

## Chapter 1 (Sura 1)

1; Bi navê Yezdanê Dilo van ê Dilo vîn.  
2; Çiqas pesindan û sipasî hene! Hemû ji bona Xuda yê cihanê ra ne.  
3; Ê mihriban î dilo van.  
4; Xudanê roja xelat û celatê.  
5; Em her te dihebînin û em tenê ji te alîkarî dixwazin.  
6; Tu me bide ser rêya rastîn.  
7; Rêya ên ku te qencî bi wan kiriye; ne ên xêşim li wan bûye û ne ên rê şaş kirine.

## Chapter 2 (Sura 2)

1; E.L.M. (Ji van tîpne di serê ferkeran da hatêne, tîpne ji hevçûyî tê gotine: Arşa wan e rastî hey Yezdan dizane).  
2; Eva pirtûka hanê, tu dudilî têda tune ye, ku ji Yezdan hatiye hinartinê. Bi xweber jî bê dudilî beled e ji bona xudaparisan.  
3; Xudaparis ew in, ku bi heyîne ne berçavî bawer dikin (Ça mafê hebona wan bi xwaberê jî). Û xudaparis, nimêja xwe dikin û ji wan tiştne, ku me ji wan ra xistîye rûzînî li hewcan disixurînin.  
4; Û ew in (Muhemmed!) ku bi wan biryarne li bal te da hatine hînartin û bi wan pirtûk û biryame, ku di berya te da jî hatine hînartinê bawer dikin û ewan (xudaparis in) ku di nêzik da bi ro (û danê dawyê da) bi xweber bawer dikin.  
5; Ewa beledîya, ku ji Xudayê wan ji bona wan ra hatiye, evan li ser wê belediyê ne û ewanê (ji aşîtan) fereste bûne (û gehîjtine armançne xwe) hey evanan in.  
6; Bi rastî ewanê bûne filehene! Tu çi ewan (bi şapatan) bidî tirsandinê û çi (ewan bi şapatan) nedî tirsandinê, li bal wan yek e: hey ewan bawer nakin.  
7; Yezdan li ser dilê wan û bihîtina wan duruf kirîye û li ser dîtina wan bi xweber jî xelî heye û ji bona wan ra şapatek e mezin heye.  
8; Û ji kesan hinek hene, ku dibêjin: Me bi Yezdan û bi ro û danê dawyê bawer kiriye. Ewan bi xweber jî qe bawer ne kirine.  
9; Ewanan, Yezdan û ewanê ku bawer kirine dixapînin; (gotina wan nîne) lê ewanan hey xwe, bi xweber dixapînin û ewan bi xapandina xwe jî aga nabin.  
10; Di dilê wan da nexweşî heye, îdî Yezdan nexweşîya wan bi nexwaşî pir kirîye. Û ji bona wan ra bi sedema wan derewne, ku ewan dikiribûne; şapatek e dilsoz heye.  
11; Û di gava jî wan : hatiye gotinê; "Hûn di zemîn da tevdanî nekin." Ewan gotinê; "Bi rastî em bi xweber aşîkar in."  
12; Hûn hişyar bin! Bi rastî hey tevdanok ewan bi xweber in, lê ewan bi tevdanokîya xwe jî agah nabin.  
13; Û di gava jî wan ra hatiye gotinê; "Hûn jî bawer bikin, ça (misilmanan) bawer kirine." Ewan gotinê: "Qey emê jî wekî evsanan bawer bikin? "Hûn hişyarbin! Bi rastî hey evsene ewan bi xweber in, lê ewan bi evseniya xwe nizanin.  
14; Û di gava ewan rastî wanê bawer kirine tên, ewan ji bawergeran ra gotine; "Em bawer dikin." Û di gava bi tenê bi pelîdne xwe va dimînin, ji pelînde xwe ra gotine: "Bi rastî em bi we ra nin, bi rastî hey em bi wan bawergeran tinaza dikin."  
15; Yezdan bi wan tinazan dike û ji bo ku ewan di koraya xwe da bi quretî bijîn ji wan ra dan dide.  
16; Ewan in, ku rê wundabonî, bi belediyê kirîne. Îdî kirîn û firotana wan kar ne kirîye û ewan bi xweber jî ne hatine li ser rêya rast.  
17; Hecwekîya wan, wekî vê temtêla hanê; (ku yek di çola tarî da ji bona ronahîyê) agirekî hil bike (dora xwe dibîne). Îdî gava agir dora wî ronahî kirîye, heman Yezdan ronaya wan birîye û Yezdan ewan di tarîtiyê da hiştîye, îdî ewan nabînin.  
18; Ewan (durûyan) ker in, lal in, kûr in. Îdî ewan ji temtêla xwe, li bal rastîyê da jî nafetilin.  
19; Û ya jî hecwekîya wan wekî temtêla wan kesne, ku ji jor da tavya şilya ewrê reşê tarî, ku têda deng, reqereqa ewr û berqetavê hebe, bi wan da digire, wan ji tirsan têlîne xwe dixine gohne xwe (ji bo ku ji deng) nemirin. Yezdan bi xweber jî filehildane binê zanîna xwe.  
20; Nêzik dibe, ku berqetav dîtina wan behere. Çi qa ji bona wan ra ronahî çê dibe, ewan di ronahî da diçin û di gava tarîti li ser wan çê dibe, ewan radibin li pîya

dimînin. Û şixwa heke Yezdan bivê, wê bihîstin û dîtina wan behere. Bi rastî Yezdan bi xweber jî li ser hemû tiştan bi hêz e.

21; Gelî kesan! hûn perestîya wî Xudayê xweyê, ku hûn û ewan heyîne berya we da heyî afirandîye, bikin. Bi vî awayî bi rastî hevî heye ku hûn xudaparisî bikin.

22; Yezdan ew e; ku zemîn ji bona we ra xistîye binrax û ezman jî xistîye avayî. Û Yezdan ji ezman, avêk e wusa hînantîye; (ji bo ku ji we ra bibe dilik) Yezdan bi wê avê ber dane derxistine. Îdî hûn jî ji bona Yezdan rêhevrêyan negirin, Loma hûn bi xweber jî dizanin, ku hevrînê wî tune ne.

23; Û heke hûn dudil dibin, di wan biryarne ku me li ser bendê xweyê (Muhemmed) da hî-nartîye, hûn ji pêştirê Yezdan, gazî hemû arîkarê xwe jî bikin (heke hûn dikarin, ka) hûn jî ferkerek e wekî ferkerê wê bînin; heke hûn di doza xwe da rastin.

24; Îdî heke hûn ferkerkî wusa neynin û hûn nikarin jî bînin, îdî hûn xwe ji wî agirê, ku ji bona filan ra hatiye amede kirinê ardûkê wî, kes û kevîr in, biparisînin.

25; Û (Muhemmed!) ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! tu mizgîna bide wan, ku bi rastî ji bona wan ra bihiştne dibinê (darê wan da) çemne avê dikişin, hene. Çi qa berêkî ji wan bihiştan ji wan ra tê dayînê (ji bihiştîyan ra) dibêjin: "Ewan berne me hêj di berê da xweribûn, evan in û hûn ji xwarin û berne cure cure ji me ra bînin." Û ji bona wan ra di bihiştan da zone paqij hene. Û ewan bi xweber jî di bihiştan da hermanok in.

26; Bi rastî Yezdan fedî nake, ku mixmixkê bi hecwekî (ji bona derxistina mafê) bide nişan kirinê û hej tiştne ji mixmixkê wêdatir jî. Îdî ewanê bawer kirine hene! şixwa ewan dizanin, ku ewa hecwekiya mafekî reste ji Xudayê wan e. Lê ewanê bûne file jî dibêjin: "Ka Yezdan bi wan hecwekiyan çi vaye?" Yezdan bi wan hecwekiyan pîr kesan ji rêya rast dîr dixê û pîr kesan jî bi wan tîne rêya rast. Bi wan hecwekiyan, hey ewanê ji rêya rast derketî wunda dibin.

27; Ewanê rêderketî hene! ew in, ku ji piştî peymanê dane Yezdan, (ji bona bawerî û perestîyê) Peymana xwe dişkênin. Û tiştê Yezdan ferman kirîye, ku bi hev ra bin ewan ewe hevratîyî dibirin (sertêdana da û bav û pîsmanan). Û ewan di zemîn da jî têkilîyî dikin. Evanan in hey ziyan dikin.

28; Hûn ça dibine file (û bi Yezdan bawer nakin)? Hûn mirî bûn, îdî ewî hûn zinde kirin. Paşê (Yezdanê) we bimirîne û paşê wê we dîsa zinde bike û hûnê paşê li bal wî da bizivirin.

29; Ewê ku hemûşk tiştne di zemîn da heyî ji bona we ra afirandîye heye! Ewa Yezdan e. Paşê ewa li bal ezman da fetilîye, îdî ewî ezman xistîye heft balokne jor da. Û ewa bi xweber jî bi hemûşk tiştan pîr dizane.

30; Û gavekî Xudayê te (Muhemmed!) ji bona fereştan ra gotîye: "Bi rastî ezê di zemîn da şûnmayekî bi afirîni." (fereştan ji Yezdan ra) gotîne: "Ka tuê di zemîn da ça ewan kesne, ku tevdanî dikin û xûnê dirêjin, biafirîni? Û em bi xweber jî te ji kemasîyan paqij dikin û sipazî (bi perestî) ji bona te ra dikin. "(Xudayê te ji wan ra) gotîye: "Bi restî ez bi tiştê, ku hûn pe nizann çêtir dizanim."

31; Û (Xudayê te) bi nişa kesan hemûşk nav (û navdan) daye hînkirinê, paşê ewan tiştan ber fereştan ra avitîye, îdî (ji fereştan ra aha) gotîye: "Ka, heke hûn di doza xwe da rast in, navê van tiştan ji min ra bejin."

32; (Fereştan, ji Xuda ra) gotîne: "Em te ji kêmasîyan paqij dikin, bi rastî ji pêştirê wî tiştê te bi me daye hînkirinê, tu zanîna me tune ye. Bi rastî pîrzanê bijejke hey tu bi xweberî."

33; (Yezdan ji bona nişa kesan ra) gotîye: "Adem! tu ji bona fereştan ra navê wan tiştan bêje." Îdî gava Adem navê wan tiştan ji fereştan ra gotîye (ewan bêzar mane). Yezdan ji wan ra gotîye: "Min ji bona we ra ne got. Ku bi rastî ez bi veşartinê tiştne di ezman û zemîn da hene dizanim û ez bi wan tiştne ku hûn vedişêrin û diyar dikin jî dizanim?"

34; Û di gava me ji bona fereştan ra gotîye: "Hûn ji bona Adam ra kunde beherin." Îdî ji pêştirê pelîd, hemûşkan kunde birin. Pelîd ji kunde birine para çû, ewî quretî kir. Û (pelîd bi xweber jî) bûye file.

35; Û me (ji bona Adem ra) gotîye: "Adem! Tu û bi tevê jina xwe va di bihiştê da bihewin hûn ji kêdera bihiştê divên, hûn di wura da (ji berê wê) bixun. Lê hûn herduk jî nêzikê vê dara (da nişana tiştan Şeceretul me'rifet) nebin. Îdî heke hûn

nêzikên wê darê bibin (ji berê wê bixun) hûnê bibine jiwanê cewrkar."

36; Îdî pelîd ewan herduk jî ji bihiştê şimitandin û ewan herduk ji wan xweşîne, ku ewan berê têda bûn, derxistin. Me jî (ji bona wan ra) got: "Hûn ji bihiştê berjêr bibin, hinekî ji we, ji bona hinekne we ra neyar bin. Hûnê heya danekî di zemîn da bi vê temtêlê bijîn.

37; (Paşê) Adem ji Xudayê xwe çend peyv hildan (bi wan peyvên ji Xuda lava kirîye) Xuda jî lavaya wî litê kirîye. Bi rastî baxişgerê dilovîn hey Xuda ye.

38; Me ji bona (nişa kesên ra) gotîye: "Hûn hemûşk jî ji wî ra berjêr bin. Kîngê ji min, ji bona we ra beledîyek hatêbe; îdî kîjan ji we bibe peyrewê wê beledîya min, ji bona wî ra tu murûzîya ji (kêm xelat) û tirsê (ji şapatan) tune ye."

39; Ê ewanê bûne file û beratenê me didine derew dêrandinê hene! Hevrîne agir hey ewan in. Di agir da hey ewan in tim (gavan) dimînin.

40; Gelî zarne cihûyan! Hûn ewan qencîne min e, ku min bi we kirîye bîra xwe bînin. Ê hûn ewê peymanî min daye we pêk bînin, ku ez jî ewê peymanî we pêk bînim. Îdî hûn hey ji min bitirsîn.

41; Ê (gelî zarne cihûyan!) ewa (Qur'an) a min hinartîye heye! rastdarya wan (biryar û pirtûka) bi we ra heye dike. Hûn bi wê bavêr bikin. Ê ewanê di cara yekem da bi wê filetî kirine hene! hûn nebîne ji wan û hûn beratenê min bi perekî hindik nefîroşin. Îdî hûn hey parîsîya min bikin.

42; Hûn bizanîn, ji bona ku mafê veşêrin; maf û pûçîyê teve hev nekin.

43; Ê hûn nimêja xwe bikin û hûn baca malê xwe bidin û hûn bi wanê, ku xwe (ji bona Yezdan ra) kûz dîkin, xwe kûz bikin.

44; Hûn ça fermana kesên bi qencîyan dîkin, hûn xwe jî bîrva dîkin û hûn bi xweber jî pirtûkê di xunin? Îdî qe hûn hiş hilnadin?

45; Ê hûn ji Yezdan bi hewdana li ser perestîyê û bi nimêj kirinê, arikarî bixwazin. Eva xwastina bi vî awayî ji xêncî xudatirsan li ser merîvan pîr mezin e.

46; Ewanê guman dîkin, ku ewanê rastî Xudayê xwe werin û bi rastî ewanê li bal Xudayê xwe da bizivirin, hene! Xudatirs ewan in.

47; Gelî zarne cihûyan! hûn ewan qencîne min e, ku min bi we kirîye bîra xwe bînin û bi rastî min hûn li ser (rûniştîne) cihanê rûmetdartir kirine.

48; Ê ji wê roya, ku di wê roye da bi tu cureyî can ji ber canekî mayî ra nayê şapat kirinê û ji bona wî canê nûsitemkar tu meherî nayê litê kirinê û ji bona ferestîya wî tu berberîya bi tiştan jî nayê hildanê û ewan bi xweber jî nayê arîkar kirinê, hûn xwe biparîsin.

49; Ê hûn (gelî zarne cihûyan!) gava min hûn ji hevrîne Fir'ewn fereste kiribûn, ku (ewan hevrîne Fir'ewn jî) bi şikê şapatan hûn didane şapat kirinê. Ewan serê zarne we ne kur in jê dîkirin (keç) û jinê we para da didane jînanînê (bîra xwe bînin). Bi rastî di van şapatan da ji Xudayê we ji bona we ra ceribandîneke pîr mezin heye.

50; Ê hûn ewê gava, ku me derya ji bona (ferestîya we) ji hev çirand, me hûn fereste kirin û hevrîne Fir'ewn jî me di avê da fetisandin we bi xweber jî li wan mêze dîkirin (bîra xwe bînin).

51; Ê hûn ewê gava, ku me ji bona Mûsa ra peymanî bi çîl şevê dabû; (ji bona hinartina pirtûka bin av Tewrat li çîyayê Tûrusînayê) we bi xweber jî li dûv Mûsa da ewa golika ji xwe ra bi perestî girtibûn, bi wê girtêna golikê bi perestî we bi xweber li xwe cewr kiribûn.

52; Me paşê ji wan nûsitemkarîyan, hûn baxişandin (bîra xwe bînin) dibe ku hûn sipazî bikin.

53; Ê hûn ewê gava, ku me ji bona Mûsa ra pirtûk (Tewrat) û berewaniya di nîveka maf û pûçîyê dabû (bîra xwe bînin). Bi rastî hevî heye, ku hûn werne rêya rast.

54; Ê hûn ewê gava, ku Mûsa ji bona kûmalê xwe ra gotibû: "Gelî komalê min! Bi rastî, ji ber ku we ewa golika ji xwe ra bi perestî girtibûn, we li xwe cewr kiribûye, hûn ji wan kirine xwe para da li bal Xudayê xwe da bizivirin û hûn (dîl xwazine) xwe bikujîn (bi gotina wî nekin). Eva şîreta hanê li bal Xudayê we, ji bona we ra çêtir e. Îdî (ji piştî poşmaniya we Xudayê we) hûn baxişandin (bîra xwe bînin). Bi rastî hey Xuda bi xweber pîr baxişkarê dilovîn e.

55; Ê hûn ewê gava, ku we ji bona Mûsa ra gotibû: "Bi rastî heya ku em Yezdan ber çavî ne bînin, em bi te bawer nakin. Îdî dengê birûska bê hişî hûn girtibûn, we bi xweber jî bi bê zarî mêze dîkirin (bîra xwe bînin).

56; Dibe ku hûn sipazî bikin, paşê me hûn ji we xwava çûnê bi hişyarî rakirin.

57; Û me ewr li ser we da xistine sîwan Û me li ser we da qarût Û gezo hinartiye (me ji wan ra aha gotiye): "Hûn ji qencê wan rozîne, ku me bi rozîtî daye we, bi xwun" Ewan li me cewr ne kirîye, lê ewan bi xweber li xwe cewr dikiribûne.

58; Û gava me (ji wan zarne cihûyan ra) gotibû: "Hûn bikebine vî gundî (Qudis); îdî hûn ji xwarinne wî ça hez dîkin. li kêderê bivên, wusa bixun. Û we bi givivîre Û hûn bi kundetî di derî da bikebine hundur Û hûn lava bikin, (aha) bejin: Xuda! Tu gunehne me bibaxîşîne, ji me dayne (di şûna peyva Hitetê. Hintetên di gotibanê)." Emê ji ji bona we ra gunehne we bibaxîşînin Û hêj emê ji bona wanê qencî kar ra, qencîyan pirtir bikin.

59; Îdî ewanê cewr kiribûne hene! Ewan; van şîreta hanê, bi wan şîretne, ku qe ji wan ra ne hatibûye getinê, guhurandine. Me jî li ser wanê cewr kiribûne ji ezmanan bi sedema ji rê derketina wan, şapatek hinartiye.

60; Û gavekî Mûsa ji bona komalê xwe ra li avê digeriya, îdî me jî ji Mûsa ra got: "Tu gopalê xwe li kevîr bixe." Ji piştî ku Mûsa bi gopal li kevîr da, ji kevîr danzdeh kanî zan. Bi sond! Hemûşk kesan şûna av vexwarina xwe, dizaniyan. Hûn ji wan xwerin Û vexwîrinê, ku Yezdan ji bona we ra xistiye rozînî bixun Û vexun Û hûn di zemîn da bi tevdanî negerin (ji rêya rast dernekebin).

61; Û hûn (gelî zarne cihûyan! Evan qencîne me ne borî bîra xwe binin). Di gava we ji bona Mûsa ra gotibû; "Mûsa! Bi rastî em li ser xwarineke bi tenê nanivin. Îdî tu ji bona me ra bi lavatî gazî Xudayê xwe bike, ji bo, ku Xuda ji bona me ra tiştne zemîn hêşîn dike ji zêrzewadan; kundur Û xîyar Û sîr Û nisk Û pîvazne ji zemîn derdikebin bide me." (Mûsa) Ji bona wan ra gotiye: "Qey hûn divên, ku ewan xwarinne qenc, bi wan xwarinne ne qenc bi guhurin? Hûn hemûşk îdî berjêrê bajar bin, bi rastî di bajara da ji bona we ra, hûn çî bixwazin heye." Û li ser wan evsenetî Û belengazî hatiye vegirtinê Û ewan rastê xeşmeke ji Yezdan hatine. Evan şapatan, bi sedema ku ewan bi beratenê Yezdan dibûne file (bawer ne dikirin) Pêxemberne Yezdan bê mafî dîkuştin, loma bi wan da hatiye. Erê! Eva şapata bi sedema gu-nehkarya wan Û bi sedema ji re derketina wan e bi cewrkarî, bi wan da hatiye.

62; Bi rastî ewanê bawer kirine; (Misilman) Û ewanê Cihû Û ewanê Merinî (Îsawî) Û ewanê sterk paris, hene! Ji wan kê bi Yezdan Û bi dan Û gavê paşîyî bawer bike Û karê aştî jî kiribe, îdî ji bona wan ra li bal Xudayê wan, xelata wan heye Û ji bona wan tîrsa ji (şapatdan) Û murû-zîya ji (kêm xelatîyê) tune ye.

63; (Gelî zarae cihûyan!) ewê gava, ku me ji we peyman stand Û me çîyayê Tûr li ser we da bilin kiribû, me ji we ra gotibû: "Hûn bi hêz ewan biryarne ku me ji we ra daye, bigirin Û hûn ewan şîretne ku di wan biryaran da hene (bîra xwe bînin). Bi rastî di be ku hûn parisî biken." (Ji ber, ku çîyayê Tûr şûnwar bûye ji bona niqandina pirtûka bi nav Tewrat, eva pirtûka jî ji bona jîyana wan bi komalî Û rêna tekoşîna wan têda hebûye, îdî çîy alî bal wan bi rûmet Û pîroz Û bilind Û bi abûr bûye).

64; Paşê we dîsa piştî xwe daye peymanê, rûyê xwe fetilandine. Îdî heke rûmet Û dîlovaniya Yezdan e ku li ser we heye tune bûya, bi rastî hûnê bibûnan ji wanê ziyar kirine.

65; Bi sond! Hûn ewanê, ku di roya şemîyê da (neçîra masîyan kirine) ji biryaran borîne, dizanin; ka ewan kêne. Îdî me jî ji bona wan ra gotiye: "Hûn bibîne meymûnê pê kenî Û pintî." (Ji piştî vê fermanê, ewan li kûdî xwûyan, komal bi wan dikenîyan; wusa bûn, îdî ji mala xwe derneketin, hinek ji wan di mala xwe da ji kovanan mirin).

66; Îdî me ewa şapata, ji bona wan merivne di gava wan da dijîtên Û ji bona wan merivne, ku di pey wan da mane, xistiye beratek e sodretî Û ji bona xudaparişan jî xistiye şîret.

67; Di gava Mûsa ji bona komalê xwe ra gotiye: "Gelê min! Bi rastî Yezdan fermana we kirîye, ku hûn çêlekekî ser jê bikin." Ewan ji Mûsa ra gotine: "Qey tu bi me tinazan dikî?" Mûsa gotiye: "Ez xwe davêjime Yezdan, ku min ji nezanan biparîşîne."

68; Ewan ji (Mûsa ra) gotinê: "Ka (Mûsa!) tu ji Xudayê xwe lava bike, bîra ji bona me ra diyar bike; ewa dewarek e çane?" (Mûsa ji bona wan ra) gotiye: "Bi rastî Xuda dibêje; ku ewa dewarek e wusa ne; ne pîr e Û ne jî ciwan e, nîvwarî ye: îdî hûn bi tiştî hatine ferman kirinê pêk bînin."

69; Ewan ji (Mûsa ra) gotinê: "(Mûsa!) tu ji bona me ji Xudayê xwe lava bike, bîra ji bona me ra diyar bike, ka rengê wê çane?" (Mûsa ji wan ra) gotiye: "Bi rastî

Xuda dibêje rengê wê zerekî wusa ne, di gava yek li mêze bike ewa mêzegreê xwe şa dike."

70; Ewan ji (Mûsa ra) gotine: (Mûsa!) tu ji bona me, ji Xudayê xwe lava bike, bira Xuda ji bona me ra diyar bike, ka ewa dewarek e çane? Bi rastî bi van salixan çêlek li bal me tevê hevbûn e (Em nizanin ka kîjan e?) û bi hezkirina Yezdan emê ewê pêk bînin.

71; (Mûsa ji bona wan ra) gotîye: "Bi rastî Xudê dibêje: "Ewa dewarek e wusa ne, sernerm nîne, ku bi wê çandinî bêne çandinê û bi wê (zevî jî) nayêne avdanê (hêj ne ketîye binê nîr) tu kêmayê wê tune ye." Ewan ji (Mûsa ra) gotine: "Te hêj salixê rastî ji bona me ra anî." Ewan îdî xwe ne dane para da û ewan serê wê dewarê jê kirin.

72; Kanê, we di gavekî da merivek kuştibû, îdî we ewa kuştîya diavête stîyê hev (ji ber ku kujrawê wî xûya ne bûye) û Yezdan bi xweber jî, tiştê hûn vedişêrin derdixê.

73; Îdî (ji piştî şer kirina çêlekê) me ji wan ra gotîye: "Hûn hinekî ji gewdê çêlekê û hinek jî ji gewdê kuştî li hev bixin. (Ji piştî li hev xistina gewdan, kujraw hate diyar kirinê). Bi vî awayî Yezdan mirya jî zinde dike û Yezdan beratenê xwe dide nîşanê we. Bi rastî hêvî heye, ku hûn ji wan hiş hildin.

74; Paşê dilê we dîsa ji pey (vê bûyerê da) wekî keviran hişk bûye, hêj ji keviran jî hişktir bûye. Çima, bi rastî hinek kevir hene, ku ji wan çemne avê bi sodretî dizên û hinek jî ji wan keviran hene! Di gava ji hev diçirin kanîyê avê ji wan bi sodretî dizên. û hinek jî ji wan keviran hene! Ji heybeta Yezdan, wusa jorda tot dibin (Dilê we qe wusa nabe). û Yezdan bi xweber jî ji wan tiştne, ku hûn dîkin bê (agah) nîne.

75; Qey hûm (gelî bawergeran!) guman dîkin ku ewan (zarne cihû û filan) ji bona we bawer bikin, bibne hevalê we? Sond! Di nava wan bi xweber da jî destek ji wan heye, peyvne Yezdan dibêhên, ji piştî ku ponîjin ka peyvnan çî armanç kirine; bi zanîn peyvnan ji şûna wan diheşivînin.

76; û ewan di gava rastî wanê bawerger tên, ji bawergeran ra gotine: "Bi rastî em bawer dîkin." û di gava ku ewan bi tenê li bal hev dimînin, ji hev ra dibêjin: "Hûn çê li bal wan dipeyvin, ku ewan bawergeran, bi wan tiştan li bal Xudayê we nihrewanan bigirin. Îdî qe hûn naponîjin?"

77; Qey ewan nizanin, ku bi rastî Yezdan bi wan tiştne ewan vedişêrin û bi wan tiştne ewan diyar dîkin jî dizane?

78; Ji wan hinek hene ne xwandine (wekî wanê ku hêj nûzane, ji dîya xwe ra bûne) ewan ji pirtûkê hey dil xwazîyan dizanin û ewan bi xweber jî hey gumanan dîkin.

79; Îdî ewanê ku pirtûkê bi deste xwe dinivîsin, paşê ji bo ku bi perekî hindik bifiroşin dibêjin: "Eva pirtûka hanê ji bal Yezdan hatîye; xwelî li van be! Ji ber ku destê wan ewa nivîsiye xwelî li wan be! û ji bona keda ku ewan dîkin, sed korayê xwelî li wan be!"

80; û ewan gotinê: "Ji pêştirê çend rone hijmarî, bi rastî qe agir bi me nagire." Tu ji wan ra bêje: "Qey we ji bal Yezdan peyman hildaye? Îdî bi rastî Yezdan jî ji peymana xwe para naçe û ya jî tiştê hûn pê nizanin, di mafê Yezdan da dibêjin?"

81; Gotina wan nîne! Bi rastî kê gunahan bike û gunehne wî, ewî som bike, îdî hevrînê agir ewan in. Ewanê ku di agir da her dimînin ewan bi xweber in.

82; Ewanê bawer kirine û karê aştî kirine, hene! Ewan hevrînê bihiştê ne. Ewanê ku di bihiştê da her dimînin ewan bi xweber in.

83; û di gavekî da dîsa me ji zarne cihûyan peyman hildabû. Hûn (geli zarne cihûyan!) ji pêştirê Yezdan perestîya tu tiştî nekin û hûn ji bona da û bavê xwe ra hey qencî bikin û hûn ji bona bira û pismamne xwe û sewîyan û xezan û belengazan qencîkar bin û hûn ji bona merivan hey şîretê qencî bêjin û hûn nimêj bikin û baca malê xwe bidin. Ji pêştirê hindikan, we paşê dîsa rû ji peymanê fetilandin û hûn bi xwe, hêj jî rû difetilînin.

84; û me dîsa carekî jî ji we peyman hildabû ku hûn bi kuştin xûna hevdû nerêjin û hûn hevdû ji welatê xwe, nedne derxistinê û we bi xweber jî dîdevanîya peymanê dîkin; paşê we "erê" jî gotin.

85; Dîsa paş da hûn bi xweber in, hevdû dikujin û hûn bi xweber in, ku hûn destek e ji xwe ji welatê wan derdixin û hûn bi xweber in, bi vir û neyartî piştê hevdû di hemberê wan da dîkin, ji welat derdixin, eva derxistên bi xweber jî li ser we qedexe bûye. Heke yek ji wan zebûn bibê, were bal we, hûn bi mal, ewan ji zebûniyê

fereste dikan. Îdî qey hûn bi hinek biryarne pirtûkê bawer dikan û hûn bi hineka jî bawer nakin? Ji piştî naha da, kê ji we aha bike, îdî bi rastî celata wî di jîna cihanê da riswabûn e û di rûya rabûna hemûtîda jî, ewan li bal şapata zor da tene avêtinê. Û Yezdan bi xweber jî ji wan tiştne ku hûn dikan bê agah nîne.

86; Ewanê ku jîna cihanê, bi jîna dan û gavê para da kirîne, evan in. Îdî şapat ji wan sivik nabe û arîkarya wan qe nayê kirinê.

87; Û bi sond! Me ji Mûsa ra pirtûk (Tewrat) daye û me li pey wî da pêxember xistine peyrewê wî û me ji bona Îsayê kurê Meryemê ra beratene daveker dane û me Îsa bi cane pîroz deye hez kirinê. Îdî qey kê gavê pêxemberê hatibe bal we; bi wan beratenê ku can we ne xwestibe, hûn doza mezinayê nakin? Îdî hûn; destekî ji wan pêxemberan didine derewdêrandinê û hûn destekî jî nakujin?

88; Ewan ji bawergeran ra gotinê: "Dilê me da xêlî heye (ji ber wî em rastîyê nabînin; bawer nakin). Gotina wan nîne, lê Yezdan bi sedema filetiya wan, ewan deherandine. Îdî çi qa hindik ji wan bawer dikan!

89; Û gava ji bal Yezdan ji wan (cihûyan ra) pirtûk (Qur'an) hatiye, ku ewê (Qur'an) ê bi xweber jî rastdarya we (pirtûka) li bal wan heyî dikir ji bona serva hatina xwe. Îdî gava ewa pêxembera bi pirtûka xwe va hatiye bal wan ewan (pirtûk û pêxember) nas nekirin (ewan cihûyan bi wan bawer ne kirine, bûne file). Îdî deherandina Yezdan li ser filan e.

90; Çi qa sike! Ku ewan, ji dexesiya di nava wan da heye, xwe firotine; ji ber ku ewan, bi wan biryarne Yezdan bi rûmeta xwe li ser bendekî xwe hinartîye, bawer nakin. Îdî ewan xeşma Yezdan bi peywestî ked kirine. Û ji bona filan ra şapatekê riswayî, heye.

91; Û di gava ji bona wan ra te gotinê: "Hûn bi wan biryarne, ku Yezdan hinartîye, bawer bikin." Ewan gotinê: "Em hey bi wan biryarne, ku li bal me da hatine hinartinê bawer dikan." Û ewan ji pêştirê wî bi tu tiştî bawer nakin. Û ewa (pirtûka Qur'an) bi xweber jî, rastdarê ji bona we pirtûka (Tewrat) ku li bal wan heyî. Îdî (Muhammed tu ji bona wan ra) bêje: "Heke hûn bi rastî bi wê pirtûka li bal we heyî, bawer dikan, we çima hêj di berê da pêxemberne Yezdan di kuştin?

92; Û bi sond! (gelî cihûyan!) Mûsa bi beratenê daveker va hatibû bal we paşê we di pey wî da (gava ji bona niqandina Tewratê çûbû çiyayê Tûrusînayê) ewa golika ji xwe ra bi perestî girtibûn û we bi xweber li xwe jî cewr kiribûn.

93; Û di gava, ku me ji we peyman standibû; me çiyayê Tûr bi dîdevanî li ser we, bilind kir, ku hûn biryarne Tewratê bi hêz bigirin. Me ji bona we ra got: "Hûn (gelî zarne cihûyan!) ewan biryarne me ji we ra anîne bi hêz bigirin û guhdarî bikin." Ewan gotibû: "Me bihişt û lê em bi gotina wî nakin." Û bi sedema filetiya wan, hezkirina golikê di dilê wan da nermojekî bûye. (Muhammed! Tu ji bona wan ra) bêje: "Heke hûn (bi golikê) bawer bikin, fermana bawerya we, ji bona we ra çi qa tiştêkî sike!

94; (Muhammed! Tu ji bona wan ra) bêje: "Heke bi rastî li bal Yezdan (bihişt) xwurî ji bona we ra ne ji tu kesî ra nîne, heke hûn di doza xwe da rast in, îdî hûn xwaziya mirinê bikin."

95; Û lê bi sedema wan kedne, ku ewan hêj pêş da kirine tu carî ewan xwaziya mirinê nakin. Û Yezdan bi xweber jî pîr rind bi cewrkaran dizane.

96; Û tu rastê wan têyî, ku ewan ji hemû kesan pirtir ji jînê hez dikan û ewan hêj ji hevri çêkeran pirtir ji jî jînê hez dikan; her yek ji wan hez dikan, ku hezar salî bijîn. Ewa jîna wan bi xweber jî, ewan ji şapatan nade paradanê û Yezdan bi xweber jî dibîne, ka ewan çi dikan.

97; (Muhammed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Kîjan ji bona Cibraîl ra neyartîyê dike, îdî (bira ewa bizane!) bi rastî (Cibraîl) ewa (Qur'ana) rastdara (wan biryarne berya xwe dike) ji bo ku ewa bibe beled û şîret, ji bona bawergeran ra li ser dilê te da hinartîye."

98; Û kê bibe neyarê Yezdan û fereştene wî û pêxemberne wî û Cibraîl û Mîkaîl, bira bizane! Bi rastî Yezdan bi xweber jî neyarê filan e.

99; Û bi sond! Me li bal te da beratenê daveker hinartine. Û ji pêştirê wanê ji rê derketî, tu kes nankorya wan nake.

100; Qey çi qa ewan peymanek dabin, destekî ji wan ewa peymanê para da ne avêtîye? Şixwa pirne ji wan bawer nakin.

101; Û çi qa pêxemberêkî ji alyê Yezdan, li bal wan da hatibe, ewa pirtûka, ku li

bal wan heye jî rastdêran dibe, dîsa destekî ji wan komalê xweyê pirtûk, pirtûka Yezdan avêtine piştî guhê xwe, te digo qey ewan bi wê pirtûkê nizanbûne?

102; Ewan (cihûyan) bûne peyrewê wan tiştne ku pelîdan dixwendin, ji bona ku maldarî û seroktiya Sûleyman ji destê w derxin. Sûleyman ne bibû file, lê ewan pelîdan bibûne file. Çima ewan meriv hînê ançê dikirin û ewan meriv hînê wan tiştne, ku li ser wan herduk serokne (welatê) Babîlê hatibûye hinartinê jî dikirin. Ewan herduk serokne (bi nav) Harût (Xwerût) Marût (Mêrat) gava yek hînê wan tiştne, ku li ser wan da hatiye hinartinê, bi kirnan, ji wan ra digotin: "Îdî tu bi wan tiştne me hînê te kirîye nebe file, loma bi rastî em hey ceribandokin." Îdî meriv ji wan (herdu serokan) ewan tiştne, ku mêr û jin, bi zanîna wan tiştan ji hev ra tiqetîyan, hîn bûne. Lê heya destûra Yezdan ne bûya (ewan serokan) zîayana tu kesî bi wan kirine xwe ne dikirin. Ewan merivan ji wan (serokan) ewan tiştne, ku zîyana merivan dikirin, hîn dibûne, hînê wan tiştne bi kerhatî, ne dibûne. Û bi sond! Ewan dizanin, ku kê ewa zanîna kiribe, di danê para da ji bona wî ra tu par tune ye. Û heke ewan bizanîyan, ka eva firotina hanê, ku ewan xwe pê firotine, çi qa sike, ewan eva firotin, ne dikirin.

103; Û heke ewan bawer kiribûnan û Xuda parisî bikirnan, bi rastî xelata li bal Yezdan ji bona wan ra qencîr dibû. Xwezîka bizanîyan!

104; Gelî bawergeran! Hûn (wekî cihûyan, ça ji Mûsa ra digotin: "Gohdarya me bike.") Ji bona (Muhemmed ra) ne bêjin: "Tu guhdarya me bike." Û hûn bêjin: "Tu li me mêze bike û hûn guhdarî bikin." Ji bona filan ra şapatek e dilsoz heye.

105; Ewan filene xweyê pirtûk û ewanê hevri perest hez nakin, ku ji Xudayê we, ji bona we ra qencîyek bê hinartinê. Û Yezdan bi xweber jî evîne xwe ji dilovanîya xwe ra xwuri dike. Û Yezdan bi rastî xweyê rûmeta mezin e.

106; Heya me hê gencîr û ya jî wekî wê, beratan neynin, em tu beratan û biryaran ji şûna wan ranakin. Qey tu nizanî ku Yezdan bi rastî li ser hemû tiştan bi hêz e?

107; Ma qey tu nizanî, ku maldarya ezman û zemîn hey ji bona Yezdan ra ne? Û ji bona we ra ji pêştirê Yezdan tu serkar û arîkar tune ye.

108; Qey hûn jî (gelî musulmanan!) divên ku hûn jî ji pêxeberê xwe pirsan bikin, ça hêj berê da ji Mûsa pirs hatine kirinê? Û bi sond! Îdî kê baweryê bi filetiyê biguhure, ew wunda kirîye.

109; Pir kes ji xweyê pirtûkan hene, ji dexesiyan ji piştî maf ji wan ra bûye jî hez dikin, ku we ji bawerya we bifetilînin, bixne file. Îdî heya fermana Yezdan ku bê, hûn ewan bibaxişînin; ji wan bibore. Bi rastî Yezdan li ser hemû tiştan bi hêz e.

110; Û hûn nimêj bikin, û baca malê xwe bidin. Hûn ji bona xwe ra qencîyan çi pêş da verêkin, hûnê ewê gencîyê li bal Yezdan bibînin. Bi rastî Yezdan, dîdevanê hemû kirinê we ye.

111; Û ewan (cihû û mexînan) gotine: "Ji pêştirê cihû û mexînan tu kes naçe bihiştê." Eva gotina dilxwaziya wan e. Tu (ji wan ra) bêje: "Heke hûn digotina xwe da rastin, ka nişana xwe binin."

112; Na, wekî gotina wan nîne; lê kê xwe hispartibe Yezdan, bi xweber jî qencîkarbe, îdî ji bona wî ra li bal Xudayê wî, xelata wî heye. Ji bona wan ra tu tirs û murûzaya (ji kê xwelat danê) jî tune ye.

113; Û Cihûyan gotinê: "Tu ola mexînan tune ye." Mexînan jî gotinê: "Tu ola cihûyan tune ye." Ewan (herduk) jî pirtûkê dixûnin. Wekî van herdukan ewanê ne xwendî jî, wekî gotina wan gotinê. Îdî di roya rabûna hemûtî da Yezdanê di wan tiştne, ku ewan têda ne wekhev dibin, berewanî bike.

114; Gelo ji wan kesne; ku nahêlin di mizgevtne Yezdan da, navê Yezdan bi perestî bê hildanê û dixebitin, ku ewan mizgevtan hilşînin, cewrkartir kê hene? Evanan hey bi tirs dikarin bikebine mizgevtan. Di cihanê da ji bona wan ra riswatî heye û di danê para da jî ji bona wan ra şapatek e mezin heye.

115; Û rojhilat û rojava ji bona Yezdan ra nin. Îdî (ji bona perestîyê) hûn kîjan alî bizivirin, bardana Yezdan di wura dane. Bi rastî (dilovanîya) Yezdan pir fire ye û ewa pir zan e.

116; Ewan (filan) gotinê: "Yezdan ji xwe ra zar hildane." Yezdan ji zar girtinê berî ye. Lê şixwa hemû tiştne di ezman û zemîn da heyî, ji bona Yezdan ra ne. Hemû jî ji bona Yezdan ra bi tirs serî berjêr dikin.

117; Ji tunebûnê (Yezdan) ezman û zemîn afirandiye. Û gava ewa bivê, ku bûyerek

bibe; îdî ji wê bûyerê ra dibêje: "Bibe." Ewa bûyara jî heman dibe.

118; Û ewanê nezan (ji bona pêxeberîya te) gotine: "Gotî Yezdan bi me ra biaxifta, ya jî ji bona me ra beratek ne anîbûya?" Ewanê berya wan da jî wekî gotina wan gotine, dilê wan di gotinê da wekî hev bûye. Bi sond! Me berate ji bona wî komalî ku di nêzîk da bawer dîkin, vekirine.

119; Bi rastî me tu bi mafî şandîyî, ji bo ku tu mizgînvan û tirsvan bî û tu ji hevrîne doje nayê pirs kirinê.

120; Û bi rastî cihû û mexînî hene! Heya tu nebî peyrewê komal û ola wan, ewan bi te qayîl nabin. Tu (ji wan ra) bêje: "Bi rastî rîya rast hey rêya Yezdan e." Û heke ji piştî ku ewan zanîna ji te ra hatîye, tu bibî peyrewê hewasa wan, îdî ji bona te ra li bal Yezdan tu serkarî û arîkarî tune ye.

121; Ewanî ku me ji wan ra pirtûk anîye hene! Ewan pirtûkê bi babetîya pirtûkê dixûnin. Şixwa ewanê bi pirtûkê bawer dîkin evan in. Û kê (bi pirtûkê bawer neke) bibe file, îdî evan in hey zîyan kirine.

122; Gelî zarne cihûyan! Hûn ewan qencînê minê, ku li ser we hene bîra xwe bînin. Kanê min hûn bi rastî li ser hemû komalne cîhanê rûmetdar kiribûn.

123; Û hûn, ji wê roya, ku di wê royê da, tu canek ji ber canekî mayî ra nayê celat kirinê û ji wî canê celat kirî, tu bertîl û xelat jî nayêne girtinê, (ku ewa ji celat kirinê fereste be) û tu mehderî jî havil nake û ewan canan nayêne arîkar kirinê jî, xwe biparisînin.

124; Û di gavekî da, Xudayê Îbrahîm, bi çend peyvan Îbrahîm ceribandîye, îdî Îbrahîm jî ewan peyvan pêk anîne. Xudê ji bona Îbrahîm ra gotîye: "Bi rastî ezê te ji bona merivan bixme pêşrewan." Îbrahîm (ji Xudê ra) gotîye: "Ji ûrta min jî pêşrewanan çê bike." Xudê gotîye: "(Îbrahîm) ji ûrta te ewanê cewrkar nagihêjîne peymana min."

125; Di wan gava da jî me xaxistibû şûna civîn û qencî û ewlwtîyê. Hûn jî di bingeha Îbrahîm da jî xwe ra şûna nimêjkirinê bigirin. Û me li bal Îbrahîm û Îsmail peyman daye, ku ewan herduk xanîyê min, ji bona sertêdanne wî û ji bona rûniştîne wî (bi perestî) û ji bona ewanê ku di wê da bi kûzayî û bi kundetî nimêj dîkin, paqij bikin.

126; Û di wê gavê da Îbrahîm ji Xudê lava kirîye, gotîye: "Xuda! Tû evê derê ji bona kesan ra bixe bajarekî wusa, ku bibe şûna ewletîyê û tu şûna rûniştîne wî ra, ku bi Yezdan û bi dan û gavê para da bawer dîkin, ber û zêr û zewadne xweş bibe. (Xudê gotîye:) "Kîjan ji wan bibe file, îdî ezê ewî bi berxudarî hindik bidime jînanîne, paşê ezê ewî li bal şapata agir da stûxar bikim. Û şapata agirê çi qa sikê şûnan e.

127; Û di wê gavê da Îbrahîm û Îsmail xîme xanî ji zemin bilind kirine, (aha) gotine: "Xudayê me! Tu evan kirinê me, ji me litê bike. Bi rastî tu bi xweber dibêhê û dizanî."

128; Xudayê me! Tu me herduka jî, bi gerînî ji wanê ku xwe hispartine te. Û tu ji ûrta me jî, komne, ku ji bona te ra xwe hispartine bi (afirînî û) bi gihinî û tu rê û biryarê perestîya me, bi me bide hînkirinê û tu nosîtemne me bibaxişîne. Birastî tu pir baxişgerê dilovîn î."

129; Xudayê me! Tu di nava ûrta me da, ji wan, pêxemberan bişîne, ku ewan ji wan ûrtê me ra beratenê te bixûnin û ewan bi wan ûrtê me, xwendîna pirtûk û zanîna retkokî hîn bikin û ewan ûrtê me ji sikatîyan paqij bikin. Bi rastî tu bi xweber jî servahatê bijejkeyî.

130; Û bi rastî ji pêştirê wanê evsene tu kes ji ola Îbrahîm, rû nafetilîne. Bi sond! Me (Îbrahîm) di cîhanê da hêlbijartîye û Îbrahîm di dan û gavê para da jî ji aşîkaran e.

131; Di gava Xudayê (Îbrahîm,) ji bona wî ra gotîye: "Tu xwe hispere." (Îbrahîm) gotîye: "Min xwe hispartîye Xudayê gerdûne".

132; Û Îbrahîm eva şîreta hanê ji bona zarne xwe ra bi olitî şîret kiriye û Yaqûb jî şîret kirîye (û gotîye): "Gelî zarne min! Bi rastî Yezdan ji bona we ra eva ola hêlbijartîye. Îdî hûn jî hey bihispar û misilmanî bimirin."

133; Qey (gelî cihûyan!) di gava Yaqûb ketibû ber mirinê, hûn amede bûn? Di wê gavê da Yaqûb ji bona zarne xwe ra gotibû: "Gelî zarne min! Hûnê di pey min da ji bona çira perestî bikin?" Zaran ji bona Yaqûb ra gotine: "Emê ji bona Xudayê te û ji bona Xudayê bav û bapîrne te ra; Îbrahîm û Îsmail û Îshaq, ku Xudakî bi tene ye,



perestî bikin. Û em bi xweber jî ji bona wî ra xwe hisparokin."

134; Evan (zarne Îbrahîm û Yaqûb) komne wusa nin bi rastî hatine û çûne. Ewan çiked kiri-bin, keda wan ji bona wan ra ne û hûn jî çiked bikin, keda we jî ji bona we ra ne û hûn ji kirine wan nayêne pirs kirinê.

135; Ewan ji bona we ra gotinê: "Hûn bibne cihû û ya bibne mexînî, ku hûn werne rêya rast." (Muhammed! Tu ji wan ra bêje:) "Gotina we nîne, lê em di ola Îbrahîm e ku ji xaryê dûr e, rast danîn. Îbrahîm bi xweber jî qe ne bûye ji hevri çêkeran.

136; (Gava ewan wusa ji bona we ra bêjin) hûn jî bêjin: "Me bi Yezdan û bi wê pirtûk û bir-yarne li bal me da hatine hinartin bi wan biryarne li bal Îbrahîm û Îsmail û Îshaq û Yaqûb nevîne wan hatine hinartin û bi wan pirtûne, ku ji Mûsa û ji Îsa ra hatine û bi wan pirtûne û biryarne ku ji hemû pêxemberan ra, ji Xudeyê wan hatine, bawer kiriye. Em di nava wan yekê da jî tu veqetandinê çê nakin û me bi xweber jî ji bona Yezdan ra xwe hispartîye."

137; Îdî heke ewanan wekî we ça bawer kiriye, bawer bikin, bi rastî ewan hatine rêya rast û heke ewan pişta xwe bidine bawerya bi vî awayî, bi rastî îdî ewan di dudilyê danin. Di hemberê wan da Yezdan besî te ye. Yezdan bihîstekê pîr zan e.

138; (Hûn bibne peyrewê) rengê, ku Yezdan (ji bona we ra daye). gelo rengê (ola kê) ji rengê (ola) Yezdan rindtire? Û em bi xweber jî hey ji bona Yezdan ra perestî dikin.

139; Tu ji bona filan ra bêje: "Ka hûn ça di ola Yezdan da bi me ra tekoşîn dikin? Yezdan bi xweber jî Xudayê me herdu destan e, keda me ji bona me ra ne û keda we jî ji bona we ra ne û em bi xweber jî bona Yezdan ra hey perestî dikin."

140; Qey hûn dibêjin: "Ku bi rastî Îbrahîm û Îsmail û Îshaq û Yaqûb û nevîne wan, cihû ya jî mexînî ne?" (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Gelo hûn çêtir dizanin, ya jî Yezdan çêtir dizane? Û gelo ji wî kesê, ku Yezdan ji wî ra rastî dabe hîn kirinê, ewa jî rastiyê veşêre, cewrkartir kê heye?" Û Yezdan bi xweber jî ji kirinê we bê agah nîne.

141; Evan komek in hatine û çûne, keda wan ji bona wan ra ne û keda we jî ji bona we ra ne û hûn ji wan kirinê, ku ewan dikin, nayêne pirs kirinê.

142; Di nêzik da ewan evsenene ji kesan wê bêjin: "Gelo berê wan (misilmanan) ji berdana wan e, ku berê da ewan berê xwe didane, çidaye fetilandinê?" (Muhemmed! tu ji wan ra) bêje: "Rojhilat û rojava, herduk jî ji bona Yezdan ra ne. Yezdan ji kê ra bivê, ewî tîne rêya rast.

143; Û her wusa me hûn xistine kemek e nîvwarî, ji bo ku hûn li ser kesan bibne (nemûş û) nihrevan û ji bo ku pêxember jî li ser we bibe (nemûş û) nihrevan û ji bo ku em ewanê peyrewê te û ewanê ji peyrewîya te para da çûne, bi zanîn ji hev raqetînin, me ewa berdana te ye hêj berê da te (di perestiyê da) berê xwe didaye ji we ra xistîye berdan. Û ewa berdana jî ji pêştirê ser wanê, ku Yezdan ewan anîne rêya rast çi qa li ser kesan mezine! Û Yezdan (bi van fermanan) bawerî (û perestîya) we wunda nake. Bi rastî Yezdan ji boma kesan ra dilsozê di-lovîn e.

144; Bi sond! Em rûyê te (Muhemmed!) ku tu li ezmanan mêze dikî (ji bona niqandinan) dibînin. Îdî bi rastî emê berê te (Muhemmed!) bizivirîne li bal berdanek e wusa, ku tu bi wê berdanê qayil bibî. Îdî (Muhemmed!) tu rûyê xwe bi fetilîne bide aliyê mizgevtê (bi nav) Mescid el-Heram. Û hûn (gelî bawergeran!) li kur bi çi awayî dibin bibin (di perestiyê da) îdî hûn jî berê xwe bidine aliyê wê mizgevtê. Û bi rastî ewanê ku ji wan ra pirtûk hatiye hene! Ewan dizanin, ku ewa fermana mafekî rast e ji Xudayê wan hatiye. Û Yezdan bi xweber jî ji kirinê wan bê guman nîne.

145; Û heke (Muhemmed!) tu ji bona wanê pirtûk ji wan ra hatiye hemû beratan jî bînî, dîsa ewan nabine peyrewê berdana te û tu bi xweber jî nabî peyrewê berdana wan. Ewanan jî nabine peyrewê berdana hev. Û bi sond! Heke tu ji piştî, ku ji te ra zanîn hatiye bibî peyrewê xweşîya wan, bi rastî îdî tu di wê gavê da dibî ji wanê cewrkar.

146; Bi rastî ewanê, ku me ji wan ra pirtûk daye hene! Ewan (bi Muhemmed û bi pêxemberî-ya wî) nîyasîn ça zarne xwe nas dikin; Û bi rastî destekî ji wan hene mafê vedişêrin, ewan bi xweber jî bi mafîtiya wî dizanin.

147; Îdî tu nebe ji wanê du dil; rastî ji Xudayê te ye.

148; Û ji bona her yekê ra berdanek heye, ewa berê xwe dide wî alî. Îdî hûn (gelî bawerge-ran!) di qencîyan da bidine ber hev. Hûn li kur dibin bibin hey Yezdanê we

hemûşkan bicivîne. Bi rastî Yezdan li ser hemû tiştan bi hêz e.

149; Û tu kengê li kuderê derkebî rê, îdî tu berê xwe bide alîyê mizgevta (bi nav) Mescid el-Heramê. Û (eva fermana) bi ber dana alîyê mizgevta (bi nav) Mescid el-Haramê rastîyek e ji Xudayê te ye. Û Yezdan bi xweber jî ji kirinê we bê agah nîne.

150; Û tu kengê li kuderê derkebî rê, îdî tu berê xwe bide alîyê mizgevta (bi nav) Mescid el-Heramê. Û hûn (gelî bawergeran!) kengê li kuderê bin, ji bo ku tu kes ji we ra rexne çê nekin. Îdî hûn jî berê xwe bidine alîyê wê mizfevtê, ji pêştirê wanê cewrkarêne ji wan (dexesan, şix-wa) tu kes (ji we ra rexnan çê nake). Îdî hûn ji wan netirsîn û hûn ji min bitirsîn, ku ez (ewan) qencîne min e, ku li ser we hene pêk bînim û hêvî heye ku hûn werne rêya rast.

151; Loma me di nava we da ji we pêxemberekî (wusa) şandîye ji bo ku ewa (pêxembera) ji bona we ra beratenê me bixûne û we ji sikatîyan paqij bike û xwendina pirtûk û zanîne retkokî hînê we bike Û ewa (pêxembera) zanîna wan tiştne, qe we di berê da pê nizanbûye hînê we bike.

152; Îdî hûn min (bi perestî) bîra xwe bînin, ku ez jî ji bona we ra (baxişandinê) bîra xwe bînim û hûn sipazîya min bikin û hûn nankorya min nekin.

153; Gelî bawergeran! hûn bi hewandin û bi nimêj kirinê (ji Yezdan) arîkarî bixwazin. Bi rastî Yezdan bi hew keranrane.

154; Û hûn ji bona wan kesne di rêya Yezdan da hatine kuştin, nebejin: "Ewan mirîne." Na, ewan ne mirî ne lê ewan dijîn haya we (bi jîna) wan tune ye.

155; Û (gelî bawergeran!) bi rastî emê we bi hinekî ji tîrs û birçîbûnê û bi kemasiya di mal û can û beran da biceribînin. Û (Muhemmed!) tu mizgînê bide hewkeran.

156; Ewanê di gava bi wan da aşîtek hatibe, (aha) gotine: "Bi rastî em bendenê Yezdan in û bi rastî emê li bal Yezdan da bizivirin hene! hewker ew in.

157; (Ewanê) ku ji bona wan ra ji Xudayê wan baxişandin û dilovîni heye, evan in û (ewanê) hatine rêya rast jî evan in.

158; Bi rastî "Sefa û "Merve" herduk jî ji nişanê Yezdan in. Îdî kîjan li dora xaniyê (Kabe) bigere û ya jî senedana (bi nav) Umre bike, tu zîyan li ser wî tune ye, ku ewa di nîveka wan herdu girikanda jî bigere. Û kîjan ji ber xwe qencîyekî bike bîra (bizane, bi rastî Yezdan hember ya qenciya wî) dide wî. Îdî bi rastî Yezdan sipazkarê pir zan e.

159; Bi rastî ewanê ku ji piştî me ewan (biryarne xwene ji salixê rêya rast e) me bi huzwartî hinartîye, ji piştî me ewan (biryaran) di pirtûkê da ji bona merivan ra daye vekirinê, vedişê-rin, hene! Yezdan ewanan ji dilovanîya xwe dideherîne û ewanê, ku hatine dehrandinê jî evanan dideherînin.

160; Ji pêştirê wanê, ku (ji kirinê xwe) poşman bûne û aştî kirine û tiştne veşartî, derxistine derva. Îdî ez jî evan dibaxişînim. Û bi rastî ez bi xweber pir baxişkarê dilovîn im.

161; Bi rastî ewanê, ku bûne file û di gava mirin e, bi filetî jî mirin e, hene! Evan in, ku deherandina Yezdan û firîştan û merivan bi hemûtî li ser wan in.

162; Ewanan di deherandinê da her dimînin. Şapat liwan sivik nabe û li wan nayê mêze kirinê jî (ku şapata wan para bikebe).

163; Û (gelî bawergeran!) Xudayê we Yezdanekî bi têne ye, ji pêştirê wî tu yezdanê (babetê perestîyê) tune ye. Ewa ye dilovanê dilovîn.

164; Bi rastî di afirandina ezman û zemîn da û di newek hevûbûna şev û royan da û di ki-şandina wan kelekne, ku di deryayê da bi barê xwe va bi wan tiştne ku havilîn ji bona merivan ra, di gera wan da û di wê ava ku Yezdan ji ezmanan hinartîye. Îdî yezdan bi wê avê zemîn ji piştî mirina wî zinde kirîye da û di belav kirina Yezdan, ya hemû candaran di zemîn da û di hatina bayê da û di wî ewrê amedeyê di nîveka ezman û zemîn da ku li hev dizivirin, beratenê (hêca ji bona hebûna afirandokê wan) ji bona komalekî (ku bi ponijandin hiş hildidin) heye.

165; Û (bi vî ra jî) hinek meriv hene, ku ji pêştirê Yezdanê (babetê perestîyê) ji xwe ra hinek manendan digirin (ji wan ra perestî dikin) ça ji Yezdan hez dikin wusa jî ji wan manendan hez dikin. Ewanê bawer kirine hene! Ewan pir ji Yezdan hez dikin. Xwezîka ewanê ku li xwe cewrkirine di gava şapatê dibînin, bi zanîyan ku bi rastî hemû hez ji bona Yezdan ra ne! Û Yezdan bi xweber jî bi rastî zor şapat e.

166; Di gava ewan şapatê dibînin, bi rastî ewanê peyrewî ji wanê pêşrewne xwe para da diçin û di nava wan bi xweber da jî bendê gêrêdanê pizirîye.

167; Û ewanê peyrew hene! (Aha) gotine: "Heke careke dinê jî ji bona me ra hatina (cihanê hebe) îdî emê ji wan peşrewanan xwe bişon, ça ewan dest ji me berdabûn e. Bi vî awayî Yezdan kirinê wan bi wan dide dîtîne, ji bo ku ji wan ra bibe kovan. Ewan ji agir jî der-nakebin.

168; Gelî kesan! Hûn ji wan tiştne di zemîn da heyî bi duristî û bi paqijî bixun, Û hûn nebîne peyrewê şopa pelîd. Bi rastî pelîd ji bona we ra ne yarekî xûya ye.

169; Pelîd hey fermane we bi kirina sikatiyan û bê fedî û maştûqiyan dike (û pelîd fermana we dike) ku hûn tiştê pê nizanin, di mafê Yezdan da bêjin.

170; Û di gava ji bona wan ra hatiye gotinê: "Hûn bibîne peyrewê wan biryarne ku Yezdan hinartine." Ewan gotine: "Na, em nabîne peyrewê wan, lê ewan tiştne, ku bav û kalê me hogirî daye wan emê hey bibîne peyrewê wan. Ere! Lê heke bav û kalê wan qe hişê wan negî-hîje tu tiştî û di rêya rast da nebin jî, ewanê dîsa bibîne peyrewê hogirîya wan?

171; Û hecwekîya wanê file hene! Wekî hecwekîya wî şivanê tarişan, ku di gava qîrê tarişan dike, tariş ji pêştirê deng tu tiştî ji wî şivanî nabihê (evan filan jî ji pêxemberan hey deng dibêhên tu arşan, ji gazî kirina wan nabihên. Ewan filan) ker in û lal in û kor in, îdî ewan (ji gazî kirina pêxemberan) tu hişî hilnadin.

172; Gelî bawergeran! Hûn ji qencê wan rozîne me dane we bixun û hûn ji bona Yezdan ra sipazî bikin, heke hûn bi rastî ji bona Yezdan ra perestî dikin.

173; Bi rastî ji bona we ra hey mirar û xûn û goştê berazan û goştê wan tarişne, ku ne ji bona qayîl bona Yezdan hatine ser jêkirinê, ne durist in. Îdî heke yek bêçar bibe ji bona xwarina wan ra; heke ji wan xwarinek e (wusa nîvwarî) ne jî û ne mirî bixun ji bo xwarina ji wan tu guneh li ser wî tune ye. Bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

174; Bi rastî ewanê, ku beratenê Yezdan ji pirtûkê hinartinê vedişêrin, ji bo ku ewan (beratenê di pirtûkê da) bi pereki hindik bifiroşin, hene! Evanan zikê xwe hey bi agir tijî kirine. (Ewan tiştne ku ewan bi beratan kirine, xurîna ewa agir e). Di roya rabûna hemûtî da Yezdan bi wan ra napeyîve û ewan ji gunehan paqij nake. Ji bona wan bi xweber jî şapatek e dilsoz heye.

175; Ewanê rêya rast bi rêya xar û baxîşandin bi şapatê kirîne, hene! Evan bi xweber in. Îdî gelo ewan li ser agir ça hew dikin?

176; Ji bo, ku Yezdan bi mafî pirtûk hinartibû, ewan (bawer ne fikir eva şapat bi wan da hatiye). Ewanê di pirtûkê da ne wekhevbûn e hene! Bi rastî ewan di ne wekhevbûnek e dîr danin.

177; Bi rastî berdana we ye ku hûn berê xwe didine alîyê rojhilat û rojava ji qencîyan nîne, lê qencîya rast (qencîya wî kesê) ku ewa bi Yezdan û bi dan û gavê para da û bi firiştan û bi pirtûkan û bi pêxemberan bawer kirîye û (qencîya wî kesê) ji bona hez kirina (Yezdan) mal, ji bona pismam û sêwîyan û xezanan û rêwîyên rêyan û xwustevanan û ji bona azadiya bende û zebûnan, dabe. Û (qencîya wî kesê) nimêj kiribe û baca malê xwe dabe û (qencîya wan kesne) di gava peyman ji bona hev ra dabîn, peymana xwe pêk tînin, Û (qencîya wî kesê) di tirs û tengayî û di gava tirsê da jî hew hewdanok in. Evane bi van salixan in, rast in û evan bi xweber in hey Yezdan parisî dikin.

178; Gelî bawergeran! Tûl hildan di kuştinê da, li ser we bi vê nevê bûye. (Kuştin hemberîye; kîjan meriv ku merivekî bikuje, ewa kujraw jî tê kuştinê). Merivê azad bi azadekî mayî û merivekî bende bi bendeke mayî û jinek bi jinek e maî bihemberîne. Û heke kujraw ji alîye bira (û xwayîn e) kuştî da hate baxîşandinê, îdî (divê ku kujraw) bibîne peyrewê (xwûyê ku di nava wan da heyî) û ji bona (mîrat xurne kuştî ra xûnê) bidin. Eva (baxîşandin û xûndana) bi vî awayî (ji bona we ra) ji Xudayê we sivikatî û dilo vanîyek e (daye we). Îdî ji piştê (van biryaran) kîjan (evan biryaran rake û disa ne yartî bike) ji bona wî ra şapatek e dilsoz heye.

179; Gelî xweyê hişan! Ji bona we ra di vê tûl hildanê da jîn heye. Bi rastî dibe ku hûn (Xuda) parizî bikin.

180; (Gelî merivan!) Di gava yek ji we amedeyê mirinê bibe; heke (ewî) li pey xwe malek hiştibe, bi vê nevê ye, ku ewa meriva ji bona da û bav û pismamne xwe ji wî malî şîretê bi qencîyan bike. (Evan şîretan) li ser (Xuda) parisan mafek e.

181; Îdî kîjan ewan (şîretan) ji piştî bihistîne biguhure, gunehê şîret guhurandinê li ser ewê ku şîretan diguhure ye. Bi rastî Yezdan bihistekê pir zan e.

182; Îdî kê ji şîretvanê bitirse, ku şîretvanê di şîretne xwe da bixelite û ya jî

gunehkar be; îdî bira di nava wan (mîrat xuran û şîretvanan da) aştî bike, tu gunehkarî ji bona (aştîvanê) tune ye. Bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e. 183; Gelî bawergeran! Rojî li ser we bi vê nevê hatiye nivîsandinê, ça li ser wan merivne berya we da jî bi vê nevê hatiye nivîsandinê. Bi rastî dibe ku hûn (Xuda) parisî bikin.

184; (Ewa rone rojî girtinê) rone bi hijmar in, îdî kîjan ji we di wan ronê rojî girtinê da nexwaş be û ya jî rêwîyê rêyan be bira wekî hijmara wan rojîyê borî di royê mayî da rojî bigire. û ewanê ku hêza wan tune ye (ji bona rojî girtinê) hene! Ji ber her royekî rojîyê da li ser wan xurek (dana) belengazekî bi vê nevê heye. Îdî kîjan ji bona qencîyan xurek pir bide, şixwa ji bona wî ra çêtir e. û heke hûn bizanin şixwa rojî girtin ji bona we ra qenctir e.

185; Di wê meha rojîyê danê, ku ewa Qur'ana ji bona merivan bi beledî (pûç û rastîyê ji hev derdixe) hatiye hinartinê. Îdî kîjan ji we bigihêje wê mehê bira di wê (mehê da) rojî bigire; û kîjan ne xweş be, ya jî rêwîyê rêyan be bira wekî hijmara wan rojîyê xwerî, di royê mayî da rojî bigire. Ji bo ku hûn hijmara rojîyan hemû pêk binin û ji bo ku hûn bi payan Yezdan ji gote gotan paqij bikin, Yezdan ji bona we ra firetî di vê ji bona we ra tengasî navê. Ji ber ku ewî hûn anîne rêya rast, bi rastî dibe ku hûn sipazîya wî bikin.

186; û di gava bendene min pîrsa min ji te kirin, (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Ez li bal wan da nezîk im." Gava yek gazî min bike, ezê pisyara wî bidim. Îdî bira ewan jî ji bona min ra pisyar bidin û bira ewan bi min bawer bikin. Bi rastî heke ewan (aha) bikin, dibe ku ewan di rêya rast da herin.

187; Ji bona we ra di şewê meha rojîyê da çûna we li bal (nivîna) jina we, durist bûye, ewan jinan ji bona we ra kinc in, ça hûn jî ji bona wan jinan ra kinc in. (Hûn ji hev ra kinc in, ji ber ku hûn hev ji sikariyan diparisînin). Yezdan dizaniya ku hûn bi xwe nikarin ji ber vî qasî Yezdan hûn baxîşandin û poşmaniya we ji gunehan litê kirîye. Îdî di naha da hûn dikarin herne nivîna wan jinne xwe (di şevê meha rojîyê da) û hûn ji Yezdan ewa tiştê, ku Yezdan ji bona we ra bi pîvayî nivîsiye bixwazin. û hûn heya tayê sipî ji tayê reş (ku jê ra segura sibê dibêjin) ji bona we ra diyar be bixun û vexun û hûn ji piştî vî danî, rojîya xwe heya şevê pêk binin. û heke hûn di mizgevtan da ji bona perestîyê rawestîyabin, îdî hûn neçine nivîna wan jinan. (Di meha rojîyê da, nemaze di dehê rojîyê para da di mizgevtan da bi rojî meriv rûtênin, perestî dikin). Evanan biryarne Yezdan in, îdî hûn nêzîkê wan nebin. Bi vî awayî Yezdan biryarne xwe ji bona merivan ra vedike. Bi rastî dibe ku ewan merivan parisî bikin.

188; û hûn (gelî kesian!) malê hev di nava hev da bi sedemne pûç nexun û hûn bi zanîn malê hevdu nevêjine bal berewanan, ku ewan berewanan jî bi gunehkarî hinekî malê kesian bixun (hûn malê hevdu bi bertîl nedine xwerinê).

189; (Muhemmed!) Ewan ji te hîvan di pîrsin. (Tu ji bona wan ra) bêje: "Ewan hîvan ku nû dibin, ji bona meriv û hec kirinê, danin (meriv danê xwe û danê hecê bi wan hîvan dizanin). û ji qencîyan nîne, ku hûn di piştê xaniyan da herne xaniyan û lê xudaparisîya kesian ji qencî-yan e û hûn di derê xaniyan da herne xaniyan û hûn Yezdan parisî bikin, bi rastî hevî heye ku hûn fereste bibin.

190; û hûn (gelî bawergeran!) Bi wanê ku bi we re qirînê dikin, di rêya Yezdan da bi wan ra qirînê bikin û hûn bi cewrkarî pêş va neçin. Bi rastî Yezdan ji wanê, ku bi cewrkarî pêş va di çin hez nake.

191; û hûn (gelî misilmanan!) li kêderê, bi çi awayî rastê wan (qirînkernê, ku bi we ra qirînê dikin) hatin, bi wan ra qirînê bikin û hûn ewan (qirînkarnê, qureyşîyan) ji wî cîyê (Mekke) ku ewan hûn ji wura derxistibûn, derxin; bi rastî tevdanî ji kuştinê zortir e. û hûn (gelî misilmanan!) li bal mizgevtê (bi nav) Mescid el-Heram da, bi wan (filan ra) qirînê nekin, heya ku ewan di wura da bi we ra qirînê nekin. Îdî heke ewan di wura da bi we ra qirînê bikin, hûn jî di wura da bi wan ra qirînê bikin. Celata filan ahan e.

192; Îdî heke ewan ji qirînê poşman bibin, hûn ewan bibaxîşînin. Bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

193; û hûn (gelî misilmanan!) heya tu tevdanî nemîne û heya ol jî ji bona Yezdan ra bi tenê bimîne, bi wan (filan ra) qirînê bikin. Îdî heke ewan ji qirînê poşman bibin hûn ewan bibaxîşînin. Neyartî hey ji bona wanê cewrkar e.

194; Mehne bi rûmet hemberîne. (Heke ewan di wan mehan da bi we ra qirînê bikin,

hûn jî di wan mehan da bi wan ra qirînê bikin.) Şixwa rûmetdarî bi hemberîye. Îdî heke yekê êriş anî ser we hûn jî wekî êrişa wî êriş bikin û hûn Yezdan parisî bikin, hûn bizanin! Bi rastî Yezdan bi wanê yezdanparis ra ne.

195; Û hûn di rêya Yezdan da, ji bona hewcan ra xwarin û xwakirina bidin, hûn bi destê xwe, xwe nevêjine taşqelê û hûn qencîyan bikin. Bi rastî Yezdan ji qencîkaran hez dike.

196; Û hûn (gelî misilmanan!) ji bona Yezdan, hec û umra xwe pêk bînin. Îdî heke hûn hatine para xistine, ji bona we ra ji tarişê heyranê kîjan hêsayî be, hûn ewê bi şîne şûna heyran jê kirinan û hûn serê xwe kur nekin heya heyran negêhêjne şûna heyran jê kirinan. Heke ji we yek nexwaş be û ya jî di serê wî de cefadan hebe (keçeli, ya birîndarî). Li ser wî, di şûna ser kurkirinê da, hemberî ji van hersêkan yek heye; rojî girtin, ya jî ji bona hewcan ra mal dayîn û ya jî heyran jê kirin. Îdî heke hûn ewlebûn, kîjan kesê, ku bivê di gava hecê da umre jî pêk bîne (kîjan heyran ji tarişan ji bona wî ra hêsayî be) bira ewî jê bike. Îdî ewanê ku nikarin (heyranan jê bikin) ya jî gorî bi destê wan neket, dive ku ewan sê royan rojî, di gavê hecê da û heft royan jî gava hûn para da hatine mala xwe bigirin. Deh royê pêkhatî eva ye. Evan biryaran ji bona wan kesne, ku mala wan di bajarê mizgevtî (bi nav) Mesdd el-Heramê da nebe, heye. Û hûn parisaya Yezdan bikin, hûn bizanin! Bi rastî Yezdan zor şapat e.

197; Hec, mehne diyar û zanene, îdî kîjan di wan mehan da ketibe hecê (yanî îhram hilgirtibe) bira bizane! Di hecê da çûna bal nivîna jinan û sikatî û dujmîndayîn û tekoşîn tune ye. Hûn ji qencîyan çî bikin, Yezdan bi wê qencîyê dizane. Û hûn ji xwe ra rozinan bikin, îdî bi rastî rozina qenc, parisîya Yezdan e. Û gelî xwêyî hişan! Hûn parisîya min bikin.

198; Ji ber ku we ji aborya Xudayê xwe, berxwudarî di danê hecê da dixwest, tu sikatî li ser we tune ye (di danê hecê de hûn dikarin, kirîn û firotinê bikin), îdî di gava hûn ji şûnwarê bi nav (Erefat) ê rabûn, ber bi muzdelîfê herîkin hatin, hûn li bal mizgevtî (bi nav) Mescid el-Heramê bi perestî Yezdan bira xwe bînin. Û hûn Yezdan bi perestî bira xwe bînin, wekî ewî ça hûn anîne rêya rast. Hûn di berya naha da hêj ji wanê rê wunda û rê wundanok bûne.

199; Paşê hûn jî di wan cîne, ku meriv têda bi hev ra diçin, bi hev ra herin. Hûn ji Yezdan baxişandina gunehne xwe bixwazin. Bi rastî Yezdan baxişkarê dilovîn e.

200; Îdî di gava, ku we perestîya heca xwe pêk anî, hûn Yezdan bi perestî bira xwe bînin wekî ku hûn ça bavê xwe bira xwe tînin. Hêj ji bîranina bavê xwe pirtir jî Yezdan bi perestî bira xwe bînin. Îdî hinek ji merivan hene (aha) daxwazî dikin: “Xudayê me! Tu di cihanê da ji bona me ra (qencîyan) bide.” Û ji bona wî ra di dan û gavê para da tu par tune ye.

201; Û hinek ji merivan hene jî (aha) daxwazî dikin, dibêjin: “Xudayê me! Tu ji bona me ra di cihanê da û di dan û gavê para da ji qencîyan bide û tu me ji şapata agir biparisîne.

202; Îdî ewanê, ku ji bona wan ra ji keda ku ewa kirîye par heye, evanan in. Yezdan bi xweber jî (kirinan) zû dihijmire.

203; Û hûn di rone hijmarî da Yezdan bi perestî bira xwe bînin (Ellahu ekber bejin) îdî (ji bona wanê ku xudaparisî dikin) heke ewan perestîne xwene (Mîna) ê di durûyan da pêk bînin ya jî di durûyan da pêk neynin para dikebin, tu gunehkarî tune ye. Û hûn parisîya Yezdan bikin, hûn bizanin bi rastî hûnê hemûşk jî li bal Yezdan da bicivin.

204; Ji merivan hinek hene! Ku mijûlya wî di jîna vê cihanê de te sodret dike, ewa Yezdan ji bona tiştî dilê xwe da dixê şahid (ku rastbêj e). Lê ewa bi xweber jî dijwarê ne yaran e.

205; Û di gava ku ewa dibe (serokê merivan) ji bona ku di zemîn da tevdanî derxe ku çan dinî û ûrtan hemûşkan teşqeke bike, li bal heval û piştevanne xwe ra diçe. Yezdan bi xweber jî ji tevdanokan hez nake.

206; Di gava ji bona wî ra bê gotinê: “Tu Yezdan parisî bike (dest ji van xebatan berde.)” Quretî bi wî digire, hêj ji bona wan xebatan pêşvatir diçe. Îdî ji bona wî ra doj bes e û doj jî çî qa şûnek e sike!

207; Û hinek ji merivan jî hene, ku canê xwe di rêya Yezdan da difiroşe (xwe dide kuştinê) ji bo ku qayîlbûna Yezdan bikire. Bi rastî Yezdan bi xweber jî ji bona bendenê xwe ra henûn e.

208; Gelî bawergeran! Hûn bi hemûtî bikebine ola bi nav Îslamê (ya jî bi hemûtî bi aştî bijîn, li hev werin.) Û hûn nebîne peyrewê şopa pelîd. Bi rastî pelîd ji bona we ra ne yarekî xwûya ye.

209; (Gelî bawergeran!) Heke hûn ji piştî, ku ewan biryarne huzwartî ji we ra hatibe bişimitên, îdî hûn bizanin! Bi rastî Yezdan servahetê bijejke ye.

210; Qey ewan hêvî ne, ku Yezdan bi tevê firiştan va di nava sîne ji ewran da (bi ser wan da şapatan) bînin û paşîya bûyera wan pêk hatibe, guman dikin? Hemû bûyer hey li bal Yezdan da dizivirin.

211; (Muhemmed!) tu ji zarne cihûyan bipirse; ka me ji bona wan ra çi qa beratenê daveker daye? Û kê qencîne Yezdan ji piştî ku ji wî ra hatibe, biguhure, bira bizane! Bi rastî Yezdan zor şapat e.

212; Jîna cihanê ji bona wanê file hatiye xemlandinê û ewanê file bi wanê bawer kirine tinazan dikin. Di roya rabûna hemû da jî ewanê Xuda parisî dikin, li sitû wanê file da nin. Yezdan ji bona evînê xwe ra bê hijmar rozînan dide.

213; Di cara yekem da hemûşk meriv komeke bi tenê bûne, Yezdan li bal wan da bi mizgînvanî û bi tirs darokî pêxember şandine û (Yezdan) bi wan (pêxemberan ra) pirtûk bi mafî hinartîye, ji bo ku ewan (pêxemberan) bi wan (pirtûkan) di nava (merivan da) di wan tiştne ku (meriv) têda ne wek hev bûne, berewanî bikin. Ji pêştirê wan kesne ku ji wan ra berate hatine, paşê ewan di (ramanê xwe da) ji dexesiya di nava wan da heyî ne wek hev bûne, tu kesî (di wan biryaran da) ne wekhevbûnî nekirine. Îdî Yezdan ewanê, ku bawer kirine bi dustûra xwe ewan ji ne wekhevbûna wan, kîjan rêya rast e li bal wî da anîye. Bi rastî Yezdan evînê xwe li bal rêya rast da tîne.

214; Qey (gelî koma Muhemmed!) hûn guman dikin, ku hûn herne bihiştê, wekî wan cefane, ku bi serê wan komne berya we da hatibû, bi serê we da neyê? (Cefa danne wusa hatibû serê wan) ji tirs û tengasî û zemîn hejî, ewanê bawer kiribûn bi tevê pêxemberê xwe va aha lava di kiribûne: "Gelo îdî arîkarya Yezdan ji bona me ra we kengê be?" Hûn bizanin! Bi rastî arîkarya Yezdan nêzik e.

215; (Muhemmed!) ewan ji te dipirsin: "Ka ewanê di rêya Xuda da çi bidin?" Tu ji bona wan ra bêje: "Hûn ji qencîyan çi bikin, îdî ewa qencîya ji bona da û bav û pismam û sêwîyan û belengaz û rêwîne rêyan bikin." Hûn çi qa qencîyekî bikin, şixwa Yezdan bi wî dizane.

216; Qirîn li ser we bi vê nevê hatiye nivîsandinê û qirîn kirin bi xweber jî ji bona we ra miçizî tê. Guman e, ku tişta hûn jê miçizê xwe tînin, ewa ji bona we ra qencî be û guman e, tişta ku hûn jê hez kin, ewa bi xweber jî ji bona we ra qencî nebe. Û Yezdan dizane, hûn bi xwber pê nizanin.

217; (Muhemmed!) Ewan ji te qirîna di wan mehne, ku qirîn di wan da qedexe ne, dipirsin. Tu ji wan ra bêje: "Bi rastî di wan mehan da qirîn pir gunehêkî mezin e, lê fetilandinê (berê merivan) ji rêya Yezdan û filetiya bi Yezdan û para dana merivan ji mizgevtê (bi nav) Mescid el-Heramê û derxistina komalê wî (bajarî) ji wura, li bal Yezdan bi gunehî hêj ji qirîna di wan da meztir e û bi rastî şeytanî û tevdanî, ji kuştinê meztir e. Heke ewan (filan) bikaribin haya ku ewan we ji ola we nezivîrinin wê bi we ra qirînê bikin, û ji we kîjan ji ola xwe derkebe dîsa bibe file, îdî paşê ewa bi fileti jî miribe, evan in ku keda wanê di cihanê da kirî, di cihan û di dan û gavê para da jî şewîtiye. Û hevrînê agir, evan in evan bi xweber jî di agir da hey dimînin.

218; Bi rastî ewanê bawer kirine û di rêya Yezdan da ji welatê xwe koç kirine derketine û ji bona qayîlbûna di rêya Yezdan da tekoşîn dikin hene! Ewanê dilovanîya Yezdan guman dikin evan in. Û Yezdan bi xweber jî baxişkarê dilovîn e.

219; (Muhemmed!) Ewan ji te ra durist bûn û qedexenê mey û xumarê dipirsin. Tu (ji bona wan ra) bêje: "Di wan herdukan da jî ji bona merivan gunehne mezin û kêrhatin hene. Lê gunehne wan herdukan jî ji kêrhatina wan herdukan meztir e." Ewan ji te dipirsin: "Ka ewanê ji bona hewcan ra çi bidin?" Tu ji bona wan ra bêje:

"Baxişandin (yanî malê ji ber hewcene we mane ya jî malê durist û paqij bidine wan)". Bi vî awayî Yezdan ji bona we ra beratenê xwe vedike. Bi rastî dibe ku hûn di beratenê Xuda da ramanî bikin.

220; Ka Yezdan di cihan û di dan û gavê para da çi armanc kirîye? Ewan ji te mafê sêwîyan dipirsin. Tu (ji bona wan ra) bêje: "Heke hûn ji bona wan ra bi aştî (malê wanji wan ra bihêvîşînin) çêtir e û heke hûn tevê wan bibin (malê wan tevê malê xwe

bikin, bi hev ra di cîyekî da bijîn) şixwa îdi ewan sêwîyan biranê we ne (bi hev ra bijîn). Û Yezdan bi xweber jî bi tevdanok û bi aştîkaran dizane. Û heke Yezdan biva wê hûn bixistina tengasî û cefadanê. Bi rastî Yezdan servahatê bijejke ye.

221; Û hûn bi wan jinne hevî çêker ra heya ewan bawer nekin, kevîn nebin. Bi rastî jinek e bawergerê bende, ji wê jinika hevî çêker qenctir e, çî qa bedewî û zarewayê wê jinika hevî çêker xweşa we here û we sodret bike jî. Û hûn jinê bawerger, bi mênê hevî çêker ra kevîn nekin heya ewan mênan bawer nekin. Û bi rastî bendekî bawerger ji wî mênê hevî çêker qenctir e çî qa bedewî û zarê wî (zar şîrîniya wî û maldarya wî) xweşa wê here û wê sodret jî bike. Ewan hevî çêkeran we gazî li bal agir da dîkin û Yezdan bi xweber ji we bi dustûra xwe gazî li bal behîşt û baxişandinê dike û ji bona merivan jî beratenê xwe vedike. Bi rastî hevî heye, ku ewan ji wan beratan bi ramanî hiş hildin.

222; Û (Muhemmed!) Ewan ji te kirasê jinan dipirsin, tu (ji bona wan ra) bêje: “Ewan kirasê jinan cefakî bi qirêje, îdi hûn di kirasan da dîrê jinan bikebin, heya ku ewan jinan ji kirasan paqij bibin. Gava ewan jinan ji kirasan paqij bûn, îdi Yezdan ça, di kur da fermana we, ji bona nivîna wan kiribe, hûn jî wusa herne bal wan. Bi rastî Yezdan ji wanê, ku ji sikatine xwe poşman dibin û ji wanê paqij, hez dike.

223; Jinne we, ji bona we ra zevînin; îdi hûn ça hez dîkin, wusa herne zevîne xwe û hûn ji bona xwe ra hêj di berê da hêza xwe amade bikin û hûn Yezdan parizî bikin û hûn bizanin! Ku bi rastî hûnê herin rastê Yezdan bîn. Tu (evê) bi mizgînî ji bona bawergeran ra (bêje).

224; Û hûn (gelîb awergeran!) ji bo ku hûn ewanê di hemberê xwe da, bi xwe bidne bawer kirinê û ji bona parisiya xwe ji gunehan û ji bo ku hûn di nava merivan da aştî dîkin (ewan bi xwe bidne bawer kirinê) Yezdan nexne armanc di sondne xwe da. Şixwa Yezdan dibêhê û dizane.

225; Yezdan we di wan sondne we ne, ku hûn têda dixelitin gunehkar nake, lê Yezdan we bi wan kedne, ku dilê we dike we gunehkar dike. Yezdan bi xweber jî baxîşkarê muahîm e.

226; Ji bona wan mênê, ku sond dixun neçine nivîna jinê xwe, heya çar mehan danê hevî mabûnê heye, heke ewan mênan di wî danî da dîsa çûne nivîna wan jinne xwe, îdi bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

227; Û heke (ewan mênê sond xwar) hey berdana wan jinan van, îdi bira bizanin! Ku bi rastî Yezdan dibêhê û dizane.

228; Û ewan jinne hatine berdanê hene! Heya sê kirasan, bi xweber xwe ji mên kirinê digirin. Heke ewan jinan bi Yezdan û bi dan û gavê para da bawer dîkin, ne durist e ji bona wan ra, ku ewan, ewa tiştê Yezdan di zikê wan da afêrandîye veşêrin (yanî zara di zikê xwe da veşêrin, bejin: “Em bi zar nînin”). Heke ewan hevhatinî bivên, di wê gavê da (yanî di wî danê jinik xwe ji mên kirinê dide para da, merivne aştîkar bikebine nîveka wan, ewan li hev bînin) mênê wan, ji bona wan jinan ra çêtir e, ku ewan jinan dîsa hildne binê kevîn bûne xwe da û ji bona jinan ra mafê wan, wekî xûyê (adetê) jinê wan dera pêşk û xebat heye (ewan jinan di kar û xebatan da wekî hev in). Û ji bona mênan ra li ser jinan payek heye. Û Yezdan bi xweber jî servahatê bijejke ye.

229; Berdana jinan du cure ne; îdi di wî danê xwe girtî da, ya ewan jinan bi qencî dîsa hildne bîne kevîn kirina xwe, ya jî bi wan qencî bikin ewan berdîn. Ji bona we mênan ra durist nîne, ku hûn tiştêkî ji mara wan jinan, ku we daye wana, para da bigirin, xêncî heke herduk tirsîyan, ku ewan herduk jî (mên û jin) di nava xwe da biryarne Yezdan pêk naynin. Heke hûn tirsîyan, ku ewan herduk biryarne Yezdan e, ku di nava wan da heyî pêk naynin, îdi tu zîyan li ser wan herdukan jî tune ye, ku jinik ji bona berdana xwe hinekî ji mara xwe, ji bona mênê ra bibaxîşîne. Ewan (biryarne di nava mên û jinan da hatine bi cî danê) biryarne Yezdan in. Îdi hûn ji wan biryaran neborin û kîjan ji biryarne Yezdan bibore, bi rastî îdi cewrkar hey evên bi xweber in.

230; Îdi heke ji piştî (kevîn kirina cara duduyan) mênê dîsa jinik berda, ji bona wî mênê ra dîsa kevînbûna bi wê jinikê ra ne durist e, heya ewa jinika bi mênê mayî ra kevîn nebe. Îdi ji piştî ku ewî mênê mayî jî ewa jinika berda, tu zîyan ji bona wî mênê cara yekem û jinika berdayî ra tune ye, ku dîsa bi hev ra kevîn bibin. Heke ewan herduk jî (jinik û mênê) goman bikin, ku wê ewan biryarne Yezdan e (di nava mên û jinan da danîye) pêk bînin. Yezdan ewan biryaran, ji bona komalê

zana ra vedike.

231; Di gava ku hûn jinan berdin, îdî ewan jinan jî gehîştine dawîya dacê hêvî mayîne, hûn îdî di wê gavê da ya ewan bi xweşî bigirin (bi wan ra dîsa kevîn bibin) ya jî ewan bi qencî berdin, ji bo ku hûn li wan cewrê bikin, hûn ewan jinan (di mala wan da) negirin (ewan jinan negirin, bira ewan bi xweşî herin bigîhêjne armanca xwe). Kîjan ewan jinan xwurî ji bona cewr kirinê bigire, bi sond! Ewî îdî li xwe cewr kirîye. Hûn biryarne Yezdan bi tinazî negirin û hûn qencîne Yezdan ne, ku li ser we hene bîra xwe bînin. (Û ewan qencîne Yezdan) ku pirtûk û zanîna retkokî li ser we da hinartîye, bi wan li we şîretan dike (bixne sere xwe). Hûn Yezdan parisî bikin û hûn bizanin! Bi rastî Yezdan bi hemû tiştan dizane.

232; Û di gava, ku hûn jinan berdin, îdî heke mêrne wan van, dîsa ewan jinne xwe hildine binê kevîniya xwe, di gava ku ewan herdukan jî (mêrê berdanok û jina berdayî) bi kevîn kirine qayîl bibin, hûn (gelî serkarne jinan!) ewan jinan ji kevîn kirina bi wan mêran ra nedine para danê. Bi van (biryarane Yezdan) ewan merivne ji we ne, ku bi Yezdan û bi dan û gavê para da bawer dikin, şîretan hildidin. (Evan biryarne) hanê heke hûn wusa pêk bînin, ji bona we ra temîz û paqijtir e. Û Yezdan dizane (ku ewan biryarane ji bona we ra çêtir e) lê hûn bi xweber jî nizanin.

233; Dayîk; heke bavê zaran bivê, ji bona zara xwe ra du salan bi hemûtî bi vê nevê şîr dide, xwarin û xweyî kirina wan jinan wekî adetê wan deran, li ser bavê wan zara ne. (Ewa jinika hatîye berdanê, heke zara wê hebe, divê ku ewa jinika şîr bide wê zarokê heya du salan, heke bavê wê zarokê bivê; wê gavê, xwarin û xweyî kirina wê jinikê li ser bavê zarokê ye). Her yek dikare wekî burha xwe xwarin û xweyî kirina bide, qe tu kes ji burha xwe pirtir nade. Dayîk; bi zaroka xwe nayê zîyan kirinê û bavê wê zarokê jî bi wê zaroka xwe, nayê zîyan dayîne û li ser mîrat xurn wan jî evan mafan hene. Îdî heke ewan da û bavan, herduk jî qayîl bûn, ku ewê zarokê şîre vekin, tu zîyan li ser herduka jî tune ye. Û heke hûn bivên, ku hûn zarne xwe, bi wan jinne mayî bidne şîr dayîne, heke hûn wekî adetê wan deran bi wan jinan ra qencîyan bikin (xwarin, xweyî kirina wan bidin) tu zîyan ji bona we ra tune ye. Hûn Yezdan parisî bikin û hûn bizanin jî ku Yezdan bi rastî tiştên hûn dikin dibîne.

234; Û ewan mêrne ji we ne, ku dimirin, li pey xwe da jinan dihêlin, ewan jinne (mêr mirî hene!) wê bi xweber heya çar mehan û deh royan ji mêr kirinê xwe para da bigirin (yanî ewan jinne, ku mêrê wan mirine, ewan jinan bi xweber wê xwe ji merkirin û ji xemlandinê heya çar mehan û deh royan bigirin, naçine mêr. Di vî dana hêvîti da, ji bona mêr kirinê qe tu tiştî nakin). Îdî gava ewan jinan, gehîjtine dawîya danê hêvî mayîyê, ewan jinan ji bona qencîya bi xwe ra, çî ji xwe ra bikin (ji xemilandin û mêrkirinê wekî adetê wan deran) li ser we tu zîyan tune ye. Yezdan bi tiştên hûn dikin agahdar e.

235; Û tu zîyan ji bona we mêran ra tune ye, ku hûn, li ber wan jinne dawîya danê wanê hêvî mayî hatibe bavêjin; ji bona ku hûn bi wan ra kevîn bibin, ya jî ku hûn kevîn bûna, bi wan ra di dilê xwe da veşerin (hûn di dilê xwe da bi sêwirînin; heke paşya danê hêvî mayîya wan were, emê bi wan ra kevîn bibin). Yezdan dizaniya ku hûnê bi rastî ji wan ra di nêzik da bêjin: "(Ka hûn bi me ra kevîn nabin?) Lê hûn bi wan jinan ra, di dizîka da peymanne qencîyê pêştir nedin (yanî hey hûn ji bona wan ra bi qînati peymanê bi şîretne qencîyan bikin, di nava hev da ewan tiştne, ku dibine sedemne ji bona sikatî û gunehan, nedine hev). Û hûn (gelî mêran!) heya ewan jinan negîhêjne dawîya danê xwe girtinê, bi wan jinan ra kevîn kirina wan nekin. Û hûn bizanin! Bi rastî Yezdan bi tiştên di dilê we da heyî dizane. Îdî hûn xwe ji Yezdan biparisînin û hûn bizanin! Ku bi rastî Yezdan baxişgerê mulahîm e.

236; (Gelî mêran!) Heke hûn ewan jinne ku hêj hûn têkilê wan jinan bi jinani nebûbin, ya jî hêj we ji bona wan ra marek diyar ne kiribe, berdin. Tu gunehkarî ji bona we ra tune ye. Hûn ji wan jinan ra; zengîn wekî, zenginan û xezan jî wekî xezanan, bi qencî mal bidne wan. Eva temtêla hanê mafekî babet e, li temtêla qencîkaran tê.

237; Û heke (gelî mêran!) we ewan jinan berdan, hêj hûn têkilê wan bi jinani nebûbin lê we ji bona wan ra marek diyar kiribe, nivê wê mara diyar kirî divê ku hûn bidne wan jinan. Ji xêncî heke ewa jinika, ya jî ewa serkarê jinikê, ku birîna mare di destê wî da bûye, mare ji bona (zavê ra) bibaxişînin. Heke hûn bibaxişandin



(gelî mêran!) marê hemûşk bidne wan jinan, şixwa ji bona xudaparizan nêzîktir e. Û hûn (gelî mêran!) ewa rûmet û babetîya, ku di nîveka we da heye (nîveka mêr û jinan da heye) bîrva nekin. Bi rastî Yezdan tiştê ku hûn dîkin dibîne.

238; Hûn (gelî bawergeran!) parisiya li ser nimêj kirinê, nemaze nimêja nîvwarî bikin û hûn ji bona Yezdan ra, bi dîl rabin perestî bikin.

239; Îdî heke hûn ji (aşîtan) tirsîyan, hûn (ça dikarin wusa bikin). Îdî bi peyatî û bi siwartî (hûn ça dikarin wusa bikin). Îdî gava hûn ewlebûn Yezdan ça kirina we ji bona we ra hûn kirîye hûn perestîya Yezdan wusa bikin, loma we bi xweber jî di berya niha da nizan bûye.

240; Ewan merivne ji wê gava dimirin, li pey xwe da jinan dihêlin hene! Divê ku ewan mêran ji bona wan jinne xwe ra, li wan mîratxurnê xwe ra şîratan bikin, ku ewan mîratxuran, jina wî ji xaniyê wî heya salekî dernexin û xwarin û xweyî kirina wê jî bidin. Îdî heke ewan jinan ji berxwe ji wan xaniyan bi xweşî derkebin, tu gunehkarî li ser we tune ye. Û servahatê bijejke Yezdan e.

241; Dayîna xwarin û xweyî kirinê, ji bona wan jinne berdayî li ser xudaparisan mafek e.

242; Bi vî awayî Yezdan ji bona we ra biryarne xwe vedike. Bi rastî dibe, ku hûn ji wan hiş hildin.

243; Ma qey tu li bal wan merivne ku bi hezaran, ji tirsê (merga) mirinê ji welatê xwe derketine mêze nakî? Îdî Yezdan ji bona wan ra gotîye: "Hûn bimirin." (Ewan mirine) Paşê (Yezdan) ewanan zinde kirine. Bi rastî rûmeta Yezdan li ser kesên heye û lê pirne kesên jî sipazîya Yezdan nakin.

244; Û hûn (gelî bawergeran!) di rêya Yezdan da qirînê bikin. Û hûn bizanin! Bi rastî Yezdan dibêhê û dizane.

245; Kîjan ji bona qayîlbûna Yezdan deynekî bi qencî bide, îdî Yezdan jî ji bona wî ra hemberiya wî deynî (bi peywestî pir dike) û Yezdan bi xweber e, şixwa mal dide û distîne. Bi rastî hûnê li bal wî da bizivirin.

246; Ma qey tu li bal wan serokne, ji zananê cihûyan, ku ji piştî Mûsa da hatine, mêze nakî? Di gava ewan ji bona pêxemberne xwe ra gotibûne: "Ka (pêxember!) tu ji bona me ra serokekî bişîne, ku em di binê seroktiya wî da di rêya Yezdan da qirînê bikin." Û (pêxember ji wan ra) gotîye: "Heke qirîn li ser we bivê nevē bê nivîsandinê. Îjar hûn jî qirînê nekin? (Ewan ji bona pêxember ra) gotine: "Emê ça di rêya Yezdan da bi wan ne yaran ra qirînê nekin û em bi xweber jî ji welatê xwe û di nava zarne xwe da hatine derxistinê (dûre wan ketine)?" Îdî di gava qirînkirin, li ser wan (bi vî nevē) hate nivîsandinê ji pêştirê hindikne ji wan, hemûşka jî berê xwe ji qirînê fetilandin. Û Yezdan bi cewrkaran pir dizane.

247; Û pêxemberê wan, ji bona wan ra gotibûye: "Bi rastî Yezdan ji bona we ra (Talût) bi seroktiya şandîye." Ewan ji bona pêxemberê xwe ra gotine: "Ka seroktiya wî li ser me ça çê dibe û em bi xweber jî ji wî çêtir babetê seroktiyê û ji bona wî bi xweber jî maldaryek e mezin nehatîye dayînê?" Pêxemberê wan ji wan ra gotibûye: "Bi rastî Yezdan ewa ji bona we ra hêlbijartîye û Yezdan ewa bi gewde û bi zanîn pir kirîye. Yezdan seroktiya maldarya xwe ji bona evîne xwe ra dide." Û Yezdan bi xweber jî maldarê pir zana ye.

248; Û ji bona wan ra pêxemberê wan gotibûye: "Bi rastî berata seroktiya wî ev e; wê ji bona we ra sursûmekê were, ku di wî sursûmî da hawdana dilan ji Xudayê we heye (ça jî di wî sursûmî da) biryarne ji bermeyîne binamala Mûsa û Harûn mane jî hene. Firiştan ewî (sursûmî) hildigirin (digerînin). Bi rastî heke we bawer kiribe, ji bona we ra divê (bûyerê da,) beratekî mezin heye.

249; Îdî di gava "Talût" bi leşkerê xwe va ji bona qirînê derket (Talût ji bona leşkerê xwe ra) gotîye: "(Gelî leşker) bi rastî Yezdanê we bi çemekî (ji avê) biceribîne, îdî kîjan ji (ava wî) çemî vexwe, bi rastî ewa îdî ji heval û leşkerê min nîne û kîjan ji (ava wî) çemî qe tam neke, ya jî kîjan ji (ava wî) çemî qemçekî bi destê xwe vexwe, ewa ji heval û leşkerê min e." Îdî ji pêştirê hindikne ji wan, hemûşka jî (av) ji wî çemî vexwarin. Îdî di gava (Talût) bi xweber û ewanê ku (bi Talût) bawer kirine, ji çem borine, ewan ji hev ra gotine: "Di îro da tu hêza me tune ye, ku em (bi Calût-Galût) û bi leşkerê wî ra qirînê bikin." Ewanê goman kirine, ku wê ewanê herin bigihêjne Yezdan ji wan hevalne xwe ra gotine: "Çi qa komne piçûk hebûne, ku bi dustûra Yezdan li ser wan komne mezin servahatine!" Û Yezdan bi xweber jî bi hawkeran ra ne.

250; Û di gava (Talût bi hevalê xwe va) derketine ji bona qirîna bi Calût (Galût-Çalût-Jalût) û leşkerê wî bi hemberî bikin (aha bi lavatî) gotine: "Xudayê me! Tu li ser me da hewdanê vala bike û tu di hemberê wan da pê me bi cîh bike (ku ji şûna xwe nehejin)." Û tu arîkarya me li ser komalê file bike.

251; Îdî ewan (Talûtiyan) bi dustûra Yezdan berê Calût (Galût-Çalût-Jalût û leşkerê) wî dan, û Dawûd (Dawîd) jî Calût kuştîye. Û Yezdan ji bona Dawûd ra seroktî û zanîna retkokî daye û Dawûd çî vaye, Yezdan ewa tiştê ji bona Dawûd ra hîn kiriye. Û heke parizaya Yezdan, ji bona marivan ra tune bûya wê zemînê ji lêdana hinekne wan li hinekî wan, tevê hev bûya û lê Yezdan li ser hemû gerdûnê xweyê abure.

252; (Muhammed!) Evan beratenê Yezdan in, em bi rastî ji te ra dixûnin. Û bi rastî tu ji pêxemberanî.

253; Evan pêxemberan in, ku me hinekne ji wan li ser hinekî wan paydar kirine. Ji wan, (pêxemberan) hinekne wan hene, ku Yezdan bi wan ra axiftin kiriye û hinekne wan jî (Yezdan) ewan bi payan bilind kirine. Me ji bona Îsayê kurê Meryemê ra beratenê daveker şandiye û me Îsa bi canê pîroz daye hêz kirinê. Ewan komne li pey, (pêxemberan) mane hene! Ji piştî ku ji wan ra beratenê daveker hatibûn heke Yezdan bi va, îdî ewan bi hev ra qirîn ne dikirin û lê ewan li pey (pêxemberan) di wan beratan da ne wekhev bûne, îdî hinek ji wan bi wan biryaran bawer kirine û hinek ji wan jî bûne file (bi wan bawer ne kirine). Heke Yezdan bi va ewan bi hev ra qirîn ne dikirin û lê Yezdan çî bivê ewî dike.

254; Geli bawergeran! Di berya wê roya, ku tu firotin û dostî û yarî û menderî qe têda tune ye, hêj ne hatîye; ji wan rojîne, ku me ji bona we ra daye, hûn jî ji bona hewcan ra bidin (loma ewanê) nankorî dikin hene! Ewanan bi xweber cewrkar in.

255; Yezdan ew e; ku ji pêştirê wî tu yezdanê (babetê perestîye) tune ye. Ewa zindeyê bi hêz e. Hênijandin û xew bi wî nagire. Çi qa tiştne di ezman û zemîn da hene! hemûş ji bona wî ra ne. Bê dustûra wî tu kes li bal wî mehderî nake (gelo ji pêştirê dustûra wî kê dikare, ku mehderî bike?) Yezdan bi wê (keda) ewan kirine û bi wê (keda) ewan dikin dizane. Û ewan tu tiştêkî ji zanîna wî, hilnedane binê zanîna xwe, ji pêştirê, ewê zanîna ku ewî va ye (ewan bizanin). Û hêz û zanîna wî ezman û zemîn hildaye nava xwe da. Û parisvaniya wan herdukan jî, Yezdan (ji parisvaniya wan) bê zar nake. Û bilindê mezin hey ewa ye!

256; Di (litê kirina) ola (misilmanîyê da) tu kotekî tune ye. Bi rastî îdî mafitî û pûçatî rind ji hev xûya bûye. Îdî kîjan bi pelîd bawer neke û bi Yezdan bawer bike, bi sond! Ewî bi çemilê bê qetyayê girtîye, ku tu pizirandin ji bona wî çemilî ra tune ye. Û Yezdan bi xweber jî bihistekê pir zan e.

257; Ewanê bawer kirine hene! Serkarê wan Yezdan e. Yezdan ewan ji tarîtiyê li bal ronahiyê da derdixe. Lê ewanê bûne file serkarê wan jî pelîd e. Pelîd jî ewanan ji ronahiyê li bal tarîtiyê da derdixe, hevrînê agir evan in. Ewanê ku di agir da dimînin evan bi xweber in.

258; Ma qey tu li bal wî kesê, ku di mafê Xudayê Îbrahîm da, bi Îbrahîm ra tekoşin kiribûye mêze nakî? Ji ber ku Yezdan ji wî ra seroktî û maldarî dabûye, gava Îbrahîm ji wî ra gotibûye: "Ewe zindetî û mirinê çê dike heye! Ewa Xudayê min e." Ewî jî (ji bona Îbrahîm ra) gotibûye: "Ez bi xweber jî zindetî û mirinê çê dikim." Îbrahîm (ji wî ra) gotîye: "Bi rastî Yezdan rojê ji rojhilatê tîne, (ka îdî tu jî rojê ji rojava bîne)." Îdî ewa nankora (di hemberê) Îbrahîm da li piya bêzar maye. Û Yezdan komalê cewrkar nayne rêya rast.

259; Û ma qey bûyera wî kesê, ku di nava gundekî da borîye: Ewa gunda jî wusa wêran bibû (tiştêkî wî li ser tiştêkî ne maye, te ne bihistîye)" Ewî merivê gotibûye: "Ka wê Yezdanê evî gundî ji piştî mirina wî, we ça zinde bike?" Îdî Yezdan ewa meriva sed salî mirandiye, paşê (Yezdan ewa meriva) rakirîye. (Yezdan) ji wî pirs kiriye: "Ka tu çî qas mayî?" Ewî (ji Yezdan ra) gotibûye: "Ez royekî mabûme, ya jî danekî ji royê mabûme." (Yezdan ji wî ra) gotibûye: "(Na, gotinê te nîne) lê tu sed salî mabûyî. Îdî tu li bal xwarin û vexwarinê xwe ra mêze bike, ku hêj ewan baborî ne bûne û tu li bal kera xwe da jî mêze bike. Û ji bo ku em te ji bona merivan ra bixne beratenê sodret; tu li bal hestîyan da mêze bike, ka em ça ewanan rast dikin, paşê em ka ça (wekî kincan) goşt li wan dikin. Îdî di gava ji bona wî ra xûya bû, ku eva bûyera bi serê wî da borîye (ewî aha) gotibûye: "Bi rastî ez dizanim, ku Yezdan bi rastî li ser hemû tiştan bi hêz e".

260; Û tu (ewê gava, ku Îbrahîm ji Xudayê lava kirîye, bîra xwe bîne. Îbrahîm) gotibûye: "Xudayê min! Tu bi min bide xûyandinê, ka tu ça mirya zinde dikî? (Xweda ji Îbrahîm ra) gotîye: "Qey tu bawer nakî?" )(Îbrahîm ji Xweda ra) gotîye: "Çima (ez bawer dikim) lê ji bona dilê min bi nîve (bi min bide xûyandinê)". (Xweda ji bona Îbrahîm ra) gotîye: "Tu ji çûçikan çar liban bigire, îdî tu ewan çûçikan li bal xwe kerî bike, paşê tu ewan çûçikan, heryekê dayne serê çîyayekî û paşê tu gazî wan çûçikan bike; ewan çûçikanê bi lez werne bal te. Û tu bizane! Ku bi rastî Yezdan li ser hemû tiştan servahatê bijejke ye".

261; Hewcekîya wanne, ku malê xwe di rêya Yezdan da disixurînin, hene! Wekî, ku libek heft weşîyan bigire, di her weşîyekî da jî sed lib hebin, wusa dibe. Û Yezdan ji bona evînê xwe ra hêj carbicar pir dike. Û Yezdan zengînê zana ye.

262; Ewanê, ku malê xwe di rêya Yezdan da disixurînin û paşê jî li pey sixurandinê da gote gotin û cefadan jî ne kirîbûn hene! Ji bona wan ra li bal Xwedayê wan, kirya wan heye. Û li ser wan tîrsa (ji agir) û mirûzîya (kêm xelatdanê) jî tune ye.

263; Gotinek e bi qencî û baxişandin ji wê qencîya, ku li pey wê da cefadan û gote got hatibe kirîne çêtir e. Û Yezdan ne hewceyê mulahîm e.

264; Gelî merivne ku we bawer kirîye! Hûn qencîne xwene, ku we bi hewcan ra kirîye, bi gote got û bi cefadanê pûç nekin, wekî wî merivê ku malê xwe ji bona dîtina kesan disixurîne, qe bi Yezdan û bi dan û gavê para da jî bawer nake, nekin. Îdî hewcekîya wî, wekî (zevîya) ku li ser tatekîye; îjar ku barşit lêdixe, îdî ewa barişta xalyê dibe, ewa tata hilû dimîne, nikarin ku ji keda xwe tişteki hildin. (Evan jî disixurandina xwe da tu qencîyê nikarin hildin). Û Yezdan komalê file nayne rêya rast.

265; Ewan merivne, ku malê xwe ji bona qayîlbûna Yezdan û nivandina dilê xwe, disixurînin hene! Hecwekîya wan wekî karêzê, ku li ser sûrmilekî avê be, îjar baranê jî lê xistibe, îdî rêça wî dûcarî xwe hatibe, dibe. Heke baranê lê nexistibe, îdî şixwa avîya avê lê dixê. Û tiştê hûn dikin Yezdan dibîne.

266; Yek ji we, ku ji bona wî ra, ji xurme û tîryan rêzekî wî hebe, di binê darê wî da çemne avê bikişin û di nava rêz da hemû berhebin, ewa bi xweber jî kal bibe û ji bona wî ra jî ûrtek e jar û bê hêz mabe: Ewa bivê temtêlê be, sexte jî îdî li wî bostan û rêzê wî bixe bişewitîne qe hez dike? (Yekê ji we heke kal be û zarne wî piçûk hebin, ewan zaran bi xweber jî hewcenê paris û parsivana bin, baxekî wanê di binê darê wî da çemne ji avê bikişê, hebe; qe hez dike, ku sexte li wî baxê wî xê, hemûşk bi şewitîne, ewa bi xweber jî divê temtêlê da be?) Yezdan bi vî awayî ji bona we ra beratenê xwe vedike, bi rastî hêvî heye, ku hûn ramanê bikin.

267; Gelî ewan merivne ku we bawer kirîye! Hûn ji tiştê ked dikin, paqijê wê û paqijê wan tiştne ku em ji bona we ra ji zemîn derdixin, bisixurînin û hûn ji wan malê xweyê, heke hûn di şûna xezanan da bûnan, we ewa mala di şûna (bac) û qencîyan da nedigirt, ji pêştirê heke we çavê, xwe ji bona girtinê, bigirta, paşê hûnê bi wan qayîl bibûna, nesixurînin. Û hûn bizanin! Bi rastî Yezdan ne hewceyî pesinvan e.

268; Pelîd we bi xezanîyê dide tirsandinê û fermana we bi sikatî û maştoqîyê dike û Yezdan jî baxişandina ji xwe û abora pir ji bona we ra, peyman dide. Û Yezdan zengîn e pir zan e.

269; Yezdan ji bona evînê xwe ra zanîna retkokî dide. Û zanîna retkokî ji bona kê ra hatibe dayîne, îdî bi sond! Ji bona wî ra qencîne pir hatine dayînê. Evî hey ewanê xweyê hiş, diponijin.

270; Û hûn ji malê xwe çî ji bona hewcan ra bisixurînin, ya jî hûn ji malê xwe çî ji bona hewcan ra bi peymanî heyran bikin, , îdî bi rastî Yezdan bi wî dizane. Û ji bona . cewrkaran jî tu arîkarî tune ye.

271; Û heke hûn qencîne xwe (xêrê xwe) bi diyarî bikin, îdî çî qa rind e! Û heke hûn ewan qencîne xwe veşêrin, hûn ewan bi dizîka da bidine xezanan, şixwa ji bona we ra çêtir e. Û bi wan, hinekî ji gunehê we radibe. Û Yezdan bi xweber jî bi wan tiştne ku hûn dikin, agahdar e.

272; (Muhemmed!) Hatina wan li bal rêya rast da li ser te bi vê nevê nîne. Û lêYezdan kîjanî bivê, ewî tîne rêya rast. Û hûn ji qencîyan çî bikin, îdî hûn ewê qencîyê ji bona xwe ra dikin. Şixwa hûn hey ji bona qayîlbûna Yezdan disixurînin. Û hûn ji qencîya çî bisixurînin, ewa li bal we da bê kemayî tê dayînê û li we jî nayê cewr kirîne.

273; (Hûn qencîne xwe) ji bona wan xezanne, ku di rêya Yezdan da ji xebata xwe qopmane, îdî nikarin di zemîn da ji bona aboraya xwe bigerin; ji fedîtîya xwe, ewan ji merivan qe tu tiştî bi lavayî naxwazin, tu ewan bi rû û rûçikê wan nas dikî, nezan dibêjin: "Qey ewan zengîn in" (ji ber wî, ewan ji bona aborya xwa, xwestinê nakin) bidin. Û hûn ji qencîyan (xêran) çî bisixurînin, îdî Yezdan, hey bi wî dizane.

274; Ewan merivne, ku di şev û royan da û bi dizî û xwûyayî, malê xwe (ji bona qayîlbûna Yezdan) disixurînin, hene! Ji bona wan ra li bal Xudayê wan kiryek e mezin heye. Li ser wan tirsê şabat danê û mirûzîya (ji kêr xelatê jî) tune ye.

275; Ewan merivne serparan (riba) dixun, hene! Ewan radibin, tu dibê qey tepa dikebin, wekî çî merivê ji ber lêdana pelîdan radibin û dikebin, ewan jî wusa dibin. Eva (şapata hanê) ji ber ku ewan digotibûne: "Serpar jî wekî kirîn û firotinê ye (herduk jî ji bona merivan ra durist e). Lê Yezdan, kirîn û firotin durist kirîye û guhartina (malan) bi serdaparî durist ne kirîye." Îdî kîjan merivê, ku ji Xudayê ku ji bona wî ra şîreteke hatibe, ewa jî ji guhartina bi serdaparîtî poşman bibe, îdî ewan kirinê wîyê hêj di berya vê biryara hanê da kiribûne, ji bona wî ra ne (ewan para da nayêne dayînê, ji bona wî ra dimînin). Û temtêla wî di vê bûyerê da li bal Yezdan e: (Bivê, ewî dibaxişîne, heke bivê, ewî şapat dike). Û kîjan meriv (ji piştî hatina şîretê) dîsa guhartina bi serdaparîtî bike, îdî bi rastî hevrînê agir evan in. Evan bi xweber jî di agir da her dimînin.

276; Yezdan serdaparîtîye kêr dike û qencîyan jî (xêran) pir dike. Û Yezdan ji tu fileyî (ku ji bona firotina serdaparîtî lec dike) gunehkar hez nake.

277; Bi rastî ewan merivne bawer kirine û karê aştî kirine û nimêja xwe kirine û baca malê xwe dane, hene! Ji bona wan ra li bal Xudayê wan kirya wan heye û tirsê (ji şapatan) û murîzaya (ji kêr xelatdanê) li ser wan tune ye.

278; Gelî ewan merivne, ku we bawer kirîye! Heke we bi rastî bawer kiribe hûn parizaya Yezdan bikin û hûn dest ji firotina bi serdaparîtîya, ku we kirîye (hêj we serpar hil ne daye) berdin.

279; Îdî heke hûn wusa nekin, hûn bizanin! Bi rastî eva di hemberê! Yezdan û Pêxemberê wîda qirînek e hûn dîkin. Û heke hûn ji wê kirinê poşman bibin, îdî ji bona we ra hey sermayeyê we heye. Bi vî awayî hûn cewr nakin û li we jî neyê cewr kirinê.

280; Û heke deyndar destteng be, îdî hûn ji wî ra heya destê wî firebe, dan bidinê. Şixwa heke hûn deynê wî ji wî ra bi qencî bibaxişînin, heke hûn bizanin bi rastî eva ji bona we ra çêtir e.

281; Û hûn ji wê roya, ku hûnê di wê royê da li bal Yezdan da bizivirin, paşê ji bona her candarekî ra, tiştê ewî ked kirîye (di wê royê da tê dayînê) qe li wan jî nayê cewr kirinê biparîsî (bitirsin).

282; Gelî ewan merivne ku we bawer kirîye! Gava hûn ji hev ra heya danekî navdayî deyn bidin, îdî hûn ewî (dan û deynî) binivîsin. Û bira ewî, nivîsdarekî dadvan, di nîveka we da, bi dadvanî binivîse. Û bira nivîsdar, çî Yezdan bi wî daye hîn kirinê, wusa binivîse (ji wî para da neçe) îdî bira ewî binivîse. Ewê deyndar jî deynê xwe bira binivîse. Û bira ewê ku li ser wî deyn heye, ji Xudayê xwe bitirse, tu tiştêkî ji deynê xwe kêr neke. Îdî heke ewê deyndar merivekî evsene be, ya jî merivekî bê wecb e, ya jî merivekî wusan be. ku nikare bi xweber deynê xwe bide nivîsandinê, bira serkarne wî, deynî wî bi dadvanî bidne nivîsandinê. Hûn (ji bona deyn nivîsandinê) du mênê ji xwe, nehrîvan bigirin. Îdî heke du mên tunebûn, hûn mênêkî bi du jinan va nehrîvan bigirin (Jinne wusa bin) ku hûn bi şahidîya wan jinan qayîl bibin. Ewan jinan jî, heke yek ji wan şahidî birva bike, bira ewa mayî bira wê bixe. Û di gava şahit hatne gazî kirinê ji bona şahidîyê, bira ji şahid ya xwe, tu tiştî veneşêrin. Û hûn ji nivîsandina deynê piçûk û mezin ne kerixin (ewan, di gavê wî û hijmara wî da binivîsin). Eva nivîsandina we bi vî awayî li bal Yezdan ji bona şahidîyê ra rasttir e û dadvantir e û nêzîktir e jî, ku hûn (di dan û hijmara) wî da dudil nebin. Ji xencî heke kirîn û firotin herduk jî (baha û pere, bahanok-mal) amade bin, ku hûn ewan (bi dest bidne hev, ji hev bistînin). Di wê gavê da heke hûn nenivîsin, tu zîyan li ser we tune ye. Di gava ku hûn kirîn û firotinê bikin, hûn şahidan bigirin. Ji bona nivîsarok û şahidan ra bira zirar neyê dayînê. Û heke hûn ji wan herdukan ra zirarê bidin, şixwa eva ji bona we ra, îdî ji rê derketi ne. Û hûn parisaya Yezdan bikin. Yezdan bixweber evan rê û rêzikan hînê

we dike. Û Yezdan bi hemû tiştan dizane.

283; Û heke hûn li ser rê bin û hûn rastê nivîsandaran ne hatin, îdî ewa tiştê ku we di şûna deyn da, ji deyndarê bi gerewî sitandîye, bes e (nivîsandin navê). Heke hûn (hinekne we bi hinekne we) ewle dibin îdî bira ewê bi wî hatiye ewledanê, ewî anemetî ku li bal wî da hatiye sipartinê, bê kemayî li bal xûyê wî da bide û bira parîziya Xudayê xwe bike. Û hûn şahidiya xwe veneşerin. Û kîjan şahidiyê veşêre, îdî bi rastî dilê wî gunehkar e. Û Yezdan bi xweber jî bi tiştê ku hûn dikin dizane.

284; Çi tiştne di ezman û di zemîn da hene! Hemûşk ji bona Yezdan ra ne. Û heke hûn ewan tiştne di dilê we da heyî, derxin; bidine diyar kirinê, ya jî hûn ewan tiştan veşêrin, hey Yezdanê we bi wan bide (xelat û celat kirinê). Îdî (Yezdan) kîjanî bivê ewî dibaxişîne û ji kîjanî ra jî bivê ewî şapat dike. Û li ser hemû tiştan bi hêz, hey Yezdan e

285; Pêxember bi wan biryarne ku ji Xudayê wî li bal wî da hatiye hinartinê bi bawergeran va, bawer kirîye. Hemûşkan jî bi Yezdan û bi firiştênê wî û bi pirtûkne wî û bi pêxemberne wî bawer kirine. (Ewan gotine:) "Bi rastî em, di nîveka yekê ji peyemberne wî da qe tu serda çetirî û nîvwarî çê nakin. Me gotina te bihistîye, em bûne pewrewê gotina te". Tu gunehne me ji bona me ra bibaxişîne, û hey para ziviradin li bal te dane.

286; Yezdan ji bona her candarekî ra, wekî hêza wî, bar li wî dike (Yezdan ji bona her merivekî ra, wekî hêza wî, fermana perestîya wî dike, qe ji tu kesî ra ji hêza wî pirtir ferman neke). Îdî ewan candaran ji (qencî û xirabîyan) çî bikin hey ji xwe ra dikin. (Merivne qenc aha lava dikin): "Xudayê me! Tu me bi wan sikatîne, ku me ewan bi bîrva kirî, ya jî bi xeletî kirîye, gunehkar neke. Xudayê me! Te ça ewan merivne berya me da borî barne giran li wan kirîye, wusa li me jî neke. Xudayê me! Ewa barê ku hêza me nagihîje, li me neke. Û (Xuda!) tu sikatîne me ji bona me ra li ser me rake û tu me bibaxişîne û tu li me dilovanî bike. Serkarê me hey tu î. Îdî tu li ser komalê file, arîkarya me bike."

### Chapter 3 (Sura 3)

1; E.L.M. (Hey Yezdan bi arşa van tîpên di serê ferkeran da hatiye, dizane.)

2; Yezdanê (babetê perestîyê) ew e; ku ji pêştirê wî tu yezdan tune ne; zindeyê bi xwe ye, pir şîye.

3; (Yezdan) bi mafêti ewa pirtûka, ku rastdar e ji bona wan pirtûkên di berya xwe da ne, li ser te da hinartîye. Û (hêj di berya naha da), ewî (pirtûkên bi nav) Tewrat, Encîl jî hinartîye.

4; Ji bo ku ewan pirtûkan bibne beled ji bona merivan. Û ewî ewa pirtûka, ku pûçatî û mafê ji hev derdixe jî, hinartîye. Bi rastî ewanên ku bi beratenê Yezdan dibine file, hene! Ji bona wan ra şapatek e zor heye. Û Yezdan servahatê xwayî tûl e.

5; Bi rastî li ser Yezdan qe tu tiştê di zemîn û ezman da heyî, veşartî nîne.

6; Yezdan ew e, ku ça bivê, we wusa di malberxan da dide rûçik kirinê. Ji pêştirê wî tu Yezdanê (babetê perestîyê tune ye). Servahatê bijejke hey ewa bi xweber e.

7; Yezdan ew e, ku pirtûk bi ser te da hinartîye, hinek beratenê wê pirtûkê hene, ku ewan beratan xîmê wê pirtûkê ne (loma ewan beratan, bûyeran bi rûçikê wan va vedikin). Û hinek beratên mayî jî hene! Ewan ji bona çend arşan, wekî hev in (yani ewan ji bona çend arşan bi hev ra tên). Îdî ewan merivên ku di dilê wan da xarî heye, dibine peyrewê wan berate ne (ku ji bona çend arşan hatine). Wekî armancên xwe arşan didine wan beratan, ji bo ku tevdanê derxin, lê arşa wanê rastî jî hey Yezdan dizane. Ewan zana ne, ku di zanîn da rehdayî, dibêjin: "Me bi wê bawer kirîye, loma hemûşk jî li bal Xwedayê me ye. Evê jî hey hişdar bîra xwe tînin."

8; Xwedayê me! Tu dilê me ji piştî, ku te em anîne rêya rast, îdî xar neke û tu ji bal xwe, ji bona me ra dilovanîyekî bide. Bi rastî hey tu yî, ku bê baha pir dayîne dikî.

9; Xwedayê me! Bi rastî di wê roya ku di hatina wê da tu dudilî tune ye, hey tu merivan dicivîne. Bi rastî Yezdan ji peymana dayî naşipite.

10; Bi rastî ewanê bûne file hene! Mal û zarê wan, bi tu tiştî ewan ji Yezdan nadine parisandinê. Û ardûkê agir hey ewan bi xweber in.

11; Ewanê beratên me didane derewdêrandinê hene! Temtêla wan wekî temtêla wan komalên ku di berya Fir'ewn da (hatibûne) û wekî temtêla malyê Fir'ewn in. Îdî

Yezdan jî bi sedema gunehê wan, ewan (bi şapan) girtin. Yezdan bi rastî zor şapata. 12; (Muhemmed! Tu ji bona wanê bûne file ra) Bêje: "Bi rastî hûnê di nêzik da sernegûn bibin û hûnê li bal dojê da bêne civandinê." Doj bi xweber jî çi qa sikê çincîla ne!

13; Bi sond! Ji bona we ra, di wan her du destên, ku ji bona qirînê, têne hemberê hev, beratên hişhildanî hene. Destek ji wan di rêya Yezdan da qirînê dike, desta mayî jî file ne. Ewa desta bawer dikin, evê desta file li ber çavan ducarê xwe dibînin. Yezdan jî evînê xwe bi arîkarêya xwe bi hêz dike. Divê bûyerê da ji bona wanê xweyî dîtîne ra hişhildan heye (yanî ewan bivê servahatinê bi ponijandin hiş hil didin).

14; Ji bona merivan hezkirina jinan û zaran û komên ji zer û zîvan û revonê hespan û kerî û sûrîne tarişan û çandinî bi dil xwestin, hatiye xemilandinê. Ewanan xişrê jîna cihanî ne. Û li bal Yezdan bi xweber da jî qencê şûnwaran heye, loma qencê zivirandina li bal wî da ne.

15; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra) bêje: "Hûn hez dikin, ku ez ji bona we ra, hêj ji van hezkirinê we, çêtir bêjim? Ewanê Xweda parizî dikin, hene! Ji bona wan ra li bal Xwedayê wan, behîştên ku di bine darê wan da çem dikişin heye. Ewanan di behîştê da hey dimînin. Û ji bona wan ra zone paqij û qayîlbûna ji Yezdan heye. Û Yezdan bi xweber jî bendenê xwe dibîne.

16; Ewan xwedaparizan in, ku dibêjin: "Xwedayê me! Bi rastî me bi te bawer kirîye, îdî tu ji bona me ra gunehên me bibaxişîne û tu me ji şapata agir biparîşîne."

17; Ewan xwedaparizan in, ku li ser aşî û teşqelan hew dikin û rast in û bi dil perestî dikin û malê xwe ji bona hewcan ra, di rêya Xwedê da, disixurînin û di sewgura sibehê da, ji bona baxişandina gunehên xwe, lavan dikin.

18; Bi rastî Yezdan û firiştan û ewan zane ne, ku bi dadvanî radibin, daditîyî bi cîh tînin şahidî dane, ku tu yezdan ji pêştirê Yezdanê (babetê perestîyê) tune ne, hey servahatê bijejke ewa ye.

19; Bi rastî "ol" a rastî li bal Yezdan, hey "ol" a (bi nav) Îslam e. Ewan komên, ku ji wan ra pirtûk hatiye hene! Ji piştî ku ji wan ra zanîn hatiye, paşê ji dexesiya di nava hev da, ne wekhevbûn çê kirine. Û kîjan bi beratenê Yezdan bibe file, îdî bira bizane! Bi rastî Yezdan zû hijmarok e.

20; Îdî heke ewan (Muhemmed) bi te ra di mafê (ol) ê da tekoşînê bikin, tu ji bona wan ra bêje: "Min xwe û bi wanê peyrewê xwe va ji bona Yezdan ra hispartîye." Û tu ji bona wanê, ku pirtûk ji bona wan ra hatiye û ji bona wanê ne xwandî ra bêje: "Hûn jî misilman bûne?" Îdî heke ewan misilman bîn, şixwa ewan hatine rêya rast û heke ewan pişta xwe dane te (misilman ne bûn) li ser te hey gotina (biryarên Yezdan ji wan ra) heye. Û Yezdan bi xweber jî bendenê xwe dibîne.

21; Bi rastî ewanê ku bi beratenê Yezdan dibîne file û pîxemberên wî bê mafî duku jin û ewan merivên ji kesan, ku fermana kesan ji bona dadvanitîyê dikin jî duku jin, hene! Îdî (Muhemmed!) tu ewanan bi şapata dilsoz bide mizgîndanê.

22; Ewan in, ku keda wanê di cihan û di dan û gavê para da kirine şewitîye û ji bona wan bi xweber jî tu arîkar tune ye.

23; (Muhemmed!) Qey tu li bal wan merivan, ku parek e ji zanina pirtûkê ji wan ra hatiye dayînê mêze nakî? Ewan ji bona ne wekhevbûna heyî da, li bal biryarên di pirtûka Yezdan da heyî, têne gazîkirinê ji bo ku di nava wan da bi dadvanî berewanî bêt kirinê, paşê destek e ji wan, rû ji biryarê pirtûkê difetilînin. Ewan bi xweber jî eva ji xwe ra kirine xûy.

24; Eva (rû fetilandina wan) ji bo ku ewan gotibûne: "Bi rastî agir ji pêştirê çend rojên, hijmarî, bi me nagire." Ewan bi van virên xwe, di "ol" a xwe da hatine xapandinê.

25; Îdî di gava, ku em ewan ji bona wê roja ku di hatina wê da tu dudilî tune ye, bicivînin û ji bona her yekê ra jî, keda ku ewan kirîye tê dayînê, li wan bi xweber jî qe cewr nayê kirinê, gelo temtêla wanê, wê ça be?

26; (Muhemmed! Tu) bêje: "Xwedayê min e serokê, serekên bi hêzên maldarê berewan! Tu bi xweber î, hêz û berewanî bi serekî ji bona evînê xwe ra didî û tu kîjanî bivê, ji wî hêz û berewanî, bi serekî rût dikî û tu evînê xwe serfiraz dikî û tu kîjanî bivê, tu ewî sernegûn dikî. Hey çêtir bûyîn di destê te da ne. Bi rastî tu bi hemû tiştan dişî.

27; (Xwedayê min!) Tu î, şevan dixî royan û royan dixî şevan (bi van xistinê di

nava hev da, şev û royan bi hev didî dirêj kirinê). Û tu zindîyan ji mirêyan û mirêyan jî ji zindîyan, derdixî û tu ji bona evînê xwe ra, bê hijmar rozînan didî. 28; Bawerger, filan ji xwe ra naxine serkar (ewan hey bawergeran ji xwe ra dixne serkar). Îdî kîjan bawergerê ji pêştirê bawergeran, filan ji xwe ra bixe serkar, li bal Yezdan tu dostiya wî tune ye. Ji pêştirê heke hûn xwe, bivê serkaryî ji wan biparisînin (ji bo ku ji wan, ji bona we ra tu teşqeले çê nabe, hûn dikarin bi xûyayî wan ra bibine dost). Û Yezdan jî we ji xwe dide tirsandinê. Bi rastî fetilandin hey li bal Yezdan da ne.

29; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra) Bêje: "Hûn di dilê xwe da çi tiştî veşêrin û ya jî derxin (bidine xûya kirinê) hey Yezdan bi wî dizane. Û ewa bi tiştên di ezman û zemîn da heye jî dizane. Yezdan bi rastî bi hemû tiştan dişî."

30; (Hûn gelî merivan!) Ewê roya, ku hemû kes di wê royî da rastî qencînê xweyên kirî tên, ku amade ne û hemû sikatîne wî jî amade ne, ewa kesa hez dike, ku di nîveka wî û kirinê wî da danekî dûr hebûya (bi ponijandin bîra xwe bînin). Û Yezdan we (ji hatina di hemberya fermanê) xwe da, bi tirsdayî dide parisandinê. Yezdan ji bona benda ra mêhrivan e.

31; (Muhemmed! Tu ji wan ra) Bêje; "Heke hûn bi rastî ji Yezdan hez dikin, îdî hûn bibine peyrewê min, ku Yezdan jî ji we hez bike, û ji bona we ra gunehên we bibaxişîne." Bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

32; (Muhemmed tu ji wa ra) bêje: "Hûn bi gotina Yezdan û pêxemberê wî bikin." Îdî heke ewan berê xwe fetilandin, bira ewan bi rastî bizanin! Yezdan ji filan hez nake.

33; Bi rastî Yezdan Adem û Nûh û binamala Îbrahim û binamala Î'mran (ku her yekê ji wan, ji nişa hev in) li ser heyîne cihanê hêlbijartîye.

34; Evan ûrtek e wusa nin, ji hev hatine. Û Yezdan bîhîstekê pir zan e.

35; Di gavekî da, jina Î'mran bi lavatî gotibû: "Xwedayê min! Bi rastî min eva (zaroka) di zikê xwe da, hey ji bo, ku ji te tenê ra xebat bike, bi gorîtî xumale kirîye. Îdî tu jî ewê ji min litê bike. Bi rastî hey tu î bîhîstekê pir zan."

36; Îdî di gava jina Î'mran razaye Yezdan zanîbûye, ku çi ji wê ra bûye jî, ewê dîsa gotîye: 'Xwedayê min! Bi rastî ji min ra keçikek bûye. Û zarên kurîn (ji bona xebatê) wekî zarên keç nabin, bi rastî min navê wê, "Meryem" danî û bi rastî ez ewê bi tevê ûrta wê va ji sikatîne pelîdê deherandî di hêspêrime, parisandina te."

37; Îdî Xwedayê wê ewa gorya wê bi rindê qencîyan litê kirîye û Xweda ewa gorya wekî hêşnayan rind gîhandîye û Zekerêya jî xistîye daman ji bona gîhîjtina wê. Zekerya çi qa diçû (wê Babû-Çelîpa ya ku Meryem têda bûye) li bal Meryemê da rastê xarînan hatîye. Zekerêya, ji Meyre ra gotîye: "Ka evan xarîne hanênan ji kur ji bona te ra hatine?" Meryem ji bona Zekerêya ra gotîye: "Ewan xurekan ji bal Yezdan ji min ra tên." Bi rastî Yezdan ji evînê xwe ra bê hijmar dilikan dide.

38; Di wura da Zekerêya bi lavatî gazî Xwedayê xwe kirîye. (Zekerêya) Gotîye: "Xwedayê min! Tu ji bona min r alî bal xwe ûrtek e paqij bide. Bi rastî tu gazîkirinan dibihê.

39; Îdî gava (Zekerêya) di (babû-çelepa) ê da nimej dikir, firiştan gazî wî kirine (gotine): "Bi rastî Yezdan tu bi kurekî bin av "Yehya" daî mizgîn danê. Yehya ewî merivê ku bi fermana Yezdan bûye, dide rast dêrandînê û ewa bi xweber jî serok û dawpaqij û pêxember û ji aşîkaran e.

40; Zekerêya bi lavatî ji Xweda ra gotîye: "Xweda! Ka, we ça ji bona min ra kurekê bibe? Îdî ez kal bûme û jina min jî "eremûk" e. (Yezdan) Gotîye: "Gotina te ye, lê Yezdan ça bivê wusa dike."

41; (Zekerêya ji Xweda lava kirîye) Gotîye: "Xweda! Ka tu ji bona min ra (ku wê ji bona min ra kurekî bibe) beratekî bide." Xweda ji bona Zekerêya ra gotîye: "Berata te ev e; ku tu di sê royan da bi tu kesî ra mijûl nebî, ji xêncî bi niqandin (bi peyivî). Û tu pir perestîya Xwedayê xwe bikî. Û tu di sibe û êvaran da Xwedayê xwe ji kêmasîyan bi sipazî paqij bikî."

42; Û di gavekî da firiştan (aha)gotine: "Meryem! Bi rastî Yezdan tu hêlbijartî û paqij kirîye û ewî te li ser hemû jinên cihanê bi paydarî hêlbijartî."

43; Meryem! Tu bi dil ji bona Xwedayê xwe ra (biperestî) stûyê xwe xar bike û tu ji bona Xwedayê xwe ra kunde behere û tu bi wanê ku (xwe ji bona Xweda ra) kûz dikin, xwe kûz bike.

44; (Muhemmed!) Evanan hemûşk ji axiftinê dizîka da nin, em li bal te da diniqînin.

Di gava ewan peşk diavêtin, ka kîjanê ji wan bibe damin, ji bona xwayî kirina Meryemê û di gava ku ewan tekoşîn dikirin (ji bona daminya Meryemê) tu li bal wan nebû î!

45; Di gavekî da firiştan (aha) gotibûne: "Meryem! Bi rastî Yezdan te bi peyvek e ji xwe dide mizgîndanê. Navê wî Îsa Mesîhê kurê Meryemê ye. Ewa di cihan û di dan û gavê para da jî, pîr bi rû ye. Ewa ji wanê nezîkê (Yezdan) e.

46; Û ewa bi merivan ra, di çincîl û di kalitîya xwe da jî, axiftinê dike, ewa ji aştîkaran e.

47; Meryemê, bi lavatî gotîye: "Xwedayê min! Ka, wê ça ji bona min ra zarê bibe? Ji merivan destê tu kesekî bi min ne ketîye." (Yezdan ji bona Meryemê ra) gotîye: "Gotina te ye, lê Yezdan ça bivê wusa diafirîne." Di gava (Yezdan bûyerekî) biqedîne ji bona we ra dibêje: "Bibe." Îdî ewa jî dibe.

48; Û Yezdan ewî hînê nivîsandin û zanîna retkokî û (hînê) xwendina Tewrat û Încîlê jî dike.

49; Û Yezdan ewa bi pêxemberî li bal zarên cihûyan da şandîye, ji bo ku ji wan cihûyan ra (aha) bêje: "Gelî zarên cihûyan! Bi sond! Ez bi beratenê ji Xwedayê we li bal we da bi pêxemberî hatime şandinê. Ezê ji bona we ra ji heryê tokelêkî wekî tokela çûkan çê bikim, îdî ezê pufê wê tokelê bikim, ewayê bi destûra Yezdan bibe çûk. Û ez korên zikmakî û belekan bi mafêti qenc dikim û ez mirêya bi destûra Yezdan, zinde dikim. Û hûn di mala xwe da çi bixun û çizimhêr bikin, ezê ji bona we ra bêjim. Bi rastî heke hûn bawer dikin, di van da berateyên mezin ji bona we ra hene.

50; Û ji bo ku ez ewê pirtûka ku di berya min da hatîye, rast bidêrînim û ez hinek, ewan tiştên ku we li xwe ne durist kirîye, durist bikim, hatime şandinê. Min ji Xwedayê we, ji bona we ra beratên daveger anîne. Îdî hûn yezdanparizî bikin û bi gotina min bikin.

51; Bi rastî Yezdan, Xwedayê min e û Xwedayê we ye jî. Îdî hûn ji wî ra perestî bikin. Rêya rast eva ye.

52; Di gava Îsa, ji wan cihûyan fileti seh kirîye, îdî (Îsa aha) gotîye: "Gelo di rêya Yezdan da, kê heye, ku arîkarêya min bike?" Suxtene wî (aha) gotîne: "Em arîkarên Yezdan in (em di rêya Yezdan da arîkarîyê didine wanê, ku di rêya Yezdan da xebatê dikin). Me bi Yezdan bawer ki-riye û tu jî şahidî bike, ku em bi rastî misilman bûne (Me xwe hispartîye Yezdan)"

53; Xwedayê me! Bi rastî me bi wan biryarên ku te hinartîye bawer kirîye û em bûne peyrewê pêxember, îdî tu me bi şahidan ra binivîse (ji wanên ku bi te û bi pirtûk û bi pêxemberan bewer kirine, di rêya wan da diçin).

54; Lê (ewan cihûyan ji bona kuştina) Îsa xax (endeze) kirine û Yezdan jî (endeze) xax kirîye (ewan bi wî xaxê xwe nikaryan îsa bikuştanan, lê ewan bi xweber xwe kuştine, xaxê wan bi wan da hatîye). Û Yezdan bi xweber jî qencê xax çêkeran e.

55; Di gavekî da Yezdan ji bona Îsa ra (aha) gotîye: "Îsa! Bi rastî ezê canê te bistînim û ezê te li bal xwe da bilind bikim, û ezê te ji wanê ku fileti dikin paqij bikin û ezê ewanê peyrewîya te dikin li ser wanê ku fileti dikin, heya roya rabûna hemûtî serfiraz bikim, fetilandina weya paşyî hey li bal min dane. Îdî ezê berewaniya we di wan tiştên, ku hûn di wan da ne wekhev bûn e, bikin."

56; Îdî ewanê bûne file hene! Bi rastî ezê ewan di cihan û di dan û gavê para da bi şapatek e zor bidime şapatkirinê. Û ji bona wan bi xwer jî tu arîkar tune ye.

57; Û ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Îdî kirya wanê wê bê kemasî ji wan ra bê dayînê. Û Yezdan bi xweber jî ji cewrkaran hez nake.

58; (Muhemmed!) Evan bûyerên hanênan ku em ewan ji te ra dixûnin, ji beratan û ji (Qur'ana) bijejke ne.

59; Bi rastî temtêla Îsa li bal Yezdan wekî temtêla Adem e. (Yezdan, Adem) ji xwelîyê afirandîye, Paşê ji wê ra gotîye: "Bibe" îdî ewa jî bûye.

60; Bi rastî daditî (û rastî) ji Xwedayê te ye, îdî ewanê ku (di dabaşa Îsa da) dudilî dikin hene! Tu nebe ji wana.

61; (Muhemmed!) Îdî ji piştî ku ji te ra zanîn divê dabaşê da hatîye, heke yek (dîsa) bi te ra tekoşîn bike, tu (ji bona wan ra) bêje: "Hûn werin (bicivin) ku em gazî zarê xwe û gazî zarê we û em gazî jinên xwe û gazî jinên we bikin û em û hûn bi xwer jî bi civin; paşê em bi hev ra qîr bikin (bêjin); îdî ewanê virek hene! Em bi hev ra deherandina Yezdan li ser wan (bixûnin)."



62; Bi rastî ewa (bûyera di mafê Îsa da hatiye gotinê heye) bûyera rast eva bi xweber e. Û ji pêştirê Yezdanê (babetê perestîyê) tu yezdan tune ne. Bi rastî Yezdan bi xweber jî serfirazê bijejke ye.

63; Îdî heke ewan rû bifetilînin, bi rastî Yezdan bi tevdanokan dizane.

64; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelî xweyê pirtûkan! Ka hûn werin bal wê peyva, ku di nîveka me û di nîveka we da bi wekitî yek e; em hey ji Yezdan ra perestî bikin û em tu tiştî ji bona Yezdan ra nexine hevî û hinekên me, hinekî meyî maî ji xwe ra ji pêştirê Yezdan bi xwedatî negirin." Îdî heke ewan rû bizivirînin tu (ji wan ra aha) bêje: "Hûn şahid bin, ku bi rastî em misilman bûne."

65; Gelî xweyê pirtûkan! Hûn çima di mafê Îbrahîm da tekoşînê dîkin? Tewrat û Încîl di pey Îbrahîm da hatine hinartinê. Îdî qe hûn hiş hilnadin?

66; (Em bêjin): "Hûn dikarin di wan tiştên, ku hûn bi wan dizanin, di wan da tekoşînê dîkin, lê hûn çima di wan tiştên, qe tu zanîna we bi wan tune ye tekoşînê dîkin?" Yezdan bi xweber jî bi wan dizane lê hûn nizanin.

67; Îbrahîm, cihû jî nîne û mexinî jî nîne û lê Îbrahîm bi rastî henîfekî misilman bûye. Û Îbrahîm putperest jî ne bûye (Îbrahîm di "ol" a bi nav (henîf) da bûye arşa peyva "henîf" ji pûçîtîyê dest berda ye li bal mafê da hatiye. Eva jî misilmanî bûye, putperestî nîne).

68; Bi rastî ji kesan ewanê babet in ji bona Îbrahîm ra hene! Peyrewê (Îbrahîm) û ewa (Muham-med) pêxember û ewanê bawer kirine (bi xweber in). Û serkarê bawergeran şixwe Yezdan e.

69; Destekî ji xweyî pirtûkan hez kirine, ku we ji rêya rast bişipitînin (bixine file). Ewanan hey xwe ji rêya rast dişipitînin û bi xweber jî agah nakin.

70; Gelî xweyî pirtûkan! Hûn çima bi beratên Yezdan dibine file? Û hûn bi xweber jî (bi zanîn) ewan dibînin.

71; Gelî xweyî pirtûkan! Hûn çima rastî û pûçîtîyê tevê hev dîkin û hûn bi zanîn ji mafê vedişêrin?

72; Û destekî ji xweyê pirtûkan (aha) gotine: "Hûn (gelî hevalên meyên xweyê pirtûk) bi wan biryarên ku li ser bawerkaran da (misilmanan) hatine hinartinê; di serê royê da bawer bikin û hûn di dawîya royê da bi wan bibin file, dibe ku ewan (bi van kirinê weyên tinazî) ji bawerya xwe bizivirin."

73; Û hûn (gelî xweyê pirtûkan!) Ji pêştirê wanê ku bûne peyrewê "ol" a (dîn) we bi tu kesî bawer nekin. (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî rêya rast, rêya Yezdan e." Qey gava ku ji bona yekê ra wekî wan biryarên, ku ji bona we ra hatine bê dayînê, ya jî ewa meriva bi wan biryaran li bal Xwedayê we, bi we ra tekoşînê bike, hûnê dîsa bêjin: "Bi wan bawer nekin?" (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Bi rastî rûmet di destê Yezdan da ne, ji kê ra bivê ji bona wî ra dide. Û Yezdan bi aborî bê perwayê pir zan e."

74; Yezdan evîne xwe, bi dilovîna xwe ra xwurî dike. Û xweyê rûmeta mezin Yezdan e.

75; Û ji xweyê pirtûkan hinek hene! Heke tu bi barê devan mal daynî bal wan tu bi wan ewle dibî, ku ewan ewî malî dîsa li bal te da bidin. Û hinek jî ji wan hene! Heke tu bi wan ewle bî, polekî bidî bal wan, ewan ewî polî para da nadine te, heya tu li ser wan pê nebîrî (ewan ji xastinê bê zar nekî). Eva ne dana wan ji ber ku ewan di gotibûne: "(Ji bona xwarine me, ji malê nexwendîyan û nezanan) tu gunehkarî û ne duristî ji me ra tune ye." Û ewan (cihûyan) li ser navê Yezdan vir dikirin (digotin: "Şixwa di pirtûka me da jî heye, xwarina malê nezan, û malê biyanê cihûyan, ji bona cihûyan ra durist e). Ewan bi zanîn evan viran li ser navê Yezdan dikirin.

76; Gotina wan nîne lê kîjan peymana xwe pêk bîne û xwedaparisî bike (bira bizane) îdî Yezdan jî ji xwedaparisan hez dike.

77; Bi rastî ewanê, ku bi perekî hindik peymana Yezdan û sondên xwe difiroşin hene! Ji bona van ra di dan û gavê para da tu par tune ye. Evan in, ku Yezdan bi wan ra axiftin nake û Yezdan di roya rabûna hemûtî da jî li wan mêze nake û ewan ji gunehan paqij nake. Û şapateke dilsoz ji bona wan ra heye.

78; Û destek jî ji wan hene (di gava xwendina pirtûkê da) zimanê xwe, xaromaro dîkin, ji bo ku hûn goman bikin ewa tiştê, ku ewan dixûnin, ji pirtûkên (lê qe giza pirtûkê jî bi wan tune ye) ewan ji pirtûkê nînin. Û ewan dibêjin: "Evan xwundinên me, ji bal Yezdan hatine." Û ewa xwendina wan bi xweber jî qe li bal Yezdan ne hatine. Û ewan bi zanîn viran li ser navê Yezdan dîkin.

79; Babet nîne ji bona tu kesî ra; heke Yezdan ji bona wî ra pirtûk û zanîna retkokî û pêxemberî dabe, paşê ewa jî ji bona merivan ra bêje: "Hûn ji yezda ra perestî nekin, ji min bi tenê ra perestî bikin." Lê ji bona wî ra babet ev e, ku ewa ji bona merivan ra bêje: "Bi wan biryarên ku hûn ji pirtûkê hîn bûne û bi wan biryarên ku hûn ders didin ji bona Yezdan ra hûn bibin bendeyên xwumal e."

80; Û ewa, fermana we nake, ku hûn firiştan û pêxemberan ji pêştirê wî, ji xwe ra bi xwedatî bigirin. Ji piştî ku hûn misilman bûne, ewa ça fermana we, bi filetiyê dike?.

81; Di gavekî da Yezdan ji pêxemberan peymanek e (aha) sitandibû; bi sond! Min ji we ra ji pirtûk û ji zanîna retkokî daye, paşê gava ewa pêxemberê ku vê (pirtûka) bi we ra heyî dide rast dêrandinê hat, hûnê bi wî bawer bikin û hûnê arîkarêya wî bikin; hûn evê peyman litê dikin û hûn dibêjin erê; ku hûnê li ser wê paymana min e hanê herin? (Pêxemberan) gotine: "Erê (em ewê peymanê litê dikin emê li ser wê herin). Yezdan (ji wan ra aha) got: "Îdî hûn nehrevan bin, bi rastî ez jî bi we ra ji nehrevanan im."

82; Îdî ji piştî vê peymanê, kîjan rû bizivirîne (peymanê pêk neyîne) ewan bi xweber in, ku bi rastî ji rêya rast derketine.

83; Qey ewan ji pêştirê "ol" a Yezdan (ji xwe ra hinek) "ol"ê mayî divên? Hemû kesên di ezman û di zemîn da heyî bi xweşî û nexweşî ji bona Yezdan ra xwe hispartine û ewanê hey li bal wî da bizivirin.

84; (Muhemmed!) Tu bêje: "Me bi Yezdan û bi wan biryarên, ku li ser me da hatine hinartinê û bi wan biryarên. ku li ser Îbrahîm û Îsmail û Îshaq û Yaqûb û nevyê wan da hatine hinartinê bi wan pîrnûkên, ku ji bona Mûsa û Îsa û pêxemberan ji Xwedayê wan hatiye, bawer kiriye. Em di nava wan yekê da jî tu dutîretî nakên. Û me bi xweber jî, xwe ji bona (Yezdan ra) hispaniye."

85; Û kîjan ji pêştirê "ol" a (bi nav) Îslam, ji xwe ra "ol" an bivê, bira ewa bizane, ku bi rastî ji wî, ewa "ol" a nayê litê kirine. Îdî ewa bi xweber jî di dan û gavê para da ji zîyangeran e.

86; Ça Yezdanê ewî komalî, ku ji wan ra beratên daveker hatibin, ewan bi wan beratan bawer kiribin û ewan şahidî dabîn, ku pêxember rast in, îdî paşê ewan bi vî ra jî bibine file, bîne rêya rast? Bi rastî Yezdan komalê cewrkar nayîne rêya rast.

87; Celata wan, ev e: "Deherandîna Yezdan û firiştan û kesan, hemûşk bi rastî li ser wan e."

88; Ewan di nava deherandinê da hey dimînin. Şapat li wan sivik nabe û li wan nayê mêze kirinê (ku şapata wan bê para danê).

89; Xêncî wan merivên, ku ji piştî gunehan poşman bibin û aştî kiribin, îdî bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

90; Bi rastî ewanê ji piştî bawerêya xwe bûne file û paşê di filetiyê da jî pêş da çûne hene! Poşmaniya wan qe nayê litê kirinê û ewan bi xweber in, ku rêya rast wunda kirine.

91; Bi rastî ewanê bûne file û gava mirinê jî bi fileti mirine hene! Ji tu kesekî ji wan, wekî tijîbûna cihanê zêr jî bidin, ji bo ku ji şapatan fereste bibin, dayîna wan nayê litê kirinê (ewan cihanê tijî zêr bikin, ji bona ferestîya xwe ji agir, bidin, dîsa ewan ji şapat û ji agir fereste nabin). Evan in. ku ji bona wan ra şapatek e dilsoz heye û ji bona wen ra qe tu arîkarî jî tune ye.

92; Bi rastî heya hûn ji wan tiştên, ku hûn ji wan hez dikin (di rêya Yezdan da) nesixurînin hûn nagehêjên qenciyan û hûn (di rêya Yezdan da) çi bisixurînin bi rastî îdî Yezdan bi wî dizane.

93; Hêj di berya ku pirtûka (bi nav) Tewrat ne hatibû hinartinê hemû xurek ji bona zarên Îsrail ra dirustbûye, ji pêştirê wan xurekên, ku Îsrail ji xwe ra li ser xwe ne dirust kiriye. (Muhemmed! Tu aha ji wan ra) bêje: "Heke hûn di gotîna xwe da rast in ka pirtûka Tewratê bînin û hûn Tewratê bixunin. (Ewan dozên we ne, ku hûn dikin, ka Tewratê di mafê wan da çi gotîye?)"

94; Îdî ji piştî van kîjan li ser navê Yezdan viran bike, bi rastî ewanê cewr kirine evan bi xweber in.

95; (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Yezdan rast gotiye." Ka îdî ewa ola (dîn) Îbrahîmê ku ji xariye li bal rastiyê da hatiye paldanê heye! Hûn bibin peyrewê wê. Û Îbrahîm bi xweber jî ji putperestan ne bûye.

96; Bi rastî xaniyê ku ji bona (sertêdana) merivan (bi perestî) di cara yekem da

(ji bona belediya kesên li ser zemîn) hatiye danînê, ewa xaniyê bi nav (Kabe) di Mekke da ne. (Ewa xaniya) ji bona hemûşk (kesê) cihanê ra pîroz û belede.

97; Di wura da beratên xûyayî hene, şûngeha Îbrahîm heye. Û kîjan bikebe wura, îdî ewa ewle dibe. Û li ser wan kesên bi hêz, ku dikarin herin wura, ji bona Yezdan sertêdana (heca) wî xaniyê bi vê nevê ye. Û kîjan xwe ji sertêdana wî bide para da (ya jî bibe file neçe wura) bira ewa îdî bizane; bi rastî Yezdan ji hemûşk gerdûnê bê perwa yê zengîn e.

98; (Muhemmed! Tu aha) bêje: "Gelî xweyê pirtûkan! Hûn çima bi beratên Yezdan dibine file? Bi rastî Yezdan ewan tiştên ka hûn dikin dibîne."

99; (Muhemmed! Tu aha) bêje: "Gelî xweyê pirtûkan! Hûn çima rêya Yezdan ji ber wanê bawer kirine digirin ku hûn ewan bixin rêya çewt, hûn bi xweber jî dibînin (ku rêya bawergeran rast e)? Û Yezdan ji wan kirinên we bê agah nîne."

100; Gelî ewanê bawer kirine! Heke hûn bi gotina destekî ji wanê, ku ji wan ra pirtûk hatiye bikin, ewanê we ji piştî bawerêya we, bifetîlînin bixne file.

101; Û beratên Yezdan li ser we da têne xwendinê û pêxemberê Yezdan jî di nava we da ne, hûnê ça dibine file?. Û kîjan xwe bi Yezdan bigire, îdî bi rastî ewa li bal rêya rast da hatiye.

102; Gelî ewanê bawer kirine! Hûn wekî babetîya Yezdan, paristîya Yezdan bikin, û hûn hey li ser ola (dînê) Îslamê bimirin.

103; Û hûn hemûşk xwe bi kapê (dîn) Yezdan bigirin, ji hev belav nebin, hûn ewan qencên Yezdan e, ku li ser we heye bîra xwe bînin; hûn di gavekî da neyarê hev bûn, îdî Yezdan di dilê we da hogirî çê kir, hûn bi qencîya wî bûne birayê hev. Hûn li ser devê kortikekî agir dabûn, îdî Yezdan hûn ji wura fereste kirin (hûn file bûn, Yezdan hûn misliman kirin). Yezdan ji bona we ra beratên xwe bi vî awayî vedike, hêvî heye ku hûn bi rastî werne rêya rast.

104; Û bira ji we komekî, ku gazî li bal kirina qencîyan û fermana bi hatina li bal rêya rast da û xwe parisandina ji sikatîyan bike, hebe. Û ewanê ferestbûyî evan bi xweber in.

105; Û hûn wekî wanê ku ji wan ra beratên hûzwartî hatibûye, paşê ewan ji hev belav bûne, di nava xwe da ne wekhev bûn çê kirine, nebin. Bi rastî ji bona wanê ku aha kirine şapatek e mezin heye.

106; Di wê roya ku hinek rû, sipî dibin û hinek rû jî reş dibin; ji bona wanê rûreş ra (aha) tê gotine: "Erê hûn bûn! Piştî bawerîyê bûne file?" De îjar îdî bi sedema filetiya xwe şapatê tam bikin.

107; Û ewanê ku di wê royê da rûyê wan sipî bûye, îdî ewan di dilovanîya Yezdan da nin. Ewan di wê dilovanîyê da jî hey dimînin.

108; (Muhemmed!) Evanan beratên Yezdan in, ku em ewanan bi rastî ji te ra dixûnin. Yezdan ji bona tu kesekî ra cewrê navê.

109; Û çi tiştên di ezman û di zemîn da hene hemûşk ji bona Yezdan ra ne. Hemû bûyer li bal Yezdan da difetîlin.

110; Hûn (gelî misilman!) qençtirê koman in, ku ji bona merivan ra hatine derxistinê, hûn fermana (bikirina) qencîyan û (bi xwe parisandina) ji sikatîyan dikin û hûn bi Yezdan jî bawer dikin. Û heke xweyê pirtûkan bawer kiribûnan wê ji bona wan ra çêtir bûya. Ji xweyê pirtûkan hinekî bawer kirine hene, lê pirê wan ji rêya rast derketine.

111; Ewan ji pêştirê cefadanê tu zîyanê nadine we. Heke ewan bi we ra qirîn bikin jî dîsa piştî xwa didine we, para da direvin. Paşê ewan nayêne arîkarkirinê jî.

112; Ewan li ku dibin bira bibin hey li ser wanan riswatî û pintîtî hatiye vegirtinê. Ji xencî heke ewan xwe bi kapê (dîn) Yezdan bigirin û ewletîya ji kesan (bi dana, bac û bi sixwurandina malê xwe di rêya Yezdan da ji bona hewcan ra) hildin û ewan bi rastî babetê xeşma Yezdan bûne, ku li ser wan riswatî û pintîtî hatiye vegirtinê. Evan şapatan bi sedema ku ewanan bi beratên Yezdan bûne file û bi sedema ku ewanan bê mafî pêxember dikuştin, bi wan da hatiye. Evan şapatan bi sedema gunahkarêya wan bi wan da hatiye. Û ewan şixwa ji tuxûbê xwe diborî bûne.

113; Ewan (xweyê pirtûkan hemûşk) wek hev nînin; ji wanan hinek hene, ku di şevê da radibin (perestîya Yezdan dikin) bi kundetî beratên Yezdan dixûnin (hew dikin).

114; Ewanan bi Yezdan û bi ro û danê para da bawer dikin û ewanan fermana (kesan) bi qencîyan û (xwe parisdana wan) ji sikatîyan dikin. Ewanan ji bona kirina qencîyan lez dikin û şixwa ewane bi van salixan in, ku bûne ji aştkaran.

115; Û ewan ji qencîyan çi bikin bi rastî îdî ewan ji wê qencîyê bê par nabin.

Yezdan bi xweber jî bi rastî bi parisvanan dizane.

116; Ewanê bûne file hene! Bi rastî mal û zarê wan, ewan (ji şapata) Yezdan bi tu awayî nadine paradanê û hevrînê agir evan in. Evanan di agir da heymanok in.

117; Temtêla wan (merivê), ku malê xwe di jîna vê cihanê da disixurînin wekî temtêla wî bayê qerimanok e, ça ewî li çandiniyê wî komalê ku li xwe cewr kirine xistiye. Îdî (ewî bayî ewa çandiniya şexte kirîye) hemûşk şewitandiye. (Tişteke ne maye, ji wî ra jî di danê para da tu qencî namîne.) Yezdan li wan cewr ne kirîye, lê ewan bi xweber li xwe cewr kirine.

118; Gelî bawergeran! Hûn ji pêştirê xwe ne (bawerger) ji xwe ra yaran negirin, ji bo ku ewan we di armancê we da çewt nekin. Ewanan ji bona cefadan û tevhevkirina we, qe xwe nadine para da. Ewan ji wan tiştên ku tengasî û kêmayî ji bona we ra çê bikin, hez dikin. Bi sond! Di devê wan (file û putperest, û du rûyan da) xeşm xûya bûye û ewan tiştên, ku ewan di hemberê we da di singê xwe da vedişerin, hêj meztir in. Bi rastî heke hûn (bi ponijandin) hiş hildin me ji bona we ra berate vekirine.

119; Hûn (gelî bawergeran!) ew meriv in, ku hûn ji wan (merivên ji pêştirê xwe jî) hez dikin, lê ewan ji we hez nakin û hûn bi hemûşk pirtûkan bawer dikin, lê ewan di gava rastî we hatine, gotine: "Em bawer dikin" û ewan di gava bi tenê dibin, ewan ji hêrsan tilîyên xwe ji ser wê digezin; (gelo emê çawa ji van fereste bin? diponijin û ji hev ra dibêjen. Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Hûn ji hêrsa xwe bimirin." Bi rastî Yezdan bi wan tiştên di singa da verşartî dizane.

120; Heke qencîyek bi we da hatibe, hatina wê qencîyê ewan sik dike û heke şixwa sikatiyek bi we da hatibe ewan bi hatina wî şa dibin. Û heke hûn di hemberê wan da hew bikin û hûn xwedaparizî bikin, xaxê wan bi tu tiştî ji we ra zîyan nake. Bi rastî Yezdan ewan tiştên, ku ewan di hemberê we da dikin, hildaye binê zanîna xwe.

121; Û di gava (Muhemmed!) tu di sibê zû da ji mala xwe derketî, te ewan merivên bawerger ji bona qirînê bi cîh kirin. Şixwa Yezdan bi xweber jî bihîstokê zana ye.

122; Di wê gavê da du destan ji we van, ku ji hev belav bibin (bi sedema ku ewan çav dabûne wan durûyê revoker). Yezdan bi xweber jî serokê wan herdu destan bû.

Gelî bawergeran! Hûn hey xwe hispêrne Yezdan.

123; Û bi sond! Hûn di (qirîna) Bedrê da hindik bûn jî Yezdan arîkarêya we kiribû (we neyarê xwe sernegûn kirin). Îdî hûn pariziya Yezdan bikin. Bi rastî hêvî heye, ku hûn bi vî awayî sipasîyê (Yezdan) bikin.

124; Di wê gavê da (te) ji bona wanê bawer kirine, digot: "Qey kû Yezdan bi sê hezar firiştên xuroşokên hinartî, arîkarêya we bike hêj têra we nake?"

125; Erê! Bi rastî heke hûn (di kozîkê xwe da) hew bikin û hûn xwedaparizî bikin û ewan neyaran jî bi vê hêza xwe, êrişê binin li ser we da, Xwedayê weyê bi pênc hezar firiştên bi nav û deng arîkarêya we bike.

126; Û Yezdan eva arîkarêya hanê hey ji bona ku bibe mizgîn ji bona we ra, ku hûnê di hembere neyarê xwe da serfirazbin û ji bo ku dilê we jî bi wê arîkarîyê bi cî bibe, kirîye. Û arîkarkirin bi xwe ber jî hey ji Yezdanê servehatê bijejke ye.

127; (Û Yezdan eva arîkarî kirîye) Ji bo ku ewan (firiştan) alîyekî wan filan jê bikin, ya jî ewan (firiştan) van filan şepirze bikin, îdî (ku ewan filan) para da bizivirin (sernegûn bibin).

128; Heke Yezdan ewan şapat bike, ya jî poşmaniya wan ji kirina wan litê bike, ji bona te ra (di vê bûyerê da) tu pişk tune ye. Bi rastî îdî ewan cewrkar in.

129; Hemûşk tiştên di ezman û zemîn da heyî ji bona Yezdan ra nin. Yezdan kîjanî bivê ewî dibaxişîne û (ji bona kî ra jî şapatê bivê) ewî şapat dike. Yezdan baxişkarê dilovîn e.

130; Gelî ewanê bawer kirine! Hûn (malê hev di nava hev da) bi serdapayî (ribatî) bi peyweste nexun. (Hûn serdapatî bi peywestî nexun, bi vî awayî îdî ji yekê, ya jî di cara yekem da heya care bê paşî hemûşk nexun). Û hûn yezdanparisî bikin bi rastî hêvî heye ku hûn fereste bibin.

131; Û hûn (gelî bawergeran!) xwe ji wî agirê, ku ji bona filan ra hatiye amadekirinê biparisînin.

132; Û hûn (gelî bawergeran!) bi gotina Yezdan û Pêxember bikin, bi rastî hêvî heye ku hûn bêne dilovîn kirinê.

133; Û hûn (gelî bawergeran!) li bal baxişandina ji Xwedayê xwe da û li bal wê bihiştê, ku firetiya wê wekî ezman û zemîn e, ku ewa jî ji bona xwedaparisan hatiye

amadekirinê, lez bikin.

134; Ewan (xwedaparis) ew in, ku di tengasî û firaqetîyê da malê xwe ji bona hewcan ra disixurînin û di gava hêrs hatinê da jî hêrsa xwe digirin û sikatîyên merivan dibaxişînin. Û Yezdan jî şixwa ji qencîkaran hez dike.

135; Ewan xwedaparisan di gava kirinek e maştîqî kiribin û ya jî li xwe cevr kiribin, îdî hema Yezdan bîra xwe tînin û lavaya baxişandina gunehên xwe dikin. Û jî pêştirê Yezdan kîjan gunehan dibaxişîne? Ewan li ser wan kirinê xwe jî bi zanîn încê bi peywestî nakin.

136; (Ji bona) vanan, xelata wan ji Xwedayê wan baxişandin û bihiştên, ku dibinê wan da çem dikişin heye. Ewanan di wan bihiştan da jî hermanok in. Çi qa qence, xelata karkerê qencîyan!

137; (Gelî bawergeran!) Bi sond! Di berya we da hinek rê û rêçik û biryar hatine, borîne. Îdî hûn di zemîn da bigerin, ka paşîya wanê vir dikiribûne, ça bûye?

138; Eva (Qur'ana bi wan beratên borî va) ji bona hemû merivan huzwartine û ji bona xwedaparisan beled û şîretek e.

139; Û hûn (gelî bawergeran!) sist ne bin û murûzê xwe nekin, heke we bi rastî bawer kiribe bi rastî hûnê bi serfirazî ewan sernegûn bikin.

140; Heke birîndaryek (di qirîna Uhudê da) bi we girtibe, bi rastî birîndaryek e wekî wê (di qirîna Bedrê da) bi wî komalî girtibû. Û evan royanin em di nava merivan da dixne dor, ji bo ku Yezdan ewanê bi rastî bawer kiribin bizane û ji we şahidan bigire. Bi rastî Yezdan ji cevrkaran hez nake.

141; Û ji bo ku Yezdan ewanê bawer kirine (ji gunehan) bi malîne û (Yezdan) ewanê file jî (bi gunehên wan va) biherçiqîne.

142; Qey hûn goman dikin, ku hûnê herne bihiştê Yezdan jî qe bi wan merivên ji we ne, ku di rêya Yezdan da tekoşîn kiribin û bi wan merivên ji we ne, ku di hembere aşîtan da hew kiribin, nizanbe?

143; Û bi sond! Di gava hêj hûn rastî mirine ne hatibûn, we dilxwazîya mirinê dikirin. Îdî bi rastî we mirin dît hûn zoq mane lê mêze dikin.

144; Û Muhemmed! Hey pêxemberêk e, di berêya wî da pêxember hatine çûne. Qey di gava (Muhemmed) bimire, ya jî bê kuştine, hûnê para da bizivirin? Îdî kîjan para da bizivire ewa tu zîyanê nade Yezdan. Bi rastî Yazdanê sipaskaran xelat bike.

145; Bê destûra Yezdan tu kes namire! Û kîjan qencên cîhanê bivê, emê ji wan qencên cîhanê bidine wî û kîjan jî qencên dan û gavê para da bivê, emê ji wan qencên danê para da bidine wî. Û bi rastî emê sipaskaran xelat bikin.

146; Çi qas pêxember hebûne, ku pîr zanan jî bi wan (pêxemberan va) di hemberê neyaran da qirîn kirine. Ewanan (bi sedema wan tiştên, ku di rêya Yezdan da hatiye serê wan), îdî sist ne bêne bê hêz û pintî û stûxwarî nekirine. Şixwa Yezdan bi xweber jî ji hevkeran hez dike.

147; Axiftina wan zanan hey eva bûye û gotine: "Xwedayê me! Tu ji bona me ra gunehên me û ewan dest belavîne me bibaxişîne û (Xweda! Tu) pê me di hemberê neyaran da bi cî bike û tu arîkarêya me li ser komalê file bike."

148; Îdî Yezdan ji wan ra qencên cîhanî û tîtalê qencên dan û gavê para da daye. Şixwa Yezdan bi xweber jî ji qencîkaran hez dike.

149; Gelî bawergeran! Heke hûn bi gotinên wanê file bikin, ewan filanê wê we para da bizivirînin, îdî hûnê bibine ji wanê zîyankar.

150; Na, (hûn bi gotina wan nekin) lê hûn bi gotina Yezdanê serkarê xwe bikin. Ewa Yezdana qencê arîkara ne.

151; Bi rastî emî bi sedema wan tiştên, ku filan ewan tiştan dixistine hevrî ji bona Yezdan ra, qe tu hêz û berate ji bona hevrîtîya wan ra ne hatibûye hinartinê jî, tirsê bavêjine dilê wan (filan) û ewra wan (filan) agir e. Şûnwarê cevrkaran çi qasîk e!

152; Bi sond! Di gava we neyarên xwe bi destûra Yezdan (xistibûne pêşîya xwe) dişkênandin, hûr dikirin. Yezdan ewa peymana xweyê, ku (bi servahatina we) dabû, pêk aniye. Lê ji piştî ku Yezdan ewa servehatine we ji hezdikirin bi we dabû xûyandinê, divê gavê da hûn rabûn ji hev belav bûn; we di mafê bûyerê da bi hev ra tekoşîn dikirin û we (guhdarêya fermana kesî nekir) hûn di hemberê wan fermana da dihatin; hineka ji we cîhan divan û hinekên ji we jî dan û gavê para divan. Paşê Yezdan hûn ji wan neyaran dane zivirandinê (hûn ji ber neyaran para da revîyan). ji bo ku Yezdan we biciribîne eva bûyera hanê bi serê we da aniye. Û bi sond! (ji

piştî poşmaniya we, ji wan kirine we) Yezdan hûn baxişandine. Şixwa Yezdan ji bona bawergeran xweyê rûmeta tîtal e.

153; Di wê gava, ku hûn para da direvîyan hûn ne dizivirîn we li tu kesî mêze ne fikir û pêxember jî gazî we fikir, ji bo ku hûn li pey xwe da bizivirin, îdî ji bo ku hûn li ser wan tiştên borî û ji bona wî tiştê bi serê we da hatiye, murûz nebin Yezdan kovan bi ser kovan bi we da anî. Şixwa Yezdan bi xweber jî bi wan tiştên ku hûn dikin agahdar e.

154; Paşê Yezdan li ser we da ji piştî kovan, ewletîyek e wusa hinartîye, ku destekî ji we dihênîjin; haja wan (îdî ji qirînê ne mabûye) û destek jî îdî ketibûne derdê xwe; ewanan bê mafî wekî gomana nezanan ji Yezdan goman dikirin, digotin: "Qe ji bona me ra jî di vê bûyera (qirînê da) ramanek heye?" (Muhemmed! tu ji bona wan ra aha) bêje: "Şixwa bûyera qirîne hemûşk jî ramana Yezdan e." Ewanan ji bona te ra ewê tiştê ku di singe xwe da vedişêrin venakin, ewanan dibêjin: "Heke ji bona me ra (ji qirînê) ramanek hebûya, em di vira da ne dihatine kuştinê." (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Heke hûn di xaniyên xwe da bûna jî, dîsa ewanê ku kuştina wan hatiye nivîsandinê, wê ji xaniyê xwe derketina bihatina şûna welgerandina xweyên hanê, bi hatina kuştine." Yezdan ji bo ku ewê tiştê di singê we da heyî biceribîne û ji bo ku dilê we parzin bike, tiştê di dilê we da heyî derxe, eva aşîta bi we da aniye. Şixwa Yezdan bi xweber jî bi tiştê di singa da heyî dizane.

155; Bi rastî ewanê ku di roya herdu komên neyar rastî hev hatine, hûn hiştine para da revîyane, hene! Bi sedema hinek kedên ku ewan kiribûne, pelîd pê wan şimitandiye, ewan ji rêya rast derxistiye. (Îdî ji piştî poşmaniya wan) bi rastî Yezdan ewan baxişandine. Bi rastî Yezdan baxîşkarê mulahîm e.

156; Gelî ewanê ku we bawer kiriye! Hûn jî wekî wan fileyên, ku ji bona birayên xweyên; gava di rêkî da çûbûnan, ya jî çûbûna qirînê, bi hatina kuştinê, ya jî bimîranan (aha) gotine: "Heke ewan li bal me bûnan, îdî ewan ne dimirîn û ne jî dihatin kuştinê" nebêjin. Yezdan ji bona ku di dilê wan da bixe kul û kovan, evê gotine hanê ewan dibêjin. Bi rastî Yezdan bi xweber e; dijît û dimirîne. Şixwa Yezdan bi xweber jî tiştê hûn dikin, dibîne.

157; Û bi rastî heke hûn di rêya Yezdan da bêne kuştinê, ya jî bimîrin (ji bona we ra) ewa baxişandina ji Yezdan û dilovaniye wî, ji wan tiştên (ku ewan di jîna cîhanê da) dicivînin, çêtir e.

158; Bi sond! Heke hûn bimîrin, ya jî bêne kuştinê hûnê hey li bal Yezdan da bêne civandinê.

159; Bi sedema dilovaniya ji Yezdan (ku dabû te) îdî (Muhemmed!) tu ji bona wan ra nerm bûyî. Û heke (Muhemmed! Tu merivekî dil) hişk bibûyaî, ewanê ji dora te biherikîyan (biçûnan). Îdî tu ewan (sikatîne wan) bibaxişîne û tu ji bona (baxişandina) gunehên wan lava bike. Û tu di bûyeran da, bi wan ra bîponije (muşawere bike). Lê di gava te cada tiştê kir, îdî tu xwe hispêre Yezdan. Bi rastî Yezdan ji histpêrekan hez dike.

160; Heke Yezdan arîkarîya we bike, îdî tu sernegûnî ji bona we ra tune ye. Û heke Yezdan we sernegûn bike, gelo ji piştî Yezdan, kesê arîkarîya we bike, heye? Gelî bawergeran! Îdî hûn xwe hispêrên Yezdan.

161; Babetê tu pêxemberî nîne, ku bi dexelî (malê şorê veşêre û di ewletîya xwe da dexelî bike) û kîjan dexelîyan bike (malê şorê veşêre) di roya rabûna hemûtî da ewa meriva bi dexelîya xwe va tê civînê. Paşê ji bona hemûşkan ra jî keda ewan kiriye bê cevrkirin ji wan ra tê dayînê.

162; Qe ewanê dibîne peyrewê qayilbûna Yezdan wekî wanê, ku rastê xeşma Yezdan hatine, dibin? Şûna evê ku rastê xeşma Yezdan hatiye, doj e. Doj çi qa şûnek e sike!

163; (Na, ewan wekî hev nabin) ewanan li bal Yezdan parpar in. Şixwa Yezdan bi xwaber jî tiştê ewan dikin, dibîne.

164; Bi sond! Ji ber ku Yezdan di (nava bawergeran da) ji wan pêxemberek şandiye ewa (pêxembera jî ji bona wan bawergeran) beratên Yezdan dixune û, ewan ji gunehan paqij dike û ewan hîne xwendina pirtuk û zanîna retkokî dike, bi wan bawergeran qencî kiriye. Û lê ewan (bawergeran) di berê da di rê wundabûnek e xûya da bûne!

165; Qey, di gava ku bi we da (di qirîna Uhûdê da heftê meriv ji we hatiye kuştinê) aşîtek hatiye, we bi xweber jî ducarî wê aşîta bi we da hatî, bi wan da aşît aniye

(di qirîna Bedrê da we heftê mêrê wan kuştibû ê heftê jî zebûn kiribûn) hûn dibêjin: "(gava Xweda û Pêxember bi me ra nin) ka eva aşîta hanê ji kur da bi serê me da hat?" (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Ewa aşîta ji we, bi we da hatiye." Bi rastî Yezdan li ser hemû tiştan bi hêz e.

166; Û çî tiştê di roya herdu deste rastî hev hatine, li serê we da hatiye: ewa hey bi destûra Yezdan bûye. Ji bona ewa bi bawergeran bizane (ku temtêla wan hey hewdan e).

167; Û ji bo ku ewa bi wanê durû jî bizane (ka temtêla wan çîye). Ji bona wanê durûtî dikin, tê gotinê: "Hûn werin di rêya Yezdan da qirîn bikin, ya jî parisvanî bikin." Ewan (aha) gotine: "Heke me bi qirînê bizaniya, ya jî me bizaniya we qirînekî çê be, bi rastî emê bibûna peyrewên we." Ewan di wê royê da ji bawerîyê pirtir, nêzikê bal filetiyê bûne. Ewan bi devê xwe, tiştê qe di dilê wan da tune ye dibêjin. Yezdan bi tiştê ku ewan vedişerin, ji wan çêtir dizane.

168; Ewan rûniştine û ji bona biranê xwe ra jî (aha) gotine: "Heke ewan biranê me bi gotina me bikirinan, ewan ne dihatine kuştinê." (Muhemmed! Tu ji bona wan ra) bêje: "Heke hûn di gotina xwe da rast in, îdî hûn mirinê ji xwe bidin paradanê."

169; Û hûn goman nekin, ku ewan merivên di rêya Yezdan da hatine kuştinê, mirîne, lê ewan dijîn, li bal Xwedayê xwe jî tene rozî dayîne.

170; Ewanan bi wan qencên, ku Yezdan ji rûmeta xwe daye wan şadoke ne. Ewanan ji bona wanê ku li pey wan mane hêj ne gihîştine wan, mizgînî didin, ku bi rastî li ser wan tu tirsê (şapatdanê) û murûziya (ji kêr xelatîyê) tune ye.

171; Ewanan bi wan qencî û rûmetê ji Yezdan, ku ji wan ra hatiye şa dibin û mizgînê didin, ku bi rastî Yezdan kirya bawergeran wunda nake.

172; Ewan (bawergeran ew kesên) ku ji piştî (di qirînê da) birîndar bûne jî, ji bona Yezdan û pêxember ra pisyar dane (gava pêxember ewan gazî li bal peyçûna Qureyşîyan kirine, ewan heftê hevalên birîndar, rabûne bi Pêxember ra dane pey Qureyşîyan, ji piştî qirîna bi nav Uhûdê, navê vê qirînê Hamray Esed bûye). Hêj ji bona wan kesên ji wan, ku qencî kirine û xwedaparizî kirine kirênên mezin hene.

173; Ewan (bawergeran ew kesên) ku gava merivan ji bona wan ra gotine: "Bi rastî merivên (neyarên we) civiyane ji bona, bi we ra qirîn bikin, îdî hûn jî ji wan bitirsîn." Evê mijûliya hanê, bawerîya wan pir kirîye, ewan (aha jî) gotine: "Yezdan besî me ye û Yezdan çî serkarekî qenc e!

174; Îdî ewanê bawer kirine para da bi qencî û bi rûmeta ji Yezdan fetilîne qe tu sikatî jî bi wan da ne hatiye (ewanan hêj di kirîn û firotanan da kar kirine). Ewan bûne peyrewê qayîlbûna ji Yezdan. Şixwa Yezdan bi xweber jî xweyê rûmetek e mezin e.

175; Bi rastî ewan tirsdanê hanênan ji pelîd in. Pelîd we bi dostên xwe, dide tirsandinê. Îdî heke we bi rastî bawer kiribe hûn ji wan netirsîn, hey ji min bitirsîn.

176; Û bira ewa berhevdana wan ji bona filetiyê (ka kîjan ji wan ji bona filetiyê zûtir xebatê dike) te nede mirûz kirinê. Bi rastî ewana qe bi tu tiştî zîyanê nadine Yezdan. Yezdan divê ku ji bona wan ra di dan û gavê para da tu paran nede û ji bona wan ra şapatek e mezin heye.

177; Bi rastî ewanê fileti, bi bawerîyê kirîne hene! Ewanên bi tu tiştî zîyana Yezdan nakin û ji bona wan ra şapatek e dilsoz heye.

178; Û bira ewanê bûne file goman nekin, ku me ji bona wan ra bên daye (şapatdana wan hinekî para daye) eva bêndana hanê ji bona wan ra qenc e. Em ji bona wan ra bên didin, ji bo ku ewan hêj gunehan pir bikin û ji bona wan ra şapatek e sernegûnî heye.

179; (Muhemmed!) Yezdan bawergeran li ser vê temtêla hûn têda nin, nahêle. Ji bona ku qencan ji xiraban parzin bike (Yezdan sedemên wusa diafirîne qe haja we pê tune ye). Û Yezdan we hemûşkan agahdarî li ser wan tiştên ne berçavî, nake. Lê Yezdan ji pêxemberên xwe ji bona kîjanî ra bivê ewî agahdarê li ser wan tiştên ne berçavî, dike. Îdî hûn bi Yezdan û bi pêxemberên wî bawer bikin. Û hûn heke bawer bikin û xwe parisandina (ji gunehan bikin) îdî ji bona we ra karek e mezin heye.

180; Û bira ewanê di wan tiştên, ku Yezdan ji rûmeta xwe ji bona wan ra daye timatiye dikin, goman nekin ku eva malê (mîratê) ji bona wan ra qencî ye, lê ewa mala ji bona wan ra xirabî ye. Di roya rabûna hemû da ewanê bi wê tiştê, ku ewan bi wî dexesî dikirin wê bîne xelêfkirinê. Û şixwe mîrata ezman û zemîn hey ji bona

Yezdan ra ne. Yezdan bi xweber jî bi tiştê ku hûn dikin agahdar e.

181; Bi sond! Yezdan gotina wanê, ku gotibûne: "Bi rastî Yezdan xezan e û em bi xweber jî zengîn in," bihistîye. Bi rastî ewa tiştê ku wan gotibûye û kuştina pêxemberan, ku ewan bê mafî pêxember dikuştin, emê binivîsin û emê ji wan ra bejin: "Ka îdî hûn şapata şewitok çeşne bikin."

182; Eva (şapata hanê) bi sedema wan tiştên ku destê we di berê da kiribûye (ji bona xwe ra bi pêşkoçî şandiye, bi serê we da hatiye." Heke wusa nebe) şixwa bi rastî Yezdan ji bona bendan ra cevrkar nîne.

183; Ewan ew meriv in, ku gotine: "Bi rastî Yezdan ji bona me ra peyman daye, ku em bi tu pêxemberi bawer nekin, heya ewa pêxembera ji bona me ra ewê gorîya (qurban) ku agir ewê bixwe, neyne." (Muhemmed! tu ji wan ra) beje: "Bi sond! Ewan pêxemberên berya min da, beratên daveker û ewa gotina waye hanê ji bona we ra anîbûn, heke hûn di gotina xwe da rast in, îdî we çima ewan pêxemberan kuştibûn?"

184; Îdî heke ewan (Muhemmed! Te bi van dozên hanêvan) bidnie derewdêrandinê, bi sond! Ewan pêxemberên berya te da jî ku bi beratên daveker va û bi wan rûperên retkokî û bi wan pirtûkên ronahîger va hatibûne, dîsa hatine derewdêrandinê.

185; Hemû candarê we mirinê çeşne bikin. Û bi rastî kirya weyê di roya rabûna hemûtî da bê kemayî wê ji bona we ra bê dayînê. Îdî kîjan ji agir bê dîrxistinê di bihiştê da bê xistinê, bi sond! Îdî ewa fereste bûye. Û jîna cîhanê şixwa ji pêştirî xemla xapanokan tu tişt nîne.

186; Bi sond! Hûnê di mal û canê xwe da bêne ceribandî û hûnê ji wan merivên berîya xwe da, ku ji wan ra pirtûk hatiye dayînê û ji wan merivên, ku hevriyan çê dikin, pîr axiftine rexne bibihên. Heke hûn di hemberê wan da hew bikin, û hûn xwe parisiya ji gunehan bikin, îdî hûn (bizanin!) bi rastî ewan bûyerên (ku kirina wan) hêca ne hene! Evan ji wan in.

187; Û di gavekî da Yezdan ji wanê, ku ji wan ra pirtûk hatiye dayînê peyman hildabûye; bi rastî hûnê ewê pirtûkê ji bona merivan ra bi vekirî bêjin û hûn ewê pirtûkê venaşêrin. (Lê ewan ewa peymana dabûne Yezdan pêk ne anîbûne) ewan, ewa peymana avêtibûne piştê xwe. Îdî ewan, ewa peymana bi pereki hindik firotine. Çika sike tiştê ewan firotine!

188; Ewan merivên, ku bi mal û bi wan tiştên ji wan ra hatiye dayînê dilşa dibin û ewan hez dikin ku pesnê wan, bi wan tiştên qe ewan ne kiribin jî bê dayînê, hene! (Muhemmed) tu goman neke ku ewanê, wê ji şapatan fereste bibin: Ji bona wan ra şapatek e dilsoz heye!

189; Û seroktî û maldarîya ezman û zemîn ji bona Yezdan ra ne. Şixwa Yezdan bi xweber jî li ser hemû tiştan bi hêz e.

190; Bi rastî di aferandîna ezman û zemîn da û di ne wekhevîyê şev û royan da (di kurtayî û di dirêjaya wan da; yek ji wan kurt dibe ya dinê dirêj dibe) ji bona xweyê hişan berate hene.

191; Xweyê hiş ew in, ku li pîya û li rûniştî û li ser kêlekê xwe dirêj kirî, Yezdan tînine bîra xwe û ewan xweyê hişan di aferandîna ezman û zemîn da, bi ramanî diponijîn (dibêjin): "Xwedayê me! Te evan bi pûçî ne aferandîne. Em te ji kêmaîyan û (ji aferandîna pûç) paqij dikin, îdî tu me ji şapata agir biparisîne"

192; Xwedayê me! Bi rastî tu kîjanî bixî agir, îdî bi sond! Te ewa ruswa kiriye. Û ji bona cevrkaran ra qe tu arîkarî tune ye.

193; Xwedayê me! Bi rastî me bihistîye, ku yek ji bona bawerkirinê gazî dike (û dibêje): "Hûn bi Xwedayê xwe bawer bikin." Îdî me jî heman bawer kiriye. Xwedayê me! Îdî tu ji bona me ra gunehên me bibexişîne û tu sikatîne me, ji me rake û tu can û (xelatên me bi) wanên qencîkar ra bide û bistîne."

194; Xwedayê me! Te çi ji bona me ra, li pêxemberên xwe da peyman daye, îdî tu ewî ji bona me ra bide û tu di roya rabûna hemûtî da me ruswa neke. Bi rastî tu ji peymana xweyê dayî poşman nabî.

195; Îdî Xwedayê wan ji bona wan ra pisyar daye (gotiye): "Bi rastî ez keda tu kesê kedkarên ji we, çi mîr û çi jin be, wunda nakim. Hûn (gelî kesan! Hemû jî) ji hev in." Îdî ewan merivên ku koç kirine û ji welatê wan ewan hatine derxistinê û ewanê di rêya min da hatine cefadanê û qirîn kirine û bi wan ra qirîn hatiye kirinê, hene! Bi rastî ezê ji wan, sikatîne wan rakim û ezê ewanan bixime wan bihiştên, ku di binê wan da çem dikişin. (Eva xelata hanê) hey qencîyek e ji Yezdanê (ji wan ra tê dayîne). Şixwe li bal Yezdan bi xweber jî rindê qencîyan heye.



196; Gera wan filan bi xweşî, di welat û bajaran da bira te nexapîne.

197; Eva bengal wan, jînek e hindik e. Êwra wanê paşîyê doj e. (Ewa doja) çi qa hêlanek e sike!

198; Lê ewanê parîsiya Xwedayê xwe kirine, hene! Ji bona wan ra ewa bihişt, ku di binê wê da çem dikişin heye. Ewanan di wê bihiştê da hermanok in. Ewanan li bal Yezdan tene mexzûvan kirinê. Û çi tişt li bal Yezdan heye, ewa ji bona qencikaran ra çêtir e.

199; Û bi rastî destekî ji xweyê pirtûkan hene, ku bi Yezdan bawer dikan û bi wê (pirtûka) li bal we da hatiye hinartinê û bi wan (biryarên) li bal wan da hatine hinartinê, bawer dikan. Ewanan ji bona Yezdan xwe bi tirs nişîv dikan, ewanan beratên Yezdan bi pereki bindik nafirosin. Eva desta bi van salixan hene! Ji bona wan ra li bal Xwedayê wan xelat û kirêya wan heye. Bi rastî Yezdan hijmaran zû dike.

200; Gelî ewanê ku we bawer kiriye! Hûn hew bikin û hûn ji neyarên xwe pirtir hew bikin û hûn di hemberê neyaran da bi hevra bin û hûn Yezdan parisi bikin. Bi rastî hêvî heye ku hûn bi vî awayî fereste bin.

#### Chapter 4 (Sura 4)

1; Gelî kesan! Hûn parisaya wî Xudayî xweyî ku ewî hûn ji canekî bi tenê aferandine, bikin. (Ewî Xudayê ji wî canî) zoya wî jî afirandiyê û ji wan herdukan pir mêr û jin zayandiye. Û hûn parisaya wî Yezdanê ku hûn li ser navê wî tiştan ji hev dixazin (û hûn bi fermana wî) bendê pismamiyê di nava hev da napezîrinin, bikin. Bi rastî Yezdan li ser we da dîdevan e.

2; Û hûn malê sêwîyan ji bona wan ra bidin û hûn (ji malê wan sêwîyan) ewareyê xwe, di şûna qencê wan da neguhurin. Û hûn malê wan di nava malê xwe da nexun. Bi rastî ewa gonehekî mezin e.

3; Û heke hûn tirsîyan (ku hûn heke bi wan keçên sêwî ne, hûn serkarya wan dikan kevîn bibin) hûn di mafê wan da dadvanî nakin (îdî hûn bi wan ra kevîn bibin). Lê hûn bi wan jinên xweşa we diçin, ji bona we ra tîtal in bi wan ra kevîn bibin; du libî û sê libî û çar libî (kevîn bibin). Heke hûn tirsîyan, ku hûn (di nava wan da) dadvanî nakin, îdî hûn bi yek jineke bi tenê ra kevîn bibin, ya ji hûn bi wan qerewaşên bendenê xweyên, ku îdî ewan bi bendetî ketine destê we, kevîn bibin. Ji bo ku hûn ji rêya rast dernekebin, eva kevînbûna we bi vî awayî ji bona we ra çêtir e.

4; Û hûn mara jinan bi xwaşî bidine wan. Heke ewan jinan ji wê mara xwe, bi xweşî ji ber xwe da ji bona we ra bibaxişînin, îdî hûn ewê mara baxişandî bi givirî bixun.

5; Û hûn ewê malê xweyê, ku Yezdan sixurandina wê daye destê we, nedin efsanan. Hûn (bi kara) wê malî ewan efsanan bi xarin û vexarin xweyî bikin û hûn kincan li wan bikin û hûn ji bona wan ra mijûlînen qencî bejin.

6; Û hûn sêwîyan, ka ku gihîştine dane kavînbûnê. Ya hêj negihîştine, biceribînin. Îdî heke we, di wê gavê da ji wan "gihîjtin" goman kir, hûn heman malê wan ji wan ra bidin. Hûn malê wan ji tirs wê, ewanê mezin bin, wê malê xwe ji me bistînin. Heman bi lez, bi dest belavî nexun. Û kîjan (serkar) xezan be, îdî bila ewa di malê wan da tu sixurandinê neke. Û kîjan (serkar) xezan be, îdî bila ji wî malî wekî xûyê waletê ku têda dijî, bixwe. Îdî di gava we malê wan sêwîyan dane wan hûn ji bona, ku we malê wan sêwîyan daye wan, şahidan bigirin. Şixwa (ka we malê wan sêwîyan bi hemûtî daye yan jî ne daye) Yezdan ji bona hêjmara we, bi malê wan sêwîyan bes e.

7; Ji bona mêran ra ji wî malê, ku da û bav û pismamên wan li pey xwe da bi mîratî dihêlin, par hene. Û ji bona jinan ra jî ji wî malê, ku da û bav û pismamên wan li pey xwe da bi mîratî dihêlin, par hene. Eva (para hanê) hindik û piraya wê, parek e hijmarî (û) bi vê nevê ye.

8; Di gava parkirina mîratê da heke (ji pêştirê mîratxwaran) lêzimên mayî û sêwî û xezan, amade ye parkirinê bûn, îdî hûn ji wê mîratê ji bona van ra jî (bidin) bi wan bidine xwarinê û hûn ji bona wan ra mijûlînen qenc bejin.

9; Û ewanê, ku ditirsin heke li pey xwe da ûrtên bêwec bihêlin, wê li wê ûrta wan cewrê bê kirinê; (mafê wîyê wunda bibe) bira (ji mafê sêwîyan bitirse, destê xwe nede malê wan). Îdî bira ewan Yezdan parizî bikin û bira ewan gotinê rast (ji bona

sêwîyan ra) bêjin (ça ewan ji bona zarên xwe ra dibêjin).

10; Bi rastî ewanê ku malê sêwîyan bi cewrê dixun, hene! Ewanan hey zikê xwe tijî agir dikin. Şixwa ewananê di nêzik da li bal doja hilopîtîk da bêne kişandinê.

11; Yezdan, ji bona zarên weyên kurîn, di mafê mîrat parkirinê da; li we (aha) şîret dike: ji bona kuran wekî du parê jinan, par heye. Îdî heke mîratxur, xwurî jin bin û ewan ji dudu yan jî pirtir bin, ji bona wan jinan ra ji sê parê mîratê du par hene. Heke ewa jina mîratxur yek bi tenê be, îdî nivê malê mîratê mayî para wê jînikê ye. Heke mirî li pey xwe da bi tevê zarên xwe va da û bavê xwe jî hiştibe; ji şeş parê mîratê, ji bona her yekê ji da û bavê mirî ra par heye. Heke ji bona mirî ra zar tune bin; mîratxurê wî hey da û bavê wî ma bin, ji bona dayîka wî ra, ji malê mîratê ji sê paran, parek heye. Îdî heke xûşk û birayê mirî hebin, wê gavê ji bona dayîka mirî ra, ji malê mîratê şeş paran parek heye. Eva parên hanênan, ji piştî wan parên, ku mirî bi dayîna wan şîret kiriye û ji piştî deynê mirî ji malê mîratê derdikebe, paşê têne dayînê. Hûn nizanin, ka ji da û bavê we û ji zarên we, ji bona we ra kîjan bi qencî çêtir e. Evan parkirinên hanênan, parkirinê bi vê nevê ne, ji Yezdan e. Bi rastî Yezdan pir zanê bijejke ye.

12; Û ji bona we (mêran ra) nivê wî malê, ku jina weye mirî li pey xwe da mîrat hiştîye heye, heke ji bona wan jinan ra zarên wan tu nebim heke zarên wan jinan hebin; îdî ji bona we ra ji wî malê mîratê, ji çar paran parak heye, ji piştî wan parên, ku ewan bi dayîna wan şîret kirine û ji piştî wan deynê, ku li ser we hebûye bê dayînê. Û ji bona wan jinên, ku ewan li pey we da mane, ji wî malê mîrata weye hiştî, ji çar paran parek heye, heke ji piştî mirina we da, zarên we ne mabin. Îdî heke ji piştî mirina we da, ji bona we ra zarên we mabin, ji wî malê mîrata weye hiştî, ji piştî wan şîretên we ne, ku we bi dana wan kirîye û ji piştî deynê we, ji bona wan jinan ra ji heşt paran, parek heye. Û heke mirî mêr be û ya jin be (bê dûmda bin, ji wan ra ji bav û diya wan, tu ûrta wan ne mabe, ewan bi xweber jî bê dûmda bin ûrta wanê mayî ji diya wan) bira, ya jî xûşka wan hebe, îdî ji bona wan her yekê ra, ji piştî şîretên, ku mirî bi dana wan şîret kiriye û ji piştî deynê mirî, ji wî malê mîrata mayî derkebe; ji şeş paran parek heye. Îdî heke ewan (bira û xûşkên we ne ji diya we) ji duduyan pirtir bin ewanan hemûşk jî ji piştî şîretên, ku mirî bi dana wan şîret kiriye û ji piştî deynê mirî ji wî malê mîrata ma; derkebe, ji sê paran, parekî da hempar in. Eva parkirina hanê rast e. Heke şîret û deynê wî zîyanê nede para wan. Eva (parkirina) şîretek e bi vê nevê ye ji Yezdan hatiye kirinê. Û Yezdan zanakî mulahîm e.

13; Evan parkirin û şîretên hanênan biryarên Yezdan in. Û kîjan jî bi gotina Yezdan û Pêxemberê wî bike, îdî Yezdanê ewî bixe wê bihiştê, ku di binê (darê wê da) çem dikişin. Ewanê di w bihiştê da hemû gavan bimînin. Serfiraziya mezin eva ye.

14; Û kîjan bê gotina Yezdan û Pêxemberê wî û neyartîya biryarên wî bike (ji wan bibore) îdî Yezdanê ewî bixe agirekî wusa, ewayî di wî agirî da hemû gava bimîne. Û ji bona wî ra şapatek e riswabûyî heye.

15; Û ewan jinên weyên, ku maştîkirî kirine hene! (divê ku hûn ji bona kirina wan) çar şahidan ji xwe binin (ku ewan jinan maştîkirî kirine, bidine rast kirinê). Îdî heke ewan şahidan, şahidî dan (ku ewan jinan maştîkirî kirine) hûn ewan jinan îdî di xaniyan da bigirin, heya ku ewan jinan bimirin ya jî haya Yezdan ji bona wan jinan ra rêyek e mayî derxe.

16; Û ewan herduk (mêrikên) ji we (ku bi hev ra) qûndayî kirine hene! Heya ewan ji wê kirinê poşman bibin û aştîkarî bikin, hûn ji wan ra cefa bidin. Îdî heke ewan ji wê kirina xwe poşman bûn, hûn jî ji cefadana wan xwe bidine para da. Bi rastî Yezdan pir baxişgerê dilovîn e.

17; Bi rastî Yezdan poşmaniya wan merivên ku bi nezani karên sikî kirine, paşê di nezîk da, ji wan kirinê xwe poşman bûne, (baxişandina) wan hildaye ser xwe. Şixwa îdî ewan in, ku Yezdan poşmaniya wan litê dike. Û Yezdan zanakî bijejke ye.

18; Û ji bona wanê, ku karên sikatî dikin heya, ku gava yek ji wan amadeyî mirinê dibe; di wê gavê da gotîye: "A, di naha da ez ji wan kirinan poşman bûme." Û ji bona wanê, ku bi filetî dimirin poşmaniya wan ji gunehan tune ye (yanî poşmaniya wanên di wê gavê da nayê litê kirinê). Şixwa ewan in, ku me ji bona wan ra şapatek e dilsoz amade kirîye.

19; Gelî ewanê bawer kirine! Ne durist e ji bona we ra ku hûn bi kotekî bibin mîratxurên jinan. Heya ewan jinan tolîtiya ber çavî nekin, ji bo ku hûn hinekî ji

wî (malê mara wê) ji bona wan ra daye, (ewan jinan hinekî ji wî malî ji bona berdana xwe, ji bona we ra bibaxişînin), di para da bistînin hûn li wan zor nekin. Û hûn bi wan jinan ra bi qencî derbasîyî bikin. Îdî heke rikê we ji wan jinan tê (hûn hew bikin bi wan ra derbasîyî bikin) dibe ku ewa tiştê rikê we jê tê, Yezdan ji bona we ra di wan da qencên pîr çê bike.

20; Heke hûn bivên, ku hûn di şûna jina xwe da bi jinekê mayî ra kevîn bibin (yanî hûn jina xweye heyî berdîn bi jineke mayî ra kevîn bibin) we ji bona wê jina xweya cara yekem da bi barê (devan) mal dabe wan, hûn ji wî malî qe tu tiştî para da ji wan nestînin. Hûnê ewî malî ça (ji wan jinan) bi vir û bi gunehkarya ber çavî bistînin?

21; Ka hûnê ça ewî malî ji wan bistînin hûn bi xewber (bi jîn û bi mirin) tavê hev bûne? Ewan jinan jî (di gava kevîn bûne da) ji we peymaneke bi hez sitandibûne.

22; Û hûn bi wan jinên, ku bav û (bapîrên we) bi van ra kevîn bûne, kevîn nebin. Ewan kevînbûnên borî, şixwa borîne. Bi rastî eva kevînbûna (bi jina bav û bapîran ra) maştoqî û tiştêkî pîr sik e. Eva sikê rêya ne.

23; Li ser we (kevînbûna we) bi dayîkên we ra û bi keçên we ra û bi xûşkên we ra û bi metên we ra û bi xatîyên we ra û bi keçên birayên we ra û bi keçên xûşkên we ra û bi wan dayên weyên, ku şîr dabine we û bi xûşkên weyên ji şîr û bi dayên jinên we ra û bi wan mozîkên weyên di mala we da nin, ji wê jina weya ku hûn bi jinanî tevê we razabin, heke hûn bi jinanî tevê diya wan mozîkên xwe ranezabin şixwa îdî ji bona we ra tu qedexe tune ye, ku hûn bi wan mozîkên xwe ra kevîn bibin û bi jina kurên xweyên, heke ewan kuran ji dola we bin, hatine qedexekirinê. Û kevînbûna we bi du xûşkan bi hev ra jî (qedexe ye), ji pêştirê wan (kevînbûnê weyên borî) şixwa borîne. Bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

24; Û ewan jinên bi mêr hene! (kevînbûna bi wan jinan ra jî li ser we hatiye qedexekirinê) Ji pêştirê wan jinên (di gava qirînê da hatine zebunkirinê) ku ewan ketibin binê ewletîya we da mabin. (Ewan qedexe û biryarên borî) biryarên Yezdan in, li ser we bi vê nevê hatine nivîsandinê. Ji pêştirê vanê borî; heke hûn malê xwa bidin bi wan ra kevîn bibin, ji bo ku xwe ji tulîyê biparîsînin, ji bona we ra durist bûye. Îdî kîjan ji we bi malê xwe bi wan jinan ra heke (bi xweşî) kevîn bibin, hûn ji bona wan jinên (ku hûn bi malê xwe bi wan ra kevîn bûne) kirya wan (mara wan e) ku we di nava xwe da diyar kirîye, bidine wan (jinan). Ji piştî, ku we ewa mala di nava xwe da bi qayîlî diyar kiribe, îdî hûn (ji wî malê diyar kirî bi qayîlbûna we herdukan, heke) kêmbidine wan (jinan) ya jî li wî malî pirtir bidin wan jinan) tu zîyan li ser we tune ye. Bi rastî Yezdan zanakî bijejke ye.

25; Û kîjan ji we heke nikaribe bi malê xwe, bi jineke dawparês e rizgar e bawerger ra kevîn bibin, îdî bira ewa bi wan koleyên jinên (ku di qirînan da hatine zebunkirinê) ketine bine ewletîya we da mane, ku ji wan keçên weyên (bende ne) bawerger in, kevîn bibin. Û Yezdan bi bawerêya we çêtir dizane. Şixwa hûn bi xweber jî ji hev in (ji yek nişakîne hemûşk meriv in; îdî hûn çî kole bin, çî rizgar bin, di merivatîyê da yek in.) Îdî heke ewan (jinan) xwe ji tulîtiyê biparîsînin, hûn bi dustûra serkare wan jinên kole, bi wan ra kevîn bibin. Û hûn (ewî malê, ku we di nava hev da ji bona kirya wan, bi qayîlîya ji wan biryar kirîye) bi qencî bidin wan jinan. Heke ewan (jinan bi dizîka da) ji xwe ra bi destê tu kesekî negirin (ku bi wan ra tulîti bikin). Îdî heke ewan jinan ji piştê (vê mêrkirinê) dîsa tulîti kirin, celata wan nivê celata jinên rizgar in. Eva duristbûna kevîna bi wan jinên bende ra, ji bona wan mêrên rizgarên ji we ne ku ditirsin, heke bi wan ra kevîn nebin, wê maştoqîyê bikin, durist e. Û şixwa heke hûn (gelî mêrên bê malê xezan!) hew bikin (qe bi wan koleyên jin ra jî kavîn nebin) ji bona we ra ne kevînbûn çêtir e. Û Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

26; Yezdan (bi van biryar û rezikan) divê, ku ji bona we ra tiştê hûn pê nizanin, hîn bike û rêya wan (komelên) berya we da borîne, bide nişanê we û sikatîne we ji bona we ra bibaxişîne. Û Yezdan zana ye bijejke ye.

27; Û Yezdan (bi van biryaran) divê, ku gunehên we ji bona we ra bibaxişîne lê ewanê, ku dibin peyrewê hewasa xwe hene! Ewan divên, ku we bi xarîyeke mezin alîyê gunehan da xar bikin.

28; Ji ber ku meriv bêwec hatiye afirandinê; Yezdan divê (ku barê weyê ji biryaran heye) sivik bike.

29; Gelî ewanê ku bawer kirîye! Hûn malê hevdu di nava hev da bi sedemên pûç nexun.

Lê hûn (malê hev di nava hev da) bi kirîn û firotina bi qayîlbûna ji herdu , alîyên ji we (bixun). Û hûn bi xweber xwe bi ne duristî nekujin. Bi rastî Yezdan ji bona we ra dilovîn e.

30; Û kîjan (evan qedexan) bi neyartî û bi cewrî bike (bira ewa bizane!) bi rastî îdî emê ewî li bal agir da bikişînin. Û şapatdana hanê şixwa li ser Yezdan hesanî ye.

31; Heke hûn xwe ji gunehên mezinên, ku hûn ji bona ne kirina wan hatine fermankirinê biparisînin, emî sikatîyên we veşerin û emê we bixin şûneke dilxweş (ku di wura da hunê bêne mexzûvankirinê).

32; Û hûn dilxwazîya wî tiştê, ku Yezdan hinekên we li ser hinekên ji we, bi wan aborî kirîye, nekin (yanî xwezîka malê wî, ya jî para wî ji bona min ra bûya bi dilxwazî ne bêjin). Ji bona mêran ra ji keda ewan kirîye par heye û ji bona jinan ra jî ji keda ewan kirîye par heye. Û hûn ji Yezdan dilxwazîya (tiştan) ji abora wî bikin. Bi rastî Yezdan bi hemû tiştan dizane.

33; Û ji bona hemûşkan ra jî, me ji wî malê ku da û bav û pismaman li pey xwe da bi mîratî hiştine (parên ji mîratê) çê kirîye. Îdî hûn ji bona wanê, ku bi sondan we ji wan ra peymanî maldayîne daye para wan bidine wan. Bi rastî Yezdan li ser hemû tiştan nêhrevan e.

34; Bi sedema ku Yezdan bi abora xwe, hinekên merivan li ser hinekên wan rûmetdar kirîye û bi sedema ku (mêr) ji malê xwe sixurandinê dîkin, mêr li ser jinan bûne serkar. Îdî ewan jinên aşîkar ew in, ku bi gotina (mêrên xwe dîkin) bi dilê xwe va bi mêran ra girêdayîne û ewan jinan, parisya wan tiştên ku Yezdan fermana parisya wan kirîye (di ne amedîna mêrên xwe da jî, parisaya wan) dîkin . Lê ewan jinên, ku hûn ditirsîn ewanê b gotina mêran bikin hene! Îdî hûn li wan şîretan bikin (ji bo ku ewan bi gotina mêran bikin) û hûn di razana tevê wan da, ji wan raqetîne bikin (heke ewan bi van kirîne we ne hatine rê) îdî hûn li wan bixin (ji bo ku ewan werên rêya rast.) Îdî heke ewan jinan bi gotina we kirin, hûn ji bona cefadayîna wan li mana negerin. Bi rastî Yezdan bilindê mezin e.

35; Û heke hûn tirsîyan, ku we nîveka wan (jin û mêran) herdukan vebe (îdî ewan li hev nayên) hûn berewanekî ji malîne mîrikê û berewanekî jî ji malîne jinîkê bişîne (civîne). Heke bi rastî ewan herdu berewanan bivên, ku di nîveka wan herdu (jinîk û mîrikê) aşî bikin, Yezdanê aşîya wan herdukan pêk bîne. Bi rastî Yezdan zanayê agahdar e.

36; Û hûn hey ji bona Yezdan ra perestî bikin û hûn ji bona Yezdan ra (di perestî û perestevanîyê da) tu tiştî hevî çê nekin. Hûn ji bona da û bavên xwe, qencîyan bikin, hûn ji bona pismaman û sêwîyan û xezanan û ji bona cînarên pisman û cînarên, ku mala wan li kêleka mala we dane û ji bona hevalê ku li kêleka we dane (ya jî ji bona zoya xwe; heke mêr be ji bona jinîkê, heke jinîk be ji bona mêrê xwe) û ji bona rêwîyên rêyan û ji bona wan bendeyên (ku di qirînan da hatine zebunkirinê) ewan îdî ketine binê ewletîya we da mane, qencîyan bikin. Bi rastî Yezdan ji wanê xwe mezin zanên pesinvan hez nake.

37; Ewanê qure ne xwe mezinzan hene! Ewanan dexesî dîkin û ewan fermana kesan dîkin, ku ewan kesan jî dexesî bikin (qe tu tiştî ji bona tu merivî ra nedin). Ewan dexesan ewî tiştî ku Yezdan ji rûmeta xwe daye wan vedişêrin. Me bi xweber jî ji bona filan ra şapateke sernegûn amade kirîye.

38; Ewanê ku malê xwe bi rûmetî, ji bona merivan ra disixurînin hene! Ewan malê xwe disixurînin ji bona ku meriv bibînin, ewan bi Yezdan û bi dan û gavê para da jî bawer nakin. (Yezdan ji van hez nake ewan hevalê pelîd in) û pelîd ji bona kêra bibe heval, îdî ewa çîqa sikê hevala ne!

39; Û heke ewanan bi Yezdan bi dan û gavê para da bawer bikirinan û ewnan ji wê dilîka ku me ji bona wan ra daye, di rêya (Yezdan) da bisixurandinan, gelo wê ji bona wan ra çî bibûya? Şixwe Yezdan bi wan dizanibû.

40; Bi rastî Yezdan li tu kesî, wekî çirûskekî jî cewrê nake. Heke (meriv) wekî çirûskekî qencî kiribe (ji xwe Yezdan) ji wî ra ewê qencîya wî car bi car pir dike û Yezdan li bal xwe da ji wî ra xelateke mezin tîne.

41; Îdî di gava em ji bona her komekî ra dîdevanekî tînin û em te jî li ser vanan bi dîdevanî tînin, gelo wê temtêla wanê ça bibe?

42; Di wê royê da ewanê bûne file û ewanê di hemberê pêxemberan da serî bilind kirine, hene! ewan hez dîkin ku zemîn ewanan dabi ilîne. Ewan bi xwerber jî qe tu

axiftinê ji Yezdan penha nakin.

43; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn heya nizan bin ka hûn çi dibêjin, di gava nimêjê da, hûn bi mestî nimêj nekin û heke hûn serên pak bin û pêştirê di gava rêwîtiyê da, heya hûn xwe neşon, hên nimêj nekin. Û heke hûn nexweş bin (ku hûn nikarbin avê bixebitînin) ya jî hûn rêwîyê rêya bin (hûn rastê avê ne hatin) ya jî yek ji we ji qedemgehê hatibe (hûn çûbûne qedemgehê we destmêja xwe şikênandibe) ya jî ji yekê ji wan herduk qulukên we, ji peş û paşîya we da tişteke hatibe (destnimêja we hatibe şikênandinê) ya jî dest (we li bedena) jinan ketibe (di wan temtêlên borî da) hûn rastî avê ne hatibin, îdî hûn di şûna destnimêja bi avê, bi xwelyeke temîzê paqij destnimêj bigirin. Hûn bi wê xwelîyê, rûyê xwe û destê xwe mes bikin (xwelyê li wan bixin). Bi rastî Yezdan baxîşkar û veşartakê sikatîya ne.

44; Ma qey (Muhemmed!) tu li bal wan kesên ku ji bona wan ra pareke (ji zanîna pirtûkê) hatiye dayînê, mêze nakî? Ewanan rê wundabûnî dikirin Û ewanan divên ku hûn jî rê wunda bikin.

45; Û Yezdan bi neyarên we çêtir dizane. Şixw Yezdan ji bona serkarya we, besê we ye. Û Yezdan bi arîkarî jî şixwe bes e.

46; Ji wanê cihû (hinek hene aha dikin); Ewanan (rewşa te ye ku di pirtûka li bal wan da heyî) ji şûna wan peyvî diheşivînin û (aha jî) dibêjin: "Em (gotina te) dibihîsin lê em (bi gotina te) nakin", (ji hevra jî aha dibêjin:) "Tu gohdarya wî bike lê ji wî tu tiştî seh neke." Û ewanan ji bona tinaza bi "ol" a te bikin; zimanê xwe ji devê xwe derdixin, xaromaro dikin (dibêjin: "Tu) dêna xwe bide me." Û heke ewan bi rastî (aha) gotibûnan: "Me gotina te bihîst û em bi gotina te dikin, tu gohdarî bike û tu li me mêze bike." Wê ji bona wan ra çêtir bibûya û wê eva gotina bi hêztir bibûya. Lê Yezdan bi sedema filetiya wan li wan deherandin kirîye, îdî ji pêştirê hindikên wan. tu kes ji wan bawer nakin.

47; Gelî ewan kesên ku ji we ra pirtûk hatiye! Ewa (pirtûka) me hînantîye, ku ewa (pirtûka) bi xweber jî rastdarê ji bona we (pirtûka) bi we ra heyî, hêj di berya ku me rûyên we şop ne kirîye, îdî ewan rûyan di para da em dizivirînin wekî piştî stûyê wan rast dibin, û hêj bi berya ku emê ewan ji (derê xwe) bideherînin, ça me ewan (merivên) hevrîne Roya Şemîyê deherandine hûn bi wê bawer bikin. Û bi rastî fermanên Yezdan şixwe hatine kirinê.

48; Bi rastî Yezdan (gunehên) hevrîtiya (ku ji wî ra çê dikin) nabaxîşîne û ewa ji bona evîne xwe ra, ji pêştirê vî gunehî hemûşk gunehên mayî dibaxîşîne. Û bi rastî kîjan ji Yezdan ra hevrêyan bigire, bi sond! Ewî bi gunehêkî mezin, vireke mezin kirîye.

49; Ma qey (Muhemmed!) tu li bal wanê ku bi xweber xwe (ji gunehan) paqij dikin mêze nakî? (Ewan ça xwe paqij dikin! Gotina wan nîne). Lê Yezdan kîjanî bivê ewî ji gunehan paqij dike, qe li wan wekî taki jî cewr nayê kirinê.

50; (Muhemmed!) Tu li wan mêze bike û binhêre; ka ewan ça bi derewan viran li ser (navê) Yezdan dikin! Şixwa eva vira hene xuyayî, bi gunehî bes e.

51; Ma qey (Muhemmed!) tu nabînî? Ewan merivên ku ji bona wan ra pareke (ji zanîna) pirtûkê hatiye, ewanan bi sernegûniyê (put) û bi kotekîya (pelidan) bawer dikin. Ewan ji bona wanê bûne file ra jî dibêjin: "Ewan (pût û sernegûnî û kotekê pelîd) ji wanê ku bawer kirine; çêtir di rêya rast danin."

52; Ewanan in, ku Yezdan li wan deherandin kirîye û Yezdan li kîjanî deherandinê bike, îdî tu ji bona wî ra rastî tu arîkarî nayê.

53; Ya jî qey ji bona wan ra pareke ji seroktiyê heye? (Ewanan xwe bi wê qure dikin). Heke ji bona wan ra parek ji seroktiyê hebûya, îdî ewan di wê gavê da ji bona kesan ra qe takî jî nadin.

54; Ya jî qey ewan, ji ber ku Yezdan ji abora xwe ji bona kesan ra qencî kirîye, dexesî dikin? Bi sond! Me ji bona binemala Îbrahîm ra pirtûk û (zanîna) retkokî dabûye, îdî me ji bona wan ra maldarî û seroktiyeke mezin dabûye.

55; Îdî hinekan ji wan bi wî bawer kirine û hinekan ji wan jî ji wî rû fetilandine. Ji bona (celatdana wan) doja ku agirê wê hilopîtke besê wan e.

56; Ewanê ku bi beratên me fileti dikin hene! Bi rastî emê ewanan bixne agir. Çiqa çermê wan (ji şewatê) dipizire, ji bona ku ewan şapatê tam bikin, em ewî çermî bi hinek çermê mayî diguhurin. Bi rastî Yezdan servahatê bijejke ye.

57; Û ewanê ku bawer kirine û kare aşî kirine hene! Emê ewan jî bixne wan bihiştên, ku di binê (darê wan da) çem dikişin. Ewanê di wan bihiştan da tim

bimînin. Ji bona wan ra di wan bihiştan da zonên paqij hene. Û erê! Emê ewanan bixne binê) sîhên sîhwanok.

58; (Hûn bi zanin) bi rastî Yezdan fermana we dike, ku hûn ewan tiştên bi ewletî li bal we hatine danînê, bidne xweyê wan û hûn di gava berewanî di nava kesan da bikin hûn bi dadvanî berewanî bikin. Bi rastî Yezdan bi şîretên qenc çîqa şîretan li we dike! Bi rastî Yezdan bihîstkarê dîtoker ye.

59; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn bi gotina Yezdan bikin û hûn bi gotina pêxember û ewan (serokên) ji we ne, ku xweyê fermana we ne, bikin îdî heke hûn bi Yezdan û bi dan û gavê para da bawer dîkin di gava hûn ku di tişteki da tekoşinê bikin (hûn nizan bin ku ewa mafê kê ye) hûn temtêla wî tiştî (ji bona berewanîyê) li bal (biryarên) Yezdan û pêxember da beherin. Eva kirina we (ku hûn ewan bûyerên xwe ne, hûn pê nizanin, di binê bal biryarên Yezdan û pêxember) ji bona we ra çêtir e û paşîya wî jî qenc e biryar û berewana ne.

60; Ma qey (Muhemmed!) tu li bal wan merivên ku viran dîkin mêze nakî? Ewan (dibêjin): "Ku bi rastî ewanan bi wan biryarên (Qur'an)a li bal te da hatiye hinartinê bawer kirine û bi wan biryarên di berya te da jî hatiye hinartinê bawer kirine" û bi vî ra jî ewan divên, ku di bûyerên xwe da ji bona berewanîyê herin bal pelîd, ewan bi xweber jî hatibûne fermankirinê, ku ewan bi pelîd bawer nekin. Bi rastî pelîd divê ku ewan di wundabûneke dûr da wunda bike.

61; Û di gava ji wan ra bê gotinê: "Hûn (di gavê tekoşinan da ji bona berewanîyê) li bal wan biryarên, ku Yezdan hinartiye û li bal pêxember da werin." Tu ewanê durû dibînî, ku ewan ji te bi hemûtî dûr dikebin (ji te direvin).

62; Îdî di gava bi sedema wan kirinê wanê borî, aşîtek bi wan da tê, ewan paşê têne bal te, bi Yezdan sond dixun û dibêjin: "Me hey qencî û aşîtiya di nava wan da va ye." Gelo temtêla wan (wê gavê) ça dibe?

63; Evanê bi wan salixan in; ku Yezdan bi tiştê di dilê wan da heyî dizane. Îdî tu giza xwe ji wan bibire û tu li wan şîretan bike û tu ji bona wan ra mijûliyên nermne, ku (pozê wan) bi wê bişewite, bêje.

64; Me çîqa pêxemberek şandîye, hey ji bona ku bi dustûra Yezdan bi gotina wî bê kirinê, me şandibûye. Heke ewanan di gava bi xweber li xwe cewr kiribûne (paşê) hatibûna bal te, ji bo ku îdî ji Yezdan baxişandina (gunehên) xwe ra lava bikin û pêxember jî ji bona wan ra ji Yezdan ji bona baxişandina (gunehên) wan lava bikira, bi rastî ewanê rast bihatinan, ku Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

65; Wusa nîne; bi Xudayê te sond dixum! Heya ewanan di wan tekoşinên, ku di nava wan da reh daye, ji bona berewanîya te neynên li bal te, ku tu di nava wan da (bi dadî) berewanî bikî, paşê ewan ji wê berewanîya te kirî, di dilê xwe da jî qe tu xeyîdîn û du dilî jî xweyî nekin û heya ewan bi hemûtî xwe ne hisperên te, ewan nabine bawerger.

66; Û heke bi rastî me li ser wan binivîsiya, ku hûnê bi xweber xwe bikujin, ya jî hûnê ji welatê xwe derkebin, ji pêştirê hindikên ji wan, tu kesî ji wan ewan fermanên me pêk ne dianînan. Û heke ewan, evan şîretên ku li wan hatiye kirinê pêk bianînan, wê ji bona wan ra çêtir bibûya û wê ji bona paydarya wan zor binecî bibûya.

67; Di wê gavê da bi rastî meyê li bal xwe da ji bona wan ra xelateke mezin bianîya.

68; Û bi rastî meyê ewanan bianînan rêya rast.

69; (Şixwa wusa ne); kê bi gotina Yezdan û Pêxember bike, îdî ewa dibe hevalê wanê ku Yezdan bi wan qencî kirîye ji Pêxember û yaran û şehîd (kuştîyê rêyarast) û aşî karan. Ewanan çîqa hevalên qenc in!

70; Evan qencên (ku ji bona qencîkaran ra hatiye dayînê) ji Yezdan in. Û şixwa (heke) Yezdan bi wan qencîyan bizane bes e. (Bira ewanê mayî qe jî nizanbin)

71; Gelî ewanê ku we bawer kirîye hûn di hemberê neyaran da xwe amede bikin (civîn û tedarika qirîna bi neyaran ra pêk binin). Îdî hûn bi nijdewanî (deste û destê) ya jî hûn hemûşk bi hev ra êrişê beherin ser neyaran.

72; Û bi rastî ji we hinek hene, ku ewan dereng dikebin (çekê xwe dereng wêldigerin, para dikebin). Îdî ewa (mêze dîkin) heke bi we da aşîtek hatibe, ewa aha dibêje: "Bi sond! Yezdan bi min qencî kirîye, loma di qirînê da ez bi wan ra amade ne bûm."

73; Û heke ji rûmeta Yezdan qencîyek bi we da hatibe, tu dibê qe di nîveka we û wî

da tu hogirî tune bûye. Ewa aha dibêje: "Xwezîka ez jî (di parkirina vê şorê da) bi wan ra bûma, îdî ezê jî bi serfirazîyeke mezin va serfiraz bibûma."

74; Îdî ewanê, ku jîna dan û gavê para da bi jîna cihanê kirîne hene! Bira ewanan di rêya Yezdan da, qirîn bikin. Û kîjan di rêya Yezdan da qirînê bike; heke ewa îdî bê kuştinê, ya jî ewa bi servahatî serfiraz be (neyarê xwe sernegûn bike) emê ji bûna wî ra bi rastî kirê û xelatên mezin binin.

75; Û ji bona we ra çi bûye; ku hûn di rêya Yezdan da ji bona ferestîya wan kesên hatine bê hêzkirinê (zebûn bûne) ji mêr û jin û zarên ku (aha) lava dikin: "Xudayê me! Tu me ji vî gundê, ku gundînê wî cewrkar in derxe û tu ji bona me ra serkarekî ji bal xwe bişîne û tu ji bona me ra li bal xwe arîkarekî bişîne" qirînê nakin?

76; Ewanê bawer kirine hene! Ewanan di rêya Yezdan da qirînê dikin û ewanê bûne file jî; ewanan di rêya palîd da qirînê dikin. Îdî (gelî bawergeran!) hûn bi serkarên pelîd ra qirînê bikin. Bi rastî xaxê pelîd bê hêz bûye.

77; Ma qey te ewanê, ku ji wan ra hatiye gotine: "Hûn destê xwe (ji qirînê) bidin para û hûn nimêj bikin û baca malê xwe bidin" (bi vî ra jî dîsa ewan dest ji qirînê bernedidan) nedîtine? Îdî di gava qirîn li ser wan bi nivîsarî bi vê nevê bûye di wê gavê da destekî ji wan, ku ewa desta wekî tirsî jî Yezdan, ji merivan ditirsîyan û hêj ji merivan pirtir ditirsîyan, aha gotine: "Xudayê me! Te ji bona çi qirîn li ser me bi vê nevê nivîsiye? Ma qey çi dibû ku te can sitandina me heya gaveke nêzik para bida?" (Muhemmed! tu ji wan ra) bêje: "Jîna berxudarya cihanî hindik e û (Jîna berxudarya) di gav û danê para da, ji bona xudaparisan çêtir e. Li wan wekî takî dendikê jî nayê cewrkirinê."

78; Hûn li kur dibin bibin, heke hûn di bedenên girtî da bin jî, wê hey mirinê bigihîje we û heke qencîyek bi wan da hatibe, ewan dibêjin: "Eva qencîya ji Yezdan e." Û heke sikatîyek bi wan da hatibe, ewan dibêjin: "Eva sikatîya ji bal te (ji bê awîkiya te ye) bi me da hatiye." (Muhemmed! tu ji wan ra) bêje: "Hemûşk jî (qencî û sikatî) ji bal Yezdan in." Îdî gelo ji bona vî komalî ra çi bûye, ku navên şîretan bibêhên?

79; Çi tiştê ji qencîyan bi te da were, ewa (qencîya) ji Yezdan e û çi tiştê ji sikatîyan bi serê te da hatibe, îdî ewa (bi sedema gunehên te kirî) bi te da hatiye. Û ji bona, ku me (Muhemmed!) tu bi pêxemberî ji bona kesan ra şandiyî, Yezdan besê şahîdiyî ye.

80; Kîjan bi gotina pêxember bike, îdî (bira ewa bizane) ku ewî bi gotina Yezdan jî kirîye û kîjan ji pêxember rû bifetilîne, îdî (bira ewa jî bizane!) ku me (Muhemmed!) te li ser wan da parisvan ne şandiyî.

81; Ewanan (ji bona te ra) dibêjin: "Fermana te (li ser çevê me) emê bi gotina te bikin." Îdî di gava ku ewan ji bal te derdikebin, destekî ji wan di şevê da ji pêştirê wan gotine, ku te ji wan ra gotîne (di nava xwe da) hinek gotinê mayî dihûnin. (Qe tişteke nabe!) Yezdan ewan tiştê ku ewan dihûnin, dinivîse. Îdî (Muhemmed!) tu dest ji wan berde û tu xwe hêspire Yezdan û şixwa Yezdan bi serkarî bes e.

82; (Gelo) qe ewan (di arş û peyvê) Qur'anê da naponijin? Heke Qur'an ji bal pêştirê Yezdan (hatibûya) wê ewanê di Qur'anê da rastê pir tiştê ne wekhev hatibûnan.

83; Û di gava ku ji wan ra bûyerek, ji ewletiyê (ku bawerger serva hatine, file para da revîne) ya jî ji tirsê (ku file bi serva hatine, bawerger para da revîyane) hatibe, heman ewan (durûyan) ewê bûyerê belav dikin. Û heke ewan, ewa bûyera bi birana li bal Pêxember (ji wî pirs bikirinan) ya jî ewan ewa bûyera bibirina li bal wan serokên xweyên, ku fermandarê wan in (ji wan bipirsîyan) wê ewê, ku ewanan jî wî rastîya bûyeran hîn dibin, rastîya wê bûyerê bizaniya. Û heke rûmet û dilovanîya Yezdan e, ku li ser we heye ne bûya, ji pêştirê hindikên ji we, hûnê hemûşk bibûna peyrewê pelîd.

84; Îdî (Muhemmed!) tu di rêya Yezdan da qirînê bike, tu hey (ji kirinê xwe) têyî pirs kirine. Û tu helana bide bawergeran, bi rastî goman heye, ku Yezdan tirsî wanê bûne file, ji we bide paradanê. Û Yezdan bi xweber jî zor êrişê û zor sernegûnvan e.

85; Û kîjan mehderyeke qencî bike, ji bona wî ra di wê mehderyê da pareke wî heye û kîjan mehderyeke sikatî bike, ji bona wî ra di wê mehderyê da gerewa wî heye. Yezdan bi xweber jî li ser hemû tiştan dîdevan e (hemberya wan dide).

86; Û di gava hûn (bi jîn danan) hatine selam danê; îdî hûn bi rindê (jîn danan) selaman bidin, ya jî hûn jî wekî wê selamê, selamê bidin. Bi rastî Yezdan li ser hemû tiştan hêjmarkarvan e.

87; Yezdan ew e, ku ji pêştirê wî tu yezdanê (babatê perestîyê) tune ye. Di wê roya rabûna hemû da, ku tu dudilî têda tune ye, ewa Yezdanê we hemûşkan bicivîne. Û gelo ji Yezdan kê rast goyîtir heye?

88; Îdî ka hûn ji bo çi di mafê durûyan da bûne dû deste? Şixwa Yezdan ewan bi sedama keda ewan kirî, paşopê kirine. Qey hûn divên, ku hûn ewan kesên Yezdan ewan ji rêya rast wunda kirine dîsa bîne rêya rast? Û Yezdan kîjanî ji rêya rast wunda bike, îdî tu ji bona wî ra qe tu rêyan nabînî.

89; Ewan hez kiribûn, ku hûn jî filetî bikini ça ewan filetî kiribûne, îdî ku hûn bibin wekî hev. Heya ewan di rêya Yezdan da ji welatê xwe koç nekin, îdî hûn ji wan ji xwe ra serkar û dostan negirin. Heke ewan ji koçkirinê rû fetilandin (ji welat derneketin) hûn bi çi awayî li kur, ça rastî wan hatin, îdî hûn ewan bigirin û hûn bi wan ra qirînê (bi kuştinê ve jî bikin). Û hûn ji wan qe tu serkar û dostan û qe tu arîkarekî jî negirin.

90; Jî pêştirê wan kesên, ku xwe avêtine ber bextê wî komalê, ku di nîveka we û wan da peyman hebe (hûn dest nedine van). Û (pêştirê) wan kesên ku hatine xwe avêtine ber bextê we, ji qirîna bi we ra ya jî qirîna bi komalê xwe ra bê zar bûne, singê wan teng bûye (hûn dest nedine van jî). Heke Yezdan bi va, wê Yezdanê ewanan bi ser we da bi hêz bikirinan, îdî ewanê bikariyan bi we ra qirînê bikin. Heke ewanan (ji qirîna bi we ra) dest berdan (îdî ewan bi we ra qirîn ne kirin) û ewan hevhatin ji bona we ra şandin (deste dostîyê dirêjê bal we da kirin); îdî Yezdan ji bona we ra, ku hûn bi wan ra qirînê bikin, tu rê nade.

91; Hûnê rastî desta mayî jî werin, ku ewa desta divên ji we û ji komalê xwe jî ewle bin. (Lê) ewanan çiqa ji bona tevdanê têne gazîkirinê, ewanan di nava tevdanîyê da qulopanî davêjin. Îdî heke ewanan bi rastî dest (ji qirîna bi we ra) bernedin û ku ewan hevhatinê ji bona we ra neşînin û destê xwe ji we nedine para da, hûn li kur bi çi awayê, ça we bi wan qedandin, îdî hûn ewanan bigirin; bi wan ra (bi tekoşînî) qirînê bikin. Û evan in, me ji bona we ra dustûra xuyayê daye; ku hûn êrişê beherin ser wan.

92; Û ji bona bawergerekî ji xêncî xeletîyê, kuştina bawergerekî mayî qe durist nîne. Û kîjan (bawerger) bawergerekî mayî bi xeletî bikuje, îdî (celata wî ev e:) Gotî bendekî bawerger azad bike û gotî ji bona mîratxurên kuştî ra xûn bide, ji xêncî heke mîratxurên kuştî ewê xûnê bibaxişîne kujraw. Û heke ewa (kuştîyê bawerger) ji komalekî wusa be, ku ewa komala ji bona we ra neyar be îdî (celata kujrawê eva ye:) Gotî bendekî bawerger azad bike. Û heke ewa (kuştîyê bawerger) ji komalekî wusa be, ku di nîveka we û wan da peyman hebe, îdî (celata kujraw ev e:) , Gotî ji bona mîratxurê kuştî ra xûnekî bide û bendekî bawerger jî azad bike. Kesê ku hêza wî tune bû (evan celatan pêk bîne) ji bona ku poşmanîya wî li bal Yezdan litê bibe, divê ku ewa du mehan li peyhev rojîyan bigire. Û Yezdan zanakî bijejke ye.

93; Û kîjan jî merivekî bawerger bê armanc bikuje, îdî celata wî doj e, ewayê di wê dojê da hey bimîne. Û Yezdan bi xweber jî li wî xêşim kirîye ewa (ji dilovanîya xwe) deherandîye, Yezdan ji bona wî ra şapateke mezin amade kirîye.

94; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Di gava hûn di rêya Yezdan da (çûne qirînan) îdî hûn (file û bawergeran rind) ji hev derxin; ji bo ku hûn bi jîna vê cihanê hinek kêrhatîyên wê ji xwe ra dest bixin hûn (di gava qirînê da) ku yekê li we selam kir ji bona wî ra nebêjin: "Tu bawerger nînî." Bi rastî li bal Yezdan şoreyên pir hene. Hûn jî di berya naha da wusa bûn. Îdî Yezdan bi we qencî kirîye (hûn bi wê qencîya Yezdan hatine, we bawer kirîye). Îdî hûn rind bîponijin (paşê biryara xwe bidin). Bi rastî Yezdan bi tişta ku hûn dîkin agahdar e.

95; Ji bawergeran: ewan bawergerên, ku di mala xwe da bê kul rûniştine, wekî wan bawergerên, ku bi mal û canê xwe va di rêya Yezdan da tekoşînê dîkin, nabin. Yezdan ewanê bi mal û canê xwe va (di rêya wî da) tekoşînê dîkin, bi payan li ser wanê (ku bê kul di mala xwe da) rûniştine, rûmetdar kirîye. Û çiqa Yezdan ji bo hemûşkan ra rindayî (û qencî) peyman kirîbe jî. (Erê!) Yezdan bi xelateke mezin ewanê tekoşînavan, li ser wanê (ku bê kul di mala xwe da) rûniştine rûmetdar kirîye.

96; Yezdan (ji bona tekoşînavan) li bal xwe da, paydarî û baxişandin û dilovîn (daye). Bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.



97; Bi rastî ewanê ku bi xweber li xwe cewr kirine hene! Di gava firiştan canê wan distînin, firiştan ji wan ra gotine: "Hûn li ser çi temtêlê û hûn heya naha li kêderê bûn?" (Ewan pisyara firiştan dane aha) gotine: "Em di zemîn da hinek belengaz bûn (me nikaribû xwe tevda)." (Firiştan ji wan ra) gotine: "Qey zemînê Yezdan fire nebû, ku we di vî zemînê da kêderê bivan, we li bal wura da koç bikira?" Îdî ewra van doj e û doj jî çîqa sikê şûna ne!

98; Ji pêştirê wan (bawergerên) ku bi rastî belengaz bûne; nikarin ji bona xwe ra ku xaxekî bikin, ji destê cewrkaran fereste bibin, îdî ewan belengazan çî mêr bin û çî jin bin û çî zar bin, yek e.

99; Îdî evanan in, tê gomankirinê ku Yezdanê ji wan kêmasîyên wan bibore. Şixwa Yezdan bi xweber jî borîkarê baxişvan e.

100; Û kîjan di rêya Yezdan da (ji nava welatê file) koç bike, ewayê bi rastî di zemîn da rastê penagehên pir û maldariyên zengîn were. Û kîjan li bal Yezdan û Pêxemberê wî da bi koçî ji xaniyê xwe derkebe, paşê mirin bi wî bigire ewa bimire, îdî kirya (xelatdana wê dikebe) ser Yezdan. Û Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

101; Û di gava hûn derketin rê, heke hûn (di rêya xwe da) tirsîyan, ku ewanê file wê ji bona we ra zîyanê bidin îdî heke hûn nimêja xwe kurt bikin, tu zîyan û gunehkarî li ser we tune ye. Bi rastî file ji bona we ra neyarên xûya ne.

102; Û di gava (Muhemmed!) tu di nava wan da bî; îdî tu ji bona wan ra nimêja wan (bi komatî) bikî, îdî bira destek ji wan bi te ra nimêj bikin û bira awan hemûşk çekên xwe jî hildin. Di gava (kom bi te ra) kunde birin, îdî bira ewan (rabin nimêja xwe hemû bikin) para da herin li pey we da (dîdevanî bikin) û bira ewa desta mayîne, ku hêj nimêj ne kiribûne (di cara yekem da dîdevanî dikiribûne) werin, îdî bira ewan bi we ra nimêja xwe bikin. Û bira ewan bi hemûtî tedbîra xwe bibînin û çekê xwe bigirin. Ewanê bûne file hene! Ewan hez kiribûne, heke hûn ji çekê xwe û ji dilikê xwe bê goman bibin, îdî ewan nişkê va bi hev ra (wekî êraşa merivekî bi tenê) li ser we da êrişê bînin. Heke barişt bibare ya jî hûn nexweş bin (hûn bizanin! heke hûn çekên xwe hildin) hûnê ji hildana wan çekan cefayî bibînin, qe hûn çekan hilnedin jî tu zîyan ji bona we ra tune ye. Lê hûn dîsa tedbîra xwe hildin. Bi rastî Yezdan ji bona filan ra şapateke sernegûnî amade kirîye.

103; Îdî di gava we nimêja xwe (bi vî awayî pêk anî) hûn perestîya Yezdan li ser piyan û rûniştî û li ser kêlekan dirêjkirî, bi bîranîni bikin. Îdî di gava hûn (ji tîrsa êrişa filan û neyaran) ewlebûn hûn nimêja xwe (wekî ça Yezdan ferman kirîye) dîsa wusa pêk bînin. Bi rastî nimêj li ser bawergeran bi danitî nivîsarîyeke (wusa ne, kirîna wê bi vê nevê bûye) hatiye nivîsandinê.

104; Û hûn (gelî bawergeran!) ji bona daçûna li pey neyaran da sistayî nekin. Heke hûn (ji daçûna li pey neyaran da) cefa dikişînin, bi rastî ewan neyaran jî cefa kişandine ça hûn cefayî dikişînin û hêj (pirtir jî). Hûn ji Yezdan tiştên wusa daxwazî dikin, ku qe ewan neyaran, ewê daxwazîya we nakin. Bi rastî Yezdan zanayê bijejke ye.

105; Bi rastî me pirtûk li bal te da (Muhemmed) bi mafitî hinartîye, ji bo ku tu di nava kesan da bi wan biryarên ku Yezdan bi te daye diyarkirinê, berewanî bikî. Û tu ji bona qelpan ra nebe parisvanê dozdar.

106; Û (Muhemmed! tu ji bona) baxîşandina (gunehan) ji Yezdan baxîşandane daxwazî bike. Bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

107; Û tu ji ber wanê, ku bi xweber li xwe qelpî kirine tekoşînê neke. Bi rastî kîjan qelpî û gunehkarî bike, Yezdan ji wî hez nake.

108; Ewan durûyan (sikatîyên xwe) ji merivan vedişêrin, lê ji Yezdan venaşerin. Di dana şevê da jî ewanan; ewan peyvên Yezdan pê qayîl nabe dihûnin, Yezdan bi xweber jî bi wan ra ne. Bi rastî Yezdan ewê tiştê ku ewan dikin, hildaye binê hêzê xwe.

109; (Em bêjin: Muhemmed! tu) di jîna cihanê da ji bona vana tekoşînê bikî, îdî gelo di roya rabûna hemûşkî da, kîjanê ji ber wan da bi Yezdan ra tekoşînê bike? Ya jî kîjanê serkarya wan hilde ser xwe (ku ewan ji şapatan fereste bike)?

110; Û kîjan merivekî ku karekî sik bike, ya jî bi xweber li xwe cewr bike, paşê (ku zanî ewî gunehê kirîye) ji bona baxîşandina wî gunehê kirî, heke ji Yezdan lava bike, ewayî rastê Yezdan were, ku Yezdan bi rastî baxîşkarê dilovîn e.

111; Û kîjan meriv gunehê ked bike, ewî îdî ewa guneha ji xwe ra kirîye. Û şixwa Yezdan bi xweber jî zanakî bijejke ye.

112; Û kîjan meriv nûsîtemekî, ya jî gunehê ked bike, paşê bavêje sitûyî yekê bê

gur û bê goman, bi sond! Îdî ewî ber çavî, vir û gunehêkî mezin hildaye ser xwe. 113; (Muhemmed!) heke rûmet û dîlovanîya Yezdan li ser te tune bûya; ji bo ku ewan te ji rêya rast derxin, we destekî ji wanê (durû) xebat bikirinan (ku te ji rêya Yezdan derxistin). Lê ewan ji pêştirê xwe bi tenê, tu kesî ji rêya rast dernaxin. Û ewan (bi wan xebatê xwe jî) qe bi tu tiştî zîyana te nakin. Şixwa Yezdan jî bi ser te da pirtûk hinartîye û bi te zanîna retkokî daye hînkirinê û tiştê qe te berê da pê nizan bûye daye zanînê. Û bi rastî rûmeta Yezdan li ser te mezin e. 114; Ji pêştirê (mijûlya wî) kesê (ku bi dizîka) fermana bi dana mal, ji bona arîkarya merivan, ya jî bi qencîyan, ya jî bi aşîtiya di nava kesan da bike, qe tu qencî di wan piste piste wan da tune ye. Û kîjan ewan (piste û pist û civînê bi dizî) ji bona qayîlbûna Yezdan bike, îdî bi rastî emê ji bona wî ra xelatên mezin bînin. 115; Û kîjan merivê, ji piştî ku rêya rast jê ra diyar bibe, paşê ewa di hemberê pêxember da dutîretî bike û bi xweber jî bi peyrewê wê rêya ku ewa pêştirê rêya bawergera ne; emê jî ewî bizivirîne wê rêya ku ewa li bal da zivirêya ye û emê ewî bixin dojê. Ewa doja çîqa sikê êwran e! 116; Bi rastî Yezdan (gunehê) ku jê ra hevri bê çekirinê nabaxişîne, ji pêştirê vî (gunehî, Yezdan) ji bona kêra bivê (gunehê wî) dibaxişîne û kîjan meriv ji bona Yezdan ra hevriyan bigire, bi sond! Îdî ewa bi wundabûneke dûr wunda bûye. 117; Ewan (hevriçêkeran) ji pêştirê Yezdan hey gazî (hinek xudayên) mê dîkin û ewan (bi vê gazîkirina xwe) hey gazî pelidê hîncar dîkin. 118; Yezdan ewa pelida deherandiye. Û pelid (ji bona Yezdan ra) gotîye: "Bi rastî ezê ji benddeyên te pareke hatiye diyarkirinê. hildim." 119; Û ezê ewan bendeyên te ne (ku para min ketine) ji rêya rast wunda bikim û ezê bi wan minî minyan bidime pevxistinê (ku ewan jîna xwe wusa pêş va beherin) û ezê fermana wan bikim, ku ewan îdî guhê tarişan biqelêşin (ji bona pûtan ra duruf bikin) û ezê fermana wana bikim, ku ewan; ewî rûçikê Yezdan afirandiye biguhurin (ji bona bedewî û rindaya xwe, ru û rûçik, heya bi mêyîtî û nêritî jî xwe biguhurin.) Û kîjan meriv bi rastî ji pêştirê Yezdan, pelid ji xwe ra serkar bigire; îdî bi sond! Ewî zîyaneke ber çavî kirîye. 120; Pelid (ji bona wan ra) pey mana (pir tiştan) dide û minî minîyan ji bona wan ra pevdixe. Pelid ji pêştirê xapandinê, qe tu tiştî ji wan ra peyman nade. 121; Êwra vanaya paşiyê hey doj e. Ewan ji dojê qe tu rêya ferestiyê jî nabînin. 122; Û ewanê ku bawer kirine û karê aşî kirine hene! Bi rastî emê ewan bixne wan bihiştên, ku di binê (darê wan da) çem dikişin. Ewanê di wan bihiştan da hey bimînin. Eva peymanêke rast e ji Yezdan e. Û gelo ji Yezdan bi gotin; rastgotî, kê heye? 123; (Gelî bawergeran! Evan xelat û celatên hanênan) ne bi minî minîya we dibe, ne jî bi minî minîya xweyê pirtûkan dibe. Kîjan meriv sikatîyan bike, ewayî bi wê sikatîyî bê celatkirinê û ji bona wî ra ji pêştirê Yezdan rastê tu serkar û arîkarekî nayê. 124; Û çî mêr û çî jin bi bawergerî, kîjan kesê ji karên aşîkaran bike, îdî ewanê bikevine bihiştê û wekî çirûskekî jî li wan cewr nayê kirinê. 125; Û gelo ji "OL" a wî kesê, ku bi qencî xwe hispartîye Yezdan û bûye peyrewê "OL" a Îbrahîm e, ku ji xwarîye li bal rastîyê da derketîye, "OL" a kîjanan rast e? Û Yezdan jî Îbrahîm ji xwe ra dost girtibû. 126; Û çî tiştê di ezman da heye û çî tiştê di zemîn da heye, hemûşk jî ji bona Yezdan ra ne. Şixwa Yezdan ewan tiştan hemû jî (bi zanîn) hildaye binê hêza xwe. 127; (Muhemmed!) Ewan (di mefê) jinan da (ku para wan ji malê mîratê çiqas e) ji te dipirsîn. (Tu ji bona wan ra aha) beje: "Şixwa Yezdan (di mafê) wan da ji bona we ra (rê) dayê (nişankirinê): Ewa malê mîrata ku ji bona wan jinên sêwî ra hatine diyarkirinê, hûn bi xweber jî divên ku bi wan ra kevîn bibin û (mafê wan) kurên bê wec û (mafê) sêwîyan ku hûn bi (dadvanî) mafê wan ragirin, di pirtûkê da ji bona we ra hatiye xwendinê." Û hûn ji qencîyan çî bikin, bi rastî îdî Yezdan bi wan dizane. 128; Û heke jinek tirsîya ku bi mêre xwe ra derbasî nake, ya jî tirsîya ku mêrê wêyî dest ji wê berde, ji bona aşîya di nava xwe da heke xebatê bikin, tuzîyan û gunehkarî li ser wan tune ye. Şixwa hevhatin (ji bona wan ra) çêtir e. Û can bi xweber jî ji bona kumreşîye ra hatiye amadakirinê. Û heke hûn qencîyan bikin (bi hev ra darbasî bikin) û hûn xwe ji bê mafîyê biparisînin (hûn bizanîn!) bi rastî

Yezdan bi tişta hûn dîkin îdî agahdar e.

129; Hûn çiqa ced dîkin, bikin, bi rastî dîsa hûn nikarin di nava jinan da dadvanî bikin. Barî îdî hûn bi hemûtî li bal yekê (ji wan jinên xwe da) hogirî nekin, ku hûn ewa mayî jî wekî wanê darda mayî bihelin. Û heke hûn aştî bikin (bi wan ra derbasîyê bikin) û hûn xwe ji bê mafîtiyê biparisînin (hûn bizanin!) bi rastî Yezdan îdî baxîşkarê dilovîn e.

130; Û heke ewan herduk (jin û mêr) ji hev raqetin, Yezdanê ewan herdukan jî ji maldarya xwe zengîn bike (ewanan hewciyê hevdu nake). Şixwa Yezdan zengînê bijejke ye.

131; Û çi tiştên di ezmana da heye û çi tiştên di zemîn da, heye hemûşk jî ji bona Yezdan ra ne. Bi sond! Me li wanê ku di berya we da ji wan ra pirtûk hatibûye, şîret kirîye û me li we jî şîret kirîye, ku hûn parizaya Yezdan bikin û heke hûn filetiya Yezdan bikin, hûn bi rastî (bizanin)! Îdî çi tiştên di ezmana da heyî û çi tiştên di zemîn da heyî hemûşk jî ji bona Yezdan ra ne. Şixwa Yezdan bi xweber jî bê perwayî pesinvan e.

132; Û çi tiştên di ezmanan da heyî û çi tiştên di zemîn da heyî, hemûşk jî ji bona Yezdan ra ne. Û şixwa Yezdan bi serkarî bes e.

133; Gelî kesan! Heke Yezdan bivê, wê we behere (tune bike) û wê (di şûna we da) hinekî mayî (ne ji we) bîne. Û bi rastî Yezdan bi vê kirinê dişi (hêza wî li ser wê kirine heye).

134; Kîjan merivê qencên cihanê bivê, îdî (bira ewa bizane) qencên cihanî û qencên gav û danê para da jî hemûşk li bal Yezdan heye. Bi rastî Yezdan bihistokê dîdevan e.

135; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn bibin arîkarê dadvaniyê. Hûn ji bo Yezdan, li ser we bi xweber be jî ya jî li ser da û bav û pismamê we, ku zengîn û xezan bin jî (qe raqetandinê) nekin, nihrevaniyê (şahîdiyê) bidin. Loma Yezdan ji wan (zengîn û xezanan) babettir e (ku hûn rûmeta wî bigirin). Îdî ji bona ku hûn dadvanî nekin, nebîne peyrewê dilxwestina xwe. Û heke hûn , (di nava wan da durûtî bikin, zimanê xwe) xaro maro bikin (ku nihrewanî ji bona wan ra bi kêr were ji bona ewan bêne parisandinê) ya jî ji (nihrewaniyê) dest berdin (rastîyê nebêjin) îdî (hûn bizanin) bi rastî Yezdan bi tişta hûn dîkin agahdar e.

136; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn bi Yezdan û bi Pêxemberê wî û bi wê pirtûka, ku ewî li ser Pêxemberê xwe da hinartiye û bi wê pirtûka ku ewî hêj berê da hinartiye, bawer bikin. Û kîjan merivê ku bi Yezdan û bi firişteyên wî û bi pirtûkên wî û bi pêxemberên wî û bi dan û gavê para da fileti bike, îdî bi sond! Ewa di wundabûneke dîr da wunda bûye.

137; Bi rastî ewanê bawer kirine, paşê bûne file, paşê dîsa bawer kirine, li pey wî da dîsa bûne file, paşê fileti pir kirine hene! Yezdan ji bona wan ra baxîşandinê nake û ewan li bal tu rêya rast da jî nayne.

138; (Muhemmed!) Tu mizgînê bide durûyan, ku bi rastî ji bona wan ra şapateke dilsoz heye.

139; Ewan (durûyan) ji xêncî bawergeran, filan ji xwe ra serkar digirin. Gelo qey ewan li bal wan filan ji xwe ra rûmetê divên? Îdî bi rastî serfirazî û rûmet hemûşk jî ji bona Yezdan ra ne.

140; Û bi sond! (Yezdan) di pirtûkê da li ser we da hinartibû, gava we bihist ku ewan (durûyan) bi beratên Yezdan dibîne file, ya jî bi wan beratan tinazan dîkin, heya ewan (durûyan) noqê mijûliyên mayî nebin, hûn bi wan ra rûnenên, Heke hûn di wê gavê da bi wan ra rûnen, hûn jî îdî dibîne wekî wan. Bi rastî Yezdan durû û filan bi hev ra di dojê da dicivîne.

141; Ewan (durûyan) dîdarya temtêla we dîkin. Îdî heke ji bona we ra ji Yezdan ferestîyek hatibe (aha) gotine: "Ma qey em jî bi we ra ne bûn?" Û heke (di qirînê da) ji bona filan ra parek hebe; (ewan filan di qirînê da serfiraz bibin) ji bona filan ra jî (aha) gotine: "Ma qay me di dizîka da arîkariya we ne dikir? Û me hûn ji bawerkaran ne didane parizandine? (Di van her du kirinê xwe da jî ewan durûyan divên, ji we her du destan jî ku pareke ji şorê ji xwe ra hildin). Îdî bi rastî Yezdanê di roya rabûna hemû da, berewenîya di nîveka we da bike. Bi rastî Yezdan ji bona filan ra tu rêya servahatiyên wan, li ser bawergeran çê nake.

142; Bi rastî durû (divên) ku Yezdan bixapînin û Yezdan bi xweber jî; ka xapandin çî ye, wê bide nişanê wan. Û di gava (ewan durûyan ji bona) nimêjkkirinê radibin,

ewan bi sistayî rabûne (nimej kirine). Ewan (nimêja xwe) ji bona ku meriv bejin: "(evan nimêj dikin)" loma dikin. Ewan Yezdan hey bi hindik bîra xwe tînin.

143; Ewanan (di nava bawergeran û filan da mane) ne ji (bawergeran in) û ne jî ji (filan in). Û bi rastî Yezdan kîjan merivî ji rêya rast derxe, îdî tu ji bona wî ra raste tu rêyan nayê.

144; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! hûn ji xêncî wanê bawer kirine, filan ji xwe ra serkar negirin. Qey hûn divên ku hûn ji bona Yezdan ra li ser xwe da, beratên bi hêz bidin, (ku Yezdan jî we bi wan beratên bi hêzên ber çavî şapat bike?)

145; Bi rastî ewanê durû di maxê agirê jêr da nin. Û tu ji bona wan ra rastê tu arîkarî nayê.

146; Ji pêştirê wanê ku ji kirine xwe poşman bûne û karê aştî kirine û xwe (bi pirtûka) Yezdan girtine û "OL" a xwe hey ji bona Yezdan ra xurî kirine. Îdî evanê (bi van salixan) bi bawergeran ra nin. Yezdanê bi rastî ji bona bawergeran ra xaletên mezin bîne.

147; Heke hûn sipazîya (Yezdan bikin) û hûn bi wî bawer bikin, Yezdanê bi şapatdana we çî bike? Û Yezdan bi xweber jî sipazvanê zana ye.

148; Yezdan ji pêştirê wî merivê, ku li wî hatiye cewrkirinê, ji mijîliyên sikên bi êşkera bêne gotinê hez nake (yanî Yezdan sikatî, axiftin ve jî jê hez nake, hemberya wî bi celatî dide). Û Yezdan bîhistokê zana ye.

149; Heke hûn qencîyekî êşkera bikin, ya jî hûn veşerin, ya jî hûn ji sikatên (hatine kirinî) biborin (hûn bizanin!) bi rastî Yezdan daborîyê bi hêz e.

150; Bi rastî ewanê bi Yezdan û bi Pêxemberê wî dibine file (bawer nakin) û ewan divên, ku dutîreti di nava Yezdan û Pêxemberên wî da çê bikin û ewan dibejin: "Em bi hinekî (pêxemberan) bawer dikin û em bi hinek (pêxemberan jî) dibine file (bi wan bawer nakin)." Û ewan divên, ku (di nava filetî û bawerîyê da) ji xwe ra rêyeke nîvwarî bigirin, hene!

151; Bi rastî ewan in, ku bi rastî file ne. Û me bi xweber jî ji bona filan ra şapateke sernegûn amade kirîye.

152; Û ewanê, ku bi Yezdan û bi Pêxemberên wî bawer kirine û di nava yekê ji wan da jî qe dutîretî nakin, hene! Bi rastî (Yezdan) ê di nêzîk da xelata wan bide wan. Û Yezdan bi xweber jî baxîşkarê dilovîn e.

153; Ewanê wayê pirtûk hene! Ewan (Muhemmed!) ji te dipirsîn; ku tu ji ezmana bi ser wan da pirtûkekî bidî hinartinê. Bi sond! Ewan ji Mûsa, hêj ji vê meztir pirsîne. Ewan ji Mûsa ra (aha) gotine: "Ka îdî (Mûsa!) tu Yezdan bi êşkera bi me bide dîtîne." Bi sedema cewra ewan kirî, îdî birûska bêhişî bi van girtîye. Ji piştî ku ji wan ra beratên daveker jî hatibûn, ewan dîsa golik ji xwe ra girtin hebandin, îdî me ewan ji wan sikatên wan (ji piştî poşmaniya wan) baxîşandin û me ji Mûsa ra jî beratên bi hêzên daveker anîne.

154; Û bi sedema peymana wan (ku bi hêz be) me (çîyayê bi nav) Tûr rakire ser wan û me ji bona wan ra (aha) gotîye: "Hûn bi kundetî di derî da bikebin (wî bajarî). Û me (ji bona wan ra aha jî) gotîye: "Hûn ji bona (nêçîra masîyan) di roya şemîyê da (ji qedexeme xwe) neborin." Û me ji wan (li ser van biryaran) peymaneke bi hêz sitandiye.

155; Îdî bi sedema, ku ewan peymana xwe şikêndibûn û ewan bi beratên Yezdan bûne file (bi wan bawer nekiribûne) û ewan pêxember bê mafî kuştibûne û bi wê gotina wanê, ku ewan (gotibûne): "Dilê me bi xêlî ye" (bi serê wan da me aşit anî). Na! Gotina wan nîne (dilê wan bi xêlî nîne) lê Yezdan bi sedema filetiya wan, li ser dilê wan duruf kirîye. Ji pêştirê hindikên ji wan, îdî tu kes ji wan bawer nakin.

156; Û bi sedema filetiya wan e (bi Îsa) û bi wê gotina wan e; ku ewan bi wan gotinê xwe, vir û pizeke mezin avêtibûne Meryemê.

157; Û bi sedema wê gotina wan e; ku ewan gotibûne: "Bi rastî Îsayê Mesîhê kûrê Meryemê ku pêxemberê Yezdan e, me kuştîye" (me bi wan da teşqele anîye). Ewan bi xweber jî Îsa ne kuştibûne û ewan Îsa li çarmixê jî nexistibûne, lê ji bona wan ra Îsa manendebûye. Û bi rastî ewan merivên (ku di mafê kuştina Îsa da du tîrebûne hene!) ewan bi xweber jî (di mafê kuştinê da) du dil in. Ji pêştirê peyrewîya gomanan ji bona wan ra (bi kuştina Îsa) qe tu zanîn tune ye. Bi rastî ewan Îsa ne kuştine.

158; Lê Yezdan Îsa (ji diliqê merivtayî derxistîye) ewa li bal xwe da bilind kirîye. Û bi rastî Yezdan serfirazê bijejke ye.

159; Û bi rastî ewanê xwayê pirtûk hemûşk jî, wê hêj di berya mirina xwe da, bi Îsa bawer bikin û di roya rabûna hemûtî da jî Îsa li ser wan nêhrevanî (şahidî) bide.

160; Îdî bi sedema wê cewra, ku ewanê cihû dikirin û ewan cihûyan pir meriv ji rêya Yezdan difetilandin, me jî ewan tiştên paqijên, ku ji bona wan ra durist bûye, bi ne duristî qedexe kirîye.

161; Û bi sedema, ewan hatibûne fermankirinê, ku ewan malê kesan bi serdaparîtî hilnedin, lê dîsa ewan serdaparî hildidan û ewan malê merivan di nava xwe da bi pûçîtî xwaribûne (me jî ewan tiştên paqijên ku ji bona wan ra durist bûye, bi ne duristî qedexe kirîye). Û bi rastî me jî bona fileyan ji wan şapateke dilsoz amede kirîye.

162; Lê ji wan; ewan zanayên, ku di zanînê da rehdane hene! Ewanan û ewanê bi rastî bi wan biryar û pirtûka, ku li bal te da (Muhemmed) hatiye hinartinê û bi wan pirtûkên ku di berya te da hatine hinartinê, bawer dîkin û ewanê ku nimêja xwe dîkin û ewanê ku baca xwe didin û ewanê bi rastî bi Yezdan û bi ro û danê para da bawer dîkin hene! Bi rastî emê ji bona van ra (xelat) û kiryeke mezin bidine wan.

163; Bi rastî (Muhemmed!) me ça li bal Nûh û li bal wan pêxemberên li pey Nûh da hatine, niqandîye û me li bal Îbrahîm û Îsmâil û Îshaq û Yaqûb û neviyên wan û Îsa û Eyûb û Yûnis û Harûn û Suleyman da, niqandîye; me wusa jî li bal te da niqandîye û me ji bona Dawûd ra jî pirtûka (bi nav) Zebûr anîye.

164; Wekî me ça li bal wan pêxemberên, ku me hêj di berê da (serdaborya wan) ji te ra gotîye û ewan pêxemberên, ku me ji te ra (serdaborya wan) ne gotîye niqandîye (me li bal te da jî niqandîye). Û bi rastî Yezdan bi Mûsa ra jî axiftin kirîye.

165; Ji bo ku meriv di pey hatina pêxemberan da ji bona xwe ra di hemberê Yezdan da îdî tu mana nebinin, me ewan pêxemberan bi mizgînvana û datirsvan li bal kesan da bi pêxemberî şandine. Bi rastî Yezdan serfirazekî bijejke ye.

166; Lê Yezdan ewan biryarên, ku li bal te da bizanîna xwe hinartîye, şahîdîya wan dide, ku ewî ewan biryaran hinartîne û firiştan jî şahîdî didin (ku Yezdan ewan hinartine). Û şixwe Yezdan (ji bona) şahîdîyê bes e.

167; Ewanê bûne file û merivan jî ji rêya Yezdan didine para da hene! Bi rastî ewan di rêyeke dûr da wunda bûne.

168; Ewanê bûne file û cewr jî kirine hene! Bi rastî Yezdan ji bona wan ra qe tu baxişandinê nake û ji bona wan ra jî qe tu rêyî nade diyarkirinê.

169; Ji peştirê rêya dojê, ewanê di wê dojê da hey bimînin. Û eva (celatdana hanê) bi rastî li ser Yezdan hesanî ye.

170; Gelî kesan! Bi rastî (bizanin) ku pêxember ji Xudayê we bi maf va hatiye, îdî hûn (bi wî) bawer bikin. Ji bona we ra bawerî çêtir e. Heke hûn (bi wî bawer nekin) hûn bibine file, îdî bi rastî (bizanin)! Çi tiştên di ezman û zemînda hene! Hemûşk jî ji bona Yezdan ra ne. Yezdan bi xweber jî zanakî bijejke ye.

171; Geli xweyê pirûkan! Hûn di "OL" a xwe da pêş va neçin (OL' a we çî ye, wusa bawer bikin. Îsa Pêxember e. kûrê Yezdan nîne). Û hûn di mafê Yezdan da ji pêştirê rastîyê tu tiştî nebêjin. Bi rastî Îsayê Mesîhê kûrê Meryemê pêxemberê Yezdan e (kûrê wî nîne). Ewa Îsa peyveke (fermaneke) Yezdan e, ewî ewa peyva li bal Meryemê da avêtîye û ewa canekî ji Yezdan e, îdî hûn bi Yezdan bawer bikin û hûn bi pêxemberên Yezdan jî bawer bikin û hûn (di mafê Yezdan da) nebêjin: "Ku ewa sisê ne." Heke hûn xwe (ji van gotinan biparisînin) bidine para da, ji bona we ra eva paradana çêtir e. Bi rastî Yezdanê (babetê) perestîyî, Yezdanekî bi tenê ye. Ewa ji hebûna zaran (hûn ça dibêjin) paqij e (ji wî ra qe tu zar tune ye). Çi tiştên di ezmanan da hene û çi tiştên di zemîn da hene, hemûşk jî ji bona Yezdan ra ne. Şixwa Yezdan bi xweber jî bi serkarî bes e.

172; Û bi rastî (Îsa)yê Mesîh ji bendetîya Yezdan serî bilind ne kirîye û ne gotîye: "(Ez nabime bende ji bona Yezdan ra)" û ewan firişteyên (ku nêzîkê Yezdan dibin) jî, ji bendetîya wî serî bilind ne kirine. Û kîjan merivê ku ji bendetîya wî serî bilind bike û xwe mezin bizane; (bira ewa bizane!) bi rastî îdî Yezdanê ewan hemûşkan li bal xwe da bicîvîne.

173; Ewanê ku bawer kirine û karê aştî kirine hene! Îdî wê kirya wanê bê kêmayî ji bona wan ra bê dayînê (û ewa) ji rûmeta xwe ji bona wan ra (hêj kirya wan pir dike). Û ewanê ji bendetîyî serî bilind kirine û xwe mezin kirine hene! Îdî (Yezdanê) ewanan bi şapateke dilsoz, şapat bike. Ewanan ji bona xwe ra ji pêştirê Yezdan qe rastî tu serkar û arîkarekî jî nayên.

174; Gelî kesan! Bi sond, ji Xudayê we, ji bona we ra berata rastî hatiye. Û me li bal we da ronahîyake (Qur'an) bi xûyayê hinartîye.

175; Îdî ewanê ku bi Yezdan bewer kirine û xwe bi wê bawerîyê jî girtine hene! Yezdanê ewan bigîhîne dîlovanî û rûmeta xwe û wê ewan bîne bal wê rêya rastê, ku ewa rêya li bal wî da diçe.

176; (Muhemmed!) Ewan ji te (mîrata wan mirîne, ku ji pêştirê xûşka wî ye ji da û bavê ya jî ji bavê, tu kesê wî ne mabe) dipirsin. Tu jî ji bona wan ra bêje: "Şixwe Yezdan ji bona we ra (di mafê mîrata) mîratxurên dîr da aha gotîye: "Heke mêrikek miribe, qe tu zarê wî tune be, hey mîratxurê wî xûşka wî mabe, îdî nivê mîrata wî, para xûşka wî ye. Heke mirî xûşk be qe tu zarê xûşkê jî tune be, mîrata xûşkê hemûşk para birayê wê ye (yanî malê mîratê hemûşk ji bona birayê wê ra ne, di herdu cûran da jî, heke ji bona mirî ra bav û zar û ya jî mîratxurên nêzîk tune bin). Heke mîratxur, du xûşk bin îdî ji bona wan herduk xûşkan ra ji malê mîratê birayê wan, ji sisyan, dûv par para wan e. Û heke mîratxurên mirî, xûşk û bira bin, îdî parkirina mîrata aha ne; ji bona her mêrekî mîratxur ra wekî du parê jineke mîratxur ra ji malê mîratê, mîrat heye. Ji bo ku hûn (mafan) wunda nekin, Yezdan ewan parkirinan ji bona we ra vedike. Şixwa Yezdan bi xweber jî bi hemû tiştan dizane.

## Chapter 5 (Sura 5)

1; Gelî ewanê, ku we bawer kirîye! (We çi peyman dabe) hûn ewan peymana pêk bînin. Ji pêştirê van tarişên ku we ji bona we ra bîne xwendinê, (goştê) hemû tarişan ji bona we ra durist bûye, ji xencî nêçîrkirina wan, heke hûn di ihrama (Hecê da bin). Bi rastî Yezdan çi bivê, berewaniya wî dike.

2; Gelî ewanê, ku we bawer kirîye! Hûn ewan biryar û (beratên) Yezdan, ku ji bona rûmeta xwe daniye, bi duristî ne hetikînin û hûn ewan rûmetê wan mehên (ku di wan da qirîn hatine qedexê kirinê û hûn rûmeta (wan tarişên gorîne xwe) û hûn rûmeta wan tarişên, ku bi guharî (hatine diyar kirinê) û hûn ewan merivên, ku xwe avêtine xaniyê qedexê (qirîn têda hatine qedexê kirinê) ewan jî di wî xanî da ji Xudayê xwe, rûmet û qayîlbûnî dixwazin, bi duristî ne hetikînin. Û di gava hûn ji (ihrama Hecê) derketin, îdî hûn nêçîra xwe bikin. Û bira fetilandinê wî komalê, ku ewan hûn ji hecê fetilandinê, nebe mane ji bona we ra, ku hûn jî êrişê bibin ser wan. Û hûn li ser qencîyan û li ser xwe parisandinê ji gonehan arîkarîya hev bikin. Û hûn li ser gonehkarî û cewrîtî arîkarîya hevdu nekin û hûn yezdanparizî bikin. Bi ratî Yezdan zor şapat e.

3; (Goştê) miraran û xwîn û goştê berazan û (goştê) wê tarişa, ku ji bona navê wan tiştên; ji pêştirê navê Yezdan ra hatina (jê kirine) û (goştê) wê (tarişa) hatiye fetisandinê û (goştê) wê tarişa, bi dar, ya jî bi tişteki mayî hatiye kuştinê û (goştê) wê tarişa, ku ketîye mirîye û (goştê) wan tarişên, ku tarişên mayî li wan xistiye mirîye û (goştê) wê tarişa, ku cenaweran xaribe, ji pêştirê heke hûn bigehijên wan, ewan bi can bin, hûn jî serê wan jê kin û (goştê) wê tarişa, ku li ser (kevîrên çikandi) têne jê kirinê (wekî pût û dar û kevîrên berate) û (goştê) wan tarişên, ku ji bona fal avêtinê û xumarê têne jê kirinê, hemûşk ji bona we ra ne durist bûye. Ewan hemûşk jî derketina ji rêya rast e. Îdî di îro da ewanê file, ji bo ku we ji ola we derxin, bê hêvî bûne (ewan nikarin we ji ola we derxin). Îdî hûn ji wan filan netirsîn û hûn ji min bitirsîn. Di îro da min ji bona we ra, ola we pêk anîye (kêmaya wî nemaye). Û min ewan qencên xwe ji bona we ra paşî anî û min ji bona we ra ola bi nav (islam) bi olîtî lite kirîye. Îdî kîjan meriv heke ji birçîya bikeve tengasiyê, heke ji bona gonehkarîyê nexwe dikare (ji goştê van tarişên borî wekî xwarineke neji û nemir bixwe). Bi rastî îdî Yezdan baxîşkarê dîlovîn e.

4; (Muhemmed)! Ewan ji te dipirsin: "Ka ji bona wan ra çi tişt hatiye durist kirine." Tu ji bona wan ra bêje: "Ji bona we ra tiştê paqij durist bûye û ewa nêçîra wan sene, ku hûn ewan hîne wan zanîn e, Yezdan bi we daye hînkirinê, dîkin. Ewan sene nêçîrvan çînêçîrê bigirin, îdî hûn ewê nêçîrê bixun û hûn li ser wan nêçîran, navê Yezdan bixûnin û hûn yezdanparizî bikin. Bi rastî Yezdan zû hijmar e.

5; Di îro da ji bona we ra paqij durist bûye. Û xwurekên wanê xweyê pirtûk jî ji bona we ra durist bûye. Û xwurekên we jî ji bona wan ra durist e. Û ewan jinên ji bawergeran, ku tolitî ne kiribin û ewan jinên ji wê desta, ku di berya we da ji wan ra pirtûk hatiye danê, xwe ji to-litiye diparisînin; di gava hûn kirya wan (mara

wan) bidne wan, hûn bi wan ra tolitî nekin û hûn ewan bi dizîka da ji xwe ra nexne dost, hey ji bo ku hûn xwe ji tolitîyê biparisînin û bi wan ra kevîn bibin. Kevînbûna evan jinan jî ji bona we ra durist bûye. Û kîjan meriv ji piştî baweryê dîsa bibe file bi sond! Xebata wî îdî şewitîye. Û ewa di gav û danê para da jî dibe ji wanê ziyanger.

6; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Di gava ku hûn bivên rabin nimêj bikin, îdî hûn rûyê xwe û destê xwe jî heya enîşkan bişon û hûn serê xwe mes bikin û pê xwe jî heya gûzekan. (Paşê nimêja xwe bikin). Û heke hûn ser ne pak bin, îdî hûn xwe bişon û paqij bikin. Û heke hûn nexweş bin ya jî hûn li ser rê bin, ya jî yek ji we ji qendegê hatibe, ya jî we dest dabe jinan îdî hûn rastê avê jî ne hatibin, hûn bi xwelîyeke paqije temîz îdî teyemmum bikin (destnimêja bi xwelyê bigirin). Hûn biwê xwelyê destê xwe û rûyê xwe mes bikin. Yezdan navê ku ji bona we ra zoratiyê çêke, lê Yezdan divê ku we paqij bike û Yezdan devê ku qencên xwe ne li ser we hene, bê kêmayî pêk bîne. Dibe ku hûn bi rastî sipazîya wî bikin.

7; Û hûn (gelî bawergeran!) ewan qencên Yezdan e ku li ser we hene û hûn ewê peyman ku we dabûye wî, di wê gava ku we gotibûye: “Me biryarên (te) bihîst û me bi gotina wan kirîye.” Hûn bi wê peymanê jî hatibûne girêdanê, bîra xwe bînin. Û hûn yezdanparizî bikin. (Hûn bizanin!) Bi rastî Yezdan bi wan tiştên veşartîyê di singa da heyî dizane.

8; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Ji bo ku dadî li pîya bimîne, hûn ji bona Yezdan ra, bibin şahidê bi hêz. Bîra kirîna wî komalê, ku di hemberê we da neyartî kirine, ji bo ku hûn di hemberê wan da dadvanî nekin, we nede helan danê, ku hûn dadvanî nekin. Hûn dadvanî bikin, loma dadvanî ji parizîyê ra nêzîktir e. Û hûn yezdanparizî bikin. Bi rastî Yezdan bi wan tiştên ku hûn dîkin, dizane.

9; Yezdan ji bona wanê bawer kirine û karê aştî kirine, peyman daye ku ji bona wan ra baxişandin û kirêke mezin heye.

10; Û ewanê ku bûne file û ewanê bi beratên me derew kirine, hene! Hevrînê dojê evan in.

11; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn ewê qencîya Yezdan e, ku di gavêkî da komalekî (êriş anîbûne ser we) destê xwe (ji bona kuştina we) dirêj kirin, îdî Yezdan jî destê wan li ser we daye paradanê, bîra xwe bînin. Û hûn yezdanparisî bikin. Îdî gelî bawergeran! Hûn hey xwe hispêrne Yezdan.

12; Û bi sond! Yezdan ji zarên cihûyan peyman hildaye û me ji wan dazne dîdevan (di nava wan da) şandibûye. Yezdan ji wan ra (aha) gotîye: “Bi rastî ez bi we ra me. Heke hûn nimêja xwe bikin û hûn baca malê xwe bidin û hûn bi pêxemberên min bawer bikin û hûn arîkariya wan bikin û heke hûn ji bona qayîlbûna Yezdan ji hev ra deyn bi qencî bidne hev, bi rastî ezê jî sikatiyên we li ser we rakim (ezê we bibaxişînim). Û ezê we bixme wan bihiştên, ku di binê (darê wan da) çem dikişin, îdî ji virha kîjan merivekî ji we bibe file (evan şîret û qencîyan bîrva bike) bi sond! Îdî ewî rêya rast wunda kirîye.”

13; Îdî ji ber ku ewan peyman xweyê dayî şikênandine, me jî ewanan deherandine û me dilê wan hişk kirîye. Ewan zarên (cihûyan) peyvên (biryanan) ji şûna wan dihêjînin (ji bo ku binek arşan wekî armancê xwe derxin). Ewan pareke, ku ji wan ra hatibûye gotinê (ji biryanan) bîrva kirine. Ji pêştirê hindikên ji wan, tûyî rastî qalpîya wan hemûşkan werî. Îdî tu ji wan kêmasiyên wan bibore û tu kirinê wan belaş bide. Bi rastî Yezdan ji qencîkaran hez dike.

14; Û me ji wanê ku gotine: “Bi rastî em mexînîne (em arikarên Îsa ne) jî peymanan hildaye. Îdî ewan mexînan pareke (ji wan biryarên) ku ji wan ra hatibûye gotine bîrva kirine. Îdî me jî di nava wan da heya roya rabûna hemû da, neyartî û xerez xistîye (helan). Yezdanê ji bona wan ra ewê kirîna wan e, ku ewan ji xwe ra xistibûye pêş e, bêje.

15; Gelî ewanê xweyê pirtûk! Bi rastî li bal we da pêxemberê me hatine. Ewan (biryarên) ku di pirtûkê da hebûn, we penha dikir, ji bona we ra ewa (pêxembera) pirê wan (biryanan) vedike û ji pirê wan (biryanan) jî dibore (qe ji wan axiftin nake). Bi sond! Ji Yezdan bona we ra ruhnayek û pirtûkeke daveger hatîye.

16; Yezdan bi wê pirtûkê, ewan merivên ku di binê peyrewê qayîlbûna wî, digihîne rêne parisvan û ewa ewan merivan (bi wê pirtûkê) ji tarîtiyê li bal ruhnayê da derdixe. Erê! Ewa, ewan tîne rêya rast.

17; Bi sond! Ewan merivên, ku gotine: “Yezdan Îsayê Mesîhê kûrê Meryemê bi xweber

e. (bi wê gotina xwe) bûne file." (Muhemmed tu ji wan ra) bêje: "Heke Yezdan bivê, ku Mesîhê kûrê Meryemê û dîya Mesîh û hemû kesên di zemîn da hene jî teşqeale bike, gelo kê dikare, ku ewan ji teşqealekirina wî bi tiştêkî bide para?" Û seroktiya ezman û zemîn û çi tiştê di nava wan herdukan da heye, hey ji bona Yezdan ra ne. Ewa çi tiştê bivê ewî diafirîne. Şixwe Yezdan li ser hemû tiştan dişî.

18; Cihû û Mexînan gotine: "Bi rastî em kurên Yezdan in û em hezgerên wî ne." (Muhemmed! Tu ji bona wan ra) bêje: "(Heke hûn kur û hezgerên wî ne) îdî ewa çima we bi gonehên we şapak dike? Na,! (gotina we nîne) lê ewan kesên ku (Yezdan) afirandine hene! Hûn jî ji wan in. Ewa ji kîjanî ra bivê dibaxişîne û kîjanî ra jî bivê, ewî şapat dike. Û seroktiya ezman û zemîn û çi tiştê di nava wan da heyî, hey ji bona Yezdan ra ne. Şixwa zivirandina (para da) bi xweber jî li bal wî da ne.

19; Gelî xweyê pirtûkan! Ji bona ku hûn (nebêjin): "Di gava sistaya hatina pêxemberan da, qe tu kesekê mizgînvane (bi bihiştê) û tirsdayê (bi dojê) li bal me da ne hatibû heya ku me jî (bi wî bawer bikira, bi hatina rêya rast). Di wê gava hatina pêxemberan sist bibû, bi rastî pêxemberê meyê (Muhammed) li bal we da hatiye. Bi sond! Ewî rastîya (dînan-olan) bi huzwartî ji bona we ra vedikir, û mizgîniya (bi bihiştê) û tirsê (ji dojê) daye we (ji bona pêkanîna biryaran hemû şîret gotine, îdî tu mana ji bona gonehkarya we ra ne maye. Ku hûn dibêjin em bi nezani gonehan dikin). Û Yezdan li ser hemû tiştan dişî.

20; Û (hûn ewê gava) ku Mûsa ji bona komalê xwe ra (aha) gotîye: "Gelî min! Hûn ewan qencên Yezdan e ku li ser we heye bîra xwe bînin; ewî di nava we da pêxember çê kirine û ewî hûn xistine serok û ewî di cîhanê da qencên wusa bi we kiriye qe li tu kesekî li cîhanê ne kiriye, bîra xwe bînin.

21; Gelî min! Hûn bikebine wî bajarê pîrozê ku Yezdan ji bona we ra bi vê nevê nivîsiye û hûn di para da nezivirin. Heke hûn îdî di para da bizvirin, bi rastî hûnê zîyan bikin.

22; Ewan (ji bona Mûsa ra aha) gotine: "Mûsa! Bi rastî di wî (welatê me da) komalekî kotekkar heye. Heya ewa (komala) bi rastî ji welat dernekebin em bi xweber nakabine wî welatî. Îdî heke ewan ji welat derkebin, emê bi xweber herin bikebine welat.

23; Du merên ji wanê tirsonek ne (ku ji Yezdan ditirsîyan) Yezdan (bi xwerber jî) li ser wan qencî kiribûye (aha) gotibûne: "Hûn di derî da li ser wan da (êrîşê) beherin, îdî gava hûn bikebine hundur, bi rastî hûnê serfiraz bibin (heke hûn li ber xwe bidin). Heke hûn bi rastî bi Yezdan ewle dibin, îdî hûn xwe hispêrne wî."

24; Ewan (ji Mûsa ra aha) gotine: "Mûsa! Bi rastî heya ewan (neyaran) di bajar da bin qe tucarî em nakabine bajar. Îdî (Mûsa!) tu bi Xudayê xwe va herin, bi wan ra qirînê bikin (ewan ji welat derxin) emê jî li vira rûnen."

25; (Mûsa ji Xuda aha lava) kirîye: "Xudayê min! Ez ji pêştirê xwe û birayê xwe, xayîtiya tu kesî nakim, îdî tu nîveka me û evî komalê ji rê derketî raqetîne."

26; Ewî (ji Mûsa ra aha) gotîye: "Îdî (ewa zemînê pîroz) heya çil salî, li ser wan qedexe bûye (ewanê heya çû salî li wê deştî bimînin, naçine bajarê Qudsê). Ewanê di wê (berya bi nav Tîyehê da) bi sergerdanî bigerin. Îdî (Mûsa) tu li ser komalê ji rê derketî kovanan neke."

27; Û (Muhemmed!) tu ji bona wan ra, serda borya herdu kurên Adem bi rastî bixûne. Ewan herdukan; heryekê ji wan goryek dabûn. Gorya yekê ji wan herdukan, hatibû litê kirinê û gorya ewê mayî ne hatibûye litê kirinê. (Ewê ku gorya wî ne hatibûye litê kirinê, ji bona wîyî gorya wî hatibûye litê kirinê ra) gotîye: "(Ji ber ku gorya te hatiye litê kirinê) bi sond! Ezê te bikujim." (Birayê wî ji wî ra aha) gotîye: "Bi rastî Yezdan hey (perestîya) wanê yezdanparizî dikin, litê dike."

28; Heke tu ji bona kuştina min, destê xwe li bal min da dirêj bikî, ez ji bona kuştina te destê xwe li bal te da dirêj nakim. Bi rastî ez ji Xudayê cîhanê ditirsim.

29; Ez divê, ku bi rastî tu gonehê min û gonehê xwe bi hev ra hildî, ji bo ku tu bibî ji wanê hevrine agir. Şixwa celata cewrkaran jî eva ye.

30; Îdî canê wî kuştina birayê wî xwest. Birayê xwe kuşt. Ewa bi xweber jî bûye ji wanê zîyankar.

31; Îdî Yezdan (ji bo ku ka ewayî ça termê birayî xwe hilde) qijikek şandîye. Ewê qijikê ze-mîn kolaye (bi kujraw) daye xûyandinê (ka ça termê bireyê xwe çal kirîye. Ewî kujrawî aha) gotibûye: "Xwelî li min be! Ez wusa bêzar bûme, ku ez nikarim wekî



ve qijikê jî termê birayê xwe veşêrim." Îdî ewanê ji kirinê xwe poşman dibin hene! Ewa bûye ji wan.

32; Ji bona vî qasî me (di pirtûkê da) li ser zarên cihûyan nivîsiye: "Bi rastî kîjanê ku me-rivekî, ne ji bona (tûlhildanê) ne jî ji bona, ku ewa di zemîn da tevdanî dike, bikuje; îdî tu dibê qey ewî hemûşk kesên cîhanê kuştine û kîjanê merivekî jî bide jînanandinê tu dibê qey ewî hemûşk kesên cîhanê daye jînanandinê." Bi sond! Li bal wan da pêxemberên me bi beratan va hatibûne. Paşê jî dîsa ji piştî hatina pêxemberan, ewan (zarên cihûyan) di zemîn da dest feşartî kirine.

33; Bi rastî celata wanê, ku bi Yezdan û bi Pêxemberê wî ra qirînê dikin û digerin, ku di zemîn da tevdanîyî derxin ev e. Ji bo ku ewan di cîhanê da sernegûn bibin, ya ewanê bêne kuştinê, ya jî ewanê bêne dardakirinê, ya jî dest û pêyê wanê bi çîloçepî bê jêkirinê, ya jî ewanê ji welatê wan bêne derxistinê. (Eva celata hanê) ji bona wan ra di cîhanê da sernegûnî ye û ji bona wan ra di danê para da jî şapatekê mezin heye.

34; Ji pêştirê wan merivên, di berya ku hêj we ewan ne xistibûne binê hêza xwe, ji wan kirinê xwe poşman bibin (eva celatdana bori ji bona van ra tune ye). Hûn bizanin! Ku bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

35; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn parizîya Yezdan bikin, hûn ji bona gihîjtina li bal wî da li rêyan bigerin û hûn di rêya wî da bi tekoşînî xebatê bikin. Bi rastî hêvî heye ku hûn fereste bibin.

36; Bi rastî ewanê fîletî dikin hene! Çi tiştên di zemîn da hene, heke wekî wan jî bi wan tiştan ra hebin, (hemûşk ji bona wan yekê rabe) ji bo ku ji şapata roya rabûna hemû fereste bibe ewa jî (ewan mal û tiştan) hemûşkan di gerewa xwe da bide, dîsa ji wan ewa gerewa nayî litê kirinê (ewan jî ji wê şapate fereste nabin). Û ji bona wan ra şapateke dilsoz heye.

37; Ewanan divên, ku ji agir derkebin, lê ewan ji agir dernakebin û ji bona wan ra şapateke peyweste heye.

38; Û dizê mêr û diza jin, celeta wan eva ye, ber keda ewan kirîye, hûn îdî destê wan jê bikin, ji bo ku ewa celata ji Yezdan, ji wan ra bibe sernegûnî (îdî tişteki wusa neyê kirinê). Yezdan bi rastî serfîraz e bajejke ye.

39; Îdî kîjan (diz) ji pêştî (dizîya xwe ye, ku bi wê dizîyê cewr kirîye (malê yekê mayî bê qayîlbûna wî, bi dizîka da hildaye) ji kirina xwe poşman bibe û aşîkarî kiribe (malê dizî, para da dabe) bira ewa (bizane) bi rastî Yezdan jî poşmaniya wî litê kirîye (ewa ji celatdanê, daye baxîşandinê). Bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

40; Ma qey tu nizanî, ku bi rastî seroktiya ezman û zemîn ji bona Yezdan ra ne? Ji bona kê ra bivê ku şapat bike, ewî şapat dike û ji bona kîjanî ra jî baxîşandinê bivê, ewî dibaxîşîne. Û Yezdan li ser hemû tiştan dişî.

41; Pêxember! Çi ji wan fileyên ku bi devê xwe dibêjin: "Me bawer kirîye (ku doza te rast e) qe dilê wan bawer ne kirîye û ji cihûyan, ewanê ku ji bona fîletiyê didine ber hev, bira ewa kirina wan te nede mirûz kirinê. Ewanan gohdaryî ji bona derewan dikin û ewan gohdaryî ji bona (îyartîya) komalekî mayî dikin. Ewan (ji bona baweryî) ne hatine bal te. Ewanan, ewan peyvên biryarîyên bi cî hatî, ji piştî ku ewan peyvan (bi biryarî şûna xwe digirin) bi zanîn ji şûna wan diheşivînin. Ewanan (ji komalê xwe ra aha dibêjin): "Heke (bawerger û bi pêxemberê xwe va) ji bona we ra, evan (biryanan) neynin, hûn xwe ji wan biryanan biparisînin (bi wan bawer nekin)." Û Yezdan ji bona kêra aşî kirina bivê, îdî tu ji bona ne aşîtkirina wî tu tişteki ji Yezdan hilnadî. Ewanê ku Yezdan navaye dilê wan paqij bike, evan in. Ji bona wan ra di cîhanê da sernegûnî heye û di para da jî ji bona wan ra şapateke mezin heye.

42; Ewanan hey ji bona derewan gohdarî dikin, ewanan hey (tiştên) ne durist dixun. Îdî heke ewan (ji bo ku tu di nava wan da berewanî bikî) hatibine bal te, îdî tu hez dikî di nava wan da berewanî bike û heke tu hez dikî rûyê xwe ji wan bizivirîne (qe berewaniya wan neke). Heke tu ji wan rûyê xwe bifetilîni, ewanan qe nikarin bi tu tiştî zîyanê bidine te. Û heke te di nava wan da berewanî kir, îdî tu di nava wan da bi dadvanî berewaniyî bike. Bi rastî Yezdan ji dadvanan hez dike.

43; Û li bal wan bi xweber pirtûka (bi nav) Tewrat heye, di wê pirtûkê da jî biryarên Yezdan hene. Ewan ji bona berewaniyê ça tene bal te û paşê jî ji piştî hatina xwe ye li bal te, rû (ji berewaniya te) dizivirînin? Û bi rastî evan bawer

ne kirine.

44; Bi rastî me Tewrat hinartîye. Di wê Tewratê da beledî û ruhnaya (biryarên min heye) bi wan (biryaran) ewan pêxemberên xwe hisparokên (Yezdan) ji bona cihûyan ra berewanî dikin. Û ewan zana û rêberan jî û ewanê ku pirtûk di destê wan da bi parisî maye, berewanî dikirin û ewan bi xweber jî şahidiya wan (biryarên) di Tewratê da heyî kiribûne. Îdî hûn ji merivan netirsîn (ji bona heke hûn ewan biryaran bi rastî bêjin, wê ji bona we ra merivê zîyan bidin). Lê (gelî zana û rêberan û parisvanan!) hûn ji min bitirsîn û hûn biryarên min, bi tu bahayê nefiroşin. Û kîjan merivê, ku bi wan biryarên Yezdan hinartîye, berewanî neke, îdî evanan hey file ne.

45; Û me di (pirtûka Tewratê da, biryarên tûl hildane aha) li ser wan nivîsandîye. Canê merivan, bi canê kujrawê û çav, bi çav e û poz, bi poz e û goh jî bi goh e û diran bi diran e. (Evan ji ber hev da tene tûlkinê. Û birîndarîjî, bi hemberî ne. Îdî kîjan merivê (ji mafê xwe bibore, gonehkarê, ji kirina wî bibaxişîne; ji wî tûl hilnede) ewa baxişandina wî ji bona wî ra dibe sedema rakirina sikatiyên wî. Û kîjan merivê ku bi wan biryarên Yezdan hinartîye berewanî neke, îdî bi rastî cewrkar evan bi xweber in.

46; Û me di pêş da, li ser şopa wan (pêxemberan) îsayê kurê Meryemê, ku rastdarya wê (pirtûka bi wan ra heyî bi nav) Tewrat fikir (bi pêxemberî) şandîye û me ji Îsa ra (pirtûka bi nav) Încîl daye. Di wê da beledî û ruhnaya (biryaran) heye û ewa rastdarya (wê pirtûka berya xwe da bi nav) Tewrat dike. Me ewa (Încîl ji bona Îsa ra daye) ji bo ku ji bona (xudaparizan bibe) beled û şîret.

47; Û (gelî peyrewên Încîlê!) hûn jî bi wan biryarên ku Yezdan (di Încîlê da) hinartîye berewanî bikin. Û kîjan merivê ku bi wan biryarên Yezdan hinartîye berewanî neke, îdî bi rastî evanê ji rê derketî ewan bi xweber in.

48; Û (Muhammed!) me li bal te da jî pirtûk (Qur'an) ji bona ku rastdarya (wan biryarên) di berya xwe da bike û bibe ewle û dîdevan li ser wan pirtûkan, bi rastî hinartîye. Îdî tu di nava wan da, bi wan biryarên ku Yezdan li bal te da hinartîye, berewaniyê bike û tu ji wan biryarên rastê, ku li bal te da hatine (rûyê xwe nefitilîne) nebe peyrevê dilxwastina wan. Ji bona her yekê ji we (pêxemberan ra) me rê û rêzikeke wî danîye. Û heke Yezdan biva, wê hûn hemûşk bi xistina komeke bi tenê, lê ji bo ku em we biceribînin ka kîjanê ji we ewan (biryarên me dane we digire) me hûn xistine deste deste, îdî hûn (gelî bawergeran!) ji bona (kirina) qenciyan bidine ber hev. Şûna fetla we hemûşka jî li bal Yezdan da ne. (Di wê gavê da) ewan biryarên ku hûn têda ne wek hev dibûn, wê ji we ra bêje.

49; Û me (eva fermana jî li bal te da hinartîye), ji bo ku tu di nava wan da bi wan biryarên, ku Yezdan hinartîye berewaniyê bikî û tu nebe peyrewê dilxwastina wan û tu xwe ji wan biparisîne. Ewan xebatê dikin, ji bo ku te ji hinek biryarên Yezdan hinartîye para bidin (poşman bikin). Heke ewan (bawer nekin) para da bizvirin, îdî tu bizane! Bi rastî Yezdan divê, ku bi hinekî ji gonehê wan, ewan şapat bike. Û bi rastî şixwa pirê merivan (ji rêya rast) derketine.

50; Qey hêj ewan berewaniya (dane) nezaniyê divên? Gelo ji bona wî komalê ku di nêzik da dizanin, ji Yezdan çêtir, yekê rindtir berewanî bike, heye?

51; Gelî ewanê ku bawer kirîye! Hûn, cihû û mexînan ji xwe ra nexine serkar. Ewan bi xweber, hinekên wan serkarê hinekê wan in. Û kîjan ji we, ku ewan ji xwe ra bixe serkar, îdî ewa jî bi rastî ji wan (cihû û mexînan) e. Bi rastî Yezdan komalê cewrkar nayne rêya rast.

52; Îdî tuyî ewanê ku di dilê wan da nexwaşî heye bibînî, ku ewan di nava (cihû û mexînan da) direvin (diçine bal wan). gava ji wan ra tê gotinê: "Hûn ji bona çi direvine bal wan filan" Ewan (aha) gotine: "Em ditirsîn ku royekî rewşa bawergeran welgere, evan filan me hildine nava xwe, me biherçiqînin." Îdî dibe ku Yezdan (ji bona bawergeran ra) ferestîyekî bine, ya jî li bal xwe da fermanekî bine, ji bo ku ewan li ser we tiştê ku di zikê xwe da vedişartin, poşman bibin.

53; Û ewanê bawer kirine (ji hev ra aha) dibejin: "Ewanê ku bi Yezdan, bi hêz sond dixwerin (digotin): "em bi we ra nin", qey evan in?" Kirinê wan şewitîne. Îdî ewan zîyan kirine.

54; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Kîjan ji we, ji ola xwe ye islamê derkebe, bira ewa (bizane!) bi rasrî Yezdanê komalekî wusa di nêzik da bine; (Yezdan) ji wan hez dike, ewan jî ewî hez dikin. (Ewa komala) di hemberê bawergeran da melûl in û di

hembere filan da jî pozbilindê serfiraz in (wê ewa komalê dîsa we bizivirîne li bal ola we ye misilmantîyê. Ewan qe ji tu sîtemên sîtemkaran natirsîn. (Loma) di rêya Yezdan da tekoşînê dîkin. Eva anîna hanê rûmeta Yezdan e, ji bona kêra bivê, ewê rûmetê ji wî ra dide. Şixwe Yezdan bi xweber jî (bi rûmetî) fire û zana ye.

55; Bi rastî serkarê we hey Yezdan û Pêxemberê wî û ewan bawergerên, ku nimêja xwe dîkin û (di halê rukû da) baca malê xwe didin û xwe ji bona wî ra kûz û rast dîkin, bi xweber in.

56; Û kîjan merivê ku Yezdan û Pêxemberê wî û ewanê bawer kirine, ji xwe ra bixne serkar, îdî (bira ewa bizane!) ku parta servahatî parta Yezdan bi xweber e.

57; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn ji wanê, ku di berya we da ji wan ra pirtûk hatîye û filane, ku bi ola we bi tinazî dileyîzin, ji xwe ra serkar negirin. Û heke hûn bi rastî bawer dîkin, hûn yezdanparizî bikin.

58; Û di gava hûn ji bona nimêjkirinê (bang didin) hevdu gazî nimêjkirinê dîkin, ewan bi wê gazîkirina we tinazan dîkin û dileyîzin, eva ririna wan, ji ber ku ewan komalekî wusa bûne, hişê wan ne digihîşte tiştan, loma tinaz dîkirin.

59; (Muhemmed! tu ji wan ra aha) bêje: "Gelî xweyê pirtûkan! Hûn hey ji ber ku me bi Yezdan û bi wê (pirtûka) li bal me da hatîye hinartinê û me bi wan (pirtûkên) hêj berê da hatine hinartinê bawer kirîye, loma rikê xwe ji me tînin (heke ji bona wî nebe) qe hûn rikê xwe ji me naynin. Şixwa bi rastî pirê we ji rêya rast derketine."

60; (Muhemmed! tu ji bona wan ra aha) bêje: "Ez ji bona we ra li bal Yezdan, di hemberê van (kirinê we da) hêj (beterê şapatan) heye, bêjim?" Yezdan kîjan deherandi be û li wî xeşim kiribe û ji wan meymûn (perest) û beraz (perest) û bendeyên pelîd çê kiribe, şûna van (bi şapatî) beterê şûna ne û evanan in, ku hêj pirtîr rêya rast wunda kirine.

61; Û di gavêkî da ewan hatine bal we (ji we ra) gotine: "Me bawer kirîye." (Gotina wan nîne). Bi sond! Ewan bi filetî hatine û bi filetî jî ewan derketine (çûne).

Şixwa Yezdan bi xweber jî çêtir bi wan tiştên ku ewan veşartibûne dizane.

62; Û tu dibînî, ku pirê ji wan ji bona (kirina) gonehan û neyartîya (bi we ra) û ji bona ku tiştên ne durist bixun, bi lez didine ber hevdu. Bi rastî çîqa sike tiştê ewan dikiribûne!

63; Qey heke zanan û rêberan, ewan ji wan gotinê wanê gonehkarî û ji xurina ne duristî bidana para da çi dibû? Bi rastî çîqa sike tiştê ewan ji xwe ra xistibûne pêş e!

64; Û cihûyan gotine! Destê Yezdan girêdaye (ji bo wî dayînê nake). Bi sedema wê gotina wan, destê wanê bê giredanê û li wan deherandinê bê kirine. Gotinê wan nîne! Lê herdu destê wî jî vekirîne ewa ça bivê, wusa disixurîne. Û bi rastî filetî û quretîya pirên ji wan, di gavê biryarek ji Xudayê te, li bal te da hatîbe hinartinê, pir dibe. Û me di nava wan da heya roya rabûnê hemûtî, neyartî û xerez avêtîye (îdî ewan nabine destêkî). Ewan çîqa gavêkî ji bona qirînê ra, agirek hilkiribin, Yezdan ewa agira temirandîye. Ewan di zemîn da digerin, ku tevdanîyekî derxî û Yezdan bir xweber jî ji tevdanokan hez nake.

65; Û heke xweyê pirtûkan bawer kiribûnan û (ewan Yezdan) parizî kiribûnan, bi rastî meyê jî sikatîyên wan ji ser wan rakira û meyê ewanan bixistina bihiştê qencî û xwarin û xakirinan.

66; Û heke ewanan, weki ça pirtûkên (bi nav Tewrat û Încîl û ewan biryarên (ji pêştirê van herdu pirtûkan) ji Xudayê wan, li bal wan da hatîye hinartine, ferman kirine, fermana wan pêk anîbûnan, ewanê di her alyê xwe da bi gihîjtina qencîyan, wê ji wan bixarinan. Ji wan destêke bi sexbêr heye (nîv warî ne). Lê pirên ji wan çîqa tiştên sik dîkin!

67; Pêxember! Çi biryarên ji Xudayê te li bal te da hatine hinartinê, tu ewan ji kesan ra bêje û heke tu ewan ji kesan ra nebêjî, îdî bi rastî te pêxemberîya Xudayê xwe pêk ne anîye. Û Yezdan te ji kesan diparîsîne. Birastî Yezdan komale File nayne rêya rast.

68; (Muhammed! tu ji bana wan ra aha) bêje: "Heya hûn (fermana) Tewrat û Încîl û ewan fermanên, ku ji Xudayê we li bal we da hatine hinartinê, pêk neynin, hûn li ser tu tiştê ji "ol" a nînin. Û bi rastî filetî û quretîya pirên ji wan. Di gava biryarek ji Xudayê te, li bal te da hatîye hinartinê, pir dibe. Îdî tu ji bona (teşqela ku wê bi wan da were) li ser, komalê file ko-vanî neke.

69; Bi rastî ewanê ku bawer kirine û ewanê ku bûne cihû û ewanê sterk perest û ewanê mexîni hene! Ji wan, kîjan bi Yezdan û bi dan û gavê para da bawer kiribe û karê aştî kiribe, îdî tu tîrsa (ji şapatdanê) li ser wan tune ye û ewan bi xweber jî (ji kêm xelatdanê) mirûz nabin.

70; Bi sond! me ji zarên cihûyan peyman sitandiye û me li bal wan (zarên cihûyan da) pêxember şandine. Çiqa li bal wan da, pêxembereki bi wan (biryarên) ku dilê wan nexwastiye hatibe, destekî ji wan (pêxemberan) didine derewdêrandinê û destekî jî dikujin.

71; Û ewan goman kiribûn, ku eva kirina wan (bi serê pêxemberan ji bona wan ra) nabe teşqe, îdî ewan kor û ker bûne, paşê (ewan ji kirinê xwe poşman bûne) îdî Yezdan jî poşmaniya wan litê kirîye. Paşê (dîsa) pirê ji wan kor û ker bûne. Yezdan bi xweber jî tiştê ewan dîkin, dibîne.

72; Bi sond! Ewanê ku gotine: "Bi rastî Yezdan, Mesîhê kurê Meryemê bi xweber e," hene! Evan bûne file. Û Mesîh bi xweber jî (ji bona wan ra aha) gotîye: "Gelî zarên cihûyan! Hûn perestîya Yezdanê, ku Xudayê min û Xudayê we ye, bikin. Rastî eva ye: Kîjan meriv, ji bona Yezdan ra hevriyan çê bike, îdî bi sond Yezdan li ser wî (çûna) bihiştê qedexê kirîye û ewra wî hey agir e. Şixwa ji bona cewrkaran ra qe tu arîkar tune ye.

73; Bi sond! Ewanê ku gotine: "Bi rastî Yezdan yekê ji sisîyene" hene! Ewan bûne file. Şixwa Yezdan, hey Yezdanekî bi tenê ye û heke ewan xwe ji wan tiştên ku dibêjin, neparisî-nin, bi rastî wê bi wanê, ji wanên ku bûne file şapateke dilsoz bigire.

74; Îdî qey ewan, ji wan (gotinê xwe) poşman nabin û lavaya baxişandina gonehê xwe ji Yezdan nakin? Bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

75; Mesîhê kûrê Meryemê hey pêxembereke (ji pêştirê wî tu tişt nîne). Di berya wî da pêxember hatine çûne. Û diya (Mesîh jî) jineke rast bûye. Herdukan jî xwarin dixwarin. (Muhemmed! tu mêze bike, ka em ji bona wan ra beratan çê vedikin. Tu paşê mêze bike ewan çê ji (doza me) rû difetilînin.

76; (Muhemmed! tu ji bona wan ra aha) bêje: "Hûn çê ji bona wan tiştên pêştirê Yezdan ku qe (ewan tiştan ji bona we ra) tu zîyan û karê nadin perestî dîkin?" Şixwa gohdarê zana hey Yezdan bi xweber e!

77; Tu (ji bona wan ra aha) bêje: "Gelî xweyê pirtûkan! Hûn di "ol" a xwe da bê mafî tengayê çê nekin û hûn nebîne peyrewê dilxwastina wî komalê, ku hêj berê da ji rêya rast derketibûne û ewan pîr (meriv jî) ji rêya rast derxistibûne. (Erê!) ewan ji rêya rast derketibûne."

78; Ewanê ji zarên cihûyan, ku bûne file hene! Ewanan li ser zimanê Dawûd û li ser zimanê Îsayê kûrê Meryemê hatine deherandinê. Ji ber ku ewan serî bilind kiribûn (ewan biryarên di pirtûkê da hebûn, pêk ne anîbûn) û ji tuxubê xwe derbas dibûn, evan (deherandin li wan hati-bûye kirinê).

79; Ewan (zarên cihûyan) qe hevdu ji wan tiştên kerixokên ku ewan dikiribûne, ne didane parisandinê. Bi rastî tiştê ewan dîkin, çiqa sik bûye!

80; (Muhemmed!) tu pirên (wan zarên cihûyan) dibînî, ku ewan (ji rikê bawergeran da) ji xwe ra ewanê bûne file dixne serkar. Bi rastî tiştê dilê wan bixastin pêş va xistiye, çiqa sik e! ji bona wî şixwa Yezdan li wan xêşim kirîye û ewanê di şapatê da jî her bimînin.

81; Û heke ewan bi Yezdan û bi pêxember û bi wan biryarên ku li bal (pêxember da) hatine hinartine, bawer bikin, ewan (file) ji xwe ra ne dixistine serkar. Lê pirên ji wan jî (rêya baweryê) derketine.

82; (Muhemmed!) Tuyê rast werî, ku ji merivan, neyarên mezin, ji bona bawergeran ra cihû û ewanê hevriyan (ji bona Yezdan ra) çêker in. Û tuyê rast werî jî, ku ji bona bawergeran ra ji merivan, ewanê bi hezkirin nêzîkê wan in, ewan merivên, ku gotine: "Bi rastî em arîkarok in (mexîniyan bi xweber in)." Ji ber ku ji wan (mexînan) zana û ji cihanê damen berdane wan hebûne, (eva hezkirina hanê ji bona bawergeran ra, kirine). Û evan (mexînan jî di gava ji bona wan ra biryarên Yezdan dihatine gotin ji litêkirinê) xwe qure ne dîkin. (Eva pêxembera ji pêxemberê me piçûktir e, ya jî tiştên mayî ne digotin).

83; Û di gava, ku ewan gohdarya wan (biryarên) li bal pêxember da hatine hinartinê, dîkin, tu dibînî ji ber ku ewan maf bi salixdana rast zanîne, çave wan hêstiran dirêje, ewan dibêjin: "Xudayê me! Me bawer kirîye, îdî tu jî me bi wanê (ku bawer

kirine) ra bi şahidî binivîse."

84; Û em bi xweber (ji Yezdan) daxwazî dikin, ku Xudayê me, me bixe nava komalê aştîkar. (Îja) emê ça bi Yezdan û bi wan (hemû) tiştên, ku ji wî li bal me da bi mafî hatiye, bawer nekin?

85; Îdî Yezdan jî bi sedema wan (dilxwazîyên) ku ewan gotibûne, ewan bi qencî xistibûye wan bihiştên (ku di binê darê wan da) çem dikişin. Ewanê di wan (bihiştan da) her bimînin. Şixwa xelata qencîkaran eva ye.

86; Û ewanê, ku bi beratên me bûne file, derew kirine hene! Hevrîyên dojê ewan bi xweber in.

87; Gelî ewanê ku we bawer kirine! Ewan tiştên paqijên, ku Yezdan ji bona we ra durist kirîye, hûn li xwe ne durist nekin û hûn ji tixûbê (biryarên Yezdan neborin). Bi rastî Yezdan ji wanê tixûbborî hez nake.

88; Û hûn (gelî bawergeran!) ji wan tiştên ku Yezdan bi dilikî ji bona we ra bi duristî û tîtalî daye, bixun. Û hûn parizaya wî Yezdanê ku we bi wî bawer kirîye, bikin.

89; Yezdan we bi wan sondên we ne, ku hûn ne ji bona armancekî dixwûnin (lê hûn hema ça radibin, rûdinên, hûn dibêjin: "Wellahî eva aha ye)" gonehkar nake. Lê (Yezdan) we bi wan sondên we ne, ku hûn bi wan sondan, kirîn û birîn û peymanê dixwe, ji hev ra didin (paşê pêk jî naynin) gonehkar dike. Celata vê sonda hanê eva ye: Divê (ku ewê sondxandî) ji wê xwarina nîvwarî ye, ku hûn ji bona malîyên xwe ra didine xwarinê, deh kesê xezan ra xwarinê bide, ya jî (sondxandî) li wan deh xezanan kincan bike, ya jî (sondxandî) bendekî (kole) azad bike. Îdî kîjan (sondxandî; heke ji bê burhîyî û ji tunebûnê) rastî van (celatên borî) nehat, divê îdî ku ewa sê royan rojî bigire. Di gava hûn sond bixun, evan (celatên borî) dibine sedema rakirina gonehê sonda we. Û hûn sondê xwe biparisînin (di gava we sond xand, hûn ewan sondên ku we xandiye pêk bînin) Yezdan jî bona we ra berateyên xwe aha vedike, dibe ku hûn bi rastî sipazîya wî bikin.

90; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Bi rastî ewan tiştên ku bi wan sermestî çê dibe û xumar û kevirên çikandî (pût, yi jî ji bona litê kirina dilxwazîyan bi perestî li ser gorî têne jêkirinê) û destegul (li ser wan, navan dinivîsin; navê kîjanî derkebe destegulya wî ye) hemûşk jî sik in; ji karê pelîd in. Îdî hûn xwe ji wan (karan) biparisînin. Bi rastî hevî heye ku hûn fereste bibin.

91; Bi rastî pelîd divê ku bi wan tiştên sermestok û bi xumarê di nava we da neyartî û xeşmê çê dike, û we bîr aîna Yezdan û ji nimêjkirinê bide para da. Îdî hûnê ji wan biparisînin, wusa nîne?

92; Û hûn (gelî bawergeran!) bi gotina Yezdan û bi gotina pêxember bikin û hûn xwe ji bê gotina wan biparisînin. Îdî heke hûn ji gotina wan derkebin, hûn bizanin! Bi rastî li ser pêxemberê me, hey ragihandina van biryaran bi vekirî heye (ji pêştirê wî qe tu pirsra wî tune ye).

93; Ewanê ku bawer kirine û karê aştî kirine hene! Di gava ewan xwe (ji hemberya Yezdan hatinê da) parisandibin û bi wî bawer kiribin û karê aştî jî kiribin, paşê li pey (vê kirina xwe da, dîsa xwe ji kirinî qedexan) parisandibin û bi wan (qedexan jî) bawer kiribin (ku ewan qedexe ne) û pasê (li pey vî da jî dîsa xwe ji kirina xirabîyan) parisandibin û qencî kiribin, ji bo ku ewan, ji wan (qedexeyên borî) çeşne kirine, qe tu gonehkarî li ser wan tune ye. Û Yezdan bi xweber jî şixwa ji qencîkaran hez dike.

94; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Bi sond! Yezdan we (di gava ihramê da) bi wan nêçîrên, ku dest û rimên we digihêjîne wan (ji bo ku hûn ewan bigirin) diceribîne, ji bo ku Yezdan bi wanê di penhatîyê da ji wî ditirsin, bizane (ka kîjan ji we di wê gavê da xwe ji qedexeyên wî diparisîne. Îdî kîjan ji virha (ji wan biryarên, ku Yezdan ji bona qedexeyên ihrama hecê ra daniye) bibore, bira ewa bizane, ku bi rastî ji bona wî ra şapateke dilsoz heye.

95; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Di gava heke hûn di ihramê da bin (heya ku hûn ji ihramê dernekebin) hûn nêçîran nekujin. Û kîjanî ji we (nêçîrekî) bi qestî bikuje, îdî celata wî ev e: Dibê ku ewa (kujrawa) tarişeke wekî wekî wê tarişa hov e hatiye kuştinê, ji wan tarişên kedî, bi gorî jêke. Dibê ku du merivên dadvanên ji we jî berewanî bikin, ku ewa tarişa (we gorî kirîye, di goşt û di bahayê xwe da) wekî wê tarişa hov e hatiye kuştinê, dibe. Dibê ku ewa (tarişa tê gorîkirinê) di bajarê (mizgefta bi nav) Kabe, têda ne (bê gorîkirinê) ya jî di şûna (goryan da,

wekî bahayê goryan) xwurek bi xezanan bide xwarinê ya jî di şûna (xwurek da, wekî her pîvaneke ku bi bahayê goryan hatine kirinê) rojî bigire. Eva celatdana hanê, ji bo ku kujraw çeşne bike (ka kuştina nêçîran ça ne!) Ewan (nêçîrên borî) Yezdan sikatîyên wan baxişandîye û kîjan dîsa (ji piştî van celatan) nêçîran bike (bira ewa bizane!) bi rastî îdî Yezdanê ji wî tûlê hilde. Şixwa Yezdan bi xweber jî serva hatê xweyî tûl e.

96; Ji bona jîyana we, ku bi hêsanî dom bike, ji bona we û ji bona rewîyan ra nêçîra deryayê bi tevê xwarina ji wan durist bûye. Û heya hûn di ihrama (hecê da bin) nêçîra reşayî ji bona we ra hatiye qedexekirinê û hûn parizaya wî Yezdanê ku hûnê li bal wî da bicivin, bikin.

97; Ji bona ku hûn bizanin, Yezdan bi tiştên di ezman û di zemîn da heyî dizane û bi rastî jî Yezdan bi hemû tişt dizane; Yezdan Kabe (bi nav) Beyt il-Heram ji bona kesan ra xistiye şûnwarê (pêkanîna mafan û ewletîyî). Her wusa jî Yezdan mehên dane (heckirinê) û gorîyên bi guhar û bê guhar (ji bona kesan ra) xistine (sedemên) ewletîyî.

98; Hûn bizanin! Bi rastî Yezdan zor şapat e. Û bi rastî Yezdan baxişkarê dilovîn e.

99; Li ser pêxemberan ji pêştirê ragihandina (biryarên Yezdan) ji bona kesan ra (qe tu pîrsa wan tune ye). Şixwa Yezdan bi xweber jî bi wan tiştên ku hûn vedişêrin, ya jî hûn bi xûyayî derdixin, dizane.

100; (Muhemmed!) Tu bêje: "Piratîya mirar û sikan, çîqa te sodret bike, dîsa jî mirar û paqij (durist ne duristî) wekî hev nabin. Îdî gelî xweyê hişan! Hûn parizaya Yezdan bikin." Bi rastî hêvî heye ku hûn fereste bibin.

101; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn ji wan tiştên, heke arşa wan ji bona we ra bê vekirine, hûnê bi wan sik bibin, pîrsa wan (ji pêxember) nekin. Û heke hûn ji wan tiştan didanê hinartina Qur'anê da (ji pêxember) pîrs bikin, ewan tiştê ji bona we ra bêne vekirinê. Yezdan (evan) ji bona we ra baxişandîne. Bi rastî Yezdan baxişkarê mulahîm e.

102; Bi sond! Komalekî di berya we da (evan tiştên hanêna ji pêxemberan) pîrs kiribûne; paşê (ji rîka da) bi wan (pîrsan) bûne file.

103; Yezdan ji bona (tu kesekî ra fermana gorîdana) bi tarişa (ku pênc salan zaye, îdî gohê wê hatiye qelişandinê; sitewr serbest hatiye berdanê) û bi wê tarişa (ku hatiye peymankirinê, heke ewa meriva ji merg û nexweşîya xwe mefa bibe, wê ewê tarişê li ser pûtan jêke) û bi wê tarişa (ku bi çewî nêr û mê zaye, dibêjin: "Eva mê gehîjte birayê xweyê nêr." Îdî herduk jî têne berdanê) û bi wê tarişa (tove, ku deh salan tovdaî kiribe, îdî ii piştî wî pûrt hildane; aha gotine: "Piştî vî hişk bûye ji wî tov çê nabe," serbest berdane) ne kirîye. Lê ewanê bûne file hene! ewana (evan gotinan) bi vir li ser navê Yezdan derewan dîkin. Şixwa pîrê wan bi xweber jî (ji van tiştan) hişê wan nabirin.

104; Û di gava, ku ji bona wan ra hatibe gotinê; ewan, biryarên Yezdan hinartine hene! Werin bibin (peyrewê wan) û bibin peyrewê pêxember. Ewan (aha) gotine: "Ewan biryarên ku em rast hatin, bav û bapîrên me li ser diçûn, besê me ye." Gelo heke bav û bapîrên wan qe tu tiştêkî nizanbin û ne hatibine rêya rast jî (dîsa rêya wan, bav û kalan besê wan e)."

105; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! (Hûn bi xweber li xwe mêze bikin). Di gava hûn di rêya rast da bin (hûn hatibne rêya rast) ewanê ku ji rêya rast derketine, qe bi tu awayî nikarin zîyana we bikin. Şixwa fetla we hemûşka jî li bal Yezdan da ne; îdî (Yezdanê di wê gavê da) ewan tiştên, ku we dikirin wê ji bona we ra bêje.

106; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Di gava ku yek ji we ketibe ber mirinê, bira ewa du merivên (pismamê) we ne, ku davdan in ji bona şîretên xwe ra şahid bigire. Û heke hûn di rêwîtiyê da bin, teşqela mirinê (di wê gavê da) bi serê we da hatibe, hûn du merivan ji wanê ku ne (pismamê) we ne ji xwe ra ji bona şîretên xwe şahidan bigirin. Heke hûn di mafê van herduk şahidan ku ne ji we ne, dudil bin (ewanê dîtî û bihistinê xwe veşêrin) hûn ewan herduk şahidan di piştî nimêjê bigirin; bira ewan herduk şahid (aha) sond bixun: "Bi Yezdan! Em bi tu cureyê (dîtî û bihistina xwe) venaşêrin û em (ewê dîtî û bihistina xwe jî) ji bona pismamên me bi xweber be jî, bi tu tiştî nafirosin. Şixwa heke em ewî (dîtî û bihistina xwe veşêrin, ya jî bifrosin) di wê gavê da em dibine ji wanê gonehkar."

107; Îdî heke derket, ku ewan herdu şahid jî babetê gonehkaryê bûne (şahidiya xwe

rast ne gotine) bira du mîratxurên ji pismamê mirî (ku ewan herduk jî ji wan pismamên, di mîratê da xwayê par in) di şûna van herdu şahidan da, rabin şahidî bidin (aha jî) sond bixun: "BiYezdan! Şahidiya wan herdukan, ji şahidiya wan herdukan jî rastir e û bi sond! Em ji rastiyê para ne çûne. (Şixwa heke em rastiyê veşêrin) di wê gavê da em dibine ji wanê cewrkar."

108; Eva şahidiya bi vî awayî, ji bona ku şahid, şahidşya xwe rast bidin, ya jî şahid bitirsîn (heke şahidiya wan di para da rast dernekebe) wê sonda wanê bi hinek sondê (şahidên mayî) para da derew derkebe, rêyeke çêtir e. Û hûn yezdanparizî bikin, hûn gohdarya (biryarên Yezdan bikin). Bi rastî Yezdan komalê ku ji rêya rast derkene nayne rê.

109; Di roya ku Yezdan, pêxemberan dicivîne (ji wan aha di pîrse): "Di gava, ku we biryarên min ji bona koma xwe ra digotin ji bona we ra çi pisyar hate danê?"

(Pêxemberan) gotine: "Bi rastî tu zanîn ji bona me ra (bi pisyara wan) tune ye, hey tu bi tenê bi wan tiştên penha çêtir dizanî."

110; Di gavêkî da Yezdan ji bona Îsayê kûrê Meryemê ra (aha) gotiye: "Îsa! Tu ewan qenciyên min e, ku li ser te û li ser diya te hene, bira xwe bîne. (Tu dizanî) ku min piştevaniya te bi canê pîroz kiribû. (Îdî) tu di çincîlê da û di gavê lawîtî û di kalîya xwe da bi kesan ra diaxivî, kanê! Min bi te nivîsandin û zanîna retkokî û Tewrat û Încîl, daye hînkirî. (Û bira xwe bîne) kanê! Te ji heryê tokela çûkan bi destûra min, çê dîkirin, îdî te di wan tokelan da puf dîkir, ewan tokelan jî bi destûra min, îdî dibûne çûk. Û te bi destûra min kurên zikmakî û kotî mefa dîkirin. Kanê! Te bi destûra min mirî (bi zindî) derdixistin. Û (bira xwe bîne) kane! Di gava ku tu (li bal zarên cihûyan da) bi beratên daveker va hatibûyî, îdî ewanê file ne, ku ji wan zarên cihûyan bûn (aha) digotin: "Bi rastî evan (berateyên ku tu ji bona me ra tînî) hey ançên xûyayî ne." Me jî tu di wê gavê da ji wan parisandî.

111; Û (bira xwe bîne) gava me li bal suxtan da niqandibû; ku ewan suxtan bi min û bi pêxemberê min bawer bikin. (Ewan suxtan aha) gotine: "Me bawer kirîye û tu şahid be, ku em bi rastî misilman in."

112; Di gava suxtan ji bona (Îsa ra aha) gotine: "Îsayê kûrê Meryemê! Gelo Xudayê te dikare, ku bi ser me da li ezmanan xewaneke (xwarinan) bihênirîne?" (Îsa ji wan ra aha pisyar daye) gotiye: "Heke hûn bawer dîkin, hûn yezdanparizî bikin (ji van gotin û kirinan dest berdin)."

113; Ewan (suxtan aha) gotine: "Em divên, ku em ji wê (xewanê) xwurekan bixun ji bo ku dilê me hêsanî be û em bizanin, ku tu bi rastî ji bona me ra rastiyê dibêjî, û em jî li ser wan bibne şahid."

114; Îsayê kûrê Meryemê jî (bi lavatî aha) gotiye: "Xudayê me! Tu li ezmanan bi ser me da xewaneke (xwarinan) bihênirîne, ji bo ku ewa (xewana) ji bona me û ji bona wanê pêşrewan û paşrewanê me ra bibe cejneki û derheozeke ji te be. Û tu (ewan xurekan) bi me bide sixurandinê. Şixwa tu bi xweber jî çêtirê sixurandokanî."

115; Yezdan jî (aha) gotiye: "Bi rastî ezê ewê (xewanê) bi ser we da bihênirînim. Îdî kîjan ji we ji piştî hinartina (xewanê) bibe file, ezê ewî bi şapateke wusa şapat bikim, ku ez wekî wî di gerdûnê da, tu kesekî şapat nakim."

116; Di gavêkî da Yezdan (ji bona Îsayê kûrê Meryemê ra aha) gotiye: "Îsayê kûrê Meryemê! Qey te ji bona kesan ra (aha) gotiye." Hûn (gelî kesan!) ji bal Yezdan, min û diya min jî ji xwe ra bixne du Yezdan? (Îsa aha) gotiye: "Ez (te ji wan gotinê wan) paqij dikim, tu maf ji bona min ra tune ye, ku ez ewê tişta qe tu mafê hûn têda tune be, bêjim. Heke min wusa gotibe şixwa tu pê dizanî. Tu bi tişta ku hundurê min da heye dizanî, lê ez bi tişta di hundurê te da heyî nizanim. Bi rastî hey tu bi tiştên penha dizanî."

117; Min ji bona wan ra, ji pêştirê wan (biryarên) ku te fermana min kirîye; ez ewan ji wan ra bêjim, qe tu tişt ji wan ra ne gotiye. (Min ji bona wan ra aha) gotiye: "Hûn perestiya wî Yezdanê, ku Xudayê min û Xudayê we ye, bikin. Heya ku ez di nava wan da bim, ez şahidê li ser wan im, îdî di gava ku te ez ji nava wan derxistim (canê min sitand) tu bi xweber dibî dîdevanê li ser wan. Şixwa tu bi xwer jî şahidê li ser hemû tiştanî."

118; Heke tu ewan şapat bikî, bi rastî ewan bendeyên te ne (tu kes têkil nabe). Şixwa heke tu ewan bibaxişînî, bi rastî servahatê bijejke hey tu bi xweberî (dîsa tu kes nikare têkil bibe).

119; Yezdan gotiye: "Eva roya hane royake wusa ne, ku di wê roye da rastiya

rastgoyan ji bona (wan rastgoyan) bi kêr tê. Ji bona wan ra bihiştên, ku di binê (darê) wan da çem dikişin, hene. Ewanê di wan bihiştan da tum carîn bimînin. Yezdan bi wan qayîl bûye, ewan bi xweber jî (bi dana) Yezdan qayîl bûne. Serfirazîya mezin eva ye."

120; Seroktîya ezman û zemîn û seroktîya wan tiştên (di ezman û zemîn da) heyî hey ji bona Yezdan ra ne. Şixwa Yezdan bi xweber jî li ser hemû tiştan bi hêz e.

## Chapter 6 (Sura 6)

1; Ew Yezdanê, ku ezman û zemîn afirandîye û taritî ûrohnayî (şev û ro) çê kirîye; çîqa pesindayîn hene! Hemûşk ji bona wî ra ne. Bi vî ra jî dîsa ewanê ku bûne file ji piştî (vê zanînê) ji bona perestîya Xudayê xwe ra (pûtan di perestîyê da) yek digirin.

2; Yezdan ew e; ku hûn ji heryê afirandine û paşê ji bona we ra danê (jîn û mirinê qedandîye. Û danekî navdayê li bal (Yezdan) heye. Û paşê hûn bi xweber jî di wan danan da dudil dibin.

3; Di ezman û di zemîn da ewa Yezdanekî (bi tenê ye). Ewa bi dizî û bi xûyayên we dizane û bi tiştên hûn dikin jî dizane.

4; Û çîqa beratekî ji berateyên Xudayê wan ji wan ra hatibe, ewan ji wê beratê hey rû fetilandine.

5; Îdî bi sond! Di gava ji wan ra maf (Qur'an) hatîye, dîsa ewan, ewa mafa jî dane derewdêrandinê. (Qe tişteke nabe!) Wê di nêzik da axiftina wan tiştên, ku ewan (bi hatina wan tiştan) tinaz dikiribûne, ji bona wan ra were.

6; Qey ewan nabînin, ka me çîqa komal di berya wan da teşqeke kirine? Me ewan komalan wusa di zemîn da bi cîh kiribû, qe me ji bona we ra wusa (di zemîn da) bi cîhkirin ne dabûye û me bi vî ra jî bi ser wan da (ewrên) jorê, ku şilyê dirêjin, şandîye û me di nava (dar û çandinîyên wan da) çemê (avê) dane kişandinê (ewan dîsa ewan qencên me bîrva kiribûne) me jî ewan bi gonehên wan teşqeke kirîye û me ji piştî (teşqekekirina wan di şûna wan da) hinek nişanên (çaxnên) mayî bi gehijandin afirandine.

7; (Muhemmed!) Heke me bi ser te da pirtûkeke wusa, ku ewa pirtûka di kaxizan da hatibûya nivîsandinê, îdî ewan bi xweber jî destê xwe dabûna wê (pirtûka nivîsarî) hinartibûya, wê ewanê ku bûne file hene! Dîsa jî bigotinan: "Eva (pirtûka) hey ançeke ber çevîye."

8; Ewan (aha) gotibûne: "(Gotî) li ser (Muhemmed) da firişteke ne hatibûya hinartinê (ku me jî bi wî bawer bikira)? Û heke me firişteke hinartibûya, şixwa bûyera (bi şapata wan) pêk hatibû, îdî me ne dihişt ku ewan çavê xwe vekin.

9; Û heke me (pêxember) bixista firişte jî, dîsa meyê ewa (firiştê) bixista merekî wusa, meyê ewan kincên, ku hûn li xwe dikin li wan jî bikira.

10; (Muhemmed!) Bi sond! Ewan pêxemberên di berya te da hatibûne hene! Bi wan jî hatibûye tinaz kirinê. Lê îdî (ewa şapata) ku ewan bi hatina wê tinaz dikiribûne (ewan tinazkarên) ji wan hildabûye nava xwe da (ewan bi wê şewitî bûne).

11; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Hûn di zemîn da bigerin, paşê hûn li bal (temtêla) wan kesên, ku ewan (bi beratên Yezdan) derew dikiribûne mêze bikin, ka ça bûye!"

12; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo hemû tiştên di ezman û di zemîn da heye ji bona kê ra nin?" (Ewan bêzar dibin nikarin pisyara te bidin, tu ji wan ra aha) bêje: "Ewan (heyran hemûşk) ji bona Yezdan ra nin. Ewî (Yezdanî) li ser xwe bi vê nevê dilovînî nivîsiye. Bi sond! Ewê wê we di wê roya, ku di hatina we da qe tu dudilî tune ye, bicivîne. Ewanê ku bawer nakin hene! Îdî ewan bi xweber xwe xistine zîyanê."

13; Û çîqa tiştên di şev û royan da di êwirin hene! Hemûşk jî ji bona wî ra nin). Û bihiştokê zana ewa bi xweber e.

14; (Muhemmed! Tu aha) bêje: "Ka ezê ji pêştirê wî Yezdanê, ku ezman û zemîn afirandîye û dide xarinê û qe jî naxwe, ça ji xwe ra serkaran bigirim?" (Muhemmed! Tu ji wan ra aha jî) bêje: "Bi rastî ez aha hatime fermankirinê; ku ez bibime misilmanê cara yekem û (ji min ra hatîye fermankirinê) ku ez nebime ji wanê hevriçêker."

15; (Muhemmed! Tu aha) bêje: "Bi rastî ez ditirsim, heke ez bê gotina Yezdan bikim ku ewa di wê roya mezin da li min şapateke mezin bike."



16; Ewa (royeke wusa ne) heke di wê royê da (Yezdan) merivêkî ji şapatê bizivirîne, bi rastî ewî li wî dilovînî kirîye. Û serfirazîya xûyayî eva ye.

17; Û heke Yezdan bi te da aşîtekî bine, îdî ji pêştirê wî tu kes nikare ewe aşîte rake. Û heke ewa qencîyekî bi te bike, bi rastî îdî ewa li ser hemû tiştan bi hêz e.

18; Û hey ewa bi xweber e (ku wekî gotina xwe bi tenê) li hemû bendeyên xwe dişî. Ewa bi xweber e (ku ji bona hemûşk derdan ra) bijejk e û zana ye.

19; (Muhammed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo ji bona şahidîyê çi tişt meztir e?" (Ewan ji pisyarê bêzar dimînin. Tu ji bona wan ra bi pisyarî aha) bêje: "Yezdan di nava min û we da şahid be, ku eva Qur'ana hanê li bal min da hatiye niqandinê; ji bo ku ez we bi wê Qur'anê (bi hatina şapatên para da) bidime tirsandinê, wusa jî ewanê, ku Qur'an gehîjtîye li bal wan. Qey hûn bi rastî şahidî didin, ku bi Yezdanê (babatê perestîyê ra) hinek yezdanên mayî jî hene?" (Tu ji wan ra aha) bêje: "Ez bi xweber şahidî nadim." Tu bêje: "Bi rastî (Yezdanê babetê perestîyê) Yezdanekî bi tenê ye û ez bi xweber jî ji wan tiştên, ku hûn (ji Yezdan ra dixne) hevîrî bê gur û bê goman im."

20; Ewanê ku me ji wan ra pirtûk daye hene! Ewanan (bi wan salixên di pirtûkê da hebûne) ça kurên xwe nas dikin, wusa jî (pêxemberîya Muhammed) nas dikin. Ewanê îdî bawer nakin hene! Ewan bi xweber xwe xistine zîyanê.

21; Gelo ji wanê ku bi vir li ser (navê) Yezdan (dipeyivin) ya jî bi berateyên (Yezdan) viran dikin, cewrkar kê heye? Bi rastî ewanê cewrkar serfiraz nabin.

22; Di wê roya, ku emê ewan hemûşkan bicivînin û paşê (emê ji bona wanê hevriçêker ra aha) bêjin: "Kanê ewan hevriyên we ne, ku we bi derew digirtin, li kêderê ne? (Bira ewan di îro da we fereste bikin)."

23; Paşê çara wan (di wê royê da) hey eva dimîne. Bi wî Yezdanê ku Xudayê me ye, em sond dixun ku em ji wanê hevriçêker nînin.

24; Tu li wan mêze bike; ka ewan ça derawan li xwe dikin! Û ewan hevriyên, ku ewan bi vir digirtin, ka ça ji wan wunda bûne!

25; Û ji wan hinek hene, ku (tên) gohdarya te dikin, lê ji bo ku ewan (ji Qur'anê) tu tiştî bi zanîn ji hev dernexin, me li ser dilê wan da perda muemayê û di gohê wan da jî keratî, danî. Û heke ewan hemûşk beratan jî bibînin, dîsa bawer nakin. Gava ewan têne bal te, ewan bi te ra tekoşin dikin. Ewanê bûne file hene! Ewan (aha) dibêjin: "Eva (Qur'ana hanê) ji xêncî çîrokên wanê berê pêstir tu tişt nîne."

26; Ewanan, merivan ji Qur'anê didine dîrxistinê û bi xweber jî ji Qur'anê dîr dikebin. Ewan hey bi xweber xwe teşqe le dikin, ewan bi teşqelebûna xwe jî bê agah in.

27; Û heke te ewanan di gava, ku di hemberê agir da di hatina sekinandinê bidîtan, ka ewan çi digotin! Ewanan (di wê gavê da aha) digotin: "Qey çi dibûya xwezîka em (dîsa) para da (li bal cîhanê da) bizivîranan û me bi berateyên Xudayê xwe derew ne kiribûya û em bibûna ji wanê bawerger."

28; Wekî dilxwazîya wan nîne, ji ber ku ji bona wan ra hêj di beryê da ewan tiştên ku ewan veşartibûn xûya bûye, wusa dibêjin (heke kirinên wan ji wan ra nehata xûyandinê ewan wusa ne digotin). Û heke ewan di para da (li bal cîhanê da) bihatina fetlandinê, ewanê (dîsa) bizivîriyan li bal wan kirine (ku kirina wan tiştan ji bona wan ra hatibûya qedxekirinê) bikirinan. Bi rastî ewan derewkar in.

29; Û (ewan, aha) gotibûn: "Ji pêştirê jîna meya cîhanê tu jîn tune ye û bi rastî em bi xweber îdî (nayne zindekirinê, li bal tu civînan da jî) nayne şandinê.

30; Û heke di gava ku ewan di hemberê Xudayê xwe da (ji bona xelat û celatkirinê bi sitûxarî) hew kiribûn, te ewan bidîtan (ka ewan bi çi awayî lava dikirin! Yezdan ji wan ra) gotîye: "Qey eva (danê hanê) bi rastî maf nebû? (Ewan aha pisbara Yezdan dane û) gotine: "Erê! bi Xudayê me, eva mafakî rast e." (Yezdan ji wan ra aha) gotîye: "De îjar îdî hûn jî bi sedema filetiya xwe şapatê çeşne (tam) bikin."

31; Bi sond! Ewanê ku rasthatina Yezdan didine derawdêrandinê zîyan kirine. Gava danê rabûna hemûtî ku ji wan ra nişke va hatiye, ewan barên xwe ne (ji gonehan) dan elî ser pişta xwe (aha) gotine: "Ji ber ku di cîhanê da kirina hinek tiştan ji destê me dihat (me jî ewan nekirîye, îdî kirina ewan tiştan ji destê me çûye, sed) kovan ji me ra be." Hûn hiûyar bin! Çiqa sike tişta ewan hildaye!

32; Bi rastî jîna cîhanê hey leyîztik û dilxwazî ne. Û ji bona wanê xudaparizî dikin, ewirên para da qenctir in. Îdî qe hûn bi hişî naponijin?

33; Bi sond! Em dizanin ku ewan peyvên wan (Muhemmed!) te bi rastî didine mirûzkirinê. Evan îdî te nadine derewdêrandinê, lê ewanê cewrkar hene! Ewanan bi hinçî berateyên Yezdan nepenî dikin.

34; Û bi rastî ewan pêxemberên di berya te da (Muhemmed) hene! Ewanan jî bi viran hatine derewdêrandinê. Îdî ewan (pêxemberan) li ser wan cefa û derewdêrandinên xwe, hew kiribûne, heya ji wan (pêxemberan ra) arîkaraya me hatiye. Û ji bona peyvên (peymanîyên) Yezdan ra tu guhurandin tune ye. Û bi sond! Ji te ra, ji wan serdaborîyên pêxemberan hatiye.

35; Û heke rûfetilandinê wan (ji vê olê) li ser te mezin bibe, heke hêza te tê, ku tu bi serê xwe dikarî; ku di zemîn da qulîkan çêkî, ya jî pêpelîkan di ezmana da daynî herî, ji wan ra beratan bînî, here (ji wan ra beratan bîne, qe jî li ser cefadana wan hew neke). Şixwa heke Yezdan biva, wê ewan hemûşkan li ser rastîyê bicivandinan. Îdî (hişyar be) nebe ji wanê ne zan.

36; Bi rastî pisyara (pirsa te) hey ewanê dibêhên, didin. Ewanê (dilê wan) mirî jî Yezdan ewanan radike (di Qarsê da) dicivîne, paşê ewanan li bal (Yezdan da) têne zivirandinê.

37; Û ewan (aha) gotibûne: "Kanê, wê li ser (Muhemmed) da, ji Xudayê wî berate ne hatibûna hinartinê? (Ku me jî bawer bikira). Tu (ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî Yezdan dikare ku beratan bihênirîne, lê bi rastî pirên ji wan (gava berateyên wekî xwastine wan ji wan ra were; wê ewan beratan ji wan ra bibin teşqe) pê nizanin."

38; Û çiqa rêwar ne di zemîn da digerin û çiqa melên (teyr ne) ku bi du baskên xwe difirin hene! Ewan hemûşk jî (di temtêl û jîn û mirina xwe da) komên wekî we ne. Bi rastî me di nivîsandina (we hemûşkada jî) tu tişt (ji temtêla we) bernedaye. Paşê ewanê li bal Xudayê xwe da bêne civandinê.

39; Û ewanê ku bi berateyên me derewan dikin hene! Ewanan di tarîtiyê da ker û lal mane. Yezdan kîjanî bivê, ewê (ji rêya rast) wunda dike û kîjanî jî bivê ewî datîne li ser rêya rast.

40; (Muhemmed! tu ji wan ra aha) bêje: "Ka qe hûn bi xweber ponijîne? Golo hûn dikarin bi min bidin zanînê; heke şapata Yezdan bi we da were, ya jî heke danê rabûna (hemû) ji we ra hatibe, qey hûnê ji pêştirê Yezdan, gazî hinekî mayî bikin (ku ewan di wê gavê da we fereste bikin)? Ka heke hûn di doza xwe da rast in (ji min ra bêjin)."

41; Na! Hûn ji pêştirê wî gazî tu kesî nakin. Heke ewa bivê, wê ewê (aşîta bi we da hatî) ku hûn ji bona rakirina wê lava dikin, ji we rake û hûnê jî, ewan tiştên, ku we ewan tiştan ji bona wî ra dixistne hevî, bîrva bikin.

42; Bi sond! Me li bal wan komên berya te da jî (pêxember) şandine. (Ji ber ku ewan koman bi gotina wan pêxemberan nekiribûn) îdî me jî ewan bi tirs û tengasiyan girtin (dane şapatkiri-nê) ji bo ku dibe ewan koman (dîsa ji kirinê xwe poşman binin; ji bona baxişandina xwe) lava bikin.

43; Îdî qey çi dibû ku ewan koman, di gava tirsê (şapata) me ji wan ra hatibû, lava bikirinan? Lê dile wan hişk bûye (ewan di wê gavê da jî lava ne kirine) pelîd ji bona wan ra kirinê wan xemlandine (ji ber wî, ewan lava nakin).

44; Îdî gava ewan koman ewan tiştên ku bi wan dihatine hişyarkirinê, bîrva kirine me jî derê hemûşk tiştan li ser wan da vekir (ji bo ku ewan koman, bi wan xweşî û qencîyan şa bibin, rind ewan hişyarokan bîrva bikin). Dema ku ewan koman, bi wan xweşiyên me ji wan ra dabû şa dibûn, me jî nişkêva ewan girtin (dane şapatkiri-nê). Qe îdî haja wan bi wan tunebû, ewan bê daremde jî mabûne.

45; Û çiqa sipazî hene, hemûşk ji Xudayê cîhanê ra be. Îdî bi vî komalê, ku cewr dikiribûne hatiye birînê.

46; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo hûn dikarin, ku bidne nişanê min; heke Yezdan bihistin û dîtina we hilde û li ser dilê we jî duruf bike, qey ji pêştirê Yezdanê (babetê perestîyê) xudayên mayî hene, ku dîsa (bihistin û dîtina we) ji we ra bînin?" Tu mêze bike, ka em beratan bi çi awayî (ji wan ra) vedikin! Paşê ewan (dîsa) ji wan beratan rû difetilînin.

47; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo hûn dikarin, ku bidine nişanê min, heke şapata Yezdan nişkêva, ya jî bi xûyayî bi we da hatibe, ji pêştirê komalê cewrkar (ji ber cewra kirine) têne taşqekekirinê (qe tu komalê mayê hene)?"

48; Û me çiqa (pêxemberek) şandibe, hey ji bona mizgîna (qencikaran bi bihiştê û tirsdana (gonehkaran jî bi dojê) bide me şandiye. Îdî kîjan marivê ku bawer bike û

aştikari bike, qe tu tirsar (ji aşîtan) û mirûziya (ji kêx xelatan) li ser wan tune ye.

49; Ê ewanê ku bi berateyên me derewan dîkin hene! Bi sedema ku ewan ji rêya rast derdikebûne, aşîtê bi wan bigire.

50; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Ez ji bona we ra nabêjim xezîne û defîneyên Yezdan li bal min hene û ez bi xweber jî bi penhanîya nîzanim." Ê nabêjim: "Ku ez firîşte me." Ewan (bîrîyarên) ku li bal min da hatine hinartinê hene! Ez hey dibime peyrewê wan. Tu (ji wan ra aha jî) bêje: "Qe (merivê) kor û (merivê) bi çav wekî hev dibin? Gelo hûn îdî qe raman nakin?"

51; Ê tu ewanê ku ditirsîn, wê ewanê li bal Xwedayê xwe da bicivîn (bi vê Qur'anê) bide hişyarkirinê, ku ji pêştirê (Yezdan) ji bona wan ra qe tu serkar û mehder tune ye. Bi rastî hevî heye ku ewan yezdanparizî bikin.

52; (Muhemmed tu) ewanê ku di sibah û evaran da (bi perestî) gazî Xudayê xwe dîkin, ewanan (bi vî perestîya xwe) hey qayîlbûna Xudayê xwe divên (bi gotina zengîn û serokan) ji bal xwe dernexe. Tu dayîn û sitandina wan li ser te tune ye, ça jî tu dayîn û sitandina te jî li ser wan tune ye. Heke tu ewan (ji bona dayîn û sitandinê) ji bal xwe bixî der, îdî tu jî dîbi ji wanê cewrkar.

53; Ê bi vî awayî me hinekên ji wan, bi hinekî wan daye caribandinê, ji bo ku (serokên wan aha) bêjin: "Qey ewanê ku Yezdan di nava me da bi wan qencî kirîye, evan in?" Ma qey Yezdan bi wanê sipazî dîkin, çêtir nîzane?

54; Ê ewanê ku bi berateyên me bawer kirine hene! Gava ewan hatine bal te (Muhemmed! tu ji wan ra aha) bêje: "Selam li ser we be, Xudayê we li ser xwe dilovînî nivîsiye, ku bi rastî kîjan (merivê) ji we bi nezani sîkatîyekî bike, paşê ji piştî kirîna we (sîkatîyê) poşman bibê û aşî bike, wê Xudayê ewî bibaxîşîne." Bi rastî (Xuda) baxîşkarê dilovîn e.

55; Ê bi vî awayî em beratan vedikin, ji bona ku rêya wanê gonehkar xûya be.

56; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî ez ji perestîya wan tiştên ku hûn ji pêştirê Yezdan ji wan ra perestî dîkin hatime paradanê (ku ez ji wan ra perestî nekim)." (Muhemmed! Tu ji wan ra aha jî) bêje: "Bi rastî ez nabime peyrewê hewasa we. Bi sond! Heke ez bibime peyrewê hewasa we, îdî di wê gavê da min rêya rast wunda kirîye û ewanê hatine rêya rast hene! Ez bi xweber nabime ji wan jî."

57; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî ew rêya rast e, ku ji Xudayê min ji min ra hatiye, ez li ser wê rê me û we bi xweber jî ewa rêya daye derewdêrandinê. (Ewa şapata) ku hûn bi lez dixwezîn jî, li bal min nîne. Hey berewanî ji bona Yezdan ra ne. Ewa rastî dibêje û ewa bi xwerber jî qenctirê berewana ne."

58; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Heke ewa (şapata) ku hûn leza hatina wê dîkin, li bal min bûya wê da naha da ewa bûyera, ku hûn doza lezhatina wê dîkin pêk hatibûya (tekoşîna di nava min û we da heyî, wê bihata qedandinê). Şixwa Yezdan bi xweber jî bi cewrkeran çêtir dizane."

59; Ê zîmanê (zanîna) bi tiştên penha hey li bal (Yezdan in) ji pêştirê wî qe tu kes bi wan nîzane û ewa bi hemû bi tiştên di reşayî û deryayê da hene, dizane. Ê çîqa belgeyê, ji şûna xwe bikebe hey ewa bi wî dizane. Şixwa çîqa lubeke di tarîtiya zemîn da hebe û çîqa ter û hişk hebe, hemûşk jî (temtêla wan) di nivîsandîneke xûya da ne (Yezdan bi wan dizane).

60; Ê ewê ku di şevê da (ewan tiştên ku we di royê da hildane gewdê xwe) dimrîne (ji gewdê we derdixe) şixwa ewa bi tiştê ku hûn di royê da birîn dîkin jî dizane, paşê ji bona ku ewadanê navdayî bê qedandinê, we bi vî jîna hanê (ku di şevê da, mirîna wan tiştên we di royê da hildane bedena xwe pêk tîne: tijî û vala dike, îdî mirîn û zîndetiya we dom dike. Gava danê dawiyê tê mirîna we diqedîne) heye! (Ewa Yezdan e). Şixwa paşê zivîrandîna we hemûşka jî li bal wî da ne. Paşê ewê ewan tiştên ku we dîkiribûne ji bona we ra bêje.

61; Ewa (Yezdana ye) hey li ser bendeyên xwe servehatî bi hêz e (jîn û mirîna wan, hebûn û tunebûna wan hey bi wî ye) û ewa li ser we da parîsvanan dişîne (hûn bi wan parîsvanan tene parîsandinê û dijîn). Heya danê mirîna yekê ji we hatibe, ewan saîne me ne, ku qe tu kemasî nakin, ewî dimrînin.

62; Paşê ewan (candaran ji piştî mirînê) li bal serkarê xweyê rastê, ku Yezdan e tene zivîrandînê. Hûn hişyar bin! Hey berewaniya bîrîyan, ji bona (Yezdan ra ne). Şixwa ewa bi xweber jî zû hijmartirê, hijmarvana ne.

63; (Muhemmed! tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo gava ku we dizîka da bi zarîn gazî wî fikir, we (aha) digot: "Bi sond! Heke tu me ji wan teşqelan fereste bikî emê bibne ji wanê sipazkar, kê hûn ji taritîya reşayî û deryayê fereste kirin?"

64; (Muhemmed! Tu ji wan ra (aha) bêje: "Yezdan, we ji wê (taritîyê) û ji hemû kovanan fereste dike, paşê hûn bi xweber jî ji bona wî ra hevriyan çê dikin."

65; Muhammed! tu ji wan ra (aha) bêje." (Yezdan) dişî, ku di jora we da li ser we da şapatekî bişîne ya jî di binê pê we da (ji bona we ra şapatekî bişîne) ya jî (Yezdan dişî) ku we bixe hinek komên destê û destê, bi hinek desteyên ji we tîrsa hinekî mayî bide çeşnekirinê." Tu mêze bike! Ji bo ku ewan bi rastî biryaran ji hev derxin ka em ça beratan vedikin?

66; (Bi vî ra jî dîsa) komalê te ewa (Qur'an) a ku maf e dane derewdêrandinê. (Muhemmed! Tu aha ji wan ra) bêje. "Bi rastî ez serkarê we nînim (Yezdan çi bike dişî)."

67; Ji bona her bûyerekî ra danê wê heye, û hûnê bi xweber jî di nêzîk da bizanin.

68; Û gava te ewanê ku noqê di nava berateyên me bûne dîtin, tu îdî ji wan rû bifetilîne, heya ku ewan noqê hinek mijûliyên mayî ne (pêştirê berateyên me) bibin. Û heke pelîd (rû fatilandinê ji wan) bi te da bê bîrvakirinê, ji piştî ku hate bîra te, îdî tu li bal komalê cewrkar rûnenê.

69; Û li ser wanê xudaparizî dikin, qe tu pîrsa ji kirina (wan filan) tune ye. Lê (eva şîreta hanê ji bona xudaparizan ra) bîrxistineke, dibe ku ewan (filan jî bi vê bîrxistina hanê) xwe ji (ti-nazê bi Qur'an) ê biparisînin.

70; Ewanê ku "ol" a xwe ji xwe ra xistine leyîztik û dilxwazî hene! (Muhemmed!) tu dest ji wan berde jîna cêhanê ewan xapandine tu (li wan) bi Qur'anê şîretan bike. Heke (merivek) bi keda xwe, bikebe nava teşqe le da bimîne, îdî ji bona wî ra ji pêştirê Yezdan, qe tu serkar û mehder tune ne. Û heke ewa ji bo (ku ji teşqe le fereste bibe) çiqa mal ji bona gerewa xwe da jî bide, dîsa ji wî (ewa gerewa) nayê litê kirinê. Ewanê ku bi keda xwe hatine teşqe le kirine hene! Ewanan in. Bi sedema ewa filetiya, ku ewan fikiribûne, ji bona wan ra vexwarineke ji kê m û xûnê û şapateke dilsoz heye.

71; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje. "Ka emê ça bi perestî ji pêştirê Yezdan, gazî wan tiştên ku qe tu kar û zîyana me nakin, bikin? Qey emê jî, ji piştî gava ku Yezdan em anîbine rêya rast, dîsa li pey xwe da para da bizvirin; wekî wî (merivê) ku pelîd ewa ji rêya rast derxistibe, hinek hevalê wî hebin, gazî wî bikin: "Werê bal me, ku tu bikebî rêya rast," bikin? (Tu ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî beledîya rast, hey beledîya Yezdan e û em bi xweber jî hatine fermankirinê, ku em xwe hispêrne Xudayê cîhanê."

72; Û em (hatine fermankirinê) ku em nimêj bikin û em parizaya (Yezdan) bikin. Û ewê ku hûnê li bal wî da bicivin, ewa (Yezdan) bi xweber e.

73; Ewî ezman û zemîn bi rastî afirandîye. Di danê ku ewa ji bona (heyan ra) dibêje: "Bibin." Îdî awîl ewan dibin. Gotina wî rast e. Di roya, ku di sturî da (sûr) tê pufkirinê, seroktî hey ji bona wî ra ne. Ewa zanayê bi penha û xûyaya ne. Ewa bi xweber jî bijejkeyê agahdar e.

74; Û di gavekî da Îbrahîm ji bona bavê xwe ra (aha) gotibû: "Bavo! (eva) Agir e!" Tu ça ewî ji bona xwe ra bi pûtî dixî Xuda? Bi rastî ez te û komalê te jî di rê wundabûneke xûyayî da dibînim."

75; Me bi vî awayî bi Îbrahîm (ewan tiştên mezin û sodretne) di ezman û zemîn da heyî daye dîtinê, ji bo ku (Îbrahîm, bibe ji wanê ku bê dudilî bawer dikin.

76; Îdî di gava, ku şev li ser Îbrahîm tarî bûye, ewî sitêrkek dît; ewî ji bona we (sitêrkê ra aha) gotîye: "Eva Xudayê min e." Gava ewa (sitêrka) çûye ava (Îbrahîm aha) gotîye. "Bi rastî ez ji wanê, ku diçine ava hez nakim."

77; (Piştî) gava, ku ewî dît hîv bi ruhmayî derket ewî (aha) gotîye: "Xudayê min eva ye." Ji piştî ku (hîv jî) çûye ava ewî (aha) gotîye: "Heke Xudayê min, min neyne rêya rast bi sond! ew komalê rêya rast wunda kirine hene! Ezê bibme ji wan."

78; Ji piştî ku ewî dît roj bi ruhmayî derket ewî (aha) gotîye: "Xudayê min eva ye: Eva ji hemûşkan meztir e." Ji piştî, ku roj jî çûye ava (Îbrahîm aha) gotîye: "Gelî komalê min! Bi rastî ez bi xweber ji wan tiştên, ku hûn ewan ji bona Xuda ra dixne hevri. bê gur û bê goman im."

79; Bi rastî ewê ku ezman û zemîn afirandîye, heye! Min berê xwe daye wî. Ez bi xweber jî ji bona rastîyê ra sitûxar im û bi rastî ez ji wanê hevri çêker nînim.

80; Komalê wî bi wî ra (di mafê Xuda da) tekoşîn kirin. (Îbrahîm ji bona komalê xwe ra aha) gotîye: "Hûn ça (di mafê) Yezdanê ku ez anîme rêya rast, bi min ra tekoşînê dîkin? Û ez bi xweber jî ji wan tiştên ku hûn ewan dixne hevrî ji bona wî ra, natirsim. (Ewan qe tu zîyanê nikarin bidne hûn) ji pêştirê heke Xudayê min bivê. Xuda min hemû tişt bi zanîn hildane binê hêza xwe. Îdî gelo hûn qe şîretan hilnadin?"

81; Û ezê ça ji wan tiştên, ku hûn ji bona (Yezdan) ra dixne hevrî bitirsim? Û hûn bi xweber jî ji bona Yezdan ra, ewan tiştên ku qe tu beratek ji bona hevrîtîya wan li ser we da ne hatîye hinartinê, dixne hevrî (ji Yezdan) natirsin. Gelo ji (me) herdu destan, kîjan deste babete ku (ji tirsê) ewle be? Heke hûn dizanin (ka bejin)!

82; Ewanê ku bawer kirine û qe cewr jî li bawerîya wan neketîye hene! Ewanan babet in ji bona ewlebûnê ra. Û ewê hatine rêya rast jî ewan bi xweber in.

83; Evan berateyên me ne, me dane Îbrahîm, ji bo ku ewa di hembere komalê xwe da, ji bona servahatina xwe bixebitîne. Em ji kîjanî ra bivên, em ewî bi payan bilind dîkin. Bi rastî Xudayê te bijejkeyê zane ye.

84; Û me ji bona (Îbrahîm ra) Îshaq û (kûrê Îshaq) Yaqûb bexşîş daye û me (ewan hemûşk jî bi pêxemberî) anîne rêya rast. Û me hêj di berê da Nûh jî (bi pêxemberî) anîbû rêya rast. Ça ewan (pêxemberên) ji ûrta Nûh; Dawûd û Suleyman û Eyûb û Yûsuf û Mûsa û Harûn jî (me ewan bi pêxemberî anîbûne rêya rast) û em bi vî awayî qencîkaran xelat dîkin.

85; Û (me bi pêxemberî) Zekerîya û Yehya û Îsa û Ilyas (anîne rêya rast). Ewan hemûşk jî ji aşîkaran bûne.

86; Û (me bi pêxemberî) Îsmail û Elyese û Yûnus û Lût (anîne rêya rast). Me ewan hemûşk jî bi aborî (li ser heyîne) cîhanê aborîdar kirine.

87; Û me hinek ji bav û kal û ûrt û birayên wan hêlbijart, me ewan jî anîne rêya rast.

88; Eva beledîya hanê beledîya Yezdan e (ewa bi wê beledîyê) ji bendeyên xwe, ji kîjanî ra bivê ewî tîne rêya rast. Heke (ewan ji Yezdan ra) hevrî çê kiribûnan, wê ewa keda, ku ewan dikiribûne, hemûşkê jî bi şewitîya biçûya.

89; Evanê (ku serdaborîyên wan borîne) hene! Ewan in, ku me ji bona wan ra pirtûk û seroktî û pêxemberî daye. Îdî heke (ewan kesên bi van pêxemberan) fîletî bikin; bi sond! Îdî emê di şûna van (filan da) komalê wusa bînin, ku ewan komalan bi wan (pêxemberan) qe fîletî nekin.

90; Evan (pêxemberan) hene! Ewan kesên, ku Yezdan anîne rêya rast ev in. Îdî tu jî bibe peyrewê rêya wan. (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Ez ji bona (van biryarên pêxamberya xwe) tu kirêkî ji we naxwazim, bi rastî (evan gotinê min) ji bona cîhanê ra hey şîreteke bîrvaxistîye."

91; Di wê gava ku ewan (aha) digotin: "Yezdan li ser merivan tu tişt ne hînantîye." Ewan rûmeta Yezdan wekî babetîya wî ne girtine. (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Lê gelo ewa pirtûka, ku Mûsa ji bona ruhnayî û beledîya kesên anîbû, ku hûn jî (ewê pirtûkê) di kaxizan da parparî dîkin, çi xweşa we here, hûn ewê ji bona kesên ra vedikin û çi xweşa we neçe, hûn ewê vedişêrin, kê hînantîye? Û hûn bi xweber jî bi wê pirtûkê hînê wan tiştên, ku ne bav û kalê we bi xweber jî qe bi wan tiştan, tu nizan bûne. (Ewan ji pîrsa te ye, ku tu ji wan dikî bêzar dibin, nikarin pîsyara te bidin). Tu (ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî Yezdan (ewa pirtûka hînantîye)." Tu paşê dest ji wan berde, bira ewan di noqbûna xwe da bileyîzin.

92; Û eva (Qur'ana hanê) ku me bi pîrozayê hînantîye û rastdar e ji bona wan (pirtûkên) di berya xwe da hatî, heye! Ji bo ku tu (merivê di Mekke da heyî) û ewan merivên li dora bajarê Mekke da heyî (bi şapata Yezdan bidî tirsandinê) me (li ser te da) hînantîye. Ewanê (ku dibêjin): "Me bawer kiriye," hene! Ewan bi dan û gavê para da û (bi vê Qur'anê jî) bawer dîkin. Û ewan nimêjkirina xwe jî tum carî diparisînin.

93; Gelo ji wîyê ku li ser navê Yezdan bi vir derewan dike, ya jî bêje: "Bi rastî li bal min da (dî alîyê Yezdan dal hatîye niqandinê û qe tu tişt jî li bal wî da ne hatîye niqandinê, ya jî dibêje: "Ezê jî wekî (wan biryarên) Yezdan hînantî, bihênirînim," cewrkartir hene? Heke te temtêla wan cewrkaran, di gava ku ewan dikebine ber mirinê, bidîta; firiştan ka çi ji wan ra digotin! Di gava firiştan ji bona cansitandina wan destê xwe dirêj dikiribûne (aha ji wan ra) digotibûne: "Ka

hûn canê xwe (ji destê me fereste bikin)." Bi sedema wan tiştên, ku we bê mafî li ser navê Yezdan digotin, hûnê di îro da bi şapata sernegûnî bêne şapatkirinê û we bi xweber jî ji (bawerya) bi berateyên (Yezdan) quretî dikiribûn.

94; Û bi sond! Me hûn ça di cara yekem da bi yekîtî afirandine, hûnê wusa jî bi yekîtî li bal me da bèn û hûnê bi xweber jî dest (ji wan mal û saman û dilxwazîyên xweyên cîhanê jî) berdin (ewanê li pey we da bimînin, hûnê werin). Û ka ewan mehderên we ne, ku we bi vir digotin: "Ewan (mehderan) hevriyên we ne di keda we da nin, em ewan (di îro da) bi we ra nabînin! Bi sond! Ewa (bendê di nava we da hebû) ewa ji hev çûye û ewan (mehderên we ne) ku we derew dikirin (ewanê mehderya we bikin). Ewan jî ji we wunda bûne.

95; Bi rastî çildana lud û dendikan hey Yezdan dike. Ewa ji mirya, zindîyan derdixe û ji zindîyan jî miryan derdixe. (Yezdan gene û hêkokê mê û nêr ji hev diçirîne: Bi nêr û mêtîti digihîne hev, ji wan mirî û zindîyan diafirîne, di berya vê pevxwistina hanê da jî ewan heyar bi serê xwe, candarî û ne candarya wan ne dihate diyar kirinê). Ewê evan xebatan (ji bona we ra dike) ewa Yezdan e. Îdî hûn ça ji wî rû difetilînin?

96; Ewê ku sewgurê (ji tarîya şevê diçirîne) û şev xistîye şûna ewirandinê û roj û hîv jî ewî ji bona hîjmara danan afirandîye heye! Ewa (Yezdan e). Evan (kirinê) hanênan pîvanê wîyê servahatê zana ye.

97; Û ewê ku ji bona we ra siterk di tarîtiya reşayî û deryayê da xistîye berate, ji bo ku hûn bi wan sitêrkan rêya xwe bibînin, ewa (Yezdan) e. Bi sond! Me ji bona wî komalê (ku tiştan dizanin berate bi vekirî (gotine).

98; Û ewê ku hûn ji yek nişakî bi tenê dane afirandinê (ewa Yezdan) e. Îdî ji bona we ra duşûn hene: (Yek ji wan, hûn di pişta bavê xwe da bi cîh bûn. Dudu: Hûn li bal malberxka diya xwe da hatine anemetkirinê, paşê hûn di wura da jî li bal cîhanê ra hatine anemetkirinê, paşê hûn di cîhanê da jî li bal zêrzmîn da hatine anemet kirine, paşê hûn ji zêrzmîn da jî li bal jîna para da tene anemet kirine, bi vî awayî jîna we dirêj dibe diçe). Bi sond! Me ji bona komalê pispor ra berate bi vekirî (gotine).

99; Û ewê ku ji ezmana avek hinartîye heye! (Ewa Yezdan e). Û me, bi wê avê çêra hemûşk tiştan derxistîye, îdî me ji wê (çêrê) hêşnayî derxistîye ku em ji wê (hêşnayîyê jî) hinek lubên li hev sîyarî derdixin. Û (em bi vê avê) darê xurma jî derdixin, ku (çiçilê wan darê xurma nêzikê hev in, di wan çiçilan da guşîyan nêzikê hev bi dardanin û (me bi vê avê) bostan û rez jî (derxistîne). Di wan rezan da ji tirî û zeytûn û hinar hene; (evanan) hinekî wan wekî hinekî wan in û hinekî wan jî qe wekî hev nabin. Û hûn di gava ku ewan beran derdikebin û digehîjin; li wan beran mêze bikin (ku ewan bi serê xwe nagehîjin). Bi rastî di van (kirinan da) ji bona komalê ku bawer dikin, berate hene.

100; Û (bi van salixan jî) ewan (dîsa) ji bona Yezdan ra, ewan meçêtirên ku Yezdan ewan afirandine, xistine hevri û ewan (filan) ji bona (Yezdan) ra bê zanîn kur û keç aloze kirine û (Yezdan bi xweber jî) ji wan (salixê) wan bê gur û bê goman bilind e.

101; Ezman û zemîn, Yezdan afirandîye. Ka we ça ji bona wî ra qe tu jin tune jî, zarê hebin? Û ewî bi xweber jî hemû tişt afirandine. Yezdan bi hemû tiştan dizane.

102; Ewê bi van (salixan hatiye salixdanê) heye! Ewa Yezdanê Xudayê we ye. Ji pêştirê wî tu Yezdanê (babetê perestîyê) tune ye. Ewî hemû tişt afirandîye, hûn îdî ji bona wî ra perestî bikin, Ewa serkarê li ser hemûşk tişt ne.

103; Qe tu dîtin nagihêje (hebûna) wî ye rastî. Lê ewî bi xweber jî (hebûna hemû dîtinan) hildaye binê zanîna xwe. Ewa bi xweber agahdarê bi hemû tiştê hûrê ne xûya ne.

104; Bi sond! Ji bona we ra ji Xudayê we (babetîya) dîtinê hatiye (hûn bi wê dîtinê rastîyê dibînin). Îdî kîjan (bi pisporî rastîyê) bibîne ewa ji bona xwe ra şixwa dibîne û kîjan ji dîtinan rastîyê kor be; nebîne şixwa koraya bona wî ra ne û ez bi xweber jî dîdevanê li ser we nînim.

105; Ji bo ku ewan (filan) bêjin: "Te evan beratan xwendine, li cîyekî ders hildane" û ji bona ku em ewan beratan ji bona komalekî zana ra vekin (ka mêze bike) me ça ewan beratan car bi car vekirine!

106; (Muhammed!) ewan (biryarên) ku ji Xudayê te li bal te da hatine niqandinê hene! Tu bibe peyrewê wan. Ji pêştirê wî tu yezdanê (babetê perestîyê) tune ye.

(Muhemmed! Tu) ji vanê hevriçêker rû bifetilîne.

107; Û heke Yezdan vabûya, ewan hevri (ji bona wî ra çê ne dikirin. Û me tu bi xweber jî serkarê li ser wan nînî.

108; Û (gelî bawergeran!) Ewanê ji pêştirê Yezdan perestîya (pûtan) dikin hene! Hûn çêrê wan nekin, ku îdî ewan jî bi nezanî û neyartî çêrê Yezdan nekin. Bi vî awayî me ji bona hemû koman ra (bawerî) û kirina wan xemilandîye. (Herkes ji kirin û bawerîya xwe hez dike). Paşê fetla wan (hemûşkan jî) li bal Xudayê wan da ne, îdî (Xudayê wanê ji piştî fetla wan) ewan kirinê wan wê ji wan ra bêje.

109; Û ewan (filan) bi sonda xweyên zexm sond xwarine, heke ji bona wan ra berateke sodret hatibe, ewanê îdî bi wê beratê bawer bikin. (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Bi rastî berateyên sodretî li bal Yezdan in." Qey hûn (gelî bawergeran!) goman nakin heke gava ji bona wan ra ewan beratan hatibin jî dîsa ewan bawer nakin?

110; Û em dil û çavê wan werdigerînin ewan ça di cara yekem da bawer ne dikirin (wusa dimînin) û em ewan di quretî, û koraya wan da dihêlin.

111; Û heke me li bal wan da firiştan hinartibûyan û mirîyan jî bi van ra axiftin kiribûyan û me hemûşk tişt jî (bi beratî) bi anîya ber çavê wan, ji pêştirê wanê, Yezdan vaye ku bawer bikin, qe tukes ji wan bawer nakin. Lê pirên ji wan bi xalyazî xwe davêjine nezanîyê.

112; Û bi vî awayî, me ji bona her pêxemberekî ra pelîdên ji meriv û meçêtiran neyar çê kirine. (Ji bo ku ewan) xapandinê bikin hinekê wan li bal hinekên wan da mijûliyên alozî li bal hev da diniqînin. Heke Xudayê te biva, ewan (pelîdan) wusa ne dikirin. Îdî tu bi virê wan va dest ji wan berde.

113; (Ewan pelîdan, ewan mijûliyan li bal hev da diniqînin) ji bona, ku ewan bi gohdarî dilê wanê bi roya para da bawer nakin, li bal wan peyvên da bi xwarî bidne gohdarî kirinê û ku ewan (filan) bi wan kirinê xwe qayîl bin û ku ewan (filan jî) ewan tiştên ku (ewan pelîdan) dikirin, bikin.

114; Ezê ça ji pêştirê wî Yezdanê, ku pirtûk li bal we da bi vekirî hinartîye, li berewanên mayî bigerim? Ewanê ku me ji wan ra pirtûk anîye, hene! Ewan bi xweber jî dizanin, ku (eva Qur'ana) bi rastî ji Xudayê te hatîye hinartîne. Îdî (Muhemmed!) tu nebe ji wanê hînckarê dudil.

115; Û bi rastî paşya peyvên Xudayê te, bi rastî û dadvanî hatine, ji bona guhurandina peyvên (Xudayê te) qe tu guhurandin tune ne û ewa bi xweber jî bihistekê zana ye.

116; Û heke tu peyrewîya piraya kesên di zemîn da hene bikî, ewanê te ji rêya Yezdan derxin, wunda bikin. Ewan hey peyrewîya gomanan dikin û ewan hey derewan li hev tînin.

117; Bi rastî Xudayê te bi wanê ku ji rêya wî derketine, çêtir dizane û şixwa bi wanê ku hatine rêya rast jî çêtir dizane.

118; Îdî heke hûn bi rastî bi berateyên (Yezdan) bawer dikin, hûn (ji goştê wan tarişên) ku navê Yezdan (di gava jêkirina wan da) li ser wan hatîye xwendinê, bixun.

119; Hûn ji bona çi (ji goştê wan tarişên) ku navê Yezdan li ser wan hatîye xwendinê, naxun? Û bi sond! (Yezdan bi xweber jî goştê wan tiştên, ku ji bona we ra ne durist e, ji pêştirê (wî goştê) ku hûn bi jîna nemir û neji divê bixun, hemû ji bona we ra yek bi yek vekiriye. Û bi rastî pirên ji kesan bê zanîn dibinê peyrewê xweşîya xwe, merivan ji rêya rast derdixin. Şixwa bi rastî jî Xudayê te bi wanê ji tixûbê xwe diborin çêtir dizane.

120; Û hûn dest di gonehên xûyayî û penhayî jî berdin (ya jî dest ji penhayî û xûyayên gonehan berdin). Bi rastî ewanê ku keda gonehan dikin hene! Wê ewanê bi wan (gonehên) ku ewan di bijartibûne, bêne celatkirinê.

121; Û hûn (ji goştê) wê tarişa, ku di gava (serjêkirinê da) navê Yezdan li ser ne hatibe xundinê, nexun. Bi rastî (xwarina ji goştê wan tarişan) ji rê derketine. Û bi rastî ji bo, ku hevalên pelîdan bi we ra tekoşinan bikin, pelîd li bal hevalên xwe (xwarina ji wan goştan) diniqînin. Û heke hûn bi xweber jî, ji wan (goştan, bi gotina wan bixun) hûn jî dibine hevriçêker.

122; Qe hecwêkîya wîyê, ku (dilê wî bi filetî) mirî bûye, îdî me ewa (bi bawerî) zinde kiribe û me ji bona wî ra ruhnameke wusa (dadvan) dabe; (ewa kesa) di nava merivan da (bi wê ruhname bi dadvanî) digere, wekî hecwêkîya wî (merivê) ku di

taritiya (filetiyê da be) qe ji taritiyê jî dernekebe, (wekî hev nabin) dibe?

Herwuha ji bona filan ra, keda ewan dikiribûne hatiye xemilandinê.

123; Û bi vî awayî em di hemûşk gundan da gonahkarên wanên mezin di şûna wan da dihelîn, ji bo ku ewan (mezinên gonehkar) di wan gundan da xaxan bikin. Û ewan gonehkarên bi xweber hey ji xwe ra xaxan dikin. Şixwa ewan bi kirina (xaxên xwe, ku ji bona wan ra ne) jî bê agah in.

124; Û di gava beratek ji bona (wan serokên gundên gonehkar) hatibe (ewan aha) gotine: "Heya ji bona me ra jî wekî (wan berateyên) ku ji bona pêxemberên Yezdan ra hatine, neyê, em (bi tucarî) bawer nakin." Yezdan bi xweber ka wê qasidya xwe ji bona kê ra bide, çêtir dizane. Ewanê gonehan dikin hene! Li bal Yezdan ji bona wan ra bi sedema wê keda, ku ewan dikiribûne (sernegûna) piçûktay û zor şapatek heye.

125; Îdî Yezdan ji kîjanî ra bivê, ku ewî bine rêya rast singê wî ji bona misilmaniyê vedike ji kîjanî ra bivê, ku ewî ji rêya rast wunda bike singê wî wusa teng dike (gava ji wî ra bê gotinê: "Bibe misilman" tu divêqey) hevraz diçe ezmanan! Bi vî awayî li ser wanê ku bawer nakin (şapata sikatiye) dihelê.

126; Rêya Xudayê te, eva ye û rast e. Bi sond! Me ji bona komalê bîranok berate (û biryar) vekirine.

127; Li bal Xudayê wan, ji bona wan ra (bihişt) ewlebûnê heye û (Xudayê) wan bi sedema wan kedên, ku ewan dikiribûne serkarê wan bi xweber e.

128; Û di roya ku ewan hemûşkan dicivîne (aha ji wan ra) dibêje: "Gelî koma meçêtiran! Hûn pir bi kesan ra xebitîn (we pirê wan ji rêya rast derxistin)." Ewan merivên, ku bûne hevalên meçêtiran (aha) dibêjin: "Xudayê me! Me ji bona hev ra bi zibarî arîkariya kirîye û em gehiştinw wî danê, ku te ji bona me ra diyar kirîye. (Yezdan ji bona wan ra aha) dibêje: "Şûna we (îdî) agir e, hûnê di agir da tum bimînin ji pêştirê wî danê ku Yezdan (derketina we) bivê." Bi rastî Xudayê te bijejkeyê zana ye.

129; Û me bi vî awayî (ça pelîd û meçêtir ji heva ra xistine serkar, wusa jî) me serokên cewrkar jî bi sedema ewê keda ku ewan dikiribûne, ji hev ra xistiye serkar.

130; Gelî komên meçêtir û kesan! Gelo ji we pêxember li bal we da ne hatibûn, ku ewan (pêxemberan) berateyên min bi ser we da bixwendinan û hûn ji rast hatina vê roya we ye hanê bi dana tirsandinê? (Ewan pisyara Yezdan aha dane) û gotine: "Erê! Em şahidî li ser xwe didin (ku pêxember hatibûne)." Lê jîna cîhanê ewan xapandibûn û ewan li ser xwe şahidî dane, ku ewan bi rastî (di cîhanê da) file bûne.

131; (Eva hatina pêxemberan li bal wan da) Ji bo ku Xudayê te binecîne tu gundî bi sedema cewrê teşqeke nake, heya binecêne wan gundan (ji hatina teşqelê) bê agah bin.

132; Û ji bona hemûşkan ra jî ji wê keda, ku ewan kirîye payen hene. Xudayê te bi xweber jî ji kirina wan tiştên ku ewan dikin bê goman nîne.

133; Û Xudayê te zengîn û xweyê dîlovîn e. Heke ewa bivê, ça hûn ji ûrta komalekî mayî afirandine, wê we jî behere (tune bike) ji piştî we, di şûna we da tiştê bivê bixe şûnmayî ji bona we ra.

134; Bi rastî tiştê hûn bi hatina wî hatine peymandanê, wê ewayê (bi serê we da) were û hûn bi xweber jî nikarin ewê bêzar bikin (ku ewa bi serê we da neyê).

135; (Muhammed! Tu ji bona wan ra aha) bêje; "Gelî min! hûn çî dikarin ewî bikin, bi rastî ez bi xweber jî tiştê, ku ez bikarim bikim ezê ewî bikim. Îdî hûnê bi rastî bizanin ka paşya vê cîhanê (ku bihişt e) wê ji bona kê ra be. Bi rastî cewrkar serfiraz nabin.

136; Ewan (filan) ji wan tiştên (ku Yezdan) afirandibûne (wekî bawerya xwe par kirine); ji bona Yezdan ra jî di çandinî û tarişan da, par çê kirine (ji piştî parkirinê) bi virê xwe (aha) gotine: "Evanan parên Yezdan in; evanan jî parên hevalê me ne." Îdî çî para hevalê wan heye, ewa para di para da (gava pir bibe) ji bona Yezdan ra nayê sixurandinê, lê ewa para ku ji bona Yezdan ra ne (di gava para da pir bibe, ewan ewî) ji bona hevalê xwe ra disixurînin. Çiqa sike tiştê ku ewan berewani dikin!

137; Û bi vî awayî ewan hevriyên wan, ji bona wan hevriçêkeran ra kuştina zarên wan (bi destê wan) xemilandine, ji bo ku ewan bi xweber xwe ji (ola xwe) derxin û ji bona ku "ol" a wan li ser wan aloze be (îdî rastî û ne rastî ji hev dernexin. Ya jî ji bo ku ewan bi xweber xwe bikujin, îdî "ol" a wan li ser wan bê alozekirinê; rastî û ne rastî ji hev dernekeve). Heke Yezdan bixwesta ewan (wusa) ne dikirin, îdî tu



dest ji wan û ji wan tiştên ku ewan bi vir dîkin berde.

138; Û ewan (filan aha) gotine: "Evan tariş û çandinîyên hanênan (bisixurandin) dest li wan nakebe, ji pêştirê wanê ku bivên, tu kes ewan naxwe; di gomana wan da (wusa ne) û hinek tariş jî (lê sîyarbûna wan) ne durist bûye û hinek tarişan jî (di gava serjêkirinê) navê Yezdan li ser naxûnin, bi vir (Evan: "Gorînê Yezdan in," dibêjin). Wê (Yezdanê) bi sedema wan virên ku ewan dîkiribûne, ewan celat bike.

139; Û ewan (filan aha jî) gotine: "Çi tişt di zikê wan tarişan da heye, ewa xurî ji bona mêrên me ra ne û ewan ji bona jinên me ra ne durist e. Heke ewa (sexela di zikê tarişan da) mirî zabe; şixwa îdî (mêr û jin herduk jî) di wê (sexela mirî zayî da) hempar in." Di nêzik da (Yezdan) ê ewan, bi wan salixê wan celat bike. Bi rastî (Yezdan) bijejkeyê zane ye.

140; Bi sond! Ewanê, ku zarên xwe bi fafikî, bê zanîn dikujin û tişt, ku Yezdan ji bona wan ra bi dilikî daye, ji xwe ra bi vir li ser navê Yezdan ne durist dîkin, hene! Ewan ji rêya rast wunda bûne û ewan naynên rêya rast jî, Ewan zîyan kirine.

141; Û ewe, ku bostanê çiqile darên wan bi çardaxî û bi arzêlî çê kirîye û xurme û çandinîyên ku xwarina wan cure û cure ne û zeytûn û hinarên (ku di xwarinê da çeşna) wan wekî hev e û (ewanê ku di xwarin û rengan da) wekî hev nînin (gehîjandîye) hey ewa Yezdan e. Di gava ewan (daran) berdan, hûn ji berê wan bixun û di gava çinandina wan (beran da jî) hûn (baca wî ye) maf bidin. Û hûn dest belavbûnî nekin. Bi rastî (Yezdan) ji dest belavan hez nake.

142; Û (Yezdan) tariş jî cure û cure afirandîye; (hinek) tariş, ji bona barkirinê û hinek jî ji bona (ku hûn ji pûrta wan) binraxan çê kin. Hûn ji wan tiştên, ku Yezdan ji bona we ra (bi duristî) dilikî daye bixun û hûn nebîne peyrewê şopa pelîd. Bi rastî pelîd ji bona we ra neyarekî xûya ye.

143; (Yezdan ji tarişan) heşt zo (afirandîye); ji mêşinan du zo û ji bizinan jî du zo; (Muhemmed! tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo (Yezdan) ji wan herdu zoyan, kîjan nedurist kirîye? Ka bêjin! Gelo herdu zoyên nêr, ne durist kirîye ya jî herdu zoyên mê ne durist kirîye, ya jî ewa tişt di malberxa wan herdu zoyên mê da hene, ne durist kirîye? Heke hûn (di doza xwe da) rast in ka ji min ra bi zanîn bêjin".

144; Û ji devan du zo û ji dewaran jî du zo (afirandîye. Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo (Yezdan) ji wan herdu zoyan, kîjan ne durist kirîye? Ka bêjin, gelo herdu zoyên nêr ne durist kirîye ya jî herdu zoyên mê ne durist kirîye, ya jî ewa tişt di malberxa wan herdu zoyên mê da hene ne durist kirîye, ya jî di gava ku Yezdan bi van li we şîret dîkir, hûn amede bûn? Gelo ji wî kesê ku (xebatê dike) ji bona, ku merivan ji rêya rast bê zanîn derxe, îdî cewrkar kê heye? Bi rastî Yezdan komalê cewrkar nayne rêya rast."

145; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Di wan biryarên, ku li bal min da hatine hîmartinê, ez ji pêştirê mirar û ya jî xûneke kêşokar û ya jî goştê berazan, rastî tu xwarineke, ku ne durist be ji bona merivekî xureger ra ne hatime. Şixwa (goştê berazan jî) pîs e û ji pêştirê (goştê wê tarişa) ku bi wê gorî hatîye kirine, ne ji bona (qayîlbûna) Yezdan (hatibe jêkirinê) şixwa eva jî rêderketina ji rêya rast e, nayêm. Îdî kîjan merivê ku bi vê nevê hewce be, ku ji wan tiştên qedexe bixwe, dikare (ji wan tiştan) xarineke nemir û neji bixwe." Bi rastî Xudayê te baxişkarê dilovîn e.

146; Û me li ser zarên cihûyan, hemû (candarên) bi pence (ji mel û çûk û tarişên hov û kedî) ne durist kirîye. Û dewar û mêşîniyan jî ji pêştirê donê serda pişt a û donê hestîyan ya jî donê bi hundurê wan (tarişan va) zeliqî, hemû donê mayî ne durist kirîye. Bi sedema ji ava rû derketina wan me wan ne duristîyên hanê ji bona wan ra çê kirîye. Û bi rastî em di van kirin û gotinên xwe da jî rast in.

147; Îdî heke ewan te (bi wan biryaran jî) bidne derawdêrandinê, tu (ji wan ra aha) bêje: "Xudayê we xweyê dilovanîyeke fire ye. Û tirs û şapata wî ji komalê gonehkar nayê fetilandinê."

148; Ewanê ku hevriyan digirin hene! Di nêzik da (ewan aha) dibêjin: "Heke Yezdan biva, me û bav û kalê me jî hevri ne digirtin û qe me tu tişt jî ne durist nedikir." Bi vî awayî, ewanê di berya wan da jî (ku pêxemberên xwe) dane derewdêrandinê (wekî wan gotine). Heya ku tirs û şapata me (ji wan ra hatîye) ewan çeşna şapata me kirine. Tu (ji wan ra aha) bêje: "Gelo li bal we (ji wan biryaran) zanîneke we heye, ku hûn ewê zanînê îdî ji bona me ra derxin (bidne nîşanê me)? Bi rastî hey hûn dibîne peyrewê gomanan û hûn hey derewan ji ber xwe aloze dîkin."

149; Tu (ji wan ra aha) bêje: "Şixwa berata bê dudil, hey ji bona Yezdan ra ne. Îdî heke (Yezdan) biva, wê ewî hûn hemûşk jî anîbûna rêya rast."

150; Tu (ji wan ra aha) bêje: "Ka hûn bi lez ewan şahidên xweyên, ku şahidî didin (dibejin: "Bi rastî Yezdan) ewan tiştên hanênan (ji bona merivan) ne durist kirîye bînin." Heke ewan şahidî dan, îdî tu jî bi wan ra şahidî nede û tu nebe peyrewê wan kesên, ku ewan bi berateyên me derew kirine (û nebe peyrewê wan kesên) ku bi roya para da jî bawer nakin. (Tuyê ça bibî peyrewê xweşîya wan) ewan bi xweber jî ji Xudayê xwe ra (pûtan) hempar digirin?

151; Tu (ji wan ra aha) bêje: "Ka hûn werin ezê ji bona we ra tiştê ku Xudayê we li ser we ne durist kirîye bixûnim. Hûn qe tu tiştî (ji bona Yezdan ra) nexin hevri û hûn ji bona da û bavên xwe ra qencîyan bikin û hûn ji tirsê xezanîyê, zarên xwe nekujin. Xarin û xakirin û dilika we û wanan em didin û hûn bi diyarî û penhayî qe nêzikê maştoqîyê nebin û hûn ewî canê, ku Yezdan kuştina wî qedexe kirîye, be mafî nekujin. Ji bo ku hûn hiş hildin ewî ewan ji bona we ra şîret kirine.

152; Û hûn nêzikê malê sêwîyan nebin, ji pêştirê heya ewan gehîjtine wî danê ku ewan bi xweber dikarin îdî malê xwe biparisînin. Hûn di vê gavê da bi qencî dikarin rnalê wan bisixurînin (ya jî hûn ji pêştirê qencîyan, heya sewî negihîjin, hûn nêzikê malê wan nebin). Û hûn pîvan û kêşanê bi dadvanî pêk bînin. Em ji bona heryekê wekî hêza wî fermanan dikin (ji hêza tu kesî pirtir em fermanan nakin). Û di gava ku hûn mijûl bin hûn îdî dadî bikin, heke ewan pismamê we bi xweber bin jî û pêka peymanê ku we daye Yezdan, bînin." Ewa bi van qedexan li we şîretan dike dibe ku hûn ji wan şîretan hildin.

153; Û bi rastî rêya min rast eva ye, îdî hûn bibne peyrewê rê û hûn nebîne peyrewê wan ryên mayî, ji bo ku hûn ji rêya Yezdan dernekebin, ku ji hev belav bibin. (Yezdan) bi van qedexan li we şîretan dike, ji bo ku hûn bi wan biryaran parisî bikin.

154; Û me paşê ji bona pêkanîna qencîya, qencîkaran û ji bona vekirina hemû bûyeran û ji bona beledî û dilovanîyê, ji Mûsa ra pirtûk daye, dibe ku ewan bi rasthatina Xudayê xwe bawer bikin.

155; Û eva (Qur'ana hanê) jî pirtûkeke pîroz e me hinartîye, îdî hûn bibne peyrewê (Qur'anê) û hûn (xuda) parizî bikin, hevî heye ku hûn bêne dilovînkirinê.

156; (Me eva pirtûka li ser we da hinartîye) ji bo ku hûn nebêjin: "Pirtûk li ser wan herdu desteyên di berya me da borîne (cihû û mexînan) hatiye hinartîne û em bi xweber jî ji xwendin û ji dersa wan bê agah bûne (ji ber wî me bi wan bawer ne dikir)."

157; Ya jî ji bo ku hûn nebêjin: "Bi rastî heke pirtûk li ser me da hatibûya hinartîne, emê ji wan (herdu destan jî çetir hatibûna rêya rast." Îdî bi sond! (Ewa Qur'ana) bi biryarên xweya vekerî va, ji Xudayê we ji bona we ra hatiye (ewa Qur'ana bi xweber jî ji bona kesan ra) beled û dilovînî (hatiye). Îdî gelo ji wî merivê ku biryarên Yezdan derew didêrine û ji wan biryaran rû difetilîne cewrkar kê heye? Ewanê ku rû ji biryarên me difetilînin hene! Emê ewan, bi sedema rû fetilandinê wan bi sikê şapatan, şapat bikin.

158; Qey ewan hevî dikin, ku ji bona wan ra firişte werin, ya jî ewan hevîya hatina Xudayê te dikin, ya jî ewan hevîya hatina hinek berateyên Xudayê te dikin? (Ji piştî hatina wan, paşê ewanê bawêr bikin?) Di gava hinek berateyên Xudayê te werin, îdî bawerîya tu kesî kêrê wî nayê. Heke ewî hêj di berya hatina (wan beratan da) bawer ne kiribe, ya jî ewî di bawerîya xwe da keda qencîyekî ne kiribe. Tu (ji wan ra aha) bêje. "Hûn hevîya hatina (wan beratan) bikin. Bi rastî em bi xweber jî hevîya hatina wan dikin."

159; Bi rastî ewanê ku "ol" a xwe par dikin (bi hinek! Pêxemberan bawer dikin û bi hinek pêxemberan jî bawer nakin) hene! Ewan di bêre da jî deste deste bûne. Tu giza te bi wan tune ye, bûyer û temtêla wan hey li bal Yezdan e, paşê ewan çi kiribûne wê ji wan ra bêje.

160; Kîjan bi qencîyan va hatibe, îdî ji bona wî ra deh carî wekî wan (qencîyê anî) qencî hene û kîjan bi sikatîyan va hatibe, îdî ewa hey wekî wan (sikatîyan anî) tê celatkirinê û li wan nayê cewrîkirinê.

161; Tu (ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî Xudayê min ez anîme rêya rast (ewa rêya) oleke rast e (qe tu xarîya wî tune ye). Ewa "ol" a komalê Îbrahîm e ku xarê li bal yekatiyêvan e û (Îbrahîm bi xweber jî) qe tu carî ne bûye ji wanê hevriçêker."

162; Tu (aha) bêje: "Bi rastî nimêja min û perestîya min û zindetîya min û mirina min, hemûşk ji bona Yezdanê Xudayê cîhanê ra ne."  
 163; Qe ji bona wî ra tu hevrî tune ye û ez bi vî awayî hatime fermankirinê û ez bi xweber jî misilmanê yekem e."  
 164; Tu (ji wan ra aha) bêje: "Ezê ça ji pêştirê Yezdanê, ku Xudayê hemû tiştê ne, ji xwe ra xudakî bigirim? Û meriv çi ked bike, keda wî hey ji bona wî ra ne û tu bardar ji pêştirê barê xwe, barê tu kesê mayî hilnade. Paşê hey fetla we li bal Xudayê we da ne, îdî tiştê ku hûn têda ne wekhev dibûne (Yezdan) ê ewî ji bona we ra bêje."  
 165; Û ewê ku hûn xistine şûnmayî di zemîn da, heye! Ewa (Yezdan) e. Ewî hinekên ji we li ser hinekan bi payan bilind kirîye, ji bona ku ewa di wan tiştên dane we, we biceribîne. Bi rastî Xudayê te zû şapatger e û bi rastî ewa baxîşkarekî dilovîn e.

## Chapter 7 (Sura 7)

1; E. L. M. S. (Arşa van tîpan hey Yezdan dizane).  
 2; Eva pirtûkeke li bal te da hatiye hîmartinê. Îdî ji bo ku tu bi wê (pirtûkê merivan) bidî hişyarkirinê û ji bona ku tu bawergeran (bi qencîyan) şîret bikî, bira qe tu tengasî di singê te da çê nebe.  
 3; (Gelî bawergeran!) Hûn bibne peyrewê wan biryarên, ku ji Xudayê we li bal we da hatiye hîmartinê û hûn ji pêştirê peyrewîya (wan biryaran) peyrawîya tu dostî nekin. Hûn çiqa hindik şîretan hil didin!  
 4; Û çiqa niştiman, me teşqeke kirine! Îdî gava şapata me bi wan da hatiye; ya ewan di şevê da razabûne, ya jî ewan di (nava royê da) di mijûlbûn û razanê da bûne (haja wan bi hatina teşqeke tune bûye).  
 5; Îdî di gava ku şapata me bi wan da hatiye (hey ewan aha gazî kirine û) gotine: "Bi rastî em cewrkar bûne!"  
 6; Bi sond! Îdî emê ji wî komalê ku (pêxember) li bal wan da hatine şandinê pirs bikin û emê ji wan pêxemberan jî bipirsin (ka ewan koma wan bi gotina wan kirine, ya ne kirine)?  
 7; Îdî bi sond! Emê ji wan ra (bûyerên borî) bi zanîn bêjin û em bi xweber jî (ji kirina wan) penha nînin.  
 8; Di wê roya (rabûna hemû da) kêş rast e (qe tu kêmayê wê tune ye). Îdî kêşa kîjanî giran be, ewanê fereste bûyî îdî ewan bi xweber in.  
 9; Û kêşa kîjanî jî sivik be, îdî ewanê ku bi rastî bi sedema berateyên me, li xwe cewr kirine û zîyana xwe kirine, ewan in.  
 10; Û bi sond! Me hûn di zemîn da ewirandine û me ji bona we ra di zemîn da dilik û xwarin, pêk anîne. Hûn çiqa hindik sipazî dikin!  
 11; Û bi sond! Me hûn afirandine. Me paşê ji bona we ra rûçik û temtêl daye, me paşê (ji bona firitan ra aha) gotîye: "Gelî firiştan! Hûn ji bona (nişa kesan ra) kunde beherin." Îdî ji pêştirê pelîd (firiştan hemûşk jî) ji bona (nişa kesan ra) kunde birin. Bi rastî pelîd ne bûye ji wanê kundeke.  
 12; (Yezdan ji bo na pelîd ra aha) gotîye: "Gava min fermana te kirîye, ka ji bona çi te kunde (ji bona nişa kesan ra) ne bir? (Pelîd ji bona wî ra aha) gotîye: "Bi rastî ez ji wî çêtir im; Te ez ji agir afirandime û ewa jî ji heryê afirandîye."  
 13; (Yezdan aha) gotîye: "Îdî, di naha da ji wura berjêr be, di wura da ji bona te ra qe tu maf tune ye, ku tu xwe qure bikî (bi gotina min nekî). Îdî tu (ji wura) derkebe, bi rastî tu ji wanê piçûk û riswayî."  
 14; (Pelîd ji bona wî ra aha) gotîye: "Ka, barî tu heya danê (meriv) radibin; têne civînê ji bona min ra firsetê bide, gav bihêle."  
 15; (Yezdan ji bona wî ra aha) gotîye: "Bi rastî ewanê ku ji wan ra dan hatiye dayînê hene! Tu ji wan î."  
 16; (Pelîd aha) gotîye: "Bi sond! Ji ber ku te ez bi sedema wan qewirandim, ezê ji bona wan ra rêya te ya rast daynim."  
 17; Paşê ezê di pêşya wan da û di paşîya wan da û di rast u çepê wan da, êrişê bînim wan û tu îdî rast nayê, ku pirê wan ji (bona te ra) sipazkar bin."  
 18; (Yezdan ji bona wî ra aha) gotîye: "Ka, tu bi riswayî û deherandî ji wura derkebe. Bi sond! (Ji merivan kîjan) bibe peyrewê te (bira ewan bizanin!) ezê ji we hemûşkan dojê tijî bikim."  
 19; Adem! Tu û bi jina xwe va di bihiştê da biêwirin, îdî hûn herduk ça li kêderê,

bi çî awayî hez dîkin, wusa bixun û hûn herduk jî nêzikê vê dara hanê nebin, îdî heke hûn (nêzikê vê darê bibin) hûnê herduk jî bibne ji wanê cewrkar.

20; Îdî pelîd ji bona wan herdukan awurte çê kirîye; ji bo ku ji wan herdukan ra, ji gewdê wan ewan cîyê sikê ku veşartina wî, ji wan herdukan ra hatibû fermankirinê, xûya be; ji wan ra (aha) gotîye: "Xudayê we ji bo ku hûn herduk nebîne du firişte, ya jî hûn herduk (di bihiştê da) tum carî nemînin, hûn ji xarina vê darê dane para da (ji pêştirê vî tu sedemên ma! Tune ne.)"

21; Û (pelîd) ji wan herdukan ra jî sond xwarîye; bi rastî ez ji bona we herdukan ra jî şîretan dikim.

22; Îdî (pelîd) ewan herduk jî, bi xapandin ji şûna wan dane şimitandinê, di gava ewan herdukan ji darê çeşne kirine, ji herdukan ra şûna sikatîya wan xûya bûye. Ewan herdukan ji bona veşartina wan herdu cîyên sikên ji gewdê xwe, belg ji darê bihiştî berev kirin, dane ser wan herdu qulên gewdê xwe. Û Xudayê wan (aha) gazî wan kirîye: "Qey min hûn ji xwarina berê wê darê ne dabûne paradanê û min ji bona we herdukan ra ne gotibû; bi rastî pelîd ji bona we herdukan ra jî neyarekî xûya ye?"

23; Ewan herdukan (aha) gotine: "Xudayê me! Bi rastî me bi xweber li xwe cewr kirîye û heke tu ji bona me ra baxişandinê nekî û tu li me dilovîni nekî bi sond! Emê bibne ji wanê zîyankar."

24; (Xuda ji wan ra aha) gotîye: "Hûn hemûşk jî (ji bihiştê) berjêr bin; hinekên we ji bona hinekên we ra (di cîhanê da) neyar in û ji bona we ra di zemîn da heya danekî, jîn û ewir heye."

25; (Xuda) gotîye: "Hûnê (di zemîn da) bijîn û hûnê di wî da bimirin û hûnê ji wî (paşê zinde bin) derkebin."

26; Gelî zarên Adem! Bi rastî me li ser we da kincên wusa hinartîne; ewan kincan sikatîyên we vedişêrin û we dixemilînin jî û kinca (Xuda) parisî ji van çêtir e. Ewan (kincan) ji berateyên Yezdan in, dibe ku ewan ji wan berateyên wî şîret hildin.

27; Gelî zarên Adem! (Bira haja we ji we hebe) ça pelîd, da û bav û kalên we (xapandin) ewan ji bihiştê derxistine wî ji wan (da û bavê we) kincê wan rût kirîye, ji bo ku ji wan herdukan ra sikatîyên wan bêne xûyandinê, bira pelîd we jî wusa neke. Loma cîyên qe hûn pelîd nabînin, pelîd bi tevê komalê xwe va, we di wura da dibînin. Bi rastî me pelîd ji bona wanê, ku bawer nakin xistîye serkar.

28; (Ewanê bawer nakin hene!) Ewanan di gava tiştêkî maştoqî kiribin (aha) dibêjin: "Em rastê bav û kalê xwe hatin (ewan jî ewan kirinên hanênan) dikirin û şixwa Yezdan bi xweber jî fermana me kirîye (ku emê wan kirinan bikin)." Tu (ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî Yezdan fermana (bi kirina) sikatîyan nake. Hûn ça tişta qe tu zanîna we pê tune ye (li ser navê) Yezdan dibêjin?"

29; Tu bêje: "Xudayê min fermana bi dadvanîyê kirîye. Û hûn berê xwe di hemûşk mizgevtan da li bal wî bi tenê da bizvirînin (ji wî bi tenê ra perestî bikin) û hûn hey xwurî gazî wî bi tenê bikin, "ol" a rastî hey ji bona wî ra ne. Ewî ça di cara yekem da hûn afirandine, hûnê (dîsa) di para da li bal wî da bizivirin."

30; (Ewî) destek anîye rêya rast û li ser destekî jî rêya wundabûnê maf kirîye. Loma (ewî desta rê wundabûyî) ji pêştirê Yezdan, pelîd ji xwe ra serkar girtibûne û ewan goman dikirin jî, ku ewanê di rêya rast da, ewan bi xweber in.

31; Gelî zarên Adem! Hûn li bal hemû mizgevtan da xemla xwe li xwe bikin û hûn bixun û vexun û hûn dest belavbûnê nekin. Bi rastî (Yezdan) ji destbelavan hez nake.

32; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo ewê ku ewan rozîyên tîtalên xweş û xemla Yezdan ji bona bendeyên xwe ra derxistîye ne durist dike, kê ye?" (Ewan ji pisyarê bêzar dibin) tu (ji wan ra aha) bêje: "(Ewanê ewle) û bawer kirine hene! (Ewan xwarin û xakirin û xemla) cîhanî ji bona wan ra ne. Lê di roya Qarsê da jî hey xurî ji bona bawergera ra ne." Em bi vî awayî beratan ji bona komalê zana ra vedikin.

33; Tu (ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî Xudayê min hey (ewanê hanênan) ne durist kirîye. Hemûşk maştoqî; çî xûyayî û çî penhayî û gonehkarî û cewrên bê maf û ewa hevrîtîya, ku qe tu tişt bi hevrîtîya wan ne hatîye hinartin jî hûn dîsa ji bona Yezdan ra hevrêyan çê dîkin û ewan tiştên ku hûn li ser (navê) Yezdan dibêjin, qe tu zanîna we jî bi wan tune ye."

34; Û ji bona her komekî ra danê wî heye. Îdî gava danê wan hatibe, ewan qe qat hijmarekî jî para nakebin û pê ra jî nakebin; (di gava xwe da diçin).

35; Gelî zarên Adem! Di gava ji we pêxemberên, ku biryarên min ji we ra bixûnin hatibin bal we, îdî kîjan xudaparisî bike û aştîkarî bike, li ser wan qe tu tirsê (şapatdan) û mirûziya (ji kêr xelatdanê) tune ye.

36; Û ewanê ku biryarên me dane derewdêrandinê û quretî kirine (bawer ne kirine) hene! Evan in ku hevalên agir in û ewan di agirda jî hey dimînin.

37; Îdî gelo ji wanê ku (li ser navê) Yezdan viran dikin û ya jî biryarên wî dabine derewdêrandinê, cewrkartir kê hene? Ewanê ku para wanê ji pirtûkê digihîje wan, evan in. (Ewan bi wan xarin û xakirinan bi xweşî dijîn) heya gava Saîyên me ne (can sitandanok) hatibine bal wan, canê wan distînin (ji wan ra aha) gotine: "Ka ewan tiştên ku we ji pêştirê Yezdan ji wan ra perestî dikirin, kêderê ne?" Ewan (aha pişyar dane) gotine: "Ewan em (hiştin) wunda bûne." Ewanan bi xweber li ser xwe şahidî dane, ku ewanan bi rastî file bûne.

38; (Yezdan ji wan ra aha) gotiye: "Hûn di nava wan komên; ku di berya we da ji meçêtir û kesan borîne, bikebine nava agir." Çiqa komek ketibe (agir, ewê komê) li wê koma xûşka xweya (borî), deherandin kirîye. Di gava ku hemûşk (di dojê da) dicivin, ewanê paş hatiye wan ji bona ser koçên xwe ra (aha) gotine: "Xudayê me! Evanê hanê nabûn bi rastî ewan em ji rêya rast derxistibûn, îdî tu ji bona wan ra ji agir şapateke ducarî bide." (Yezdan aha) dibêje: "Ji bona hemûşkan ra jî (ji şapata agir) ducarî heye, lê hûn pê nizanin."

39; Û serkoçên wan jî, ji bona paş (koçên wan ra aha) gotine: "Bi rastî ji bona we ra li ser me tu mezinayî û rûmet tune ye, îdî hûn jî ji bona wê keda we kirî şapatê çeşne bikin (ka çane?)"

40; Bi rastî ewanê ku berateyên me dane derewdêrandinê û ji bawerya bi wan poz bilind kirine (bi wan beratan bawer ne kirine) hene! Ji bona wan ra derê ezmanan venabe heya pîlete-coban di qulika derziyê da derbas nebe ewan nakebine bihiştê. Û em bi vî awayî gonehkaran celat dikin.

41; Ji bona wan ra ji doja hilopîtîk da çincil û li ser wan da jî (ji agir) perde hene. Em bi vî awayî cewrkaran celat dikin.

42; Û ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Şixwa hevriyên bihiştê evan in, evan in ku di bihiştê da her dimînin. Em ji bona her canekî ra ji pêştirê hêza wî fermana wî bikirina qencîyan nakin.

43; Û me ji dilê wan hemû tiştên, ku kovanî dikin rakirîye, di binê (ewra wan da) çem dikişin. Ewan (bihiştîyan di wê gavê da aha) gotine: "Ew Yezdanê, ku em li bal van qencîyan da anîne heye! Çiqa sipazî hene, hemî ji bona wî ra ne, heke Yezdan em li bal (van qencîyan) ne anîbûnan şixwa em bi xweber li bal (van qencîyan da) ne dihatin. Bi sond! Pêxemberên Xudayê me, bi maf û bi rastî hatine (gotinê wan rast bûye). Û (ji bona wan ra aha tê) gazîkirinê: "Ewa bihiştê ku we bi kirinê xwe ji bona xwe ra xistiye mîrat, eva ye."

44; Û havalên bihiştê li bal hevalên agir da (aha) gazî kirine: "Gelî dojewîyan! Bi rastî çi tiştê ku Xudayê me ji bona me ra peyman dabû, em bi mafî rast hatin, îdî gelo hûn jî rastê wê (şapata) ku Xudayê we ji bona we ra peyman kiribû bi mafî rast hatin?" (Ewan hevalên agir aha) gotine: "Erê! (Em rast hatin; peymana wî bi mafî rast e)." Îdî di nava wan herdu desteyên (hevalên bihiştî û agir da aha) tê bangdanê: "Deherandina Yezdan li ser wanê cewrkar be."

45; Ewanan, ew kes in ku merivan ji rêya Yezdan didane para da û divan, ku ewê rê li ber merivan xar bikin. Şixwa ewan bi xweber bi dan û gavê para da jî bawer nakin.

46; Û di nava wan herdu (hevalên bihiştî û dojê da) perdek heye; li ser pisporêyayê (di nava wan herdukan da) mêrên wusa hene! Ewan (bihiştî û dojewîyan) hemûşkan jî bi rûçikê wan nas dikin (ewan mêran aha) gazî hevriyên bihiştê kirine: "Selam li we be (xwazîyên xweş ji bona we ra be). Evan (meran) hêj ne ketibûne (bihiştê) lê ewan divan, ku îdî herne bihiştê.

47; Û di gava ku berê wan meran li aliyê hevalên dojê da hatiye fetilandinê (ewan dîtine aha) gotine: "Xudayê me! Tume bi wan komalê cewrkar ra negerîne."

48; Û hevalên li ser pisporêya (ku di nava bihişt û dojê da hene) gazî hinek mêrên dojewî kirine; (ewan hevalan evan mêran bi rûçikê wan nas dikin, aha ji wan ra) gotine: "(Hûn dibînin) ku qe koma we û quretîya we, hûn ji şapatan nedane

paradanê."

49; (Mezinê filan ewan bihiştîyan dane nîşanê hev, ji hev ra aha gotine:" Ewanê, we sond dixwar ku ji bona van ra ji Yezdan qe tu dilovînî nagîhiye wan, evan bihiştîyan nînin?" Îdî hûn bikebine bihiştê tu tîrsa (ji şapatdan) û mirûzîya (ji kêr xelatdanê) li ser we tune ye.

50; Û hevriyên agirî gazî hevriyên bihiştî kirine (aha ji wan dilxwazî kirine): "Hûn (gelî hevriyên bihiştê) hinekî ji ava xwe, ya jî hûn hine ji wan rozîyên, ku Yezdan bi dilikî daye we li ser me da biherikînin." Hevriyên bihiştê (ji wan hevriyênê agirê bawarkar ra aha) gotine: "Bi rastî Yezdan ewan herduk jî li ser filan ne durist kirine."

51; Ewan filan "ol" a xwe xistine dilxwazî û leyîztik. Bi rastî jîna cîhanê ewan xapandibûne. Îdî ewan ça rasthatina van royên xweyên hanênan bîrva kiribûn di îro da jî emê ewan bîrva bikin; ewan bi zanîn bi berateyên me bawer ne dikiribûn.

52; Û bi sond! Me ji wan ra pirtûkeke wusa li ser zanînû daveker aniye, ewa pirtûka ji bona komalê ku bawer dikin, beled û dilovîn e.

53; Qey ewan (filan) hey hêvîya paşî gotina wê pirtûkê dikin (ka gelo peymanên wê pirtûkê ji xelat û celatan rast e ya ne rast e)? Di gava ku ewa roya (xelat û celatan) tê, ewanê ku hêj berê da eva roya hanê bîrva kiribûne (aha) dibêjin: "Bi sond! Li bal me da pêxemberên Xudayê me bi mafî hatibûne (maf anîbûne). Îdî gelo ji bona me ra tu mehder tune ne, ku ji bona me ra mehderî bikin? Ya jî gelo ji bona me ra paraçûn tune ye, ku em karên ji pêştirê van karên me kirî, bikin (yanî bawer bikin û qenciyan bikin)? "Bi sond! ewan zîyana xwe kirine û ewan tiştên ku ewan (goman dikirin; evan tiştan wê mehderya wan bikin) li ber (çavê wan) wunda bûne.

54; Bi rastî Yezdanê ku ezman û zemîn di şeş danan da afirandiye, paşê jî arş (mana) hildaye binê hêza xwe, ewa Xudayê we ye û ewa Yezdana royê bi şevê dide tarî kirinê; Ewa şeva ku qe nahewe, bi lez royê (digire tarî dike; herduk qe ji hev venabin) û ewî roj û hîv û sitêrk hemûşk bi ser nermî hildaye binê burha xwe. Hûn hişyarbin! Bi rastî afirandin û ferman bi xweber jî hey ji bona wî ra ne. Yezdanê Xudayê cîhanê pîroz e!

55; Hûn bi zarî û bi dizî lava ji Xudayê xwe bikin. Bi rastî (hûn bizanin!) ku Yezdan ji wanê ji tixûbê xwe diborin hez nake.

56; Û hûn ji piştî aştiya di zemîn da heyî, di zemîn da tevdanî nekin, hûn bi tîrsî û bi dilxwazî perestîya wî bikin. Bi rastî (hûn bizanin!) ku dilovaniya Yezdan nêzikê qencikara ne.

57; Ewê di berya dilovaniya xwe da "ba" yê bi mizgînvanî dişîne heye! (Ewa Yezdan e). Di gava ku ewan ewran hêdî hêdî bi bariştan giran dibin (emê wan ewran li bal wî welatê) mirî da dişînin, îdî em bi wan ewran avê dihênirînin, emê wî welatê (ku ji bê avî mirîye) zinde dikin û em bi wê (avê) ji hemû ber û hêşnayan derdixin. Herwuha em miryan jî zinde dikin (derdixin) dibe, ku hûn bi rastî evan şîretan bîra xwe bînin (ji wan hiş hildin).

58; Û ewa welatê, ku xwelîya wî tîtal e bi destûra Xudayê wî hêşinayên wî derdikebin û ewa welatê, ku welîya wî tirlêçe hêşnaya wî hey bê wec derdikebe. Em bi vî awayî beratan ji bona wî komalê, ku sipazî dikin vedikin.

59; Bi sond! Me Nûh li bal komalê wî da (bi pêxemberî) şandîye, îdî (ji bona komalê xwe ra aha) gotîye: "Gelê min! Hûn ji Yezdanê (bi tenê ra) perestî bikin, ji pêştirê wî ji bona we ra tu yezdan tune ne. Bi rastî ez ji bona we ji şapata roya mezin ditîrsim (ku bi we da were)."

60; Destekî ji mezinanê komalê wî (aha) gotine: "Bi rastî (Nûh)! Em te di rê wundabûneke xûyayî da dibînin."

61; (Nûh aha pisyara wan daye) gotîye: "Gelî komalê min! Bi min ra tu rê wundabûn tune ye, lê ez ji Xudayê cîhanê (li bal we da bi pêxemberî) hatime şandinê."

62; Ez ji bona we ra niqandinên Xudayê xwe dibêjim û ez ji bona we ra şîretan dikim û tişta ku hûn li bal Yezdan pê nizanin, ez ji we çêtir dizanim.

63; Qey ku mîrekî ji we ji bona ku we (bi şapatdana) Yezdan, bi wan biryarên ku ji Xudayê we hatiye bide hişyarkirinê, ji bo ku hûn xwe ji kirîna gonehan biparisînin, hûn sodret dibin? (Heke hûn xwe ji gonehan biparisînin) bi rastî hêvî heye ku hûn bêne dilovînkirinê.

64; Îdî ewan (komalê Nûh) Nûh dane derewdêrandinê, me jî Nûh û hevalên wî di keştîyê da fereste kirin û me ewanê ku berateyên me dane derewdêrandinê (di avê da)

dane fetisandinê. Bi rastî ewan komalekî kor bûne.

65; Û (me) li bal (komalê) Ad da jî birayê wanê Hûd (bi pêxemberî şandîye. Hûd ji bona wan ra aha) gotîye: "Gelê min! Hûn hey ji bona Yezdan ra perestî bikin, loma ji bona we ra ji pêştirê (Yezdanê babetê perestîyê) tu yezdanên mayî tune ne. Qey hêj hûn îdî xwe di hatina hemberya (Yezdan) da naparisînin?"

66; Destekî ji mezinanê fileyên ji komala (Hûd aha pisyara Hûd dane): "Bi rastî em te dibînin, ku tu diwaneyî û bi rastî em goman dikin, ku tu ji wanê derewgerî."

67; (Hûd pisyara wan aha daye) û gotîye: "Gelê min! Bi rastî bi min ra tu diwanetî tune ye, lê ez pêxember im, ji Xudayê cîhanê (li bal we da hatime şandinê)."

68; Ez biryarên Xudayê xwe ji bona we ra radigihim û ez bi xweber jî ji bona we ra şîretvanekî ewle me.

69; Qey ji bona ku biryarên ji Xudayê we, li ser merekî ji we, ji we ra hatîye, ku ewa (mêrika jî) wê bi wan biryaran hişyar bike (ku hûn xwe ji gonehan biparisînin) hûn sodret dibin? Û hûn baponijîn: Ewê gava ku (Yezdan) ji piştî komalê Nûh, hûn xistibûne şûnmayî ya (wan) û di afirandinê da hêj hûn ji wan bi hêz û meztir (afirandine). Îdî hûn qencîyên Yezdan bîra xwe bînin, bi rastî hêvî heye ku hûn (ji şapatan) fereste bibin.

70; (Ewî komalî ji Hûd ra aha) gotine: "Qey (Hûd) tu hatîyî bal me da ji bo ku em ji Yezdan bi tenê ra perestî bikin û em dest ji wan tiştên ku bav û bapîrên me ji wan ra perestî dikirin, berdin? Îdî heke tu di doza xwe da rastî, ka ewa şapata ku tu ji bona me ra peyman dikî, bîne."

71; (Hûd ji wan ra aha) gotîye: "Bi rastî ji Xudayê we bi ser we da şapateke sik û xeşim ketîye. Hûn ça bi min ra tekoşînê di mafê wan navên, ku we û bav û bapîrên xwe hildane, dikin? Qe Yezdan bi xweber ji bona wan tu berateyên bi hêz jî ne hinartine. Îdî hûn hêvîya hatina (wan şapatan) bikin, bi rastî ezê jî bi we ra bibme ji wanê hêvîdar."

72; Îdî (gava ku şapat bi wan da hatîye) me jî (Hûd) û ewan nedîmên (bi Hûd ra hebûne ji wan aşîtan) bi dilovanîke ji me, fereste kirin, me dû va wanên, ku berateyên me didane derewdêrandînê birîye û şixwa ewan bawer ne dikiribûne.

73; Û (me) li bal (komalê) Semûd da, birayê wanê Salih (bi pêxemberî şandîye, Salih ji bona wan ra aha) gotîye: "Gelê min! Hûn (hey) perestîya Yezdan (bi tenê) bikin, ji bona we ra ji pêştirê wî tu (yezdanê babetê perestîyê) tune ye. Bi rastî ji Xudayê we li bal we da berateyên xûyayî hatine. Eva deva hanê deva Yezdan e, ji bona we ra beratek e, îdî hûn dest ji wê devê berdin, ji bo ku ewa deva di zemînê Yezdan da biçêre û hûn tu sikatîyê bi wê devê nekin, ji bo ku şapateke dilsoz bi we da neyê (we negire nava xwe da)."

74; Û hûn (gelê min!) Ewê gava ku (Yezdan) hûn ji piştî (komalê) Ad (di zemîn da xistibûne) şûnmayî û ewî hûn di zemîn da êwirandine, bîra xwe bînin. Hûn (ji bona êwra xweya zivistanê) di destê zemîn da koşkan (ava dikin) û (ji bona êwra xweya havînê jî) çîyan dikolin xaniyan çê dikin, îdî hûn qencîyên Yezdan bîra xwe bînin û hûn ji bona, ku di zemîn da tevdanî bikin li bal hev da nerevin.

75; Ewê desta ji komalê (Salih) e ku bi mezinayî xwe qure dikirin, ji bona wanê bê hêzên xweyên ku (bi Salih bawer kirine aha) gotine: "Qey hûn dizanin, ku Salih ji Xudayê xwe (bi pêxemberî) hatîye şandinê?" (Ewan bê hêzan aha) gotine: "(Erê wusa ne!), Ewanê ku (bi wan berateyên bi Salih ra) hatine şandinê bawer dikin hene! Bi rastî em ji wan in."

76; Ewanê quretî dikiribûne (ji bona bawergeran ra aha) gotine: "Bi rastî em bi wê tiştê, ku we bi wê bawer kirîye, bawer nakin."

77; Îdî Ewan serê deva mê jê kirin û ewan ji fermana Xudayê xwe derketin û (ewan ji bona Salih ra aha) gotine: "Salih! Ka heke tu bi rastî ji pêxemberanî, îdî tu ewê (şapata) ku ji bona me ra hatina wê peyman dikî, ji me ra bîne."

78; (Ji vê xwastina wan) ewê hejê bi wan girtîye, îdî ewan di xaniyê xwe da li ser çokan ketine mane.

79; Îdî (Salih) berê xwe ji wan fetiland (aha) gotîye: "Gelê min, bi sond! Min biryarên Xudayê xwe ragihandine we û min ji bona we ra şîret kirin û lê hûn ji şîretvanan hez nakin."

80; Û me (Lût jî li bal koma wî da bi pêxemberî şandîye, Lût) di gavekî da ji bona komalê xwe ra (aha) gotîye: "Gelê min! Hûn ça ewê tolîya, ku tu kesekî ji cîhanê ne kirîye, dikin?" .

81; Hûn bi rastî jinan dihêlin, li bal mêran da bi dilxwezî tûş dibin. Bi rastî hûn komalekî destbela ne."

82; Û pisyara komalê (Lût) hey eva bûye; (ji hev ra aha) gotine: "Hûn (Lût û desta wî) ji gundê xwe derxin, loma bi rastî ewan kesan paqij in"

83; Îdî me jî (Lût) û malîne wî ji pêştirê jina wî (ji şapatê) fereste kirin. Ewa (jinika) ji wanê para da mayî bûye.

84; Û me li ser wan da barişteke wusa barand. Îdî tu mêze bike ka encama wanê nûsitemkar ça bûye!

85; Û me li bal (komalê welatê bi nav) Medyenê ra jî birayê wanê Şu'eyb (bi pêxemberî şandîye. Şu'eyb ji wan ra aha) gotiye: "Gelê min! Hûn hey ji Yezdan (bi tenê ra) perestî bikin. Bi rastî ji bona we ra ji pêştirê wî, tu yezdanê (babetê) perestîyê tune ne. Bi rastî berateyên xûyayî ji Xudayê we, bal we da hatiye, îdî hûn pîvan û kêşnê xwe (bi rastî) pêk binin û hûn (di pîvandî û kêşan da) di tiştê merivan da zîyana wan nekin û hûn ji piştî aştiya ku di zemîn da bi cîh hatiye, dîsa (komalê zemîn) bi tevdanî tev hev nekin. Heke hûn bi rastî merivên bawerger bin, evan (şîretan) ji bona we ra çêtir in."

86; Û hûn (gelê min!) ji bo ku hûn bi tirsdan û peymanan bidne merivan, ewan ji rêya Yezdan xar bikin, ewanê bi Yezdan bawer kirine (rêya Yezdan ji wan ra bi xarî bidne nîşanê wan) li serê hemûşk rêyan rûnenên. Û hûn (gelê min!) ewî danê ku hûn hindik bûn (hêza we tune bû) îdî Yezdan hûn pir kirin (hûn hêzdar kirin) bîra xwa bînin. Û hûn (gelê min!) mêze bikin: ka encama wanê tevdanok ça bûye!

87; Heke (gelê min!) destekî ji we bi wan biryarên, ku ez bi wan (biryaran bi pêxemberî) hatime şandinê, bawer kiribin û destekî jî ji we bi wan bawer ne kiribin, îdî hûn binivin, heya ku Yezdan di nava me da berawanî bike. Şixwa (Yezdan) bi xweber jî qenctirê berewana ne.

88; Ewê desta mezinanê ji komalê (Şu'eyb) ku xwe qure dikirin (pisyara Şu'eyb aha dane û) gotine: "Şu'eyb! Bi rastî emê te û ewanê bi te ra bawer kirine, ji gundê xwe derxin, ya jî hûnê dîsa werne "ol" a me (dîn)." (Şu'eyb) gotiye: "Heke em ji "ol" a we bêzar bin jî (hûnê dîsa têkilê me bibin?)"

89; Bi sond! Heke ji piştî ku Yezdan em ji "ol" a we fereste kiribin, dîsa em bifetiline "ol" a we, di wê gavê da em bi vir derewan davêjine Yezdan. Heke Yezdanê Xudayê me para zivirandina li bal "ol" a we da nevê, ji bona me ra para zivirandin qe çê nabe. (Zanîna) Xudayê me hemû tişt hildaye nava xwe me hey xwe hispartîye Yezdan. Xudayê me! Tu di nava me û di nava komalê me da (di wî tiştê ku em têda tekoşînê bi hev ra dikin) rastîya wî derxe û tu bi xweber jî qenctirê ferestekarani.

90; Û ewê desta mezinanê ji komalê (Şu'eyb) ku file bûne (aha) gotine: "Bi sond (gelê me!) heke hûn bibne peyrewê Şu'eyb, hûn di wê gavê da zîyan dikin."

91; Îdî ji piştî (van şîretan) ewa şapata lerezandinê bi wan girt, ewanan bi qerefîzikî li ser çokan di xaniyê xwe da mane.

92; Ewanê ku Şu'eyb dabûne derewdêrandînê hebûn! Te digo qey ewan (di xaniyên) xwe da şahî û geşî ne dîtine. Ewanê ku Şu'eyb dabûne derewdêrandînê hebûne! Ewan bi xweber zîyan kirine.

93; Îdî (Şu'eyb) piştî xwe daye wana (aha) gotiye: "Gelê min! Bi sond; min ewan biryarên ku Xudayê min şandibûn, ragihandîye we (ji bona we ra gotiye) û min ji bona we ra şîret kiribûn, îdî (ji piştî van kirinan) gelo ezê ça li ser komalekî file kovanê bikim?"

94; Û me çiqa pêxemberek şandibe (wela tekî) hey me (ewa welat û komalê wî) bi tirs û xelayanên (ku me bi wan da anîye) girtiye, ji bo dibe ku ewan (komalan) lava bikin (ji wan kirinên xwe poşman bibin).

95; Paşê me (temtêla wan) guhurand; me di şûna sikatîyan qencî dane wan, heya ewan (ji wan tengayan) fereste bûne û (aha) gotine: "Bi sond! Bi bav û bapîrên me da jî tengasî û firetî (mirûz û şayî) hatibûye (ewan jî evan royên hanênan dîtine)." Îdî (ewan bi van dilxwazîyan mane, hemû tişt bîrva kirine) haja wan qe ji wan ne maye, me ewan nişkê va (bi şapatan) girtin.

96; Û heke (komalê wan welatan) bawer kiribûnan û (xuda)parizî kiribûnan, meyê jî bi rastî li ser wan da (deêe) pir kirina ji ezman û zemîn vekira û lê ewan (di şûna bawerîyê da) derewdêrandin ji xwe ra girtin, îdî me jî bi sedema keda ku ewan kiribûn, ewanan bi (şapatan) girtin.



97; Îdî qey (komalê wan welatan) bi xwe ewle dibin, ku şapata me di şev da ewan raketibin bi wan da neyê?

98; Ya jî (komalê wan welatan) bi xwe ewle dibin, ku ewan di danê taştê da bi xweber bileyîzin (haja wan bi wan ne mîne) şapata me bi wan da neyê?

99; Îdî qey (ewan komalê wan welatan) ji xaxê Yezdan ewle bûne (ku îdî nakebine defika Yezdan)? Ji pêştirê wan komalê ku zîyana xwe kirine, qe tu kes ji xaxê Yezdan ewle nabe!

100; Qey hêj (ewan şapatên ku bi serê wanê borî da hatibûne) ji bona vanê; ji piştî komalên (zemînê ku hatibûne şapatdanê) bûne ûrta zemîn (bûyera borî ji wan ra nebûye rêber)? (Hêj ewan nizanin) heke em bivên (ewan şapat bikin) em dişên, ku ewan bi gonehê wan (şapat bikin) û em dikarin li ser dilê wan duruf daynin, îdî ewan bi xweber ji qe ne bihên!

101; Ewan welatên ku em hinekî ji bûyere wan ji te ra dibêjin hene! Evanan ew in. Bi sond! Pêxemberên wan bi berateyên xwûyayî va hatibûne bal wan, lê ji ber ku ewan (pêxember ne xwe) hêj di berê da dabûne derewdêrandinê, îdî ewan nikarbûne bi wan derewdêrandinê xwe bawer bikin. Bi vî awayî Yezdan li ser dilê filan duruf dike.

102; Û em ji bona pirên (wan komên borî ra) rastê tu peyman girtekî ne hatin, lê em rastê (wan koman) hatin, ku pirê wan ji rêya rast derketibûne.

103; Me paşê li pey wan da Mûsa bi berateyên xwe va, li bal Fir'ewn û koma wî da (bi pêxemberî) şandiye, îdî (Fir'ewn û rûsipiyên wî) bi berateyên me cewr kirine, îdî tu mêze bike ka encama wanê tevdanokger û (re derketokan) ça bûye?

104; Û Mûsa (aha) gotîye: "Fir'ewn! Bi rastî ez ji Xudayê cîhanê bi pêxemberî (li bal we da) hatime şandinê."

105; Babetê ku ez ji pêştirê maf û rastîyê qe tu tiştî li ser navê Yezdan nebêjim. Bi sond! Ez bi berateyên xwûyayî va ji Xudayê we (li bal we da bi pêxemberî) hatime, îdî tu zarên cihûyan bi min ra bişîne (welatê me, dest ji me berde).

106; (Fir'ewn pisyara Mûsa daye, aha) gotîye: "Mûsa! Heke tu bi beratekî va (li bal me da) hatîyî û tu bi rastî (dibejî), ka îdî ewê (beratê) bîne (tu ji bona çi nivyaîyî)?"

107; Îdî (ji piştî van gotinên Fir'ewn, Mûsa) gopalê xwe ji destê xwe berdaye, îdî wê gavê da (gopal) bûye zîhakî xwûyayî (maye).

108; Û (Mûsa) destê xwe (ji paxila xwe) derxistîye, di wê gavê da (destê Mûsa) ji bona mêzevanan, ji sipîtayîyê (diçirûsî).

109; (Ewê desta) rûsipiyên ji komalê (Fir'ewn aha) gotine: "Bi rastî eva (Mûsayê hanê) ançkerekî pir zana ye."

110; Ewa divê ku we ji welatê we derxe. Hûn îdî di hemberê wî da çi ferman dîkin?

111; (Civata Fir'ewn bi pisyarî aha) gotine: "Tu Mûsa û bi birayê wî va bi hêvîdarî bide hewdanê û tu di welat da civînkaran bişîne."

112; Bira ewan (civînkaran) hemûşk ançkarên pirzan ji bona te ra bînin.

113; Gava ançkar hatine bal Fir'ewn (aha ji Fir'ewn pirsîne û) gotine: "Heke bi rastî em (di hemberê Mûsa da) ser va hatin; bi rastî ji bona me ra xelat hene: (wusa nîne)?"

114; (Fir'ewn ji wan ra bi pisyarî aha gotîye: "Erê! (Ji bona we ra xelat hene) û hûn bi xweber jî (di wê gavê da dibine) ji wanê nêzikê (min)."

115; Ewan (ançkaran di bona Mûsa ra aha) gotine: "Mûsa! Îdî (di cara yekem da) tuyê (beratan) bavêjî, ya jî (di cara yekem da) em bi xweber in (pêseyên xwe) davêjin?"

116; Mûsa (bi pisyarî ji bona wan ra aha) gotîye: "Hûn (pêseyên) xwe bavêjin." Îdî (ji piştî) ku ewan pêseyên xwe avêtine, ewan çavê kesan jî dane ançkirinê, ewan meriv dane tirsandinê û ewan ançên mezin anîne.

117; Û me jî li bal Mûsa da (aha) niqandiye: "Tu jî gopalê xwe bavêje." Îdî (ji piştî gava Mûsa ku gopalê xwe avêtîye) gopalê (Mûsa) ewa (pêseyên ançkaran) digirt, (ya jî ewan mêze kirin, ku gopalê Mûsa ewan tiştên ewan aloze kiribûne, li ser wan da xwe bi lez davêje, ewan ançên) wan kirî, heman wunda dibin).

118; Îdî rastî derket (xûya bû) û ewan (ançên ku ewan aloze kiribûne pûç bûne.

119; Îdî ewan di wura da ser berjêr bûne (bi vî awayî) ewan piçûk ketine.

120; Û ewan xwe bi kundetî berdane xwarê.

121; Û (ewan ançkaran aha) gotine: "Xudayê rastî me bi Xudayê cîhanê bawer kirîye."

122; Ewa Xudayê Mûsa û Harûn e.

123; Fir'ewn (di pisyara swan da aha) gotîye: "Hê di berya ku min ji bona we ra

destûra (bawerîyê)ne dabû, we bi wî bawer kirîye! Bi rastî eva endezeke, ji bo ku hûn merivên welat ji welat derxin, we di bajar da kirîye. Îdî hûnê ji virha bizanin (ka bi serê we da ê çî were).

124; Bi rastî ezê dest û pê we (çilo çep) bi rast û çep jê bikim û peşê ezê we li serê çiqilan da darda bikim.

125; Ewan (di pisyara Fir'ewn da aha) gotine: "Bi rastî şixwa emê li bal Xudayê xwe da bizivirin."

126; Û tu bi xweber jî, ji bo ku gava biryarên Xudayê me hatine bal me, em bi wan bawer dikin, ji me tûl hildî. Xudayê me! Tu li ser me da di hemberê van (aşîtan da) hewdanî vala bike û tu me bi misilmanî bimirîne.

127; Û desta rûsipîyên ji komalê, Fir'ewn (ji bona wî ra aha) gotine: "Qey tu dest ji Mûsa û ji komalê wî berdidê; ji bo ku ewan di zemîn da tevdanî derxn û dest ji te û ji Xudayê te berdin?" (Fir'ewn bi pisyarî aha) gotîye: "Emê bi rastî (wekî berya naha da dîsa) zarên wanê kurîn bikujin û emê jinên wan bi zindetî para da bihêlin (ji bona ku em ji wan jinan zarên diliqyê xebatkar hildin) û em bi xweber jî (li ser wan da) herçiqokerên bi hêz in."

128; Mûsa ji bona komalê xwe ra (aha) gotîye: "Hûn (gelo min! Ji bona hildana van aşîtan) ji Yezdan arîkarî bixwazîn û hûn (di hemberê cefa wan da) hew bikin. Bi rastî zemîn ji bona Yezdan ra ne, Yezdan ji bendeyên xwe ji kê ra bivê; ewî dixe mîratxurê zemîn. Û encam bi xweber jî ji bona yezdanpariza ne.

129; (Komalê Mûsa bi pisyarî ji bona Mûsa ra aha) gotine: "Ewan (Fir'ewnîyan) hêj berya tu li bal me da ne hatibûyî, cefa didane me û ji piştî ku tu hatîyî jî dîsa cefa didine me." (Mûsa ji komalê xwe ra aha) gotîye: "Goman heye ku Xudayê we, neyarê we teşqeke bike û (Xudayê we) we bixe şûnma, di zemîn da, îdî Xudayê we li we meze bike, ka hûn ça xebatê dikin?"

130; Û bi sond! Ji bona ku Fir'ewn û hevalên wî evan qencîyên me bîra xwe bînin (ji wan kirinên xwe para da bizivirin) me bi salan ewan birçî kirin û me bi kemasîya rêça genim û berên daran ewan di xelayîyan da girtin.

131; Îdî di gava ku ji wan ra qencîyek hatibe; ewan (aha) gotine: "Evan (qencîyan di rûyê me da) ji bona me ra hatine." Û heke sikatîyek bi wan da hatibe, ewan (aha) gotine: "Evan ji nutûfa Mûsa û hevriyên bi wî ra ne (loma bi me da hatîye)." Hûn hişyar bin! Bi rastî nutûfa wan li bal Yezdan e, lê pirê wan bi vê (nutûfê) nizanin.

132; Û (ewan ji bona Mûsa ra aha jî) gotine: "(Mûsa!) Ji bona ku tu me ançk bikî, tu çiqas û kîngê ji bona me ra beratan bînî, hey îdî em bi te bawer nakin."

133; Îdî (ji piştî van şîretan ewan bi Mûsa bawer ne kirin) me jî li ser wan da berateyên cure û cureyên daveker: lê mişt û kûlî û sipî û beq û awxûn şandine. (Ji piştî hatina van beratan jî dîsa) ewan pozbilindî kirin (bi Mûsa bawer ne kirine) û bi rastî ewan komalekî gonehkar bûne.

134; Îdî di gava ku şapat bi ser wan da hat, ewan (ji Mûsa aha lava kirine) û gotine: "Mûsa! Tu ji bona me ra ji Xudayê xwe bi qedrê wan peymanên, ku ewî daye te lava bike, heke tu (evan) şapatan li ser me rakî bi rastî emê bi te bawer bikin û emê zarên cihûyan bi te ra (bi azadî) bişînin (welatê we).

135; Îdî gava ku me li ser wan şapat, heya wî danê ku ewanê bi xweber bigîhêjin şapatê, rakirîye, ewanan heman ji peymana xwe para çûne.

136; Îdî (ji piştî ku ewan ji peyman xwe para çûne) me jî ji wan tûl hildaye. Ji bo ku bi rastî ewan biryarên me dabûne derewdêrandinê û ewan ji berateyên me bê agah bûn, me ewan di ro da fetisandin.

137; Û me ewa komalê (ku komalê Fir'ewn) ewan bê hêz kiribûne (ji xwa ra dane xebatê) di rojhilat û rojava wî zemînê ku me dora wî bi pîrozî xemilandîye û (xwarin u vexwarinê wî pir kirîye) xistine mîratxur û bi sedema hewa zarên cihûyan (di hemberê teşqeleyên Fir'ewnîyan da) peyva (peymana) Xudayê te bi qencî li ser zarên cihûyan pêk hatîye. Û me çî tiştê Fir'ewn û komalê wî (ji koşk û avayên bilind ava kirine) hemûşk jî dêriz kirîye.

138; Û me zarên cihûyan ji deryayê borandin. Ewan (zarên cihûyanê heya hatine çûne bal wî komalê, ku ji bona wan ra hinek pût hebûne, ewî komalî li ser perestîya ji bona wan pûtan ra hew dikiribûne. (Komalê Mûsa ji Mûsa ra aha) gotine: "Mûsa! (Ka binhêre, gelo çî dibe) ku tu jî ji bona me ra hinek yezdanan bigrî, ça ji bona wan ra yezdanên (Lap) hene." Mûsa (di pisyara komalê xwe da aha) gotîye: "Bi rastî hûn

komalekî wusa nin, bi xweber xwe davêjine nezanîyê."

139; Evan tiştên ku ewa komala ji wan ra (perestî dikin) hene! (Bi "ol" a xwe va) dêriz bûne û tiştên ku ewan, dikin ewa bi xweber jî pûç e.

140; (Mûsa ji wan ra aha jî) gotîye: "Ka, ezê bi çi awayî ji pêştirê wî Yezdanê, ku ewî hûn li ser hemû cihanê paydar kirine, ji bona we ra yezdanekî mayî bivê?"

141; Û (gelî zarên cihûyan! Hûn ewan) gavê ku me hûn ji komalê Fir'ewnê, ewanan hûn bi sikê şapatan, şapat dikirin, fereste kirîye, bîra xwe bînin. Ewan (komalan) zarên weyên kurînan dikuştin û jinên we para da bi zindî dhiştin. (Hûn dizanin, ka ewan kirinan çiqa zor in?) Û di vî da jî ji bona we ra ji Xudayê we aşîteke mezin hebûye.

142; Û me (ji bona perestîya xwe) ji Mûsa ra sî şev peyman daye û (ji bona pêkanîna biryaran) me deh şevê dinê jî, peyweste kirîye. Îdî rawen da Xudayê te ji bona Mûsa ra çil şev pêk hatîye. (Ji piştî ku wê Mûsayê biçûya bal Xudayê xwe, Mûsa) ji bona birayê xweyê Harûn ra(aha) gotîye: "Tu! Li pey min da di şûna min da di nava komalê min da bibe şûnmayî min û tu (di nava wan da) aşîkarî bi cîh bîne û tu nebe peyrewê wanê tevdanok in.

143; Îdî di gava ku Mûsa (di wî danê radewanî da) hatiye bal me û Xudayê wî bi wî ra mijûl bûye. Mûsa (aha) gotîye: "Xudayê min! Xwe bide nîşanê min; ji bo ku ez li bal te da mêze bikim." Xuda ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "Bi rastî tu min nabînî; lê tu li bal çiyê da mêze bike, heke çiya di şûna xwe da hewya, îdî dibe ku tu min bibînî. Ji piştî ku Xudayê wî xwe daye nîşanê çiya, îdî çiya wusa belav bu (te digot qey) hirya jenîye, maye û Mûsa bi xweber jî bi xwe va çûye. Îdî gava ewa bi xwe va hatiye ewî (aha) gotîye: "Bi rastî (Xuda)! Ez te ji hemû kemayan paqij dikim, ez (ji wan gotine xwe) li bal te da poşman bûme û ewanê ku di cara yekem da bi te bawer kirine hene! Ez ji wan im."

144; (Xuda ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "Mûsa! Bi rastî min bi pêxemberêya xwe (ku min ji bona te ra Tewrat daye) û bi axiftina xwe ye bi te ra, tu li ser kesan hêlbijartîyî. Îdî tu (ewan biryarên) ku min daye te hilde û tu bibe ji wanê sipaskar."

145; Û me ji bona (Mûsa ra) di rûperê (Tewratê da) hemû tişt bi şîretî û vekirina hemûşk (biryaran) nivîsiye (me ji bona wî ra aha) gotîye: "(Mûsa! Tu ewan biryar û şîretan) bi hêz bigire û (tu) fermana komalê xwe jî bike; ji bo ku ewan qencê wan biryaran bigirin (wekî wan fermanan perestî bikin. Bi rastî ezê di nêzîk da xanî (û welatê) wanê ji rê derketî bidime nîşanê we (ka min ça welatê wan dêriz kirîye),"

146; Di nêzîk da ezê ewanê ku di zemîn da bê mafî quretî dikirin (zanîna) biryarên xwe ji wan bifetilînim. Û heke ewan hemûşk beratan jî bibînin, dîsa ewan bi wan beratan bawer nakin. Heke ewan rêya rast bibînin jî, dîsa ewan ewê rêya rast ji xwe ra bi rêtî nagirin. Heke ewan rêya (pelîd) bibînin, heman ewan ewê rêya (pelîd) ji xwe ra bi rêtî digirin. Bi sedema ku ewan, ewan berateyên me ne (ji wan ra hatibûn) dabûne derewdêrandinê û ewan bi xweber jî (ji wan beratan) bê agah bûne ewan aha ji rê derketine.

147; Ewanê ku berateyên me û rasthatina di danê para da dane derewdêrandinê hene! Kirinê wan şewitiye. Ewanan hey bi keda kirinê têne aşîtkirinê.

148; Û komalê Mûsa ji piştî (gava Mûsa çûye ji bona wî danê radewanîya Xudayê xwe ) ji xişrê xwe tokela golîkekî (bi xudatî ji xwe ra girtine) ji bona tokela wê (golîkê ra) dengê hebûye. Qey ewan nabînin, ku ewa (golîka) bi wan ra naaxive û ji wan ra qe tu rêkî jî nade nîşandanê? Ewanan, ewa (golîka ji xwe ra) bi xudatî girtine, ewanan cewr kirine.

149; Û di gava (ji poşmanîya wan, ewan armancê wan pelîşî) kete destê wan û ewan dîtî, ku bi rastî ewan rêya rast wunda kirine. Ewanan (aha) gotine: "Bi sond! Heke Xudayê me li me dîlovanî neke û nûsîtemên me ji bona me ra nebaxişîne, bi rastî emê bibne ji wanê zîyan kirine."

150; Û di gava ku Mûsa (ji wî radewana xweya bi Xuda ra) fetilya hatiye bal komalê xwe, bi hêrs û kovanî (ji komalê xwe ra aha) gotîye: "We ji piştî min çiqa şûnmayêke sik kirîye! We lez kir; (hêvîya) ku ez bi fermanê Xudayê we va (li bal we da bizivirim) neman. Û Mûsa (rûperên Tewratê) avêt bi serê (birayê xweyê Harûn) girtiye li bal xwe da (bi hincirandin) kişandiye. (Birayê wî; Harûn ji bona wî ra bi pisyarî aha) gotîye: "Kurê diya min! Bi rastî komal ez bê hêz kirim û nêzîk bûn ku min bikujin, îdî tu neyaran bi min nede kenandinê û tu min ji vî komalê cewrkar

nehijmire."

151; (Mûsa ji Xuda aha lava kirîye û) Gotîye: "Xudayê min! Tu min û birayê min bibaxişîne û tu me herdukan bixe nava dîlovanîya xwe. Bi rastî her tu î dîlovanê dîlovînan."

152; Bi rastî ewanê ku golik (ji xwe ra bi xudatî) girtine hene! Wê di nêzîk da ji Xudayê wan, bi wan da xeşmekî were û wê riswabûneke di jîna cîhanê da bi wan bigire. Bi vî awayî em virekan celat dikin.

153; Ê ewanê ku karê sikatî kirine, paşê ji piştî (sikatîyê) poşman bibin û bawer bikin hene! Bi rastî Xudayê te ji piştî van (kirin û poşmanîyan, ji bona wan ra) baxişkarê dîlovîn e.

154; Ê di gava hêrsa Mûsa danîye, îdî Mûsa (rûperên Tewratê) hildaye di nivisandîna (rûperan da eva) hebûye; (evan rûperan) ji bona wanê ku ewan hey ji bona Xudayê xwe (xwe ji kirîna gonehan) diparisînin, rênîşan û dîlovînek e.

155; Ê Mûsa ji komalê xwe (ji bona wî danê radewanî, ku Xuda ji bona baxişandîna gonehê wan peyman dabûye) heftê mêr, hêlbijartîbûye. (Îdî gava ewan hatibûne, ewan ji mijûlyî Mûsa û Xuda hêj pirtir aha gotine: "Heya em Yezdan berçavî nebînin, em bawer nakin.") Ji piştê vê hejeke bi tirse wusa ewan girtine (ewan ji tîrsa ji xwe va çûne. Mûsa aha lava kirîye û) gotîye: "Xudayê min! Heke te biva, teyê hêj di berya naha da ewan bi tevê min va teşqe bikirinan; qey tuyê me bi wan kirinê evsenên ji me teşqe bikî? Eva (teşqela hanê) hey ceribandîna te ye. Tu bi wê ceribandîna xwe ji ber hinekan rêya xwe wunda dikî û tu evînê xwe jî bi wê ceribandîna tînî rêya rast. Serkarê me hey tu î, îdî tu (evan sikatîyên me) ji bona me ra bibaxişîne û tu li me dîlovanî bike û tu bi xweber jî qencîrê baxişkaranî.

156; Ê tu di vê cîhanê da ji bona me ra qencîyan binivîse û di danê parada jî (qencîyan binivîse) bi rastî em (di rêya rast da) li bal te da hatine." (Xuda di pîsyara Mûsa da aha) gotîye: "Ez kîjanî bivêm, ewî rastê şapata xwe tînim û dîlovanîya min bi xweber jî hemû tişt hildaye nava xwe da. Ez ji bona wanê ku xudaparizî dikin û baca (malê xwe) didin û ewanê ku (bi van salixan) bi berateyên me bawer dikin, îdî (dîlovanîya xwe) dinivîsim.

157; (Ewanê ku ezê dîlovanîya xwe ji bona wan ra binivîsim hene!) Ewan di Tewrat û Încîla li bal xwe da rastê (salaxê) wî pêxemberê (ku di cara yekem da ji wî komalê hatiye şandinê) hatine ku nivîsandîye awil bûne peyrewê wî pêxemberî. Loma ewa (pêxembera fermana wan bi qencîyan û parisandîna wan ji sikatîyan dike û ji bona wan ra tiştên paqij durist dike û tiştên qirêj jî li ser wan ne durist dike û barê wanê giran li ser wan radike û ewan bend û zincîrên ku ewan pê hatibûne girêdanê jî (yanî ewan xwarin û vexwrînên, ku ewan cihûyan bi xweber li ser xwe qedexe kiribûne; ewa ewan qedexan li ser wan radike). Îdî ewanê ku bi wî (pêxemberî) bawer kirine û ewanê ewa ji xwe ra mezin girtine û arîkîya wî kirine û bûne peyrewê wê ruhîyaya ku bi wî (pêxemberî ra) hatiye hinartinê hene! Evan bi xweber in, hey fereste bûne.

158; Tu (Muhemmed! Ji bona wan ra aha) bêje: "Gelî kesan! Bi rastî ez ji wî Yezdanê, ku maldîya ezman û zemîn hey ji bona wî ra ne, li bal we hemûşka da jî bi pêxemberî hatime şandinê. Ji pêştîrê wî tu yezdanên mayîyê (babetê perestîyê) tune ne. Hey ewa dijît û dîmirîne. Îdî hûn bi Yezdan û bi wî pêxemberê wîyî yekemî bawer bikin, ewa (pêxembera bi xweber jî) bi Yezdan û bi peyvên (Yezdan) bawer dike û hûn (gelî kesan!) bibne peyrewê wî (pêxemberî) dibe ku hûn werin rêya rast."

159; Ê ji komalê Mûsa desteke wusa hebûne; (meriv) li bal rastîyê da dibirin û bi rastîyê jî dadvanî dikirine.

160; Me ewan (nevîyên Yaqûb, ku ji danz deh kurê wî) hebûne; her yekê xistîye lêzim û komake nevî. Îdî di gava komalê (Mûsa) ji Mûsa av xwestine; me li bal Mûsa da (aha) niqandîye: "(Mûsa!) tu gopalê xwe li kevîr bixe." Îdî (ji piştî ku Mûsa gopalê xwe li kevîr xistîye) ji kevîr danz deh kanî zaye. Bi sond! Her komekî cîyê av vexwarina xwe zanîbûye. Ê me li ser wan (di kêşa bi nav Tîyehê da) bi ewran sîwan kirîye û me (ji bona xwarina wan) li ser wan da gezo û (goştê) qarûtkê hinartîye. (Me ji wan ra aha got: "Îdî) hûn ji wan rojîyên tîtalên ku me daye we bixun." Lê ewan (ji wan cewrên xwe) li me tu cewr ne kirine, ewanan bi xweber li xwe cewr dikirin.

161; Di gava ku ji wan ra (aha) hatibûye gotinê: "Hûn di vî bajarî da bê ewir in û hûn ça hez dikin, wusa ji xwarinê wî bajarî bixun û hûn (aha ji Xuda lava bikin û)

bêjin: "(Xuda! Tu) me bibaxişîne (gonehên me ji me dayne) û hûn di derê bajar da bi kundetî bikebine (hundurê) bajar; emê ji bona we ra gonehên we bibaxişînin. Û emê ji bona qencîkaran ra hêj qencîyan pîr bikin."

162; (Ji piştî van fermanan) îdî ewanê cewrkarên ji wan (ewa gotina me ji wan ra) gotibû; bi wan gotinê qe ji wan ra ne hatibûye gotinê, guhurandine, me jî (ji piştî guhurandina wan) ji ezmanan li ser wan da, bi sedema ewê cewra ku ewan dikiribûne şapatek şandîye.

163; Û tu (Muhammed! Ji wan cihûyên cewrkar) pîrsa (temtêla) wan gundiyan, wî gundê ku derê deryayê dabûne, bike. Ewan gundiyan di roya şemiyê da dest ji biryaran berdidan (nêçîra masîyan dikirin). Di roya wê şemîya, ku ewan (ewa şemîya ji bona perestîya Yezdan hêlbijartine) masîyê wan (ji deryayê) li bal wan da diherîkin dihatin û di roya wê şemîya, ku ewan (di wê şemiyê da perestî ne dikirin; lê ewan ewa şemîya ji bona nêçîra masîyan hilbijartine) masîyên wan (ji deryayê) li bal wan da ne dihatin. Me bi vî awayî bi sedema ku ewan ji rêya (rast) derdiketin, diceribandin.

164; Û di gava destekî ji wan ra (aha) gotibûne: "Hûn ji bona çi li ewî komalê ku Yezdanê ya ewan teşqe le bike, ya jî ewan bi şapateke zor, şapat bike, şîretan dikin?" (Ewan şîretvanan di pisyara wan da aha) gotine: "Ewan şîretên me, dibe ku li bal Xudayê we ji bona me ra (gava ji wan bê pîrsînê; ka we ji bona çi ewan qedexeyên roya şemiyê di nava xwe da rakirine, dîsa we nêçîra masîyan kirîye? Ewan pisyara xwe aha bidin: "Ka tu kesekî ji bona me ra ne gotibû, nêçîrê nekin." Bibe tatî û dibe ku ewan xwe ji wan kirinan biparisînin (bi gotina Xuda bikin.)

165; Îdî (ji piştî şîretan) gava ewan ew şîretên li wan hatibûye kirinê bîrva kirine, me jî ewanê ku xwe ji sikatîyan diparisandin fereste kirine û me ewanê ku cewr kiribûne jî bisedema ji rêya (rast) derdiketibûne, bi şapateke zor girtine.

166; Îdî (ji piştî wan şîretan) gava ewan (ji şîretvanan) hêrs bûne ewan (dîsa ji rêya rast derketine nêçîra masîyan di roya şemiyê da, kirine) me jî ji bona wan ra (aha) gotiye: "Hûn (gelî cewrkaran! Ji diliq û qencîyên merivatîyê derkebin bikebine diliqê) meymûnê pêkenî."

167; Di wê qavê da Xudayê te li wan (aha) qîr kirîye û (ji wan ra gotiye): "Xudayê te li ser wan da merivên wusa bişîne, ku ewan merivan van (cewrkaran) heya roya rabûna hemû da bi sikê şapatan, şapat bikin. Bi rastî Xudayê te bi lez celatvan e! Û Xudayê te bi rastî baxişkarê dilovîn e.

168; Û me ewan (cihûyan) di zemîn da xistine çend komên wusa: Ji wan aşîkar hebûn û ji wan xêncî aşîkaran jî hebûne û ji bo ku ewan li bal (rêya rast da) bizivirin me ewan bi qencî û xirabîyan ceribandin.

169; Îdî li pey wan da şûnmanên wusa (kotî) mane, ewan bûne mîratxurên pirtûka (Tewratê) ewan (aha) digotin: "Şixwa (ça dibe bira bibe) emê hey bêne baxişandinê." (Ji ber vî qasî) ewan (biryarên pirtûkê) di hemberê hinekî ji malê ve cîhana hanê riswa da, diguhurandin û heke wekî wî malî jî ji bona wan ra mal bê dayînê, ewanê ewî malî jî bigirin. Gelo qey ji wan, peyman li ser pirtûkê ne hatibû sitandinê, ku ewan ji pêştirê rastîyê li ser navê Yezdan qe tu tiştî nebêjin? Û çi tiştê di pirtûkê da heye, ewî (ji merivan ra bi şîretî) bêjin? Bi rasrî ji bona wanê xudaparisî dikin, şûnwarê para da çêtir e. Îdî qey hûn bi hişî naponijin?

170; (Xudaparis) ew in ku xwe (bi fermanê) pirtûkê digirin û nimêja xwe (ça hatine fermankirinê) wusa dikin. Bi rastî em kirya wanê aşîkar wunda nakin.

171; Û di gava me çîya ya (bi nav) Tûr bi ser wan da wekî sîwanekî rakiribû, ewan goman dikirin ku ewa çîya bi ser wan da bikebe (wusa bêzar mane. Me ji wan ra di wê gavê da aha gotiye): "Hûn (gelî kesan!) bi hîz bi wan (biryarên pirtûka) me daye we bigirin û hûn ewan biryaran bîra xwe bînin. Ji bo ku hûn bibne ji wanê xudaparis."

172; Û di gavekî da Xudayê te ji ûrta Adem, dûmda wan girtiye û (Xudayê te ewan) bi xweber, li ser wan bi xweber xistiye nihrevan (şahid. Di wê gavê da Xudayê te ji wan aha pîrsîye): "Ma qey ez Xudayê we nînim?" Ewana jî (di pisyara Xudayê te da aha) gotibûne: "Erê! Em şahidîyê didin (ku tu Xudayê meyî)." Ji bo ku hûn di roya rabûna hemû da nebêjin: "Haja me bi vê peymanê tu ne bûye," me eva peymana ji we girtiye.

173; Ya jî ji bo ku hûn (aha jî) nebêjin: "(Em ça bikin!) hêj di berya naha da, bav û kalê me (ji bona Yezdan ra) hevri çê kiribûn û em bi xweber jî li pey wan (bav û kalan da) ûrteke bê wecbûn (loma me jî hevri çê kirin). Qey tuyê îdî me bikirinê

wanê (ku rastîyê) pûç dikin, teşqeले bikî?"

174; Ji bo ku ewan bifetîlîne bal (rêya rast da) em beratan bi vekirî (rêz dikin).

175; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra bûyera) wî merivê (ku ji zarên cihûya bûye)

bixûne; di cara yekem da me ji bona wî ra (zanîna) berateyên xwe dabû. Paşê ewa ji (zanîna) wan beratan rût bûye (ewan bîrva kirine). Îdî pelîdên ji (cihûyan) ketine pey wî, ewa bi vî awayî bûye ji wanê devbixûn.

176; Heke me biva meyê ewa bi van beratan paydar bikira (nav û nîşanê wîyê bilind bibûya) û lê (me ewa neva, nav û dengê wî) di zemîn da (bi rezîlî) hey maye û ew bi xweber jî bûye peyrewê xweşîya xwe. Îdî temtêla wî wekî temtêla sa ne (kûçik). Heke tu êrişê jî beherî ser, ya jî para da ji wî birevî; ewa hey zimanê xwe derdixe li navê dixê. Temtêla wan komalê ku berateyên me derew didirîn jî aha ne. Îdî (Muhemmed!) tu evê çîrokê ji bona (wan ra bêje) dibe ku ewan (bi vê bûyerê) ramanî bikin.

177; Temtêla wî komalê ku bi berateyên me derewan dikin çîqa sike! Ewan bi xweber li xwe cewr dikiribûne.

178; Ewê ku Yezdan, ewa anîbe (rêya rast) şixwa ewa (di rêya rast dane) û (Yezdan) kîjanî ji (rêya rast) derxe, ewanê zîyan kirine, bi rastî îdî evan bi xweber in.

179; Bi sond! Me ji bona dojê ra ji meçêtir û kesan (wekî çandina) pîr (afirandine). Ji bona van (dojeyan ra) dilê wan heye, lê ewan bi wî dilî pisporêya (tu tiştî) nakin, ji bona wan ra çav hene, ewan bi wî çavî (tiştan) nabînin û ji bona wan ra goh hene, ewan bi wan gohan (tu tiştî) nabihên. Ewanan wekî tarişan in, ji tarişan pirtir jî hêj (rêya xwe) wunda kirine. Ewanê ku haja wan ji wan tune ye; evan bi xweber in.

180; Çîqa navên rind hene! Ewan ji bona Yezdan ra nin, îdî hûn bi qencê navan gazî wî bikin û hûn dest ji wanê, ku ewan (bi we ra) di navê wî da tekoşînê dikin berdin. Ewananê di nêzik da bi wan kirinê xwe bêne celatkirinê.

181; Û ji wan kesên ku me afirandine (destek) heye, ewan bi malî têne (rêya rast) û ewan hey bi mafî jî dadî dikin.

182; Ewanê ku bi berateyên me derewan dikin hene! Emê ewan di cîyekî wusa da hêdî hêdî şapat bikin, ku qe ewan pê nizan bin.

183; Û ez ji bona wan ra nemaze (xusûsî) dan didim. Bi rastî xaxê min pîr zexm e.

184; Ma qey ewan qe raman nakin, ku tu tepaketin bi hevalê wanê (Muhemmed ra) tune ye? Ewa hevalê wan hey hişyardarê (ji şapatan) bi xûyayî ye.

185; Qey ewan (bi ramanî) di maldarya ezman û zemîn da û di çî tiştên ku Yezdan afirandine û dibe ku danê can sitandina wan nêzik be, naponijin? Ewanê ji piştî vê (Qur'anê) gelo we îdî bi kîjan axiftinê bawer bikin?

186; Îdî Yezdan kîjanî (ji rêya rast) derxe, ji bona wî ra tu beled tune ye û (Yezdan) ewanan di quretî (û devxûnîya wan da) kor dihêle.

187; Ewanan ji te (Muhemmed!) pîrs dikin; ka gavê danê şandina rabûna hemûtî (Qîyametê) kînge ye? Tu (di pisyara wan da aha) bêje: "Bi rastî zanîna wî danî hey li bal Xudayê min e. Ji pêştirê wî tu kes gava wî danî nade qûyandinê (hey ewa di gava wî da derdixe). Ewa dana wusa girane ku ezman û zemîn jî nikarin hildin. Wê nişkê va bi we da were. Ewan pîrsa wî danî ji te dikin, tu dibe qey te (hêj berê da) ewa dana pîrsîyaye pê zaniye. Tu (ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî zanîna wî danî hey li bal Yezdan e, lê pîrên kesan (bi vî rastîyê) nizanin."

188; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Ji pêştirê tiştê Yezdan va ye; ez ji bona xwe ra jî tu kar û zîyanê nikarim bikim. Heke hûn bi tiştên ne xûyayî bizaniya, minê bi rastî qencê pîr bikirinan! Û ji min qe tu sikatî jî nedihat (ça bi serê min da jî ne dihat). Ez bi xweber jî ji bona komalê bawer dikin, tîrsdanê (bi celat) û mizgînvane (bi xelata) nim."

189; Evê ku hûn ji yek nişake bi tenê afirandine heye! Ewa Yezdan e, ji bo ku hogîrya xwe bidne hev ewî ji wê nişa zoya wê jî afirandiye. Îdî gava (zoya nêr li bal zoya mê da bi jinanî çûya) zoya mê bi barekî sivik avis bûye. Ji piştî (vê bûyerê, li ser avisbûnê da dan û dem) borîne, avisbûna we giran bûye; Her du zoyan bi hev ra ji Yezdan (aha) lava kirine: "Xudayê me! Heke tu ji bona me ra zarekî aşîkar bidî, bi sond! Emê bibne ji vanê sipazkar."

190; Îdî gava ku ewî ji bona wan ra (zareke) aşîkarê bê kemasî daye; ewan herdukan di afirandina (zarokê da) hevî jî bona wî ra girtine. Yezdan bi xweber jî ji wan hevriyên ewan girtine bê gur e.

191; Ewanan ça ewan tiştên ku hatine afirandinê; qe tu tişt jî ne afirandine ji bona wî ra dixne hevri?

192; Ewan hevriyan bi xweber jî ne ji bona (wan perestvananên xwe ra) û ne jî ji bona xwe ra bi xweber nikarin tu arîkarî bikin.

193; Heke hûn ewan (havriçêkeran) gazî li bal rêya rast bikin ewan dîsa nabin peyrewê we. Hûn çî gazî wan bikin û hûn çî xwe ker bikin (qe gazî wan nekin) li bal wan yek e.

194; Bi rastî ewan (perestvanên) ku hûn ji pêştirê Yezdan (bi perestî) gazî wan dikin hene! Ewan jî hinek bendeyên wekî we ne; (me ewan afirandine). Heke hûn di doza (xudatiya wan da rast in): ka îdî hûn (bi perestî) gazî wan bikin, bi ra ewan jî pisyara we bidin.

195; Qey ji bona wan ra pê heye, ku ewan bi wî digerin? Ya jî ji bona wan ra dest heye, ku ewan bi wî dayînê dikin? Ya jî ji bona wan ra qey çav hene, ku ewan bi wî çavî dîtîne bikin? Ya jî ji bona wan ra qey gonehên, ku ewan bi wî gohî bihistîne bikin? Tu (ji bona wan ra aha) bêje: "Ka hûn gazî wan perestvanên xwe bikin; pasê hûn (bi hev ra) ji bona min ra endezan bikin, îdî hûn qe li min mêze nekin (bira dilê we bi min neşewite!)"

196; Bi rastî ewa Yezdanê ku (bi ser min da) pirtûk hinartîye heye! Serkarê min bi xweber ewa ye. Ewa serkarya hemû aştikaran jî dike.

197; Ê ewan (perestvanên, ku hûn bi perestî) ji pêştirê (Yezdan) gazî wan dikin hene! Ewan nikarin arîkaria we bikin û ewan arîkaria xwe bi xweber jî nikarin bikin.

198; Ê heke hûn gazî wan (perestîyên xwe ji bona aştikarya xwe, ya jî ji bona ku ewan rêya rast bidne nişanê we) bikin; ewan (dengê we) nabihên. Gava tu ewan dibînî; tu dibê qey ewan li te mêze dikin, ewan bi xweber jî qe nabînin.

199; Tu (rêya) baxişandinê bigire û tu fermana bi qenciyan bike û tu ji nezanan dest berde.

200; Heke pelîd xidîka te anî (ji bo ku tu ji wan ra biryaran ne bêjî) heman tu xwe bavêje Yezdan. Bi rastî Yezdan bihistekî pir zana ye! (Ya jî heke ji pelîd da bîrvakirinek ji te ra hat, te jî bîrva kir biryarên Yezdan ji wan ra ne got, gava kete bîra te heman tu ji bona wan ra ewan biryaran bêje û tu ji bona vê bîrvakirîne ji Yezdan lavaya baxişandina xwe bike.) Bi rastî Yezdan bihistekê pir zana ye.

201; Bi rastî ewanê ku xudaparisî dikin hene! Gava ji pelîd sêwrandinek bi wan bigire; ewan heman lavaya baxişandina xwe, ji Yezdan tînine bîra xwe). Îdî di wê gavê da ewan (rêya rast jî) dibînin.

202; Ê birayên (pelîdan; file jî) hene! (Gava ji pelîdan sêwrandinek bi wan bigire) îdî pelîd ewan (birayên xwe) di demên dirêj da, di xapandina xwe da dihêle, pasê ewan (ji wan kirîne xwe jî dest) kurtayî nakin.

203; Ê di gava ku tu ji wan ra beratekî neynî, ewan (di pisyara te da aha) dibêjin: "Hêj te xwe berev ne kirîye (heya tu beratan jî ji bona me ra binî)?" Tu (ji bona wan ra aha) bêje: "Bi rastî ez hey dibime peyrewê wan berateyên, ku ji Xudayê min li bal min da hatiye niqandinê. Eva (Qur'ana bi xweber jî) ji Xudayê we, ji bona wî komalê bawer dikin, beled û dilovînek e.

204; Ê di gava ku Qur'an hate xwendinê, îdî hûn ji bona (xwendina Qur'anê) gohdarî bikin û hûnê xwe ker bikin; dibe ku hûn (bi vî awayî bêne dilovînkirinê.

205; Ê tu di dilê xwe da bi zarîn û bi dizî Xudayê xwe bîra xwe bîne; di sibe û evaran da (ji wî lavaya baxişandina xwe bike) bê qirîn (û hewar). Ê tu nebe ji wanê (ji bîranîne) bê goman in.

206; Bi rastî ewanê li bal Xudayê te, hene! Ewanan ji perestîya Xuda, xwe qure nakin; ewanan (di hemû caran da jî Xuda ji kêmasîyan) paqij dikin, ewan hey (ji bona Yezdan ra) kunde dibin.

## Chapter 8 (Sura 8)

1; (Muhemmed!) Ewan ji te pîrsa (parkirina malê) şorê dikin. Tu (di bersiva wan da aha) bêje: "Malê şorê; ji bona Yezdan û Pêxember e (ewan ça bivên wusa par dikin). Heke hûn Bi rastî bawer bikin, îdî hûn Yezdan parisî bikin û hûn di nava xwe da aştikarî bikin, hûn bi gotina Yezdan û Pêxemberê bikin."

2; Bi rastî bawerger hey evan in: Di gava ji Yezdan tê mijûlkirinê, dilê wan ji tîrsa davêje û di gava ku beratan wî ji wan ra tê xundinê, bawerya wan hêj pirtir

dibe, ewan (bawergeran bi xweber jî) xwe hispartine Xudayê xwe.

3; Ewan (bawergerên ku salixê wan borîne) ev in: Nimêja xwe dikin û ji wan rojînên (rizq) ku me daye wan (bi xezanan) didine xurînê.

4; Bi rastî bawergerên rast evan in. Li bal Xudayê wan ji bona wan ra paye û baxişandin û rojînên xweş hene.

5; Ça, gava ku Xudayê te, tu (ji bona qirîna bi filan ra) ji mala te derxistibû (xweşa wan ne diçû, wusa jî par kirine şorê jî xweşa wan naçe). Bi rastî destekî ji bawergeran, rikê xwe ji çiyûna qirînê dianîn.

6; Ji piştî ku rastî jî ji wan ra xûya bûye (ku we ewanê herne qirînê) ewan dîsa ji bo ku neçine qirînê bi te ra tekoşîn dikirin. Tu dibê qey ewan li bal mirinê da têne şandinê; ewan jî bêzar mane li çûna xwe mêze dikin.

7; Û hûn (bîrva nekin) di wê gavê da Yezdan yek ji wan her du destan (desta ji Mekke derketibû ji bona qirîna bi we ra û desta karwan vanên ku ji Şamê fetilîbûne) ji bona we ra peyman dabû (ku yek ji wan hey ji bona we ra ne). We bi xweber jî diva ku ewa desta (ji wanê para we ye); ewa desta bê hêz e (çekê wan tune ye, bê sturîbin, ku tu zîyana ji wan çê nebe) lê Yezdan bi xweber jî diva ku rastîyê bi peyvên xwe derxe û poçika filan jî îdî bibire.

8; Û (file û gunehkar) çîqa rikê xwe binin jî ji bona ku rastîyê maf bike û pûçatîyê jî pûç bike, Yezdan evan kirinan divê.

9; Di wî gavê da we bi lava ji Xudayê xwe arîkarî dixwest. Îdî (Xudayê we) ji bona we ra (aha) bersiv daye, "Bi rastî ez ê bi hezar firişteyên li pey hev arîkariya we bikim."

10; Yezdan ji bona ku dilê we bi arîkarine wan (fereştan ji tirsan neyaran) bi nive û ji bo ku (eva servahatin) bibe mizgîn (ji bona we ra, ku hûn îdî paş da jî servahatî bin) eva arîkarina hanê bi we kirîye û bi rastî arîkar in (û servahat in) hey li bal Yezdan e. Bi rastî Yezdan servahatê bijejke ye.

11; Di wê gavê da (ji bona ku hûn di qirîna Bedrê da ji tirsan neyaran) ewle bibin, Yezdan li bal .xwe hênijandinek bi we da anîye, ji bo ku ewa we paqij bike û sikatîyên ku pelîd (didane we, ji bona we ra aha digot: "Heke hûn li ser rêya rast bûnan, hûn di vê qirînê da bê av ne diman." Evan sêvirandinan) ji we behere û ji bo ku dilê we (bi servahatina li ser wan da) girê de û pê we jî (di hemberê wan neyaran da) bi cîh bîne, ew; ji ezmanan di ser we da avêk hinartîye.

12; Di wê gavê da Xudayê te li bal firiştan da (aha) niqandîye: "Bi rastî (gelî firiştan!) ez bi we ra nim, hûn îdî (dilê) bawergeran (bi qinyatan) bidne nivandinê ez e jî di dilê wan ê file da tirsê berdim. Hûn (gelî firiştan!) Li ser stûyê wan filan bixin hûn li hemû tilî û pêçiyê wan bixin (ji bo ku ewan nikar bin şûran hildin pêş va herin).

13; We (celata wan ê aha be;) loma ewan di hemberê Yezdan û di hemberê Pêxemberê wî da derketibûne. Kîjan di hemberê Yezdan û di hemberê Pêxemberê wî da derkebe, îdî bira (ewa bizane!) bi rastî Yezdan (ji bona wan ra) zor şapat e.

14; Îdî hûn (gelî filan!) ewê şapata (hanê di vê cîhanê da) çeşne (tam) bikin û bi rastî ji bona filan ra (di para da jî) şapata agir heye.

15; Gelî ewanê, ku we bawer kirîye! Di gava ku hûn (ji bona qirînê derketin çûn, hûn) rastê filan hatin (we dêna xwedayê, ku ewan) filan pîr in, îdî heman hûn piştî xwe nedine wan para da nerevin.

16; Û kîjan di wî danî da piştî xwe bide wan (para da here) bi rastî îdî ewa rastî xeşmeke Yezdan e wusa hatîye, ewra wî hey doj e, ewa doja çika sikê ewran e! Ji pêştirê; heke paraçûna wî, ji bo ku ewa (ji bona neyaran ra xaxan darxe; bi awayekî dinê qirîn bike) ya jî para da here bal desteke mayî (ji hevalê xwe) ku di tevê wan da (bi filan ra qirînê bike.)

17; We ewan (di wî danî da bi hêza xwe) ne dikuştin! Lê îdî Yezdan ewan dikuştin. Û di gava ku te (çekê qirînê) diavête wan, te ewan (çekan) ne diavêt, lê Yezdan ewan (çekan) diavête wan (ewan çekan jî bi zanîna ji Yezdan digihîjtine armancên xwe). Ji bo ku (Yezdan) bi vî arîkarîkirinê bawergeran (bi qenciyên) rind qencîyan bike; eva arîkarkirina hanê bi we kirîye. Bi rastî Yezdan bihistekê pîr zan e.

18; Bi van (arîkarîkirin û qenciyên hanênan we dît) bi rastî Yezdan xaxê filan sist dike.

19; (Gelî filan!) Heke hûn servahatinê dixwazin, îdî ji bona we ra servahatin, hat, (bi servahatina bawergeran, hûn sernegûn bûn). Û heke hûn ji neyartîya (Pêxember û



hevalê wî) xwe bidine para da, şixwa eva paradana hanê ji bona we ra çêtir e. (Na!) Heke dîsa para da bizivirin (ji bona qirîn û neyartîya Pêxember û hevalê wî) şixwa emê jî (ji bona arîkarkirina Pêxember û hevalê wî) para bizivirin (hûnê dîsa sernegûn bibin). Û koma we çîqa ji pir dibe bira bibe, dîsa ewa koma we, we ji şapata (sernegûnî ye) nade para da. Û Yezdan bi xweber jî bi rastî bi bawergeran ra ne.

20; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn bi gotina Yezdan û Pêxemberê wî bikin û hûn (fermanên Yezdan) dibêhin (bi zanîn) piştî xwe nedine (wan fermanan).

21; Û hûn jî wekî wan komalên ku (aha) gotine: "Me bihist", nebin. Lê qe ewan ne bihistibûne (çima qe ewan wekî fermanên Yezdan xebat ne dikiribûne.)

22; Bi rastî li bal Yezdan betere reweran; ewan rewerên, ku ker in û lal in qe ji tu tiştî hiş hilnadin hene! (Ewan reweran) bi xweber in.

23; Û heke Yezdan zanibûya ku di nava wan da qenciyekey heye, wê Yezdanê (biryarên xwe) bi wan bida bihistinê. Û heke Yezdan (biryarên xwe) bi wan bida bihistinê jî. Şixwa dîsa ewanê piştî xwe bidana wan (biryaran) para da biçûnan.

24; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Gava Yezdan û Pêxember hûn li bal wan (biryarên) ku ewan ji bona we ra jîna (hebûnê) didin, gazî kirin; hûn ji bona wan ra bersiva (litê kirin) bidin. Û (gelî ewanê ku we bawer kirîye!) Hûn bizanin, bi rastî Yezdan dikebe nava meriv û (mirazê) dilê wî da û (hûn bizanin) ku hûnê bi rastî li bal (Yezdan da) bîne kom kirinê.

25; Û (gelî ewanê ku we bawer kirîye!) Hûn ji wê aşîta, ku ewa xurî ji bona wanê ji we ne cewr kirine nîne, xwe biparisînin. Û hûn bizanin! Bi rastî Yezdan zor şapat e.

26; Û hûn ewê gava, ku hûn hindik bûn, hûn di zemîn da dihatine herçi qandinê, hûn ditirsîyan, ku (neyarên we) wê nişkê va bi ser we da bigirin, we bifetisînin, bira xwe bînin: Di wê gavê da îdî ewî hûn (bi nivandin) ewirandin û ewî hûn bi arîkarkirina xwe bi hêz kirin û bi paqijê rojîyan hûn dane rojî kirinê, divê ku hûn bi rastî sipazîya wî bikin.

27; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Hûn qelpîya Yezdan û Pêxember nekin, ji bo ku hûn bi zanîn di wan tiştên bi ewletî (li bal we da hatiye danînê) qelpî nekin.

28; Û hûn (bizanin!) ku bi rastî mal û zarên we (ji bona we ra sedemên) ceribandina (gonehan in) û (hûn bizanin!) bi rastî li bal Yezdan kirêne mezin hene.

29; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Heke hûn parisîya Yezdan bikin bi rastî ewê ji bona we ra pûçî û rastîyê ji hev derxe û bi rastî ewê sikatiyên we li ser we rake û ji bona we ra baxişandinê bike. Bi rastî Yezdan bi xweber jî xweyê rûmeta mezin e.

30; Kanê! Di gavêkî da ewanê file ji bo ku te (Muhammed!) bigirin girebidin, ya jî te bikujin, ya jî te (ji welat) derxin; divan ku ji te ra xexan darxin. Ewan tevdira xaxan dikirin û Yezdan jî (ji bona wan ra) tevdira xaxan dibîne. Û Yezdan bi xweber jî qenctirê ji wanê tevdira xaxan dibîneye.

31; Û di gava ku beratên me ji wan ra tê xwandinê ewan (aha) gotine: "Bi sond! Me bihist (îdî bes e) heke me biva, meyê jî wekî van (peyvan) bigotinan. Bi rastî ewan (gotinan) hey çîrokên berê ne."

32; Û di gavêkî da jî ewan (ji Xuda lava kirine aha)gotibûne: "Yezdan! Heke bi rastî eva (pirtûka hanê) maf e, bi rastî ji bal te hatiye; îdî tu li ser me da ji ezmanan kevîran bibarîne, ya jî tu ji bona me ra şapateke dilsoz bîne."

33; Û Yezdan bi xweber jî; ji bo ku tu di nava wan da î ewan şapat nake, Yezdan ewan şapat nake, heke ewan ji kirinê xwa poşman bibin.

34; Û îdî (gava tu ji nava wan derketî) ji bo ku Yezdan şapat neke çi maye? Ewan bi ewan bi xweber jî (merivan ji sertêdana) mizgevtî (bi nav) Mescid ul-Heram didine para da, ewan qe ji bona wê mizgevtê ra jî serkar ne bûne. Serkarê wê mizgevtê hey xudapariz in. Lê pirên wan bivê (serkaryî) nizanin.

35; Û nimêja wan di mizgevtê da ji pêştirê fitandin û çepik li hev xistinê, tu tişt nîne. Îdî (gelî filan!) ji bo ku hûn fileti dikin; hûn şapartê çeşne (tam) bikin.

36; Bi rastî ewanê ku fileti dikin hene; ewanan malê xwe didine xwarinê, ji bo ku ewan rêya Yezdan li ber merivan bigirin. Îdî ewanê di nêzik da jî dîsa ewî malê xwe bidin, paşê wê ewa mal sixurandina wanê ji bona wan ra bibe kovan paşê ewanê sernegûn jî bibin. Û bi rastî ewanê bûne File hene! Ewanê li bal dojê da kom bibin.

37; (Ewan kom dibin) ji bo ku Yezdan sikan, ji titalan raqetîne û, ewan sikan dicivîne li ser hev datîne, îdî ewan sikan hemûşkan tevê hev dike paşê ewan sikan

dixe dojê. Îdî ewanê zîyan kirine hene! Evan filan in.

38; Tu (Muhemmed! Ji bona wanê bûne file ra aha) beje: "Heke ewan (filan ji neyartîya Pêxember û ji qirîna bi wî ra) xwe bidine para da, we ji bona wan ra, ewan kirinê wanên berê bêne baxişandinê û heke ewan (filan) dîsa li bal (neyartî û qirîna bi Pêxember ra) bizivirin: îdî bi sond! Rêya (şapatdana wan komalên di berya wan da borîne heye!) We ji bona van ra jî (bêt pêkanînê)."

39; Û (Gelî bawergeran!) Hûn bi wanê (file ra) qirînê bikin heya (di cîhanê da) tevdanî nemîne û heya ku ol hemûşk jî ji bona Yezdan ra bimîne. Heke ewan (filan dest ji qirîn û tevdanê) berdan (bîra ewan bizanin!) ku bi rastî Yezdan, ewan tiştên ku ewan dîkin, dibîne.

40; Û heke ewan ji wan kirinan (dest ber nedan); piştî xwe dane we, îdî hûn bizanin! Ku bi rastî Yezdan serkarê we ye. Çiqa serkarekî qenc e û çiqa arîkarekî qenc e!.

41; Û hûn (gelî ewanê ku we bawer kirîye!) bizanin: We di roya, ku her du destan (di qirîna Bedrê da) rastî hev hatine, we çî mal şor kirîye; ji wî malî penca yek, ji bona Yezdan ra ne: Ewa ji bona Pêxember û lezîmên wî û sewîyan û xêzan û rêwîyan (te sixurandinê). Heke we bi Yezdan û bi wan biryarên, ku me di roya her du destê tevê hev bibûn, ji bona rastî û pûçîtî ji hev raqetîne li ser bendê xwe da hinartîye, bawer kiribin (parkirin wusa ne). Bi rastî Yezdan li ser hemû tiştan dişî.

42; Di wê gava hûn di rûbarê newalê (nezîkê Medîne da) bûn, ewan (neyaran jî) di rûbarê newalê alîyê dûrê (Medîne da) bûn û karwanê wan jî di jêra wê da (li derê deryayê di terazîna avê da hewya bûne). Ya jî (di wê gava, ku we ji bona jîna cêhanî, kelepur divan: ku hûn li talanê wan xîn, ewan jî ji bona armancên dûr, divan, ku Muhemmed bikujin paşya we bînin û sîyariyên wan jî di alîyê deryayê da li jêra we da diterezîna avê da hewya bûn; dîdeyanîya we bi hêsanî dikirin.) Heke we (gelî bawergeran!) peymanî danê radewanî (ji bona qirîna Bedrê bida wan neyarên xwe) weyê di wî danî da tekoşînî bi hev ra bikirinan, hûnê para biketinan. Lê ji bo ku Yezdan ewa bûyera (ji bona teşqela wan) pek hatîye bîne cî, ewanê tîne teşqelekirinê, li ber çavî bêne teşqelekirinê û ewanê tîne jînê jî li ber çavî bijîn, ewa bûyera pêk anî. Bi rastî Yezdan bi xweber jî bihîstekê pir zana ye.

43; Di wê gavê de Yezdan ewan (neyaran) di xewna te da bi hindîka î dane nişanê te. Û heke (Yezdan) ewan (neyaran) bi piratî bidana nişanê te hûnê bêzar bibûnan, weyê bi hev ra (ji bona bûyerê) tetoşîn bikirinan, hûnê ji hev biçûnan. Lê Yezdan hûn (ji vê bûyera hanê) ferestandin. Bi rastî Yezdan bi tiştî di singan da heye dizane.

44; Di wê gava (ku hûn rastê hev hatin) ji bo ku Yezdan ewa bûyera (ji bona teşqeledana wan) pêk hatîye, bîne cî; ewan (neyaran) di çavê we da hindîk dida xuyandî û hûn jî di çavê wan da hindîk dikirin, şixwa hemûşk bûyer jî li bal Yezdan da dizivirin.

45; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Di gava ku hûn rastî koma (neyaran) hatin, îdî hûn di hemberê wan da ji bona qirînê) bi cî hew bikin, ji bona ku hûn bi servahatî fereste bibin, hûn Yezdan pir bîra xwe bînin.

46; Û hûn (gelî bawergeran!) bi gotina Yezdan û Pêxemberê wî hûn (bi hev ra) tekoşînê nekin. (Heke hûn bi hev ra xir bikin) wê, îdî hûnê ji hev bêzar bibin û wê bêna (vê bêzarbûna we) here (neyarên) we û hûn (li hemberê wan neyaran) xwe da hew bikin. Bi rastî Yezdan bi hewgeran ra ne.

47; Û (gelî bawergeran!) hûn jî wekî (wan alotiyên filan, ku ji bona qirînê) bi pesnan û ji bona ku nav û dengê wan li pey wan da bê gotinê ji welatê xwe derketine, nebin. Ewan (filan hene!) ewan rêya Yezdan li ber merivan dibirin; ewan durûtî dîkin. Û tiştî ku ewan dîkin Yezdan hildaye binê zanîna xwe.

48; Û di wê gavê da pelîd kirinên wan ji bona wan ra xemilandî bûye û pelîd ji bona wan ra (aha) gotîye: "Di îro da servahatîna tu kesî bi ser we da çê nabe û bi rastî ez bi xweber jî ji bona we ra heval im." Îdî gava ku her du destê (ji bona qirînê hatin) ji hev ra xûya bûn (pelîd) di para da li ser her du gûzekê xwe teisî (ji wan revîya) û ji wan ra jî (aha) gotîye: "Bi rastî qe tu gur û gumana min bi we tune ye: Loma tiştî ku hûn nabînin, ez dibînim, bi rastî ez ji Yezdan ditirsim. Bi rastî Yezdan bi xweber jî zor şapat e."

49; Di wê gavê da (ewanê) durû û ewanê ku di dilê wan da nexweşîya (dexesî û filetiyê) heye (aha) digotin: "Ola van, evan ji avarû derxistine." (Gotina wan

nîne, lê) kîjan xwe hispêre Yezdanê servahatê bijejk e, îdî ewa serfiraz e.

50; Xwezîya di gava can sitandina wan da; ku firişte li ber û piştê wan (filan) dixin, ji wan ra (aha) dibêjin: "Û hûn (gelî filan!) ka îdî şapata şewatê çeşne (tam) bikin", te temtêla wan bidîta, ka çabû!

51; Eva (şapata hanê ku bi we da hatiye) bi sedema wan kedên we ne, ku hêj di berê da (we ji bona xwe ra pêşkoçî şandîye) bi cî tê. (Heke ji bona wan nebe) bi rastî Yezdan ji bona bendan ra qe cewrkar nîne.

52; Wekî temtêla hevriyên Fir'ewn û temtêla wan komên ku di berya (hevriyên Fir'ewn da) borîne: Ewan jî Beratên Yezdan dabûne derewdêrandinê, îdî Yezdan ewanan bi gonehên wan şapat kirine (ewan tune kirine), Bi rastî Yezdan bi hêzê zor şapat e.

53; Eva (aha) ye; bi rastî Yezdan gava ku qencîyekî bi komalekî bike, heya ewa komala bi xweber ewê qencîyê neguhure, ewa jî qencîya xwe ji wan naguhure. Bi rastî Yezdan bihistokê pîrzane ye.

54; Wekî temtêla hevriyên Fir'ewn û temtêla wan komalên ku di berya (hevriyên Fir'ewn da) borîne; ewan jî beratên Xudayê xwe dabûne derewdêrandinê, îdî me jî ewan bi gonehên wan teşqeke kirine û me hevriyên Fir'ewn (di avê da) fetisandin. Û bi rastî ewan hemûşk jî cewrkar bûne.

55; Bi rastî ewanê file hene! Ewanan li bal Yezdan beterê reweran in, îdî ewan qe bawer nakin.

56; (Muhemmed!) Ewan kesên (ji wan filan) ku te peyman (aştiyê) dabûye wan hene! Ewan di her carê da paşê peyman xwe şikênandine û qe ewan bi xweber jî parisvaniya wê peymanê nakin.

57; Tu (Muhemmed!) ewan kînge di qirînê da bigrî, îdî tu wusa bînî serê wan; ji bo ku ewan, ji bona wanê ku li peywan da tê bibne sodret (îdî peyman xwe neşikênin). Bi rastî dibe ku ewan, ewan kirinan bîra xwe bînin.

58; Û kînge tu tirsîya î, ji wî komalê ku te bi wan ra peyman (aştiyê) daye: ku we ewanê qelpî bikin (peyman xwe bişikênin) îdî tu jî bi vekirî (hêj di berya qirînê da) ji wan ra (aha) beje: "Ji vir ha, di nava me û we da qe tu peyman tune ye; ça hûn dikarin wusa bikin)." Bi rastî Yezdan ji qelpan hez nake.

59; Û bîra ewanê (ku di qirînê da) pêş va çûne (fereste bûne) goman nekin (ku wê ewanê ji şapatan jî pêş va herin fereste bibin). Bi rastî ewanan qe me bêzar nakin (ku hûn bidne pey wan ewan bigirin û em ewan şapat bikin).

60; Û hûn jî (gelî bawergeran!) çi dikarin; di hemberê wan (neyaran da bikin) ji bona ku hûn (bi wê hêza we ye heyî) neyarên Yezdan û neyarên xwe û ewan neyarên mayîne ku hûn bi wan nizanin, lê Yezdan bi wan dizane: bidine tirsandinê, Hespên xweyên (Xamê da) û çekên xwe ji bona (qirîna bi wan neyaran ra) amade bikin. Û hûn di rêya Yezdan da çi bisixurînin ewa ewê li bal we da (paş da) bê kemaî bê dayînê û qe tu cewr jî li we nayê kirinê.

61; Û heke ewan (neyaran) ji bona aştiyê nezîkê we bûn, îdî tu jî (ji bona aştiyê ra) nezîk bibe û tu xwe hispêre Yezdan. Bi rastî hey (Yezdan bi tenê ye) ku bihistokê pîrzane ye.

62; Û heke ewan (neyaran) bivên, ku te (ji bona aştiyê) bixapînin, (haja te bi wan nemîne, dîsa ewan qirînê bikin) qe (tu kovanan neke!). Loma Yezdan besê te ye. Ewî (Yezdanî) tu bi arîkarîya xwe û (bi arîkarîya) bawergeran (serfiraz kirî).

63; Û ewî di nava dilê (bawergeran da) hogirî çê kirîye. Heke te (hemû heyîne) di cîhanê da hene, bida jî dîsa te di nava dilê wan da hogirî çê ne fikir, lê Yezdan di nava wan da hogirî çê kir. Bi rastî ewa servahatê bijejke ye.

64; Pêxember! Ewan bawergerên ku bûne peyrewê te hene! Yezdan besê te û wa ne.

65; Pêxember! Tu ji bona qirînê helana bide bawergeran. Heke ji we (bawergeran) bîst merivên hewdaî hebin; Ewanê li du sed (merivê neyar) servahatinê bikin. Û heke ji we sed merivên hewdaî hebin; wê ewanê li hezar (merivên fileyên neyar) servehatinê bikin. Loma bi rastî ewan komalekî wusa nin; qe qencî û xirabîyan ji hev dernaxin.

66; A, di naha da! Yezdan barê we sivik kirîye, loma bi rastî Yezdan zanîye ku di nava we da (merivên) bê wec hene. Îdî heke ji we sed (merivên) hewdaî hebin; wê ewanê li du sed (merivên file) servahatinê bikin, û heke ji we hezar (merivên) hewdaî hebin; wê ewanê bi dustûra Yezdan li du hezar (merivên fileyên neyar) servahatinê bikin. Loma bi rastî Yezdan bi hewdaran ra ne.

67; Heya neyar di zemîn da rind sernegûn nebin, qe ji bona tu pêxember (û hevalê wî

ra) durist nîne, ku (ewan neyaran bigrin) zebûn bibin (di hemberê wan da mal bistînin ewan azad bikin). Hûn (gelî bawergeran! Malê wan talan û tajan dîkin dest ji qirînê berdidin) jîna cîhan û xişrê wê divên. Yezdan bi xweber jî (ji bona wa ra jîna) paş da divê. Bi rastî Yezdan servahatê bijejke ye.

68; Heke hêj berê da ji Yezdan (ji bona we ra peymana bi servehatina we) ne borî bûya, we bi sedema van (mal hildan û zebûn girtina we) şapateke mezin bi we bigirta.

69; Îdî (gelî bawergeran!) hûn ji wan (malên) ku we (ji neyarên xwe) şorî kirine, bi duristî û bi titalî bixun û hûn yezdanparisî bikin. Bi rastî Yezdan baxişkarê dilovîn e.

70; Pêxember! Tu ji bona wanê ku di destê we da zebûn in (aha) bêje: "Heke Yezdan bizane ku di dilê we da qencî heye, we ji wan (gerewên) ku ji we tê sitandinê; çêtirên wan bide we u we ji bona we ra gonehên we bibaxişîne." Bi rastî Yezdan baxişgerê dilovîn e.

71; Heke ewan (zebûnan) qelptîya bi te ra bivên (bira ewan bizanin!) ku ewan hêj di berê da qelptî bi Yezdan ra kiribûne, îdî ewî ji bona ku tu bi wan bikarî) çare daya te, ku tu ewan (biherçiqinî). Bi rastî Yezdan bi xweber jî pirzan e bijejke ye.

72; Bi rastî ewanê ku bawer kirine û (ji bona qayîlbûna Yezdan ji welat xwe) koç kirine û bi mal û canê xwe di rêya Yezdan da tekoşîn kirine û ewan ê, ku ewan (koçer û tekoşîngeran) di mala xwe da di êwirînin û arîkarîya wan dîkin, hene! Ewanan; hinekê wan sarkarê hinekê wan in (ewan mîratxurên hev in). Lê ewanê ku bawer kirine (ji bona qayîlbûna Yezdan ji welatê xwe) koç ne kirine, hene! Ewanan heya (ji welatê xwe) koç nekin, qe tu serkarîya we ji bona wan ra bi tu tiştî çê nabe (hûn ji bona hev ra jî nabine mîratxur). Lê heke (ewanê ku ji welatê xwe ji bona qayîlbûna Yezdan koç ne kirine) ji we, di mafê olê da arîkarî xwastin; îdî (di wê gavê da) arîkarîya wan, li ser we bi vê nevê ye, ji pêştirê heke ewan arîkarî di hemberê wî komalê, ku di nava we û wan da peymana (aştiyê) hebe (hûn nikarin arîkarîya wan bawergeran bikin). Şixwa Yezdan bi xweber jî tiştê hûn dîkin dibîne.

73; Ê ewanê bûne file hene! Ewan jî hinekî wan sarkarê hinekî wan in (ewan mîratxurên hev in). Heke (hûn ça hatine fermankirinê, wusa arîkarîya hev nekin) we di zemîn da tevdan û ji rêderketinên mezinê çê bin (hêza filanê we pir bibe, hûn Misilmanê be hêz bin).

74; Ê ewanê ku bawer kirine û di rêya Yezdan da (ji welatê xwe) koç kirine û tekoşîn kirine û ewanê (ku koçgeran di mala xwe da) bi cî kirine û arîkarîya wan kirine hene! Ewanan in, ku bi rastî bawer kirine. Ji bona van ra baxişandin û xarin ne xweş hene.

75; Ê ewanê ku di paş da bawer kirine û (ji bona qayîlbûna Yezdan ji welatê xwe) koç kirine û bi we ra jî (bi neyaran ra) tekoşîn kirine hene! Îdî ewan jî ji we ne. (Gelî bawergeran!) Şixwa di pirtûka Yezdan da; ewanê ku ji bona hev ra lêzîmin, babettirin ku ji bona hev ra bibne mîratxur û ûrt. Bi rastî Yezdan bi hemû tiştan dizane.

## Chapter 9 (Sura 9)

1; Eva ji Yezdan û ji Pêxemberê wî li bal hevriçêkerên, ku we ji bona wan ra peymana (aştiyê) dabûye, (ewan jî ewa peyman şikênandine, ji bona gizbirîna we) bi rastî belavok û destûrek e.

2; Îdî hûn (gelî filan!) di zemîn da çar mehan (bê tirs) bigerin û hûn evî jî bizanin! Ku hûn nikarin Yezdan bêzar bikin (ku îdî Yezdan nikaribe şapatê bide we) û hûn (bizanin!) bi rastî Yezdanê filan riswa bike.

3; Ê eva di roya meztirê hecê da ji Yezdan û ji Pêxemberê wî li bal kesan da belavanokeke, ku bi rastî ewan herduk jî ji hevriçêker û ji peymana bi wan ra daî dest berdane (ji wan bê gur û bê goman in). Îdî heke hûn (gelî kesan! Ji filetî û ji peyman şikênandinên xwe) poşman bibin, şixwa (poşmanîya we ji wan kirinê we) ji bona we ra çêtir e û heke hûn (ji poşmanîya xwe) rû bifetilînin (dîsa hevriçêkirinê bikin û peymanên xwe bişikênin) hûn bizanin! Ku hûn nikarin Yezdan bêzar bikin (ku îdî ewa nikaribe şapatê bide we). Ê (Muhemmed!) ewanê ku bûne file hene! Tu mizginîya wanan bi şapateke dilsoz bide.

4; Ji pêştirê (peymana) wan hevriçêkerên, ku we bi wan ra peymana (aştiyê) daye hev

û paşê ewan hevriçêkeran jî qe ji wê peymanê tu tiştêk kêr nekiribin û ewan piştvanîya tu kesekî jî li hemberê we da ne kiribin, hûn jî heya danê paşya peymanê hat, ewa peymana ku we daye hev pêk bînin. Hûn bizanin! Bi rastî Yezdan ji parisvanan hez dike.

5; Îdî di gava ku paşya wan mehên (qirîn di wan da hatiye qedexe kirinê) hat, hûn li kederê rastî wan (hevriçêkeran) hatin; hûn çar dikarin wusa bi wan ra qirîn bikin û hûn ewan bigirin; di xanî û di duzan da (kelan da) bixne zindanan û hûn li hemû ciyan da ji bona wan ra didegehan daynin (didarya wan bikin û hemû rêyan li wan bigirin). Îdî heke ewan (ji wan kirinên xwe) poşman bûn û nimêja xwe kirin û baca malê xwe jî dan, hûn îdî rêya wan valakin (dest nedine wan). Bi rastî Yezdan ji penhûgerê kemasîyan û dilovîn e.

6; (Muhemmed!) Heke yek ji hevriçêkeran xwe avête ber bextê te, îdî tu jî ewî bi ewletî hilde berbextê xwe, heya ku ewa peyvên Yezdan bibêhê, paşê tu ewî bi ewletî bigihîne wî cîyê ku ewa di wura da ewle dibe (ji bo ku tu kes dest nede wî). Ji ber ku ewan komalekî bi tiştan nizanin (tu evan xebatan bi wan ra dikî.)

7; Ji pêştirê wan (fileyên) ku we li bal mizgefta (bi nan Mescid ul-Heram peyman daye hev, we ji bona wanê ku hevriçêker in (pût perestî) li bal Yezdan û li bal Pêxemberê wî çar peymanê çê be? Îdî ji wan (filan) kîjan ji bona we ra rast bin, hûn jî ji bona wan ra rast bin. Bi rastî Yezdan (ji wanê ku di peymana xwe da) parisvan in hez dike.

8; Wê çar (peymanê) çê be? Heke ewan (filan) li ser we da bi serbestî servahatî bibûnan, ewan (filan) qe di nav we da li tu kesekî pismam û li tu sond û peymanên ku we dabûye hevdu mêze ne dikirin. Ewan (filan) divên ku we devê xwe, bi xwe bidine qayîl kirinê û lê dilê wan qe bi tu cureî qayîl nabe. Şixwa pirên wan bi xweber jî ji rêya rast derketî bûne.

9; Ewan (filan) beratên Yezdan bi perekî hindik firotine, îdî ewan rêya Yezdan ji ber merivan giredane. Bi rastî tiştê ewan dikin çiqas sîk e!

10; Ewan (filan) di nava bawergeran da qe li tu kesekî pisman û li tu sond û peymanekî mêze ne dikirin. Şixwa ewanê ku ji tuxûbê xwe borîne; (qe li tu tiştî mêze nakin) evan bi xweber in.

11; Îdî heke ewan (filan ji wan kirinên xwe) poşman bûn; nimêja xwe kirin û baca xwe dan, ewan di olê da îdî birayên we ne. Em (evan) beratên ji bona wî komalê ku dizanin vedikin.

12; Ê heke ewan (filan) ji piştî peymana xwe, sonda xwe şikênandin û ewan ziman xwe dirêjî ola we kirin (bi we tinaz kirin) îdî hûn jî (gelî bawergeran!) bi wan pêşrewanê wanên ku di filetiyê da pêşrewanî dikin ra qirîn bikin, bi rastî ji bona wan ra tu sond tune ye. (Bi vî awayî) dibe ku ewan (filan) ji wan kirinê xwe, xwe bidine paş da.

13; Qey hûn (gelî bawergeran!) bi wî komalê ku ewan sonda xwe şikênandine û ewan ji bona ku Pêxember (ji bajarê Mekke) derxin, biryar hildane (evan kirinên hanênan) di cara yekem da jî ewan bi xweber dest avêtibûne xebata wan kiribûne, qirînê nakin? Qey hûn (gelî bawergeran!) ji wî (komalê) ditirsin? Heke hûn bi rastî bi Yezdan bawer dikin, îdî babettir e ku hûn ji Yezdan bitirsin.

14; Hûn (gelî bawergeran!) ji bo ku Yezdan (ewan filan) bi destê we şapat bike û ji bona ku ewan sernegûn bike û arîkarêya we bike; ku hûn li ser wan da servahatî bibin, ji bo ku dilê (we) komalê bawerger bi vî awayî mêfa (şifa) bibe, bi wan (filan ra) qirînê bikin.

15; Ê ji bona ku Yezdan (ewa kula fila ne, ku di dilê bawergeran da heye) behere. Şixwa Yezdan bi xweber jî, ji bona kîjanî ra bivê, poşmanîya wî ye ji gonehan litê dike. Ê bi rastî Yezdan pirzanê bijejke ye.

16; Qey hûn goman dikin, heya ku Yezdan; ewan merivên ji we ne, ku ji bona rêya Yezdan tekoşîn dikin û ewan merivan bi xweber jî ji pêştirê Yezdan û ji pêştirê Pêxemberê wî û ji pêştirê bawergeran ji xwe ra qe tu kesekî serkar û bextiyar nagirin, bi wê temtêla wan nizanbe, wê Yezdanê li ser vê temtêla we, dest ji we berde? Şixwa hûn çî bikin, Yezdan bi xweber jî bi wî dizane.

17; Ewan hevriçêkerên, ku ji bona filetiya xwe ra li ser xwe, bi xweber şahidî didin, ku file ne ewa hene! Ji bona wan ra tu maf tune ye ku mizgeftên Yezdan ava bikin. Ewan kirinê wan hemûşk şewitîne û ewanê di agir da jî tum carî bimînin.

18; Bi rastî mizgeftên Yezdan hey ewan kesên ku bi Yezdan û bi ro (danê) para da

bawer kirine û nimêja xwe kirine û baca xwe dane û ji pêştirê Yezdan ji tu kesî jî natirsîn, ava dîkin. îdî dibe ku ewan bibîne ji wan kesên ku hatine rêya rast.

19; Qey hûn (gelî kesên!) av dana hecîyan û ava kirina mizgevtê (bi nav) Mescid ul-Heram û ewanê ku bi Yezdan û bi ro û danê para da bawer kirine û (ji bona qayîlbûna Yezdan) di rêya Yezdan da tekoşîn kirine; wekî hev digirin? Na, ewan li bal Yezdan wekî hev nabin. Bi rastî Yezdan komalê cewrkar nayne rêya rast.

20; Ewanê ku bawer kirine û (ji welatê xwe) koç kirine û ji bona qayîlbûna Yezdan di rêya Yezdan da bi mal û bi canê xwe tekoşîn kirine, hene! Ewan li bal Yezdan bi payetî meztir in. Ewanê serfiraz jî ewan bi xweber in.

21; Xudayê wan li bal xwe ji bona wan ra mizgîna dilovanîyeke ji xwe û qayîlbûna xwe bi wan dide, ku ji bona wan ra bihişt hene, xarina wan bê paşî ne.

22; Ewan bi xweber jî di wê bihiştê da hey manok in. Bi rastî li bal Yezdan xelatên mezin hene.

23; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Heke bav û kal û birayên we, ji bawerîyê pirtir ji filetiyê hez bikin, hûn jî ewan ji xwe ra serkar û mezin negirin. Û kîjan ji we, ewan bav û kal û biran ji bona xwe ra serkar û mezin bigire; îdî bi rastî ewan bi xweber cewr kirine.

24; (Muhammed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Heke li bal we bav û kalên we û zarên we û birayên we û zone we û pismam û lêzimên we û ewa malê ku hûn keda wî dîkin û ewa kirîn û fîrotina ku hûn ditirsîn, ji bona ku hûn di wî da karê nekin û ewan xan û malên ku hûn bi wan qayîl bûne, ji Yezdan û ji Pêxemberê wî û ji wê tekoşîna ku ji bona rêya wî tê kirinê, heztir be, îdî hûn dîdarî bikin, heya ku fermana Yezdan (bi teşqeledana we) were." Bi rastî Yezdan bi xweber jî ewî komalê ku ji rêya rast derketîye nayne rê.

25; Bi sond! Yezdan di pir cîyan da arîkarîya we kirîye û di roya (qirîna) Huneynê da jî (arîkarîya we kirîye): Di wê royê da; piranîya we hûn bi sodretî qure kirine, îdî ewê (piratiyê jî) qe tu tiştêk ji we ne daye para danê û zemîn bi firetiya xûya jî li ser we teng bûye û paşê jî we piştê xwe daye qirînê hûn para da revîyane.

26; Passê (ji piştî ku hûn revîyane) Yezdan hewdana xwe (bi ber dilî) li ser pêxemberê xwe û li ser bawergeran da hinartîye û ewî leşkerekî wusa hinartîye ku qe we ewa (leşkeran) ne didîtin. (Ewî bi wan leşkeran) ewanê ku filetiyê dikiribûne şapat kirîye. Û şixwa celata filan bi xweber jî ewa ye.

27; Ji piştî vî jî Yezdan poşmaniya evînên xwe litê dike. Û bi rastî Yezdan baxişgerekî dilovîn e.

28; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Bi rastî ewanê hevriçêker hene! Ewanan (bi bawerî) pîs in, îdî bira ewanan ji piştî vê sala wane hanê nêzikê mizgevtê (bi nav) Mescid ul-Heram nebin û heke hûn (ji ne hatina wan li bal mizgevtê da) bitirsîn, ku hûnê xezan bibin; îdî heke Yezdan bivê şixwa ewê we ji rûmeta xwe zengîn bike. Bi rastî Yezdan zanakî bijejke ye.

29; Hûn (gelî bawergeran!) bi wanê ku ji bona wan ra pirtûk hatîye, ku ewan hêj bi Yezdan û bi ro û danê para da bawer nakin û ewan ku Yezdan û Pêxemberê Wî ne durist kirine, ne durist nakin (ji wan bi duristî dixun) û ola rast jî (ji bona xwe ra) bi olî litê nakin, qirînê bikin; heya ku ewan xeraca xwe bi destê xerac kûsanên bidin, ku ewan bi xweber jî stûxar bin.

30; Û cihûyan (aha) gotine: "Bi rastî Uzeyr kurê Yezdan e." Û Mexînan jî (aha) gotine: "Bi rastî Îsa kurê Yezdan e." Eva gotina hanê, gotina wan e, bi devê xwe dibêjin. (Gotina wan) wekî gotina wan fileyên ku hêj di berya wan da (borîna) gotina: (Ewan jî di devê xwe da wekî gotina wan filan digerin.) Yezdan ewan bikuje! Ewan di kuda ewan viran dîkin?

31; Ewan (filan) Yezdan hiştine, zanayên xwe û sofîyên xwe û Mesîhê kur ê Meryemê ji xwe ra xistine Xuda. Ewan bi xweber jî hatibûne ferman kirinê; ku ewan hey ji bona yek Yezdanê bi tenê ra perestî bikin, ji pêştirê wî (qe tu yezdanê babet ê perestîyê) tune ye. Bi rastî ewa ji wan sa-lixê hevriçêkeran paqij e.

32; Ewan (filan) divên, ku ronahîya (fermanên Yezdan) bi devê xwe bitemirînin. Bi rastî file rikê xwe binin jî wê Yezdanê ewan filan ji vîna wan bide para da, wê hey ronahîya (fermanên xwe) pêk bîne.

33; Û hevriçêker çîqa rikê xwe binin jî, hey ewê ku pêxemberê xwe bi rêya rast û bi ola maf (haq) şandîye, ji bona ku ola xwe li ser hemûşk olan servahatî bike ewa hey (Yezdan) e.

34; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Bi rastî pir kesên ji zanan û sofîyên wan (filan) malê merivan bi pûçî dixun û ewan (zanan û sofîyan) merivan ji rêya Yezdan didine para da. Û ewanê ku zêr û zîvan çal dikin: di rêya Yezdan da nasixurînin hene! Îdî (Muhemmed!) tu mizgîna wan bi şapateke dilsoz bide.

35; Di roya ku ewan (malên çalkirî) di agirê dojê da têne sor kirinê, îdî bi wî (malî sorkirî) netik û kêlek û piştê wan tê deqandinê, ji wan ra (aha tê gotinê): "Ewa malê ku we ji bona xwe ra veşartibû eva ye, îdî hûn ewî (malê xwe yê) ku we veşartibûye (tam) bikin.

36; Di roya Yezdan ku ezman û zemîn afirandîye; bi rastê hijmara mehan danzdeh in. eva hijmara hanê di nivîsara Yezdan da heye. Ji wan mehan: çar mehê wî bi rûmet in (di wan da qirîn û sikatî û tekoşînî qedexe ne, ewan mehan: Zil qade, Zil hece, Muhherrem, Receb in) evan (hijmar û qedexan) ola wî ye rast e bi hêz e, îdî hûn (gelî bawergeran!) di wan mehan da bi xweber li xwe cewr nekin, ça file bi hemûtî bi we ra girînê dikin, hûn jî bi hemûtî bi wan ra qirînê bikin. Û hûn bizanin! ku bi rastî Yezdan bi xudaparizan ra ne.

37; Bi rasrî şûn guhurandîna wan mehan (meha bi nav Muhherrem para didan, di şûna wê da meha bi nav Sefer datînin, ji bona ku danê qirînê pir bikin, ya jî danê qirînê kêr bikin) pirkirîna di filetiyê da ne wundabûna ji rêya rast e. Ewanê file hene! Ewanan ewê meha qedexerok di salekî da ji wan mehên qedexerok di hijmirînin û di salekî da jî qe ji wan mehên qedexerok nahijmirînin. Ji bona ku ewan (filan) ewê hijmara ku Yezdan hijmartîye pêpes bikin (qe bi tu tiştî nehijmêrin). Îdî ewan bi vê hijmara xwe (ewan mehên qedexe ne) ku Yezdan hijmartîye; qedexetiya wan radikin, ji bona wan ra ewa kirîna wane sik hatiye xemilandinê (xweşa wan diçe). Şixwa Yezdan bi xweber jî komalê file nayne rêya rast.

38; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! Ji bona we ra çi bûye? Di gava ji bona we ra tê gotine: "Hûn hemûşk bi hev ra di rêya Yezdan da herin qirîne, hûn li bal zemîn da giran dibin dimînin. Qey hûn ji jîna para da pirtir bi jîna cihanê qayîl dibin? Bi rastî Xemla jîna cihanê di dan û gavê para da hey hindike.

39; Heke hûn (gelî bawergeran! Ça hatine ferman kirinê wusa) bi hev ra neçine qirînê, wê (Yezdanê) bi şapateke dilsoz we şapak bike û wê ewê) we bi komalekî mayî yê pêştirê we, biguhure, qe hûn nikarin tu ziyana wî jî bikin. Bi rastî Yezdan bi xweber jî li ser hemûşk tiştan bi hêz e.

40; Hek hûn (gelî bawergeran!) arîkarîya (wî pêxemberê min ê Muhemmed) nekin, îdî bi sond! (hûn bizanin) Yezdan arîkarîya wî kirîye. Kanê di gava ku ewanê file, ewa (pêxembera) yekê ji wan duduyan bi tenê bû, ji (welat) derxistibûn; di gava ku ewan herdukan di şikevtê da bûn (aha) digote hevalê xwe: "Qe murûzê xwe neke bi rastî Yezdan bi me ra ne." (A, di wê gavê da) Yezdan arîkarî kir, îdî Yezdan hewdana xwe li ser dilê wî da hinartîye û (Yezdan) ta ê wî bi leşkerekî ku hûn nabînin, kirîye û mijûlîya wanê ku fîletî dikiribûne berjêr kirîye. Û şixwa hey mijûlîya Yezdan bi tenê bilind e. Û Yezdan servahatê bijejke ye.

41; Hûn (gelî bawergeran bi dil xwazî) û bi sivikaî (û bi dil nxwazî) û bi giranî bi mal û canê xwe va di rêya Yezdan da bi hev ra (bi wan filan ra) tekoşîn bikin. Bi rastî heke hûn bizanin (eva tekoşîna bi vî awayî) ji bona we ra çêtir e.

42; Heke (eva gazîkirîna te Muhemmed! ji bona wan ra, li bal qirîna bi filan ra, ji bona qirînê ne bûya) lê ji bona karekê nêzîk bûye, ya jî ji bona rêya miraza bûya, bi rastî ewanê bibûna peyrewê te, lê bi rastî zehmet û westandinê ewan (bawergeran; ji gazîkirîna te li bal qirîna bi filan ra) dûr xistine. Ewan (bawergeran) di nêzîk da bi Yezdan sond dixun û (aha) dibêjin: "Heke me bikarya (ku em herne qirînê) emê bi we ra derketibûna (qirînê). Ewan bi wî awayî xwe teşqe le dikin. Şixwa Yezdan bi xweber jî dizane ku ewan bi rastî derewan dikin.

43; Yezdan ji te kulan behere! Ka heya ji bona te ra (Muhemmed) ewanê ku rastgone xûya bibûnan û ji bona, ku te bi wanê derew dikiribûne bizanîya, te ji bona çi destûra wan (ji bona qirînê) daye?

44; Ewanê ku bi Yezdan û bi dan û gavê para da bawer kirine hene! Ji ber ku ewan bi mal û bi canê xwe va di rêya Yezdan da tekoşînê dikin (ewan nayên ji bona para ketinê, ji te Muhemmed destûra para ketinê naxwezî). Û şixwa Yezdan bi xweber jî bi xudaparizan dizane.

45; Lê ewanê ku bi Yezdan û bi ro û danê para da bawer nakin û dilê wan (di baweriyê da) du dilî kirîye, hene! Hey ewan ji bona para ketina (ji qirînê) ji te

destûra xwe dixwazin. Îdî ewan bi xweber jî di du dilîya xwe ye (bawer kirinê da) du dil dibin.

46; Û heke (ewanî bawer ne dikirin) çûbûna qirînê bi van, wê ewanê ji bona (qirînê) tedarikeke xwe bikirinan. Lê Yezdan ji wan kirinê wan rikê xwe anî, îdî ewî ewanê (bê bawer di mala wan da) hişt, (ji wan ra aha hate) gotinê: "Hûn jî (di mala xwe da) bi wanê (bêzar va) rûnên."

47; Heke ewanê (bê bawer) di nava we da derketina (qirînê) ewan ji pêştirê tevdanîyê qe ji bona we ra tu tişteke, pir ne dikirin û ewanê di nava we da hey têkilkirin danînan (ji bona ku hûn para da birevin). Şixwa di nava we da jî, ewanê ku gohdarêya (vanê bê bawer) bikirinan hebûn. Û Yezdan bi wanê cewrkar dizane.

48; Bi sond! Ewan hêj di berê da tevdanî va bûne û ewan ji bona te ra pir bûyerên şoresîsaz kiribûne, heya rastî hatîye û fermanên Yezdan bi serfirazî servahatî ye, ewan bi xweber jî ji vê servahatina hanê rikê xwe anîbûne.

49; Û ji wan hinek jî hene (aha) dibêjin: "Ka (Muhemmed!) tu ji bona min ra destûr bide; (ji bona ku ez neçime qirînê) dawekû serê min nekebe xax û lorê giran." (Muhemmed!) tu hişyar be! Bi rastî ewan noqê derdan bûne û bi rastî dojê (cehenem) file hildane nava xwe da jî.

50; Û heke qencîyek bi te da were, hatina wê qencîyê ewan sik dike. Lê heke aşîtek bi te da were ewan (aha) dibêjin: "Bi sond! Me hêj di berê da tedarika xwe kiribû." Ewan bi şahitî piştî xwe dane, para çûne.

51; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Bi sond! Yezdan ji bona me ra çi nivîsiye hey ewa tê serê me. Serkarê me hey Yezdan e. Ûdî gelî bawergeran! Hûn hey xwe hispêrin Yezdan."

52; Tu (ji wan ra aha) bêje: "Qey hûn (geli durûyan!) ji pêştirê van her du qencîyan; (ya servahatin û pozbilindî, ya jî şehîd û ji gonehan baxişandinê) hêviya tişteki mayî ji bona me ra dikin? Û bi rastî em bi xweber jî ji bona we ra hey hêviya vî dikin; Yezdanê ya li bal xwe ji bona we ra şapatekî bide, ya jî wê we bi destê me şapat bike. Îdî hûn hêvidarî bikin, bi rastî em bi xweber jî bi we ra hêvidar in."

53; (Muhemmed!) tu ji wan ra aha bêje: "Hûn (geli durûyan!) bi xweşî ya jî bi rikê xwe (malê xwe) bisixurînin; hey ewa sixurandina ji we nayê litê kirinê. Bi rastî hûn komalekî ji rêderketî ne."

54; Û tiştî ewan dane para da ji bo ku sixurandina wan neyê litê kirine hey eva ye; bi rastî ewan bi Yezdan û bi Pêxemberê Wî bawer ne dikiribûne. Ewan heya diçûn ku nimêj bikin, hey bi sistayî dikirin, ewan gava sixurandin jî bikin hey bi ne xweşî û rikê xwe anîne (paşê) dane."

55; Îdî bira (piranîya) mal û zarên wan (Muhemmed!) te sodret neke. Bi rastî Yezdan divê ku ewan (durûyan) di jîna cîhanê da bi mal û zarê wan bide şapat kirine. Û (Yezdan divê) ku gava canê wan derkebe jî, ewan (di wê gavê da) file bin.

56; Ewan (durûyan) bi Yezdan sond dixun, ku ewan ji we ne, lê qe ji we nînin jî. Bi rastî ewan komalekî wusa nin ziravê wan ji tirsî diçire.

57; Heke ewa rastê daredekî, ya jî rastê şikevtan bihatinan, ya jî quleke ku têda bihewyan, bi dîtan, ewanên para da li bal wî da serê xwe hildana biçûnan.

58; Û hinek ji wan hene; ku ji bona (parkirina malê şorê) bê te (ji bona te ra Muhemmed!) ezmanê xwe dirêj dikin (aha dibêjin: "Eva parkirina hanê bi daditî nîne.") Îdî heke ji wan ra ji wî malî hatibe dayînê, ewan şixwa qayîl dibin, heke ji wan ra ji wî malî ne hatibe dayînê şixwa ewan heman dixeyîdin.

59; Heke ewan bi tiştî ku Yezdan û Pêxemberê Wî dabûne wan qayîl bibûnan (û aha jî) gotibûnan: "Bi rastî Yezdan ji bona me ra bes e û wê Yezdanê ji rûmeta xwe û pêxemberê xwe ji virha dîsa ji bona me ra bide, bi rastî me dilê xwe li bal Yezdan da giredaye." (Wê ji wan ra çêtir bibûya.)

60; Bi rastî malê (şorê û malê) bacê, hey ji bona xezanan û ji bona belengazan û ji bona wan şanene, ku li ser wî malî xebat dikin û ji bona wan merivên ku hatine misilman bûne; hêj dilê wan bi rastî bi misilmanîyê germ ne bûye (ya jî ewan fileyên zor be; ji bo ku herçiqandina wan li ser misilmanan bidine para da ka ewan jî misilman nabin) û ji bona azadiya benda û zebûnan û ji bona deyndarên (ku malê wanê heyî têra deynê wan nake) û ji bona wan kesên ku di rêya Yezdan da tekoşînê dikin û ji bona wan rêwîyên ku di rêyan da mane (tê dayînê). Eva parkirina hanê parkirineke wusa ne; ku Yezdan bi vê nevê kirîye. Yezdan zanayê bijejke ye.



61; Û ji wan (durûyan) ewanê ku cefayê didine pêxember hene! (Ji bona cefadana pêxember aha) dibêjin: "Ewa (pêxembera wusa dibêhê) bûye goh (ji hemû tiştan ra gohdarî dike. Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje:"Ewa goha gohekî wusa ne; ji bona we ra qencîyek e. Ewa bi Yezdan bawer dike, ça jî bi bawergeran jî bawer dike, ewa (gotha) ji bona wanê, ku ji we ne (bi rastî) bawer kirine dilovanîyek e (ji Yezdan e). Û ewanê ku cefayê didine pêxemberê Yezdan hene! Bi rastî ji bona wan ra şapateke dilsoz heye.

62; Jj bona ku ewan xwe bi we bidine qayîl kirinê, ewan ji we ra bi Yezdan sond dixun. Heke bi rastî ewan bawer kiribin; Yezdan Û Pêxemberê Wî babettir in, ku ewan bi xwe bidine qayîl kirinê.

63; Ma qey ewan nizanin? Kîjan di hemberê biryarên Yezdan Û Pêxemberê (Wî da, biryaran bihûne) îdî bi rastî ji bona wî ra agirê dojê bê paşî heye. Ewa ê bi xweber jî di wê dojê da hey bimîne. Riswaya mezin eva ye.

64; Ewanê durû hene! Ewan ditirsîn, ku li ser wan da ferkereke wusa bê hinartinê, di dilê wan da çi hebe ji wan ra bêje (bi vî awayî jî tinaz dikirin. Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Hûn (gelî durûyan) tinazan bikin! Bi rastî tiştê ku hûn jê ditirsîn, Yezdanê ewî derxe (rohnayî ye)."

65; Heke (Muhemmed! Tu) ji wan bipîrsî (ka hûn çi mijûl dibin?) Ewanê (aha bersiva te bidin): "Bi sond! (Qe em bi tu tiştî mijûl nabin) lê em di nava xwe da tinazan dikin û bi hev dileyîzin diçin. (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Qey hûn bi Yezdan û bi beratên wî û bi Pêxemberê Wî tinazan dikin?"

66; Hûn (gelî durûyan!) baxişandina xwe ji wan kirinê xwe nexwezin. Bi sond! Hûn ji piştî bawerîya xwe, bûne file. Heke em destekî ji we bibaxîşînin, emê desta mayî jî bi sedema, ku ewan gonehkar bûne şapat bikin.

67; Ewanê durû hene! Mêr û jinê wan jî ji hev in. Ewanan fermana bi kirina sikatîyan û bi xwe para dana ji qencîyan dikin. Ewan destê xwe (ji kirina qencîyan) digirin; Ewan Yezdan (bi vî awayî) jî bîrva kirine. Îdî ji ber vî qasî Yezdan jî ewan bîrva kirine. Bi rastî ewanê ji rêya rast derketine, ewan durû bi xweber in.

68; Yezdan ji bona durûyên mêr û durûyên jin û ji bona filan ra, agirê dojê peyman kirîye, ewa ne di dojê da hey bimînin. Ewa şapata hanê besê wan e û Yezdan ewan (ji dilovanîya xwe) deherandine. Û ji bona wan ra şapateke bê paşî heye.

69; (Gelî durûyan!) Hûn jî wekî wanê berya xweyên: hêj ewanê berya we da; hêza wan ji hêza we zortir bûye û mal û zarê wan ji mal û zarê we pirtir bûye. Îdî ewanê (berya we, di cîhanê da) bi para xwe benga (kayf) û xweşîya xwe kirine, we jî bi para xwe (di cîhanê da) beng û xweşîya xwe kirine, ça ewanê di berya we da jî bi para xwe (di cîhanê da) benga xwe kirine û ça ewan noqê pûçatîyan bibûn, hûn jî wekî wan noqê pûçatîyan bûne. Ewanê ku kirinê wan di cîhan û di dan û gavê para da şewîtîne hene! Evan in û ewanê ku zîyan kirine, evan bi xweber in.

70; Qey mijûlîya (ji temtêla) wan komalên, ku di berya wan da (borine) ji komalê Nûh û komalê A'd û Semûd û ji komalê Îbrahîm û rûniştîyên (bajar) ê Medyenê û ji komalê (Lût) ku (bajarên wan bi serê wan da dêriz bûye) ji bona wan ra ne hatibû? Pêxemberên wan li bal wan da bi beratên ber çavî va hatibûne. (Lê ewan bi wan pêxemberan bawer ne kiribûne, ji ber vîqasî rastê xeşma Yezdan hatine). Îdî Yezdan li wan cewr ne kirîye, lê ewan bi xweber li xwe cewr kirine.

71; Û ewanê bawer kirine hene! Mêr û jinê wan ji hev in: Hinekê wan serkarê hinekê wan in. Ewanan fermana (bi kirina) qencîyan û xwe parisandina ji sikatîyan dikin û ewan nimêja xwe dikin û baca (malê xwe) didin û ewan bi gotina Yezdan û Pêxemberê Wî dikin: Yezdanê di nêzik da li wan dilovanî bike. Bi rastî Yezdan servahatê bijejke ye.

72; Yezdan ji bona bawergeran; çi mêr û çi jin, peyman wê bihiştê ku di binê wê da çem dikişin û di bihiştê xurinanê (bi nav) Adinê da jî êwirên tîtal daye, ewanê di wura da hey bimînin. Û şixwa qayîlbûneke ji Yezdan ji bona wan ra ji vê (peyman hanê) hêj pirtir û mezintir heye. Serfirazîya mezin eva ye.

73; Pêxember! Tu bi filan û bi durûyan ra tekoşîn bike û tu li ser wan da giranî bike: Bi rastî ewra wan doj e. Ewa doja çiqa sikê ewran e!

74; Bi sond! Ji piştî ku ewan (durûyan) misilman bûne, paşê dîsa bûne file û peyvên filetî jî gotine. Paşê dîsa bi Yezdan sond dixun û dibêjin: "Qe me ewan peyvên ne gotine." Û ewan miraz kirin, ku ewê tiştê (kuştina pêxember) qe nikarin bikin ji bona wî ra xebat kirin. Xurî ji bona ku Yezdan û Pêxemberê Wî, ewanê (durûyan) ji

rûmeta xwe zengîn kirine, ewan radibin ji dexesiyan tûl hildidin (di hemberê qencîyên Yezdan ne ku li ser wan hen, ewan jî radibin sikatî dikin, qe eva kirina wan dibe karê merivan?). Heke ewan ji wê kirina xwe poşman bibin, wê poşmaniya wanê ji bona wan ra çêtir bibe. Û heke ewan rû bifetîlînin (di filetiya xwe da hinc bikin) Yezdanê ewan di cîhan û di dan û gavê para da jî bi şapateke dilsoz şapat bike û ji bona wan bi xweber jî di zemîn da tu serkar û arîkar tune ye.

75; Û ji wan (durûyan) ewanê (aha) peymanê didin hene: Heke Yezdan ji rûmeta xwe ji bona me ra (mal biqencî) bide, bi sond! Emê jî ji wî bacê bidin û emê bibine ji wanê arîtîkar.

76; Îdî gava (Yezdan) ji rûmeta xwe ji bona wan ra mal daye, ewan (durûyan) bi wî malî dexesî kirine (qe ji tu xezanekî ra bi wî malî qenci ne kirine) piştî xwe dane (pevmana dayî). Şixwa ewan bi xweber jî piştanokê maleke ne. (Dest ji wan peymanan malandine).

77; Îdî ji ber ku ewan, ewa peymana dabûne Yezdan pêk ne anîbûne û ji ber ku ewan derew dikiribûne, Yezdan jî (ji piştî peyman şikêandina wan) di dilê wan da heya roya ku ewanê rastê Yezdan bîn, dexesî danîye.

78; Qey ewan (durûyan) nizanin, ku bi rastî Yezdan bi dizîyên wan û bi wan piste pistê wan dizane? Û bi rastî Yezdan bi xweber jî pirzan e bi tiştên ne xûya ne.

79; Ewanê (durû ne) ku tinaza bi wanê bawergerên baca xwe bi dilê xwe hêj pirtir dane, dikin (ji wan ra aha gotine: "Ewan baca xwe hêj pirtir didin, ji bona qayîlbûna Yezdan nadin, lê ji bona ku navê wan bê gotinê: Ewî jî hewqas bac daye.") Û bi wanê ku bawer kirine baca xwe wekî hêza xwe dane, bi awakî dinê tinaz kirine (ji wan ra jî aha gotine: "Xuda ji van zengîntir e, bira Xuda ji bona xezanan ra mal bide, ka hûn gelî bawergerên xezan! Ji bo çî hûn ji bona xezan ne mayî ra malê xwe didin?") Îdî Yezdan ewan hildane tinazan û ji bona wan ra şapateke dilsoz heye.

80; (Muhammed! Tu hez dikî) ji bona wan (durûyên bi van salixên borî ji min) baxişandina gonehên wan lava bikî, ya jî qe ji bona baxişandina gonehên wan lava nekî (hey wekî hev e). Heke tu ji bona baxişandina wan hevtê carî jî lava bikî, dîsa bi rastî Yezdan qe ewan nabaxişîne. Ji ber ku ewan bi Yezdan û bi Pêxemberê Wî filetî di kiribûne eva (ne baxişandina wan çê nabe). Şixwa Yezdan bi xweber jî ewî komalê ku ji rêya rast derketîbûne, nayne riêya rast.

81; Ewanê bê gotina pêxemberê Yezdan kirine hene! ewan bi rûniştina xweyê (di mala xwe da mane, neçûne qirînê) şabûne, ewan rikê xwe anîne, ku bi mal û bi canê xwe va di rêya Yezdan da tekoşînê bikin û ji hev ra (aha) gotine: "Hûn di germê da neçîne qirînê." (Muhammed! Tu ji wan ra aha) bêje : "Bi rastî agirê dojê germtir e."

Xwezîya ewan pisporî bikirinan.

82; Îdî ji bona ewê keda ku ewan dikiribûne, bira ji virha ewan hindik bikenin û pir bigirîn. Eva celata wan e.

83; Îdî heke Yezdan (Muhammed! Tu ji qirîna Tebûkê) para da zivirandî, li bal destekî ji wanê (ku bi te ra ne hatibûne qirînê) û ewa desta jî (ji bona ku bi we ra derkebine qirînê) ji te destûr xwestin, tu ji wan ra (aha) bêje: "Qe di tucarî da hûn bi min ra dernakebine qirînê û hûn bi min re qe bi tu neyarî ra qirînê nakin." Bi rastî hûn şixwa di cara yekem da bi rûniştinê qayîl bibûn, îdî hûn jî bi wanê para da mane, bi wanê dijê me ra rûnên.

84; Û (Muhammed!) tu li ser tu kesekî ji wan, gava bimire nimêj neke û tu (di gava çalkirinê da), neçe ser gora wî jî. Bi rastî ewan filetiya Yezdan û Pêxemberê Wî kirine û ewan ji rêya rast bi derketî mirin e.

85; Û (Muhammed! bira piraniya) mal û zarên wan te sodret neke. Hey Yezdan divê ku ewan di cîhanê da bi wan (mel û zaran) bide şapatkirinê û (gava) canê wan derkebe jî, ewan şixwa file bin.

86; (Evan hene!) Di gava, ku ferkerek hatibe hinartinê, di wê ferkerê da jî eva fermana hebe: "Hûn bi Yezdan bawer bikin û hûn bi Pêxemberê Wî ra herin tekoşîn bikin." Ji wan ewanê zengîn hene! (Ewan aha ji te ra) dibêjin: "Ka tu destûra me bide û dest ji me berde, ku em jî bi wanê ne çûne qirînê (di mala xwe da mane) rûnên.

87; Ewan qayîl bûne, ku ewan (di mala xwe da bi jin û zaran va) bimînin. (Ya jî ewan qayîl bûne, ku ewan bi wanê dijê we ra bimînin) û li ser dilê wan bi xweber jî durufa (durûtîyê) hatiye danînê. Îdî şixwa ewan ji hev dernaxin.

88; Lê pêxember bi tevê ewanê ku bi pêxembera bawer kirine hene! Ewanan bi mal û bi

canê xwe va (di rêya Yezdan da bi wan neyeran ra) tekoşîn kirine. Îdî ji bona van ra qencî hene. Û evan bi xweber in, ku fereste bûne.

89; Yezdan ji bona van ra ewan bihiştên ku di binê wan da çem dikişîn amade kirîye, ewanan (di wan bihiştan da) di hemû gavan da dimînin. Serfirazîya mezin, a, eva ye. 90; Û ji koçerên ereban (ewa desta ku ne çûbûne qirîna Tebûkê) ji bona ku ji wan ra destûr bê danê (ewan jî di mala xwe da wekî wanê para da mane, rûnên) hinek sedem ji bona xwe ra (hûnandine) hatine (ji bo ku tu ewan bibaxişînî). Lê ewanê ku Yezdan û Pêxemberê Wî dabûne derewdêrandinê hene! Ewan rûniştibûne, qe (ji bona baxişandina xwe) ne hatibûne, ewanê file ne ji wan hene! Wê di nêzik da şapateke dilsoz bi wan da were.

91; Li ser bêwec û nexweşan û li ser xezanên rastî tu malî nayên ku ji (bona qirîna bi wanê file ra di rêya Yezdan da bisixurînin), heke ewan ji bona Yezdan û Pêxemberê Wî şîreta (qencîyan) bikin tu goneh tune ye (ku ewan neçine qirînê). Şixwa li ser qenckaran qe tu rênedana wan tune ye. Û Yezdan bi xweber jî baxişkarê dilovîn e.

92; Ewanê di gava (tu derketî herî qirînê) hatibûne bal te, ji bo ku tu ewan sîyar bi kî (beherî qirînê) te jî ji wan ra (aha) gotibûye: "Qe li bal min tu tiştêkî ku hûn li wan sîyar bin werne qirînê tune ye." Ji ber ku di destê wan da tu malê ewan (di rêya Yezdan) bisixurînin tune ye, ewan para zivirîne; çavê wan ji kovanan histêr dibarandin hene! Qe tu sikatî li ser wan jî tune ye.

93; Lê sikatî bi rastî li ser wan zengînên ku ji te destûr dixwestin (ku neçine qirînê) heye. Ewanan qayîl bûn (ku di mala xwe da bi wanê para da mane, rûnên) ji ber ku Yezdan li ser dilê wan duruf kirîye; îdî ewan (bi temtêla) xwe qe nizanin.

94; Di gava ku hûn (ji qirînê) para da li bal wan da zivirî bûne, ewan (durûyan hatibûne) ji we baxişandina xwe bi hinek (sedema xwestine). (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Hûn qe baxişandina xwe ji me nexazin, bi rastî em ji we bawer nakin; loma Yezdan hemû temtêla bûyera we ji bona me ra gotîye. Û wê Yezdan û Pêxemberê Wî kirinê we bibînin, paşê wî ewê ku bi der û hûnduran dizane, hûnê herne bal îdî ka we çî kirîye, wê hemûşkî ji bona we ra bêje."

95; Di gava ku hûn (ji qirînê) li bal wan bizivirin, ji bona ku hûn rûyê xwe ji wan nezivirinin, ewanê bi Yezdan ji bona we ra sond bixun; ku ewan ji bona hinek sedema bi we ra ne hatine (qirînê)." Îdî hûn rûyê xwe ji wan bifetilînin. Bi rastî ewan sîkin û bi sedema wan kedên ku ewan kirine, êwra wan doj e.

96; Ewanan ji bona we ra sond dixun; ji bona ku hûn bi wan qayîl bibin. Heke hûn bi rastî bi wan qayîl bibin jî, îdî Yezdan dîsa bi wan komalê ku ji rêya rast derketine qayîl nabe.

97; Ewan erebên koçer hene! Ewanan (ji hemûşkan) pirtir file û durû ne, şixwa ewanan ji bona ku ji wan biryarên Yezdan, ku li ser pêxemberê xwe da hinartîye nizanbin, babettir in. Bi rastî Yezdan zaneyê bijejke ye.

98; Û ji koçeran hinek hene, ku bawer dikin; ewan malên di rêya Yezdan da hatine sîxurandinê ji bona wan ra zîyan e, ewanan hêvî dikin (ku ji bona we ra royên şoreşî werin; di wan royan da ewanê tûla xwe ji we hildin). Ewan royên şoreşî ku ewan hêvî dikin, li ser wan bi xweber e. Şixwa Yezdan bi xweber jî bihisteke pirzan e.

99; Û ji erebên koçer hinek jî hene, ku bi Yezdan û bi ro û danê para da bawer dikin û ewan koçeran (dizanin) ku ewa malê te xebitandine (ji bona tekoşîna) rêya Yezdan, sedeme ji bona nêikaya wan li bal Yezdan da û ji bona dilxwezîyên Pêxemberê wî, ji wan- ra ne. Bi rastî tu hişyar be! Eva kirina wan sedemeke ji bona nêzikaya wan li bal Yezdan dane. Yezdanê ewanan di nêzik da bixe nava dilovanîya xwe. Bi rastî Yezdan baxişkarê dilovîn e.

100; Û (Yezdan) ji wan koçer û arîkarên (misilmanê) ku di cara yekem da (misilman bûne) û ewanê ku bi qencî bûne peyrewê van, qayîl bûye û ewan jî (bi wan tiştên ku Yezdan daye wan) qayîl bûne û ewî ji bona wan ra ewan bihiştên ku dibinê (darê wan da) çem dikişîn amade kirîye, ewanan di bihiştê da hey dimînin. Serfirazîya mezin eva ye.

101; Û hinek ji wan koçerên li dora we da durû hene û hinek jî ji wan binecî ne (bajarê) Medîne hene, li ser durûya xwe lec dikin. Hûn bi wan nizanin, xurî em bi xweber bi wan dizanin. Emê ewan du caran şapat bikin, paşê ewanê li bal şapateke mezin da bêne zivirandinê.

102; Û Destek jî (ji wan kesên ku bi te ra nehatibûne qirînê) hene! ewan (hatine) ji gonehkarîya xwe ra erê gotine; Ewanan karên xweyên aştî û sikatî tevê hev kirine. Dibe ku Yezdan poşmanîya wan litê bike (ewan bibaxişîne). Bi rastî Yezdan baxişkerê dilovîn e.

103; (Muhemmed!) ji bo ku tu ewan (bi hildana) wî malî paqij û ewan pîroz û pir bikî, tu ji malê (vanê rastbêj) hinekî bac hilde. (Muhammed!) Tu ji bona wan ra (ji Yezdan) dilxweziyên rind bixwaze. Bi rastî dilxweziyên te ji bona wan ra hewdana dil e. Şixwa Yezdan bi xweber jî bihistekê pirzan e.

104; Ma qey ewan nizanin ku hey Yezdan bi xweber e ji bendeyên xwe poşmanîya wan ji gonehan litê dike û bacan (ji maldaran) digire? Û bi rastî poşmanîya ji gonehan hey Yezdan bi xweber e litê dike û dilovîn e.

105; Û (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Hûn (çi dikarin bikin) hûn ewî bikin, îdî wê Yezdan û Pêxemberê Wî û bawerkar, ewî karê we bibînin. Hûnê hemûşk jî bi rastî li bal wî (Yezdanê) ku bi der û hûnduran dizane bêne zivirandinê, îdî ewa ê di wê gavê da ewî karê ku we kirîye ji bona we ra bêje."

106; Û destek jî ji wanê (ku çûne qirînê) temtêla wan li bal fermana Yezdan da hatiye hispartinê; (Yezdanê) ya ewan şapat bike, ya jî we ewan bibaxişîne. Şixwa Yezdan bi xweber jî zanayê bijejke ye.

107; Û ewanê (ji qirînê para da mane) hene! Ewan ji bona zirarê bidin û (mafê nîyas nekin) û ji bona ku di nava bawergeran da dutîretî çê bikin û ji bona, ku ewanê di cara yekem da bi Yezdan û bi Pêxemberê Wî ra ceng kirine (ka wû kînge werin) bixne şûna çavneranan, ewan ji xwe ra mizgevtêk ava kirine. Ewanê sond bixun: "Ku (armanca me ji avakirina wê mizgevtê) ji pêştirê qenciyê qe tu tişt nîne." Û bi rastî Yezdan bi xweber jî nêhrîwanî dide, ku ewan bi rastî derewan dîkin.

108; (Muhemmed!) Tu qe di tu gavê da di wê (mizgevtê da nimêj) neke. (Nimêj kirina te) di wê mizgevtê ku di cara yekem da li ser xudaparizîyê hatiye avakirinê, babettir e. Di wê (mizgevtê da) hinek mêr hene hez dîkin, ku (ji gonehan) paqij bibin. Şixwa Yezdan bi xweber jî (ji wanê ku divên ji gonehan) paqij bibin, hez dike.

109; Îdî qey ewê ku xîmê (avayî yê xwe) li ser xudaparizî û qayîlbûna wî ava kirîye qenc e, ya jî ewê ku (xîmê avayî yê xwe) li ser lêvê kendalekî herikî danîye, ku ewa bi xweber jî (bi wî avayîyê xwe va) biherike here (bikebe) agirê dojê, qenc e? Bi rastî Yezdan bi xweber jî ewî komalê cewrkar nayne rêya rast.

110; Ewa avayîyê wanê ku ewan ava kirîye heye! Heya ku dilê wan (bi mirinê) ker be, wê di dilê wan da hey dudilî bihêle. Bi rastî Yezdan zanayê bijejke ye.

111; Bi rastî Yezdan ji wanê bawer kirine, can û malê wan kirîye. Ewanan di rêya , Yezdan da qirînê dîkin, îdî ewanan (filan) dikujin û têne kujtinê jî; Yezdan ji bona wan ra bi mafê di (pirtûkên bi nav) Tewret û fincîl û Qur'anê da peyman daye, ku ji bona wan ra bihişt heye. Û gelo ji Yezdan çêtir kî heye, ku peymana xwe pêk tîne? (Gelî bawergeran!) îdî hûn bi wê kirîna xwe ye ku hûn bi wê hatine firotinê şa bibin. Şixwa serfirazîya mezin jî eva bi xweber e.

112; Û (Muhemmed!) ewanê ku ji (gonehan) poşman bûne, perestîya (Yezdan û) sipazkariya wî dîkin di rêya wî da digerin (ji bona wî ra xwe) kuz dîkin û kunde dibin, ewanan fermana bi qencîyan û xwe parisandina ji sikatîyan dîkin û ewanê parisîya biryarên Yezdan dîkin û bawer kirine (hene!) mizgînîya (wanê bi van salixan têne naskirinê, bi bihiştê) bide.

113; Ji piştî ku ji bona pêxember û bawergeran ra diyar bû, ku ewan kesên (pêxember û bawerger ji wan hez dîkin); bi rastî (ewan) hevriyên dojê ne, îdî maf tune ye, ku pêxember û bawerger ji bona wan ra ji Yezdan baxişandina gonehên wan bixwazin. Evan hevriçêkeran çîqa pismamên (pêxember û bawergeran) nêzîk bin jî.

114; Xwaztina Îbrahîm, ji bona baxişandina gonehên bavê xwe ji Yezdan, hey ji bona ku Îbrahîm (hêj di berê da) ji bona bavê xwe ra peyman dabû (ku ezê ji bona baxşandina gonehên te ji Yezdan lava bikim) loma kirîye. Îdî gava ji bona Îbrahîm ra xûya bû (ku bavê wî) ji bona Yezdan ra neyar e, Îbrahîm dest ji baxişxwastinê berda. Bi rastî Îbrahîm pir dilsozê mulahîm e.

115; Yezdan ji piştî komalek anî rêya rast, hey ji wî (komalî ra) xûya nebe, ka wê xwe ji çi biparisînin (qencî û xirabîyan ji hev dernexin) ewî komalê jî rêya rast dernexe. Bi rastî Yezdan bi hemû tiştan dizane.

116; Bi rastî seroktî û maldarya ezman û zemîn hey ji bona Yezdan ra ne. Jînandin û

mirandin hey ewa dike. Û ji bona we bi xweber jî ji pêştirê Yezdan qe tu serkar û arîkar tune ye.

117; Bi sond! Yezdan, pêxember û hevalên wî ne ji koçer û arîkaran ku di danê tenk da bûne peyrewê wî baxişandîye, ji piştî ku di nava van da jî destekî (wusa hebûn) nêzîk bu, ku dilê wan (li bal rêya wanê kevin da) welgere paşê dîsa Yezdan poşmaniya wan litê kirîye. Bi rastî ewa li ser wan (pêxember û peyrewê wî) pir henûn û dilovîn e.

118; Û Yezdan ewan her sê (merivên ku ji qirîna Tebûkê) para da mabûn (baxişandine); loma ewan (wusa lava dikiribûne, ji ne çûna xwe wusa poşman bibûn) zemîn bi firetîya xwe va li wan teng dihat û bêhna wan wusa teng bibû (te digot qey canê wan derdikebe) û ewan bi gomanî dizaniyan ku ji pêştirê Yezdan, ji bona wan ra tu darende tune ye. Ji bo ku ewan (ji kirîna xwe) poşman bibûn, paşe Yezdan jî ewan baxişandin. Bi rastî Yezdan pir baxişgerê dilovîn e.

119; Gelî bawergeran! Hûn yezdanparizî bikin û hûn bi rast (û rastbêjan ra) rabin (rûnên).

120; Ji bona binecîne (bajarê) Medîne û ji bona wan koçerên Erebanê li dora (bajarê) Medîne da nin, ku ji Pêxemberê Yezdan para da bimîn (û bi gotina wî nekin) û canê xwe ji canê pêxember pirtir hez bikin qe babet nîne. Çima, çiqa ewanan di rêya Yezdan da tî bibin û biwestin û birçî bibin û ewan çiqa ji bona ku filan bibeicînin, pê li kîjan zemînî bikin û ewan çiqa servehatinekî di hemberê neyaran da pêk bînin, hey ji bona wan ra bi sedema wan kirinê wan, karekî aştî tê nivîsandinê. Bi rastî Yezdan kirya qencîkaran wunda nake.

121; Ewan çiqa (di rêya Yezdan da) rozîyeke piçûk û ya jî mezin bidin û ewan çiqa ji newalekî li bal newalekî mayî da (ji bona tekoşîna qayîlbûna Yezdan) biborin, hey ji bona wan ra qencî têne nivîsandinê. Ji bona ku Yezdan ji wan kirinê wan çêtir xelata wan bide (ewan qencîyan ji wan ra dinivîse).

122; O babet nîne ku hemûşk bawerger bi hev ra herne qirînê; heke ji her destekî hinek ji wan di nava pismamên xwe da bimîn: ji bona ku ewanê mayî, olê (ji bona jin û zaran ra) hîn bikin û ji bona ku ewan, ewan (pismamên wanê ku çûne qirînê) gava para da hatin; ewan (bi aşîta Yezdan) bidine tirsandinê, gelo çêtir nîne? (Ya jî; heke ji her destekî hinek li bal pêxember bimîn, gava ewanê çûne qirînê para da hatin, ewa niqandina ji pêxember ra hatiye hinê wan bikin gelo çêtir nîne?) Bi vî avayî dibe ku ewan xwe ji karên ne rastî biparisînin.

123; Gelî bawergeran! Hûn bi wan fileyên, ku nêzîkê we ne, qirînê bikin, ji bona ku ewan filan we di hemberê xwe da bi hêz bibînin. Û hûn bizanin bi rastî Yezdan digel xudaparisan e.

124; Û di gava ku ferkerek hatibe hinartinê; hinek ji wan durûyan (ji hev ra aha dibêjin): "Ka evê ferkera hanê, bawerya kîjanî ji we pir kirîye?" (Tu ji wan ra aha) bêje: "Ewanê ku bi rastî bawer kirine hene! Çiqa ferkerek hatibe hinartinê, îdî ewê bawerîya wan pir kirîye; ewan ji hev ra mizgîna hatina ferkerê didin."

125; Lê ewanê ku di dilê wan da nexweşîya (filetî û durûtîyê heye, hene!) hinartina ferkeran ewan bi sikatî li ser sikatîya wan pir kirîye, ewan bi xweber jî bi filetî mirin."

126; Ma qey ewan (durû û filan) ku di salê da carekî ya du caran têne şapat kirinê nabînin? Dîsa ewan ji kirîna xwe poşman nabin û ji wan (şapatan jî) hiş hilnadin.

127; Û di gava ku ferkerek hatibe hinartinê, hinekên wan (file û durûyan) li bal hinekên wan da mêze kirine (aha ji hev pirsîne:) "Gelo kesekî hûn dîtin?" (Çav ji hev ra diniqînin) paşê para da dizivirin diçin. Bi sedema ku ewan komalekî wusa nin; rastî û ne rastîyê ji hev dernaxin, Yezdan dilê wan ji bawerîyê fetilandiye.

128; Bi sond! Li bal we da pêxemberekî wusa ji we hatiye, cefa û tengasiya we ewî diêşîne, ji bona we ra bi hezkirinî pir halokeye û ji bona bawergeran ra henûnekî dilovîn e.

129; Îdî heke (Muhemmed!) ewan ji te û (ji bawerya bi te) rû fetilandin, tu ji bona wan ra aha) bêje: "Ew Yezdanê ku ji pêştirê wî (tu yezdanê babet û perestîyê) tune ye, besê min e. Bi rastî min xwe hispartîye wî, ewa bi xweber jî xweyê arşê (mana) mezin e.

## Chapter 10 (Sura 10)

1; E. L. R. (Arşa wan tîpên ji hev çûyî hey Yezdan dizane). Ewanan beratên pirtûka

bijejke ye.

2; Qey ji bo ku me li bal mêrekî ji kesan da niqandîye (me ji wî ra aha gotibû:)  
"Tu kesan (bi şapatan) bide tirsandinê û mizgînê bide wanê bawer kirine, ku ji bona  
wan ra li bal Xudayê wan cîyên dostî û paye hene," ji bona merifan ra eva bûye  
sodret? Ji xwe ewanê file (aha) gotine: "Eva (mêrika) hey ançkarek; xûya ye."

3; (Gelî kesan!) Bi rastî ev, Yezdanê ku ezman û zemîn di şeş rojên êwîrgahî da  
afirandîye û paşê arş jî (mana) hildaye binê hêza xwe da heye: Ewa Xudayê we ye.  
Ewa (Xuda naye) tedarika hemû bûyeran dike. Ji pêştirê destûra wî tu mehdervan tune  
ye (hemû meher ji bona wî ra ne.) Ewa Yezdanê bi van salixan (tê salixkirinê)  
Xudayê we ye. Îdî hûn (ji bona wî ra) perestî bikin. Qey hûn (ji van salixan) hiş  
hilnadin?

4; Zivirandina we hemûşkan hey li bal wî (Yezdan)î da ne. (Eva) bi rastî peymana  
Yezdan e, maf e. Bi rastî (Yezdan bi xweber e) ku di cara yekem da dest bi  
afirandinê dike. Ji bona ku ewanê bawer kirine û karê aştî kirine bi dadvanî xelat  
bike (ewan ji piştî mirinê) dîsa diafirîne. Ewanê bûne file hene! Ji bona wan ra bi  
sedema filetiya wan vexarineke ji ava herîkelkê heye û ji bona wan ra şapateke  
dilsoz heye.

5; Ewê ku roj xistîye tav û hîv jî xistîye rohnayî û (ji bona hîvê ra) êwirgehên  
(pîvayî) gerandîye, ji bona ku hûn bi hijmara salan û bi hijmara (gavê xwe)  
bizanin, ewa Yezdan e. (Yezdan evan hey) bi dadvanî afirandine (ji bo ku hûn ji wan  
hiş bildin. Yezdan beratan ji bona komalê zana vedike.

6; Bi rastî ji bona wî komalê ku xudaparisî dikin; di ne wekhevbûna şev û royan da  
û di afirandina Yezdan, tiştên di ezman û zemîn da heyî beratên (hişdarî) hene.

7; Bi rastî ewanê ku naxwazin bi bervahatin bigêhijne me, hene! Ewanan bi jîna  
cîhanê qayîl bûne û bi wê jînê jî qinyat anîne. Û ewan bi xweber jî ji beratên  
(hebûna me) bê goman in.

8; Ji ber ewê keda ku ewan dikiribûne, şûna ewra wan agir e.

9; Bi rastî ewanê ku bawer kirine û karê aştî kirine hene! Bi sedema bawerîya wan  
wê Xudayê wan, ewan li bal wê bihiştê xwarinan e, ku di binê (darê) wan da çem  
dikişin (behere).

10; Dilxwezîya wan (di bihiştê da ahane): "Xuda! Em te ji kemayan dadiweşînin." (Ji  
hev ra di bihiştê da gava serhevdanê da aha) dibêjin: "Selam hûn bijîn" û paşîya  
dilxwazîya wan eva ye; bi rastî çîqa pesindayîn hene! Hemûşk ji bona Xudayê cîhanê  
ra ne.

11; Heke Yezdan ji bona kesan ra, ça meriv ji bona qencîyan lez dikin, wusa leza  
sikatiya wan bikira, wê a, di naha da canê wan hatibûya standinê. Lê emê ewanê ku  
goman nakin (bi berva hatin) wê bigihêjne me. Di raşihetina wan da bi korayî  
bihêlin.

12; Û di gava bi merivan nexweşîyek girtibe (îdî ewa meriva) dirêjkirî û rûniştî û  
li pîya, me gazî hewara xwe dike. Di gava ku em ji wî (merivî) ewê nexweşîya wî  
radikin, wusa diçe (ji bîrva dike) tu divê qe ewî (merivî) ji bona rakirina wê  
nexweşîya bi wî girtibû, lava ji me ne dikiribû. Bi vî awayî ji bona wanê dest  
vala, karên ewan di kiribûne hatiye xemilandinê.

13; Û bi sond! Di berya we da çîqa komel hebûne, geva pêxemberên wan li bal wan da  
bi beratên vekirî va hatibûne bal van ji bo ku ewan bi wî pêxemberî bawer bikin,  
ewî (komalê bawer ne kiribûne) li xwe cewr kiribûne, me jî ewan teşqeke kirine. Bi  
vî awayî em komalê nûsitemkar celat dikin.

14; Paşê ji bo ku em mêze bikin ka hûn çi dikin, me hûn li pey wan da xistine  
şûnmaiyên wan di zemîn da hiştin.

15; Û di gava ku (ji bona wan ra ewan pêxemberan) beratên me bi vekirî dixunin,  
ewanê ku gomana (bi ber va hatina) gihîjtina me nakin (aha) gotine: "Ka, tu  
Qur'aneke ji pêştirê vê (Qur'anê) bine, ya jî tu ewê (Qur'anê) biguhure." Tu (ji  
wan ra aha) beje: "Ez nikarim ewê (Qur'anê) ji ber xwe, bi xweber biguhurim. Loma  
ez hey dibime peyrewê wan biryarên, ku li bal min da hatine hîmartinê. Bi rastî  
heke ez bê gotina Xudayê xwe bikim ez ji şapata ro ya mezin ditirsim."

16; Tu ji (wan ra aha jî) bêje: "Heke Yezdan biva (şixwa) min ewa (Qur'ana) ji bona  
we ra ne dixwend û min hûn (bi xwendina wê Qur'anê jî) bi xwe ra ne dixistine  
tekoşînê. (Hûn dizanin ku ez di nava) we da hêj di berê da çend salan mabûm (qe  
tiştêkî aha min gotibû?) îdî qe hûn naponijin?"

17; Îdî gelo ji wî kesê ku bi viran, derewan (li ser navê) Yezdan bike, ya jî beratên Yezdan bide derewdêrandinê cewrkartir kî heye? Bi rastî nûsîtemkar fereste nabin.

18; Ewanan ji pêştirê Yezdan, perestîya wan tiştên ku qe ji bona wan ra tu kar û zîyanê nakin, dikin û (aha jî) dibêjin: "Evan perestvanan li bal Yezdan mehderên me ne." (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Qey hûn ji wan tiştên, ku Yezdan di ezman û zemîn da pê nizane, agahdarya Yezdan bi wan dikin?" Bi rastî (Yezdan) ji wan tiştên, ku ewan ji wî ra dixne hevîrî bê gur û goman e.

19; Meriv (hemûşk di cara yekem da) desteke bi tenê bûne, îdî paşê ji ber wan ne wekhevîbûnê di nava xwe da ji hev çûne. Heke peyman (ji bona wî danê para da) ji Xudayê te ne borîbûya, wê a di naha da berewaniya wan, di wan tiştên ku ewan têda ne wekhev dibûne, pêk bihata.

20; Û ewan (aha) dibêjin: "Heke (ji pêştirê vê Qur'anê) li ser wî (Muhemmed) beratek ji Xudayê wî bihata hinartinê wê çi bûya? (Meyê jî bi wî bawer kiribûya)" îdî (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Zanîna bi ne xûyanan hey ji bona Yezdan ra ne, îdî hûn bi hevîrî mêze bikin. Bi rastî ez bi xweber jî bi we ra hevîdar im (ka em bihewin wê ça be).

21; Û ji piştî wê gava ku bi kesan tengasiyek girtibe, em bi wan kesên dilovanî û xweşiyê bidine tam kirinê (ewan ji wê tengasiyê derkebin) ewan heman di beratên me da defikan datînin; ziman dirêj dikin. (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî Yezdan hêj zûtir endezan dike (ewan defikê wan dibîne.)" Bi rastî ewan çi endeze bikin, saiyên me (firiştan) ewan endezeyên wan dinivîsin.

22; Ewê ku we di reşayî û di deryayê da dide gerandinê heye! Ewa Yezdan e. (Ewa wusa we dide gerandinê) heya gava ku hûn di kelekê da bûne, hûn bi wan (rêwîyên di kelekê da) bi bakî tîtal va (li ser deryayê) diçûn û ewan (rêwîyan) bi wê şa bibûne, di vê (gavê da) bobelîzkek (li wan û li keleka wan rabûye) û pêlên deryayê li hemû ciyî da li wan hatiye, ewan goman kiribûne (ku ewanê di gava pêlan da bimînin, wê bifetisin) îdî ewan bi dilekî xwurî (aha) gazî Yezdan kiribûne: "Hey ola xwuriye rast ji bona te ra ne. (Yezdan!) heke tu me ji vê teşgelê fereste bikî, bi sond! Îdî emê bibine ji wanê sipazkarên (te)."

23; Îdî gava ku me ewan (ji wê teşgelê) fereste kirin, ewan (dîsa) bê mafî di zemîn da cewr dikiribûne. Gelî merivan! Bi rastî cewra we hey ji bona we ra ne. (Eva jîna hanê) jîna cîhanê ye (qe tu bahayê wê tune ye) û hûnê paşê li bal me da bizivirin, îdî emê jî ewa tiştê ku we (di cîhanê da) dikiribûne ji bona we ra bêjin.

24; Bi rastî jîna cîhanê jî hecwekî avek e, ku me ewa ji ezmana hinartiye, îdî bi wê avê, ewa hêşênayîyên zemînê ku meriv û tariş ji wan dixun, bi tevê hev hêşîn dibin (wusa hêşînayê çê dibe) zemîn bi wan hêşnayîyan xemla xwe digire û zemîn tê xemilandinê (di wê gavê da îdî) kesên zemîn goman kirine, ku dikarin (xurinên xwe ji wan hêşinayan) hildin. (Di wê gavê da) fermana me di şev û royan da (bi teşqeledana) wan hêşinayan hatiye, îdî me ewan hêşinayan bi rehê wan va durût, te digo qey zemîn (hêj berya naha da bi wan hêşinayan nehatibû) xemilandinê (qe tu tişt li ser zemîn nemaye). Em beratan ji bona komalê ramankar ra vedikin.

25; Yezdan gazî bal xaniyî (û jîna ewletiyê) dike. Û evîne xwe tîne rêya rast.

26; Ji bona wanê qencîyan dikin, qencîyên hêj çêtir û pirtir hene. Û bi rûyê wan, rûreşî û riswabûn nagire. Evanê bi van salixan tene salixandinê hevriyên bihiştê ne. Ewanan di bihiştê da jî hey dimînin.

27; Û ewanê ku keda sikatiyan kirine hene; celata sikatiyan, wekî wan (sikatiyên) û rûreşî û riswabûn li rûyê wan digire. Ji bona wan ra, ku ewan ji (şapata) Yezdan bide parisandinê tu parisvan tune ye. (Gava tu li wan mêze dikî tu dibê) qey rûyê wan kerekî ji şeva reş e. Ewanê bi van salixan tene salixdanê hevriyên agir in, Ewanan di agir da jî hey dimînin.

28; Di roya ku em ewan hemûşkan (bi hev ra) dicivînin paşê em ji bona wanê hevîrî çê kirine (aha) dibêjin: "Gelî hevriçêkeran! Hûn bi wan (pûtên) hevriyên xwe va (herne) şûna xwe ye (ku babet e ji bona we ra)." Îdî me di nava wan û hevriyên wan da (bi hemûtî bendê hevaltîyê) pizirandibû (ça di cîhanê da di nava wan da bend hebû, îdî ne maye) û hevriyên wan ji bona wan ra (aha) gotine: "(Gelî hevriyên me!) we ji bona me ra perestî ne fikir (lê hûn li pey gomanên xwe diçûn)."

29; Îdî a di naha da, Yezdan di nava me û we da bi şahidî besê me ye. Bi sond! Ji wê perestîya we ye, ku we ji bona me ra dikiribûne, qe tu gomana me tune ye.

30; (Di wê royê da) hemû candar kirinê xwe diceribînin (kar û zîyana wan kirinê xwe dibînin) û ewanan li bal serkarê xweyê maf; ku Yezdanê têne zivirandinê, îdî ewan (peresteyên wanên, ku ewan ji bona wan ra) bi vir (perestî dikiribûne) ji wan wunda bûne.

31; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: " (Gelo hûn qe diponijin!) ka ji ezman û ji zemîn ji bona we ra rojîyan (rizq) kî dide? (gelo) bihistinê û dîtinê kî (dikare) bixe binê hêza xwe? Û (gelo) zindîyan ji hirîyan û mirîyan ji zindîyan, kî ye derdixe? Û (gelo ewê) ku tedarika hemûşk bûyeran dike, kî ye? Îdî ewanê (di bersiva te da aha) bêjin: "Ewê van bûyeran hemûşk dike) ewa Yezdan e." Îdî (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Hûn qey îdî (xwe ji şapata Yezdan) naparisînin?"

32; Ewê bi wan salixan tê salixdanê, ewa Xudayê me yê rast e. Îdî şixwa ji piştî rastîyê, ji pêştirê (rê) wundabûnê qe tu tişt tune ye. Îdî (gelo) hûn ça ji rastîyê têne zivirandinê?

33; Bi vî awayî li ser wanê ku (bi hîncarî) ji rêya rast derketine, peyva Xudayê te (bi peymanî) pêk hatiye, ku ewan bi rastî bawer nakin.

34; Tu (ji bona wan ra aha) bêje: "(Gelo) qe ji wan hevriyên ku hûn ji wan ra (perestî dikin) hene! Ku di cara yekem da tiştan biafirîne, paşê (ewan afirndokên xwe ji piştî mirinê) dîsa bikaribe biafirîne? (Ewan ji bersivdanê bêzar dibin). Muhemmed tu ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî hey Yezdan eku di cara yekem da tiştan diafirîn, paşê (ewan afirandokên xwe ji piştî mirinê) dîsa dikare biafirîne, îdî (gelo) hûn bi çi awayî li kuda (bi viran) dizivirînin?"

35; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "(Gelo) qe ji wan hevriyên ku hûn (ji wan ra perestî dikin) hene! Ku beledîya li bal rêya rast da bike? (Ewan ji bersivdanê bêzar dibin. Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Hey Yezdan beledîya li bal rêya rast da dike. (Îdî qey hûn naponijin; gelo) ewê beledîya li bal rêya rast da dike: Ewa babet e ku (ji bona wî ra perestî bê kirinê) li pey wî çûyîn çî be, ya jî ewê ku qe ji pêştirê beledîya heyî tu beledî nake, ewa babet e (ku ji wî ra perestî bê kirinê) çûyîn li pey wî çêbe? Îdî (gelo) ji bona we ra çi bûye? Hûn ça û bi çi awayî berewanî dikin?"

36; Û pirên ji wan hey di binê peyrewê gomanan da nin. Bi rastî goman jî bi tu cureyî (merivan) ji mafê (heqê) nade parisandinê. Bi rastî Yezdan bi tiştê, ku ewan dikin dizane.

37; Û eva Qur'ana hey li bal Yezdan (hatîye hinartinê). Qe tu maf tune ye; ku eva Qur'ana li bal wanê pêştirê Yezdan in, bi vir hatibe hinartinê. Lê ewa (Qur'ana) heye! Ewa hey rastdarya (wan pirtûkên di berya we da borîne) dike û ewê (pirtûkê bi biryarî) vedike. Qe tu dudilî tune ye, ku ewa (Qur'ana) hey ji Xudayê cihan ê hatîye (hinartinê).

38; (Muhemmed!) qey ewan (ji bona te ra dibêjin): "Eva Qur'ana hanê (Muhemmed) bi vir aloze kirîye?" (Tu ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî heke hûn di doza xwe da rast in; ji pêştirê Yezdan, hûn çi dikarin gazî wî bikin (arîkarya hev bikin) îdî hûn jî ferkerekî wekî wê (Qur'anê) binin."

39; Na, (gotina wan nîne) ewan ew tiştên ku hêj zanîna bi wan tiştan ji wan ra ne hatibû ewan bi xweber jî bi wan nizan bûne, dane derewdêrandinê (hêj ji bona wan ra zanîna bi Qur'anê ne hatibûye, ewan Qur'an dane derewdêrandinê) ewanê berya van da jî wekî van (pirtûkan ji wan ra hatibûye) dane derewdêrandinê. Îdî tu mêze bike ka ser encama cewrkaran ça bûye?

40; Û ji wan hinek hene, ku (bi Qur'anê) bawer dikin, û hinek jî hene, bi we bawer nakin û Xudayê te bi xweber jî bi wanê tevdanok çêtir dizane.

41; Heke ewan (filan Muhemmed! te) bidine derewdêrandinê (tu ji wan ra aha) bêje: "Kirinê min ji bona min ra ne û kirine we jî ji bona we ra ne, hûn ji kirine min, bê gur in û ez bi xweber jî ji kirinê we bê gur û goman in."

42; (Muhemmed!) ji wan hinek hene, ku li bal te da gohdarî dikin, îdî heke ewan bi ponijî hişdarî nekin, qey tu bi keran dikarî bidî bihistinê?

43; Û ji wan hinek hene (bi bawerî) li bal te da mêze dikin, îdî heke ewan nebînin, qey tu dikarî bi koran bidî dîtinê?

44; Bi rastî Yezdan bi tu tiştî li merivan cewrê nake, lê meriv bi xweber li xwe cewrê dikin.

45; Di roya ku (Yezdan) ewan dicivîne; tu dibê qey ewan kat hijmareki bi tenê di



nava royê da mane wusa hev nas dîkin (ya jî tu dibê qey danekî ji royê bal hev bûne wusa di nêzîk da hev nas dîkin). Bi sond! Ewanê bawer nakin; ku we herne bal Yezdan (hêjmara kirinê xwe bidin) hene! Ewan zîyan kirine û ewanan nehatibûne rêya rast da jî.

46; Û heke em hinekî (ji wê şapata) ku me ji wan ra peyman daye, bi te bidine diyar kirinê, ya jî (hêj şapat bi wan da ne hatibe) em canê te bistînin (çi diguhurîne)? Loma fetla wan hey bal me da ne. Paşê şixwa Yezdan ewan kirinên, ku ewan dîkin, bi amedî dibîne.

47; Ji bona her komekî ra pêxemberekî wî heye. Îdî gava pêxemberê wan hatiye bal wan (ewan bi gotina pêxemberê xwe ne kirine) di nîveka (wan û pêxemberê wan da bi dadvanî bûyer) pêk hatiye li wan bi xweber jî cewr nayê kirinê.

48; Ewan ji te dipirsîn (aha dibêjin): "Heke hûn di doza xwe da rast in, ka danê (hatiye peymananê ku wê şapatê di wî da ji bona me ra bê danê) kengê ye?"

49; Tu (ji wan ra aha) bêje: "Ez ji bona xwe ra jî ji pêştirê wî tiştê, ku Yezdan ji bona min ra va ye, qe nikarim tu zîyan û karê bikim. Ji bona her komekî ra danê teşqele û (canstandina) wan heye. Gava ku ewa dana bê, îdî ewa dana demekî pêş û paş nakebe."

50; Tu (ji wan ra aha) bêje: "Ka bi min bidine diyarkirinê, heke şapata (Yezdan) di şevê da (hûn raza bin) ya jî hûn di royê da (xebat bikin) bi we da were, hûnê ça bikin? Gelo ewan îdî (ku nikarin qe tu tiştî bikin, ka ji bona çi) leza hatina wî danî dîkin?"

51; Qey ji piştî, ku gava şapat hat hûnê paşê bi wî (Yezdan) ê bawer bikin? (Ji wan ra aha tê gotinê): "Hûn di naha da bawer dîkin? We bi xweber jî (hêj di berê da) leza hatina wê (şapatê) dîkir? (Ka ewa xwastina we çabû)?"

52; Paşê ji bona wanê ku cewr kirine hene! (Aha) tê gotinê: "Hûn ewê şapata her heyî çeşne (tam) bikin. Hûn hey bi keda xwe tene celatkirinê."

53; Ewan divên, ku ji te hîn bibin (aha ji te dipirsîn): "Bi rastî ewan (peymanên, ku tu ji bona me ra dibêjî) rast in?" (Muhemmed! tu bersiva wan aha bide): "Bi Xudayê min, ewan rast in. Hûn nikarin (ewan) para da jî bidin (ya jî şapatdanê bêzar bikin, ku îdî şapatê nede)."

54; Ewan kesên ku cewr kirine hene! heke (di wê royê da) hemû heyîyên di zemîn da heyî ji bona yekê wan rabe, wê ewan heyên hemûşkan di gerewa xwe da bide ku bi xweber fereste be. Ewan gava ku şapatê dibînin, poşmaniya xwe vedişêrin. Û di nava wan bi xweber da jî berewanî bi dadvanî hahatiye pêk anînê. Li wan jî qe cewr ne hatiye kirinê.

55; (Hûn) hişyar bin! Bi rastî çiqa tişt di ezman û di zemîn da hene, hemûşk ji bona Yezdan ra ne. (Hûn) hişyar bin! Bi rastî peymana Yezdan rast e û bi rastî pirên wan pê nizanin.

56; Ewa (Yezdan aye) jîn û mirinê dike û hûnê bi rastî li bal wî da bêne zivirandinê.

57; Gelî kesan! Bi rastî ji Xudayê we ji bona we ra şîretek (Qur'anek) ê wusa hatiye: Ewa ji bona (nexweşiyên) di singan da mefa (şifa) ye û ji bona bawergeran ra dilovanî û rêberîyek e.

58; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Ewan (jîn û mirin û xweşî û nexweşiyên me) bi rûmet û dilovîna Yezdan e." Îdî bira ewan bi vê şa bin. Eva (qinyata) bi vî awayî, ji wan tiştên ku ewan dicivînin çêtir e.

59; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "M a qey hûn nabînin; Yezdan ji bona we ra çiqa rojî (rizq) hînantîye? Îdî we ewa rojîya, hinekî wî durist kirîye û hinekî wî jî ne durist kirîye: (ka we eva kirina ji ku anîbû)? (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Qey Yezdan ji bona we ra (eva) destûra (hanê) dabû? Ya jî hûn li ser (navê) Yezdan viran dîkin?"

60; Û gelo (hûn dizanin ka) gomana wanê, ku viran (li ser navê) Yezdan dîkin, di roya rabûna hemû da çî ye? Bi rastî Yezdan ji bona kesan ra xweyê rûmeteke mezin e û lê pirên (kesan jî) sipazîya wî nakin.

61; Û (Muhemmed!) tu di çi temtêla da dibî bibe û tu (bi koma xwe va ji bona wê dabaşê) ji Qur'anê çi dixûnin bixûnin û hûn (ji bona xwe ra) çi dîkin bikin di vê gava ku hûn noqê wan kirinan dibin, em we dibînin. Û di zemîn û ezmana da, ji çûrûskan, piçûk û meztir qe tu tişt (ji zanîna) Xudayê te wunda nabe, ewan hemûşk jî di pirtûk (û nivîsarekê) vekirî da nin.

62; (Hûn bizanin) û hişyar bin! Bi rastî li ser wanê ku Yezdan serkarê wan e, tu tirsar (şapatdan) û murûzaya (ji kêr xelat kirinê) tune ye.

63; Ewanê (ku Yezdan serkarîya wan kirîye) hene! Ewanan (bi Yezdan) bawer kirine û (ewan xuda) parisî jî dikiribûne.

64; Ji bona wanê (bi van salixan, ku têne neskirin) di jîna cîhan û di (jîna) parada jî mizgînî hene. Qe tu guhurandin ji bona peymanê Yezdan ra tune ye. Serfirazîya mezin hey eva bi xweber e.

65; Bira gotinê (wanê, ku bawer ne kirine) te nedine murûzkarinê. Bi rastî servahatin hemûşk ji bona Yezdan ra ne. Ewa bihistoke pîr zana ye.

66; Hûn (bi zanîn) hişyarbin! Bi rastî di ezman û di zemîn da çi hene (hemûşk) ji bona Yezdan ra nin. Ewanê ku (dest ji Yezdan ber didin) di binê peyrewê wan tiştên, ku ji pêştirê Yezdan in, hene! Ewanan bi rastî hey di binê peyrewê gomanan û ewan bi rastî hey sêwrnê bi vir dikan.

67; Ewê, ku ji bona we ra şev çê kirîye ji bona ku hûn di şevê da bihewin û ro jî bi rohnayî çê kirîye (ji bo ku hûn di royê da rojîyên (rizq) xwe pêk bînin) heye! Ewa Yezdan e. Ji bona komalê ku tiştan dibêhên, di van kirinan da berate hene.

68; Ewan (filan aha) gotibûne: "Yezdan ji bona xwe ra zar girtine." (Wusa nîne) Yezdan (ji wan gotinan) paqij e, şixwa Yezdan ji hemû tiştan bê perwa ye; Çi tiştên di ezman û zemîn da hene! Hemûşk ji bona Yezdan ra ne. Li bal we (ji bona ku Yezdan ji xwe ra zar girtine) qe tu berate tune ye. Ka tiştê, ku hûn pê nizanin, çê di mafê Yezdan da dibêjin?

69; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Bi rastî ewanê, ku bi vir derewan li ser (navê Yezdan) dikan hene! Ewanan serfiraz nabin."

70; (Ji bona wan ra) di cîhanê da jîneke hindik heye. Paşê wê ewanê li bal me da bizivirin, paşê bi sedema, ku ewan filetî dikiribûne, emê bi wan şapateke zor bidine çeşnê (tam) kirinê.

71; (Muhemmed! Tu ji wan kesan ra) serdaboriya Nûh bixûne; di gavakî da (Nûh) ji bona komalê xwe (aha) gotibû: "Gelî komalê min! Heke şûn û şîretên minê, ku ez bi beratên Yezdan ji bona we ra dikim; li ser we giran û mezin tê, min bi xweber xwe hispartîye Yezdan, îdî ji bona ku para da (ewan biryarên hûnê ji bona min ra hildin) bira ji bona we ra nebe kovan. Hûn û bi wan hevriyên xwe va gotina xwe bixne yek, paşê ew e biryara, ku we (bi hev ra hildaye) bi serê min da bînin û qe li bal min da mêze nekin (dîlê xwe ji bona min neşewitînin)."

72; (Ka îdî hûn ji bona çî rûyê xwe fetilînin?) Heke hûn rûyê xwe (ji şîretên min) difetilînin, min (ji bona şîretkarinê) ji we tu kêr ne xwastiye; kirya min hey li ser Yezdan e û ez bi xweber jî hatime fermankirinê, ku ez bibime ji Misilmanan.

73; Bi vira jî dîsa ewan Nûh dane derewdêrandinê. Îdî me jî (Nûh) û ewan (hevalên wî ne) ku di kelekê da bi wî ra bûn fereste kirin û me ewan xistine şûnmaî (di zemîn da) hiştin û me ewanê, ku beratên me didane derewdêrandinê fetisandin. Ka îdî tu mêze bike, ser encama wanê (ku hatibûne tirsandinê) çê bûye?

74; Paşê me di pey (Nûh da) pîr pêxember li bal komalê wan da şandine. Îdî ewan (pîxemberan) bi beratên xûyayî va hatine bal (komalê) xwe da, ji ber ku komalê wan hêj di berê da (ewan tiştên, ku ewan pêxemberan ji wan komalê xwe ra gotibûne) dabûne derewdêrandinê, îdî komalê wan bi wan (gotinê pêxemberên xwe) bawer ne dikiribûne. Bi vî awayî em li ser dîlê wan komalê, ku ji hedê xwe borî bûne duruf dikan.

75; Paşê me li pey (wan pêxemberan) da, Mûsa û Harûn: bi beratên xwe va, li bal Fir'awn û koma wî da şandiye. Îdî (ewê komalê) quretî kirine (bi Mûsa bawer ne kirine). Bi rastî ewan komalekî nûsitemkar bûne.

76; Îdî (gava) ji bal me da, ji wan ra (mafên rastî hatine, ewan aha) gotine: "Bi rastî eva ançeke (sihir) xûya ye."

77; Mûsa (ji wan ra aha) gotîye: "Di gava ji bona we ra maf (heq) hetîye; hûn evê dibêjin? Ma qey eva anç e? Bi rastî ançkar serfiraz nabin."

78; Ewan (ji bona Mûsa ra aha) gotine: "Qey tu hatîyî bal me da, ji bona ku em (ji wan rê û rêzikan) em rast hatin. Bav û bapîrê me li ser wan rêya bîn, dest berdin û bira mezinayî di zemîn da ji bona we herdukan ra bimîne? Bi rastî em bi xweber bi we herdukan jî bawer nakin."

79; Ê Fir'awn (ji bona komalê xwe ra aha) gotîye: "Hûn hemûşk ançkarê qanixê pîr zan e, ji bona min ra bînin."

80; Îdî gava ançkar hatine (bal Fir'ewn) Mûsa (ji bona wan ançkaran ra aha) gotîye: "Hûn çi dikarin bavêjine (kêşê) bavêjin."

81; Îdî gava, ku ewan (ançkaran, pêşeyên) xwe avêtine: Mûsa (ji bona wan ançkaran aha) gotîye: "Eva tiştê, ku hûn ji bona wî hatine; we jî ewa anî (çê kir, ewa) bi rastî anç e. Bi rastî Yezdanê ewî pûç bike. Bi rastî Yezdan karê tevdanokan aştî nake."

82; Û bi rastî Yezdanê mafê, bi peyvên xwe rast bike, çiqê nûsîtemkar pê xweş nebin jî.

83; Ji tirsê Fir'evn û komalê wî, ku wê ji bona wan ra aşîtan bidin; ji komalê Mûsa çend xunan pêştir tu kesî bi Mûsa bawer ne kirine. Bi rastî Fir'ewn di zemînê (wura da) mezinê bi hêz û (qurê bûye). Û bi rastî (Fir'ewn) ji dest belabûya bûye.

84; Û Mûsa (ji bona komalê xwe ra aha) gotîye: "Gelê min! Heke we bi rastî bi Yezdan bawer kirîye, îdî hûn xwe hispêrin wî û bikebine (ber bextê wî)."

85; (Ewanê bawer kirine; bersiva Mûsa aha dane û) gotine: "Bi rastî me xwe hispartîye Yezdan. Xudayê me! Tu me ji bona wî komalê cewrkar ra nexeribandin."

86; Û tu bi dilovanîya xwe, me ji komalê file fereste bike.

87; Û me jî li bal Mûsa û birayê wî da (aha) niqandîye: "Hûn herduk (di Misrê da) ji bona komalê xwe ra hinek xaniyan amade bikin; Hûn ewan xaniyan ji bona xwe ra bixêr meşgeft û hûn (bi vî awayî) nîmêja xwe (di wan xaniyan da) bikin. Û Mûsa tu mizgînîya bawergeran (bi serfirazîya wan) bide.

88; Û Mûsa (ji Xudayê xwe aha) dilxwezî xwestîye: "Xudayê me! Bi rastî te ji bona Fir'ewn û koma wî ra di jîna cîhanê da xîşir û maldaryeke pir daye. Xudayê me! Qey ewan (dayîne hanê, ku te daye wan) ji bona ku ewan ji rêya te derkebin û rêya te wunda bikin, te daye wan? Xudayê me! Tu malê wan raşîhetîne û dêrîz bike û tu dilê wan zor teng bike, îdî heya ewan şapata dilsoz nebînin, ewan bawer nakin."

89; Yezdan (bersiva herdukan aha daye û) gotîye: "Bi rastî dil xwezîya we herdukan hatîye litê kirinê; îdî hûn herduk bi rastî xwe dadvan bikin û hûn herduk nebîne, pewrewê rêya wanê (ku tiştan) nizanin."

90; Û me zarê cihûyan ji deryayê borandin. Îdî Fir'ewn û bi leşkerê xwe va dane pey şopa wan ji bo ku (ewan zarê cihûyan) bi neyartî bi cewrî bigirin (wusa çûn) heya danê fetisandinê; di wî danî da (Fir'ewn aha) gotîye: "Bi rastî min bi wî Xudayê ku zarên cihûyan bi wî bawer kirine, bawer kirîye, ku ji pêştirê wî tu yezdanê babetê perestîyî tune ye û ewanê (xwe hispartîne Yezdan hene!) ez bi xweber jî ji wan im."

91; (Ji bona Fir'ewn ra aha tê gotinê): "A, di naha da (tu bawer dikî? Bi sond! te hêj di berê da (di hemberê Yezdan da) serî bilind kiribû û tu bibûyî ji wanê tevdanok."

92; Ji bona ku tu ji bo wanê li pey xwe da bibî berate, emê îro xurî termê te yê bê can fereste bikin. Bi rastî pirên ji kesan ji beratên me ne (sodretî) bê goman in."

93; Û bi sond! Me zarên cihûyan di warên qenc da bi cî kirin û me rojîyên (rizq) tîtal dane wan, îdî heya ji wan ra zanîna (bi tiştan) ne hatîye; Ewan di wan bûyerên (di nava wan da heyî) ne wekhevî ne dikirin. Îdî (gava ji bona wan ra zanîna bi tiştan hatîye, ewan jî wekî zanîna xwe ye bi wan tiştan ne wekhev bûne). Bi rastî Xudayê te yê we di roya rabûna hemûtî da, di nava wan da di wê tiştê ku ewan têda ne wekhev bûne, berewani bike.

94; Heke (Muhemmed! Tu di wan serdaborîyên pêxemberên) ku me (serda borya wan) li bal te da hinartîye du dil dibî, îdî tu (serdaboriya wan) ji wanê, ku hêj di berya te da pirtûk xundine bipirse (şixwa rastîya eva, ku me ji bona te ra hinartîye xûya dibe). Bi sond! Ji Xudayê te maf bi rastî li bal te da hatîye. Îdî (hişyar be) nebe ji wan du dilê hîncar.

95; Û tu nebe ji wanê, ku beratên Yezdan dane derewdêrandinê. (Heke tu jî wekî wan bikî) tuyê bibî ji wanê zîyan kar.

96; Bi rastî ewanê, ku peymanê Xudayê te (ji bona celatdana wan) maf bûye hene! ewanan îdî bawer nakin.

97; Û heke hemûşk beratên (sodretî) ji wan ra hatibe jî, heya ewan şapata dilsoz nebînin (ewan bawer nakin).

98; Îdî ji pêştirê komalê Yûnus, qe tu gundî û welatî; yê ji piştî hatîna şapatan bawer kiribin, bawerîya wan kêrê wan hatibe, tune ne. Gava (komalê Yûnus ji piştî hatîna şapatan) bawer kirine, îdî me jî li ser wan şapata riswabûnê di jîna cîhanê da rakir û me ewan di cîhanê da heya hinek gavan bi xweşî dane jînandinê.

99; (Muhemmed!) Heke Xudayê te biva, wê hemûşk kesên di zemîn da heyî bawer kiribûnan, Îja qey tuyê li kesan zor bikî ji bo, ku ewan bawer bikin?

100; Ji pêştirê wan kesên, ku Yezdan destûra bawerkirina wan daye, qe tu kes nikare ji ber xwe va bawer bike û (Yezdan) li wan kesên, ku hişê xwe naxebitînin riswabûn û şapatan dike.

101; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Ka hûn (gelî filan!) li ezman û zemîn mêze nakin, di wan da çi heye?" (Lê çawa be!) berate û tirsdan ji bona wî komalê bawer nakin, qe bi tu awayî kêr nayê.

102; Ewan qey hêvîya wan royên, ku di berya wan da (ewan komalên bawer ne kirine, di wan royan da hatibûne şapatkirinê) dikin, qey wusa ne? (Muhemmed! tu ji wan ra aha) bêje: "Îdî hûn (gelî filan!) hêvîya wan (royan) bikin, ez bi xweber jî bi we ra hêvîdarya wan (royan) dikim."

103; Paşê (gava ji wan bê baweran ra şapat hatiye) me pêxemberê xwe û ewan merivên bawer kirine (ji wan şapatan) fereste kir. Bi vî awayî maf e li ser me, ku em bawergeran fereste bikin.

104; (Muhemmed! tu aha) bêje: "Gelî kesan! Heke hûn di ola (dîn) min da du dil dibin: hûn bizanin! Îdî bi rastî ewan tiştên ku hûn ji pêştirê Yezdan ji wan ra perestî dikin, ez ji wan ra perestî nakim û lê hûn (bizanin!) ez hey perestîya wî Yezdanê, ku bi canstandin we dimrîne, dikim. Û ez bi xweber jî hatime fermankirinê, ku ez bibme ji bawergeran."

105; Û (ez hatime fermankirinê) ku ez berê xwe bidime ola rast e bi tenê û ez nebime ji wanê hevriçêker."

106; Û (ez bi vî awayî jî hatime fermankirin, Muhemmed! tu) ji pêştirê wî Yezdanê (ku babet e ji bona perestîyê ra) perestîya wan tiştên ku qe tu kar û zîyana te nakin, neke. Îdî (ji pêştirê wan şîretan) heke tu (perestîya wan dîsa bikî) îdî (bizane!) tu di vê gavê da dibî ji wanê cewrkar.

107; Û heke Yezdan ji bona te ra kulekî bide, îdî ji pêştirê wî tu kes nikare ewê kulê rake. Û heke Yezdan ji bona te ra qencîyekî bike, îdî tu kes nikare ewê rûmeta wî bifetilîne. Ewa ji bendeyên xwe, ji kîjana ra bivê, ewê qencîyê ji rûmeta xwe ji bona wî ra dide. Bi rastî ewa bi xweber jî baxîşkarê dilovîn e.

108; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelî kesan! Bi rastî mafî ji Xudayê we ji bona we ra hatiye, îdî kîjan were rêya rast, ewa ji bona xwe ra hatiye rêya rast. Û kîjan jî ji rêya rast derkebe, îdî wundabûna ji rêya rast hey ji bona wî ra ne û ez bi xweber jî li ser we serkar nînin."

109; Û (Muhemmed!) tu hey bibe peyrewê wan biryarên) ku li bal te da hatine hinartinê û tu hew bike, ka heya Yezdan (di nava we da) berewanî bike. Ewa bi rastî qencê berewanan e.

## Chapter 11 (Sura 11)

1; E.L.R. (Hey Yezdan bi arşa van tîpan dizane). Eva pirtûka hanê (pirtûkeke wusa ne) ku ji bal Yezdanê bijejkeyî agahdar da, beratên wê hatine hêz kirin, paşê hatine vekirinê.

2; Ji bo ku hûn hey perestîya Yezdan bi tenê bikin. Bi rastî ez ji bal wî da ji bona we ra bi tirsdanok û mixgînvan (hatime şandinê).

3; Û (ji bo ku hûn) baxîşana xwe ji Xudayê xwe bixwezin. Û paşê, ku hûn ji kirinê xwe poşman bibin li bal Xudayê xwe da, bizivirin; ku Xuda jî heya wî danê navdaî we bi qencê jînan, bide jînanandinê û ewa ji bona hemûşk rûmetdaran ji rûmeta xwe, wan rûmetdar bike. Û heke hûn (ji van şîret û gotinan) rû bifetilînin, îdî (hûn bizanin!) bi rastî ez ji wê şapata roya mezin, ku bi ser we da were, ditirsim.

4; Hey şûna hewa we ye (ku hûnê li bal da) bizivirin; ewa li bal Yezdan e. Û ewa bi xweber jî li ser hemû tiştan bi hêz e.

5; Hûn hişyar bin! Bi rastî ewan (filan) ji bona, ku ji xwendina (Qur'an û ji gotinê (Muhemmed) xwe veşerin; singe xwe duta dikirin (ji rastîyî vedişartin). Hişyar bin! Di gava (ku ewana ji bona razanê) xwe di nava kincên xwe da dipêçin û vedişerin jî, Yezdan dîsa bi wan tiştên, ku ewan vedişerin û vedikin û diyar dikin, dizane. Bi rastî Yezdan bi tiştê di singa da veşartî dizane.

6; Û çiqa rewar di zemîn da hene! rozîya wan hemûşkan hey Yezdan dide û ewa bi şûna wan rewaran, di gava (dibine beden) di şûna xwe da diêwirin û ji şûna xwe derdikebin (bê beden dimînin) diçin, dizane. (Ya jî bi şûna wanê cîhanî û bi şûna

wan e, ku hêj di tovê xwe da nin dizane). Evan bûyeran hemûşk jî di nivîsareke (hijmarî) û daveger da nin.

7; Ewê, ku ezman û zemîn di şeş (êwirêndanî da) afirandîye heye! Ewa Yezdan e (gava Yezdan, evan diafirandin) hêj hêza wî yê arşî (mana) li ser avê bû (Yezdan eva gerdûna bi vî awayî afirandîye) ji bo ku, we biceribîne; ka kîjanê ji we kiryarên qenc dike. (Ji piştî van beratan jî) heke tu (ji wan ra aha) bêjî: "Bi sond! Hûnê ji piştî mirinê (rabin ji bona xelat û celatdanê) bi civandin bêne şandinê". Wê ewanê filê (aha ji bona te ra) bêjin: "Evan (gotin û şîretan ji pêştirê ançeke huzwartî, qe tu tişt nînin."

8; Û heke em şapatê heya danekî hijmarî ji wan bidine para da (ewan bûne filê hene! Wê aha) bêjin: "Ka, ewa şapata (ji me ra dihat) çi hatina wê daye para da?" Hûn hişyar bin! Di roya, ku şapat ji wan ra were, ewan nikarin ewê şapatê ji xwe bidine para da. Ewa şapata ku ewan bi hatina wê tinaz dikirin (haya wan qe tune ye) ewan hildane nava xwe da jî.

9; Û heke em ji bal xwe da bi meriva dilovanîyekî ji xwe bidine tam kirin (ewa bi wê şa dibin) paşê heke em ewe dilovanîyê ji wî rakin derxin, ewa (meriva ji dilovanîya me) bi murûzî bê hêvî dibe. Bi rastî (ewa qenciyên me yên berê, ku me bi wî kirine) bîrva dike.

10; Û heke em ji piştî wan kul û derdên bi meriva girtine; qenc û xweşîyek bidine tamkirinê, ewa (aha) dibêje: "Bi rastî îdî sikatî nexweşî ji min çûye." (Ewan têngaiyên hêj berê da bi wî da hatine, bîrva dike). Bi rastî ewa (meriv) dilşa û qure ye.

11; Ji pêştirê wan merivên, (li ser wan herduk temtêlan da jî) hew kirine û karê aştî kirine. Ji bona van merivên (bi van salixên qenc hatine salixkirinê) baxişandin û kiryeke mezin heye.

12; Ji ber, ku ewan (aha) dibêjin: "Gotî li ser wî da (pêxember), xezîne bihatina hînartinê, ya jî bi wî ra firişte hatibûnan (ku me bi wî bawer bikira)? Îdî ji bona van gotinan wusa singê te teng dibe, nezîk dibe, ku tu hinekî ji wan biryarên li bal te da hatine hinartinê ji (merivan ra nebêjî) dest ji wan berdî. (Muhemmed! Hişyar be) tu hey hişyarvan û gotîkarî. Yezdan li ser hemûşk tiştan serkar e.

13; Qey ewan (aha) dibêjin: "(Muhemmed eva Qur'ana li bal xwe da) aloze kirîye (ku tu jî ji wan bihêrs dibî?" Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Heke hûn di doza xwe da rast in, ji pêştirê Yezdan hêza we digihêje çi, hûn gazî wan jî bikin, hûn jî deh ferkerên wekî (we Qur'anê) aloze bikin, bînin."

14; Îdî (gelî filan!) heke ewan tiştên, ku hûn (bi wan bawer in) bi pisyarî (arîkarya we nekirin) hûn bizanin. ku bi rastî (ewa Qur'ana) bi zanîna Yezdan hatiye hînartinê û ji pêştirê wî jî (tu tiştî babetê perestîyê) tune ye. Îdî gelo hûnê teslîm bibin?

15; Kesê jîn û xemla cîhanê bivê, emê ji bona wan ra (di cîhanê da bê kemasî) kirya wan bidine wan, ewan di cîhanê da jî qe tu kêmasî nabînin.

16; Evanê ku bi van salixan hatine salixkirinê hene! Ji bona wan ra di para da hey agir heye. Ewan pêşeyên wan e, ku ewan kirine, di para da hemûşk şewitîne û ewan kirinê wan hemûşk pûç bûne.

17; (Qe ewanê, ku bi van salixan hatine salixdanê) wekî wanê, ku ji Xudayê wan ji wan ra rêya diyarî hatibe û ji Xudayê wan (beratên ji Qur'anê) bi şahidî (ji bona rêya rast) ji wan ra bê xundinê û hêj di berya (Qur'anê da jî) pirtûka Mûsa (Tewrat) ku pêşrevan û dilovîn bûye (eva rêya rast daye hêzkirine) wekî hev dibin? Evanê bi van (salixên) rast hatine salixkirinê hene! Ewan bi Qur'anê bawer dikin. Û kîjan part bi Qur'anê bibe filê, bi rastî şûna wî agir e, îdî bira ji bona te ra di mafê Qur'anê da qe tu dudilî çê nebe. Bi rastî ewa Qur'ana ji Xudayê te bi mafî (hatiye). Lê pirên ji kesan (bi Qur'anê) bawer nakin.

18; Gelo ji wanê, ku bi vir derewan li ser (navê) Yezdan dikin, cewrkartir hene? Ewan di hemberê Xudayê xwe da têne raberkirinê; şahid ji bona wan ra (aha) dibêjin: "Ewanê, ku li ser navê Xudayê xwe vir dikirin ev in". Hûn hişyar bin! Bi rastî deherandina Yezdan li ser cewrkaran e.

19; Ewan (cewrkaran) wusa nin, rêya Yezdan (li ber kesan) dibirin û divên, ku ewê xar bikin. Şixwa ewan bi xweber jî (bi jîna) danê para da bawer nakin.

20; Evanê bi van (salixan hene!) ewanan (gava Yezdan ji bona wan ra di vê cîhanê da şapatê bide) nikarin ewî bêzar bikin, ku ewa ji bona wan ra di zemîn da şapatê

nede. Ji bona wan ra şapat tê car carkirinê. Ewan nikaribûne, ku rastîyê bibêhên û nikaribûne, ku rastîyê bibînin jî.

21; Ewanan in, ku ji bona xwe ra zîyan kirine. Û ewan tiştên, ku ewan goman dikirin wê ji bona wan ra (di para da mehderya wan bikin) bi xweber wunda bûne.

22; Qe tişteke nabe! Bi rastî di parada jî ewan bi xweber pîr zîyan kirine.

23; Bi rastî ewanê, ku bawer kirine û karê aştî kirine û bi dilgermî li bal Xudayê xwe da bi perestî fetilîne, ewanan. hevriyên bihiştê ne, ewan di bihiştê da heymanok in.

24; Heçwekîya van her du destan; wekî (van her du destên hanênan in): Yek ji wan kor û ker be (desta mayî jî) bibîne û bibêhê, qe temtêla her du destan bi heçwekî wekî hev dibin? Îdî gelo qe hûn (ji bona temtêla van her du destan) naponijin?

25; Bi sond! Me Nûh li bal komalê wî da şandîye (ji bo ku ewa ji bona wî komalê xwe ra aha bêje): "Bi rastî (gelê) min! Ez ji bona we ra bi pêxemberî li bal we da hatime, ku bi diyarî tîrsa (ji şapatan bidim ji bo ku hûn gonehan nekin).

26; Hûn hey ji bona Yezdanê bi tenê ra perestî bikin. Bi rastî ez ditirsim (heke hûn bawer nekin) şapata ro ya dilsoz bi we da were.

27; Îdî (ji piştî van şîretên Nûh) ewê desta fileyên pêşrewanê ji komalê wî (aha) gotine: "Em te dibînin, ku tu jî kesekî wekî me yî. Û ewan di cara yekem da, bûne peyrewê te hene! Em dibînin, ku ewan riswayên me ne û em ji bona we ra tu rûmetekî jî li ser xwe nabînin, hêj (ji van jî pirtir) em goman dikin, ku hûn derewan dikin (ka emê ça bi te bawer bikin?)."

28; (Nûh di bersiva wan da aha) gotîye: "Gelê min! (ka ji min ra bêjin) heke ji Xudayê min rêyên xûyayî û biryarên rast li bal min da hatibin û Xudayê min li bal xwe da bi dîlovanî (pêxemberî) dabe min, ewan (biryar û dîlovanî) ji we hatibin veşartinê (hûn jî bi wan bawer nekin) hene! Qey gava hûn bi wan (bawer nekin) emê bi zor bi we bidine bawer kirinê?"

29; Gelê min! Ez ji bona (vê pêxemberîya xwe jî) qe tu malekî ji we naxwezim, kirya min hey li ser Yezdan e (ji bona ku hûn ewan navên) ez nikarim ewanê ku bawer kiribin, bixme der. Bi rastî ewanê bigehêjne Xudayê xwe (ewanê fereste bin. ezê ça ewan derxime derva?) Û Lê bi rastî ez dibînim, ku hûn komalekî (wusa nin) xwe davêjine nezanîyê.

30; Û gelê min! Îdî qe hûn naponijin heke ez ewan (bawergeran li bal xwe) derxime derva (gava şapata Yezdan ji bona tûla wan bi min da were) gelo kî dikare arîkarîya min bike (ewê şapatê ji min bide para da)?

31; (Gelê min!) Ez ji bona we ra nabêjim: "Xezînê Yezdan li bal min hene (werin, ezê ji bona we ra bidim). Bi rastî ez ji tiştên ne ber çavî jî nizamim." Û ez nabêjim: "Ku bi rastî ez firîşteme;" Û ez ji bona wanê, ku hûn ewan piçûk dibînin, aha jî nabêjim: "Bi rastî Yezdan ji bona wan ra qe tu qencî nade." Yezdan bi tiştê di dilê wan da çêtir dizane. Bi rastî gava, ku ez ewanê (borî bêjim) di wê gavê da ez dibime ji wanê cewrkar."

32; Ewan (komalê pêşrewan ji bona wî ra aha) gotine: "Nûh bi sond! Te bi me ra tekoşîn kir û tu di tekoşîna bi me ra jî pîr pêş va çûyî. Heke tu di doza xwe da rastî, ka îdî ewan şapatên, ku tu me bi wan ditirsînî, ji bona me ra bîne."

33; (Nûh aha) gotîye: "Bi rastî heke Yezdan bivê wê ewê şapatê ji bona we ra bîne û hûn bi xweber jî nikarin ewî şapatdanê bidine bîzarkirinê, ku şapatê nede we."

34; Heke Yezdan teşqelêdana we bivê, qe şîretên min ji bona we ra bi kêr nayê. Ewa Xudayê we ye, hûnê hey li bal wî da bizivirin.

35; Qey ewan (ji bona te ra Muhemmed! aha) dibêjin: "Eva, (serdaborya Nûh, Muhemmed) li bal xwe da bi vir aloze kirîye ji bona me ra bivan, şîretan dike." Tu ji bona wan ra (aha) bêje: "Heke min ewan ji ber xwe da aloze kirine, îdî sikatîya min li ser min e û ez bi xweber jî ji wan sikatîyên, ku hûn dikin, bê gûr û bê goman im."

36; Û li bal Nûh da hatiye niqandinê: "Bi rastî ji temtêla wan (hatiye zanînê) ku ji pêştirê wanê bawer kirine, îdî ji komalê te qe tu kes bawer nakin, îdî ji bona wan tiştên, ku ewan dikin qe tu kovanê nekişîne."

37; Û (Nûh!) tu kelekê bi (dîdevanî û bi niqandina me çê bike û tu ji bona wanê ku cewr kirine, ji min lava neke (ji bo ku ez ewan cewrkar ji teşqelê fereste bikin). Bi rastî ewanê avê da bifetisin.

38; Û (Nûh) kelek çê dikir, çîqa peşrewanekî ji komalê wî li bal wî da di borya ewî komalî bi Nûh, ji bona kelekê tinaz kiribûne. (Nûh ji bona wan ra aha) gotîbûye: "Heke hûn bi me (ji bona vê kelekê) tinazan dikin, îdî emê jî (di gava hatina şapatê da) ça hûn (bi me) tinazan dikin, wusa bi we tinazan bikin."

39; Îdî hûnê di nêzik da bizanin; ka şapata riswabûnê ji bona kê ra tê û ka şapata her heyî li ser kîjana da dikebe.

40; Di gava fermana me bi teşqeledana wan hatiye û tendûre jî (stîla kelekê kelandiye, ya jî di jora çîyan da lehîya avê ser wan da herikiye) av herikandiye; me ji bona (Nûh ra aha) gotîye: "Nûh! Tu ji her zoyekî (ji nêr û mêyan) duduyan û bi malîyên xwe va jî, ji pêştirê wan malîyên tene, ku peymanî me bi teşqeledana wan borîye, ewanê bawer kirine jî hilde kelekê." Şixwa bi Nûh hindikan bawer kiribûne.

41; Nûh (ji bona koma xwe ra aha) gotîye: "(Koma min!) hûn di hemû kişandin û şandina kelekê da bi nevê Yezdan li kelekê sîyar bin. Bi rastî Xudayê min baxişgerê dilovî ne (qe ne tirsîn!)"

42; Kelek bi wan va di nava wan pêlê avê ne, ku wekî çîyan dihatin; dikişîya diçû. Nûh (ji bona wî kûrê xwe yê) ku dest jê hatibû berdanê (di nava komal da mabûye, aha) gazî kirîye: "Kurê min! Tu jî bi me ra li kelekê sîyar be û tu bi filan ra nemînî."

43; Kurê wî (di bersiva wî da aha) gotîye: "Di nêzik da ezê xwe bavêjime çiyakî, ewa çiyayê wê min ji avê biparisîne." (Nûh jî ji bona wî ra aha) gotîye: "Di îro da ji pêştirê wanê, ku Yezdan li wan dilovanî kirîye, qe tu kes ji şapata Yezdan nayê parisandinê." (Bi vî awayî îdî) Pêlê avê kete nava wan da (kuruk jî) bûye ji wanê di avê da fetisî.

44; Û ji bona zemîn û ezmanan ra (aha hatiye) gotinê: "Zemîn! Tu ava xwe biqurçîne û ezman! Tu jî ava xwe rake." Îdî av mirçîqî û fermana (Yezdan jî hate şûna xwe û kelek jî gihîjte li ser (çîya) ê Cûdî maye. (Paşê aha hatiye) gotinê: "Dûr (dilovanîya Yezdan) ji bona wî komalê cewrkar e!"

45; Nûh (aha bi lavayî) gazî Xudayê xwe kirîye û gotîye: "Xudayê min! Bi rastî peymanî te ye, ku te (bi ferestîya malîyên min dabû) bi mafî rast e (ka ça dibe?) kurê min jî ji malîyên min bû. Û tu bi xweber jî (bi dadvanî) berewantirê berewanan î."

46; Yezdan (ji bona wî ra aha) gotîye: "Bi rasî ewa (kurika) ji malîyên te nîne, bi rastî (xûyê wî) ji karê aştî nebû. Îdî tiştê, ku zanîna te pê tune be, tu ji min nepirse. Bi rastî ez şîreta li te dikim ji bona, ku tu nebî ji nezana."

47; Nûh (bi lavayî aha) gotîye: "Xudayê min! Ji bona wan tiştên, ku ez pê nizanim ji te jî dipirsim, xwe davêjime ber bextê te. Naxwe, heke tu ji bona min ra baxişandin û dilovîniyê nekî, bi rastî ezê bibime ji wanê zîyan kirine."

48; (Ji piştî van gotin û lava kirina, ji bona Nûh ra aha hatiye) gotinê: "Nûh! Parisvanî û pîrozaya me li ser te û li ser wan komên bi te ra ye. Tu îdî berjêr be (ji kelekê derkebe). Û hinek kom hene! (ewan komên wusa nin); emê ewan heya (hinek dana) bi jîneke xweşî bidine jînanandinê, Lê paşê wê ewanê şapateke dilsoz ji me bigirin."

49; (Muhemmed!) Evan bûyerên hanênan, ji wan bûyerên ne xûya ne, em ewan li bal te da diniqînin. Di berya naha da, ne te û ne jî komalê te bi wan bûyeran, nizanbûn. Îdî (Muhemmed! Tu li ser wan gotegotê wan) hew bike. Bi rastî (servahatina) para da, hey ji bona xudaparizan e.

50; Û me li bal komalê Ad da birayê wan ê Hûd (bi pêxemberî) şandiye. (Hûd ji bona wan ra aha) gotîye: "Gelê min! hûn ji bona Yezdan ra perestî bikin, loma ji bona we ra ji pêştirê wî tu xuda tune ye. Hûn (evan pûtan ji bona wî ra dixine hevri, hûn bi van kirinê xwe) hey viran dikin."

51; Gelê min! Ez ji bona van (şîretên xwe) qe tu kirê ji we naxwezim. Bi rastî ewê ku ez afirandime heye! Kirya min hey li ser wî ye. Îdî qe hûn hiş hilnadin?

52; Û gelê min! Hûn ji Xudayê xwe baxişandina xwe (ji gonehan) bixwezî û paşê hûn li bal Yezdan da bifetilin, ji bo ku ewa ji ezmanan li ser we da baranê bibarîne û ji bona, ku ewa bi hêzî, hêza we pir bike (çandinîyê we pîroz bike) û hûn bi nûsitemî para da (ji bawerîya xwe) nefetilin.

53; Ewî (komalê Hûd, ji bona Hûd ra aha) gotine: "Hûd! Te ji bona me ra tu beratên xûyayî ne aniye (heya ku em jî bi te bawer bikin). Em ji bona gotinê te dest ji xudayên xwe bernadin û em bi te jî bawer nakin."

54; Em hey (ji bona te ra aha) dihêjin: "Ji ber ku te (dijmîniya hinek xudayên me kirîye) ewan xudayên me xenîme te bûne (tu tepa xistine, îdî tu evan tiştan ji ber xwe dibêjî." Hûd di bersiva wan da aha) gotîye: "Bi rastî ez Yezdan dixime şahidê xwe û hûn jî şahid bin, ku bi rastî ez ji wan tiştên ku hûn ji bona Yezdan ra dixine hevri bê goman im."

55; "Ji pêştirê Yezdan, îdî hûn hemûşk jî ji bona min ra defikan bi xaxî daynin, paşê qe li min mêze nekin."

56; "Bi rastî min xwe hispartîye Yezdan, ewa Xudayê min e û Xudayê we ye jî. Çiqa rewê hene! Yezdan bi tuncika wan hemûşkan girtîye (Ewan wekî gotina xwe digihîne). Bi rastî Xudayê min li ser rêya rast e (dadvan e)."

57; Heke hûn (ji bawerîyê) para da herin, îdî hûn (bi zanin)! Ku bi rastî min ji bona we ra ewan (biryarên ku Yezdan) ez bi wan (biryan) li bal we da (bi pêxemberî) şandime, bi gîhandî gotîye. Û Xudayê min dikare (we teşqeale bike) di şûna we da jî komalekî mayî bixe şûnmayê. Û qe hûn nikarin bi tu tiştî ziyana wî bikin jî. Bi rastî Xudayê min li ser hemû tiştan parîsvan e.

58; Û di gava fermana me (bi teşqeledana wan) hatiye; me Hûd û ewanê bi Hûd bawer kirine, bi dilovanîya xwe fereste kirîye. Bi rastî me ewan ji şapateke stûr fereste kirîye.

59; Û ewanê (bi van salixan hatine salixkirinê) hene! Ewan komalê bi nav Ad in. Ewan bi beratên Xudayê xwe bi hîncarî bawer ne kirine û ewan bûne peyrewê fermanên hemûşk serokên zorên hîncar.

60; Di vê cihanê da û di roya rabûna hemû da jî, deherandina (Yezdan) bûye peyrewê wan. (Hûn hişyar bin!) Bi rastî (komalê) Ad filetiya Xudayê xwe kirine. (Hûn hişyar bin!) Bi rastî dûr (dilovanîya Yezdan) ji bona komalê (bi nav) Ad ra ne, ewan jî ji komalê Hûd in.

61; Û (me li bal komalê bi nav) Semûd ra, birayê wan ê Salih! (bi pêxemberî şandime; Salih ji bona wan ra aha) gotîye: "Gelê min! Hûn ji bona Yezdan ra perestî bikin, ji bona we ra ji pêştirê wî (Yezdanê, ku babetê ji bona perestîyê) qe tu perestvan tune ye. Ewî hûn ji zemîn afirandine û hûn di zemîn da dane jîrandinê. Îdî hûn baxişandina xwe hey ji wî bixwazin û hûnê li bal wî da para da bizivirin. Bi rastî Xudayê min nêzik e: bersiva (daxwazan) dide.

62; (Ewî komalî ji bona Salih ra aha) gotine: "Salih! Bi rastî di berya naha da tu di nava me da (merivekî pêşrewan bû î); Ji te hevî dihatine kirinê. Tu ça me ji perestîya wan (tiştên) ku bav û kalên me ji wan ra perestî dikirin, didî para da? Bi rastî em bi xweber jî bi dudilî ji perestîya wî tiştê ku tu me li bal (perestîya wî da) gazî dikî di şikê da nin.

63; (Salih ji bona komalê xwe ra aha) gotîye: "Gelê min! (ka hûn çî dibêjin!) Heke bi rastî ez bi beratên ji Xudayê xwe (li bal we da bi pêxemberî hatibime şandinê) û Xudayê min bi dilovanîya ji xwe (pêxemberî) ji min ra dabe (bi vî ra jî ez rabim) bê gotina wî bikim, îdî gelo kî dikare (heke ewa ji min ra şapatê bide) ewê şapata wî ji min bide para da? Îdî (gelê min! "Hûn bi van gotinê xwe) hey ji min ra kovanan pîr dikin."

64; "Û gelê min! Eva deva Yezdan ê han e heye! Ewa ji bona we ra beratek e. Îdî hûn dest ji wê berdin. Ji bo ku ewa (deva) di zemînê Yezdan da (bi azadî) biçêre. Ji bo ku bi we da şapateke nêzik neyê, hûn bi sikatî dest nedine (wê devê)."

65; (Ji piştî van şîretan, ewan dîsa) ewa (deva) bi jêkirin, wergerandin. Îdî (Salih ji wan ra aha) gotîye: "Hûn di xaniyên xwe da heya sê royan jî bi şahî bijîn (hûnê paşê dêriz bibin). Eva (dêrizbûna we) peymaneke wusa (rast e) qe nayê derewdêrandinê."

66; Îdî gava fermana me (bi şapatdana) wan hatiye; me Salih û ewanê, ku bi wî bawer kiribûne (ji şapat) û ji riswabûna di wê royê da bi dilovanîke ji xwe fereste kirîye, Bi rastî Xudayê te zexmê servahatî ye.

67; Ewanê cewrkar hene! (gava) Dengê (şapatê bi tirsdayî) bi wan girtîye, îdî ewan di xaniyên xwe da li ser çokan (bê can) mane.

68; (Şûna wan wusa dêriz bibû) Te digo qey di şûna wan da avayî tune bûne. Hûn hişyar bin! Bi rastî komalê (bi nav) Semûd, filetiya Xuda yê xwe kirine. Hûn hişyar bin! Dûrî (ji dilovanîya Yezdan) ji bona komalê (bi nav) Semûd ra ne.

69; Û bi sond! (firişteyên meyan) saî ji bona mizgînîyê hatine bal Îbrahîm. (Ewan firiştan ji bona Îbrahîm ra aha) gotine: "Selam." (Îbrahîm jî di bersiva wan da



aha) gotiye: "Selam." (Jîn) îdî îbrahîm qe ne hewya heya ji bona wan (firiştên saî ra) golikeke qelew e, qelandî anî.

70; Gava îbrahîm dît; ku ewan (saîyan ji bona xwarinê) destê xwe direjî li bal (wê golika qelandî) nakin, îdî (îbrahîm) ji wan (saîyan) vecinîqî, ji tirsîya ji wan (saîyan) silikî. Ewan (saîyan, gava temtêla îbrahîm dîtine; ji bona wî ra aha) gotine: "Îbrahîm! Tu ji me netirse; bi rastî em li bal komalê Lût da hatine şandinê."

71; Jina (îbrahîm) li pîya (di xebata wan da, gava ewan mijûlyan bihîst) bi wan kenîya, îdî me jî (di cara yekem da ewa jinika) bi lshaq û di pey lshaq da jî bi Yaqûb daye mizgîndanê.

72; (Jinika îbrahîm aha) gotiye: "Xwelî li minbe! Ez jineke pîr im, eva mêrê, min e: kalek e. Ezê ça zaran bînim? Bi rastî eva tiştêkî sodret e!"

73; Ewan (firiştên saî ji bona wê jinekê ra aha) gotine: "Malîyên (îbrahîm!) dilovanî û pîrozaya Yezdan li ser we ye, bi vî ra jî hêj hûn ji fermana Yezdan sodret dimînin? Bi rastî ewa pesinvanê comerd e."

74; Îdî gava ji (îbrahîm tirs çûye û mizgîniya (zaran ji îbrahîm ra) hatiye (ji bona, ku şapatê li ser komalê Lût rake, bi saîyên) me ra tekoşîn kirîye.

75; Bi rastî îbrahîm yekî xûy nermê, pîr lavakarê xwe hisparê (Yezdan e).

76; (Saîyan ji bona îbrahîm ra aha) gotine: "Îbrahîm! Tu dest ji vê tekoşînê berde. Bi sond! Fermana Xudayê te (bi şapatdana) wan hatiye û bi rastî ewa şapata, ku para dayîna wê qe çê nabe, wê ji wan ra were.

77; Û di gava (firiştên) meyên saî hatine bal Lût, Lût (bi hatina wan) bi kovanî mat maye û (tirsîya ye) ku komalê wî (ewan saîyan jî) bihetikînin. (Lût bi xweber ji xwe ra aha) gotiye: "Eva royeke dijwar e."

78; (Û di gava komalê Lût, hatina wan firiştên saî bihîstine) bi lêz hatine bal (Lût) hêj di berê da ewan (komalê Lût) tiştên sikatî dikiribûne. (Lût ji bona wan ra aha) got: "Gelê min! Îdî hûn ji Yezdan bitirsîn, ji bona hetka mêvanê min, min li bal wan riswa nekin (rûmeta min bigirin) ewan keçên minê hanênan (bi jinanî) ji bona we ra (ji van mevanan) paqijtirin. Di nava we da qe mêrekî xwezane tune ye?

79; (Komalê Lût di bersiva wî da aha) gotine: "Bi sond! Tu dizan, ku ji bona me ra di keçên te da tu mafê (hewasî) tune ye. Û bi sond! Tu dizanî ka em çi dixwazin jî."

80; (Lût ji wan ra aha) gotiye: "Xwezîka ji bona min ra hêzeke (parisvan) hebûya! Ya jî (komalêkî di dizeke zor parisvan ji bona min ra) hebûya (weyê bidîta!)."

81; (Ewan firiştên saî aha) gotine: "Lût! (qe tu netirse) Bi rastî em saîyên Xudayê te ne, bi sond! (deste wan) Nagihêje te, îdî tu bi malîyên xwe va di danekî şevê da (ji gundê xwe) derkebin ji pêştirê jina te. Bira tu kes para da nemîne (li para xwe mêze nekin). Bi rastî şapata bi wan da hatî, wê (bi jina te da jî) were. Danê (hatina şapatê) sibeh e; qey sibeh nêzîk nîne?

82; Îdî gava fermana me (bi şapatdana wan) hatiye, me ewan bi serobinî (zêr û zeber) kirin û me li ser wan da kevirên ji herya bi hev zeliqî barand (ya jî me li ser wan da rewarên ji herya kevirên bi hev girtî barandiye, ewan hemûşk bi wan rewaran nexweş ketin mirin.)

83; (Ewan heriyên bivan salixan) li bal Xudayê te berate ne (binav in). Ewa (şapata bivi awayî) dûrê cewrkaran nîne.

84; Û me (li bal welatên) Medyenê da birayê wan ê (bi nav) Şu'eyb (bi pêxemberî şandiye. Şu'eyb ji bona wan ra aha) gotiye: "Gelê min! Hûn ji Yezdan ra perestî bikin; ji bona we ra ji pêştirê wî qe tu perestvan tune ye. Û hûn pîvan û kêşan kêr nekin, bi rastî ez we berxudar û dewlemend dibînim. Bi rastî (heke hûn dest ji van xaxan bernedin) ez ditirsim, ku bi ser we da şapata wê roya, ku şapata wê hemûtî ye, were."

85; "Û gelê min! Hûn bi dadvanî: pîvan û kêşanê (xwe) pêk bînin, hûn zîyana merivan, di tiştê wan da nekin û hûn ji bona têkilîkirinê di zemîn da tevdanî nekin."

86; "Heke hûn bi rastî bawer dikin, ewan hiştine Yezdan (ji kara; ku ji kirîn û firotinê dimîne) ji bona we ra çêtir e. Bi rastî es bi xweber jî bi parisvanî li ser we çavnêr nînim."

87; (Komalê Şu'eyb bi bersivî aha) gotine: "Şu'eyb! Qey nimêja te ye fermana te dike, ku em dest ji perestîya wan tiştên bav û kalê me ji wan ra perestî dikirin,

berdin û sixurandina malê xwe wekî dilxwastina xwe nekin? Bi rastî (Şu'eyb!) tu xûynermê xuzan bûyî!"

88; (Şu'eyb di bersiva wan da aha) gotîye: "Gelê min! (ka bêjin; ku ez li we mêze bikim) hûn dibînin, heke (ji Xudayê min ji bona min ra berateke xûyayî hatibe) ez bi xweber jî li ser we beratê bim û Xudayê min ji bal xwe, dilik (rozîyên) xweş dabine min (hûn ji van dexesî bikin, bawer nekin) ka ez îdî çî dikarim bikim? Bi rastî min navê, ku ez ewan tiştên ji we ra dibêjim, nekin, ez bi xweber jî ewan tiştan bikim. Ez hey wekî hêza xwe dikarim aştî bikim û miraz bexşîya min hey bi Yezdan e, min xwe hey hispartîye wî. Û ez hey ji wî dilxwazîyan dixwazim."

89; "Û gelê min! (wusa bikin) bira ewa hemberî hatina we bi min ra nebe sedem ji bona şapatdana we, ça hember hatina komalê Nûh, ya jî komalê Hûd, ya jî komalê Salih (bûye sedema şapatdana wan). Komalê Lût ji we dûr nîne (ewan bîponîjin, ka çî hatîye serê wan)."

90; "Û (gelê min!) hûn ji Xudayê xwe baxişandina xwe bixwazin, paşê (ji kirinê xwe) li bal (Xudayê) xwe da bizivirin. Bi rastî Xudayê min dilovîne hezger e."

91; (Ewî komalî di bersiva Şu'eyb da aha) gotine: "Em bi pire wan tiştên, ku tu dibêjî pîspor nînin û em te di nava xwe da bê hêz dibînin û heke pismamên te nebûyan, bi rastî meyê te bi kevîran (bi kuştî) û ji bona te bi xweber jî, qe tu servahatin li ser me da tune ye."

92; (Şu'eyb ji bona wan ra aha) gotîye: "Gelê min! Qey pismamên min bi ser we da ji Yezdan, pirtir bi servehatîyên (ku hûn hêza pismamên min didine ber çavê xwe, hêza Yezdan jî) davêjine piştî (gohê xwe)? Bi rastî Xudayê min, ewan tiştên ku hûn bi wan dizanin (hildaye nava zanîna xwe da)."

93; "Gelê min! (qe tişteke nabe!) hûn di şûna xwe da çî dikarin, ewî bikin, bi rastî ezê jî (pêşê xwe) bikim. Hûnê bizanin ka ji bona kêra şapata riswabûnî tê û ka kîjan derewan dikin. Hûn temaşe bikin, bi rastî ez jî bi we ra temaşe dikim."

94; Û di gava fermana me (bi şapatdana wan) hatîye, îdî me Şu'eyb û ewanê ku bi wî ra bawer kirine hene! Bi dilovanîyeke ji xwe (ji wê şapatê) fereste kir. Ewanê cewr kiribûne hene! (ewî dengê şapatê) bi wan girtibû, ewan (di xaniyên) xwe da li ser çokan bê can mabûne.

95; (Wusa dêriz bn) te digo qey ewan qe di wan xaniyan da ne jîne. Bi zanîn hişyar bin! Ça komalê Semûd (bi şapatan) dûrê (dilovanîya Yezdan bûne) wusa jî (komalê ku li bajarê Medyenê rûdiniştin) dûrê (dilovanîya Yezdan bûne).

96; Bi sond! Me Mûsa bi beratên bi hêzên xûyayî va şandîye.

97; Li bal Fir'ewn û koma wî da, îdî ewa (koma wî) bûne peyrewê fermanên Fir'ewn û fermanê Fir'ewn bi xweber jî xuzan û rêber ne bûne.

98; Di roya rabûna hemûtî da (Fir'ewn) dibe pêşrewanê koma xwe, îdî (Fir'ewn, ewê koma xwe) dibe agir. Ewa şûna ku ewan çûnê, çî qa sikê şûnan e!

99; Di vê (cîhanê da) û di roya rabûna hemûtî da jî, deherandina (ji dilovanîya Yezdan) bûye peyrewê wan. Eva çîqa bexşîşeke sik e!

100; (Muhemmed!) Ewa mijûlîya serdaboriya wan (gundîyên) ku hinek ji wan hêj şopa wan heye, hinek ji wan jî qe şopa wan ne maye (dêriz bûne) heye! Eva bûyera ku em ji te ra dipeyîvin bi xweber e.

101; Û me li wan cewr ne kirîye, lê ewan bi xweber li xwe cewr kirine, îdî gava fermana Xuda yê te (bi şapatdana wan hatîye) ewan perestvanên, ku ewan ji pêştirê Yezdan ji wan ra perestî dikirin hene! Qe bi tu tiştî ewanan ji şapata Yezdan nedane paradanê (parisvanîya wan ne kirine). Ewan (perestvanên wan) ji bona wan ra hey teşqela wan pir kirîye.

102; Xudayê te gava merivên wan welatên cewrkar bigire, aha digire! Bi rastî girtina Xuda zor dilsoz e.

103; Bi rastî di van serdaborîyên (wan welatên ku hatine teşqekekirinê hene!) ji bona wan kesên, ku şapata para da ditirsîn, berateyên mezin hene (ji bo ku ewan ji wan beratan hiş hildin). Eva royeke wusa ne, ku hemû meriv ji bona wê dicivin û ewa royeke (ku hemû heyînen ezman û zemîn) di wê roye da xûya ne.

104; Û em ewê (royî) hey ji bona wî dane hijmarî para da dihelin.

105; Gava ewa roya hat, bê destûra Yezdan qe tu kes napeyîve. Îdî hinek (ji wanê civîne) bê bext in ji rêya rast derketine) û hinek ji wan jî bextiyar in.

106; Îdî ewanê bê bext hene! Ewanan di agir da nîn, di agir da ji bona wan ra navqutan, qîrîn heye.

107; Ji pêştirê heke Xudayê te nevê, ku ewan derxe; ewanê di agir da heya ezman û zemîn hebin wê bimînin. Bi rastî Xudayê te çi bivê ewî bê (kemasî) bi cîh tîne.

108; Lê ewanê bextîyar hene! ewanan di bihiştê da nin, ji pêştirê heke Xudayê te derxistina wan bivê (qe tu kes nikare ewan ji bihiştê derxe) heya ezman û zemîn hebin (ewanê jî di wura da) bimînin. (Eva) xelateke bê paşî ye.

109; (Muhemmed!) Îdî tu di pûçîya perestîya wan tiştên, ku ewan jê ra perestî dikin du dil nebe. Ça di berê da bav û kalê wan perestî (ji wan pûtan ra) dikirin evan jî wekî wan dikin. Û bi rastî emê para wan (ji şapatê) bê kemasî bidine wan.

110; Bi sond! Me ji bona Mûsa ra pirtûk (Tewrat) daye, paşê (komalê wî di biryarên wê pirtûkê da) ne wekhev bûn çê kirin. Heke peymana (şapatdana wanê, wê para da bê danê) ji Xudayê te ne borya, wê a di naha da berewaniya nava wan da pêk bihata (xelat û celata wanê bihata danê). Û bi rastî ewan bi xweber jî (di mafê wê pirtûkê da) hey bi dudilî mane.

111; Û bi rastî Xudayê te ê (xelat û celata) bê kemasî bide wan, ewan çi dikin (Xudayê te) bi kirinê wan zana û agahdar e.

112; Îdî tu ça hatî fermankirinê wusa rast be, tu jî ewanê bi te ra jî (ku ji kirinê xwe yê berê para da zivirîne) hemûşk gava da (dadvanî bin). Û hûn ji rê dernekebin, loma hûn çi bikin bi rastî (Xuda) dibîne.

113; Û (Muhemmed!) hûn xwe ne hisperên wanê ku cewr kirine (bi sedema cewrkirina wan) ku agir bi we jî negire, loma ji pêştirê Yezdan ji bona we ra tu serkar tune ye. (Heke hûn bi gotina wan bikin) paşê (ji alîyê Yezdan da) arîkariya we nayê kirine.

114; Û (Muhemmed!) tu di her du kêlekê roya da: (sibeh û evarê da) û di şevê da jî nêzikê (royê da) nimêj bike. Bi rastî qencî, sikatiyan dibin. Evan (şîretên) ji bona wanê ku şîretan litê dikin, bi rastî bîranînek e.

115; (Muhemmed!) Tu li ser wan cefadanê wan) hew bike, bi rastî Yezdan xelata wanê qenciyan dikin wunda nake.

116; Îdî heke ewan merivên ku di berya we da borîne (hişdar bûn) fermana kesan bikirinan, ji bo ku ewan di zemîn da tevdanî nekin, wê çi bûya? Ji wan hindikên, ku me ewan fereste kirine, ewan bi tenê (fermana kesan bi qenciyan) kirine. Û ewanê, ku cewr kiribûne (qe fermana kesan bi qenciyan ne kirine) ewan şixwa bûne peyrewê xweşiya ku têda bûne û ewan bi rastî sikatî kiribûne.

117; Xudayê te gundekî, ku rûniştîyên wî aşîkar bin, ewan tu carî bi cewrê teşqeke nake.

118; (Muhemmed!) Heke Xudayê te biva, wê Xudayê te ê hemûşk kes bixista komeke bi tenê, lê ewan qe nahewin, hey (di armanca da) ne wekhev dibin.

119; Ji piştirê wanê, ku Xudayê te li wan dîlovanî kirîye (ewan di armanca da xistîye komeke bi tenê). Şixwa (Yezdan) ewan kesan ji bona (ne wekhevbûn û hevçûn û belavbûnê) afirandîye. Û peyva Xudayê te pêk hatîye; ku wê dojê ji me çêtir û ji kesan hemûtî ti jî bike (eva ne wekhevbûn; ji bona pêşvaçûna kesan bi vê nevê ye, ji bona ku di cîhanê da ewa pêşvaçûna merivan ji bona xwe ra armanc kirine; ne wekhev in, hey xebatê dikin ji bo ku ji hev biborin; dizanin û pêş e, û maldarî, û ne mirin û nav û nişanan ji xwe ra bihêlin: Ça Ji dar û ber û tarîş, rewar, genê wan jî ji bona hebûn û jîna xwe ra wekî meriva dikin, ne wek hev dibin).

120; Ji bona ku em dilê te bidine hewkirinê, em ewan hemû serdaborîyên wan pêxemberên borî ji bona te ra dixûnin (ji bona ku tu ji komalê xwe, gava cewr û cefan bibînî dilê te jî hew bike firşkê te fire be). Di van da ji bona te ra maf û ji bona bawergeran jî şîret û bîrxistîneke mezin heye.

121; (Muhemmed!) Tu ji bona wanê ku bawer nakin (aha) bêje: "Hûn li ser armanca xwe çi dikin bikin, bi rastî em jî wekî armanca xwe dikin."

122; "Û hûn hêvîya (xelat û celatan, ji bona xwe ra bikin) bi rastî em jî hêvîdarin."

123; Û çi ne xûyayên di ezman û zemîn da hene! Hemûşk ji bona Yezdan ra nin û hemûşk bûyer hey li bal wî da dizivirin, îdî (Muhemmed!) tu hey ji bona wî ra perestî bike û tu hey xwe hispêre wî. Bi rastî Xudayê te ji kirinê we bê goman nîne.

## Chapter 12 (Sura 12)

1; E. L. R. (Arşa van tîpan hey Yezdan dizane. Evan beratên ku em ji bona we ra

dibêjin) hene! Bi rastî ewan berateyên wê pirtûka huzvartî ne.

2; Bi rastî me ewa (Qur'ana) bi zimanê 'erebî hinartîye, ji bo ku hûn ji wê (pirtûkê) bizanin; hêvî heye bi rastî hûn ji wê hiş hildin.

3; (Muhemmed!) ji bo ku em evê Qur'anê li bal te da diniqînin, em qencitirê serdaboryan ji te ra ji te ra dibêjin. Loma tu di berê da jî ji van (serdaboryan) bê goman bû î.

4; Gava (Yûsuf ji bona bavê xwe ra aha) gotibû: "Bavo! (min di xewna xwe da) dît, ku yanzded stêrkan û roj û hîvê ji min ra kunde dibirin."

5; (Bavê wî ji bona wî ra aha) gotîye: "Kurkê min! Xewna xwe ji bona birayên xwe ra nebêje. (Heke tu ji wan ra bejî) ewanê ji bona te ra xaxan bikin. Loma bi rastî pelîd ji bona merivan ra neyarekî xûya ye."

6; "Bi vî awayî, wê Xudayê, te, te hilbêjêre û wê (ça di xewnê da te dît) te hîne zanîna têgihandina xewna bike û we qenciyên xwe li ser te da û li ser nişa Y'eqûb da peyweste bike, ça hêj di berê da li ser her du bavên te (qenciyên xwe) peyweste kiribû; (Ewan) Îbrahîm Ishaq in. Bi rastî Xudayê te pirzanê bijejke ye."

7; Bi sond! Ji bona pirsîvanan. di serdaborya Yûsuf û birayên wî da berateyên (sodretî hene).

8; (Birayên Yûsuf aha) gotine: "Em komeke bi hêz in (tivêka me yek e) bi vî ra jî Yûsuf û bi birayê xwe va li bal bavê me, ji me heztir in. Bi rastî bavê me di wundabûneke xûya da ne."

9; "Ya hûn Yûsuf bikujin, ya jî hûn bavêjine zemînekî dûr, ji bo ku berê bavê we hey ji we ra bimîne û hûnê paşê (ji kiriê xwe poşman bibin, Xudayê we bibaxişîne) hûnê di peywî da bibine ji komalêkî aştîkar."

10; (Yekî ji wan aha) gotîye: "Heke hûn bi rastî divên (ku tişteki bi serê wî) bikin, hûn ewî nekujin, hûn ewî bavêjine tarîtiya bîrê dibe, ku hinek kerwan rastî wî werin (ewî wekî malê wundabûyî ji xwe ra hildin, beherin)."

11; (Dema xaxe xwe pêk anîne, fetilîne bal bavê xwe; ji bavê xwe ra aha) gotine: "Bavo! Çi bûye ji te ra ku tu ji bona Yûsuf bi me ewlê nabî û em bi xweber jî ji bona wî ra şîretvan in?"

12; "(Bavo! Tu) ewî di sibehê da bi me ra bişîne, ji bo ku ewa bigere û bilêyîze. Bi rastî em ji wî ra parisvan in."

13; (Bavê wan ji wan ra aha) gotîye: "Heke hûn ewî beherin, bi rastî bêhna min dernakebe, ez mirûz dibim û ez ditirsim; ku haya we ji wî tune be, gur ewî bixun."

14; Ewan gotine: "(Bavo!) Heke gur ewî bixun û em bi xweber jî komeke bi hêz in (li wura bin) bi rastî me îdî di wê gavê da zîyan kirîye."

15; (Îdî bavê wan destûra Yûsuf daye). Dema ewan bi wî ra çûne, ewan li hev civiyane, ku ewan ewî bixne tariya bîrê, (ewan Yûsuf avêtine bîrê). Me jî li bal wî da niqand: "(ne tirşe)". Bi sond! Haja wan bi xweber qe tune be tuyê evê bûyara wan e hanê ji wan ra bêjî."

16; Ewan di êvarê da bigirîn (ji bo xaxê kirine, xwe rast bidine diyarkirinê) hatine bal bavê xwe.

17; (Ji bavê xwe ra) gotine: "Bavo! Em çîqa rastbêj bin jî dîsa tu ji me bawer nakî. Bi rastî dema em çûn (me li cîyekî danî) me Yûsuf hişt li bal cîrya xwe da, em çûne (lêyîztikê); me da berhev (dema em para da hatin me dêna xwe dayê, ku) guran ewî xwarîne."

18; "(Heke tu ji me bawer naki jî) eva me kirasê wî bi xûn ji te ra anîye (xûneke bi vir li kirasê wî dabûne." Bavê wan ji wan ra) gotîye: "Bi rastî gotina we nîne, lê canê we eva xaxa xwestîye we jî kirîye. Îdî (karê min li ser vê bûyerê) hey hewa bi qencî ye. Li ser van salixên we, hey arîkarê min Yezdan e."

19; Kerwanekî hatiye li ser (wê bîrê danîye; Merivên xweyên bişkuri) şandine, ku ji wan ra (avê ji bîrê derxin). Dema bêdloka xwe avêtne bîrê (ji bo ku tijî av bikin, Yûsuf bi bêdloka wan re derket. Ewî qîr daye aha) gotîye: "Mizgîna min! Eva kureke (derket)." Ewan ji bona sermayeyê kirên û firotinê ewa veşartin û Yezdan bi xweber ji zanetirê bi kirina wan e.

20; Ewî (kerwanî Yûsuf) bi bahakî hindikê ku dihatine hijmartinê firotine. Ewan di bahayê Yûsuf da, damen ji cîhanê berdabûn.

21; Ewî misrîyî ku Yûsuf kiribû, ji bona jîna xwe ra (aha) gotibû: "Rûmeta wî rind bigire û şûna wî xweş bike, dibe ku ewa kêrê me bê, ya jî ku em ewî ji xwe ra bixne kur (bibe ûrta me, li pey me bimîne)." Bi vî awayî me ji bona Yûsuf ra di zemîn da,

bingehek pêk anî û me Yûsuf hînê zanîna xewnan kirîye. Yezdan bi xweber jî servahatê bûyera Yûsuf e, lê pirê merivan pê nizanin.

22; Û dema (Yûsuf) gihîjte sedra xwe, me ji wî ra berewanî û zanîn da. Bi vî awayî em qencîkaran xelat dîkin.

23; Lê ewa kevanîya mala ku (Yûsuf) di wura da bûye, diva ku ewa dest bavêje wê (serê xwe bi wî ra bixe yek): Derî hemû dadan (ji Yûsuf ra aha) got: "Ka îdî were nezik (çi bûye ji te ra? Nereve, were bikebe paxila min." Yûsuf) gotîye: "Ji bona Yezdan! Ka ezê ça gotina te pêk bînim? Bi rastî malxwê malê, xweyê min e; ewî qencî bi min kirîye. şûna min xweş kirîye. Loma bi rastî cewrkar fereste nabin."

24; Bi sond! Heke ewî beratên Xudayê xwe nedîta, jinikê ça va ye, ku ewa dest bavêje, ewî jî va ye li bal jinikê da here. Bi vî awayî, ji bo ku em ji (Yûsuf) sikatî û tolîtî bidine paradanê (me beretên xwe dane nîşanê wî, ewa daye parisandinê). Bi rastî (Yûsuf) ji bendeyên min ê xwurîne.

25; Û ewan (herdukan) dane berhev (heya ber) derî (revîyane. Jinikê para da bi kirasê wî girt) çirand û ewan herduk li bal derî rastê mezinê jinikê hatin. Jinikê (ji bona mezinê xwe ra aha) gotîye: "Celata wî kesê, ku bivê sikatî bi malîyên te ra bike, ji pêştirê ku bikebe zîndanê û ya jî bi şapateke dilsoz bê şapatkirinê, tu tişt nîne."

26; (Yûsuf aha) gotîye: "Ewê diva, ku ez dest bavejime wê (ez ji ber wê reviyam, ku derkebime derva, rastî te hatim)." Yekî ji malîyan dîdevanî (şahidî) kirîye; (aha) gotîye: "Heke kirasê (Yûsuf) ji ber va çirya be (Yûsuf) vira dike (jinik) ji rastbêjan e."

27; "Û heke kirasê (Yûsuf) ji para da çirya be (jinik) vira dike (Yûsuf) ji rastbêjan e (ka li bal wan da mêze bike."

28; Îdî gava (mêrik mêze kir) dît, ku kirasê ewî para da çirya ye. (Mêrikî ji bona jinikê ra aha) gotîye: "Bi rastî eva kirina, ji xaxê we jinan in. Bi rastî xaxê we jinan pir mezin e."

29; (Mêrik ji bona Yûsuf ra jî aha dibêje): Yûsuf! Tu ji van dest ber de (ji tu kesî ra nebêje)." Ji bona (jinêkê ra jî dibêje: "Tu ji bona (nûsîtemkarya xwe, ji Yezdan) baxişandina xwe bixwaze. Bi rastî tu bû î ji wanê xelêtkar."

30; (Dema jinên bajar, eva bûyera bîhistine aha) gotine: "Jina serok bi rastî bûye bengiyê berdestê xwe; (xwestîye ku serê xwe bi berdestê xwe ra bixe yek.) Loma hezkirina berdestî (hişê we ji serê we hildaye). Bi rastî em dibînin, ku ewê hişê xwe wunda kirîye. Eva jî wundabûneke xûya ye."

31; Îdî gava jinikê, gotinê wan (jinên bajarî, di mafê xwe da) bîhistîye (ku ewan jinan li wê digazinin û qencîyan jê ra nabêjin; saîyên xwe) şandîye pey wan, ji wan ra xewaneke (sifreke) bi palge û raxistî amade kirîye, ji bona her jinekî ra kêrek anîye. (Pirî ku jin hatine rûniştine, jinikê ji Yûsuf ra aha) gotîye: "Derkebe hemberê wan. "Dema ewan (jinan Yûsuf) dîtine, ewan (jinan Yûsuf) mezin kirine û (haja ji wan nemaye, kêr avêtine destê xwe) destê xwe birîne û gotine: "Ji bona Yezdan! Eva meriv nîne. Eva hey firişteki kirnas e."

32; (Jinikê ji bo jinên bajarî aha) gotîye: "Eva ye, ku hûn ji bona wî gazinda li min dîkin. Bi sond! Min ji wî, ji bona xwe ra nîyaza canê wî kiribû, ewî dawparisî kir û xwe para da. Heke ewa, ewê tiştê ku ez fermana wî dikim (ku ew ewî tiştî bike) neke, wê ewa ê bekebe zîndanê û wê ewa ê bibe ji wanê ku hatine piçûkkirinê."

33; (Yûsuf bi xweber ji xwe ra aha) gotîye: "Xudayê min! Bi rastî zîndan li bal min, ji wî tiştê, ku ewan kirina wî ji min dixwazin, hezgertir e. (Xuda!) Heke tu xaxê wan ji min nedî zivirandinê, ezê li bal wan da meyl bidim û ezê bibime ji nezanan."

34; Îdî ji bona wî ra Xudayê wî, bersiva wî daye û ji wî xaxê wan jinan daye zivirandinê. Bi rastî Xuda bîhistîyê pirzan e.

35; Ji piştî dîtina van beratan (ji bona malîyên serok) xûya bûye, ku wê ewanê (Yûsuf) heya danekî bixne zîndanê.

36; (Dema ewan Yûsuf avêtine zîndanê) bi Yûsuf ra du xort ketine zîndanê. (Ewan her du xortan xewneke aha dîtibûne; ji hev ra xewna xwe gotine çûne bal Yûsuf; ji bona ku hînê zanîna xewna xwe bibin, ji Yûsuf ra aha) gotine: "Yekê ji wan; min dît ku min tiryê meyî digivaşt (mey çê dikir)." Û ewê mayî. Min dît, ku min nan daye ser serê xwe, çûkan ji wî, nan dixwarin. Îdî tu ji van xewnan ji me ra bêje. Bi rastî em te di bînin ku tu ji qencîkaranî."

37; (Yûsuf ji wan ra aha) gotiye: "Hêj xwarina ku hûn ji wî dixun, ji we ra ne hatibe, ez ewan xwarinan ji bona we ra dibêjim, ka çi ne, (wusa jî derdikebe). Ew zanîne ku Xudayê min hînê min kirîye hene! Eva jî ji wan in. Bi rastî hûn dest ji wî komalê ku Yezdan bawer nakin û bi roya para da bûne filê, ber daye.

38; "Û ez bûme peyrewê (ola) komalê bavanê xwe, ku Îbrahîm û Ishaq û Ye'qûb e. Ji bo me yekê ra jî maf nîne ku ew tişteki bixne hevriyên Yezdan. Evan qenciyan hanênan ji rûmeta Yezdan in, li ser me û kesan kirîye, lê pirê kesan jî sipazî nakin."

39; "Her du hevalên minê zîndanê! Gelo (baweriya) bi xudayên cure cure qenc e, ya jî (baweriya) bi Yezdanekî bi tenê, ku hêzdarê li ser hemû (tiştan e) qenci?"

40; "Ewan tiştên ku hûn ji pêştirê Yezdan ji wan ra perestî dikin hene! Ewan ji pêştirê wan navdêrên, ku we û bav û bapîrên xwe li wan nav danîne, tu tişt nînin. Yezdan (di mafê wan da) qe tu tişt ne hinartiye. Hey ferman û (perestî) ji bona Yezdan ra ne. Ewî (Yezdanî) ferman kirîye, ku hûn hey ji wî ra perestî bikin. Bi rastî ola, ku maf e ewa ye, lê pirê kesan jî nizanin."

41; "Her du hevalên minê zîndanê! (rind gohdarya min bikin. Arşa van xewnên ku we dîtî eva ye): "Yekê ji we, wê dîsa meyê bide xweyê xwe, ewê mayî wê bê dardakirinê, wê (termê wiyê li derva bimîne) çûkê di serê wî da ewî bixun. Ewa bûyera ku we arşa wî ji min xwestiye; pêk hatiye (îdî qe ne qayîlbûna xwe, diyar nekin)."

42; Û (Yûsuf) ji bona wî hevalê (xwe ê zîndanê) ku guman dikir, wê ji herdukan, ewê fereste be (aha) gotiye: "Tu dabaşa min li bal xweyê xwe bike (dibe ku li min dilovanî bike, min jî ji vira derxe)." Lê pelîd Xudayê wî ji bîra wî birîye, îdî qe (mijûliya) Xudayê xwe ne kirîye. (Her wusa hevalê Yûsuf ji zîndanê derket, dabaşa Yûsuf ji bîrva kir), îdî (Yûsuf) çend salan di zîndanê da maye.

43; (Heya wê gava ku serokê misr ê aha) gotiye: "Gelî koma min! (Min di xewnê da) bi rastî dîtîye, ku hevt çêlekên qelêw hebûn, hevt çêlekên jar, ewan dixurin û min (dît) hevt weşiyên hêşîn, hevt weşiyên hişk, ewan hildane binê heza xwe. Ka ji min ra arşa van bêjin, heke hûn bi rastî ji bona xewnan ra arşa dizanin.

44; (Xewnzanan ji bona serok ra aha) gotine: "Eva xewna te dîtî, xewnerojk e û em bi xweber jî arşa xewnerojkan nizanin."

45; Û (ewî xortê) ferestebûyê: Yek yê ji wan her du hevalê (Yûsuf ê zîndanê bû) ji piştî (ewle bû ji baxisandina serok, îdî serok bi rastî ji wî ra tu celatê nade, aha) gotiye: "Ezê arşa vê xewnê ji we ra bêjim, îdî hûn min bişîne (zîndanê)."

46; (Gava ewa çûye zîndanê li bal Yûsuf, ji wî ra aha) gotiye: "Yûsuf! Dostê rastbêj: Tu ji me ra arşa vê xewna bêje; (serok aha dîtîye): Hevt çêlekê jar, hevt çêlekê qelêw dixwarin hevt weşiyên hişk, hevt weşiyên hêşîn hildane binê heza xwe (hemû hişk kirine, tune kirine). Hêvî heye, ku ez para da herim bal (wan kesên ku min destûr ji wan xwestibû ji bona hatina bal te) ewan îdî bi zanîna te, bizanin (rûmeta te bigirin, ku te ji zîndanê derxin)."

47; (Yûsuf ji saî ra aha) Gotiye: "Hûn hevt salan li pey hev (weki çandina xwe yê berê) biçînin. Îdî (ji piştî xwarina we ye vayî, hûn ewê mayî) di gava dirûnê da, di nava weşiyên wî da bihêlin."

48; "Wê pasê hevt salên werin, ewa çandina, ku we zimhêr kirîye para da (hiştîye) ji pêştirê tovê ku hûn diçînin, hemûşkan bixun."

49; "Wê pasê pey wan da salêkê were (ku ji bona) kesan ra bariştê bibare (hemî tiştê heşîn bibin, dar û ber, wê beran bidin rêzê tirya bigirin, merivê ewan tiryan ji xwe ra) bigivêşin (dîsa mexzûvanî ji bona hev ra bikin; meyê vexun)."

50; (Piştî ku saî eva arşa ji bona xwena serok ji bal Yûsuf anî, ji koma wan ra got, arşa xewnê hişê wan hildaye. Serok ji koma xwe ra aha) gotiye: "Hûn ewî ji bona min ra bînin." Îdî dema saî ji bona gazîkirina (Yûsuf çûye zîndanê; Yûsuf ji saî ra aha) gotiye: "Ka here bal xweyê xwe, îdî ji wî bipirse; ka temtêla wan jinên (li ser xwarinê) ku destê xwe jê kirinbûn, çi bûye? (Bira evê bûyerê bikole). Bi rastî Xudayê min bi xaxê (wan jinan) pîr zana ye."

51; (Serok gazî wan jinan kirîye, ji wan aha pirsîye): "Ka bêjin, di wê gava ku we dixwest Yûsuf nêzikê we be, hûn di wê gavê da di çi temtêlê da bûn?" (Jinan bersiva serok dan, aha) gotin: "Ji bona Yezdan! Qe me tu sikatî ji wî nizanbûye." (Di wê gavê da jina serok rabûye aha) gotiye: "Îdî di naha da rastî derket; bi rastî min diva ku (Yûsuf) serê xwe bi min ra bixe yek û bi rastî (Yûsuf) ji rastbêjan e."

52; (Dema saî para da çûye bal Yûsuf; gotina jinan jê ra gotiye; Yûsuf ji bona saî

re aha) gotiye: "Min evan kirnan bi cî da anînê, ji bo ku serok bizane, ku min di dizîka da jî evîxaniya wî ne kirîye û Yezdan xaxê evîxanan bi rastî nagihîne qe tu armancan."

53; Û bi rastî ez canê xwe (ji wan kirinan, ji ber xwe) denaxime paqijîyê, loma ji pêştirê wî canê, ku Xudayê min li min dilovanîyê kirîye, hemî hewasa canan fermana bi sikatiyan dikan. Bi rastî Xudayê min baxişgerê dilovîn e.

54; Û serok ji bona koma xwe ra (aha) gotiye: "Hûn ji min ra Yûsuf bînin; Ezê ewî hey ji bona xwe bi tenê ra xurî bikim. Îdî (piştî ku ewan çûn, Yûsuf anîne bal serok; Serok bi wî ra) mijûl bûye (serok di mijûliya xwe da, ji Yûsuf ra) gotiye: "Di îro da tu li bal me bi paydarî xweyê şûneke mezin î; (ji hemî xaxan jî) ewle yî."

55; (Yûsuf ji serok ra) gotiye: "Tu (verihîna min) li ser xezîneyên zemîn bike. Bi rastî ez bi parisîyê rind dizanim."

56; (Dema serok bersiva Yûsuf da, jê ra got: "Erê, me tu xistî serkarê xezîneyên zemîn, îdî tu çi divê, pêk bîne." Me litêkirina gotina Yûsuf, di dilê serok da bi cî anî) her wusa me ji bona Yûsuf ra di wê (welatî da ji pistî ferestîya wî ji zindanê) şûneke rûmetdarî pêk anîye. Ça diva wusa di zemîn da berewani dikir (loma serok gustîl û gopal û taçê seroktiyê ji bona Yûsuf ra dabû). Em bi dilovanîya xwe (evan qencîyan) digihînen evînê xwe û em kirya qenckaran wunda nakin.

57; Û ji bona wanê (bi Yezdan) bawer kirine, parisya (mafê) biryarên Yezdan dikan, kirya para da çêtir e.

58; Biranê Yûsuf (ji bona zimhêr) hatibûne bal Yûsuf, gava çûne bal Yûsuf. Îdî ewî birayên xwe nîyandin. Lê birayên wî ewî ne nîyasî bûn.

59; Dema (Yûsuf ji wan pirsî, hûn kî ne? Ewan gotin: "Em kurê Ye'qûb Pêxember in; danzdeh bira ne, birakî me li çolê wunda bû, birakî me ji bavê me heye, li bal bavê me maye.") ji piştî tevdîra wan dît, barê wan dagirt, (Yûsuf) ji wan ra gotiye: "Heke hûn carekî dinê hatin ewî birayê we yê ji bavê we ye, ji min ra bînin. Ma qey hûn nabînin va ez para wî jî dipîvim? Ez qencê mexzûvanan im."

60; "Heke hûn ewî (birayê xwe) ji min ra neynin, îdî li bal min ji bona we ra tu (zimhêr) pivandin tune ye û nêzikê min jî nebin."

61; Ewan (birayên wî, ji wî ra) gotine: "Bi rastî emê ewî ji bavê wî bixwazin; (bawer ke) emê (evê dilxwaziya e) pêk bînin."

62; Û (Yûsuf ji bona) xortên (paleyên) xwe ra gotiye: "Hûn pûlên wan bixne nava barê wan. Bi rastî hevî heye dema ewan bifetiline bal malîyên xwe, bi van (pûlan) bizanin, dibe ku para da bizivirin."

63; Dema (ewan) para da fetilîne bal bavê xwe (ji bavê xwe ra) gotine: "Bavo! Heke tu birayê me (bi me ra neşîni) wê pîvandina (zimhêr ji me ra) bê birînê. Îdî tu birayê me bi me ra bişîne ku em (zimhêr) bipîvin, bi rastî emê ji wî ra parisvan bin."

64; (Ye'qûb) gotiye: "Ez ça hêj di berê da ji bo birayê wî li we ewle bûm (ku we bir, para da ne anî) wusa jî bi sond! Ji bona vî jî ezê li we ewle bim (ma qey wusa nîne?)" Bi rastî Yezdan qencê parisvanan e. Û ewa dilovîntirê dilovanan e.

65; Dema ewan derê barê xwe vekirin. Dêna xwe dane ku pûlê wan, para da li bal wan da hatiye fetilandinê, qîr dan (aha) gotin: "Bavo! Ka îdî em çi dixwazin, eva pûlû me li bal me da hatiye fetilandinê (destûra birayê me bide, emê bi hev ra herin) ji bona malîyên xwe ra emê zimhêr bipîvin û emê parisvanî ya birayê xwe bikin û emê barê devekî jî pir bikin. Eva zimhêrê (me anîye) pîvaneke hindik e."

66; (Ye'qûb) gotiye: "Heya hûn peymanekî (sonda) bi Yezdan, ji min ra nedin, ji pêştirê heke hûn hemî bi hev ra bêne girtinê, ku hûn ewî dîsa para da ji min ra bînin, ez ewî bi we ra naşînim. Îdî gava ewan (ji bona Ye'qûb ra bi Yezdan sond xwarin, ku ewanê para da) birayê xwe (bi van girîn da) bînin. (Ye'qûb aha) got: "Yezdan li ser van gotinê me cînişte be (wekîl)."

67; (Ya'qûb) gotiye, "Gelî kurên min! Hûn di deryekî bi tenê da nekebine bajar, hûn di deriyên cure cure da bikebine bajar. Ewa şapata, ku Yezdan (peyman dabe, wê bi we da bîne) ez nikarim we ji wê (şapatê) biparisînim. Berewani hey ji bona Yezdan ra ne. Min hey xwa hispartîye wî, xwe hisparvan jî, xwe dihêspêrên Yezdan."

68; Dema ewan (bi birayê xwe va ji bona zimhêr çûne welatê Misr ê) ça bavê wan ferman kiribû; di derên cure cure da ketine bajar. Evê tedbîra hanê qe tu tiştêkî ji wan neda paradanê. Loma tiştê ku Yezdan bike, qe tu tişt pêşya wî nagire (eva

gotina hanê, ku Ya'qûb ji bona kurên xwe ra şîret kiribû) sêwrandineke, di dilê wî da pêk hatibû, ewî jî avête derva. Bi rastî tiştê me (bi Ye'qûb) dabû hînkirinê, dizanibû (ku tu tiştê pêşya fermana Yezdan nagire). Lê pirê kesan pê nizanin.

69; Dema (ewan) çûne bal Yûsuf (ji piştî hinek mijûlêya, Yûsuf) birayê xwe yê (Binyamîn) hildaye bal xwe, jê ra gotîye: "Bi rastî ez birayê te yê (ji dê û bavê me) îdî tu bi kirinê van (birayên me) dertdêr û kulkeş nebe."

70; Îdî piştî ku (Yûsuf) zimhêrê wan dagirtîye tasa av vexwarinê xistîye nava barê birayê xwe yê (ji dê û bavê. Piştî karwan rabûye, li pey wan da) yekî gazî wan kirîye: "Gelî kerwan! Bi rastî hûn diz in."

71; (Birayên Yûsuf fetilîn) berê xwe dane wan, ji wan ra gotin: "We çi wunda kirîye (hûn li çi digerin)?"

72; Ewan gotine: "Bi rastî me tasa av a serok wunda kirîye (em li wê digerin) û kê ewa (tasê) anîbe (bira bêje) emê ji wî ra barekî deva (zimhêr) bidin, ez bi xweber jî gerewa dayîne me."

73; (Birayên Yûsuf ji wan ra) gotine: "Bi Yezdan em sond dixun! Ku hûn dizanin em ji bona tevdanê di zemin da derxin, ne hatine (vî ra) û em bi xweber jî diz nînin."

74; (Ewan ji birayên Yûsuf ra) gotine: "Heke ev gotina we vir be; celata wî yê (ku tas dizî be) çi ye?"

75; (Birayên Yûsuf bersiv dane) gotine: "Tas di barê kî da derkebe, ewa gerewa tasê ye. Li bal me celatdana dizan wulo ye."

76; (Dema ewan para da çûne bal Yûsuf) îdî (Yûsuf) barê wan berya barê (birayê xwe yê ji dê û bavê) vekirîye (tiştê di barê wan da nedît). Paşê barê birayê xwe yê (Bunyamîn vekir, tas) ji nava barê wî da derxist. Her wuha me ji bona Yûsuf ra endeze kirîye (xax) ku birayê xwe hilde bal xwe. (Heke wuha nebûya) ji pêştirê vîna Yezdan qe bi tu awayî (Yûsuf nikarî bû) di wan biryarên serok da (birayê xwe hilda bal xwe). Bi vî awayî em payên evîne xwe bilind dikin û li ser her zanakî ra zanakî bêhtir heye.

77; (Birayên Yûsuf aha) gotine: "Heke evî dizî be, hêj berê da jî birakî wî hebû, ewî jî dizî kiribû. Û îdî Yûsuf eva gotina wan di hundurê xwe da veşartîye û gotina wan ji bona wan ra venekirîye (Yûsuf) gotîye: "Hûn bi rastî di sikê şûnandan in." Yezdan bi wan salixên we çêtir dizane."

78; Ewan (ji Yûsuf ra aha) gotine: "Ezîz! Bi rastî bavekî wîyê kal ê pîr heye, îdî heke tu yekî ji me di şûna wî da bigirî (tu bi me ra qencî dikî). Bi rastî em dibînin ku tu ji qencîkaran î."

79; (Yûsuf) gotîye: "Ji bo Yezdan! Ka ça dibe: Em di şûna wî yê ku me di nava barê wî da (tasa xwe) derxistîye, yekî mayî bigirin? Heke em wusa bikin di wê gavê da em cewrê dikin."

80; Îdî gava ewan (ji bona berdana birayê xwe, ji Yûsuf) bê hêvî mane, di cîyekî da hevdu tenê kirine; (Birayê) wan ê mezin (ji bona wan ra aha) gotîye: "Qey hûn nizanin, ku bavê we bi sond ji we peyman standîye, hêj berê da jî, ji bona Yûsuf ji we standibû (we kirinê xwe bi serê Yûsuf da anî! Ka vê carê emê bi çi rûyî herne bal bavê xwe)? Îdî (hûn herin bi sond!) ez ji vî zemînî ranagetim; heya bavê min destûra min nede, ya jî Yezdan canê min nestîne. Û ewa qencîrê berewanan e."

81; "Hûn para da herin bal bavê xwe, îdî jê ra bêjin: "Bavo! bi rastî kurê te dizî kir, me (bi çavê xwe dît, ku tas di nava barê wî derket, tiştê mayî em nizanin) û em bi xweber jî, ji bona tiştên, ne ber çavî parisvan nînin."

82; "(Heke tu ji me bawer nekî, hez kî) ji wan gundîyên, ku me (barê xwe li wura, dagirtîye) û ji wî kerwanê ku em bi hev ra hatine, bipirse. Bi rastî em rast dibêjin."

83; Dema (ewan para da hatine bal bavê xwe, gotina birayê xwe ji bavê xwe ra gotine, Ye'qûb aha) gotîye: "Bawer ke canê we ji bona we ra wusa xemilandîye, we jî eva bûyera (kirîye) îdî (ji bona min ra) hey hewa bi qencîya maye. Hêvî heye ku Yezdan ewan hemûşkan bi hev ra ji min ra bîne. Bi rastî hey zanayê bîjejke Yezdan e."

84; Û (Ye'qûb) piştî xwe daye wan (aha) gotîye: "Ax, kovan li ser Yûsuf (îro roya te ye, were ka Yûsuf tu li kêderê yî?) Ji hesreta (Yûsuf) her du çavê wî sipî bûn û bi xweber jî kula xwe vedişart."

85; Ewan (kuran ji Ye'qûb ra) gotine: "Bi Yezdan! Tuyê Yûsuf bînî bîra xwe, bi bihatin jar bî, nexweş bikebî, ya jî bi serê te da teşqelake were."



86; (Ye'qûb ji wan ra) gotiye: "Bi rastî ez gilî û kul û kovanê xwe hey ji Yezdan dikim, tiştê ku hûn qe pê nizanbin, ez (bi sedema) Yezdan ji we çêtir dizanim!"

87; "Gelî kurên min! Hûn herne (bajarê Misrê) îdî hûn di wura da (dizîka da) ji Yûsuf û ji birayê wî kolandina bikin û hûn ji dilovaniya Yezdan bê hêvî nebin, ji pêştirê filan, tu kes ji dilovaniya Yezdan bê hêvî nabin."

88; Îdî dema ewan (dîsa fetilîne Misrê) çûne ketine (xaniyê Yûsuf; jê ra) gotin: "Wezîr! Bi me û bi malîyên me da xelayî hatiye, em jî bi pûlekî hindik hatine, vê carê tu jî me ra zimhêr bi hemûtî pêk bîne û tu jî me ra qencî bike, bi rastî Yezdan qencîkaran xelat dike."

89; (Yûsuf) ji wan ra dibêje: "Gelo hûn dizanin ka we çi bi serê Yûsuf û birayê wî kirîye? Bi rastî hûn di wan gavan da nezan bûn."

90; (Ewan birayên wî) gotine: "Qey tu! Tu bi rastî Yûsuf nînî?" (Yûsuf) got: "Erê, ez Yûsuf im, eva jî birayê min e. Bi sond! Yezdan bi me qencî kirîye (em parisandine û mezin kirine) bi rastî kî (ji Yezdan bitirse û li ser cefadana di rêya wî da) hew bike, îdî bê dudilî (Yezdan) kirya qencîkaran wunda nake."

91; (Ewan birayên Yûsuf) gotine: "Bi Yezdan em sond dixun! Ku ewî tu li ser me, paydar kirîyî. Bi rastî em bi xweber jî nûsîtemkar bûne."

92; (Yûsuf ji wan ra) gotiye: "Di îro da ji aliyê min da, ji bona we ra qe tu (rexne û kemasi) tune ye. Yezdan we bibaxişîne. (Û ewa) dilovîntirê dilovanan e."

93; "Hûn bi vî kirasê min ê hanê va herne (welatê xwe). Hûn ewî kirasî bavêjine li ser çavê bavê min, ku çavê wî vebin û hûn hemûşk malîyên xwe hildin bêne bal min."

94; Dema ku karwanê wan ji Misrê raqetîyan, bavê wan gotiye: "Gelî (malîyên min!) heke hûn nebêjin: "te hişê xwe wunda kirîye" bi rastî bêhna Yûsuf hate min."

95; (Ewan ji Ye'qûb ra) gotine: "Bi Yezdan! Hêj tu di wê wunda bûne berê da nî."

96; Îdî gava mizgînan hat; (kirasê Yûsuf avête) ser çavê (Ye'qûb) 'ewîl çavê wî vebûye. (Ye'qûb ji malîyên xwe ra) gotiye: "(Hêj berê da) min jî bona we ra qey ne gotîbû: "Tiştê hûn qe pê nizanin, ez jî Yezdan dizanim?"

97; Kurên Ye'qûb, jê ra gotine: "Bavo! Bi rastî em nûsîtemkar in, îdî tu ji bona baxişandina me (ji Xudayê xwe) lava bike."

98; (Ye'qûb ji wan ra) gotiye: "Ezê ji bona baxişandina we ji Xudayê xwe di nêzîk da lava bikim. Bi rastî Xudayê min bi xweber jî baxişkarê dilovîn e."

99; Îdî gava (hemûşk) bi hev ra çûne (welatê misrê): çûne bal Yûsuf. (Yûsuf) dê û bavê xwe dane ber hemêza xwe (ji wan ra) gotiye: "Bi vîna Yezdan, bi ewletî bikebine (bajar) ê misrê."

100; (Yûsuf) dê û bavê xwe bilind kirîye danîye li ser text, ewan ji Yûsuf ra kunde birine. (Yûsuf ji bona bavê xwe ra) gotiye: "Bavo! Arşa we xewna ku min berê da dîtîbû, eva ye. Bi sond! Xudayê min ewa rast derxistîye û bi sond! Xudayê min bi min qencî kirîye. Loma ji piştî ku pelîd nava min û birayên min da tevdanî kiribû (ewan ez avêtime bîrê, paşê ez ketime zîndanê. Xudayê min) ez ji zîndanê derxistim û hûn ji beryê anîne bal min. Bi rastî Xudayê min çi bivê, ewî bi hûratî dike. Bi rastî Xudayê min pirzanê bijejke ye."

101; "Xudayê min! Bi rastî te jî min ra pareke ji seroktî û maldan daye û te parek ji hînkirina arşa xewnan daye min. Afirandeyê ezman û zemîn hey tu î û serokê min ê di cîhanê û para da hey tu tenê î. (Xuda!) Tu min bi misilmanî bimirîne û min bigîhîne aşîkaran."

102; Ewan tiştên me li bal te da (di dabaşa vê bûyerê da) niqandîye, ji wan (axiftinê) ne xûya ne. Loma dema ewan civîyan, ku xaxan (bi serê Yûsuf) bikin, tu li bal wan ne bû yî.

103; Tu çîqa bixwazî, hey pirên kesan bawer nakin.

104; Tu (Muhemmed!) ji wan, ji bona (xundina biryaran) tu kirye naxwazî. Ewan (biryaran hemî) ji bona hemî kesan ra (şîret) û bîrdaxistin in.

105; Çîqa beratên (mezin) di ezman û zemîn da hene! Ewan li ser wan da diborin (qe bawer nakin) piştê xwe didine wan (ji wan hiş hilnadin, wê çê ji vê bûyerê hiş hildin?)

106; Heya pirê ji wan, hevalan ji Yezdan ra çê nekin, bawer nakin.

107; Îdî gelo heke bi ser wan da ji Yezdan şapateke, ku ewan (hemûşkan hilde nava xwe da) were, ya jî nişkê va danê (wêranbênê) bi wan da were, qe haja wan bi xweber jî (bi hatina wê) tune be: dikarin xwe biparisînin ewle bin?

108; (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Eva rêya min e, ez (bi zanîn û) dîtîn

(komalan) gazî bal rêya Yezdan dikim. Ez û peyrewê xwe va, Yezdan ji hemî kemasîyan paqij dikin. Bi rastî ez ji wanê hevriçêker nînim."

109; (Muhemmed! Ewan çima ji pêxemberîya te sodret dimînin?) Me çîqa pêxember di berya te da şandine, ewan jî mîrên ji gund û (bajaran) bûne, me li bal wan da niqandiye. Îdî qey ewan di zemîn da nagerin, ku li paşya wan kesên berya wan da borîne mîze bikin. Û bi rastî ji bona wan kesên (xudapariz) bingaha para da çêtir e, qe hûn hiş hilnadin?

110; (Heya hinek danan ewan bi serê xwe mane, ji bona vê mayîna hanê bira nexapin. Ewanê berya wan da jî wusa ji wan ra mecal hatibû dayînê, lê dema) ku pêxember ji (bawerîya) wan bê hevî mane û goman kirine, ku ewa (koma wan) bi rastî ewan didine derewdêrandinê bawer kirine ku ji wan ra qe tu şapat nayê îdî ji bona pêxemberan û peyrewê wan ra cefa dane) paşê ji bona (pêxemberan ra) arîkarîya me hatiye. Îdî ewanê, ku me vaye fereste bin, fereste bûne. Bi rastî ji komalê nûsîtekar, heza me ya şapatê nayê zivirandinê.

111; Bi sond! Di serdaborya (pêxemberan da) ji bona xweyê hişan beratên sodret hene. Loma ewa (Qur'ana) mijûlyeke alozek e nîne. Û lê ewa rastdarê ji bona wan (pirtûkên) berya wê da borîne. Ça jî ewa ji bona hemû tiştan ra huzwartin û dave kirine. Û ji bona komalekî bawer dikin rêber û dilovînek e.

### Chapter 13 (Sura 13)

1; E.L.M.R. (Arşa van tîpên ji hev çûyî, bi rastî hey Yezdan dizane.) Ewan beratên pirtûkê (Qur'anê) ne. Û ewan (biryaran) ji Xudayê te li bal te da hatin hinartinê (hene!) ewan rast in. Lê pirên kesan bawer nakin.

2; Ewê ku hûn ça dibînin, ezman bê stûn bilind kirîye, ewa Yezdan e û paşê ewî arş (mana) hildaye binê heza xwe (hemî tişt hildaye binê heza xwe ça bivê wusa ewan dixebitîne, her wusa) roj û hîv jî xwe ra ser nerm kirîye, hemûşk jî bona danê navdayî diherikin diçin. (Yezdan) bûyerên (afirandok) pêk tîne. (Ewa ewan) beratên (ji bona we ra) vedike, bi rastî hevî heye, ku hûn bi rast hatina Xudayê xwe bizanin.

3; Û ewê zemîn raxistîye (ewa Yezdan e). Ewî di zemîn da çiyayên binecî û çem bi cî kirîye û di zemîn da ji hemî beran bi zotî û cotî ewî pêk anîye; (hemî tişt bi nêr û mîyîti afirandiye) şev û ro li hev dide pêçandinê. Bi rastî ji bona komalê ramankar ra di wan kirinan da beratên (sodret) hene.

4; Û (Yezdan) di zemîn da parên mezinên, ku nêzê hev in pêk anîye û rêzên ji tiryan û zevîyên çandî û darên xurman e bi heçî û be heçî bi cîh kirîye (ewan hemî jî) bi aveke tenê tene avdanê. (Lê) me dixwerin û rengê wan da; hinekê wan li ser hinekên wan dane çêtir kirinê. Bi rastî di van da ji bona komalê ku hişdarî dikin, beratên (sodret) hene.

5; Heke (ji piştê gotina van beratên, ne bawerîya wan; Muhemmed!) te sodret bike, îdî gotina wanê, ku dibêjin: "Qey gava (em bimirin bibine) xwelî, qey dîsa emê carekê dinê bêne afirandinê? Sodrettir e." Ewan kesên ku bi Xudayê xwe bûne filê hene! Ewan bi xweber in, ewanan ew in, ku di stûyê wan da zincîr hene. Ewan hevalê agir in û wê di agir da jî hey bimînin.

6; Ewan (filan çîqa tu ji wan ra dibêjî: "Heke hûn ji van kirin û bawerîyên xwe para da neyên, wê Yezdanê ji bona we ra şapatan bîne, heke hûn poşman bibin, we Yezdanê qencîyan bi we bike" dîsa) ji te di berya qencîyan da, sikatîyan dixwazin. Bi sond! Di berya wan da pir hecwekî ji wan borîne (gelo çima ji wan hecwekîyan hiş bilnadin?) Bi rastî di hemberê cewra kesan da Xudayê te, ji bona kesan ra baxîşkar e. Û bi rastî Xudayê te zor şapat e.

7; Ewanê bûne file hene! (aha) dibêjin: "Heke ji Xudayê wî (wekî me ça diva) berate bihata hinartinê (meyê bi wî bawer bikira". Muhemmed!) tu hey (hatî şandinê) ji bo ku tu (ewan bi hatina şapatan) bide tirsandinê. Û ji bona her komalekî ra rêberek heye.

8; Tiştê ku hemî mî pe avis dibin û tiştê malberxa wan kêr û pir dike (ji bona mezinatî û jînê pir dike tiştê bermaî jî davêje derva) hey Yezdan pe dizane. Û hemû tişt li ba (Yezdan) bi pîvan in.

9; Ewa bi dizî û xûyanan dizane, mezinê bilind e.

10; Li bal wî ku yek ji we (mijûliyên xwe) dizîka da bike, ya jî eşkere mijûl be, yek e (hey dibihê). Û çî bi şev xwe veşêre, ya jî bi ro derkebine şûnên xwe (bêne

xûyandinê yek e hemûşkan dibîne, di şûna wan da bi cî datîne).

11; Ji bona van tiştan ra peyrewên pêşvaçûyî peywestî hene, ku ewan peyrewan ewan tiştan ji bûyerên Yezdan diparisînin. Bi rastî Yezdan heya komalek; tiştê babetê xwe, bi xweber nede heşivandinê, ewê qencîya kirî ji wan nade heşivandinê. Û Yezdan bivê ku sikatîyê bi komalekî bike, tu kes îdî nikare ewê sikatîyê ji wan bide para danê. Şixwa ji pêştirê wî jî ji wan ra tu parisvan û serkar tune ye.

12; Ewê ku berqetavê bi tirs û bi xwastin bi we dide dîtîne, heye! Ewa Yezdan e (gava hûn berqetavê dibînin; hinek ji we ditirsin, ji bona lêdana birûşkê, hinek ji we jî divên, ku berqetav lêxe, ji bona ku şilî bibare) û ewan (berqetavan) ewran bi giranî tijî dikin diweşînin.

13; Dengê ewran (Yezdan) bi sipasî ji kemasîyan paqij dikin û firiştan jî ji tirsan sipazîya (Yezdan) dikin. Ewa teyrokê dişîne, îdî kîjanî (ewî lêxistina wî va ye) teyrok li wî dixê (bi vî ra jî ewan di mafê Yezdan da) hêj tekoşin dikin. Bi rastî Yezdan zor hembervan e.

14; Bi rastî gazîkirina mafî (hey ji Yezdan ra ne). Ewanê gazî pêştirê (Yezdan dikin hene!) bi tu tiştî bersiva wan (ji aliyê gazîvanan) nayê danê. (Hecwekîya wan aha ne): Wekî wîyê ku mişta xwe vedike, ji bo ku av bigêhêjê devê wî, dirêjî avê dike, devê wî bi xweber jî (bi dirêjkirina mişta wî li bal avê da) nagihêje, (divê ku kulma xwe tijî ke bîne devê xwe, paşê bi lêvê xwe avê vebixwe). Û gazî kirin û perestîya filan hey rê wunda bûne.

15; Û di ezman û zemîn da çi hene! Hemû bi zor û hêsanî û sîhê wan jî, di sibe û êvaran da, (kurt û dirêj dibin) ji bona Yezdan ra kunde dibin.

16; (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Gelo Xudayê ezman û zemîn kî ye? (Heke hûn dizanin ka ji min ra bêjin." Ewan ji bersivê bê hêvî dimînin, îdî tu ji wan ra aha) bêje: "Xudayê ezman û zemîn) Yezdan e." (Paş da tu ji wan ra aha) bêje: "Îdî hûn çar jî pêştirê (Yezdan, perestevanên) ku ewan ji bona xwe ra jî kar û zîyanê nikarin bikin, ji xwera perestevan digirin? (Heke ewan ji doza xwe para da ne hatin, tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo (merivên) kor û bi çav (di dîtîne da) wekî hev dibin? Gelo qe tarî û ronahî wekî hev dibin? Ya jî ewan hinek hevri jî Yezdan ra çê kirine, ewan hevriyan jî wekî Yezdan (tiştan) diafirînin, îdî afirandina tiştan li bal wan wekî hev bûne (ji hev dernaxin: kîjan Yezdan afirandine, kîjan hevriyan afirandine. Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Afirandokê hemû tiştan Yezdan e. Lê ewa servahatê bi tenê ye.

17; (Ji wan ra bêje: "Hecwekîya perestî ya Yezdan û perestîya pûçan aha ne; wekî çar) av ji azmanan dihinire, îdî leyî dikişê dikebe newalan, şirik çê dibin, paşê leyî bi belqoqî kef digire (av dimîne, kef diçe). Wekî (gava ku hûn ji xwe ra bivên) xişir û dezgahan çêkin, hûn li ser madenan agir pê dixin, madenan dibahitînin (helandin) li ser rûyê madenan to digire (dema xebatê) to diçe, Lê maden dimîne, perestîya Yezdan û perestîya pûçan bi vî awayî ye (perestîya Yezdan dimîne. Lê perestîya pûçan diçe kêr nayê.)" Her wusa Yezdan ji bona wan tiştên veşartî heçwekîyan vedike.

18; Ji bona wanê, ku bbersiva Xudayê xwe dane, qencê xelatan heye. Ji bona wanê bersiva Xuda ne dane, heke hemî heyînen di zemîn da hene, wekî wan dîsa hebin jî ewanê (ji bo ku xwe ji şapata Yezdan fereste bikin) wê hemûşkî di şûna xwe da bidin. Hey ji bona wan ra sikê çelatan bi hijmarî heye û şunwarê wan hey doj e. (Doj çiqê) sikê hêlanan e!

19; Qe ewê dizane tiştê ji Xudayê te li bal te da hatiye hinartinê rast e, wekî wî yê, ku kor e (dibêje: "Ewa ne rast e)" dibe? Evê hey xweyê hiş bîra xwe tînin.

20; (Xweyê hiş) ew in, ku peymana dane (Yezdan, bi yekatîya wî) pêk tînin û peyman dayî naşikênin.

21; Û (ewanê xweyê hiş) tiştê, ku Yezdan fermana gîhîjtin û gîhandina wî kirîye, pêk tînin û digihînin (ji bîra û pismam û merivan, gîza xwe nabirin, sertêdan û serdana wan ra diçin) û ji Xudayê xwe ditirsin û xwe ji sikê hijmaran diparisînin.

22; Û (ewanê xweyê hiş) ji bona qayîlbûna Xudayê xwe (li ser perestîya wî) hew dikin (wekî çar hatine fermankirinê wusa) nimêj dikin û bi dizî û eşkere ji wan rojiyên me daye wan ji hewcan ra disixwurînin û ewan sikatîyan, bi qencîyan diborînin. Serfirazîya para da ji bona ra ne.

23; (Serfirazîya para da ev e;) ku ewan û tevê wan bav û da û zar û zonên xweyên aştîkar va dikebine bihiştê xweşîyan, firişte jî di hemû deryan da dikebine bal

wan.

24; (Ji wan ra aha dibêjin): "Bi sedema hewa we ye (cîhanî, ka mêze bikin Yezdan dawya cîhanê ça ji we ra) qencî anî, îdî hûn bijîn."

25; Ewanê ku (di cara yekem da peyman dane Yezdan, gotine: "Tiştê me dayî, bê dudilî emê pêk binin." Paşê) peymana xwe şikênandine û tiştê Yezdan fermana gîhandina wî kirîye, ewan birîne (gîhandinê pêk naynin, di şûna wî da di nava bira û pismaman da) di zemîn da têkilîkirinê çê dikin (ewan berê hev didin) hene! Ji bona wan ra deherandina ji (dilovanîya Yezdan) heye û ji bona wan ra sikê xaniyan heye.

26; Ewê ku rojînan bi vîna xwe ji bona (heyana ra) kêr û pir dike, ewa Yezdan e. Ji ber piratiya rojînan) ewan bi jîna cîhanê şa dibin, jîna cîhanê jî (li ber jîna para da) ji pêştirê pînan tu tişt nîne.

27; Ewanê bûne file hene! Dibêjin: "Heke ji Xudayê (Muhemmed) wekî (ça em divên berate bihatinan, dibû ku me bi wî) bawer bikira, çi dibû ku berate bihatinan?" (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Bi rastî Yezdan (rê) wundabûna kî bivê (rêya wî) wunda dike. Û ewanê bi dilê xwe li bal wî da fetilî bin, tîne rêya rast."

28; (Ewanê hatine rêya rast, ew in ku bi Yezdan) bawer kirine û dilê wan bi bîranîna Yezdan hew dike. Hişyar be! Bi rastî dil, bi bîranîna Yezdan (li ser teşqelân) hew dike.

29; Ewan kesên ku bawer kirine û karê aştî kirine hene! Ji bona wan ra (evan gotinê hanê hene!) "Xwezîya me bi wan hatî, ji wan ra êwirên qencî hene."

30; (Me ça di berya te da pêxember şandibûn) wusa em te jî li bal komalekî ku filetiya (Yezdanê) dilovan dikin, di berya wan da jî pir kom borîne, dişînin, ji bo tiştê me li bal te da hinartîye tu ji wan ra bixûnî. (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Ewa (Xudayê dilovan) Xudayê min e; ji pêştirê wî tu (yezdanê babetê perestiyê) tune ye. Min xwe hispartîye wî, hey (para hatina ji sikatiyan) li bal wî da ne.

31; Û ewan (filan aha gotine: "Heke Muhemmed! Ça Qur'an , anîbû) bi Qur'anê ra çîya (li dorê me) rabûnan (me ji xwe ra zevî biçandinan, cîhê me fire bibûya) ya jî ji me ra hinek zemîn biqetanda (di nava wî da çemê av ê bikişîyan me bireşanda) ya jî mirî (rakira bi me ra) mijûl bibûnan (meyê bawer bikira û ewa dibû Qur'an )." Lê fermana (van bûyeran) hemî jî ji bona Yezdan ra ne. Îdî qey ewanê bawer kirine negihîjtinê, ku heke Yezdan biva, wê hamû kesê (ji aliyê Yezdan da) bihatina rêya rast. Ewanê bûne file hene! Ji piştî wan, heke nişkeva şapatek li wan kebe, ya jî nêzê welatê wan aşîtek bikebe, heya danê peymana hatina wê aşîte neyê, ewa aşîta bi ser wan da nayê. Bi rastî Yezdan ji peymana daye para naçe.

32; Bi sond! Bi wan pêxemberên berya te da borî jî hatiye tinazkirinê, îdî me jî ji bona wanê bûne file ra mecal daye, paşê ewan me bi şapatan girtin. Îdî (mêze bike) ka şapatê min (ji wan ra) çane!

33; Îdî (mêze bike) qe ji bona wî (Yezdan)ê ku li ser hemî candaran bi kirina wan (dîdevan e, hevri tene çekirinê? Ewan (filan) ji bona Yezdan ra jî hevri çê kirine. (Muhemmed! Tu ji wan ra bêje): "Ka, navan li wan (perestvanên xwe bikin, ku em mêze bikin alyekî wanê babetê perestiyê heye?) ya jî gelo hûnê bêjin: "Tişt di zemîn da hene, Yezdan bi wan nizane?" Ya jî hûn hey peyvên belaş dibêjin? Gotina wan nîne. Bi rastî (pelîd) ji bona wanê file ra kirinê wan daye xemilandinê (endezeyên wan xweşik tîne xuyandinê) û ewan ji rêya wî hatine fetilandinê. Û Yezdan kîjanî wunda bike, îdî ji wî ra qe tu beled tune ye.

34; Di jîna cîhanê da ji bona (wanê rê derketî ra) şapatek heye û bi sond! Şapata para da hêj zortir e. Tu parisvanê ku ewana ji şapata Yezdan biparisîne, tune ye.

35; Hecwekîya we bihiştê, ku ji bona wanê xwe (ji bê fermanîya Yezdan) parisandine hatiye peymandanê (eva ye): "Di binê (darê) wê da çem dikişin, xwurek û sîhiyên wê her hene." Encama wanê xwe paris, eva ye. Encama filan jî agir e.

36; Ewanê (ku me di berê da ji wan ra pirtûk şandiye) bi vê pirtûka me li bal te da niqandiye şa dibin. Lê ji partiyan hinek hene! Ku bi hinekî (Qur'anê) bawer nakin. Tu (ji wan ra) bêje: "Ez hatime fermankirinê, ku ez bi rastî perestîya Yezdan bikim û ez ji wî ra hevriyan çê nekim, ez hey li bal (Yezdan da) gazî (we) dikim û ewra (para da) hey (li bal Yezdan da ne)."

37; (Me di berya te da pirtûkên hizger bi ezmanê komal ê wan li ser wan da hinartîye) wusa jî me ser te da pirtûka (bi nav Qur'anê bi zimanê) Ereban hinartîye (ji bo ku tu bi wan biryarên wê, fermanê) berewanî bikî. Heke ji piştî, ku ji te ra zanîn hatibe, paşê tu bibî pewrewê (hewesa filan) îdî ji bona te re tu parisvan û

serkarê, ku te (ji şapata) Yezdan fereste bike tune ye.

38; Û bi sond! Di berya te da jî (ewan pêxemberên wekî te meriv bûn) me li bal (kesan da) şandine ji bona wan ra jî jin û zar û ûrt me dane. (Ewan filan çi dibêjin bila bêjin, tu nexeyîde). Tu pêxemberek nikare bê destûra Yezdan beratên, ku meriv bi (pêkanîna wan bêzar dibin) bîne. (Ewan danê şapatê dipirsin, heya danê wan şapatan neyê, şapat bi wan da nayê) loma ji bona her bûyerekî danê (hatina wê) heye.

39; (Ku ewa bûyera di wî danî da tê û di wî danî da diçe). Yezdan bi vîna xwe, tiştê ku bivê (di wan dana da) diheşîvîne û tiştê bi mayîna wan bivê (ewan jî heya danê wan dihîle), Dayîka wan şixwa li bal Yezdan e: (di gewdê hemî heyên da genê pîvandayî hene. Yezdan ji wan genan kîjane pîr bûye, ya jî danê mirîna wî hatîye, ewî di wî danî da dimirîne paşê hinek genên jîndarî, di şûna wan genên mirî da bi cîh dike. Her wusa ewan heya danê para da bi pîvayî tîr û diçin. Lê dayîka wan genan di şûna xwe da dimîne).

40; Heke em hinekî ji wê şapata ku me ji wan ra peyman daye (ji ber ku ewan bi te bawer nakin, bi wan da bînin); bi te bidîne dîtîne, ya jî hêj te ewa şapata nedîtîbe, em canê te bistînin, qe tu kovan tune ye, li ser te hey (eva heye), "Gelo te ewan biryarên me, ji wan ra gotîye ya ne gotîye?" Hijmara (xelat û celata wan jî) li ser me ye.

41; Ma qey ewan nabînin, ku em zemîn tînin; li doranê wî em kêrî dikin (ava ya em kavil dikin, ciwanan em kal dikin, dimirînin, zemînê wan ji destê wan derdixin, dixine destê hinekê mayî). Yezdan (bi van biryaran) berewanî dike. Tu kesê bikebe pey fermanê Yezdan bide para tune ye. Ewa zû hijmarê (van biryaran e).

42; Bi sond! Ewan (fileyên) di berya wan da jî endeze kirine (ku pêxemberên xwe, bixapînin). Lê hemî endeze (di zanîna) Yezdan da nîn. Can çi ked bike ew bi wî dizane. Wê fileyî jî bizanin ka dawya wê cîhanê ji bo kî re ne!

43; Ewanê bûne file hene! (Muhammed! Ji te ra) dibêjin: "Bi rastî tu (ji bal Yezdan da li bal me da bi pêxemberî) ne hatî şandine." (Tu ji wan ra) bêje: "Di nîveka min û we da bi nêhrewanî (şahid) Yezdan û ewê zanîna pirtûkê li bal heye, bes e.

#### Chapter 14 (Sura 14)

1; E.L.R. (Hey Yezdan bi arşa van tîpan dizane). Me eva pirtûka li bal te da hîmartîye, ji bo ku tu kesan bi destûra Xudayê wan, ji tarîtiya (ne zanîn û filetiyê) li bal ruhnaya (zanîn û baweriyê da) derxî (ewa jî) rêya Xudayê servahatê pesinvan e.

2; Ewa Yezdana (Xudayekî wusa ne) ku hemû tiştên di ezman û zemîn da hene ji wî ra nîn. Ji bona şapata (Yezdan e) zor, xwelî li wan filan be!

3; (Ewan file yên wusa nîn) jîna cîhanî, ji jîna dawyê pirtir hez kirine. (Ewan) divên, ku rêya Yezdan (li ber kesan xar bikin û) bigirin. Ewanan bi rastî di rê wundabûneke dûr da nîn.

4; Me çiqa pêxemberek şandibe, hey ewa bi zimanê komalê xwe hatîye şandinê, ji bo ku (bizane fermanê me) ji wî koma xwe ra veke (û bi zanîn ji wan ra bêje): "Îdî Yezdan ji kê ra bivê ewî ji rêya (rast) dûr dixê û ji kê ra jî bivê ewî tîne rêya rast." Bi rastî (Yezdan) servahatê bijejke ye.

5; Bi sond! Me Mûsa bi beratên xwe va (bi pêxemberî li bal koma wî da) şandîye. (Me ji Mûsa ra got: "Mûsa!) Tu komalê xwe ji tarîtiya (nezanî û koletiyê) li bal ruhnaya (zanîn û azadiyê da) derxe û tu ewan royên (ku di wan royan da, şapat bi wan komalê file da hatîye) bixe bîra, wan. Bi rastî di van da ji bona hemû kesê (ku li ser şapatan) hewdarî kirine û sipazîya (Yezdan) kirine, beratên sodret hene."

6; Û di gava Mûsa ji bona komalê xwe ra (aha) gotibû: "Gelê komalê min! Dema Fir'ewn û bi komalê xwe va hûn bi sîke şapatan didane cefadanê bîra xwe bînin. Loma ewan zarên we yên kurîn dikuştin û jinê we jî para da bi rindî dihîştin. Yezdan bi we qenc kir hûn ji wan fereste kirin. Bi rastî (di van şapatan da) ji Xudayê we, ji bona we ra ceribandineke mezin heye."

7; Û (gelî cihûyan! Xudyê we gavekî ji bona we ra aha) gotibû: "Heke hûn li ser wan (qenciyên ku min ji we ra kirîye) sipazî bikin, ezê ewan (qenciyên) ji bona we ra pîr bikim û heke hûn nankorî bikin (bi rastî agaha we hebe) şapata min pîr zor e."

8; Mûsa (ji koma xwe ra aha) gotîye: "(Gelê min!) heke hûn hemû û bi wan heyînen di zemîn da hene, nankorî bikin jî (bizanin! Bi rastî) Yezdan ji hemû (heyînen cîhanê

û ezmanî) bê perwa ye û pesinwan e."

9; "Qey zanîna bi serdaborya wan (pêxemberên) berya we da bûn, ji bona we ra ne hatîye (ka ewan çî bi serê wan pêxemberên xwe kirine? Ewan komalan); Komalê Nûh û Ad û Semûd û ewan komalên pey wan da hatî, ji pêştirê Yezdan tu kes bi hijmara wan nizane. Pêxemberên wan (bi beratên) daveker va hatibûne bal wan (ji wan ra şîretên bi qenciyan dikirin). Îdî ewan komalê wan (pêxemberan ji hêrsa) destê xwe danîne ser devê xwe (Qîr dane wan pêxemberên xwe, ji wan ra gotine: "(Bes in, ewan şîretan nekin, em bi wan şîretên we gēj bûn). Bi rastî em bi wê tiştê ku hûn ji me ra dibêjin, bûne file (bi we bawer nakin) û bi rastî em bi wî yê ku hûn me, li bal wî da gazî dikin, di dudilyekî bê goman da nin."

10; Pêxemberên wan ji wan ra gotine: "Qe (di hebûna) Yezdan da dudilî çê dibe? Ewî ezman û zemîn afirandîye ewa, gazî we dike, ji bo ku ewa gonehên we ji bona we ra bibaxişîne û ewa heya danê navdayî we (di cihanê da) dihêle." Ewan (bersiva pêxemberan didin) dibêjin: "Hûn jî merivên wekî me ne. Hûn ji me dixwazin, ku em dest ji perestîya wan tiştên ku, bav û kalê me ji wan ra perestî kirine, berdin. Heke hûn (di van dozê xwe da rast in, ka) ji me ra beratên bi hêz û daveker bînin."

11; Pêxemberên wan ji wan ra gotine: "(Hûn rast in) em jî merivê wekî we ne, ji xencî wî tu tişt nînin. Lê Yezdan ji kîjan bendê xwe ra bîvê, ji wî ra (pêxemberî) dide. Ji pêştirê destûra Yezdan ji me ra tu hêz tune ye, ku em beratên hêztir bînin. Îdî (gelî) bawergeran! Hûn xwe hispêrin Yezdan."

12; "Ma qey çî bûye ji bona me ra, ku em xwe ne hispêrin Yezdan? Bi sond! ewî em anîne rêya me ya (rast). Bi rastî emê li ser van cefanên ku hûn didine me hew bikin, hisparok bi xweber jî xwe di hêspêrin Yezdan."

13; Ewanê bûne file (hene! Ewan ji bona) pêxemberên xwe ra gotine: "(Ji van her du rêyan hûnê yekî ji xwe ra hilbijêrin); ya emê we ji welatê xwe derxin (îdî em gohdarya we nekin) ya hûnê (dîsa werin) ola komalê me." (Dema pêxember ji bawerîya wan bê hêvî bûne) îdî Xudayê wan ji wan ra niqandîye: "(Gelî Pêxemberên min! Hûn bi mirûz nebin, bi rastî) emê cewrkaran teşqeले bikin."

14; "Û emê di pey wan da, we di zemîn da biêwirînin. Ewa (peymana hanê) ji bona wanê ku ji payen û celatên (minê peyman dayî) tirsîyane heye."

15; Û (ewan pêxemberan) servahatîna bi ser neyaran (ji Yezdan) xwestine, îdî hemû încarkarên serdest bê hêvî mane.

16; Di pey (bê hêvî manê) ji wan ra doj heye (di dojê da ewan) bi aveke kêr û xûnê têne avdanê.

17; Ewa ewê avê diqurtîne, lê jê ra çê nabe, ku di qirika xwe da bixe xwarê û ji wî ra di hemû cihî da mirin hatîye (di xwarê ku bimire) lê namîre. (Çavê wî wusa zoq dimîne). Di peyda jî (ji bona wî ra) şapateke peywestî heye.

18; Hecwekîya wanê ku filetiya Xuda yê xwe dikin hene! Kirinê wan wekî wanê ku di royeke bager da be, arîstê xwelîyê bide bayê (ça ewê arîst dide bayê, tu tişt destê wî da namîne, eva jî) çî ked kiribe, nikare qe tu tiştî ji keda xwe bigire. Rê wundabûna dûr, eva ye!

19; Ma qey tu (li bal ezman û zemîn da) mêze nakî, bi rastî Yezdan ezman û zemîn bi mafîti afirandîye? Heke (Yezdan) bîvê wê we (bimirîne) behere, di (şûna we da) hinek afirandinên nû, bîne.

20; Û ewa kirîna (hanê jî) li ser Yezdan zor nîne (hesanî ye).

21; (Di roya rabûna hemû da) ewan bi tevê (kirinê xwe va) di hemberê Yezdan da xûya dibin (ewan bi xweber jî digotibûne: "Ewan kirinê me li bal Yezdan nayêne xûyandinê." Yezdan dema kirinê wan bi wan daye xûyandinû) îdî ewanê bê wec ji bona wan peyrewên xweyên (ku doza mezinatî kiribûne) gotine: "Bi rastî em ji bona we ra peyrewan bûn, îdî qe hûn nikarin ku me tişteki ji şapata Yezdan bi parisînin?" Ewan pêşrewanan (bersiva bê wecan aha dane) gotine: "Heke Yezdan em anîbûna rêya rast, meyê jî hûn bianîna rêya rast. ji bona me ra qe tu ferestebûnî (ji aşîta Yezdan) tune ye, îdî em çî qîr û hewar bikin û em çî hew bikin, li ser me yek e (tu raqetana wan tune ye)."

22; Ji piştî ku bûyera (wan) pêk hatîye, pelîd ji bona (wan fileyên ku çûne dojê aha) gotîye: "Bi rastî Yezdan ji bona we ra peymana xwe yê maf dabû, min jî ji bona we ra peyman dabû. Lê îdî ez ji peymana xwe poşman bûm (min peymana xwe pêk neanî) ji bona min ra li ser we (ji bo ku hûn bibîne file) qe tu hêz tune bû, ji pêştirê min gazî we kiribû, îdî we jî bersiva min dabû (hûn li pey min hatin, bûne file).

Îdî hûn gazinan ji min nekin, û hûn hey gazinan ji xwe bikin. Ez nikarim we (ji şapatan) fereste bikim. Bi rastî hêj di berê da, ku we ez dixistime hevî (ji bona Yezdan ra) min dest ji we berdabû (bi wê kirina we bawer ne dikir). Bi rastî ji bona cewrkaran ra şapateke dilsoz heye."

23; Ewanê bawer kirine û karê aştî kirine (hene!) ewanan dikebine bihiştê ku di binê (darê wê da) çema avê dikişin: (ewan) bi destûra Xudayê xwe (di wê bihiştê da) hey dimînin. Sertêdana wan (di bihiştê da) ji hev ra "Selam" dibêjin.

24; Ma qey te ne dîtîye, Yezdan hecwekî çêkirinê? Peyveke paqij wekî dareke paqij e; çêkirinê wê darê jor da ne, koka wê jî di zemîn da rehvedaye (ewa peyva jî ji merivan derdikebe, lê qencîyên wê jî bi jor da diçin).

25; Di hemû gavan da berên ku ji wê darê tene xwarinê, bi destûra Xudayê (wê darê) tene. (Qencîyên ji wan peyvan jî di hemû gavan da tene goman kirinê). Yezdan evan hecwekîyan ji bona kesan ra tene, hevî heye ku bi rastî ewan kesan ji van hecwekîyan hiş hildin.

26; Peyva sik jî wekî sik e, ewa dara a sik çê li ser zemîn bûye qurm maye (kêrê tu tiştî nayê: berê wê tune ye, ku meriv ji wê bixun, li wê mêze bikin, peyva sik jî wusa ne) qe ji wê darê ra tu hew tune ye.

27; Yezdan ewanê bawer kirine; di cîhan û di para da jî di hewînê. û Yezdan cewrkaran jî (wekî dara sikê ku tu hew jê ra tune ye) ji rêya rast wunda dike. Yezdan çê bivê ewî dike.

28; Ma qey tu li wanê, ku qencîyên Yezdan bi nankorîyê (û xirabîyê) guhurandine û komalê xwe jî di xaniyê teşqelê da ewirandine, mêze nakî (ka temtêla wan çê ne)?

29; Ewa xaniya doj e (ewanê) hemû li bal dojê da pal bidin. Ewa çêqa sikê ewra ne!

30; Ji bona ku rêya Yezdan wunda bikin, ji bona Yezdan ra hevî çê kirine.

(Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Hûn di xweşîya xwe da dûm bikin, loma bi rastî hey zivirandina we li bal agir da ne."

31; (Muhemmed! Tu ji bona wan bendeyên minê bawer kirine) bêje: "Me çê fermana wan kirîye) bira nimêja xwe wusa bikin û rozîyên me dane wan, hêj ewa roya tu kirin û firotin têda tune ye û yartî jî têda tune ye (ne hatîye) bi dizî û eşkere (ji bona hewcan ra) bidin."

32; Ewê ku ezman û zemîn afirandîye heye! Ewa Yezdan e, ewî ji ezmanan avek hinartîye, îdî (bi fermana wî) ji bona we ra, ji berên cure cure bi wê avê rozî derxistîye û ewî ji bona we ra kelek semerin kirîye, ji bo ku hûn bi fermana wî di zeryayê da bigerin. û Yezdan çemên avê jî xistîye binê destê we.

33; (Yezdan tûm caran) roj û hîv jî, ku yek ji yeka mayî dîr nekebe û ji hev neçin jî sernerm kirîye (xistîye binê fermanê, ji bona qencîya bi we ra). Çê şev û ro jî (ji bona qencîyan xistîye binê fermanê, ku hûn di wan gavan da ji xwe ra xebatê bikin.)

34; û we çê (ji Yezdan) xwesti be, ewî ewan hemû ji bona we ra anîye, daye. Heke hûn qencîyên Yezdan e (ku bi we kirîye) bihişmîrin, hûn nikarin ewan (qencîyan) bi destê destê jî bihejmîrin. Bi rastî meriv (ji bona xwe ra) zor cewrkar û nankor e!

35; Îbrahîm di gavekî da (aha) gotibû: "Xuda! Tu evî bajarê hanê ji hemû

(sikatîyan) ewle bike. (Xuda!) tu min û zarên min ji perestîya pûtan biparisîne."

36; "Xuda! Bi rastî ewan (pûtan) pirên ji kesan, ji rêya rast dane wundakirinê. Îdî (Xuda!) kîjan bibê peyrewê min, ewa ji min e û kîjan bê gotina min bike, bi rastî îdî hey tu î baxişgerê dilovîn."

37; "Xudayê me! Bi rastî min ji ûrta xwe di newaleke bê çandin, li bal xaniyê te yê, ku li dora wî da kirina sikatîyan qedexe ne, daye hewandinê. Xuda! (min wusa kirîye) ji bona ku ewan nimêj bikin; îdî (Xuda!) tu dilê hinek kesan jî û bal wan da xar bike (ji bo ku herne bal wan, ewan bi tenê nemînin. Xuda!) Tu ji beran, ji wan ra rozînî bide, bi rastî hevî heye ku ewan sipazîya (te) bikin."

38; "Xudayê me! Bi rastî tu bi kirinê me yê dizî û eşkere dizanî (em çê tiştî veşerin ya jî eşkere bikin, tu bi hemûyan dizanî) di ezman û zemîn da tu tişt li ser Yezdan veşartî nîne."

39; "Ew Yezdanê ku di gavê kaltî ya min da Îsmail û Ishaq, ji min ra raber kirîye, hemû sipazî ji wî ra be. Loma bi rastî Xudayê min gazî kirinan (bi litêkirin) dibêhê!"

40; "Xudayê min! Tu ji bona min û hinekê ji ûrta min (xûyekî wusa bidî me) ku em bi peywestî, nimêj bikin. Xudayê me! Tu (van) xwastinê me litê bike."

41; "Xudayê me! Di roya hijmara (kirinan) tu min û dê û bavê min û bawergeran bibaxişînî."

42; (Muhemmed!) Tu goman neke ku Yezdan ji kirinê wan cewrkaran bê agah e. Lê Yezdan celata wan para da ji bona wê roya çav têda zoq dibin, dihêle.

43; (Di wê royê da) ewan serê xwe bilind dikan, direvin: Çavê wan (wusa zoq dimîne) li bal wan da nafetile, dilê wan (ji qenciyan) vala ye.

44; (Muhemmed!) Tu merivan ji wê roya, ku şapat di wê royê da ji wan ra tê dayînê, bide tirsandinê, îdî ewanê cewr kirine hene! (aha) dibêjin: "Xudayê me! Tu ji bona me ra heya danekî nêzik firsendê bide, emê ji bona gazîkirina te ra bersivê bidin (fermanê te li pêk binin) û emê bibne peyrewê pêxemberan." Ma qey di berya naha da we sond nedixwar, ku ji bona we ra tu çûna ava tune ye?

45; Hûn di şûna wanê, ku bi xweber li xwe cewr kiribûn êwirîne, ji bona we ra diyar bûye; ka me ça ewan (şapat) kirine û me ji bona we ra jî (ji temtêla wan) hecwekî anîbû (wusa nîne?).

46; Bi sond! Ewan endezên xwe çê kirine, ji wan endezên wan çîya di şûna xwe da jî herin, hey Yezdanê celata wan bi endezan bide.

47; (Muhemmed!) Tu goman neke, ku Yezdan ji wê peymana daye pêxemberên xwe, poşman bûye. Bi rastî Yezdan servahatê xwe yê tûl e!

48; Di wê roya ku zemîn bê zemînî û ezman bê ezmanî tene guhurandinê, hemû (heyî) di hemberê Yezdanê servahatî yê bi tenê da, xûya dibin.

49; Di wê royê da (Muhemmed!) tu dibînî, ku nûsitemkar bi heva (deste deste) hatine tewldanê.

50; Kirasê wan ji qîrên e, agir ser çavê wan diniximîne.

51; Ji bo ku Yezdan her kesî bi keda wî bide celatkirinê (evan tiştan) dike. Bi rastî Yezdan zor zû hijmare!

52; Û ji bona ku kes bi wê tirsdanê bêne (hişyarkirinê) û ji bona ku ewan bizanin, hey babetê perestiyê Yezdanê bi tenê ye û ji bona xweyê hiş ji wê şîretan hildin, eva (Qur'ana) bûye (şîreteke) ragehînî.

## Chapter 15 (Sura 15)

1; E.L.R. (Hey Yezdan bi arşa van tîpên ji hevçûyî dizane). Ewanan, beratên pirtûk û Qur'ana daveger in.

2; Gavê werin, ewanê bêne file hene! (Ewanê bêjin:) "Xwezîka em misilman bûna."

3; (Muhemmed!) Tu dest ji (tekoşîna bi wan ra) berde. Bira ewan bixun û (bi xweşî) bijîn, xwestinê wan ewan didine para da. Îdî di nêzik da ewanê bizanin (ka paşîya kirinê wan ça ne?).

4; Me çîqa rûniştîyên welatekî teşqeale kiribin, hey ji bona teşqela wan, danekî diyarî hebûye. (Ya jî, ji wan hey mayîne nivîsarê diyarî mane).

5; Qe tu kom tune ye, ku ji danê (teşqeale dane xwe) borîye, ya jî para da mayî be.

6; Ewan (filan ji bona te ra aha) gotine: "Bi rastî ewê ku (Qur'an) bi ser te da hatiye hinartinê, tu yekî tepaketî yî."

7; "Heke (bira, tu) di doza xwa da rast î, ka (ji bona rastîya pêxemberîya xwe) ji me ra firiştayên (dîdevan) bine."

8; Em hey firiştan (ji bona berewanî û şapatdanê) dihênirin. (Gava firişte werin hinartinê îdî ewanan nikarin) tu tiştî bikin (firişte nahêlin ku ewan çavê xwe vekin).

9; Bi rastî me (Qur'an) hinartîye, bi rastî em bi xweber jî ji bona (Qur'anê ra) parisvan in.

10; Û bi sond! Di nava wan komên berya te da, me pêxember şandine.

11; Çîqa pêxemberek hatibe bal wan, ewan hey bi wî (pêxemberî) tinaz kirine.

12; Em bi vî awayî (tinazan) dixine dilê wan ê nûsitemkar.

13; Di berya wan da (ewan komalên tinazger) ka me çî bi serê wan da anîbû, borîne (evan şopa wan dibînin jî, disa) bawer nakin.

14; Heke me di ezman da ji bona wan ra derîyek vekirî bûya, ku ewan di wî derî da hevrax derketinan jî (ewan beratan bi çavê xwe bidîtanan).

15; (Wê disa ewanê) bi gotinan: "Bi rastî çavê me sermest bûye, bi rastî em komelekî wusa nin li me anç hatîyekirinê."

16; Bi sond! Me di ezman da şûnwarê (wekî koşkan) gerandine, me ewan (şûnwaran) ji bona dîdevanan ra xemilandine.



17; Me ewa (ezmana) ji hemî pelîdên deherok dane parisandinê.  
18; Ji pêştirê wî pelîd ku bi dizî gohdarî dike, îdî pêtên agirê xûyayî dibine peyrewê wî pelîdî.  
19; Û me zemîn jî raxistîye. Me di nava zemîn da çiyayên dirêj rakutan e. Me hemû tişt di zemîn da bi pîvayî hêşîn kirine.  
20; Di zemîn da me ji bona we ra û ji bona wan candarên, ku hûn ji wan ra rozîyan nadin (rozîyên) jînê çê kirine.  
21; Û xezna hemî tiştan hey li bal me ye. Em ewan wekî hewcebûnê hey dihênirin (ji azman û zemîn ji bona jîna we derdixin, wekî ba û bariştan).  
22; Û me ba, bi kevîni şandîye (ewr civandine) îdî em di jor da aveke wusa dihênirin, em we bi vê avê didine avdanê. We bi xweber jî nikarîye ewa ava bixista cûrnan.  
23; Û bi rastî hey em bi tenê ne jîn û mirin çê dikin. (Ûrta wan hemûyan jî) em bi tenê ne. (Piştî wan, hey em bi tenê dimînin).  
24; Bi sond! Ewanê ji we yên ku pêş da çûne, me bi wan zanîye. Û bi sond! Ewanê ji we yên ku para tên em bi wan dizanin.  
25; Û Xudayê te ê (ewan bi rastî we ji bona hijmartina kirinê wan) bicivîne. Bi rastî Xuda bijejkeyê zana ye.  
26; Bi sond! Me meriv ji heryeke ji hev çûyê genîyê qimitî afirandîye.  
27; Hêj di berê da jî me meçêtir ji agirê bayê germok e afirandîye.  
28; Di gavekî da Xudayê te ji bona firiştan ra gotibû: "Bi rastî ezê merivan ji heryekê ji hevçûyî bînketî qimitî biafirînin.  
29; Îdî gava min pêka wî anî û ji canê xwe can berda gewdê wî, heman hûn ji wî ra kunde beherin.  
30; (Ji piştî afirandina wî) hemî firiştan (ji bona wî ra) kunde birin.  
31; Ji pêştirê pelîd; ewî ji bona kundebirinê, xwe da para.  
32; (Yezdan ji bona wî ra) gotîye: "Çi bûye ji te ra pelîd! Ku tu jî bi wanê kundebir ra ne bûyî?"  
33; (Pelîd di bersiva Yezdan da) gotîye: "Ezê ça ji bona wî kesê, ku te ewa ji heryekê bînketî qimitîye ji hevçûyî çê kirîye, kunde biherin?"  
34; (Yezdan ji pelîd ra) gotîye: "Îdî tu ji nava qencîyê min derkebe. Bi rastî tu ji dilovaniya min hatî deherandine."  
35; "Û heya roya xelat û celatan deherandin li ser te ye."  
36; (Pelîd beresiv daye) gotîye: "Xudayê min! Heya roya ku ewanê dîsa rabin (ji bona kirinê xwe bêne xelat û celatkirinê, canê min nestîne) li min mêze bike (ka ez çî bi wan dikim!)"  
37; (Yezdan ji wî ra) dibêje: "Bi rastî ji te ra mecal hate dayînê."  
38; "Heya wî danê roya diyarî."  
39; (Pelîd ji bona Yezdan ra) dibêje: "Xudayê min! Ji bo ku te ez (bi sedema wan) aziran dime, ezê ji bona wan ra di zemîn da (sikatîyan) bixemilînim û ezê ewan hemûşkan bi azirînim (ewan ji rêya te derxim)."  
40; "Ji pêştirê wan kesên ji wan, ku xurî bendeyên te ne."  
41; (Yezdan ji pelîd ra) gotîye: "(Eva gotina te ye ku tu dibêjî. Ez nikarim bendeyên te yên xurî ji rêya rast derxim." Şixwe ewa) rêya min a rast e."  
42; "Bi rastî li ser wan bendeyên minê xurî tu hêz ji bona te ra tune ye. Ji pêştirê wanê azirî ku bûne peyrewê te."  
43; Bi rastî doj, şûna radawa wan aziryan hemûşkan e.  
44; Ji bona dojê ra heft derî hene. Ji bona her yekî ji wan derîyan, pareke ku ji wan hatiye parkirinê, heye.  
45; (Ewanê ku xwe ji pelîd parisandine) hene! Ewan di bihişt û kanya da nin.  
46; Hûn bi xêlne û bi ewletî bikebine behîştan.  
47; Me dexesiya di singê wan da heyî, rakirîye. Ewan bi biratî li ser textan hemberî hewyane.  
48; Di wura da westandin bi wan nagire, û ewan ji bihiştê jî nayêne derxistine.  
49; (Muhemmed!) Tu ji bendeyên min ra agahdarî bide; "Bi rastî ez baxişgerî dilovînim."  
50; "Bi rastî şapata min jî şapata dilsoz e!"  
51; (Muhemmed!) Tu ji wan ra agahdarî ji mêvanê Îbrahîm bide.  
52; Gava (ewan mêvanan) ketine bal (Îbrahîm, jê ra aha)gotine: "Selam" (Îbrahîm ji

wan ra) gotiye: "Bi rastî em ji we vecinîqîn."

53; (Ewa mêvanan ji bona Îbrahîm ra) gotine: "Tu ji me veneciniqe, bi rastî (em hatine) te bi kurekî zana didine mizgîndanê."

54; (Îbrahîm ji wan ra) dibêje: "Ji pişkî kaltî bi min da hatiye, hûnê bi çi îdî mizgînî bidine min?"

55; (Ewan ji Îbrahîm ra) dibêjin: "Em mizgînî didine te bi rastî tu nebe ji wanê bê hêvî."

56; (Îbrahîm ji wan ra) dibêje: "Ji pêştirê wanê rê derketî tu kes ji dilovanîya Yezdan bê hêvî nabe."

57; (Ji piştî ku Îbrahîm zanî, ewanê hatî firişte ne; ji wan pirsî) got: "Gelî saîyan! Xwastina we çi ye?"

58; (Ewan saîyan) gotine: "Em li bal komalekî nûsîtemkar da hatine şandinê."

59; Ji pêştirê malîyên Lût. Bi rastî emê ewan (malîyên Lût) hemûşkan fereste bikin.

60; Ji pêştirê jina (Lût) me bi rastî (ewa jinika ji wanê ku di nava teşqalan da dimînin hijmartiye). Bi rastî ewa jinika di teşqeale da maye.

61; Îdî gava ewan saîyan hatine bal malîyên Lût.

62; (Lût ji wan ra aha) gotiye: "Bi rastî hûn komalekî (wusa ne nîyas in) meriv ji we vedicinîqîn."

63; (Ewan saîyan) gotine: "(Hûn ji me netirsîn) me ewa (şapata) ku komalê te, di hatina wê da du dil in, ji te ra anîye."

64; "Û me bi rastî ewa şapata anîye û em di gotina xwe da jî rast in."

65; Îdî tu di danekî şevê da malîyên xwe derxe rê û tu jî li pey wan da here, bira tu kes ji we para da mêze neke, cîyê hûn hatine fermanîdanê, ji bona çûna wêderê, herin wura."

66; Û me (li bal Lût da) pêkanîna vê fermanê niqandîye, "Bi rastî poçika wanê di sibehê da hatibe birînê (qe tu kes ji wan namîne)."

67; Û rûniştîyên bajar bi hev ra mizgîna (hatina saîyan) didane hev (direvîyan hatibûne bal mêvanan).

68; (Lût ji bajarîyên xwe ra aha) gotiye: "Bi rastî ewan mêvanê min in; hûn min bi wan nehetikînin."

69; "(Çi dibe!) Ji Yezdan bitirsîn, hûn min riswa nekin."

70; (Bajarîyên Lût jê ra) gotine: "Ma qey me tu ji karê bîyanan ne dabû paradanê (hêj tu têkilê karê wan jî dibî)?"

71; (Lût ji bona bajarîyan aha) gotiye: "Heke hûnê tiştêkî bikin, ewan keçên (minê jinê we ne) havanên."

72; (Lût!) Bi jîna te ewan (komalê te yê file) di mestîya xwe da kor mane.

73; Îdî di gava roj derketîna da, dengê hêja zemîn bi wan girt.

74; Îdî me ewan ser û binê hev kirin û me li ser wan da jana bi nav (xwuryê kevîran) barand (ya jî di zemînê wan da me agir da hilkirinê, wusa teqya di hundurê xwe da herya xweye wekî agir avête hewa, ewan wekî çûrûskê agir bi ser wan da barîne).

75; Bi rastî (di vî da) ji bona wanê xwe nîyas ra beratên (sodretî) hene.

76; Û bi rastî ewa (bajarê wan komalê Lût) li ser rêyeke berê da heyî da ne.

77; Bi rastî ji bona bawergeran ra di vê (bûyerê da) beratên hişhildayî hene.

78; Û bi rastî hevriyên (Eyketê) zor cewrkar bûne.

79; Îdî me ji wan jî tol hildane. Ewan herduk (bajarê Lût û bajarê Eyketîyan li ser rê) li ber çavan xûya ne.

80; Bi sond! Hevriyên hicrê (şikeft û kevîran) jî (pêxember) dane derewdêrandînê.

81; Û me ji wan beratên xwe anîne, îdî ewan ji wan beratan rû fetilandine.

82; Ewan di wan çîyan da ji xwe ra xanî bi ewletî dikolan.

83; Îdî di danê sibe da dengê (hêja zemîn) bi wan girtiye.

84; Ewa (xebata wan e, ku ewan di berê da ji bona ewletîya xwe di çîyan da xanî kola bûn) ewan (ji şapatê) nedane parizandinê.

85; Me ezman û zemîn û tiştê nîveka wan da heyî, hey bi mafî afirandîye (ne ji bona ku ewan rêzikê min hilşînin. Ewanê di hemberê te da derdikebin hene! Emê ji wan tolê hildin) wê ewa roya (rabûna hemûtiyê) were, îdî tu bi wan ra bi qencî derbasî bike.

86; Bi rastî Xudayê te pir afirandok û pir zane ye.

87; Û bi sond! Me ji zoyan heft parên zo (Fatihe) û bi Qur'ana mezin va, ji te ra

anîne.

88; (Muhemmed!) Tu çavê xwe li bal hinek cotên (ji wan) ku me ewan di cîhanê da (bi zengînî û xweşî dane jînanandinê) zoq neke. (Ji bona ku ewan bi te bawer nakin) tu murûz nebe û tu ji bona wanê bawer kirine baskê xwe ber jêr bike (di hemberê wan da mulahîm be).

89; Û (Muhemmed!) tu ji wan ra bêje: "Bi rastî ez hey (ji bona we ra hişyarekî) tirsdanê ber çavî me."

90; (Hûn dizanin, heke hûn bawer nekin, wê şapata Yezdanê bi ser we da were) wekî me ça li ser wan (fileyên) parkar da hinartîye.

91; Ewan (filan in) ku Qur'an parpar kirine (hinekî wê, ku wekî Tewrat û Încîlê ye; litê kirine, ewa para ku wekî Tewrat û Încîlê ne bûye, bi wê bawer ne kirine).

92; Îdî bi Xudayê te emê ji hemû (keda) wan pirs bikin.

93; Ka ewan çi ked kiribûn?

94; Îdî tu ça hatî fermankirinê (bê perwa) ewan wusa pêk bîne û tu rû ji wanê hevriçêker bifetilîne.

95; Bi rastî di hemberê wanê bi te tinazan dikin, em besî te ne.

96; Ewanê (tinazan bi te dikin hene!) ewanan ji Yezdan ra hinek xudayên (xweyê) mayî dixne hevri. Îdî ewanê di nêzîk da bizanin.

97; Bi sond! Em dizanin, ku dilê te bi gotinê wan teng dibe.

98; Îdî tu bi pesindayîna Xudayê xwe, ewî ji kêmasîyan paqij bike û ewanê kunde (ji Xuda ra) dibin hene! Tu bibe ji wan.

99; Û heya mirina te bê, tu perestîya Xudayê xwe bike.

## Chapter 16 (Sura 16)

1; Fermana Yezdan hat! Îdî hûn (ji bona hatina fermanê) lez nekin. Bi rastî (Yezdan ji gotinê wan filan; ku tiştan jê ra dixne hevri paqij û bilind e.

2; Yezdan ji bendeyên xwe, ji kîjanî ra bivê, bi fermana xwe firişte (Cibrîl) bi niqandinê va li ser wan bendeyên xwe dihênirîne, ji bo (ewan pêxemberên bendeyên me, ku merivan hişyar bikin û ji bona wan ra evê gotina min a hanê bêjin): "Ji pêştirê min tu tişte babetê (perestîyê) tune ye, îdî hûn parisaya min bikin.

3; Ewê ku ezman û zemîn bi mafî afirandîye heye! Ewa Yezdan e. Ji wî tiştê, ku (ewan filan) jê ra dixne hevri (paqij) û bilind e.

4; (Yezdan) meriv ji dilopeke (ava genokî ye) xwe avîtî afirandîye. Hema (ewa meriva) piştî (gava afirandina xwe da) bûye tekoşîngerekî xwûyayî.

5; Û (Yezdan) tariş jî afirandîye. Di wan (tarişan da) ji bona we ra tiştê germê (pêk) tînin hene û pîr karên (mayî jî) hene û hûn ji hinekî (wan tarişan jî) dixun.

6; Û (hêj) gava (ku hûn ewan tarişan) di sibehê da berdidine çêre û di êvarê da jî (hûn ewan ji çêre) tînin û dadikin, ji bona we ra (xweşî û) rindayî heye.

7; Û (ewan tarişan) giranîyên we hildidin dibine bajarên (wusa dûr) heya nîvê canê we derneketa hûn nikar bûn bigihîjtina (wan bajarên). Bi rastî Xudayê we mêhrivanê dilovîn e.

8; Ji bona sîyarîya we û xişran; (Yezdan) hesp û hêstir û ker (afirandîye). Û tiştin qe hûn pê nizanin ewa ewan jî diafirîne.

9; Ewê rêya xwe (rast dike û bendeyên xwe li bal rêya rast da) tîne, ewa hey Yezdan e. Lê hinek rêyên xaromaro hene hinek meriv di wan da diçin. Heke ewî biva, we hûn hemûşk bianîna rêya rast.

10; Ewê av ji ezmanan hinartîye, ewa Yezdan e. Di we avê da ji bona we ra vexurin heye, ji wê avê (gîha û dar û ber jî) çê dibin, hûn (tarişên xwe) bi wan diçêrînin.

11; Ji bona we ra bi we avê, çandinî zeytûn û xurme û tirî û ji hemûşk beran hêşîn dike. Ji bona komalê ramankar ra di van kirinan da beratên (hişdarî) hene.

12; (Yezdan) ji bona we ra şev û roj û tav û hîv (di xebata ji bona we ra, di rêzekî da) bi sernermî danîye. Sterk jî şixwa di fermana Yezdan da sernerm in. Di van kirinan da ji bona komelê hişmend ra bi rastî beratên mezin hene.

13; Û ewî çiqa çandinîyên cure cureyê di zemîn da hene! (Hemû) ji bona xebitandina we ra (amade kirîye). Ji bona wî komalê, ku bîra xwe tînin di van da, beratên (hêca) hene.

14; Ji bo ku hûn ji zeryayê goştê nû û şil bixun, ewî zerya di fermana we da amade kirîye, hûn ji wê zeryayê xemilên ku hûn li xwe dikin, derdixin. Tu kelekên mezin dibînî, ku ewan evê ça diqelêşin, diçin! Ji bo ku hûn ji rûmeta wî ji xwe ra

rozînan bixwazin û ji bo hêvî heye, ku hûn sipazîya bikin ewî evan kirine.

15; Ji bo ku zemîn we nehejîne ewî li ser zemîn da çîyayên mezin rakutane. Ji bo ku hûn rêya xwe wunda nekin ewî di zemûn da çem û rû û rê danîne.

16; Û (Yezdan) beratên mezin jî (di zemîn da) rakutane. Şixwa ewan bi siterkan jî tene re.

17; Îdî qe ew (Yezdanê) ku afirandinê dike, wekî wan (tokelên) ku afirandinê bikin, dibe? Qe hên (bi ponijandin evan) bîra xwe naynin?

18; Û heke hûn (gelî merivan!) qencîyên Yezdan yên (ku li ser we kirîye yek bi yek) bihijmêrin, hûn ewan deste deste jî nikarin bihijmêrin. Bi rastî Yezdan baxişgerê dilovîn e.

19; Û hûn çi tiştî veşêrin û ya jî eşkere bikin, hey Yezdan bi wan dizane.

20; Ewan tiştên ku ewan (filan) jî wan ra perestî dikin hene! Ewan qe tu tiştî naafirînin, hêj ewan bi xweber jî hatine afirandinê.

21; Ewan (tokelan) mirîne, zindî nînin. Ewan bi danê (rabûna hemûşkî, ji piştê mirinê) bê agah in.

22; Yezdanê ku (hûn jê ra perestî dikin) heye! Ewa Yezdanekî bi tenê ye. Îdî ewanê ku bi danê para da bawer nakin hene! Dilê wan (filan da) ne bawerî cî daye, ewan bi xweber jî, ji bawerîyê, quretî dikin.

23; Qe tu zîyan nake! Bi rastî Yezdan bi wan tiştên ku ewan dizî dikin ya jî eşkere dikin dizane. Bi rastî (Yezdan) jî wanê ku xwe qure dikin hez nake.

24; Gava ji wan tê pirsîne, "Xudayê we çi hinartîye?" (Ewan bersivê didin) û dibjin: "Çîrokên berê hinartîye."

25; (Aha bersiv dane) ji bo ku ewan hemî gonehên xwe û hinek jî, ji gonehên wanê bê zanîn ji rêya rast derxistine, di roya rabûna hemî da hildin. Hişyar bin! Çîqa barê wan sik e!

26; Bi sond! ewanê berya wan da jî endeze kiribûn, îdî Yezdan jî ximê avayê wan ji bin da anî, îdî li ser wan da banê avayan hate xarê. Di wî cîhê ku haja wan pê tune bû, şapat bi wan da hatiye.

27; Paşê di roya rabûna hemî da (Yezdan ewan hemûşkan) riswa dike û (ji wan ra) dibêje: "Ka ewan hevriyên min yê, ku we (bi bawergeran ra, di mafê wan da) tekoşin dikirin, li kêderê ne?" Ewan (firiştan û pêxember û bawergerên) ku ji wan ra jî temtêla (filan) zanîn hatiye, gotine: "Bi rastî riswabûn û sikatî di îro da li ser filan e."

28; Ewanê ku bi xweber li xwe cewr kirine hene! Gava firişte canê wan disitînin (aha) dibêjin: "Me qe tişteke ji riswabûnê nekirîye, îdî hemî sikatîyan davêjin." (Firiştên bersiva wan didin aha) dibêjin: "Gotina we nîne, bi rastî we çi tiştê kirîye, Yezdan bi wî rind dizane."

29; "Îdî hûn di deryê dojê da bikebine dojê, hûn di dojê da her bimînin. Îdî (doj) ji bona quran çîqa sikê şûnan e!"

30; Ji bona wanê (Yezdan) parizî kiribûne (aha) tê gotinê: "Ji bona we ra, Xudayê we çi hinartîye?" (Ewan bawergeran bersiv dane û) gotin "Qencî (hinartîye)." Ji bona wanê ku di vê cîhanê da qencî kirine, qencî hene. Hêj xaniyê para da (ji bona qecîkaran) qencîr e. Bi rastî xaniyê xudaparizan çîqa qenc e!

31; Ewa bihiştê ku di bine darê wê da çem dikişin heye! (ewan xudaparizan) dikebine wê, ewa bihiştê tijî û amade ye; ji bona wan ra, çi bivên heye. Bi vî awayî Yezdan xudaparizan xelat dike.

32; Ewanê xudapariz hene! Gava firişte canê wan distînin, bi paqijî distînin. (Firişte) ji wan ra dibêjin: "Selam li ser we bin, bi sedema wan qencîyên we dikiribûne bikebine bihiştê."

33; (Ewanê file hene!) Hey hêvîya vî dikin: "Gelo wê kengê firiştan werin (canê wan bistînin) ya jî gelo wê kengê fermana Xudayê te yê bi şapatdana wan were." (Ya jî arşa vê beratê aha ne: Ewa ji bona rastîya pêxemberîya pêxemberan, ji pêxemberan ra gotine: "Ka ji bona xwe ra firiştan ji ezmanan bînin; bixne şahidê xwe, ku em jî bi we bawer bikin." Îdî qey ewan filan hêvîya hatina firiştan, ya jî hêvîya hatina şapata Xudayê te dikin, ku bawer nakin?") Bi vî awawî ewanê di berya wan da borine jî, wekî wan kirine. Bi sedema kirinê wan (Yezdan ewan teşqeke kirine, bi vê kirinê) Yezdan li wan cewr ne kirîye, lê ewan bi xweber li xwe cewr kirine.

34; Îdî sikatiya tiştê ku ewan kiribûne, bi wan da hatiye, tiştê ewan ku (bi hatina wê) tinaz dikiribûne, bi ser wan da hatiye, ewan hildane nava xwe da.

35; Û ewanê ku ji bona (Yezdan ra) hevri çê kirine hene! (Bi tinaz aha) gotine: "Heke Yezdan biva, me û bav û bapîrên xwe ji pêştirê wî, ji tu tiştî ra perestî ne fikir û me (bê wî) qe tu tişt ne durist ne fikir." Bi vî awayî ewanê berya wan da borî jî wekî wan fikiribûne. (Tu bi kirinê wan mirûz nebe) qey li ser pêxemberan ji pêştirê gotina vekirî tu tişteke heye?

36; Û bi sond! Me di nava hemû koman da pêxember şandine, ji bo ku ewan (pêxemberan ji koma xwe ra aha bêjin): "Hûn ji Yezdan ra perestî bikin û hûn xwe ji perestîya pelîd biparisînin." Îdî ji wê koma (pêxember) hinek hene; Yezdan ewan anîne rêya rast û hinek jî ji wan koman hene: rêwundabûn li ser wan maf bûye. Îdî hûn mêze bikin! ka encama wanê virek çê bûye?

37; (Muhemmed!) Heke tu bihewilî, ji bona hatina wan li bal rêya rast da, bi rastî evê ku Yezdan rêya rast li ber wî wunda kiribe, îdî ewa nayê rêya rast, ji bona wan ra, tu arîkar jî tune ye.

38; Ewan bi sondên xwe yên mezin bi Yezdan sond xwarine; ku Yezdan mirîyan îdî ranake. Bi rastî gotina wan nîne (loma rakirina wan) li ser Yezdan mafek e. Lê pîrên kesan pê nizanin.

39; Ji bo ku ji wan ra, ewa tiştê ku ewan têda ne wekhev bûne, bi rastî diyar be û ji bo ku ewanê bûne file hene! Bizanin, ku ewan di berê da vir kiribûne (wê Yezdanê ewan rake).

40; Bi rastî gava em bivên, ku bûyereke ya jî tişteke bibê, dema em ji wî ra dibêjin, "bibe", îdî ewa heman dibê.

41; Ewanê ku li wan cewr hatiye kirinê hene! Ku ji bona qayîltîya Yezdan, ji welatê xwe koç kirine: Emê bi rastî ji bona wan ra di cihanê da qencîyan bikin. Heke ewan bizanin, qencîyên para da hêj meztir in.

42; (Ewanê li wan hatiye cewrkirinê; ji welatê xwe ji bona qayîlbûna Yezdan derketine) hew dikin hene! Ewan xwe dihêspêrne li ser Xudayê xwe.

43; Me ewanê di berya te da bi pêxemberî şandine, ewan jî hinek mêr bûne, me li bal van da niqandîye. Îdî heke hûn nizanin, hûn ji zanan bipirsîn.

44; Me (ewan pêxemberan) bi beratên (vekîrî) û bi pirtûka va (şandîye). Me eva Qur'ana li bal te da hinartîye, ji bona ku tu ji bo kesan ra tiştê li bal wan da hatiye hinartîne vekî, bi rastî hevî heye ku ewan raman bikin.

45; Îdî ewanê ku endezên sik kirine hene! Qey ewan ewle dibin, ku Yezdan ewan di zemîn da nexe xwarê, ya jî ji wan ra şapatan di cihê qe haja wan tune be, bîne?

46; Ya jî (dema ku ewan) di kar û xebata xwe da bin, heman şapat bi wan negire (ewle dibin)? Îdî ewan jî nikarin, dema şapat hatibe, bidine para.

47; Ya jî ewan di tîrsa hatina şapatê da bin (heman nişkêva şapat) bi wan negire (ewan ewle dibin)? Îdî bi rastî Xudayê we mêhrivanê dilovîn e.

48; Ma qey ewan li bal wan tiştên, ku Yezdan afirandine mêze nakin; ka sîha wan çê bi rast û çep xaro maro dibin, ji bona Yezdan ra bi kurt û dirêj kunde dibin?

49; Ji revaran; çî ezman û zemîn da hene û firişte hemûşk, ji bona Yezdan ra kunde dibin, qe yek jî quretî nake.

50; Ewanan ji Xudayê ser xwe ditîrsîn, ewan bi çî tene fermankirinê, hey ewî tiştî dikin.

51; Yezdan gotîye: "Hûn du ilaha (ji xwe ra) negirin. Bi rastî Yezdanê (babetê perestîyê) yek Yezdanê bi tenê ye. Îdî hûn hey ji min bitîrsîn (li bal min da hûnê bi tîrs bizivîrin)."

52; Çî di ezman û zemîn da hene! Hemî ji bona (Yezdan ra ne) û ola rast û perestî hey ji Yezdan bi tenê ra ne. Îdî qey hûn parizaya pêştirê Yezdan dikin?

53; Çî qencîyek bi we da were (hûn dibêjin: "eva ji Yezdan e.") Paşê dema nexweşîyek bi we bigire, dîsa hûn li bal Yezdan da zarî dikin.

54; Paşê dema, ku ewa nexweşî ji we radibe, destekî ji we di wê gavê da hevriyan ji Xudayê xwe ra çê dikin.

55; Ewan, ewan tiştan dikin, ji bo ku (di hemberê van) qencîyên me bi wan kirîye nankorî bikin. Îdî hûn di xweşîya xwe da bimînin. Lê hûnê di nêzik da bizanin!

56; Ewan (filan) ji wan rozîyên ku me daye wan, ji wan (pûtên) ku qe tu tiştî nizanin, par çê kirine. Bi Yezdan! Hûnê bi rastî ji wan virên ku hûn dikin, bêne pîrskirinê.

57; Û ewan (filan) ji bona Yezdan ra (firişte) xistine (keç). Yezdan ji wan gotinê wan paqij e. (Çîqa sodret e!); tiştê ku ewa ra jî dixwazin kur in. (firişte keç in,

ewan zarê Yezdan in, lê kur jî ji xwe ra hildane: eva çîqa parkirineke sodret e!). 58; Gava yek ji wan bê mizgîndanê: "ku ji te ra keçek bûye," bê gotinê, rûyê wî ji hêrsa reş dibe, bi xweber jî hêrsa xwe diqurtîne.

59; Ji bo sikatîya mizgînê ewa xwe ji komal xwe vedişêre. Gelo wê ewa yê, ewê keçikê bi sernegûnî xweyî bike, ya jî wê ewê keçikê di xwelyê da çal bike? (Bêzar dimîne nizane wê çî bike). Hişyar bin! Tiştê ewan berewanî dikin çîqa sik e!

60; Ji bona wanê ku bi danê para bawer nakin hecwekîya sikatî heye. Ji bona Yezdan ra jî hecwekîya balatir heye. Yezdan servahatê bijejke ye.

61; Û heke Yezdan bi sedema sikatîya kesane, heman bi wan da şapat bianîya; Li ser (zemîn) tu rewar ne diman, lê şapatdana wan, heya danê navdayî para dixê. Îdî gava danê şapatdana wan hatibe, qe ewa dana para û pêra nakebe.

62; Tiştê rikê wan ji te, ewan ewî dixê (zarê) Yezdan û zimanê wan bi vir salixê çî tiştên rind bide, bi rastî eva ji me ra ne (dibêjin). Qe tu çare tune ye; bi rastî ji bona wan ra agir heye û ewanê di agir da her bimînin.

63; Bi Yezdan! Me hêj berya te da li bal gelek koman da pêxember şandibûn. Îdî pelîd kirinê wan (koman) ji bona wan ra xemilandibû (kirinê wan xweşa wan diçû, gotinên pêxemberan ne dikirin) pelîd di îro da jî serkarê wan e, ji bona wan ra şapata dilsoz heye.

64; Hey ji bo ku tu ewan tiştên, ku ewan (kesan) têda bi dudilî ne wekhev dibin, vekî (ewan rastîyê bizanin) û ji bo ku ewa (pirtûka) ji bona komalekî bawerger bibe rêber û diloînêkî, me pirtûk li ser te da hinartîye.

65; Û Yezdan ji ezman avek hinartîye, îdî ji piştî mirina zemîn, ewî zemîn bi wê avê zindî kirîye. Di vê kirinê da ji bona komalekî bihistok ra (ku Yezdan ça zemîn ji piştê mirinê zindî kirîye, wusa ji merivan ji piştî mirinê dikare zindî bike) berateyên sodret hene.

66; Bi rastî ji bona we ra di (tarişên) mêşînî da tiştên ku meriv jê hiş hildin, hene. Ji tiştên di zikê wan mêşînan da ku di nîveka bişkul û xwûne derdikebin: Bi şîrekî xurî em we av didin, ewa şîra ji bona vexwarya, bi hesanî di qirika wan da diçe xarê.

67; Bi rastî di berê darê xurma û rêzan da, ku hûn ji wan (beran) rozîyên qenc (ji xwarin û vexwarinan) û meyê digirin, ji bona komalakî hişdarî dikin, beratên (sodretî) hene.

68; Û Xudayê te û bal moza hingiv da (aha) niqandîye: "Tu ji bona xwe ra di çîya û dar û ji wan arzêlên (ku ji daran, meriv çê dikin û diçikînin) xaniyan bigire."

69; "Paşê ji hemî beran bi xwe û bi stûxarî paşê bikebe wan rêyên Xuda yê xwe (derkebe) bigere. Ji zikê wan mozan da aveke rengê wê cure cure derdikebe; ji bona merivan di wî (hingivî da) mefayek heye. Di van kirinan da ji bona komalekî ramanger ra beratên hêja hene.

70; Yezdan hûn afirandine, paşê ewê canê we disitîne û ji bo ku hûn ji piştî zanînê qe tu tiştî nizanbin, hinekan ji we, Yezdan ewan heya danê xurifandinê dihêle. Bi rastî Yezdan pirzanê bişîye.

71; Yezdan hinekên ji we, bi ser hinekên we da di rozîniyê da bi paydarî pir kirîye. Îdî ewanê ku para wan pir e, hene: Çî dibe, ku hinekî ji wê rozîyê; ji bona wanê bê par in di binê destê wan da mane, bidin? Loma ewan hemî jî di wê rozîniya heye da, hevpar in. Qey hûn (ji bona vê parkirina Yezdanê, ku rozîniya hinekê we daye destê hinekên ji we; ewan jî di para da rozîniya wanê bindestê xwe bidine wan, qayîl nabin) hûn bi qencîyên Yezdan nankorî dikin?

72; Û Yezdan ji bona we ra ji canê we zo çê kirine, ji wan zonê we ji bona we ra kur û nevî çê kirine. Û hûn bi paqijê rozîyan dane rozînikirinê. Îdî qey ewan bi pûçan bawer dikin û bi qencîyên Yezdan jî nankorî dikin?

73; Û ewan qey ji pêştirê Yezdan, ji bona wan (tokelên) ji ezman û ji zemîn qe bi bu tiştî rozînan ji wan ra kar nakin û nikarin jî kar bikin, perestî dikin?

74; Îdî hûn ji bona Yezdan ra hecwekîyan çê nekin (ji ber hişê xwe nebêjin: "Ka ewan tokelan ji piştî, ku em ji wan ra perestî dikin, ewan jî paşê wekî perestîya me ji Yezdanê mezin ra perestî dikin."). Bi rastî Yezdan (bi hecwekîyan) dizane û lê hûn (bi wan) nizanin.

75; Ji bona we ra Yezdan evê hecwekîyê çêke; ewê (perestîya pêştirê Yezdan dike) wekî wî bendeyê di binê destan da zebûn mayî, qe nikare tu tiştî bike, ewê (perestîya Yezdan dike) wekî wî bendayê ji binê destan derketî, ku me ji wî ra

rozîneke rind dabe, îdî ewa jî bi dizî û eşkere (di rêya min da) bide xwarinê, qe wekî hev dibin? Çiqa pesindan hene! Hemû ji bona Yezdan ra nin. Û lê pirê wan nizanin.

76; Û Yezdan (ji bona we ra serdaborya) her du mêrikan jî hecwekî kirîye; yek ji wan lal e, qe tu tiştî nikare bike: Hey bûye barekî ketîye stûyê serkarê xwe. Axayê wî ewî kuda dişîne, qe tu karê; qencîyê nake. Evê mêrika, qe wekî wî mêrê ku di rêya rast da diçe, fermana bi dadvanî dike, dibe?

77; Ne xûya ne di ezman û zemîn da heyî, hemû ji bona Yezdan ra nin. Fermana bi hatina danê rabûna hemûşkî li bal Yezdan, wekî çav girtinekî ye, ya jî hêj nezîktir e. Bi rastî Yezdan li ser hemû tiştan bi hêz e.

78; Gava Yezdan hûn ji zikê dîya we derxistin, we qe tu tişt nizanbû, ji bona ku bi rastî dibe hûn sipazîya Yezdan bikin ewî ji bona we ra (aletê bîhistinê û dîtîne û dil) çê kirîye.

79; Ma qey ewan (filan) li bal wan çûkên hewa ku ji wan ra sernerm bûne, mêze nakin? Ji pêştirê Yezdan tu tişt ewan (çûkan) di jor da nagire. Bi rastî ji bona komalekî bawer dikin, di van kirinan da beratên (mezin) hene.

80; Û Yezdan ji bona we ra ji xanîyên we êwîrgah çê kirîye û ji bona sivikaîya, di roya barkirin û êwrê da, Yezdan ji kelê tarişan ji bona we ra (kon) û xanî çê kirîye. Gava (ewan tarişan tene kêmkirinê) Yezdan ji hirî û tivtik û mûyê wan, ji bona we ra xemil û xwakirin û raxistin çê kirîye; (Hûn ewan dikirin û difiroşin).

81; Yezdan ji bona we ra ji tiştên ku afirandîye, sîwan çê kirîye û ji bona we ra ji çîyan ewî kozîk afirandîye û ji bona we ra kincên, ku we ji germê û kincên, ku we di qirînan da ji lêxistinê biparisîne çê kirîye. Bi vî awayî ewa qencên xwe li ser we peyweste dike, bi rastî hevî heye, ku hûn xwe hispêrne wî.

82; Îdî heke ji piştî van (beratan, ewan filan, ji bawerîyê) rû bifetilînin (ji bona te ra tu xesar tune ye) li ser te hey eva dimîne: Bi xûyayî ragihandina fermanan e."

83; Ewan qencîyên Yezdan nîyas dikin (paşê dibêjin: "Ewan qencîyan hinekên mayî dane," ji wan ra perestî dikin.) Bi vî awayî pirê wan nankorî dikin.

84; Di wê roya, ku em ji her komê ra şahidan tînin, îdî ji bona wanê file ra destûr nayê dayînê, ku herin lavaya bağışandin yê xwe bikin.

85; Ewanê cewr kirine hene! Gava ewan şapatê bibînin, îdî şapata wan sivik nabe û firseta wan jî nayê danê.

86; Gava ewanê hevriçêker, ewan hevriyan dibînin (aha) dibêjin: "Xudayê me! Ewan hevriyên, ku me ji pêştirê te ji wan ra perestî dikir, evanan in (îdî tola xwe ji wan derxe, ewan em xapandibûn," tokelan bersiva wan aha daye): "Bi rastî hûn derewan dikin (qe tu carî me hûn gazî bal perestîya xwe ne kirine)."

87; Di wê royê da ewan xwe ji bona Yezdan ra dihêspirînin, ewan tiştên ku ewan (filan) ji bona Yezdan ra bi vir dixistinê hevri dest ji wan berdane, wunda bûne.

88; Ewanê file ne, ku merivan ji rêya Yezdan didine para da hene! Bi sedema ku ewan (di zemîn da) têkilî kiribûne, me ji bona wan ra şapat bi ser şapatan pir kirîye.

89; Di wê roya em di her komekî da ji wan bi xweber şahidekî li ser wan da dişînin û em te jî li ser van (misilmanan da) şahid tînin. Ji bo ku (Qur'an) bibe beled û dilovî û mizgîndan ji bona misilmanan ra, me ewa Qur'ana davekirina hemî tiştan, bi ser te da hinartîye.

90; Bi rastî Yezdan fermana bi dadî û qencîyan û dayîna ji bona pismam û lêziman, dike û ewa fermana parisandina ji maştoqîyê û ji rikhatinan û ji cewrkirinê dike. Evan şîretan; ji we ra dike, bi rastî dibe ku hûn ewan şîretan hildin.

91; Û gava we peyman (ji bona Yezdan) da hev, îdî hûn peymana Yezdan pêk bînin û ji piştî, ku we sonda xwe rast dêrand, îdî sonda xwe neşikênin, loma we Yezdan xistîye şahidê xwe. Bi rastî Yezdan bi tiştê hûn dikin, dizane.

92; Hûn jî wekî wê jinika, ku rîsê xwe qenc rîstîye, paşê vedirêse, nekin. Gava hûn bi navê Yezdan peymana didine hev, ewa desta we ye bi hêz dixwaze ku bi hinek endezan peymana xwe bişikênin, dîsa ewanê bê hêz biherçîqînin (ji piştî ku we peyman bi hêz dabe hev, bi hinek endezan paşê di nava xwe da, peymana xwe ranekin) ku hûn sondê xwe di nava xwe da dişikênin. Bi rastî Yezdan we di van peymanan da diceribîne. Ewa tiştê ku hûn di mafe wî da ne wekhev bûne, wê di roya rabûna hemû da ji bona we ra bê vekirinê.

93; Heke Yezdan biva, wê hûn hemûşk bixistina komekê bi tenê; lê Yezdan ji kîjanî

ra bivê ewî tîne rêya rast û kîjanî bivê ewî ji rêya rast wunda dike. Bi sond! Hûnê ji kirinê xwe bêne pîrskirinê.

94; Û hûn (gelî bawergeran!) sondên xwe, di nava hev da nexine sedem ji bona têkilkirina, peymanan ranekin, îdî ewa pêyê bi cîh hatiye danînê paşê bira ne şimite û bira hûn jî ji bona birîna rê ya Yezdan li ber kesan, sikê şapatan tam nekin. Bi rastî heke hûn (wusa bikin) ji bona we ra şapateke mezin heye.

95; Û hûn (Gelî kesan!) ewê peymana we daye Yezdan (ku hûnê bibine peyrewê pêxember) bi perekî hindik nefiroşin. Heke hûn bizanin, bi rastî ewan qencîyên ku Yezdan peymana dana wan ji bona we ra daye, çêtir e.

96; (Loma ewan malên cîhanî ku li bal we heye) paşya wan tî, ewan (qencîyên) li bal Yezdan hene, bê paşîne. Ewanê ku ji bona rêya me hatine cefadanê û di hemberê wê cefayê jî hew kirine mane hene! Bi rastî emê ji kirinê wan çêtir xelata wan bidine wan.

97; Çi kesê, ji mêr û jinan, bi bawerî karekî aştî kiribe, emê ewî di cîhanê da bi paqijê jînan, bidine jînanandinê (lê di para da jî) bi qenctirê keda ewan dikiribûne, emê ewan xelat bikin.

98; Îdî gava (Muhemmed! Tu bivê) ku Qur'anê bixûnî, tu (ji sikatîyên) pelîdê deherok, xwe bavêje ber bextê Yezdanê (dilovan; evê peyvê bixûne).

99; Loma bi rastî li ser wanê bawer kirine û xwe hispartine Xudayê xwe, ji bona pelîd ra qe tu hêz tune ye.

100; Hêza wî pelîdî, hey li ser wanê, ku pelîd ji xwe ra dixine serkar û li ser wanê, ku hevriyan (ji Xudayê xwe ra) çê dîkin, heye.

101; Gava, ku em beratekî (ji fermanê zor) rakin, di şûna wî da (fermanê hesanî) bînin, şixwa Yezdan bi hinartinê xwe çêtir dizane; ewan (filan aha) dibêjin: "(Muhemmed!) tu van kirinan bi pîz li bal xwe dikî." Gotina wan nîne, lê pîrê wan bi vê kirinê nizanin (ka me çima şûna wan bi hev guhurandîye).

102; (Muhemmed! tu ji bona wan ra) bêje: "Ji bo ku ewanê bawer kirine (dilê wan) bi rastî hew bike û beled û mizgîn be ji bona misilmanan ra, bi rastî ewan (beratên hev guharok) Cibrîlê pîroz ji Xudayê min hinartîye."

103; Û bi sond! Em dizanin ku ewan dibêjin: "Bi rastî hinek (zanayên cihû û mexînan, evê Qur'anê) hînê (Muhemmed) dîkin" Ka ça dibe! Ewan merivên, ku ewan goman dîkin û dibêjin: "(Ewan, Muhemmed hînê Qur'anê dîkin.)" zimanê wan biyanî ye û eva (Qur'an bi xweber jî) bi zara wekî 'erebîyê ber çavî ye?

104; Bi rastî ewanê bi beratên Yezdan bawer nakin hene! Yezdan ewan li bal rêya rast da nayne; ji bona wan ra şapateke dilsoz heye.

105; Ewanê bi beretên Yezdan bawer nakin, hey ewan in (ku van) derewan bi vir dîkin. Ewan bi xweber jî hey viroke ne.

106; Ji pêştirê kesê ku dilê wî bi bawerîyê hewya ye, ji piştî ku hatibe zordanê li bal filetîyê (çiqa bi devê xwe gotibe; "Ez bûme file, îdî dest ji min berdin" bi vî ra jî bawerî dilê wî da hewdabe) kîjan ji piştî bawerîyê bibe file û dilê wan bi filetî jî, bi şaî vebûbe, îdî xeşma Yezdanê mezin li ser wan e. Ji bona wan ra şapateke mezin heye.

107; Eva (celata wanê bi vî awayî) ji ber ku ewan jîna cîhanê ji jîna para da pirtir hez kiribûne (loma ji wan ra hatiye). Bi rastî Yezdan komalê file nayne rêya rast.

108; Ewan komalekî wusa nin, Yezdan li ser dilê wan û li ser gohê wan û li ser dîtina wan duruf kirîye. Ewan (ji vê kirinê) bê goman in.

109; Qe (tu tişt nake!) bi rastî di para da jî ewan hey zîyan dîkin.

110; Paşê bi rastî Xudayê te, ji bona wanê hatine cefadanê ji welate xwe derketine, paşê dîsa bi wan (filan ra) tekoşîn kirine, li ser tekoşîn û cefadanê hew kirine, arîkarî dide. Ji piştî (van hemûyan) bi rastî Xudayê te baxişgerê dilovîn e.

111; Di roya para da tê, hemû can ji ber xwe ra tekoşînê dîkin (ji bo ku fereste bibin). Ji bona hemû candaran ra keda ewan kirî (bê kemasî) tê dayînê, li wan nayê cewrkirinê.

112; Yezdan ewî gundê, ku gundîyên wî bi ewletî, bê tirs têda hewyane bi hecwekî tîne; gundîyên wî bê tirs têda diheviyan, rozîyên wan bi hesanî ji her alî ji wan ra dihat. Îdî paşê ewan bi qencîyên Yezdan nankorî kirine, Yezdan bi sedema pêşeyên, ku ewan dikiribûne, xwekirina birçîbûn û tirsê bi wan daye tamkirinê.

113; Bi sond! Pîxemberê wan nankoran, ji wan, li bal wan da hatine, îdî ewan, ew



pêxembera dane derewdêrandinê, bi vî awayî cewra wan peyweste bûye, îdî şapatê jî bi wan girtîye.

114; Îdî hûn (gelî merivan!) ji wî rozîniyê ku Yezdan daye we, bi duristî û bi paqijî biwun. Heke hûn bi rastî sipazîya qenciyên Yezdan dikin, perestîya wî bi te-nê bikin.

115; Bi rastî hey ji bona we ra mirar û xûn û goştê berazan û (goştê wê gorya) ku hûn ji bona (qayîlbûna) Yezdan (jê nakin, lê ji bona hatîna serokan, ya jî ji bona mezar û goran, ya jî ji bona ku xweyê wan goran, mafê bide nexweş û nexweşîya bi we da hatî, jê dikin) ne durist e. Îdî heke yek ji we (rastî tu xarinê ne hatibe, ji bona ku bijî) dikare ji van (goştên borî) xarîneke neji û nemir bixwe. Bi rastî Yezdan baxişgerê dilovîn e.

116; Hûn (gelî kesani!) zimanê we bi vir salixê çî bide, bibêje: "Evan durist in û evan ne durist in," ji bo ku hûn li ser navê Yezdan derewan bikin (evanan duristîyên Yezdan in bêjin, wusa nekin). Bi rastî ewanê bi vir, derewan li ser (navê) Yezdan dikin, ewan fereste nabin.

117; (Evan kirinê wan di cîhanê da) derbasîyeke hindik e (lê di para da) ji bona wan ra şapateke dilsoz heye.

118; Ewanê cihû hene! Tiştê me ji te ra di berê da (ne duristîya wan) gotîye; ji wan ra jî me ne durist kiriye. Me bi vê (ne duristî) li wan cewr ne kirîye, lê ewan bi xweber li xwe cewr kirine.

119; Ewanê bi nezanî sikatî kirine hene! Heke ji piştî sikatîya kirinê, poşman bibin û temtêla xwe rast kiribin. Bi rastî Xudayê te li bal wan e, bi rastî ji piştî van kirinan Xudayê te baxişgerê dilovîn e.

120; Bi rastî Îbrahîm (pêşrewanaki wusa ne, ku bi gotina Yezdan, hemû xûyê qenciyî di xwe da civandîye) ji hemû pûçan dest berdaye, ji bona Yezdan ra zivirîye. Û qe tu carî hevî çê ne kirîye.

121; (Îbrahîm) ji bona qenciyên Yezdan ra sipazkar e. (Yezdan, Îbrahîm) li bal rêya rast da anîye.

122; Û me di cîhanê da (ji bona Îbrahîm ra) qencî dane. Bi rastî ewa di para da jî ji aşîkaran e.

123; Paşê me li bal te da niqand; ku tu bibî peyrewê komalê Îbrahîm yê mafperest. (Îbrahîm) qe ne bûye ji wanê hevriçêker.

124; (Hûn roya îne ji bona xwe ra bixne roya rawestî û perestîyê) roya şemîyê; ji bona wanê ne wekhevbûnî têda çê kirine (ji cihû û mexî û mayan) bi vê nevê bûye (roya rawestî û perestîya wan). Bi rastî Xudayê te ye, di roya rabûna hemû da di wî tiştê ku ewan têda ne wekhevbûnî kirine, berewaniya wan bike.

125; (Muhemmed!) Tu li bal rêya Xudayê xwe da, ewan bi zanîna retkokî û bi şîretên qencî va gazî bike. Tu bi qencê tekoşîna, bi wan ra tekoşîne bike. Bi rastî Xudayê te bi wanê ku ji rêya wî derketine çêtir dizane.

126; Heke hûn cefayê bidine (wan nayarê xwe) îdî wekî ewan ça cefa dane we, hûn jî hewqas bikin. Heke hûn hew bikin (di hemberê cefadana wan da) şixwa (baxişandin) ji bona hewdaran ra qencîr e.

127; Û (Muhemmed!) Tu li ser cefadana wan hew bike (ewan bibaxişîne). Şixwa hewa te bi xweber jî bi Yezdan e, ji bo ku ewan endezan dikin (berê xwe ji ola misilmanîyê difetilînin) tu mirûz nebe û singê xwe jî teng neke.

128; Bi rastî ewanê xudaparizî dikin û bi xweber jî qencîkar in, Yezdan bi wan ra ne.

## Chapter 17 (Sura 17)

1; Ew Xudayê, ku bendê xwe, di şevêkî da ji mizgevta (bi nav) Mescid ul-Heram li bal mizgevta (bi nav) Mescid ul-Eqsa ya ku me dora wê pîroz kirîye, daye birinê heye! Ewa ji hemû kêmayan paqij e. (Me eva dabirandin çê kir) ji bo ku em bi wî (bendeyê xwe yê Muhemmed ra) hinekî beratên xwe yên (sodret) bidine xûyandinê. Bi rastî (Yezdan) bîhistokê didevan e.

2; Me ji bo Mûsa ra pirtûka (bi nav Tewrat) anîye, ji bo ku ewa ji bona zarên cihûyan ra bibe beled û ji bo ku (ewa ji wan ra bêje: "Gelî zarên cihûyan! Hûn) ji pêştirê (Yezdan) ji xwe ra serkaran negirin."

3; (Gelî ûrta, ku me hûn bi Nûh ra) hildabûne kelekê! Bi rastî (Nûh) bendekî pir sipazger bû (hûn çima sipazî nakin?).

4; Me li bal zarên cihûyan ra di pirtûkê da pêk anîye; ku hûnê di zemîn da du caran tevdanî bikin û hûnê paşê bi quretî cewrên mezin bikin.

5; Îdî gava danê yekem ji wan her du danan hat; me li ser we da hinek bendeyên, ku ji bona me ra xwuribûne, xweyî burha mezin û zor hêz bûne, şandîye: Ewan ketine welat û xaniyên we li wan deran da, li we digeryan (hûn ber hev dikirin, ji welatê we, hûn derxistin, bi zebûnî birin) eva (celata hanê ji bona we ra îdî) hatibû pêkanîne (paradana wê qe çê ne dibû).

6; Paşê (hûn ji kirinê xwe poşman bûn) me jî hêza we ya berê (ji bona servehatina bi ser neyaran da) dîsa da we; me hûn bi mal û zaran bi hêz kirin, me hûn bi qirînvani û nijdevani pirtir kirin.

7; Heke hûn qencîyan bikin, hûn ji xwe ra qencîyan dikin, heke hûn sikatîyan bikin, îdî şixwa sikatî ji bona we ra ne. Îdî gava danê celata mayî hatiye; (we dîsa dest avêtiye kirina sikatîyan, emê dîsa ewan bendeyên xwe yên xwurîne, bi hêz û zorbirhan, bi ser we da bişînin) ji bo ku ewan (dîsa) rûyê we reş bikin, ça di cara yekem da ketibûne mizgevt û (welatê we, hûn bi kuştin û zebûnî, ji welat derxistibûne) dîsa wusa bi serê we bikin; ji bo ku ewan rastî çî werin kaviil bikin (ewan ji we tol hildane).

8; (Heke hûn ji wan kirîne xwe poşman bibin) dibe ku Xudayê we, li we dilovîni bike. Heke hûn dîsa bizivirine (bal wan kirinan) emê jî bizivirîne (bal şapatdana we). Bi rastî me ji bona filan, doj xistiye zîndana niximkar.

9; Bi rastî eva "Qur'an"a (ji bona kesan ra) beledîya rêya rasttir dike, ji bona wanê bawer kirine û karê aştî kirine mizgîn dide, ku bi rastî ji bona wan ra kirêke mezin heye.

10; Bi rastî ewanê ku (bi jîna) para da bawer nakin hene! Me ji bona wan ra şapateke dilsoz bi amadî peyman kirîye.

11; Meriv ça qencîyan dixwazin, wusa sikatîyan jî dixwazin (ça hez dikin hema bira qencî bi wan da werin, wusa jî hez dikin, heke wê şapatê bi wan da were, awîl bira were). Di van xwestinê xwe da meriv pir lezoke ne.

12; Me şev û ro xistine du berate; (ji bona şîna-qudret xwe ku em dikarî têkilê wan bin jî. Ewan her du berate jî berê da wekî hev bûn, paş da) me berata şevê heşivand (ewa tarî kir) û me berata royê jî xiste dîtoker (me ronahî têda çê kirîye. Bi can têda tiştan dibînin). Û (me ewan beratan xistine van rûçikan). Û ji bo ku hûn rozînan ji rûmeta Xudayê xwe ra bicivînin û hijmara salan û royan bizanin, me hemî tişt bi êşkere daye vekirinê.

13; Em ji hemû kesan ra (kirinê wî wekî) çûkan di stûyê wî da darda dikin. Di roya rabûna hemû da em ji bona wî ra pirtûkeke vekirî derdixin, ewa di wê gavê da rastê wê tê.

14; (Ji wî ra em dibêjin): "Ka îdî tu bi xweber pirtûka xwe bixûne. Di îro da tu bi xweber ji bona hijmartina (qencî û sikatîyên xwe) besî xwe î."

15; Kîjan hatibe rêya rast, îdî ewa ji bo xwe ra hatiye rêya rast. Û kîjan rêya xwe wunda bike, îdî rê wunda kirina wî ji bona wî bi xweber e. Tu bardarê (gonehan û qencîyan û giraniyan) barê mayîyan hilnade (hey barê xwe hildide). Heya em di nava komalan da pêxemberan neşînin, ji tu komalî ra em şapatê nadin.

16; Gava ku em teşqeledana welatekî bivên, em (rozîniyê wan pir dikin, ewan biryarên me bîrva dikin). Vêca em jî fermana wanan (bi hatina rêya rast dikin) îdî ewan ji rêya rast dûr dikebin (bi wî awayî peyman me ye) bi şapatdana wan maf dibe. Îdî em jî ewan welatan bi kavilî teşqeleda dikin.

17; Ji piştî Nûh da me çîqa (welat) di çaxan da teşqeleda kirîye! Agah û dîtina Xudayê te bi gonehên bendeyên xwe, besî wî ye.

18; Kîjan (evê cîhana hanê) lezoke bivê, em di cîhanê da ji bona wî ra, tişt ku em bivên, bi lez didin, paşê em ji bona wî ra dojê amade dikin. Ewa li bal dojê da, bi sernegûnî û çikûsî û rûreşî tê kişandinê.

19; Û kîjan jî (di cîhanê da) jîna para da bivê û bi bawerî ji bona (wê jînê) xebata babet ya wê jînê jî kiribe, îdî kirinê van têne spaskirinê.

20; Em ji hemûşkan ra jî; ewanê (jîna cîhanê va ne) û ewanê (jîna para da va ne û ewanê herduk jîn jî va ne û ewanê file û bawerger jî) ji dayîna Xudayê te ji wan ra raber dikin. Qencîyên Xudayê (te ji tu kesê va ye ra) ne hatiye birînê.

21; (Muhemmed!) Tu mêze bike, ka me ça hinekên ji wan bilind û paydar û maldar kiriye, li ser hinekên wan. Bi rastî jîna para da, meztirê payan e û meztirê rûmeta

ne.

22; (Muhemmed!) Ji bo ku di para da bi serê xwe bi tenê bi mirûzî rûnenê, tu ilahên mayî, ji bona Yezdan ra beraber negire.

23; Xudayê te fermana xwe pêk aniye; ku hûn hey ji bona wî bi tenê ra perestî bikin û hûn ji bona dê û bavê xwe ra qenciyan bikin (qe li wan xirabî nekin). Gava yek ji wan, ya jî her du bi hev ra li bal te pîr bûn, îdî tu (ji bona xebata berdestê wan aha) nebêje: "Of (ez westiyam, îdî bes e ez naxebitim) li wan hêrs nebe. Û tu ji bona wan herdukan ra mijûliyên qencî bêje."

24; "Û tu ji bona wan herdukan ra baskê xwe bi dilovanî berjêr bike (di hemberê wan da nerm xebat bike) û tu ji bona wan ra (aha lavayan bike): "Xudayê min! Tu (li dê û bavê min) dilovanî bike, ça ewan di danê piçûkaya min da (li min dilovanî kiribûn) ez mezin ki-ribûme."

25; Xudayê we bi tiştê di hundurê we da heye çêtir dizane. Heke hûn aştîyê bikin (ji kirine xweyên sik poşman bibin) şixwa îdî Xudayê we jî ji bona wanê ku bi poşmanî lava dikin, baxişkar e.

26; Û (Muhemmed! Tu bi tevê kesan va) mafê bira û pismanan û belengaz û rêwîyan (ji malê xwe) bidine wan, tu (malê xwe bê perwa) bi destvekirî belav neke.

27; Loma ewanê (ku malê xwe b perwa) bi destvekirî belav dikin hene! Bi rastî ewan biranê pelîd in. Pelîd bi xweber jî ji bona Xudayê xwe ra nankorekî hînçkar e.

28; Heke (destê te da) ew malê ku te ji dilovanîya Xudayê xwe diva, tune bû, îdî te jî ji wan rû fetiland (ji ber ku di dastê te da tune bû, tu bidî wan) barî tu ji bona wan ra mijûliyeke hesanî û nerm bêje.

29; (Di sixwurandîna ji bona hewcan ra tu ji xwe ra rêyeke nîwarî bikire); ne destê xwe li bal qirika xwe da girêde (ji bo ku tu qe tişteki nedî wan) ne jî (destê te da çi mal hebe) hemûşkî belav neke, loma heke (tu wusa bikî) tuyê (bi rexni) kovanan bikişî û rûnê.

30; Bi rastî hey Xudayê te ji bona bendeyên xwe ra rozînan kêr û pîr dike. Loma (Xudayê te) agahdar û dîtogerê bi bendeyên xwe ye.

31; Û hûn (gelî kesan!) ji tirsê xezanîyê zarokê xwe nekujin. Loma ji bona wan zar û we bi xweber jî em rozînan didin. Bi rastî kuştina ewan zaran gonehekî pîr mezin e.

32; Û hûn (gelî kesan!) nêzîkê maştociyê (zina) nebin, loma bi rastî ewa karek gelek pîs e. Ewa reyeke sik e!

33; Û hûn (gelî kesan!) ewa kesê, ku Yezdan kuştina wî ne durist kirîye, bê mafî ewî nekujin. Loma bi rastî kesê bi cewrî hatibe kuştinê, îdî me ji bona mîratxurên wî ra hêz daye (ku ewa mîratxura li mafê kuştî bigere: Hez dike tola wî hilde, hez dike bira kujrawê bibaxişîne). Ji ber ku ji wî ra hêz hatiye dayînê, îdî bira (ewa mîratxura jî ji pêştirê kujrawê destê xwe dirêjî kuştina malî û bira û pismamên kujrawê) bi kuştinî neke.

34; Û hûn (gelî kesan! ji bona sixurandîna malê) sêwîyan, nêzîkê malê wan nebin, heya ku ewan sedra xwe nebînin. Ji pêştirê heke hûn malê wan (ji wan çêtir ji bona wan ra bisixurînin, hûn wê gavê dikarin bisixurînin). Û hûn (gelî kesan!) peymana we dayî pêk bînin. Loma bi rastî (hûn) ji peymana dayî têne pîrskirinê.

35; Û hûn (gelî kesan!) gava hûn (tişteki) bi pîvayî (bidine hev, hûn) pîvana xwe rind pêk bînin, hûn bi terezîya rast kêşan bikin. Aha kirin (ji bona kirîn û firotina we) qenctir e. Şixwa dawîya wî jî qenctir e.

36; Tu ji bona wî tiştê qe ji te ra di mafê wî da tu tişt ji zanînê tune ye, pey da çûnê neke. Loma bi rastî bîhistin û dîtin û dil, hemûşk jî (meriv) ji wan têne pîrsikirinê.

37; Tu li ser zemîn bi quretî negere. Loma tu nikarî (bi çûna xwe) zemîn biqelêşî û tu bi dirêjî jî nagihêjî çîyan.

38; Evan (kirinê borî, ku me fermana bine kirina wan kirîye) hemî jî kirina wan li bal Xudayê te sik e.

39; Evan (biryarên) ku Xudayê te li bal te da niqandine, ji wan zanînê retkokî ne. Tu bi Yezdanê (babetê perestîyê ra) bi xudatî, tu ilahî negire. Heke (tu wusa bikî) tuyê bi rûreşî li bal dojê da (dûrê dilovanîya Yezdan) bê avêtinê.

40; (Ka eva ça dibe!) Xudayê we hûn bi zarên kurî xurî kirine, ji xwe ra jî ji firiştan (keçên) me girtine? Bi rastî hûn mijûliyên pîr mezin dibêjin!

41; Bi sond! Ji bo ku hûn (evan qedexeyên Yezdan) bira xwe bînin, me (evan arşan)

di vê Qur'anê da (bi peyvane cure cure) pir caran (gotine). Lê evê (gotina me) ji bona wan ra hey revandina (ji mafê) pir kirîye.

42; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Heke ça (hevriçêker) dibêjin bi Yezdanê (babetê perestîyê ra) heval hene wusa bûya; wê hevriyan (ji bona servahatina xwe li ser) xweyê arş da, xebata (rêyên servahatinê) bigeryanan."

43; Ewa ji wan gotinê wan, pir bilind û paqij e.

44; Ji bona wî ra heft ezman û zemîn bi tevê tiştên di wan da heyî perestî û paqijî dikin. Şixwa çiqa tişt hene! Hamû ji sipazîya bi paqijî dikin, lê hûn pisporî û sipazîya paqija ya wan nakin. Bi rastî Yezdan mêhrivanê baxişger e.

45; Gava tu Qur'anê dixûnî, em di nîveka te û di nîveka wanê ku bi jîna para da bawer nakin, xêlyeke, ku xûyandin têda çê nabe, dikişînin.

46; Em li ser dilê wan da sapan û di gohê wan da jî giranî datînin, ji bo ku ewan pisporîya wê Qur'anê nekin. Di gava ku tu di Qur'anê da (dibeji): "Xudayê min yekê bi tenê ye" Ewan di para da dizivirin; rikê xwe tînin.

47; Di gava ewan têne gohdarya te, ka ji bo çi gohdarî dikin, em çêtir dizanin; gava ewan têne gohdarya te, dizîka da di nava hev da (aha pistepist dikin) ewan cewrkaran (aha) ji hev ra dibêjin: "Bi rastî em bûne pêyrewê mêrekî ançkar."

48; (Muhemmed!) Tu li wan mêze bike, ka ewan ji bona te ra heçwekîyan ça çê dikin? (Gotin: "Bengîyek e, ançker e, tepa dikebe, bê hiş e, nigase ye - xeyalperest. Îdî ewan bi van heçwekîyan (rêyên rast) wunda kirine, nikarin werin rêya rast bibînin. 49; Ewan ji hev ra (aha) gotine: "Gava em bûne hestî û arişt jî, bi rastî qey emê ji nû da bûne afirandinê, ji bona (kirinê me di cîhanê da kirî, hijmara wan bidin) emê dîsa bûne civandinê?"

50; (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Hûn hez dikin bibine kevir ya jî hesin."

51; "Ya jî bibine ji wan hevînên, ku hûn ewan heyran li bal xwe meztir dikin (hûn çi dibin, bibin hûnê hey ji piştî mirinê li bal w da bicivînin)." Ewan (aha) dibêjin: "(Ji piştî mirinê dîsa li bal jînê da) kî me difetilîne?" (Tu ji wan ra aha) bêje:

"Ewê ku di cara yekem da hûn afirandine, wê di vê carê da jî we biaferîne. Ewan serê xwe bi tinazî li bal te da dihejînin û ji te ra dibêjin: "Ka ewa dana kengê ye?" (Tu ji wan ra) bêje: "Bi rastî hevî heye ku ewa dana nêzîk be."

52; Di roya ku (Yezdan, di goran da) gazî we bike, îdî hûnê bi spazî (bersiva wî bidin, herne civînê) û hûnê goman bikin, ku hûn (di goran da) hindik mane.

53; (Muhemmed! Tu ji bona) bendeyên min ra (aha) bêje: "Hûn (gava bi tokel perestîyan ra mijûl bibin, hûn) mijûly a qenc ji wan ra bêjin. Loma pelîd divê, ku di nîveka we da hev çûyîne çê bike. Bi rastî pelîd ji bona merivan ra neyarekî xûya ye."

54; "Xudayê we, bi we çêtir dizane. Heke bivê wê li we dilovînî bike, heke bivê wê we şapat bike (di nîveka we û Xudayê we da tu tişt tune ye)." Me tu neşandî ku tu li ser wan bibî serkar.

55; Û Xudayê te bi wan kesê di ezman û zemîn da heyî, çêtir dizane. Bi sond! Me hinek pêxember, li ser hinek pêxemberan (bi zanîn) rûmetdar kirine û me ji bona Davûd ra (pirtûka bi nav) Zebûr daye.

56; (Muhemmed! Tu ji bona wanê file ra aha) bêje: "(Gelî filan! Ka îdî hûn) gazî wan xudayên, ku we ji pêştirê Yezdan, ji xwe ra bi qestî perestvan girtibûne, bikin; bira arîkarya we bikin, îdî ewan nikarin tu zîyanê ji we bidine rakirinê û nikarin bidine fetilandinê jî."

57; (Ewan xudayên ku ewan filan bi perestî) gazî wan dikin hene! Peyrewê wan, ji bo ku ewan ji wan ra bibine darende li bal xudayê wan, gazî wan dikin ka kîjan ji wan xudayan nêzîkê Yezdan e, ku ewa ji bona wan peyrewên xwe ra, dilovanîya Yezdan bixwaze û peyrewê xwe ji şapata Yezdan biparisîne. Bi rastî şapata Xudayê te pir tirseke zor e.

58; Çiqas welatek hebe; di berya roya rabûna hemû da, ya em ewî teşqeke dikin, ya jî em (rûniştîyên wî) bi şapateke zor, şapat dikin. Eva (celatdana) bi vî awayî di pirtûkê da hatiye nivîsandinê (bi vê nevê tê pêkanînê).

59; Ji bona şandina beratên derhoze (mucîze) tu tiştî, ji pêştirê derewdêrandina wanê berê, ku borîne, em nedane para danê (loma me berê da çiqa berateke derhoze şandibû, ewanê berê, dabûne derewdêrandinê, heke em naha jî bişînin we evanê jî, dîsa bidine derewdêrandnê, ji ber vî me ne şandiye). Me ji bona Semûdiya, berateke (derhozeye) ber çavî; devek dabû. Îdî ewan bi sedema wê devê li xwe cewr kirine

(loma bawer nekirin, di şûna wî da rabûn, devê jê kirin). Em hey ji bona tirsdanîyê beratên derhoze dişînin.

60; Di gava me ji bona te ra (aha) gotibû: "Bi rastî Xudayê te hemî kes hildane binê haz a xwe (bîra xwe bine)." Ewa xewna, ku me bi te dabû dîtîne (di şeva bi nav Esra da) û di Qur'anê da ewa dara deherok (ku di dojê da hêşîn dibe) hene! Me ewan ji bona kesan ra hey xistîye ceribandîn." Em kesan (cure cure bi wan didine) tirsandinê (evan anîna van beratan) hey quretîya wan filan bi mezinî pir kirîye.

61; Di gavekî da, me ji bona fereştan ra (aha) gotibû: "Gelî firiştan! Hûn ji bona nişa kesan ra kunde beherin." Îdî ji pêştirê nişa pelîd, hemîşkan kunde birin. (Yezdan ji wî pirsî: "Tu çima kunde nabî?" Nişa pelîd aha) gotîye: "Ez ça kunde dibim ji bona wî yê, ku te ewa ji heryê çê kirîye?"

62; "Tu qe li bal wî yê, ku te ewa li ser min rûmetdar kirîye mêze dikî (ka bi Xudê kî, çiyê wî bi ser min dane, heya ez ji wî ra kunde beherim)? Bi sond! Heke tu min heya rûya rabûna hemîtî para da bihelî, ji pêştirê hindikê ji ûrta wî, ezê ji binva ewan ji rêya rast derxim, li pey xwe binim."

63; (Yezdan ji wî ra aha) gotîye: "Bi qîşte here, îdî ji wan, kî bibe peyrewê te, doj celata we hemûya ne. Doj (ji bona we ra) celateke hêca ye!"

64; "Tu ji wan bi kîjanî dikarî, bi dengê xwe ewan bişimîtîne û tu bi sîyarî û pêyane xwe va êrişê behere ser wan; di mal û zarên wan da bibe hempayê wan û tu (ji bona wan ra) peymanê (cure cure) bide. Şixwa pelîd ji pêştirê xapandinê tu peymanê ji bona wan ra nade."

65; "Bi rastî ewan bendeyên minê xurî hene! Ji bona te ra tu hêz li ser wan tune ye. Bi serkarî Xudayê te besê wan e."

66; (Gelî merivan!) ewê ku ji bona we ra kelekan di deryayê da dide gerandinê, ji bo ku hûn ji rûmeta wî rozîyên xwe pêk binin heye! Ewa Xudayê we ye. Bi rastî ewa Xuda ji bona we ra dilovîn e.

67; Gava di deryayê da nexweşîyek bi we digire, ji pêştirê (Yezdan) ewan tiştên ku hûn ji wan lavaya dikin, wunda dibin (ji bîra we diçin, loma ji pêştirê wî tu kes nikare we fereste bike). Dema ku Yezdan we ji deryayê li bal reşayîyê derdixe, hûn dîsa ji wê perestîya xurî rû difetilînin. Bi rastî meriv, pir nankor in.

68; (Gelî kesan!) qey hûn ewle dibin (ku Yezdan) ewî zemînî hûn li ser fereste bûne wernegerîne, we nede dabiûlandînê, ya jî bahorekî bi ser we da bişîne (kevîran rake bi serê we da neyne xwarê? Heke Yezdan evan bike) paşê hûn ji bona xwe ra rastê tu serkarî nayên.

69; Ya jî hûn ewle dibin, ku (Yezdan) careke dinê wedîsa li bal deryayê da bizivirîne, îdî li ser we da bagereke hilwejk bişîne, bi sedema filetîya we, we hemûşkan di deryayê da nefetisîne? Heke (Yezdan evan bike) paşê hûn ji bona xwe ra jî rastê tu peyrewkarê, ku evîkarê we, li bal min peywestî bike (tola we hilde we ji destê min fereste bike) nayên.

70; Bi sond! Me ûrte Adem li ser (heyana) paydar kirîye. Me ewan di reşayî û di deryayê da (li ser tariş û kelekan) hildaye û me ji bona wan ra paqijê dilikan daye. Û me ewan li ser pirên ji afirandinê xwe bi rûmetdarî paydar kirîye,

71; Di wê roya, ku em gazî hemû kesan bi pêşrewanê wan va dikin. Îdî ji kî ra nivîsandinê xwe bi xweber dixunin, li wan wekî takî cewr nayê kirinê.

72; Kî di vî cîhanê da kor be (rêya rast ji bona xwe ra nebîne) ewa di para da jî kor e (rêya ferestebûna xwe ji aşîtan nabîne) û ji herkesî jî pirtir rê wunda kirîye.

73; Hindik mabû, ku ewan te jî ji wan biryarên me li bal te da hinarti bû, bidine paradanê (ji bo ku tu hinek mafan ji bona perestîyên wan ra bizanî û hinekî rûmetan ji bona wan ra bigirî aha ji te ra dibêjin: "Heke ji te hate pirsînê, ka tu evan kirinan, ji bona pûtan ji kur tînî?" Tu bersiva wan aha bide, bêje: "Yezdan wusa ferman kirîye." Paşê emê bi te bawer bikin, Ewan evan kirinan ji te ra dibêjin) ji bo ku tu bi vîr, tiştê me ne kirîye bavêjî ser me û di wê gavê da ewanê te ji xwe ra dost bigirin.

74; Bi sond! Heke me ji te ra nivadin û hew ne dabûya, teyê bi tiştêkî hindik li bal wan da (ji ber gotin û kirinê wan ji te ra) pal dabûya.

75; Gava (te bi gotina wan kiribûya) meyê (şapata xwe) di jîn û mirinê da bi du carî bi te bida çeşne kirinê. Îdî paşê tu ji bona xwe ra (di hemberê me da) rastê tu arîkarî nedihatî (ku ewa te ji şapata me fereste bike).

76; Û hindik mabû ku ewan te di zemîn da bêzar bikin, ji bona ku ewan te ji welat derxin û (ji piştî derketina te ji welat) ewan jî hidik li eiy te da (di welat da) dimînin.

77; Eva rêya, rêya wan pêxemberên me ne, ku me di berya te da şandibûne (komalê wan jî ewan ji nava xwe dane derxistinê) û tu ji bona rêya me ya hanê ra rastî tu guhurandinê nayê (eva rêzikek, wusa dom dike diçe).

78; Di gava roj, ji derketinê li bal rojava da diçe, heya tarîya şevê tu nimêja xwe bike û Qur'ana sibehê (ku di nimêja sibehê da dirêj tê xwendinê, bîrva neke). Bi rastî Qur'ana (di nimêja sibehê da tê xwendinê bîrva neke (loma danê, ku Qur'an têda tê xwendinê, êvar û sibeh bi hev ra dicivin.

79; Tu di danekê şevê da rabe, ewa nimêja ku xurî ji bona te ra ne, bike, ku Xudayê te, te li bal paye şûnwarên pesinvan da bişîne.

80; Tu (ji Xudayê xwe aha lava bike): "Xudayê min! Tu di cîyê ketina rastîyê da min bixe (cîyan) û tu dicîye derketina rastîye da min ji wan (cîyan) derxe (tu min kuda dişim bi xwaşi bişîne u min ji keder e dem bi xwaşi derxe) tu ji bal xwe, ji bona min ra hezeke arîkar bide."

81; Tu (ji bona wan ra) bêje: "Bi rastî maf hatiye û pûçî çûye. Şixwa bi rastî pûçîtî bi xweber hey çûye."

82; Me ji bona bawergeran ji Qur'anê, tiştê mefa û dilovîn e hinartîye. Eva (hinartîna me) ji bona cewrkaran hey zîyanê pir dike.

83; Gava em ji bona merivan qencîyan dikin: (ji wî ra mal û zar didin) rûyê xwe difetilîne, ewan qencîyan li bal xwe da dide: (evan qencîyan min bi xweber pêk anîne). Gava aşîtek pê da hatibe, heman (ji ferestîya wê aşîte) bê hevî dimîne.

84; Tu (ji bona wan ra aha) bêje: "Her kes wekî xwe xebatê dike. Îdî Xudayê we ka kîjan di rêya rast e çêtir da ne, pê dizane."

85; Ewan merivan ji te dipirsin: "Ka can çî ye?" (Tu bersiva wan aha bide): "Can ji fermana Xudayê min e, zanîna (ji can,) li bal we da hindik hatiye dayînê."

86; Bi sond! Heke em bivên, emê zanîna ji wan biryarên, ku me li bal te da hinartîye beherin, paşê ji bo ku tu ewê (zanînê para da bistînî) ji bona te ra di hemberê me da, rasthatina tu serkarekî tune ye.

87; Ji pêştirê dilovanîyeke ji Xudayê te (hey ewa dikare dîsa ewan zanîna para da bide te). Bi rastî rûmeta Xuda li ser te pir mezin e.

88; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Bi sond! Heke meriv û meçêtir bicivin ji bo ku (pirtûkeke) wekî Qur'anê (binivîsin) bînin, heke ewan bibine piştevanê hev jî dîsa ewan nikarin wekî wê Qur'anê bînin."

89; Bi sond! Me ji bona kesan ra di vê Qur'anê da ji hemî hecwekîyan car bi car anîne, îdî pirê kesan (ji wan rû fetilandin) nankorî kirine.

90; Ewan (nankoran) gotine: "Heya tu ji bona me ra kanîyekî ji zemîn dernexî, em bi te bawer nakin."

91; "Ya jî heya bax û rezeqî te ji xurma û tirîyan, ku di binê darê wî da jî çemên avê bikişin, tune be (em bi te bawer nakin)."

92; "Ya jî tu ça goman dikî, heya tu bi ser me da, ji ezmanan parên (ji şapatê) neynî xarê, ya jî tuyê Yezdan bi tevê Firiştan va di berya xwe da bînî (ewanê şahidî bidin, ku tu pêxember î, wusa nebe em bi te bawer nakin)."

93; "Ya jî xanîkî te yê ji xîşra tune be, ya jî heya tu bi jor da hevraz neçî, heke tu herî ezmanan jî, heya tu ji bona me ra pirtûkekî ji ezmanan nehîninî, ku em ewê pirtûkê bixûnin (ka tu pêxember î, an ne, em bi te bawer nakin)". Tu (bersiva wan aha) bide: "Ez Xudayê xwe ji van (dîlxazîyan) paqij dikim (qê mafê min nîne, ku ez evan aşîtan ji wî bixwazim) hey ez xurî merivek im li bal we da (bi pêxemberî) hatime şandinê."

94; Şixwa paradana merivan ji baweryî eva ye. Gava ji wan ra rêber û beled hatine, gotine: "(Em pêxember in, bi me bawer bikim.)" Ewan jî (aha bersiva dane): "Qey Yezdan ji merivan pêxemberan dişîne?"

95; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra) bêje: "Heke di zemîn da firiştên nivanên geroke hebûna, meyê di ezmanan da li ser wan da firişte bi pêxemberî bişanda."

96; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra) bêje: "Di nava min û we da bi şahidî Yezdan bes e. Loma ewa bi kirinê bendeyê xwe agahdar e, dibîne."

97; Yezdan kîjanî bîne rê, îdî ewa hatiye rêya rast û Yezdan kîjanî wunda bike, îdî tu ji bona wî ra, ji pêştirê Yezdan rastî tu serkarî nayê. Emê ewan di roya rabûna

hemî da kor û lal û ker bi deverû bicivînin. Êwra wan doj e, çîqa agirê wê ditemire, em pêtê agirê wan pir dikin.

98; Celata wan eva ye, loma ewan bi beratên me bûne file û ewan gotibûne: "Heke gava em bibîne hestî û arişt jî, qey emê ji nû da bêne afirandinê, dîsa bêne civandinê?"

99; Ma qey ewan mêze nakin? Ew Yezdanê, ku karîye ezman û zemîn afirandiye, dikare ku heyîne wekî wan jî biafirîne û Yezdan jî bona (afirandin û mirîna) wan ra danêkî bê dudil daniye. Îdî cewrkaran, ji pêştirê filetiyê (ji hemî beratên rû fetilandinê).

100; (Muhemmed! tu ji wan ra) bêje: "(Hûn wusa çikûsin) heke hûn ji dîlovanîya Xudayê min bibûna xweyê xezînan jî, dîsa we ji tîrsa xezanîye tu tişt ji wan nedi sixuradin. Bi rastî meriv pir çikûs in."

101; Bi sond! Me ji bona Mûsa ra neh beratên derhoze (mucîze) bi vekirî dane. Îdî tu ji zarên cihûyan pîrs bike, gava Mûsa (bi van beratên va) hatibû bal wan, dîsa Fir'ewn jî bona Mûsa ra gotiye: "Bi rastî Mûsa ez goman dikim ku tu hatî ançkirinê."

102; Musa (ji bona wî ra) gotiye: "(Fir'ewn!) Tu rind dizanî, ku ewan beratên (ji bona rast derandina min) hey Xudayê ezman û zemîn hinartîye, şîxwa li ber çava ne jî. û Fir'ewn! (îdî qe tişteki ne bêje) bi rastî ez goman dikim, îdî dawya te hatiye (tê werî teşqelekirinê)."

103; Îdî (Fir'ewn) xwast, ku (Mûsa û zarên cihûyan) ji welatê (Misrê) derxe, me jî (Fir'ewn) û kesên bi wî ra heyî, hemî (di avê da) fetisandin.

104; Me ji piştî (Fir'ewn) jî bona zarên cihûyan gotiye: "(Gelî zarên cihûyan!) Hûn li dû (fir'ewn da) di wî zemînê (ku Fir'ewn, diva we ji wura derxe) rûnên. Îdî gava danê para da hatibe, emê we hemîşkan li hev peçayî bînin cîyekî.

105; û me ewa Qur'ana (ji bona ku rastîyê bide derxistinê) hinartîye. Şîxwa ewa bi mafî hinirîye. Me tu jî (Muhemmed!) hey ji bona mizgîn û hişyarîye bi pêxemberî şandîyî.

106; Me beratên wê Qur'anê anî ji hev derxist, ji bo ku tu hêdî hêdî bi nîvanî ji bo kesan ra bixunî. Me ewa Qur'ana (wekî hewcebûna kesan hindik hindik) hinartîye.

107; (Muhemmed! tu ji wan ra) bêje: "Hez dikin bawer bikin, ya jî bawer nekin, bi rastî ewanê hêj berya hatina Qur'anê (ji wan ra bihatina Qur'an û pêxember) zanîn hatiye dayînê hene! Gava Qur'an ji wan ra tê xendinê, ewan deverû kunde dibin."

108; û (aha) dibêjin: "Bi rastî Xudayê me ji kêmayan paqij e. Bi rastî peymanê Xudayê me dayî, pêk hatiye."

109; (Qur'an çîqa tê xwendinê) nermaya wan hewqas pir dibe, ewan bi deverû dikebin digrîn.

110; (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Hezkî bi navê Yezdan hildin gazî bikin, hezkî bi navê dîlovan hildin gazî bikin, hûn bi kîjan navî gazî dikin, bikin, îdî hey navên qenc ji Yezdan ra hene." Tu nîmêja xwe bi dengê bilind neke û bi dengê dizîka jî neke, tu di nava her du dangan da, dengekî nîvwarî bivê. What do you plan on your 100MB of free space for

111; (Muhemmed! Tu aha) bêje: "Çîqa pesindanî hene, hemû ji bona Yezdan ra ne, ku ji xwe ra zar ne girtine û ji bona wî ra hevparên di maldaryê da jî tune ne û ji bona wî ra serkarên, ku ewî ji belengazîyê fereste bikin jî tune ne, tu ewî ji kêmayan paqij û bilind bike.

## Chapter 18 (Sura 18)

1; Ew Yezdanê, ku li ser bendeyê xwe yê (Muhemmed) da pirtûk hinartîye heye! Çîqa pesindan û sipazî hene! Hemî ji bona wîra ne. Ewî ji bona wê pirtûkê ra qe tu xarî çê ne kirîye.

2; Ji bo ku (merivan) bi wan şapatên zorên li bal we hene! Bide hişyarkirinê (ewa Qur'ana) rast derandiye. (Ewa Qur'ana) jî bona wan (merivên) karê aştî kirine, mizgînî dide, ku bi rastî jî bona wan ra kiryeke qenc heye.

3; Ewanê di nava wan kirênên qenc da (ku bihişt e) hey bimînin.

4; û (Yezdan bi we pirtûkê) ewanê ku dibêjin: "Yezdan ji bona xwe ra zar girtine." (Bi hatina şapatan) dide hişyarkirinê.

5; Ji bona wan û bavên wan ra jî (di mafê vê dabaşê) qe tu zanîn tune ye. Eva peyveke mezin e ji devê wan derdikebe. Ewanan hey derewan dibêjin.

6; Îdî ji bo ku ewan bi vê Qur'anê bawer nakin, dibe ku tu li ser wan ji kovanan xwe teşqele bikî.

7; Bi rastî tiştê li ser zemîn heyî, me ji bona zemîn ra xistiye xişir, ji bo ku em kesan biceribînin, ka kîjan xebatê çêtir bike (bi vî ra jî ewan nankorya min dikin, ka tu çima ji bona wan kovanan dikişîni?).

8; Û bi rastî (di royekî da) emê ewan xişirên li ser zemîn heye, bixine xwelîyeke zaha bihêlin.

9; (Muhemmed!) Qey tu goman dikî hevriyên şikevt û (li ser derê wê şikevtê) ku navê wan nivîsar bû, ji wan derhoze me yên sodretin? (Na, wusa goman neke, hêj ji wan betertir hene.)

10; Gava ewan xortan berê xwe dabûn li bal şikevtê çûbûn, îdî (aha) gotibûn: "Xudayê me! Tu ji bal xwe, dilovanîyekî bide me û tu ji bona me ra bûyera me hêsanî bike (ji bo ku em bikaribin bigehêjne armancê xwe)."

11; Îdî me jî bi çend salan li ser gohe wan (perda xewê danî, ewan heya çend salan di xewê da mayîne).

12; (Di mafê xewa wan da ewan bûne du deste) ji bo ku em bizanin, ka kîjan destê, danê mayîna wan e di şikevtê da rind hijmartîye, me paşê ewan (hişyar kirin) şandin.

13; Bi rastî em serdaborya wan ji te ra bi mafî dibêjin: "Ewanan destek xort bûn, bi Xudayê xwe bawer kiribûn, me jî bawerî û hewa wana di hemberê cefadanê pir kiribû."

14; Di gava ewan (ji civata serok) rabûne, me berdilî da berdilê wan. Îdî ewan (ji bona civatê ra aha) gotibûne: "Xudayê me, Xudayê ezman û zemîn e, ji pêştirê wî em gazî tu ilahî nakin. (Heke ji pêştirê wî em gazî hinekê mayî bikin) di wê gavê da bi rastî em tiştên bê hişî dibêjin."

15; (Tu) li van komalê me yê hanênan (mêze bike!) ji pêştirê Yezdan ji xwe ra hinek ilahên mayî girtine. Ma qey ji bona ilhîtiya wan ra ne diva, ku beratên bi hêz bianînan? Îdî gelo ji wî kesê, ku derewan bi vir li ser navê Yezdan dike, cewrkartir kî heye?

16; (Yekê ji wan xortan aha gotîye:) Gava we (ji (komal) û ji perestîyên wan yê ji pêştirê Yezdan (ewan ji wan ra) perestî dikiribûne, dest berdane, îdî hûn herin, xwe bavêjine şikevtê, ji bo ku Xudayê we ji dilovanîya xwe (rozîyan) ji bona we ra, bide raxistinê û ji bona ku Xudayê we bûyera we ji bona we ra hêsanî bike."

17; (Piştî mijûliya wî xortî, ewan di şikevtê da razane). Gava roj hiltê, tu dibîni tirêja rojê li kêleka rastê, gava çûna ava jî li kêleka çepê dixist, ewan bi xweber jî di firetiya şikevtê da bûne. (Ya jî gava roj derdikebe li kêleka rastê da dibore, lê gava roj ava da jî di kêleka çepê da dibire derbas dibe, ewan bi xweber jî nîveka şikevtê da raza bûne, qe tavê li wan ne xistiye). Eva temtêla wan ê hanê ji beratên derhozeyên Yezdan in. Îdî Yezdan kîjanî bine rêya rast, ewî rêya rast dîtîye û, kîjanî (Yezdan) ji ber wî rêya rast wunda bike, îdî tu ji bona wî ra rastî tu serkarê beled nayê.

18; Ewan razayî bûne, te digo qey hişyar in (loma çavê wan vekirî bûye, ewan di xew da bûne) me ewan rast û çep dizivirandin û seyî wan jî herduk destê xwe yê pêşiyê (pê pêşiyî) li ber derî dirêj kiribûye (raza ye). Heke te ewan bi vê (temtêla wan) bidîta, hundurê teyê tijî tirs bûya, tuyê ji wan birevîyayî.

19; (Me ça ewan razandi bûn) wusa jî me ewan hişyar kirin, ji bo ku ewan (demên borî û temtêla xwe) ji hev pirs bikin. Yekê ji wan (aha) gotîye: "Gelo çiqas e hûn di vira da mane?" Ewanê mayî (bersiva wî dane, aha) gotine: "Royek e û ya jî danekî ji royê ye (em razane di vira da mane." Ewanê ku rastîya mayîna xwe nizanbûne, aha) gotine: "Xudayê we bi mayîna we çêtir dizane. Îdî hûn yekê ji xwe, bi van perên xwe va bişîne bajar, bira ewa li xurekan mêze bike, ka kîjan xurek xweş e, îdî bira ji, wî ji bona we ra rozîniyekî bine, bira wusa xalyazî bike, ku tu kes bi wî nehese."

20; Loma bi rastî heke ewan bi we bihesin, ewanê we bi kevîran bikujin, ya jî we dîsa we beherin ser ola xwe. Bi rastî (heke hûn herin ser ola wan) îdî hûn di wê gavê da fereste nabin.

21; Ji bo ku (ewanê bi rabûna para da bawer nakin) bizanin, bi rastî peymanê Yezdan e (ji piştî mirinê) rabûn heye, mafekî rast e û (bizanin ku) bi rastî di wî danî da, qe tu dudilî tune ye. (Me ça ewan razandin, dîsa hişyar kirin) wusa jî me komal bi wan dane hesandinê. (Loma ewan hêj di berê da, di bûyera rabûn û civandinê da,



bi hev ra tekoşîn dikişibûne, gava ewa çû şikevtê, îdî bi rastî mirin e) di wê gavê da komal bi hev ra tekoşîn kirin (ji bo ku hevrîyên şikevtê ça biparisînin): Hinekan ji wana gotine: "Hûn li ser wan kumbetan ava bikin." (Hineka di mafê wan da tekoşîn kirine, gelo kî ne, navê wan çi ne? Lê) Xudayê wan, bi wan çêtir dizane. Ewanê servatîyî bûyera wan in (aha) gotine: "Emê li ser wan mizgevtêkî ava bikin." 22; (Ewanê xweyê pirtûk, di nêzîk da) dibêjin: "Ewan xortan sisê bûne, çarê wan kûçikê wan bûye." Hinekî wan jî dibêjin: " (Ewan xortan) pênc bûne, şeşê wan kûçikê wan bûye;" evan (kevîran) nedîtî davêjin (ji ber xwe dibêjin). Hinek jî dibêjin: "(Wusa nîne) rastîya wan eva ye; hevt bûne, heştê wan kûçikê wan bûye." (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Xudayê min bi hijmara wan çêtir dizane. Ewanê bi wan dizanin hindik in. Îdî tu di mafê hijmara wan xortan da, ji tekoşîna berçavî pêştir qe tu tekoşînê bi wan ra neke. (Muhemmed! Tu) ji wan, di mafê xortan da tu tiştî pirs neke. 23; (Muhemmed!) Tu ji bona tu tiştî ra ne bêje: "Ezê evî tiştî di sibehê da bikim." 24; Lê tu (aha) bêje: "Heke Yezdan bivê (ezê evê tiştî bikim)." (Muhemmed!) Gava tu evê gotina, heke Yezdan bivê, bîrva bikî (ne bêjî), tu Xudayê xwe (bi paqîjî û perestî) bîne bîra xwe û (aha) bêje: "Ez hevî dikim, ku Xudayê min ji vî nêzîktir, min bigihîne mirazê min." 25; Ewan (xortan di şikevta xwe da, sê sed salî mane, ewanê (sala xwe bi hijmara hîvan di hijmirînin) neh sal jî (li van salan) pir kirine (gotine: "Sê sed û neh salan mane)." 26; (Muhemmed! Tu ji wan ra) bêje: "Yezdan bi mayîna wan (di şikevtê da) çêtir dizane, loma zanîna bi ne xûyayên ezman û zemîn hey ji Yezdan ra ne. Ew çîqa rind dibîne û çîqa rind dibihê! Ji pêştirê Yezdan ji bona wan (xortan ra) qe tu arîkar tune bûye û tu kes di berewaniyê da nabe hempayê Yezdan." 27; (Muhemmed!) Ji pirtûka Xuda yê te, çi li bal te da hatibe niqandinê tu ewî bixune. Tu guhurandin ji bona peyvên we ra tune ye, tu ji pêştirê wî jî rastê tu penahî nayê. 28; (Muhemmed!) Tu li bal wanê, ku di sibeh û êvara da, gazî Xudayê xwe dîkin; ji bona ku Xudayê wan bi wan qayîl be, hew bike. ji bo ku tu xişrê vê cihana hanê bivê; bîra her du çavê te ji (xezanê perestok) para da nefetile (li bal wanê zengînda mêze neke) û tu peyrewîya wîyê, ku me dilê wî ji bîranîna xwe, bê goman kirîye, neke, ewî hey peyrewîya canxwestina xwe kirîye. Bûyera wî ji hedê xwe borîye. 29; û (Muhemmed! Tu aha) bêje, "Bi rastî Qur'an ji Xudayê we (hatîye). Îdî kê hez dike bîra bawer bike û kîjan hez nake bîra bawer neke." Loma me ji bona cewrkaran ra agirekî wusa amade kirîye, ku ewî agirî bi gorayîya xwe, ewan hildane nava xwe. Heke ewan ji bona vexwarinê hewar bikin, hewarîya wan, aveke germe wusa tê, wekî madena bihatî, rû dixaşandin. Çîqa vexwarineke sik e û çîqa ewra wan sikê kursîya ne! 30; Bi rastî ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Em xelata wa yên qenc bi tu car wunda nakin. 31; Ji bona van ra bihiştên bi nav 'Edn (bihiştên xurekan) heye, ku di binê darê wan da çem dikişin, ewan di wê bihiştê da bi bazinê zêr têne xemilandinê û kincên hêşîn, ku ji zîv û burqonekan hatine çekirinê, li xwe dîkin, di bihiştê da li ser kursîyan pal dayîne. Çîqa qencê qencîya ne û çîqa qencê kursîya ne! 32; (Muhemmed!) Tu ji bona wan ra bi hecwekî serdaboraya wan her du mêran bêje: "Ji bona yekê ji wan ra me du rezên ji tîryan dabû, me ewan her du rez bi cêrgeyên darê xurman (ku di dora wan da bûne) girtine, me di nava wan da jî (zevîyên) çandinîyê bi cîh kiribû." 33; "Ewan her du rezan jî, wusa ber didan, qe tu tişt ji wan kêr ne mabû, me di nava wan da jî çem dane kişandinê." 34; "Ji bona (xweyê van rezan ra) berê (semer) daran hebû (xweyê mal bû). Evî ji bona hevalê xwe yê (xezan ra) xwe qure fikir (aha) gotîye: "Tu çima bi min ra (tekoşînê dikî)? Bi mal ez ji te bi hêztir im û zarên min jî ji zarên te pirtir in." 35; Gava diçû nava rezê xwe, xwe qure fikir, bi xweber jî xwe cewr fikir (aha) digot: "Ez goman nakim, ku dawîya van rezan bîn, di hemû gavan da wê evanê bimînin."

36; "Û ez goman nakim, ku wû rabûna hemû jî çê be. (heke çê be jî) dema ez herime bal Xudayê xwe, bi rastî ezê rastê qencî yên wusa bêm, hêj ji van çêtir bin."

37; Hevalê wî yê (xezan) ji wî ra bi tekoşînî dibêje: "Tu ça bi wî Xudayê, ku di cara yekem da tu ji xwelîyê afirandîye, paşê ji menya (dilmeyî) paşê tu xistî mêrekî çêkirî, dibî file?"

38; "(Tu bawer nakî) lê ez bawer dikim, ku Yezdan Xudayê min e, ez ji Xudayê xwe ra tu kesî naxime hevpar."

39; "Ka, çi dibe; heke gava tu herî nava rezê xwe (aha) bêjî: "Eva hêza Yezdan e. Çiqa hezeke mezin e! Hemû hêz bi Yezdan in. Hava tu dibînî, ku mal û zarên min ji yên te kêmtir in."

40; "Dibe ku Xudayê min hêj ji rezê te çêtir bi min ra qencîyan bike û li ser rezê te da jî ji ezmanan birûsk û aşîtan bişîne, îdî ewa rezê te bibe xwelyekê tirlêç bimîne."

41; "Ya jî ava wî bikişê binê zemîn, îdî tu qe nikaribî li wê avê bigerî, bibînî."

42; (Evan bi hev ra mijûl dibûn malê ewê file) zêr û zeber bû, qe nikarya tu tiştî bike. Îdî destên xwe da ser hev, mizda û ji bona wan xebatên xwe yên pêşîyê, ku ji bona rezan kiribû bêzar ma (kovan dikişand). Dema rez zêr û zeber dibûn (ewî jî aha) digot: "Xwezîka min ji Xudayê xwe ra qe tu tiştî ne xistîbûya hevpar!"

43; Ji bona wî ra komeke, ku arîkarya wî bike jî, ji pêştirê Yezdan tune bû. Ewî bi xweber jî nikarbû ku tişteki bike.

44; Di vê gavê da serkarya rast, ya Yezdan e. Çi qencîya Yezdan bike, çêtir e û encama (aqûbet) wî bi xweber jî qenctir e.

45; (Muhemmed!) Tu ji bona wan ra hecwekiya jîna cîhanê (aha) veke: "Jîna cîhanê wekî ava ku em jor da dihênirînin: gava tevê çêreyên zemîn dibin çêre hêşîn dibin (dema ji wan zaha dibin) ewan çêran jî hişk dibin, dema ba li wan dixê; ewan ji hev derdixe belav dike." Bi rastî Yezdan li ser hemû tiştan bi hêz e.

46; Mal û ku, . xemla jîna cîhanê ne. Ewanê para da (ji bona merivan) dimînin karê aştî ne. Evan li bal Xudayê te bi qencî, çêtir e û qencê hêviya ne.

47; Di roya ku em çîyan dibin; tu zemîn (qe tu tişt li ser ne mayî) li ber çavan rût dibînî û em hemûşkan dicivînin, îdî em tu kesî ji wan nahêlin.

48; Ewan hemû (wekî xêlyan-merasim) di hemberê Xudayê te da bi rêz nivyanê. Bi sond! Me ça hûn di cara yekem da (rût) afirandibû, hûn wusa (rût) li bal me da harine. Le we goman kiribû, ku em ji bona we ra danekî (civînê) çê nakin.

49; Û pirtûka (xebata wan, ji bona wan ra bi vekirî) hate danînê, îdî tu gonehkaran dibînî; (dema ewan kirinê xwe) di pirtûkê da dibînin; jê vediciniqin (û aha) dibêjin: "Xwelî li me be! Ji bona vê pirtûkê ra çi bûye! Qe tu tişt (ji kirinê) piçûk û mezin bernedaye: hemî kirinê me hijmartîye (nivîsiye). Loma ewan rast hatin, ku hemî kirinê wan di pirtûkê da amade ne. Xudayê te li tu kesî cewrê nake.

50; Û di gavekî da me ji bona firiştan ra gotibû: "Gelî firiştan! Hûn hemû ji bona nişa kesan ra secde bikin." Ji pêştirê nişa pelîdê (bi nav) iblîs hemûşkan çûn secde. Iblîs bi xweber jî ji meçêtiran bû, îdî ewa ji fermana Xwedayê xwe derket. Îdî hûn (gelî kesan! Ji quretî û pozbilindîya xwe) ji pêştirê min, hûn iblîs û ûrta wî yê, ku ji bona we ra neyar in, ça ji xwe ra serkar digirin? (Eva guhurandîna hanê, ku hûn Yezdan dihêlin, di şûna wî da pelîd ji xwe ra dixîne serkar) ji bona cewrkaran ra çiqa guhurandîneke sik e!

51; Min (iblîs û ûrta wî va) ne di gava afirandîna ezman û zemîn da, ne jî di gava afirandîna wan bi xweber da jî, amadeyê afirandîne ne kiribû û min ji bona xwe ra ji ewanê ji rêya rast derketî ne xistîye piştevan.

52; Di wê royê da (Yezdan ji bona hevriçêkeran ra aha) dibêje: "Ka îdî hûn gazî wan hevriyên, ku we ji min ra goman dikişin, bikin (bira ferestîya we di îro da bikin)." Îdî ewan (filan) gazî (wan hevriyan) kirine, qe ewan (hewriyan) ji bona wan ra tu bersiv ne dane. Me di nava (filan û hevriyên wan da) teşqelên mezin danîne.

53; Di gava ku gonehkaran agir dîtine, îdî goman kirine, ku bi rastî wê bikebine agir. Û ewanan rastî tu penahêkî jî nayên, ku ewa, ewan ji wî agirî bidîne zivirandinê.

54; Û bi sond! Me ji bona merivan ra, di vê Qur'anê da ji hemî bûyeran car bi car gotîye. Lê meriv ji hemî tiştî bêhtir, tekoşîne divê.

55; Û gava (pêxember û Qur'an) ji bona merivan ra hatine, ji pêştirê hêviya wanê ku

ewan hêvî dikirin: Ka ji bona wan ra jî şapa wan yê di berya wan da borîne, hatibû, nayê ya jî ka li ber çavan ji wan ra şapat nayê, paşê bawer bikin, tu tiştî ewan ne dabûne paradanê, ku ji Xudayê xwe lavaya baxişandin a (gonehên) xwe bikin.

56; Me çîqa pêxember şandine, hey ji bona, ku ewan pêxemberan mizgîna (bawergeran bi bihiştê) û hişyara (filan jî bi tirsdana dojê) bidine kirinê (me şandine). Ewanê bûne file hene! Ewanan jî tekoşînê dikin, ji bo ku mafê, bi pûçîtiyê bê hêz bikin. ewanan ji xwe ra berate û şapatên min tinaz girtine.

57; Gelo ji wî kesê, ku bi beratên Xudayê xwe tê şîret kirinê, îdî paşê piştî xwe dide wan şîretan (litê nake) û tiştî kirî jî bîrva bike (bêje: "Evan kirinê min nînin") cewrkartir kî heye? Ji bo ku ewan pisporîya rastîyê nekin, me li ser dilê wan da xêlî kişandîye, di gohê wan bi xweber da jî kerayî heye. Heke tu ewana gazî bal rastîyê bikî, îdî ewan tu gavê nayêne rêya rast.

58; Heke ewî Xudayê te yê baxişgerê dilovîn, heman ewan bi keda wanên kirî, bi şapatê bigirtinan, wê şapatê ji bona wan ra bi lez bihata. Lê ji bona şapatdana wan, danekî wanê wusa heye, gava ewa dana hat, ewan ji pêştirê Yezdan rastê tu penahî nayên (ku ewan ji wê şapatê biparisîne).

59; Ewanan, ew gundên, ku me ji bona cewra wan ewan teşqeke kirine. Me ji bona teşqekekirina wan jî, danekî diyarî dabûye.

60; Di gavekî da Mûsa ji bona xortê xwe (aha) gotibûye: "Heya ez neçime wî cîhê, ku her du avşîn tevê hev dibin, ez nahew im, ya jî ezê bi salan bigerim."

61; Îdî gava ewan çûn, gehîjtine wî cîhê, ku her du zerya tevê hev bûne, ewan di wura da masîyê xwe bîrva kirine. Masîyê wan di deryayê da rêya xwe girtiye çûye.

62; Îdî gava ewan herduk ji wê derê borîne (Mûsa) ji bona xortê xwe ra gotiye: "Ka taştêya me bine, bi sond! Di vê rêwîtiya me yê hanê da westandinekî em girtine."

63; (Xort ji bona Mûsa) ra gotiye: "Te dît! Gava em hatibûne bal zinar, îdî min masî bîrva kirîye (masî li wura maye). Ji pêştirê pelîd tu tiştî ji bîra min nebirîye, ku ez ji bona te ra bêjim: (Ha va masî çûye avşînê)." Ewî masîyê di zeryayê da ji xwe ra rêyeke sodret girtibû."

64; (Mûsa ji bona xortê xwe ra aha) gotiye: "Tiştî em lê digeryan ewa ye." Îdî ewan herduk para da di şûna xwe da vegeryan, ji hev ra bûyera xwe digotin.

65; Îdî ewan herduk, rastî bendekî ji bendeyên me hatin, ku me ji bal xwe da ji bona wî ra dilovanîyek dabû û me ji bal xwe da ji bona wî ra zanînek hîn kiribû.

66; Mûsa ji bona wî (bendî ra aha) gotibû: "(Destûra te heye) ku ez bibime peyrewê te, ji bo ku tu min hînê wê zanîna, tu hînê wê bûyî, bikî?"

67; Ewî (ji bona Mûsa ra aha) gotiye: "Bi rastî tu nikarî bi min ra hew bikî."

68; "Û tuyê ça li ser wan tiştên, ku qe gura te bi wan tune ye hew bikî?"

69; (Mûsa ji wî ra aha) gotiye: "Bi hezkirina Yezdan, tuyê bibînî, ku ez bi te ra hew dikim û ez (di tu tiştî da) bê gotina te nakim."

70; Ewî (ji bona Mûsa ra aha) gotiye: "Îdî heke tuyê bibî peyrewê min, gotî tu pîrsa tu tiştî ji min nekî heya ez bi xweber ewî tiştî ji te ra bêjim."

71; Îdî ewan herduk, bi hev ra çûn, heya çûne sîyarê kelekê bûne (ewî bendî rabûye) kelek qul kirîye. (Mûsa ji wî ra aha) gotiye: "Tu çima qul dikî? Wê hemî rêwîyên we, di ave da bifetidin. Bi sond! Eva tişteki sodret e tu dikî (hemîşka rikê xwe ji me bînin.)"

72; (Ewî bende î ji Mûsa ra aha) gotiye, "Maqeymin ji te ra negot; ku bi rastî tu nikarî bi min ra hew bikî?"

73; (Mûsa ji wî bendeyî ra aha) gotiye: "Min bibaxşîne, bi sedemê bîrvakirin a min li min sîtem neke, ji bona vekirina min tu ji min ra zorîtî dernexe."

74; Îdî ewan herduk bi hev ra çûn, heya çûne rastê zareke kurîn hatine (ewî bendeyî rabûye) kurik kuştîye. (Mûsa ji wî bendeyî ra aha) gotiye: "Te çima ewa zaroka paqij a bê gur û goman kuşt? Qe tu tola te li ser wî tune bû. Bi sond! Te tişteki wusa kirîye; wekî wî sik tune ye."

75; (Ewî bende ji Mûsa ra aha gotiye): "Ma qey min ji te ra ne got, bi rastî tu nikarî bi min ra hew bikî?"

76; (Mûsa ji bona wî bendeyî ra aha) gotiye: "Heke ez ji piştî vî, pîrsa tişteki ji te bikim, îdî tu bi min ra hevaltîyê neke. Bi sond! Kirinên min li bal te gehîştine baxişandina dawîyê."

77; Îdî ewan herduk bi hev ra çûne, heya gava hatine wî gundê ku wan herdukan, ji komalê wî gundî, xwarin xastine. Ewan gundîyan, ji bona wan herdukan jî xwarin ne

dane. Ewan (di nava gund da geryan) heya çûn, rastî diwarekî wusa hatin, nezîk bû, ku hilşîya. (Ewî bendeyî va) ku ewî diwarî rast bike, îdî xebitî rast kir. (Mûsa ji bona wî ra aha) gotîye: "Heke te ji bona çêkirina diwar, kirya xwe bistanda çêtir ne dibû (ku me jî bi wî ji xwe ra xarin, ji wan bikirya)?"

78; (Ewî bendeyî, ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "Îdî ewa sedema raqetandina min û te ye. Ezê ji bona te ra sedemên wan tiştê ku te li ser wan hew ne fikir, pirsê wan ji min fikir, bêjim:"

79; "Kelek, malê hinek belengazan bû, ewan di avşînê da dixebitînin, di berya wan da serokekî pir zor hebû, bi zorê hemî kelek ji xweyê wan distandin. Min jî rabû kelek qul kir, ji bo (ku ewa serok qula wê kelekê bibîne, îdî kêrê wî nayê keleka wan berde.)"

80; "Zarok jî kurê da û bavekî bawerger bû, îdî em tirsîyan (dema ewa zaroka mezin bibe) wî da û bave xwe, ji hezkirina ku ewan ji wî hez kirine, bi quretî bixê file."

81; "Îdî me jî va, ku Xudayê wan her du; da û bavan, di şûna wî kurikî da, zarekî qencîr û dilovantîr û paqîjtîr bide wan."

82; "Diwar, malê du zarên sêwî yên di bajar da bûn, di binê wî diwarî da, xezîneke wan her du sêwîyan hebû, bavê wan herdukan jî aşîkar bû, îdî Xudayê te va ye (ku ez diwarê wan rast bikim, ku hilneşe) heya ewan herduk zar bigihêjne sedra xwe, paşê xezîna xwa derxin. Eva dilovanîyeke ji Xudayê te ye bi wan kiriye. Min evan ji ber xwa ne kirine. Sedema wan tiştên me kirî eva ye, te jî li ser kirina wan hew ne fikir (tim dipirsî).

83; (Muhemmed!) Ewan (kesan) ji te pirsê xweyê du qoçan (Zulqerneyn) dîkin. Tu (beresîva wan aha) bide: "Ezê ji bona we ra, ji serdaborya wî hinek axiftina bixûnim."

84; Me ji bona wî ra di zemîn da şûneke bi hêze parizvan çê kirîye û di wura da ça bivê wekî xwestina xwe xebat dike, ji bo ku bigihêje armanca xwe, me ji hemû tiştan sedem û rêyên wan, daye (Zulqerneyn).

85; Îdî ewî jî (ji bo ku bigihêje rojava, ji xwe ra) rêyek girt (çû).

86; Heya çûye gehîştîye (şûna) ku roj têda diçe ava. Dêna xwe daye, ku roj di kanîyeke herya reş da diçe ava. Di wêderê da rastî komalekî hat, me ji bona (Zulqerneyn ra aha) got: "Zulqerneyn! Tuyê ya ewan şapat bikî, ya jî tuyê bi wan ra qencîyan bikî (ewan bi xweşî binî rêya rast)."

87; (Zulqerneyn aha) gotîye: "Kî cewr kiribe, emê ewî şapat bikin, paşê ewî li bal Xudayê xwe da bê zivirandin, îdî Xuda ê ewî wusa şapat bike, ku wekî wî şapat ne hatibe ditin."

88; "Lê kîjanî bawer kiribe û karê aşî kiribe, îdî ji bona wî ra jî qencê qencîyan heye û emê ji bona wî ra ji fermanên xwe yê hêsanî bêjin: "(Bira ewa tiştê hêsanî bike, tiştê zor neke)."

89; Paşê rêyeke mayî ji xwe ra girt (çû, ji bo ku bigihêje armanca xwa ya vî alî).

90; (Çûye) heya gehîştîye (şûna), ku roj jê derdikebe, rastî komalekî hat, roj li ser wan derdiket. Me ji bona wê komal ra jî bo ku xwe ji rojê biparisînin qe tu perdek çê ne kiribû.

91; (Serokîya Zulqerneyn wusa bû; ça biva, wusa fikir, wusa zana bû, rêya her tiştî dizanîya) Bi sond! Me zanîna wî hilda bû binê hêza xwe.

92; Paşê jî ketîye rêyekî (çûye).

93; Heya çûye gihîştîye (şûna) her du bendan. Di rûbarî van her du bendan da rastî komalekî wusa hat, ku nikaribûne bi pisporî mijûlîya wan ji hev deerxin.

94; Ewî komelê (ji bona Zulqerneyn ra aha) gotîye: "Zulqerneyn! Bi rastî komalê (bi nav) "yecûc û mecûc" zemîn wêran kirine. Gelo çi dibe? Ku em kirya te bidin, tu di nîveka me û wan da bendekî çê bikî?"

95; (Zulqerneyn ji wan ra) gotîye: "Ew mal û milkê ku Xudayê min ez xistime navê ji wî (kirya ku hûn bidine min) çêtir e. Îdî hûn bi hêza (gevdê xwe) ji min ra arîkarî bikin, ku ez di nîveka we û wan da bendeke derabî çê kim."

96; "Hûn ji min ra kursîyê hesin binin." (Dema ewan kursîyê hesin anîn, Zulqerneyn di nîveka wan her du sermilê çîyan tijî kir) heya gava her du sermil bûne wekî hev, yek man. (Zulqerneyn ji wan ra) gotîye: "Hûn pufî (agir bikin, bira agir pêkebe." Dema agir pêket) heya hesin sor bûye (bû wekî) agir maye. (Zulqerneyn ji wan ra) gotîye: "Hûn ji min ra sifrê biha (hêla) binin: (Dema ewan, ewa sifra ji

Zulqerneyn ra anîne, Zulqerneyn ewa sifra) li ser wî hesinî sor da kirîye.  
 97; Ewa (bende wusa zexm bû) îdî (yecûc û mecûcan) nikaribûne derkebine ser bende û nikaribûne ku qul bikin jî derkebin.  
 98; (Zulqerneyn aha) gotîye: "Eva (çêkirina vê bendê) dilovanîyeke ji Xudayê min e. Îdî heya gava peyman Xudayê min (bi hilşandina) we hat; Xudayê min ê ewê bi zemîn va bixe yek; wêran bike. Bi rastî peyman Xudayê min maf e.  
 99; Me kesên (cîhanê) di nava hev da hiştine, di wê gavê da ewan wekî pêlê deryayê di nava hev da pêl didin (ser binê hev da derbas dibin), îdî (dema ku em ewan bicivînin) di sturî da, tê pufdanê em ewan wusa dicivînin qe yekî ji wan nahêlin.  
 100; Em ji bona filan ra, di wê royê da dojê bi xûyayî vedikin.  
 101; Ewan filan ew kes in: ku çavê wan ji bîranîna min, bi perde ye û ewan nikarin gohdarya (Qur'anê jî) bikin.  
 102; Qey ewanê ku bûne file goman dîkin, ku ewan ji bal min, ji xwe ra heke ji bendeyên nûn serkaran bigirin (wê ji wan ra kêr hatibin)? Bi rastî me ji bona filan ra doj bi êwîrgahî amade kirîye.  
 103; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Hûn hez dîkin, ku ez ji bona we ra ewanê, ku keda xwe (di para da pir) zîyan kirine, ka kî ne, bêjim?"  
 104; "Ewanan; (evê bi van salixan, tene nîyaskirinê ne) ku di jîna cîhanê da çi kirine, hemî wunda bûye loma tiştê dîkirin, goman kiribûne, ku ewan pêşeyên qenc kiribûne."  
 105; "Ewanan; cw fileyên, ku bi berate û bi rasthatina Xudayê xwe (di roya para da) bawer nakin, îdî keda wan hemû şewitiye. Em ji bona wan ra di roya rabûna hemû da, tu kêşê nadine çikandinê (ji bo ku keda wan bê kişandinê)."  
 106; Bi sedema, ku ewan berate û pêxemberê min, di nava xwe da bi tinaz girtibûne celata ne bawerî û filetiya wan doj e.  
 107; Bi rastî ji bona wanê, ku bawer kirine û karê aştî kirine, bihiştê reza bûye êwîrgah.  
 108; Ewanan di wê bihiştê da her dimînin, qe naxwazin ji wura derkebin.  
 109; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Heke zerya bibe hubur, ji bo, ku peyvên Xudayê min, pê bêne nivîsandinê, wê dawya avşînê were, hêj dawya peyvên (Xudayê min nayê. Heke em wekî wê avşînê jî di arîkariya wê da binin (wê dîsa dawya wê jî were).  
 110; (Muhemmed! Tu) bêje: "Ez jî merivekî wekî we me; li bal min da hatiye niqandinê, ku Xudayê we yekî bi tenê ye. Îdî kî dixwaze, ku (bi rûkî rûsipî) here rastî Xudayê xwe be, bira karekî aştî bike û bira di perestiya Xudayê xwe da, tu kesî nexwe hevpar.

## Chapter 19 (Sura 19)

1; K.H.Y.A.S. (Arşa van tîpên ji hev çûyî, hey Yezdan dizane).  
 2; (Evan beratên ku em ji te ra dixunin) dilovanîya Xuda yê te ye, ji bona bîranîna bendeyê xwe; Zekerîya (hinartîye).  
 3; Di gavekî da (Zekerîya) bi dengêkî dizî va, gazî Xudayê xwe kiribûye.  
 4; (Aha) gotibûye: "Xudayê min! Bi rastî îdî hêstîye min (ji kalbûnê bi jarîtî) sist bûne û serê min jî ji kalîtîyê pê girtîye (sipî bûye). Xudayê min! Min çiqê gazî te kirîye, ez bê hêvî ne bûme (hey te bersiva min daye)."  
 5; "Xuda! Bi rastî ez ji wan (pismamên xwe yê, ku ji piştî mirina min tiştên ne pak bikin). Ditirsim û (tu dizanî) jina min jî eremûk e (çi dibe!) ku tu li bal xwe da, ji bona min ra ûrtekî bidî."  
 6; "Ji bo ku ewa ji min ra û ji malîyên Y'eqûb ra jî bibe ûrt (bimîne). (Xudayê min!) tu ewî bixe yekî wusa, ku tu bi wî qayîl bibî."  
 7; (Yezdan ji bona Zekerîya ra aha qotîye:) "Zekerîya! Bi rastî emê te bi kurekî bi nav Yehya bidine mizgîndanê, me ev navê hanê di pêşya wî da, qe li tu kesekî ne kiribû."  
 8; (Zekerîya) gotîye: "Xudayê min! Ka we çê ji min ra kur bibe? Jina min eremûk e, ez bi xweber jî wusa kal bûme temarê min îdî hişk bûne."  
 9; (Xuda) gotîye: "Gotina te ye, lê eva afirandina hanê li ser Xudayê te hêsanî ye, hêj berê da, tu jî tiştê ne bûye, min tu afirandî."  
 10; (Zekerîya) gotîye: "Xudayê min! Ka ji min ra beratekî bide (ku ez bizanibim tuyê ji min ra kurekî bidî." Xuda ji Zekerîya ra) gotîye: "Berata te ev e: Heya sê

ro û şevan, hemî gewdê te jî dirust be, tu nikarî bi tu kesekî ra mijûl bibî."

11; Îdî (Zekerîya) ji baboyê (mihrabê) derkete nava komalê xwe (nikarbû bi wan ra mijûl bibe, bi hinek nîşana ve ji wan ra aha) gotîye: "Hûn di sibeh û evaran da ji Xudayê xwe ra nimêj bikin û ewî ji kemasîyan paqij bikin."

12; (Îdî dema ewa zaroka bû, navê wî Yehya danîn. Me ji wî ra aha got): "Yehya! Tu pirtûkê bi hêz bigire (ewê ça ferman kirîye, wusa bike)." Bi rastî Yehya hêj zar bû, me ji wî ra zanîna retkokî dabû.

13; (Çima me ji wî ra dema zaroktiyê da zanîn dabû), loma Yehya li bal me delal û paqij bû. îdî ewa xudapariz bû.

14; (Loma Yehya) ji bona dê û bavê xwe ra jî qencîkar bûye û ewa yekê pozbilindê, serhişkê, qure ne bûye.

15; Di roya ji dayîk bûye û di roya dimire û di roya wê bi zindî rabe here civînê da, selam li ser wî be.

16; (Muhemmed!) Tu di pirtûkû da (serdaborya) Meryemê jî bixune. Kanê, gava ewa ji malîyên xwe raqetiyabû li alîyê rojhilat ji bona xwe ra şûnek girtibû (qe li malîyên xwe mêze ne fikir, xurî perestî fikir).

17; Îdî ewê di nava xwe û malîyên xwe da perdek vegirtibû (qe tevê wan ne dibû). Îdî me jî canê xwe li bal Meryemê da şandşye. Ewa cana ji bona Meryemê ra bûye wekî merivekî bê kemasî xwe daye nîşanê wê.

18; (Gava Meryemê ewa meriva dît, aha jê ra) gotîye : "Ez ji te (ditirsim) xwe davejime ber bextê Xudayê diloan, ku min ji te biparizîne. Heke tu bi rastî xudaparis î (têkilê min nebe.)"

19; (Ewî rûhê, ku ketîye diliqê merivan, ji Meryemê ra aha) gotîye: "Bi rastî hey ez saiyê Xudayê te me (hatime vira) ji bo ku ez ji bona te ra kurekî tîtalê zêhirdar bidim."

20; (Meryemê bersiva wî daye, aha) gotîye: Qe tu meriv têkilê min ne bûye û ez bi xweber jî ez jinekî xirab jî ne bûme, wê ça ji bona min ra kurekî çê bibe?

21; (Ewî bersiva Meryemê daye, aha) gotîye: "Gotina te rast e. Lê Xudayê te gotîye: Bi van salixan va jî (dayîna kurekî li ser me hêsanîye;" (Emê ewî aha bidin); ji bo ku em ewî bixne berateke derhoze (mucize) ji bona kesan ra bihêlin (Eva dayîna) dilovanîyeke ji me ye." Îdî bûyer (hadise) pêk hat.

22; (Meryem) îdî bi wê zarê bi zar maye. Ji ber vî qasî (Meryem, ji kemalê xwe) çûye cîyekî dûr maye.

23; (Dema gava razana wê hatîye) sancîyan bi wê girtîye, ewa çûye nava darê xurman, xwe bi çiqilê daran girtîye (aha) gotîye: "Xwazîka ez hêj berya naha da mirî bûma û hatibûma bîrvakirinê (min evan tiştan ne dîtibûyan)."

24; Îdî gazî (Meryemê) kirine (aha) gotine: "Tu mirûzê xwe neke, bi sond! Xudayê te dibinê (nigê) te da nijdewanekî mezin çê kirîye."

25; "Tu çiqilê darê xurman li bal xwe da bihejîne, ji bo ku li ser te da xurmên terê gihîjtî bikebin."

26; "Îdî tu bixwe û vexwe û tu çave xwe ji hêstiran zaha bike (çavê te ronahî be). Heke tu ji merivan, kesekî bibînî, tu ji wî ra (aha) bêje: "Bi rastî min peyman daye, ku ez ji bona Xudayê diloan ra rojî bigirim; îdî di îro da qe bi tu kesekî ra mujûl nabim."

27; Îdî paşê (Meryemê zara) xwe hildaye hatîye bal komalê xwe. (Komalê Meryemê jê ra aha) gotine: "Meryem! Bi sond te tiştêkî sodret anîye û kiriye."

28; "Xûşka Harûn! Bi rastî bavê te merivekî xirab ne bû û dîya te jî jinekî pîs ne bû."

29; "(Ka te eva ji kêdere anîye?) Îdî (Meryemê) li bal wî zarê da niqandîye (Gotîye: "Ji wî pirs bikin.)" Ewan (bersiva Meryemê dane, aha) gotine: "Ka ewa zaroka hêlanê da, wê ça bi me ra axiftin bike?"

30; Ewê zarokê (bersiva wan daye û) gotîye: "Bi rastî ez bendeyê Yezdan im; ewî ji min ra pirtûk anîye daye min û ez ji xwe ra xistime pêxember."

31; "Û ewî ez li hemû cîhî bi payetî rakutame û li min şîret kirîye, heya ez bijîm gotîye ez nimêj bikim û baca xwe bidim."

32; "Ji bona dîya xwe ra jî qencîkar bim. (Yezdan) ez ji serhişkê pozbilind yê rêderketî ne gerandime."

33; (Ji Yezdan) di roya ji dayîkbûna min da û di roya mirina min da û di roya ku ezê bi zindî rabim (herime civînê) da, selam li ser min heye.

34; Rastîya wî 'Îsayê kur ê Meryemê ku hûn di rastîya wî da dudil in, eva ye.

35; Qe babet nîne, ku Yezdan ji xwe ra zaran bigire, ewa ji van (gotinan) paqij e. Gava (Yezdan) bivê ku bûyerekî çê bike, ji wê bûyerê ra dibêje: "Bibe." Ewa jî ji ber xwe dibe.

36; Bi rastî Yezdan Xudayê min e û Xudayê we ye jî. Îdî hûn hey ji wî ra perestî bikin. Rêya rast hey eva ye.

37; Îdî (paşê ewan di nava xwe da partî çê kirine). Ewan partiyan di nava xwe da ne wekhev bûn çê kirine. Îdî ji dîtina roya mezin (ku roya rabûna hemû ye) xwelî li wan filan be (ka ewan ça fereste bin?).

38; Di roya ku ewan têne bal me, çîqa rind dibêhin û çîqa rind dibînin! Lê ewanê cewr kirine hene! Ewan di wê royê da di wundabûneke xûya da nin.

39; Û (Muhamed!) tu ewan ji wê roya, ku hemû bûyer têda têne pêkanînê, meriv li ser kirinê xwe kovanan dikişînin, bide hişyarkidrinê. (Gava bûyera wan pêk tê) haja wan namîne, ewan bi xweber jî bawer nakin.

40; Bi rastî hey ûrta zemîn û tiştê li ser (zemîn) em tenê ne. Ewan hey li bal me da bine zivirandinê.

41; (Muhamed!) Tu di pirtûkê da (serdaborya) Îbrahîm (ji bona koma xwe ra) bixûne. Bi rastî (Îbrahîm) pêxemberekî pir rast bûye.

42; Di gavekî da (Îbrahîm) ji bona bavê xwe ra (aha) gotîye: "Bavo! Ka ji bo çî tu ji wan tiştên, ku nabihên û nabînin, perestî dikî? Ewan qe te (ji tu şapatî jî) fereste nakin."

43; "Bavo! Bi sond, ji bona min ra zanîneke wusa hatiye, ku ewa zanîna ji te ra ne hatiye, îdî tu bibe peyrewê min, ku ez te beherime wê rêya rast ya bê kêmasî."

44; "Bavo! Ji bona pelîd ra perestî neke. Bi rastî pelîd li ber Xudayê dilovan da serî bilind kirîye (bi gotina wî nake.)"

45; "Bavo! Bi rastî ez ditirsim, heke şapatek ji Xudayê dilovan bi te bigire, îdî tu jî bibî dostê pelîd."

46; (Bavê Îbrahîm bersiva wî daye aha) gotîye: "Îbrahîm! Qey tu ji perestîya Xudayên min, rû difetilîni (perestîya wan nekî)? Bi sond! Heke tu ji wan kirinê xwe dest bernedî ezê te kevir bikim (bikujim) û (Îbrahîm) tu dest ji min berde, heya hinek gavan ji vira here."

47; (Îbrahîm bersiva bavê xwe aha daye), gotîye: "(Bavo!) selam li ser te be, ezê ji bona te ra ji Xudayê xwe, lavaya baxişandinê bikim. Loma Xudayê min, ji bona min ra pir qencîkar e."

48; "Bi rastî ezê ji we û ji wan tiştên, ku hûn ji pêştirê Yezdan, ji wan ra perestî dikin dest berdim, ezê hey ji Xudayê xwe ra perestî bikim. Goman dikim, ku ez jî (wekî we) bi perestîya Xudayê xwe dil hişk û rê derketî nehim."

49; Îdî gava (Îbrahîm) dest ji wan û ji pêştirê Yezdan, ji wan ra perestî dikirin, berdaye, me jî ji bona (Îbrahîm ra) Ishaq û Y'eqûb raber kiriye. Me hemûşk jî xistibûne pêxember.

50; Me ji diloaniya xwe, ji bona wan ra (mal, hêz û serwet) daye, me ji bona wan ra zimanekî rastê bilind daye.

51; Û (Muhamed!) tu di pirtûkê da (serdaborya) Mûsa (ji bona koma xwe ra) bixûne. Bi rastî (Mûsa bendekî me ye) xwurî bûye, ewa bi pêxemberî (li bal zarên cihûyan da) hatiye şandinê.

52; Me ji aliyê rastê çîya yê (bi nav) Tûr da, gazî (Mûsa) kirîye. Ji bo ku em bi wî ra mijûl bibin, me ewa nêzê xwe kirîye.

53; Me ji diloaniya xwe, ji bona (Mûsa ra) birayê wî yê Harûn bi pêxemberî raber kirîye.

54; (Muhamed!) Tu di pirtûkê da (serdaborya) Îsma'îl (ji bona komalê xwe ra) bixûne; Bi rastî ewa di peymana xwe da rast bûye. Ewa (li bal komalê xwe da) bi pêxemberî hatiye şandinê.

55; (Îsma'îl) fermana malîyên xwe bi nimêjkirinê û bi baca malê xwe dayînê kirîye. Ewa li bal Xudayê xwe jî, hatiye qayîlkirinê.

56; (Muhamed!) Tu di pirtûkê da (serdaborya) Îdrîs (ji bona komalê xwe ra) bixûne. Loma bi rastî (Îdrîs) pêxemberekî pir rast bûye.

57; Me jî ewa li bal cîyekî bilind da rakirîye.

58; Evan (pêxemberên, ku navê wan borîne) hene! Ji nişa (Adem) û ji nişa wan kesên, ku me ewan bi Nûh ra hildabûne (kelekê) û ji nişa Îbrahîm û Israîl (Y'eqûb) in. Me

ji wan ra, rê daye nîşanê û me ewan (di nava kesan da bi pêxemberî) hilbijartîne. Gava beratên Yezdanê dilovan ji wan ra tê xwendinê ji xwe va diçin, bi giryanê ve diçin secdê.

59; Îdî li pey wan (pêxemberan) ûrteke wusa maye, ewê ûrtê dest ji nimêjkirinê berdane, bûne peyrewê dîlxweziya xwe (haja wan ji fermanên me ne maye. Evanê jî celata qûretîya xwe bibînin). Wê li bal dojê da bêne avêtinê.

60; Ji peştirê wanê, ku ji kirinê xwe poşman bibin û karê aştî kiribin, evanan dikebine bihiştê, qe bi tu tiştî cewr li wan nayê kirinê.

61; Ewa (bihiştê) bihişteke wusa ne (Yezdan)ê dilovan bi ne xûyayî ji bona bendeyên xwe ra peyman daye (ku wê ewanê bikebine wê bihiştê). Bi rastî peymana (Xudayê dilovan) tê şûna xwe.

62; Ewanan (di bihiştê da) hey rastê vê peyvên "Selam" tên, qe peyvên kajî vajî têda tune ne. Ji bona wan ra di sibeh û evaran da xwarinên wan di bihiştê da hene (ewan jê dixun).

63; Ewa bihiştê hanê heye! Ji bendeyên me, kîjanê xudaparizî dike, em ewî dixine mîratxwarê wê bihiştê.

64; (Dema niqandin, çend royan para ket, pêxember ji Cebraîl pirsîye: "Ka çima niqandin para ketîye?" Cebraîl bersiva wî daye, aha gotîye): "Em hey bi fermana Xudayê te têne hiartinê, çî di berya me da borîye û çî di pey me da maye, û di niveka van her du deman da jî çî heye, hemî ji bona Xudayê te ra ne (çî ferman bike wilo dibe). Şîxwa Xudayê te (tu jî) bîrva ne kirîye.

65; "Xudayê ezman û zemîn û Xudayê tiştên di niveka wan herdukan da heye, ewa ye. Îdî tu ji bona wî (Xuda ra) perestî bike û tu ji bona perestîya wî ra binive. Qe tu bi navê yekî (ku bi navê Yezdan hatibe navdanê) dizanî?"

66; Meriv (aha) dibêje: "Gava ez mirim, dîsa ezê di nêzîk da zindî (ji gorê) derkebim?"

67; Qey meriv bîra xwe naynin, me ewan afirandin, qe ewan di berê da tu tişt nebûn?

68; Bi Xudayê te! Emê ewan û pelîdan bi hev ra bicivînin, paşê emê ewan li dora dojê li ser çokan amade bikin.

69; Paşê ji hemî koman, ka kîjan e di hemberê (Yezdan)ê dilovan da, bi curet û serbilind e, emê di nava wan da rakin.

70; Şîxwa paşê em bi xweber jî çêtir dizanin ka li bal dojê da kîjan babet e, ku bê avêtinê.

71; Di nava we da yekê neçe dojê tune ye (hemûşk jî herine dojê). Eva ketina dojê li ser Xudayê te fermanek e, pêk hatîye.

72; Paşê emê ewanê xudaparizî kirine hene! Ewan ji dojê fereste bikin, emê ewanê cewr kiribûne jî di dojê da li ser çokan bihêlin.

73; Gava beratên me yên daveker ji bona wan ra têne xwendinê, ewanê bûne file hene! Ji bona wanên bawerger ra (aha) dibêjin: "(Ka hûn gelî bawergeran! Mêze bikin) ji van her du destan, cîyê kîjan yê çêtir e, kîjan qenctir e (ku meriv ji xwe ra bixe heval)?"

74; Me çîqa welatîyên, ku hêj ji van bi mal û temtêla xwe va pir rindtir bûne, teşqele kirine, di berya wan da borîne. (Tu dibe qe ewan bi teşqela wan nizanin?)

75; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Kî rêya xwe wunda kiribe, heke Yezdanê dilovan heya hinek deman (mal û zar û fîrsend) bide wî, çî jê derdikebe? Loma heya gavê peymanê ji bona wan ra tê, ewan ji van her du tiştan, yekê dibînin: Ya celata wan (bi destê bawergeran di vê cîhanê da ne) ya jî di roya rabûna hemî da (doj bi xweber e.)" Îdî ewanê di wan gavan da bizanin, ka şûna kî, sikê şûna ne û ka bi leşkerî, kê bêvece.

76; Ewanê hatine rêya rast hene! Yezdan belediya wan hêj pirtir dike. Ewan karên aştîkarî para da mayî hene! Ewan li bal Xudayê te, qencê karan e û (evan karê, ka para da ji bona xweyê wan ra tê dayînê) qencê wan e jî.

77; (Muhemmed!) Qe tu evê, ku bi beratên me bûye file (aha) dibêje: "We (di roya rabûna hemî da) mal û zarê ji min ra bêne danê (ezê jîwê gavê mafê teyê li bal min heye bidime te)" nabîni?.

78; Gelo ewa bi nexûyanan (dizane, çûye ewan dîtine) ya jî ji Yezdanê dilovan peyman sitandîye (ku we ji wî ra mal û zarê bêne dayînê)?.

79; Gotina wî nîne (ewa xapîyaye) ew tiştê ku ewa dibêje, emê ewî binivîsin, emê şapatê ji bona wî ra bi dirêjayî dirêj bikin.



80; Emê bibine ûrta wan gotinê wî (mal û zaran ji wî bistînin) ewê bi serê xwe, bi tenê were bal me.

81; Ji bona ku bibine piştevanê wan, ewan ji xwe ra pêştirê Yezdanê (babetê perestîyê) hinek ilah girtine.

82; Wekî gotina wan nîne! Ewan (ilahên, ku ewan ji xwe ra girtine) wê nankorya perestî ya wan bikin û wê ji wan ra bibine dij.

83; (Muhemmed!) ma qey tu nabîni? Ku bi rastî me pelîdên (wusa) li ser filan da şandine, ji bo ku helanê bi gonehkarî bidine wan, ewan ji gonehan bikin.

84; Îdî tu ji bona (şapatdana wan) lez neke, loma em ji bona wan ra danê (şapata) wan dihijmîrin.

85; Di roya (rabûna da) em xudaparizan, deste û deste li bal (Yezdan)ê dilovan da dicivînin.

86; Û em gonehkaran jî li bal dojê da bi xurakandin dajon (ça tariş li bal xwê avê da dixurukin)

87; Ji pêştirê wanê ku li bal (Yezdan)ê dilovan, peymana mehderyê hildane, tu kes nikare mehdere bike.

88; Ewan (filan aha) gotibûne: "(Yezdan)ê dilovan ji xwe ra zar girtine."

89; Bi sond! We curetekî pîr sik anîye.

90; (Wusa sik e) hindik maye, ku ezman ji wê (gotina we) biçire û zemîn bidire û çîyan jî biherifin.

91; Ji ber ku we doz kiriye û (gotîye): "Ji bona (Yezdan)ê dilovan ra zar hene."

92; Babet nîne ji bona (Yezdan)ê dilovan ra, ku ji xwe ra zaran bigire.

93; Şixwa çî tiştên di ezman û zemîn da hene! Hemûşk jî li bal (Yezdan)ê dilovan ra bi bendetî tên.

94; Bi sond! (Yezdan ewan hemîşk jî) hildane binê hêz ya xwe, ji hijmara wan ra paşî hatiye.

95; Ewan hemûşkê jî di roya rabûna hemû da (li bal Yezdan da) wê bi kitayî werin.

96; Bi rastî ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Wê (Yezdan)ê dilovan ji bona wan ra hezkirinekî çê bike (her kesê ji wan hez bikin).

97; Îdî ewa (Qur'an)a bi zimanê te (hinartîye) hêsanî kirîye, ji bo, ku bi wê (Qur'an)ê xudaparizan bidî mizgîndanê (ewanê felat bibin) û tu ewî komalê leçker jî (bi hatina şapatan) bidî tirsandinê.

98; Me di berya wan da çîqa (komalên) çaxan teşqeke kirine! Gelo qe tu ji yekê ji wan pêjnê hildidî, ya jî qe ji wan dengan dibihîsî?.

## Chapter 20 (Sura 20)

1; T.H. (Arşa van tîpên ji hevçûî her Yezdan dizane).

2; (Muhemmed!) Me Qur'an li ser te da ne hinartîye, ji bo ku tu bi wê (Qur'an)ê cefa bikişînî;

3; Lê me (ewa Qur'ana hinartîye ku xurî ji bo (xuda) tirsan bibe bîranînekî.

4; Ewa (Qur'ana ji wî Xudayê) ku zemîn û ezmana bilind afirandî (hêdî hêdî) hatiye hinartinê.

5; (Yezdan)ê dilovan, arş (wate) hildaye binê hêza xwe.

6; Çî tiştê di ezman û zemîn da heye û tiştê di nîveka wan herdukan da jî heye û tiştê di nava xunava xwelyê da heye jî, hemî ji bona wî ra nîn.

7; Heke tu (ji bona xwastin û lavayan) dengê xwe bilind bikî (ya jî dizîka da bêjî, li bal Yezdan yek e). Loma ewa bi hemî dizî û veşartîyan dizane.

8; Yezdanê (babetê perestîyê ew e) ji pêştirê wî tu ilahek tune ne, hey ji bona wî ra navê rind hene.

9; Qe (ji bûyera) Mûsa, ji bona te ra zanîn hatiye?

10; Di gavekî da (Mûsa) agirek dîtibû. Îdî ji bona malîyên xwe ra (aha) gotibû: "Hûn li vîra binivîn, bi rastî agirek li ber çavê min ket (ezê herim). Guman dikim, ku ez ji wî agirî ji bona we ra kozekî bînim, ya jî ez li ser wî agirî rastê beledêkî werim."

11; Îdî gava (Mûsa) hatiye bal wî (agirî) deng (li Mûsa hate kirinê, aha got): "Mûsa!"

12; "Bi rastî ez Xudayê te me, îdî tu her du pêlava derxe, loma bi rastî a, di naha da tu li newala pîroz ya (bi nav) Tuwa dayî.

13; Û min tu (ji bona pêxemberîyê) hilbijartîye, îdî ewa tiştê li bal te da tê

niqandinê tu guhdarya wî bike.

14; Bi rastî ez, erê ez! Yezdan im, ji pêştirê min, tu ilahek tune ne, îdî tu ji min ra perestî bike, ji bona ku tu min bîra xwe bînî, tu nimêj bike."

15; "Bi rastî wê roya rabûna hemîyê were, ji bo ku hemî candar, bi kirinê xwe bêne xelat û celatkirinê. em (danê hatîna wê) vedişêrin."

16; "Îdî bira ewê, ku bi hatina wê bawer nake, te (ji bawerîya hatina wê royê) nede paradanê, ewa hey bûye peyrewê hewasa canê xwe. Îdî (heke tu peyrewîya wî bikî) tu ê jî teşqele bibi."

17; (Yezdan ji Mûsa pirsîye, jê ra gotîye): "Mûsa! Ewê di destê te yê rastê da çi ye?"

18; (Mûsa bersiv daye aha) gotîye: "Ewa gopalê min e; Ez pala xwe didime li ser wî, ez pelê daran ji bona pezê xwe ra bi wî dadiweşînim û hêj ji bona min ra di wî gopalî da hinek nîyazên mayî jî hene."

19; (Yezdan ji bona Mûsa ra) got: "Mûsa! Ewî (gopalê ji destê xwe) bavêje."

20; Dema Mûsa (ewa gopala ji destê xwe) avêt, dêna xweyê (ewa kopala) wekî tîremarekî direve (tu dibê qey zîhayek e).

21; (Yezdan ji Mûsa ra aha) got: "Ewî bigire, tu ji wî netirse, dîsa emê li bal diliqê wî yê berê da bizirînin."

22; "Tu destê xwe bixe binçenqa xwe: destê te yê bê nexweşî sipî derkebe. Eva jî berateke mayî ye."

23; "Ji bo ku em bi te, ji wan beratên me yên mezinên (derhoze) bidine dîtîna (me evan beratan bi te dane xûyandinê)."

24; "Tu here bal Fir'ewn, loma bi rastî Fir'ewn ji ava rû derketîye."

25; (Mûsa ji Yezdan lava kirîye aha) gotîye: "(Bêhna min teng e) tu bêhna min fire bike (ji bo singê min axiftinan hilde)."

26; "Tu ji bona min ra bûyera min hêsanî bike."

27; "Tu girêya zimanê min veke."

28; "Ji bo ku ewan têngîhandina min bikin (ka ez çi dibêjim)."

29; "Tu ji malîna min, ji bona min ra şûnmaî û arîkaran çê bike."

30; "Bira ewa jî Harûnê bira yê min be."

31; "Tu piştevanîya min bi hêz bike."

32; "Tu ewî di bûyera min da, bixe hevparê min."

33; "Ji bo ku em pir (ji te ra perestî bikin, em te) ji kêmayan paqij bikin."

34; "Em pir te bîra xwe bînin."

35; "Bi rastî tu bi xweber jî me dibînî."

36; (Yezdan bersiva Mûsa daye, aha) gotîye: "Mûsa! Xwastîna te çi hene! (hemî) ji te ra hatîna dayîna."

37; "Bi sond! Me carekê mayî jî ji te ra qencî kiribû."

38; " (Gava tu ji dîya xwe bûyî) me li bal dîya te da eva (kirîna hanê) niqandibû."

39; "Ku dîya te, te bixe sursûm, paşê te bavêje ava ro ya mîlmîlok. Ji bo ku ewa ava, ewî sursûmî bavêje kêlekê xwe, wê yekê, ku neyar e ji bona min û neyar e ji bona wê (zara te ra jî) ewê (zara te) ji xwe ra bigire. (Mûsa!) Me hezkirînekî ji xwe, berdabû ser te, ji bo ku (ewa neyara) di binê dîdevanîya min da te şayî bike."

40; "(Îdî ewî te hildaye bal xwe, me şîrê biyanan li ser te ne durîst kiribû, te şîr venedixwar)". Di wê gavê da xûşka te çû bal wan; ji wan ra (aha) got: "Hûn divên, ku ez yeke bikarbe ji wî (kurîkî ra şîr bide) ewî xweyî bike, bidime nişanê we?" Ewan (bersiva xûşka te dan û gotin: "Ere" (xûşka te hat, dîya te ji wan ra bir.) Îdî me tu li bal dîya te da zivirandî. Ji bo, ku çavê wê ji hêstiran zaha bibe û bi murûzî çavnêr nebe. Û (Mûsa) te (ji wan mêrek) kuşt, îdî me jî te fereste kirî. Ji ber ku me te ji wan kovanan kiriyî, me tu bi pir aşîtan ceribandî. Tu bi çend salan di nava komalên (bajarê) Medyenê da hewyaî, paşê ewan gavên, ku me ji bona te ra dan, dabûn (dema dawya wan hat) Mûsa! Îdî tu li bal me da hatî."

41; "Û min tu (bi pêxemberî) ji bona xwe ra hêlbijartî."

42; "Tu û birayê xwe bi beratên min va beheren û hûn herduk jî, sistayê di bîranîna min da nekin."

43; "Hûn herduk herne bal Fir'ewn. Bi rastî ewa deliqîye ji ava rû derketîye."

44; "(Gava hûn çûne bal Fir'ewn) jê ra gotîna nerm bêjin, dibe ku ewa şîretan hilde, ya jî (ji hatîna şapatan) bitirse."

45; ( Mûsa û Harûn, bersiv dane, aha) gotîna: "Xudayê me! Em ditirsîn, ku (Fir'ewn)

êrişê bîne ser me (me bide cefadanê) ya jî îdî pirtir ji ava rû derkebe."

46; (Yezdan bersiva wan herdukan aha daye, ji wan ra) gotîye: "Hûn netirsîn, ku loma ez bi we ra me (gotin û kirinê wan) dibêhêm û dibînim."

47; Îdî hûn herduk herne (bal Fir'ewn, nevinin herin) ji wî ra (aha) bêjin: "Em herhuk jî pêxemberên Xwedayê te ne (Fir'ewn!) tu zarên (cihûyan) bi me ra (me) bişîne (welatê me) tu îdî li wan şapata neke. Bi sond! Me ji Xudayê te beratên derhoze (m'ucize) anîne. Xweşî û jînî ji bona peyrewê beleda ne."

48; "Bi sond! Li bal me da halîye niqandinê; ewan kesên ku bi doza (pêxemberan bawer nakin) piştî xwe dane wan û ewan dane derewdêrandinê hene! Şapata (Yezdan) ji bona wan ra ne."

49; (Fir'ewn ji wan pirsîye; aha) gotîye: "Mûsa! Xudayê we kî ye?"

50; (Mûsa bersiva Fir'ewn daye) gotîye: "Ewê afirandina hemû tiştan daye (reng û rûçikê wan çê kirîye) paşê jî (di armancê afirandinê da) anîne rêya rast, heye! Ewa Xudayê me ye."

51; (Fir'ewn ji wan pirsîye aha) gotîye: "Em (ji van doza we ra "Erê", bêjin lê) ka temtêla wan (komalên) ku di demê berê da borine çane?"

52; (Mûsa bersiva wan aha daye) gotîye: "Zanîna bi wan, di pirtûkekî da li bal Xudayê min e. Bi rastî Xudayê min ewan wunda nake û ji bîrva jî nake."

53; Ewê, ku ji bona we ra zemîn xistîye hêlan heye! Ewa Xudayê min e. Ewî ji bona we ra di zemîn da rêyên celeb vekirine. Û ewî ji jor da avek hinartîye. Îdî me bi wî avî, ji hemî çêreyên celeb bi zotî afirandîye. (Di vira da tê zanînê, ku çêre jî bi zotî hatine afirandinê).

54; Hûn ji wan hêşinayan bixun û tarişên xwe bi wan bidine çêrandinê. Bi rastî ji bona wanê, ku fermana parisaya ji sikatîyan dîkin, beratên hişildanê hene.

55; Me hûn ji wî (zemînî) afirandine û emê dîsa we li bal wî (zemînî da bimirî) bizvîrînin û emê careke dinê dîsa we ji wî (zemînî) derxin.

56; Bi sond! Me bi Fir'ewn hemî beratên xwe yê (derhoze) dane dîtînê. Îdî ewî ewan beratan dane derewdêrandinê, ji bawerîya bi wan para da çû (bi wan bawer nekir).

57; (Fir'ewn ji Mûsa ra aha) gotîye: "Mûsa! Qey tu hatî bal me, ji bo ku tu bi wan ançê xwe, me ji welatê me derxî?"

58; "Îdî emê jî wekî wan ançê, ku tu dikî, ançan ji te ra bînin. Îdî (Mûsa!) tu di nîveka me û xwe da, danê rademvaî dayne: Bira cîyekî wusa be, ne em ne jî tu para nekebin (ji me her du destan ra wekî hev be)."

59; (Mûsa ji wan ra aha) got: "Danê hatina me li bal hev bira roya xemla (ji bona cejnê be); ji bo ku hemî meriv di gava taştê da bicivîn."

60; Îdî Fir'ewn para da zivîrî (çû). Paşê endezezanê xwe civandin, hatine (radewa xwe).

61; (Piştî, ku Mûsa jî hate wura, endezezanê Fir'evn dîtîn, ji wan ra aha) gotîye: "Xwelî li we be! Li ser navê Yezdan bi vir derewan nekin, we reha we bi şapatan be birînê. Bi sond! Ewê vira dike, bi xweber belangaz bûye."

62; Îdî ewan ançkarên (Fir'ewn) di nava xwe da li ser bûyera xwe tekoşîn kirine û bi dizî ji hev ra pistepist kirine.

63; (Bi êşkere ji hev ra aha) gotine: "Evan herduk ançkaran, hey divên, ku bi ançê xwe we ji zemînê we derxin, ewan divên ku ola we ya nemûşî beherin."

64; "Îdî hûn hemî endezeyên xwe bicivînin, paşê deste dest, bi rêzî werin. Bi sond! Kî îro bi ser va were, ewa fereste bûye."

65; (Ançkaran ji Mûsa ra aha) gotine: "Mûsa! Tuyê bavejî, ya jî emê di cara yekem da bibîne avêtkar."

66; (Mûsa ji wan ra) gotîye: "Na, hûn bavêjin. Îdî (gava ewan gopal û kapê xwe avêtin) kap û gopalê wan, ji ançê wan (te digo qey) li bal hev da dibezyan.

67; Îdî Mûsa (gava ewan) bi gewdetî (dîtîn) di hundurê xwe da tirsîya.

68; Me (ji bona Mûsa ra) got: "(Mûsa!) tu netirse, loma bi rastî servahatin ji te ra ne."

69; "(Mûsa!) tiştî di destê te yê rastê da heye, ewî bavêje. (Ewê destê te da) wê wan tiştên (ku ewan ançkaran) bi pêşetî çê kirine dabi'ulîne. Loma tiştî ewan bi pêşetî çê kirine, ewan endezên ançkaran in. Şixwa ançkar ji kur hatibin, serfiraz nabin."

70; Îdî (gava Mûsa gopalê xwe avêtîye, gopalê Mûsa ewan pêşeyên ançkaran daqulandiye) ançkaran xweberdane çûne secde (aha) gotine: "Me bi Xudayê Harûn û

Mûsa bawer kirîye."

71; (Fir'ewn ji wan ra aha) gotîye: "Hêj berya min ji we ra destûr ne daye, we bi wî bawer kirîye? (Bira wusa be) bi rastî (Mûsa) mezinê we ye. Ewê ku hûn hînê ançê kirine (şixwa ewa Mûsa bi xweber e). Îdî (hûnê bibînin) ku ezê dest û pa yê we bi çîloçepî jê bikim, paşê ezê we bi serê çiqilê darê xurman da darda bikim. Hûnê wê gavê bizanin (ka ji min û ji Xudayê Mûsa) kîjan ji me zor şapat e, şapata wî her heye."

72; Ewan (bersiva Fir'ewn dane aha) gotine: "Tu çi dikarî bikî (xwe nede para) bi serê me bike, loma em nikarin hilbijartina te, li ser van beratên vekirî ne (berçavî) kû ji me ra hatine û li ser wî Xudayê em afirandine, bikin. Tu çi jî bikî, ewa kirina te, di jîna vê cîhanê da ne."

73; "Bi rastî me bi Xudayê xwe bawer kirîye, ji bo ku Xudayê me, xeletîyên me û ewan gonehên ji ançkirina, ku te bi me bi zor daye kirinê çêbûye) bibaxşîne. Bi rastî Yezdan (ji te) çêtirê û her maîtir e."

74; Loma kî bi gonehan va here bal Xudayê xwe, îdî ji bona wî ra doj heye. Ewa di dojê da, ne dimire û ne jî dijî.

75; Lê kî bi bawerî here bal Xudayê xwe, bi rastî karê aştî jî kiribe, îdî ji bona wan ra payeyên bilind hene.

76; (Ewan payan) bihiştê rez û beran e, di binê (darê) wê bihiştê da çem dikişin, ewanê di wura da her bimînin. Xelata wan (kesên, ku) xwe ji gonehan paqij dikan ewa ye.

77; Bi sond! Me li bal Mûsa da (aha) niqandîye: "Tu zarên cihuyan (ji misrê) bi şev da derxe rê." (Gava Mûsa ewan di şevê da derxistin, hatine derê avê, nikaryan ji avê derbas bibûnan, bêzar mane) îdî me (ji bona Mûsa ra aha got: "Mûsa!) tu (gopalê xwe li avê) bixe, tu ji bona (peyrewê xwe ra) rêyeke zaha ji deryayê bigire, ji bo ku ewan (ji gîhandina Fir'ewn û hevalê wî) netirsîn û (ji fetisandina di avê da jî kovanan) bi tirs nekişînin."

78; Îdî Fir'ewn bi tevê leşkerê xwe va ketine pey wan. (Gava ewan ketine nava avê, te bidîta avê ewan) ça niximandin! Îdî ewan di ava milmilî da, fetisîn hatine niximandinê.

79; (Bi vê kirina hanê) Fir'ewn, komalê xwe wud da kir, ne anî rêya rast.

80; (Gava zarên cihuyan fereste bûn, me ji wan ra aha gotibû:) "Gelî zarên cihûyan! Bi sond! Me hûn ji neyarê we felat kirine. (Ji bona hinartina Tewratê me ji bona we ra) kêleka rastê çiya yê Tûrê Sîna (bi êwirgahi) peyman dabû, me (ji bona, ku hûn birçî nebin, ji bona we ra) di jor da, gezo û goştê qarutkan hinartîye."

81; "Hûn ji paqijê rozîyên me dane we, bixun, hûn ji bona van xwarinan ne deliqîn (ji ava rû dernetebin) ji bo ku xeşma min bi ser we da nekebe. Bi sond! Xeşma min bi kê da hatibe, îdî ewan krtîye agir."

82; "Bi rastî ez bi xweber, ji bona wî kesê ji kirinê xwe yê (sik) poşman bibe û bi hebûna girêdên me (şert) bawer kiribe, paşê jî hatibe rêya rast, baxîşkar im.

83; (Piştî ewan cihûyan li çola sîna ê ewirîn, Mûsa birayê xwe yê Harûn di nava wan da hişt, ji bona peymana Xuda daye, çûne çiyayê Tûr; Yezdan ji Mûsa ra aha gotîye): "Mûsa! Gelo çi tiştê, ku tu bi lez ji komalê te (raqetandî, hatî vira?)

84; (Mûsa aha bersiv daye) gotîye: "Heya ewan di şopa min da nin, min lez kirîye, ez hatime bal te, ji bo ku tu Xuda! bi min qayîl bibî."

85; (Xuda bersiva Mûsa daye) gotîye: "Bi sond! Ji piştî te, me komalê te ceribandîye. Samirî ewan ji rêya rast derxistin, rêya wan wunda kirîye."

86; Îdî Mûsa para da li bal komalê xwe da bi hêrs û kovan, zivirî (ji komalê xwe ra aha) gotîye: "Gelê min! Qey Xudayê we ji bona we ra peymanekê rind ne dabû! Qey danê peymanê pir direj bibû, ku we aha kir? Ya jî we bi van kirinan diva, ku ji Xudayê we xeşmek bi we da were, îdî hûn rabûn, peymana we dabû min, jê poşman bûn?

87; (Ewan bersiva Mûsa dane, aha) gotine: "Bi rastî em ji ber xwe da, ji wê peymana me daye te, poşman ne bûne, lê jî xişrê komalê Fir'ewn, hinek bar li me hatibû kirinê, me hildabû. îdî me ewan (xişran) avêtine (agir, me ewan bahatin) bi vî awayî "Samirî jî (xişre xwe) avête (agir bahat.)

88; Îdî Samirî ji bona wan ra (tokela) golikeke, ku diore derxist, paşê ewan (ji hev ra aha) gotine: "Ilahê we û ilahê Mûsa eva ye, lê ewî eva birva kirîye (çûye li çiyayê "Tûrî Sîna" lê digere)."

89; "Ma qey ewan nabînin, ku ewa golika li bal wan da tu (bersivekî) nazivirîne û

ji bona wan ra qe tu kar û zîyanê jî nake?"

90; Bi sond! Hêj berê da jî Harûn ji wan ra gotibû: "Gelê min! Bi rastî hûn bi wê golika hatine ceribandî (hûn ji rê derketine). Bi rastî Xudayê we ewê dilovîn e; îdî (hûn werin) bibine peyrewê min û bi gotina min bikin."

91; Ewan (bersiva Harûn dane aha) gotine: "Bi sond! Heya Mûsa (ji çîyayê Tûr) li bal me da nezivire, neyê vira, emê hey ji bona (perestîya wê golikê) bê nivandin dom bikin."

92; (Ji piştî, ku Mûsa ji çîyayê "Tûr" li bal wan da zivirî, bi hêrs, ji bona Harûn aha) gotiye: "Harûn! (Ka bêje) gava te dît, ku ewan (evan tiştên hanê dîkin, ji bo çî) te ewan ji vê rêderketina haê nedane para da?"

93; "Ka ji bo çî tu nebûyî peyrewê min (wekî min hêrsa xwe bianîya, ewan ji kirinê wan bidana para?) Qey te bê gotina min kirîye?"

94; (Harûn ji bona hêrs danîna Mûsa aha) gotiye: "Kûrê dayîka min bi rû û serê min negire, loma bi rastî ez (ji te tirsîyam) dibe tu gohdarya min nekî, ku tu (ji bona min ra) bêjî: Te di nava zarên cihûyan da du tîretî kirîye (ji ber vî ez têkilî wan nebûm)."

95; (Paşê Mûsa zivirî ser Samirî jê ra aha) gotiye: "Samirî! (ka bêje;) te ji bona çî evan tiştan kirîne?"

96; (Samirî bersiva Mûsa aha daye) gotiye: "Tiştê komal ne didît min ewa didît; (gava Cebraîl ji te ra niqandin dianîya, min ewa didît) îdî min ji şopa saî qemçek (xwelî) hildaye avête nava xişrê (hatibû bihatin, eva tokela hanê jê deket.) Şixwa canê min jî wusa şîrîn dixwest."

97; (Mûsa ji bona Samirî ra aha) got: "Îdî tu (ji vira) here, di jîna te ya cîhanê da, ji bona te ra eva heye;" Nêzikê min nebin (loma bi min ra derdê bê derman heye). Ji bona te ra danê (şapatê) heye. Qe tu ji wê şapatê para nakebî, tu li encama wî ilahê xwe î, ku nedihewyaî ji wî ra te perestî dikir mêze bike. Bi rastî emê ewî bişimitînin, paşê emê ewî di ava milmilî da bi hûritî bidine bayê."

98; "Bi rastî ewê ku ji pêştirê wî tu ilahê bebetê perestîyê tune ye, heye! Ewa Yezdanê we ye. Ewî hemî tişt hildane zanîna xwe."

99; Bi vî awayî em ji bona te ra ji serdaborîyên berê diaxivin. Bi sond! Me ji bal xwe da (pirtûkekê da bîrxistoker) daye te.

100; Îdî kê ji wê rû bifetilîne, bi rastî ewê di roya rabûna hemî da barekî giran hilde.

101; Ewan di binê wî barî da her diminin. (Ewa bara) di roya rabûna hemî da ji bona wan ra çîqa hildaneke sik e!

102; Di roya, ku di Sturî da tê pufkirinê, em nûsîtemkaran di wê royê da bi çav beloqî û şasî dicivînin.

103; Di nava hev da pistepist dîkin (ji hev dipirsin; gelo çend royan em di cîhanê da mane? Bersiva hev dane, aha gotine: "Hûn di cîhanê da hey deh royan mane."

104; Em bi wê (mayîna wan yê cîhanî, ku ewan di nava hev da pistepist dikirin, ji hev ra) digotin, çêtir dizanin. Loma ewanê di pêşrewanê da nemûşê wan in (aha) gotine: "Hûn di cîhanê da hey royekî mane."

105; (Muhemmed!) Ewan ji te temtêla çîyan dipirsin: (Ka çîyayê di roya rabûna hemû da, wê ça bibin?) îdî tu ji wan ra bêje: "Xudayê min ê wan çîyan hûr bike bixe (arişt) bide bayê."

106; "Îdî (Xudayê min ê) şûna wan rast bike, bihêle."

107; "Tu (şûna wan da) qe tu kort û tepan nabînî."

108; Di wê roya (civînê da) hemû kes dibine pewrewê wî gazîkarê, ku ji bona wî ra xarkirina (li bal rast û çepê da çênabe). Hemû deng ji bona (Yezdanê) dilovan ra ker dibin. Îdî tu ji pêştirê mişîniyê tu dengî ji wan nabînî."

109; Di wê royê da tu mehdêrî kêr nayê, ji pêştirê mehderya wî kesî, ku (Yezdan)ê dilovan ji bona wî ra destûra mehderyê dabe û (Yezdan) bi gotinê wî qayîl bûbe (mehderya vî bi tenê bi kêr tê).

110; (Yezdan) bi kirinê wan ê borî û bi kirinê wan ê para tê, dizane. Ewan kesan bi tu zanîne, zanîna (Yezdan, ya jî zanîna ji Yezdan bi xweber) hîlnedane binê zanîna xwe.

111; Û hemî rû ji bona (Yezdan)ê zende û şîra zebûn bûne. Bi sond! Ewanê cewr hildane, hene! Ewan (di wê royê da) belengaz bûne.

112; Û kîjanî jî bawer kiribe û karê aştî kiribe, îdî ewa ji cewr û ji maf ne danê,

natirse.

113; Bi vî awayî me (ewa pirtûka) Qur'aneke 'erebî hinartîye me di wê (Qur'an)ê da (peymana) şapatan bi cure cure fetilandin (ji wan ra gotin). Loma dibû ku ewan xudaparizî bikin, ya jî ewa (Qur'an)a ji bona wan ra bibe bîrdaxistinekî.

114; Îdî bi rastî serokê maf, Yezdanê bilinde. (Muhemmed!) Heya ku li bal te da niqandina wê pêk ne hatibe tu leza (xûndina) Qur'anê neke, tu (aha) bêje: "Xudayê min! Tu zanîna min pîr bike."

115; Bi sond! Me hêj di berê da li bal nişa kesan da peyman dabû (ku ewa ji berê wê darê nexu). Îdî (ewê nişa ê peymana me) bîrva kirîye, em bi xweber jî ji bona (nişa kesan ra) rastê tu cadê ne hatin.

116; Gava me (nişa kesan afirandibû, me) ji bona firiştan ra (aha) gotibû: "Gelî firiştan! Hûn ji bona Adem ra secde beherin." Îdî ji pêştirê nişa pelîd hemî (firiştan ji bona Adem ra) secde birin, ewî secde nebîr.

117; Îdî me jî (ji bona nişa kesan ra aha) got: "Adem! Bi rastî eva (pelîda) ji bo te û jina te ra neyar e (haja we bira bi we hebe) ku ewa we herdukan ji bihiştê dernexe, îdî ku hûn şepirze bibin."

118; "Bi rastî (di bihiştê da) ji bona te ra tazîbûn û birçîbûn tune ye."

119; "(Tu di bihiştê da) bi rastî ne tî dibî û ne jî tav li te dixê."

120; Îdî pelîd li bal (nişa kesan da xwarina ji berê dara da zanînê (Şeceret ul-M'erîfet) daye siwêrandinê, ji wî ra (aha) gotiye: "Adem! Tu divê ku ez beledîya te bikim, li bal dara (dazanîna) her maî û li bal seroktîya bê dawîya ne rizî?"

121; Îdî (ji bo ku ji mirinê felat bibin. tim cari bijîn, rabûn) ji wê darê xwarin (piçtî xwarinê) ji herdukan ra cîhê 'eybên wan vebûn, herduk li bal (darê) bihiştê da revîyan, ji bo ku bi pelên wan daran pêş û paşîya xwe bigirin. Adem (bi vî awayî) ji gotina Xudayê xwe derket û jê mehrûm ma.

122; Paşê (Adem bi zarîn û girîn ji wan kirinê xwe poşman bû). Xudayê Adem, ewa (ji nava heyran) hîlbijart û kirinê wî baxişandin, îdî ewa anî rêya rast.

123; (Xudayê wî ji wan ra aha) gotiye: "Hûn herduk hemî (ji bihiştê) berjêr bin: Hinekê ji we, wê ji bona hinekên we ra neyar bin. Îdî gava ji min li bal we da beledî hat, kî ji we bibe peyrewê beledî ya min, paşê ewa rê wunda nake û şepirze jî nabe."

124; "Kîjan rû ji bîranîna min bifetilîne, îdî ji bona wî ra jîneke nemir û neji heye û emê ewê di roya rabûna hemî da kor bicivînin."

125; (Ewa di wê royê da aha) dibêje: "Xudayê min! Te ji bo çi ez bi korî civandime? Bi sond (hêj berê da) min didit."

126; (Xuda jê ra) dibêje: "Wusa ne: Gava beretên me ji te ra hat, îdî te ewan beratên me bîrva kiribûn, tu jî wusa dî îro da hatî bîrva kirinê."

127; Em bi vî awayî, ewê dest belavê, ku bi beratên Xudayê xwe bawer nake celat dikin. Bi rastî şapata para da jî hêj zortir û her mayîtir e.

128; Qey ji bona wan ra ne bûye rêzber, ku me di berya wan da çîqa komalên çaxan teşqeke kirîye? Ewan bi xweber jî di nava kavlê wan da digerin (bi çavê xwe jî ewan kavilan di bînin). Bi rastî di van (beratan da) ji bona xwe parizan, beratên sodretî hene.

129; Heke ewa paymana (danê şapatdana wan) ji Xudayê te ne borî bûya (celata wanê, wê bi kirîna wan ra) bihata. (Lê) dane (şapatdanê) hatiye navdanê.

130; Îdî tu li ser gotinê wan hew bike, tu di berya roj hila û roj ava da bi sipazîya Xudayê xwe, perestî bike tu di hinekî danê şevê da û kêlekê royê da jî bi paqijîya Xudayê xwe ji kemasîyan perestîya wî bike. Loma hêvî heye ku tu (bi vî kirinê) qayîl bibî.

131; (Muhemmed!) Tu her du çavê xwe, li bal wan zonê (Fileyên) ku me ji hinekî wan ra ji bona ceribandina wan, xemla cîhanê daye wan, bi direjî zoq neke. Bi rastî rozîyên Xudayê te, qenctir û her mayîtir e.

132; Tu fermana malîyên xwe bi nimêjkirinê bike. Tu bi xweber jî li ser cefayên wê berxwe bide. Em ji te rozînan naxwezin, em ji te ra rozînan didin. Şixwa encam ji bona xudaparizan e.

133; Ewan (aha) gotine: "Gotî ewî (ji bona pêxemberya xwe) hinek beratên (derhoze) ne anîbûya (ku me bi wî bawer bikira)?" Qey ji bona wan ra di pirtûkê berê da beratên daveker ne hatibû?

134; Heke me ewan hêj di berya hatina (pêxemberan li bal wan da, teşqeke kiribûnan,

wê ewanê bi gotinan: "Xudayê me! Qey çi dibû, ku te li bal me da pêxemberek şandibûya, îdî hêj ku em aha ser berjêr û riswa ne bibûnan em bibûna peyrewê beratên te?

135; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Hemî kes didarî dikin, îdî hûn jî didarî bikin (paşê em mêze bikin) ka hevriyên rêya rast kî ne û ka kîjan di rêya rast da nin? Hûnê wê gavê bizanin.

## Chapter 21 (Sura 21)

1; Ji bona kesan ra (danê) hijmara (kirinê wan) nêzik bûye, lê ewan bi xweber jî dibe gomanîyeke wusa da nin (ji hatina wê danî) rû fetilandine.

2; Çiqa berateke nû ji Xudayê wan ji wan ra hatîye, ewan hey bi tinazkirina wê beratê gohdarî kirine.

3; Dilê wan hey di laqirdiyan da ne. Ewanê cewr kirine hene! Di nava xwe da (aha) kurepistî kirine; ma qey (Muhemmed) jî merivekî wekî we nîne? Îdî hûn ça li ber çavan diçin dibine (peyrewê wî) ançkarî?

4; (Pêxember jî wan ra aha) gotîye: "Bi rastî Xudayê min, di ezman û zemîn da çi gotin hebin, bi wan dizane. Ewa bihistokê pirzan e."

5; Na, (Muhemmed, pêxember nîne, emê çima bibine peyrewê wî? Paşê aha) gotine: "Evan tiştên dibêje jî sêwrandin û xewên rojk in, dibe ku ji ber xwe jî dibêje. Wusa ne xwuzanekî (pir zana ye). Heke aha nîne, de ka bira wekî wan pêemberên berê hatî, ji bona me ra beratên derhoze) bîne."

6; Çiqa (rûniştîyên) welatekî, ku me di berya wan da teşqeले kiribin, ji ber ewan bawer ne kirine, loma me ewan teşqeले kirine, îja evanê bawer bikin?

7; Me çiqa (pêxember) di berya te da şandine, ewan jî hey mêr bûne; me li bal wan da niqandiye. Îdî heke hûn (bi van rastîya) nizanin, hûn jî (xweyî pirtûkan, rastîya wan) bipirsin.

8; Me ewan (pêxemberan) ne xistine termekî wusa, ku qe xwarinan ne xun. Ewan (pêxemberan di cihanê da jî) bê mirin nînin.

9; Me paşê, ewan peyman, ku me dabû wan (pêxemberan) rast derxist. Îdî me ewan û bi evîne xwe va felat kirin û ewanê dest bela jî me teşqeले kirin.

10; Bi sond (gelî kesan!) Me li bal we da pirtûkeke wusa hinartîye, di wê (pirtûkê da) nav û nîşanê we bi abûrî heye. Îdî qe hûn hiş hilnadin?

11; Me çiqa ji wan welatîyên, ku cewr kiribûne bi şkenandinê teşqeले kirine! Û me paşê (di şûna wan da) komalekî mayî afirandiye.

12; Îdî gava ewan pêjna şapata me ye zor hildane, heman silikîne, bardarên xwe zengû kirine revîyane (ji welat derketine).

13; Hûn (gelî cewrkaran! Belaş) nerevin û para da li bal wan berxwudariyên xwe û xaniyên xwe da bizivirin, loma hûnê bi rastî ji wan bêne pirsînê.

14; Ewan (cewrkaran aha) gotine: "Xwelî li me be! Bi rastî em cewrkar bûne."

15; Eva peyva (hewrê "xwelî" li me be) tim digotm; heya me ewan bi durûnî (wekî çandinan durût) dengê wan temirî.

16; Me ezman û zemîn û tiştên di nava wan da heyî, bi tinazî ne afirandiye.

17; Heke me biva, ku ji xwe ra pêlêyîztek bigirta, meyê ewa tişta li bal xwe hilda (ku ewa babet bûya ji bona navê me ra). Heke me bikira, meyê aha bikira.

18; Na, (gotina wan nîne, lê em) mafê davêjine ser pûçîtiyê, îdî pûçî can dide (parparî dibe, namîne). Ji bona salixên wan yên, ku ji bona (Yezdan ra kêmayan dibêjin), xwelî li we be!

19; Di ezman û zemîn da çi hebe! Ewan ji bona Yezdan ra nin. Ewanê li bal wî hene! Ewan ji perestîya wî, quretî nekin (ku jê ra perestî nekin) û ji perestîya wî jî nawestin.

20; Ewan di şev û royan da paqijaya (Yezdan) bi perestî ji kêmayan dikin, qe nakerixin (sist jî nabin).

21; Qey ewan (filan) jî zemîn, ji bona xwe ra hinek xuda girtine; wê ewan (xudayên ewan ji piştî mirinê) biweşînin?

22; Heke jî pêştirê Yezdan, hinek xudayên mayî di ezman û zemîn da hebûnan, wê bi rastî herdukê jî kavi bibûnan. Îdî Yezdanê xwe yê arşê (m'ena) ji wan salixên wan, bê kemasî paqij e.

23; Ewa çi bike; ji kirina xwe nayê pirsînê, lê ewan (kesan) çi bikin, ji kirina xwe tene pirsînê.

24; Ewan (filan) qey ji pêştirê (Yezdanê babet ê perestîyê ji bona xwe ra) hinek xuda girtine? (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Kanê (ji bona xudatîya wan ra) nişanê we yên rastî çi hene! ewan (nişanan) bînin (bidine nişanê me). Eva (doza yekatîya Yezdan) doza wanê bi min ra ne (ça jî) pirtûka bi min ra û ewan pirtûkê berya min da borîne (nişanê vê doza me bi xweber e)." Lê pirê wan bi mafê nizanin, îdî ewan ji mafê rû fetilandine.

25; Me çiqa pêxemberek di berya te da (li bal kesan da) şandîye; me hey ji wî (pêxemberî ra aha) niqandîye: "(Hûn gelî kesan! Bizanin) ku tu îlahek (babetê perestîyê) ji pêştirê min tune ne, îdî hûn ji min ra perestî bikin."

26; Ewan (filan) aha gotine: "Xudayê dilovan, ji bona xwe ra zar girtine." Xuda ji wan gotinê wan paqij e. Lê (firişte) li bal (Yezdan) hinek bendeyên rûmetdar in.

27; Ewan (firiştan) nakebine pêşîya gotina (Yezdan). Ê ewan hey bi gotina wî (tiştan) dîkin.

28; (Yezdan) bi tiştê berya wan û bi tiştê paš wan da maye (bi kirî û ne kirîyê) wan dizane. Ewan (firiştan) hey mehderya wan ê ku ewa bi wan qayîl bûye, dîkin, şixwa ewan bi xweber jî ji tirsê wî cirifîne mane.

29; Ji wan (firiştan) kîjan bibêje: "Bi rastî ji pêştirê (Yezdan), ez jî xuda me." Îdî em ew bi dojê didine celatkirinê. Em cewrkaran wusa didine celatkirin.

30; Ewanê bûne file, ma qey nabînin? Bi rastî ezman û zemîn (di cara yekem da) bi heva bûn (paşê) me ewan ji hev fîstiqandin (ji hev dane derxistinê). Me ji avê hemî tişt zindî kirine (çiqa heyî hene! Hemî ji avê bûne gewde). Qey ewan hêj bawer nakin?

31; Ji bona ku zemîn ewan ne hejîne; me di zemîn da çîyayên binecî afirandine, me di (zemîn da) gaz û rê û bêlanê bilind çê kirine; ji bo ku ewan (bi hêsanî) herne (karê xwe û werne mala xwe).

32; Me ezman jî xistîye benakî parisvan, bi vî ra jî ewan (filan) ji berate û (bawerya Yezdan) rû difetilînin.

33; Ewê şev û ro û roj û hîv afirandîye, heye! Ewa Yezdan e. Ewan hemî jî di şûneke diyarî da melevanî dîkin.

34; Me di berya te da ji bo tu kesekî ra nemirî çê ne kirîye. Qey gava tu bimirî îdî ewanê (di cîhanê da) nemirî bimînin?

35; Bi rastî wê hemî candarê çeşna mirinê bikin. Em we bi qencî û xirabîyan diceribînin (ka kîjanê ji we hew bike). Paşê hûnê li bal me da bêne zivirandinê.

36; (Muhemmed!) Gava ewanê file te dibînin, ewan hey bi te tirana dîkin, ji hev ra (aha) dibêjin: "Qey eva ye, ku (kêmasîyên) Xudayê we dibêje?" Ewan bi xweber jî bi bîranîna (Xudayê) dilovan bûne file.

37; (Di xûyê merivan da wusa lezîtî heye, tu dibê qey) ji lezîtîyê hatine afirandinê. Îdî (gelî merivan! Binivin), ezê beratên xwe bi we bidime diyarkirinê.

38; (Ewan aha) dibêjin: "Heke bi rastî hûn rastbêj in ka danê peymanê (aşîtan) kînge ye?"

39; Heke ewanê bûne file ewî danê ku nikarin agir ji pêş û paşê xwe, bidine para û arîkariya wan jî nayê kirinê (bizanîyan ewa dana aha zû ne dixwestin).

40; Lê ewa dana ê nişkê va bi wan da were. Îdî ewan nikarin ewî danî bidine para; şaş dibin (dimînin, nizanin wê çi bikin) li wan jî nayê mêzekirinê (ku ji wan ra hinek danê mayî bê danê).

41; Bi sond! Bi wan pêxemberên berya te da jî hatiye tiranekirinê. Îdî ewan tiranekerê ji wan (filan) hene! Şapata tiranê wan, ewan hildane nava xwe da.

42; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo kê dikare; ku we di şev û royan da (ji şapata Yezdan yê) dilovan bide parisandinê? (Bi vî ra jî) ewan (hêj) ji bîranîna Xuda yê xwe rû difetilînin.

43; Qey ji bona wan ra ji pêştirê me, hinek xudayên mayî hene, ku ewan (ji şapata me) bidine para da? Ewan (xudan nikarin) arîkariya xwe bi xweber bikin (ma dora arîkariya wan wê ça bikin?). Ji me bi xweber jî (ji bona wan ilahan) qe tu xayîbûn çênabe.

44; Me ewan (filan) û bi tevê bav û kalê wan va dane jîrandinê, heya jîna wan ji wan ra jî dirêj hat. (Goman kirin, ku di cîhanê da bê mirin in). Ma qey ewan (filan) nabînin, ku em zemîn tînin, ji doranê zemîn dibirin (hindik û hindik zemîn kêmbibe)? Îdî qey servahatî ewan in (ya jî servehatî em in)?

45; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Ez hey we (gelî filan!) bi wê niqandina li



bal min da hatiye niqandinê, bi tirsdanî didime (hişyarkirinê). Lê gava li bal keran da bê gazîkirinê, ewan dengan nabihên (heya ji dengan jî) hişyarî hildin." 46; Bi sond! Heke pufek ji şapata Xudayê te bi wan (filan) bigire, ewanê (aha) bêjin: "Xwelî li me be! Bi rastî em cewrkar bûne."

47; Ji bona roya rabûn a hemî ra em terezîya (daditîyê) datînin, îdî tu can bi tu tiştî nayê cewrkirinê. Heke (kirina meriva) wekî libekî hîroyê be jî, hey emê ewî bînin (bikişînin). Şixwa ji bona hijmattinê em besî xwe ne.

48; Bi sond! Me ji Mûsa û Harûn ra pirtûkeke wusa anîye; ewa pirtûka (maf û pûçitîyê ji hev) radiqetîne, ji bona xudaparizan jî, ruhnaî û dabîrxistinê çê dike.

49; Ewanê ku dizîka da ji Xudayê xwe ditirsin hene! ewan xudapariz in, ewan ji danê (roya rabûn a hemî, ji tîrsa) diricifin.

50; Eva (Qur'an a hanê) bîranîneke pîroz e, me ewa (li ser Muhemmed da) hinartîye. Îdî (gelî kesan!) qey hûn rikê xwe ji wê (Qur'anê) tînin?

51; Bi sond! Me hêj berê da ji bona Îbrahîm ra sedra wî dabû (îdî ewî rastî û çewtî ji hev derxist.). Şixwa me bi vê (babetîya Îbrahîm) dizanîya.

52; Di gavekî da Îbrahîm ji bona bav û komalê xwe ra (aha) gotibû: "Ewan tokelê hanê yên çî ne, ku hûn ji wan ra bê nivandin perestî dikin?"

53; Ewan (bersiva Îbranîm aha dane û) gotine: "Em rastî bav û kalê we hatin; ji wan ra perestî dikirin (em jî perestîya wan dikin).

54; (Îbrahîm ji wan ra aha) gotîye: "Bi sond! Hûn û bi bavê xwe va, di rêwundabûneke xûya da nin.

55; Ewan (bersiva Îbrahîm dane aha) gotine: "(Îbrahîm!) Te ji bona me ra rastî anî va ya jî tu bi me dileyîzî?"

56; (Îbrahîm) gotîye: "Na, (gotina we nîne, ewan tokelan ji bona we ra nabine Xuda) lê Xudayê we: Xudayê ezman û zemîn e, ewî (ezman û zemîn) afirandîye. Ez bi xweber nêhrewanê (şahid) van tiştê me.

57; Bi Yezdan! Ji piştî hûn para da vegeryan çûn, ezê ji wan tokelan ra endezan bikim (ewan hûr bikim).

58; Îdî (ji piştî zivirandina wan) Îbrahîm tokelê wan hûr kirîye, ji pêştirê yek ê mezinê wan hebûye (ewa hiştîye). Loma di bû ku ewan li bal wî da bizivirin (pisyara hûrkirina tokelan ji wî bikin).

59; (Gava ewan para da hatin û dîtin, ku tokelê wan hatine hûrkirinê; ji hev aha pîrsîne): "Gelo kî bi serê ilahên me aha kirîye? Bi rastî kî jî kiribe, ewa hey ji cewrkaran e."

60; Ji hev ra (aha) gotine: "Me navê xortekî bihîstîye; jê ra Îbrahîm dibêjin (ewa ji van ilahên me, bi kêmasî mijûl dibe)."

61; (Ewan ji hev ra aha) gotine: "Hûn herin ewî bîne ber çavê merivan, dibe ku hinek ewî nîyas bikin."

62; Ewan (gava Îbrahîm anîne, ji wî aha pîrsîne:) "Îbrahîm! Te evan, bi serê ilahên me kirine?"

63; (Îbrahîm bersiva wan daye aha) gotîye: "Na, min ne kirîye; dibe ku evî tokela hanê mezin yên wan kiribe, heke ewan mijûl dibin, îdî hûn ji wan pîrsa (hûrkirina wan bikin)."

64; Paşê ewan ponijîn (aha) gotin: "Bi rastî hey cewrkar hûn bi xweber in."

65; Paşê bi sernegûnî li bal hişê xwe yê berê da zivirîne (aha) gotine: "(Îbrahîm!) Bi sond! Tu jî dizanî, ku evan (tokelan) mijûl nabin."

66; (Îbrahîm aha ji wan ra) gotîye: "(Hûn rast dibêjin) Lê ka hûn ça perestîya wan tiştên, qe tu kar û zîyana we nakin, dikin?"

67; "Ewan tiştên ku hûn ji pêştirê Yezdan perestîya wan dikin hene! Xwelî li we û li wan be. Îdî qe hûn (ji van bûyeran) hiş hil nadin?"

68; Ewan (ji hev ra aha) gotine: "Heke hûnê tişteki (bi Îbrahîm) bikin û arîkarya ilahên xwe bikin; hûn (Îbrahîm) bişewitînin (bi vî awayî tola ilahên xwe, ji Îbrahîm hil din)."

69; (Piştî ewan Îbrahîm avêtine agir) me (ji bona agir ra aha) got: "Agiro! Tu li ser Îbrahîm sar bibe û parizvanê wî be."

70; Ewan vabûn ku ji bona (Îbrahîm ra) endezan bikin, îdî me jî ewan bi rastî xistine ji wanê zîyankertir.

71; û me (Îbrahîm) û Lût ji wan felat kirîye, me ewan birine bal wî zemînê, ku me ewa zemîna ji bona cîhanê ra pîroz kirîye.

72; Me ji bona (Îbrahîm ra) ji piştî felatbûnê "Îshaq" raber kirîye, bi ser da jî ji bona Îshaq ra me "Y'eqûb" daye. Me ewan hemî jî xistine aşîkar.

73; Me ewan xistine pêşrewanên wusa, ewan bi fermana me beledî dikin û me li bal wan da kirina qencîyan û nimêjkirin û bacdan, niqandîye. Ewana ji bona me ra perestvan bûn.

74; Me ji bona Lût ra jî seroktî û zanîna retkokî aniye. Me ewa ji wan gundiyan, ku ewan kirinê sik dikiribûne felat kirîye. Bi rastî ewan (gundiyan) komelêkî sike ji rê derketibûne.

75; Me ewa xistîye dilovanîya xwe. Loma ewa "Lût" ji aşîkaran bûye.

76; Hêj di berya van da, me ji bona (Nûh ra jî) bersiv daye. Gava ewî (ji bona feresîya xwe) gazî me kiribû, îdî me jî (Nûh) û malîne wî ji kovanên mezin felat kirine.

77; Me tola (Nûh) ji wî komalê, ku ewan beratên me didane derewdêrandinê, hil daye. Loma bi rastî ewan komalêkî sik bûne. Îdî me ewan hemîşk di avê da fetisandin.

78; Me (ji bona) Dawûd û Suleyman ra jî (dilovanî kirîye). Gava pezê komal ketibû çandinîyan, (zevî) hatibû çêrandinê, ewan herdukan berewanîya nav ya (her du destan kiribûne). Em bi xweber jî şahidê berewanî ya wan herdukan bûne.

79; Îdî me (bi Suleyman) ewa berewanî daye zanînê (gotina Suleyman, ji gotina Dawûd çêtir hate litekirinê) me ji herdukan ra jî seroktî û zanîn aniye. Me ji bona Dawûd ra çîya ser nerm kirîye: Ewan (çîyan) bi Dawûd ra (gotinê) paqijî dibêjin. Me çûk jî (ji bona wî ra ser nerm kirîye). Em ewan tiştan dikarin bikin û (dikin jî).

80; Me bi Dawûd pêşetîya çekirin a zirîncan daye hînkirinê, ji bo ku ewan zirîncan we di royê (qirînê da) ji tîrsa (birîndaryê) bidine parisandinê. Îdî qey, hûn sipazî nakin?

81; Me ji bona Suleyman ra jî bayekî hilwejok daye. Ewa baya bi fermana Suleyman li bal wî zemînê, ku me ewa zemîna pîroz kirîye, dikişe diçe. Bi rastî em (bi kirina) hemî tiştan dizanin.

82; Û (me ji bona Suleyman ra) jî pelîdan (cunûkan) hinek (pelîdên melevanê wusa) ser nerm kirine; ewan (pelîdan dikebine deryayê, ji bo ku di diryayê da xişran derxin. Evan pelîdan) ji pêştirê (xebat a deryayê da) xebatên mayî jî dikin: (Xaniyan ava dikin, dersê cihûyan, ji bo zanîna pêşewanî didin û dersê tişt yên mayî jî didin). Em ji bona wan (cunûkan ra ji bo ku ewan ji fermana Suleyman dernekebin) parisvan in.

83; Û gava Eyûb (nexwaş ketibû, aha) gazî Xudayê xwe kirîye: "Xudayê min! Bi rastî îdî evî derdî ez bêzar kirime (ez dizanim) dilovantirê dilovanan tu bi xweber î."

84; Îdî me ji bona (Eyûb ra) bersiv daye. Me ewa ji wî derdê pê va girtî, mefa (şifa) kirîye, me hemî malîyên (wî yên berê, dîsa) dane wî û bi dilovanîya li bal me da heyî me wekî wan jî bi wan ra dane wî. Evan dayîn û mefakirin, ji bona cîhanê ra dabîranîneke (Yezdan e).

85; Û (ewan pêxemberên ku bi serê wan da dert hatine hene!) Îsma'îl û Îdrîs û Zelkefil jî wan in. Ewan hemîşkan jî (li ser derdê xwe) hew kirine.

86; Me jî ewan hildane nava dilovanîya xwe da. Loma bi rastî ewan ji aşîkaran in.

87; Û (Yunûs)ê xwe yê (masî jî) di gavekî da (ji komalê xwe) xeyîdî bû (çûbû). Îdî ewî goman kiribû, ku em nikarin (dîsa ewî li bal komalê wî da bizvirinin û ewî jî xirabîyên wan biparisînin). Ji piştî (ku ewa ji kelekê avêtine avê; masîkî ewa daquland, ewî jî) di tarîtiyê da (aha gazî) kiribûye: "(Xuda!) Bi rastî ji pêştirê te (tu ilahek babetê perestiyê) tune ne, ez te ji hemî kemasîyan paqij dikim. Loma bi rastî ez ji cewrkara bûme."

88; Îdî me jî bersiva wî daye û me ewa ji kovanê fereste kirîye. Em bi vî awayî bawergeran felat dikin.

89; Di gavekî da "Zekerîya jî (aha) gazî Xudayê xwe kiribûye: "Xudayê min! Tu min bi tenê nehêle; (tu ji bona min ra ûrtekî bide, lê tu nedî jî ez tu kovanê nakişînim) loma bi rastî tu qencê ûrtanî."

90; Me ji bona Zekerîya bersiv da û me ji bona wî ra "Yehya" baxşîş kirîye û me ji bona wî ra, jîna wî jî bo bizarmayîne amade kir. Loma ewan di kirina qencîyan da dibezyan, ewan bi goman û bi tîrs gazî me dikirin. Ewan ji bona me ra bi ser berjêrî rûmeteke meziin digirtin.

91; Ewa (Meryema) ku daw û zayenda xwe (ji hemî tiştan parisandîye (heye!)) Me ji candarya xwe (di dawa) wê da puf kirîye (îdî ewa bi zar maye, paşê ji xwe ra kurek

anîye). Me ewa (jinika) bi tevê kurê wê va, ji bona cîhanê ra xistîye berateke (derhoze).

92; Bi rastî eva koma we ya hanê (ola yekatî û misilmana ne). Ez bi xweber jî Xudayê we me. Îdî hûn (gelî misilmanan!) hey ji min bi tenê ra perestî bikin.

93; (Evan pêxemberan wekî qulpê zincîran li pey hev peyweste bûne hatine. Ewan ola xwe ji hev hildane, hemî jî ji bona binecîtiya yek bawerîyê hatine, lê merivan bi xweber) di nava hev da bûyerên xwe ji hev raqetandine (ji ola Yezdan ra bi curecure nav da ne). Wê hemîşkê jî li bal me da bizivirin.

94; Îdî kîjan bi bawerî ji karê aştiyan bike, ji bona kirina wî tu nankorî tune ye (hey ji wî ra sipazî heye). Loma bi rastî em ji bona wî ra nivîsyanok in (kirinê wî bi qencî dinivîsin).

95; (Jîna cîhanê) li ser rûniştine welatê, ku me ewan teşqeke kirine ne durist e. Loma îdî ewan (carekî dinê) nazivirine (cîhanê).

96; Gava derê yecûc û mecûcan vedibe, hemî ji gorê xwe, ji her alî da (li bal civînê da) êriş dikin: (Derê goran li mirîyan vedibe hemî li bal civînê da bi xweber lez dikin têne civînê).

97; Îdî danê rabûnê bi rastî nêz bûye. (Gava meriv di roya rabûn a hemî da têne civînê), ewanê bûne file hene! Çavê wan di wê gavê da zoq dimîne (aha ji hev ra dibêjin) "Xwelî li me be, bi sond! Em ji vî danî bê goman bûne, bi rastî me li xwe cewr kiribûye, lê me (pê nizanbûye)."

98; Bi rastî (gelî Mekîyan!) hûn û bi wan perestvanên we yên, ku we ji pêştirê Yezdan ji wan ra perestî dikirin hene! Hûn ardûkê dojê ne, hûnê (bi hev ra) herne dojê."

99; "(Hûn qe naponijin) heke evan ilah bûnan, evan ne diçûne (dojê)? Ewanê hemûşkê jî di dojê da her bimînin.

100; Di dojê da ji bona wan ra qarîn û wîqandin heye, ewan (di dojê da ji zoraya şapatê) qe tu dengî nabihên.

101; Lê ewanê, ku ji me ji bona wan ra peymana bi qencîyan hatiye borînê hene! Ewanan ji (dojê) hatine dîrxistinê.

102; (Ewanê dîr ê dojê) qe pêjna wê jî nabihên, ewanan di nava (qencîyên) can xwastina xwe da tim dimînin.

103; Vecinaqindana mezin jî ewan bi mirûz nake (ji piştîderketina wan ji gorê ji mirûzê xwe nakin, loma nea ewletî daye wan, ewan ji mirinê nasilikin). Di pêşnewaziya wan da firişte derdikebin (ji wan ra dibêjin): "Ewa roya, ku ji we ra hatibû peymandanê hebû! Eva roya ye."

104; Di wê royê da em ezmanan wekî pêçandina defteran dipêçin. Ça di cara yekem da me ewan afirandibûn, emê dîsa ewan wusa tune bikin. Eva kirina hanê peymanê li ser me bi vê nevê bûye, emê evê bikin jî.

105; Bi sond! Me ji piştê Tewratê di Zebûrê da jî nivîsîbû ku wê bendeyên me yên aşîkarê bibine mîratxwarê zemîn; wê (ewanê zemîn biçînin, rakin û bajon, bibine xweyê zemîn).

106; Bi rastî di vê (Qur'ana hanê da) ji bo komalê perestvan ra ragihandina şîret yên hêja hene.

107; (Muhemmed!) Bi rastî ji bona cîhanêra me tu hey dilovan şandîye.

108; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Li bal min da hey eva hatiye niqandinê," Xwedayê we hey Yezdanekî bi tenê ye. Îdî (hûn ji wan bawerîyên pûç nazivirin) gelo nabine misilman?"

109; Îdî heke (ji piştî van şîretan jî) ewan dîsa para da zivirîne (li bal bawerîya xwe ya berê, tu ji wan ra aha) bêje: "(Tiştê hatiye niqandinê li bal min da, min ji we gotîye). Îdî em hemî (di zanîna biryaran da) wekî hev in. Gelo ewa (aştiya), ku ji we ra hatiyepeymandanê, nêzîk e ya jî dîr e, ez pê dizanim?"

110; "Loma bi rastî (Yezdan) bi gotinê eşkere û dizî dizane."

111; "Bi rastî ez nizanim, gelo çima şapatê bi we da nayne; gelo ji bona ceribandina we ye, heya hinek gavan para da hiştiye, ya jî ji bona ku hûn heya hinek danan bi kêfa xwe bijîn (para da hiştiye?)."

112; (Muhemmed Pêxember aha) got: "Xwedayê min! Tu di nava me da bi mafî berewanî bike. (Ça hûn doz dikin, dibêjin: "Em servahatinê li ser we bikin di hemberê we da") Xwedayê me yê dilaovan: wê arîkarîya me di hemberê wan salix yên we da bike."

## Chapter 22 (Sura 22)

1; Gelî kesan! Hûn parizaya Xudayê xwe bikin, loma bi rastî heja danê (rabûna hemîtî) tiştêkî pir mezin e.

2; Di wê royê da tu dibînî, ku hemî (dayîkên) şîrvan (ji şîr vexwurên xwe) para da diçin (ji tîrsa şîr nadine berbistanê xwe) û hemî (dayîkên bîzar, zara xwe datînin. Tu dibînî, ku meriv sermest in, lê ewan bi rastî serxwoş jî nînin: lê ji ber ku şapata Yezdan pîr zor e (ewan di wê temtêlê da têne xûyandinê).

3; Û ji kesan hinek hene, ku di mafê Yezdan (û ola wî da) qe tu zanîna wan tune ye jî, dîsa tekoşînê dîkin (dibêjin: "firişte, zarên Yezdan in û roya hijmara kirinan tune ye.") Ewan (bi vî awayî) dibine peyrewê hemî pelîdên bi rik.

4; Li ser wî (pelîdî jî aha) hatîye nivîsandinê: " Kê pelîd ji xwe ra bixe serkar, îdî (pelîdê) ewî (ji rêya rast derxe) wunda bike, wê (pelîdê) ewî li bal şapata doj a ku aqirê wî hilopît e, behere."

5; Gelî kesan! Heke hûn di rabûna ji piştî mirinê da dudil in, îdî hûn (li afirandina xwe ya cara yekem mêze bikin). Loma bi rastî me hûn di cara yekem da ji xwelîyê (bi termî) afirandine, paşê (me hûn ji ava hindikê bin mayî) afirandine; (ava şûna xwe da dimîne: sivikê wê diçe û giranê wê di şûna xwe da dimîne, me hûn ji wê ava hin-dik mayî afirandine). Paşê (me hûn ji wan) zûrîyên, ku di nava wê avê da mabûne (afirandine) û paşê jî ji xerêfka avgoşt (afirandine; ava goşt gava sar dibe, dimeyî dibe xerêfk, zûrî jî gava hev digirin; wekî avgoştê dimeyîn dibine xerêfk). Ji bo ku em (hêza xwe) ji bona we ra diyar bikin; em (ewê xerêfkê ya pêk) tînin (dane heyîkî dihelin) ya jî ewê (xerêfkê ji malberxka dayîk a wê davêjine) der-va. Tiştê em bivên, ku ewî bixne heyî: em ewî di mal-berxka diya wî da heya danê navdayî dihelin: paşê em we bi zartî (ji malberxka diya we da) derdixin, paşê (ji bo ku hûn bigêhêjne) sedra xwe (di zanîn û his da, me hûn me-zin kirin) û hinek ji we hene! (ku hêj zar in) dimirin, hi-nek jî ji we hene! Heya danê wusa dimîne, ku (di wî danî da dixurufe) îdî ji piştî zanîna (xwe ya berê) qe tu tiştî nizane. (Hûn ça di van gavan da temtêla xwe diguhurin, wusa jî heyîyên mayî têne guhurandinê) tu dibînî, ku ze-mîn hişk bûye (mirîye) rût maye; îdî gava em avê li ser zemîn da dihênirin, zemîn diricife û gij dibe, ji hemî zone (hêşnaîyan: zone) rind hêşîn dike.

6; Eva (afirandina meriv û hêşnayan) wusa ne. Loma bi rastî Yezdan bi xweber (hebûnake) maf e, hey ewa mirya zindî dike. Loma bi rastî ewa li ser hemî tiştî şîye.

7; Û qe tu dudilî tune ye wê danê rabûna hemî tiştî were. Loma bi rastî Yezdanê hemî tiştên (veşartî) di goran da, wê rake, bişîne (cîvînê).

8; Hinek ji kesan hene! Ku qe tu zanîn û rêberî û pirtûk jî jê ra tune ye, dîsa di mafê (hebûna) Yezdan da tekoşînê dike.

9; Ji bo ku rêya Yezdan li ber kesan wunda bike (bi quretî xwe dimilmîne, li çep û rastê xwe, xwe dihejîne, tekoşîna xwe ra dom dike). Ji bona vî ra di cîhane da riswabûneke mezin heye, di roya (rabûna hemî da jî) emê bi wî şapata şewatê bidine çeşne (tam) kirinê.

10; Bi sedema wan kedên, ku her du destê te kirîye, di pêş da şandiye, eva şapata hanê bi serê te da hatîye. Loma bi rastî Yezdan ji bona bendeyên xwe ra cewrkar nîne.

11; Ji kesan hinek jî hene, perestîya Yezdan ji alîyekî da dîkin (bi hemî ola wî bawer nakin), heke ji wî ra qencîyek hatibe, ewa bi wê qencîyê diheve (qînata wî pê çêdibe). Heke ji wî ra aşîtek hatibe; hema li ser çavê xwe dikebe (dest davêje olan, bi xirabîya wan mijûl dibe). Ewî di cîhan û di para da jî (axiret) zîyan kirîye. Zîyana ber çavî eva ye.

12; (Ewan dest ji perestîya Yezdan berdane) perestîya wan tiştên pêştirê Yezdan dîkin, ku ewan tiştan jî ji wî ra ne kar û ne jî zirar didin. Rêwundabûna dûr eva ye.

13; Ewan perestîya wan tiştên, ku zîyana wan ji kara wan pirtir nêzikê wan e, dîkin. Bi rastî perestîya wan çiqa sikê serkarîtiyê ye û çiqa sikê hevaltîyê ye!

14; Ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Bi rastî Yezdan ewan dixwe wan bihiştên di binê (darê wan da) çem dikişin. Loma Yezdan çi bivê, bi rastî ewî dike.

15; (Bi rastî Yezdan di cîhan û di para da, wê arîkarîya "Muhemmed" Pêxember bike). Kê goman bike, ku Yez-dan di cîhan û para da jî arîkarîya "Muhemmed" nake, îdî

(gava dēna xwe dayê, ku Yezdan naha da arîkarîya pêxemberê xwe dike, hêrsa wî ji arîkardanê tê) ji bona hêrsdanîna xwe ra, bira serî li hemî çaran bixe; Ji bona xeniqandina xwe bira bendekî jor da dirêj bike, paşê bira xwe darda bike (xwe ji zemin raqetîne) îdî bira mêze bike; gelo ew hêrsa wî ye ku ji arîkarîya Yezdan hatiye bi vê endeza wî da, dikare arîkarîya Yezdan ji (pêxember) bide para da?

16; Bi vî awaî me "Quran" bi berate-ne xwûyaî hinartîye. Bi rastî Yezdan ji kîja-nî ra biv e, ewî tîne rîya rast.

17; Bi rastî ewan 6 bawerkine û ewan, 6 Cuhû û ewan 6 Mexînî û Sterk perest O Agir perest Q ewan e Hevrî çeker hene! , (ewan bira bi hev ra tekoşîn e bikin). Bi rastî Yezdan e di roya rabûna hemî da, we di 1 nava wan da berewanî bike. Loma bi rastî Yezdan li ser hemî tiştî dîdevane.

18; Maqey tu nabînî! çi kesne di azman O di zemîn da hene Q roj Q hîv û sterk û çîya ´ û dar û rawer û pire ji merivan hemî ji bona Yezdan ra kunde di bin? Le şapat ji bona pire merivan mafbûye. Loma bi rastî Yezdan kîjanî riswa bike, îdî ji bona wî ra tu-kes rûmet nagire. Bi rastî Yezdan çi bive, ewî dike.

19; Evanan du deste-ne; di maf e Xuda e xwe da bi hev ra tekoşîn kiri-ne. îdî ji bona we (dest a) file ra kincekî j i agir hatî-ye birîn e. Li ser ser e wan da, kem û xwûna kelyaî te rokirin e.

20; Bi we (kem O xwûna kelyaî) tiştî di zi-ke wan da heyî bi teve çerm e wan va, tene biha-tin e.

21; Ji bona (wan zebanîne doje ra) topizne j i hesin hene.

22; Çîqa ewan (filan) vane, ku ji agir derkebin (îdî kovana şapat e ne kişînin, ewan zebanîyan bi wan topizan li ser e wan xistine, dîsa ewan filan) li bal we kovana agir da zivirandine (ji wan ra aha gotine,) "Hûn (gelî filan!) çeşna şapata şewat e bikin."

23; Ewan e bawerkirine û kar e aştî kirine hene! bi rastî ew behîştî, ku (di bin e dare we da) cem di kisin hene! Yezdan e ewan bixe wura, ewan di we (behîşte da) bi bazinne ji zer û lalan tene xemlandin e. Kence wan bi xweber jî (di behîşte da) ji hevir-mûşîn. bide para da?

24; Ewan (bawerkeran di cihane da) li bal paqij e gotinan da; (ku ewa jî Peyva yekîtiye "laîlahe îlle-lah") e çûne. ewan li bal rîyaraste peşin van da çûne.

25; Bi rastî ewan e bûne file hene! ewanan (kesan) ji rîya Yezdan didine para da (nahelin meriv vterne rî-ya Yezdan) wusa nahelin jî ku (meriv werne sertedana we) mizgevtî (binav) mescid el heram; ku me ewa miz-gevtî xistîye şuna (perestîya) hemî kesan, îdî ewan kesan çi (di bajar e Melce da) runîştîbin, çi (Welat e) dûr e (Meke da bin) hatîbine (Mek e) yeke (qe tu raqetana nîvek a wan tune). Ke bive jî ku (di Meke da) cewre bi rik bike (merivan ji sertedana we bide para da) bira bi zane! em e bi wî şapata dilsoz bidne çeşne kirin e.

26; Di gava, ku me ji bona "îbrahîm ra" şuna xenîye (miz-gevt) daye dîyarkin e (ku here keder e di para da li bal wura da bi fetîle) me j i îbrahîm ra (aha) go-tîye; "(îbrahîm! tu) qe tu tiştîji bona min ra bi hevritî negire û tu xenîye min ji bona sertedanvanan û ji bona wan e li pîya (perestî dikin) û jibona kuz (rûkû) ker û kundekeran, paqij bike."

27; Û (îbrahîm!) tu jî ji bo-na sertedana (xenî) eazî hemî merivan bike, îdî (ji piştî gazî kirin e) we merive peya û yajî siwarî di hemî alyan da (dûr u nezîk da) werne bal te.

28; (Meriv e werin) ji bo ku dîdevanîya qendne ji bona wan ra hene, bikin. (Yezdan) ji bona wan ra tariş bi rozînî daye, li ser wan tarişan (dema gorîkirine da-Qurban) nev e Yezdan bira bi xwûnin. îdî hûn ji (goş-te) wan (goryan) bi xun û hûn ji bona wan hevcene xe-zan ra jî bidne xarin e.

29; Pas e (sinbel û neynûk û paqijîna maî pek bî-nin) qîrejîyan bavejin. Û görme xwe bi cî bînin, û (Li dora) xenîye kevin çerx bikin.

30; Kîjan qedege û ne dirustîne Yezdan bi rfl-metî bici bine, îdî eva pek anîna van (Qedeğan) li bal Xuda e wî ji bona wî ra çetire. (Gelî kesan!) ji peştir e (wan tarişne) ku li ser we da (nav û temtela wan di beratan da) te xwandin e (goşte) hemî tansan ji bona we ra dûrûst bûye, îdî hûn xwe ji pîsaya (perestîya) ji Pûtan ten bi parisînin, hûn xwe ji go-tin e be binî jî bi parisînin.

31; (GeB kesan!) hûn xurî ji bona Yezdan ra (Peres-û") bi kin û hûn hevriyan (di perestîya xwe da) ji bona wî ra çe nekin. Ke ji bona Yezdan ra hevriyan çe bike, nî

dibe qey ewa di jor da dikebe, çûk ewî di girin dibin, yajî "ba" wekî (kelkelokan) ewî dibe, daveje kaşekî dûr.

32; (Evan biryame bôn ahanin); le kîjan (bi vasati hec û gorîye xwe) wekî gotin e Yezdan pek bine, be dndiB (eva pek anîna) ji parizaya dilane.

33; Ji bona wera di wan tansan da heyadanekînavdanî (ji şîr û hirya wan) ker halin heye. Pas e şnna »an (larisne gorîye) Li bal xaluye kevne: (û wura da goryan y bikin).

34; ji bo ku ewan nav e Yezdan û ser wan tarişne, ku me ji bona wan ra bi rozinî da-ye; ewan jî (ewan tarpan bi gorin je dîkin) bînin, mî ji bona her ko-mekî ra dye jddnîsa wan gorîyan çe kirîye. îdî (hîm bi zanin eefi kesan!) Xuda e we yet e bi teneye, hûn ji wîbi tene raperesnbi km. (Muhem-med!) tu ewan e giran e (ku perestî-ya Yezdan bi ten e dîkin bi behîşt e) bide mizgîn dan e.

35; Evan e (giran, salix e wan ahane). Gav a (nav 6) Yezdan (te gotin e) dil e wan (ji ursa) di lerize û gav a aşîtek bi ser wan da hatibe, di hember e we aşîte da hew dîkin û nimej e dîkin û ji wan rozîne me ji wan ra daye, ewan jîji bona (hew-can ra) didin.

36; Me ji bona we ra deve jî asdye berata "OL"a Yezdan.(Hûn di kara ji wac devan jî goryan bi. din). Ji bona we ra di wan devan da qencî hene. (Gav a jekirîna wan da-van da hûn herdu pae wan 6) peşî-yi birez giredin, nav k Yezdan li ser wan bînin (pas e \k bikin). te gav a ewan ketne xare (bi hemî can e wan derket) hûn ji goşt e wan bi xwun u bi xezan e hewce ra û bi xwastiyan ra jî bidne xwarin e. Bi vî awa e me ewa (gonyan) ji bona we ra semerin kirîye, loma bide, ku hûn spazî bi kin.

37; LomabirastîDegoştewaDDejîXwunawall(goryan), na gihejne Yezdan, k ewa Xuda parizaya we heye! ewa di giheje Yezdan. Ji bo ku hûn bi mezinvanî spaaya Yezdan bikin, me (rîy' lîildana wan goryan) bi vî awaî ji bona we ra hesaî kirîye.Yezdan) bivî awaî (riya) hildana wan (gorîyan) daye nîşan e we. (Muhem-med!) tu mizgîn k bide qendkaran (ku ji wan ra qend hene). ^S1-^Sn lato evanîtaveniame'neneî'iezdan ewan (ji ende zene filan) di parisîne. Loma bi rasû" Yezdan ji henû evîxan e pm file hiz nake.

38; Bi rastî ewan 6 bawerkirine hene! Yezdan ewan (ji ende-zene filan) di parisîne. Loma bi rastî" Yezdan ji hemî evîxan e pir ( file hiz nake.

39; Ewan (bawerkeme, ku file) bi wan ra qirîn e dîkin hene! ji bona wan ra dustûra qirîna (bi filan ra) hatiye dayîn e. Loma bi rastî li wan (bawerkaran) cewr hatiye kirin 6. B6 dudiu Yezdan li ser arîkarya wan di şîye.

40; Ji ber, ku ewan (bawerkeran) dibêjin, "Xuda e me, Yezdan e " be mafî ewan ji Welat e wan hatine der-xistin e. Heke Yezdan hinekî merivan, bi hinek (merivne bi hez) neda parizandin e, we çûexane û kenîşte 0 der û mejgah û mizgevt e; ku nav 6 Yezdan di wan da pir te hildan e, bi hatîna hilşandin e. Bi rastî ke arî karya (01 a) Yezdan bike, Yezdan jî arîkarya wî dike. Loma bi rastî Yezdan bihez e servatîye.

41; Heke em ji bona (wan bawerkeran ra) di zemîn da seroktî û paydarî pek bînin jî (dîsa ewan na-kebine rîya cewr karan, we dîsa ewan e) nimej bikin û baca mal e xwe bidin û ewan 6 ferman a bi qen-cîyan û parizandîna ji sikatîyan bikin. Bi rastî encama boyeran ji bona Yezdan rane.

42; (Muhemmed!) heke ewan (komaine te) te didine derewderan-din e, îdî (bi zane) bi sond! ewan e beryawan da, ku komal e NûhûAd û Semûd

43; O komal e ibrahîm û komal e Lût

44; û komal e (nmiştîne bajar e) Medyene jî (evan Peyğembeme xwe) dane derewderandin e. (Wusa) Musa jî hatiye derewderandin e. îdî min jî j i bona filan ra fîrset daye (Heya hinek danan ewan jîne.) Paşe min ewan (bi şapatan) girtin. (Tu meze bike) nonkorya wan bi min ra ka çane!

45; (Tu meze bike) çiqa Welat hebune, ku me (runiştîne wan) tesqeke kirine, ewan (rûniştîyan) li xwe cewr kiribun, îdî (me jî) Welat e wan zer û zeber kir: bire wan be xaye mane û koşke wan xaB mane.

46; Maqey ewan qe di zemîn da nagerin; ka (di berya wan da çiqa Welat hatine teşqekekîrin e, ku bi çav k xwe ewan ka-vîlan bi binin)? Ji boku ji wan (kavîlan) dil k, wan bi pisporî his nûde, yajî ji bona wan ra gûtme wusa hebin, bi wan gu-han (şîretan bi dil û canva) bibehen. Loma bi rastî çav e (ser-yan, ji bona gîhandîna tiştan) kor nabin; (meriv e be çav jî di karin li ser tiştan remana xwe diyar bikm). Le bi rastî ko-raya raste (îdî ramana li ser tiştan, be wî çenabe); koraya

dil e singadane (loma pisporî ji bona merivan ra be gehîna dilan çenabe).

47; (Muhemmed! ewan filan) ji te hatina şapat e bi lez di xwazin; (ji te ra dibejin, "heke tu di doza xwe da rastî, ka bira a, di naha da ewa şapata bi me da were.") Û Yezdan bi rastî ji peymanî dayî, xwe para nade. (Heke hinekî ewe şapat e para bide jî, we peymanî xweve dayî, be dudilî pek bîne, qe bun leza balina we Dekin). Loma royek li bal Xuda e te wekî hezar sal e hun dilûjmirin, he-ye (gav u dem li bal wî tune, ev hijmara han e li bal we da heye).

48; Çiqa welatî hebûne, cewrkar bûne jî, dîsa me ji bona wan ra firset dabu (ewan di jîyan) le pas da me ewan (nişkeva bi şapatan) girtin. Şixwa feda da»ve jî B bal me dane.

49; (Muhemmed! tu ji wan ra aha) beje, "Gelî kesan! bi rasn ez ji bona we ra hey dahişyareid ber ça-vî me."

50; Ewan e bawerkirine û kar e aştî kirine nene! ji bona wan ra ba-ğisandin û rozîne be paşî hene.

51; Le ewan e bi lez didine ber-hev, ji bo ku beratene me (li bal me-rivan) be zar bikin (tu keş bi wan beratene bawer nekin) hene! ewanan hevrîne dojene.

52; (Muhemmed!) me çiqa di berya te da Peyğemberek (li bal ko-mal e wî da) şandibe (ewî Peyğem-berî ji bona komal e xwe ra) çivabe û (lava kiribe) Pelîd hey (di vîn û la-va kirina wî da) tevdanî çekirîye. îdî (j i piştî ve tekilkirina Pelîd) Yezdan eve tevdana Pelîd ji nav a (vîn û la-vakirina Peyğember) radike û pûç dike; pas e Yezdan beratene xwe bi hez dike. Bi rastî Yezdan pir zane bijejkeye.

53; (Yezdan ewan tiştan dike) ji bo ku ewan kirine Pe- 1 lîd, ji bona wan e ku di dil e wan da nexwaşî heye û ji bona wan e dilhişk ra bixe kovan û ceribandî. Loma bi rastî " cewrkar di newekhevbûna dîr e (ji Yezdan) danin.

54; Û ji bo ku ewan e, ji bona wan ra zanîn hatiye bi zanin, ku bi rastî eva (Qurana) mafeke ji Xuda e te (hatiye) îdî bi we (Quran e) bawer • bikin û îdî dil e wan ji bona (Quran era) rûmet-darbe. Loma Yezdan ji bona wan e bawerkirine, beledîya rîyarast dike.

55; bi vîra jî ewan e bûne file hene! ewanan heya niş- L keva dan e rabûna hemîti, yajî şapata roya bedûmda, bi wan da neyî, ewan e hey di (mafîtiya Qurane eda) dudil ^ bibin û biçin.

56; Di we roye da seroktî hey ji bona Yezdan rane. Ewa (di we roye da) di nîveka wan da berewanî dike. îdî ewan e bawerkirine û kar e aştî kirine he-ne! ewan di behisla qencîyan danin.

57; Ewan e bûne file û beratene me dane de-rewderandin e hene! îdîji bona wan ra şapateke ris-wabûnî heye.

58; Le ewan e ji bona rîya Yezdan ji (Welat e xwe) bar kirine (çûne) pas e hatîbne kuştin e, yajî (di we re da) mirîbin, hene! Yezdan e wana bi gence rojîna bide xwarin e (ewan xam bike). Loma bi rastî Yezdan gençtir e rojîn darane.

59; (Yezdan e) ewan bixe cîyekî wusa, ku ewan bi wî (d-yî) qayîl bibin. Bi rastî Yezdan pir zan e mehrîvane.

60; Ewan (biryame, ku me ji bona te ra gotine, wusanin) le kîjan (keş e) ku ji bona wî ra (cefa hatibe kirin e; ewa jî (tûla xwe) wekî cefadan a xwe (ji cefa kar e) hilde; (ji cefadana xwe purtir tûl e hîlnede) pas e dîsa cefakar) erîş, bi ser wî da anîbe (cefa dabe wî), Yezdan e bi rastî we arîkarya wî bike. Loma bi rastî Yezdan pir bağışkar e ve-şortekare.

61; Wusane! (Yezdan ji ke ra biv e, arîkarya wî dike). Loma bi rastî Yezdan (hinek tiştan, bi ser hinek tiştne maîra serva tîne; çi bi-ve ewî dike. Yezdan) şev e di \_\_\_\_\_ roye da û roye jî di seve da derbas dike (li hev di peçe), bi rastî Yezdan di behe Q di bîne.

62; Evan (kirine Yezdan) wusanin! Loma bi rastî Yezdan j i ber xwe heye (li bal heyana da qe hewce nîne) maf jî evaye. Le ewan tiştne, ku ewan (filan) ji peştir e Yezdan ji wan ra (perestî dikin) hene! ewan pûçin. Bi rastî Yezdan pir bilind e gewreye.

63; Ma qey tu nabînî? ku bi rastî Yezdan aveke wusa di jor da hinartîye; îdî bi we av e zemîn heşîn bûye. Loma bi rastî Yezdan bi hûr û giran, hemûşkan ra jî agahdare.

64; Çi tiştne di azman û di zemîn da hene! he-mî ji bona wî ranin. Loma bi rastî ewe pir zengîn e peşin van heye! Ewa Yezdan bi xwebere.

65; Ma qey tu nabanî ku bi rastî Yezdan çi tiştîne di ze-nîn da heyî û ewa keleka bi fermana wî di derya e da di kişe ji bona we ra semerm kirîye (ewan li ferman a we ra çav nerî dikin, nûn ça biven, ewan wusa dikin), ji bona, ku azman nekebe ser zemîn, ewî azman girtîye (azman) hey bi dustûra wî dikebe (ser zemîn). Bi rastî Yezdan ji bona kesan mehrîvan e dilovîne.

66; Ew e we zende dike û pas e we dimrîne û pas e (dîsa) we zende dike heye! ewa Yezdan e. Bi rastî meriv pîr nonkorin.

67; (Muhemmed!) bi rastî me ji bona hemî koman ra rez-berî çekirîye. Ewan (koman) di riya wan rezbeme xwe da di cin. îdî bira ewan (koman, di maf e rezberya OL e da) bi tera tekoşîn e nekin. (Muhemmed!) tu ewan (koman) gazî bal (perestîya) Xu-da e xwe bike. Loma bi rastî ewa rezberya (ku tu li bal Xuda da di çî) ewa rezberyeke raste.

68; Heke ewan (koman dîsa di maf e OL e da) bi te ra tekoşîn e bi kin tu (ji wan ra aha) beje, "Yezdan bi tişte nûn dikin, çetir di zane."

69; Hey Yezdan e di roya rabû-na hemî da, di wî tişt e, ku hûn di wan da newekhevbûne we berewanî bike.

70; Ma qey tu ni zanî, ku bi rastî Yezdan bi hemî tiştne di azman O zemîn da heyî di zane? Loma bi rastî eva (za-nîn a bi van tiştan) di zanîna Yezdan da parisîne. Bi rastî eva (kirina han e) li ser Yezdan hesaye.

71; Ewan (filan: dest ji perestîya Yezdan berdane) ji tişt e wusa ra perestî dikin, ku (Yezdan) ji bona perestîya wan ra, qe tu berate ne hinartîye, qe ji bona wan (filan jî, di maf e perestîya wan tiştan da \ ji peştir e gumanan) tu zanîn tune. Ji bona cewrkaran qe tu arîkar tune.

72; Gava beratene mene huzwartî li ser < wan tene xwendin e; tu di rûye wan e bûne file da, rik O nonkorîye nîyas dikî. (wusa rik e • wan te) nezîk dibe, ku erîş e beherne ser wan e ku beratene me di xwûnin (xwe bavejne ser wan). Tu (ji bona wan ra aha) beje, "ez ji bo- na we ra ji tiştne hej ji van diwartir bejim? l Ewa (sapa) agire. Yezdan ewa (agira) ji bona wan e bûne file ra peymandaye. Ewa çîqa şû-neke şike!"

73; Gelî kesan! (ji bona we ra) hecwe-kîyek hatîye anîn e, îdî hûn j i bona we (hec-wekîye ra) guhdarî bikin. Ewan e, ku hûn ji peştir e Yezdan (lavaye) ji wan dikin, hene! ewan hemî ji bona (aferandina meşekî) li hev bicivin jî dîsa nikarin meşekî bi af erinin. He-ke meş ji wan (perestvan û lavadaran) tişte-ki rake, ewan nikarin (xwe ji we meş e) bi parisînin. Xwastevan û xwastin herduk jî be-wec bûne.

74; Ewan wekî babetya Yezdan, biwî nizan bûne. Bi rastî Yezdan bi hez e servahatîye.

75; Bi rastî Yezdan ji fereşte û ji kesan; Saîyan hil dibejere. Bi rastî Yezdan bihistok e dîtokere.

76; Yezdan bi tişt 6, ku ewan (peş da kirine) Q bi tişt e, ku (ewane) para da bikin, di zane. Şixwa (hemî) boyer li bal Yezdan da dizvirin.

77; Gelî kesan! hûn xwe ji bona Xuda e xwe ra kuz bi kin û kunde beherin û perestîya wî bikin. Hûn qencîyan bikin, loma bi rastî hîvî heye, ku hûn bi gi-hejne armance xwe (felat bibin).

78; (Gelî kesan!) hûn di riya Yezdan da wekî babetya wî tekoşîn e bikin. Loma ewî hûn (dinava he-yan da) hilbijartîne; ji bona we ra di OL e da qe tu tengaî dernexistî-ye (OL a we jî wekî) OL a bav e weyî îbra-hîm (fire kirîye). (Yezdan) di berya (ve Quran e da, di wan Purtûkne bere da jî) ça di ve (Quran e bi xweber da jî) nav e we Misilman dayîne. (Yezdan eva nava li we danîye) ji bo ku Peyğember bibe Şahid e ser we û hûn jî bibine Şahid e ser kesan. îdî hûn nimejbikin û baca (mal e xwe) bidin û hûn (bi OL a) Yezdan bigirin . Ewa serkar e weye. îdî ewa çî-qa qenc e serkarane û çîqa e arîkarane!

## Chapter 23 (Sura 23)

- 1; Bi sond ewanê bawer kirine hene! Ewan felat bûne.
- 2; Ewan (bawergeran) di nimêja xwe da, ji bona (Yezdan ra) rûmetdarî dikin.
- 3; Ewan ji (mujûlîyên) bê amaç, rû fetilandine.
- 4; Ewan baca (malê xwe) dane.
- 5; Ewan ji bona (dawa xwe ra) parisvanî kirine (jin û mêr herdukan jî).
- 6; (Parisvanîya wan, ji bona bîyana ra ne) ne ji bona zoya wan ra ne, ya jî ji



pêştirê zo ya xwe û ji pêştirê wan ê ku (peymana mal anîne dane wan qerewaşan) bi wê peymanê qerewaş hildane binê destê xwe. Îdî (bawerger di razana tevê van hadukan jî) nayêne nav û nuçûk kidrine.

7; Îdî kê ji van (salixan) pêştir, paş da li bal hinekî mayî ra here, bi rastî ewan ji tuxûbê xwe borîne.

8; Ewan ji bona enamet û peymana (xwe yê dayî ra) pêkanok in.

9; Ewan ça hatine fermankirinê (ji bona nimêjê) wusa nimêja xwe dikin.

10; Ewanê di binê ûrt, evan in.

11; Ewanê ku di binê ûrta bihiştê bax û rezan hene! Evan bi xweber in, ewanê di bihiştê da jî her bimînin.

12; Bi sond! Me (nişa) merivan ji melqeke ji herîyê afirandîye (ji herîyê parzun kirîye derxistîye).

13; Paşê me ewa melqa di şûneke bi hêz da xistîye aveke binmaye tîr hiştîye.

14; Me paşê ji wê ava binmaye tîr, zûrû afirandîye, îdî me ewa (zûrûya) xistîye xerêfk (wekî ava goşt dema sar dibe, dibe xerêfk, ewan zûrûyan jî wusa di binê xerêft (dimînin). Îdî paşê me ji wê xerêfkê hestî afirandine. Hêj paşê me ewan hestîyan bi goşt daye niximandinê. Me paşê ewa (hestûyê goşt lêwerger, bi reng û rûçik û candarî) ji nişa wî ya berê pêştir, xistîye afirandekî mayî hiştîye. (Tu mêze bike) Yezdanê pîroz, çiqê qenctirê afirandoka ne!

15; Paşê (ji piştî vê afirandinê) bi rastî hûnê bimirin.

16; Paşê (ji piştî mirina we) hûnê di roya rabûn a hemî da, rabin, ji bo (civînê) bêne şandinê.

17; Bi sond! Me li stûyê we da hevt çerxê felekê, ku di rîya (xwe da dimeşin) afirandine. Û em ji afirandina (wan) bê agah nînin: (Me hemî bi zanîn afirandîye).

18; Û me ji ezmana avek pîvayî hinartîye, îdî me ewa ava di zemîn da daye êwirandinê. Û (me ça şiyaye, ku me ewa ava hinartîye) em wusa dişîn, ewê (avê) beherin (wunda bikin).

19; Îdî me bi wê avê ji bona we ra rezên ji tirî û xurman çê kirine, ku di wan (rezan da) ji bona we ra berên pir hene û hûn bi xweber jî ji wan beran dixun.

20; Û me (bi wê avê) ewa dara, ku (li çiyayê bi nav) Tûrisîna derdikibe (heşîn) kirîye. (Ewa dara heşîn dibe) rûnekî wusa dide (gava meriv) ewî rûnî li qote xwe dixin, pê xurina wan xweş dibe.

21; Bi rastî ji bona we ra di tarişan da ponijandinek heye. Em bi we ewî (şîrê) di zikê tarişan da heye, didine vexurînê, ji bona we ra di wan tarişan da hêj tiştên kêrhatî mayî jî hene. Hûn ji wan (tarişan, goştê wan) dixun.

22; Hûn li ser wan (tarişan) û li ser kêlekan tene siyarkirinê (diçin).

23; Bi sond! Me Nûh li bal komalê wî da bi pêxemberî şandîye. Îdî (Nûh ji bona komalê xwe ra aha) gotîye, "Gelî komalê min! Hûn hey ji bona Yezdan ra perestî bikin, ji pêştirê wî, ji bona we ra qe tu (Yezdanê babet ê perestîyê) tune ye. Îdî qey hûn xudaparizîyê nakin?"

24; Îdî ewa desta ji pêşrewanê komalê (Nûhê) ku bûne file hene! (Ewan bersiva Nûh dane; ji hev ra aha) gotine: "Eva jî hey merivekî wekî we ye, eva divê, ku bi rûmetî xwe li ser we mezin bike. Heke Yezdan biva, wê di şûna wî da firişteke (bi pêxemberî) bihinarta. Me hêj di bavên xwe yî yekem da jî tiştên aha (ku ji merivan pêxember hatine şandinê) ne bihistîye."

25; "Ewa (Nûh) hey mêrekî tepa dikebe (bi wî ra meçêtir hene) ji ber vî qasî hûn hinekî dîdevanîya wî bikin (ka encama wî ça dibe)"

26; (Nûh ji wê koma xwe bê goman maye aha) gotîye: "Xudayê min! Bi sedema, ku ewan min didine derewdêrandinê tu arîkariya min (di hemberê wan da) bike."

27; Îdî me li bal (Nûh da) niqandîye: ku ewa kelekê di binê dîdevanî û niqandina me da çêbike. Îdî gava fermana me bi teşqeledana wan hatiye û sitîla kelekê ji (kelê) ser da avêtibe (ya jî ava kelekê wekî tendûran kelyaye, kela wê bi ser da avêtîye) me (ji bona Nûh ra aha) gotîye: "Nûh!) Ji pêştirê wan malîyên te yên ku ji bona teşqeledana wan ferman ji me boriye, tu ji her zoyan duduyan (nêr û mêyan) û malîyên xwe jî bixe kelekê. (Nûh!) Tu ji bona wanê, ku cewr kiribûne; ji min lavaya (fereste ya wan) neke. Bi rastî ewanê di avê da bifetisin.

28; Îdî (Nûh!) gava tu û bi wanê bi te ra derketine ser kelekê hewyan (aha) beje: "Em ji bona wî Yezdanê, ku em ji komalê cewrkar fereste kirine, sipazî dikin."

29; Û (Nûh! Tu aha jî) bêje; "Xudayê min! (Te em tereste kirin, îdî) tu min bi

qencê dahêlan, dahêle êwreke pîroz (ji bo ku em bikaribin xwe xweyî bikin). Şixwa Xuda! Ewan (mexzûvanê ku li bal wan) êwir çêdibe hene! Tu bi xweber qenctirê wan î jî.

30; Û bi rastî me çîqa (Nûh û komalê wî) bi van (serdaboryan) dane ceribandîne, le dîsa di wan (serdaboryan da ji bona we ra) beratên (derhoze) hene.

31; Pasê me di peywan da (hinek komalê) çaxê mayî afirandîye.

32; Îdî me di nava wan (komalan da) saiyên ji wan (li bal wan da) şandîye. Ewan (saiyan ji wan ra aha gotîye: "Hûn gelê me!) Hey ji Yezdan ra perestî bikin, loma ji peştirê wî ji bona we ra qe tu ilah tune ne. Îdî qey hûn xudaparizî nakin?"

33; Ji koma wî (pêxemberî) ewanê bûne file û bi rastihatina para da (bawer nakin) dane derewdêrandîne; desta ji pêşrewanê wan, ku me ji bona wan ra di cîhanê da berxudarî dabû wan, hene! (Ewê destê ji bona hev ra di nava xwe da aha) gotine: "Eva (pêxembera jî) hey merivekî wekî we ye, loma hûn çî dixun û vedixun, ewa jî, ji wan dixwe û vedixwe."

34; "Û heke hûn bi gotina merivekî wekî xwe bikin, bi rastî hûn di wê gavê da di binê (ji wanê nezanê) zîyangerê (ku hatine xapandinê)."

35; "Qey ewa (pêxembera) ji bona we ra peyman a dide, ku hûn gava bimirin û bibîne xwelî û hestû, bi rastî hûnê dîsa (ji xwelyê) derkebin (herne civînê)?"

36; "Çîqa dûr e! Ewa peyman a, ku ji bona we ra hatîye dayînê dûr e!"

37; "Hemî tişt, hey jîna me ye di vê cîhanê da ne, em (di vê cîhanê da) dimirin û dijîn, qe em (ji bona hijmara kirinê xwe li bal civînê da nayêne şandinê)."

38; "Ewa (pêxembera) merekî wusa ne, hey li ser (navê) Yezdan derewan dike û bi rastî em bi wî bawer nakin."

39; (Pêxember aha) gotîye: "Xudayê min! Tu di hemberê derewdêrandina wan da, arîkariya min bike."

40; (Yezdan ji wî pêxemberî ra aha) gotîye: "Bi rastî ewanê di danekî hindik da, wê poşman bibin."

41; Îdî bi rastî dengê (birûska bêhişî) bi wan girt, îdî me ewan xistine berbirne lêmiştê. Dûrketin ji bona komalê cewrkaran e!

42; Me paşê li peywan da (hinek komalê) çaxê mayî afirandîne.

43; Bi rastî tu kom, berya (danê şapata xwe) nakebe (ça) bi rastî para da jî namîne.

44; Paşê (ji bona şapatdana wan ra) me saiyên xwe li pey hev şandîye. Çîqa komeke, ku pêxemberê wan hatine bal wan, ewê (komê) hey ewan (saiyên xwe) dane derewdêrandîne, îdî me jî (ewan koman, di teşqeledanê da) hinekî wan xistine peyrewê hinekên wan û me ji bona wî komalê ku bawer nakin, ewan li ser zar û zimanan da xistine mijûlî (hiştine). Îdî dûraya (ji diloşaniya Xuda) ji wan ra be!

45; Me paşê (li pey wan da) Mûsa û birayê wî yê Harûn bi berate û hêza xwe yê, xûyaî va şandîye.

46; Li bal Fir'ewn û koma wî yê (pêşrewan da), îdî ewan xwe qure kirin (bi wan bawer ne kirin). Şixwa ewan (Fir'ewn û koma xwe va) komeke (bi mal û nimet) bilind bûn.

47; Îdî (ewan bersîva Mûsa û Harûn dane, ji hev ra aha) gotine: "Emê ça ji bona du merivê, ku wekî me ne û komalê wan herdukan jî, ji bona me ra koletî dikiribûne, bawer bikin?"

48; Îdî (Fir'ewn û koma xwe va, Mûsa û Harûn) dane derewdêrandîne. (Fir'ewn û koma xwe va) bûne ji wanê teşqelekirî.

49; Bi sond! Me ji bona Mûsa ra pirtûk daye, loma hêvî heye (ku komalê Mûsa bi wê pirtûkê) werne rêya rast.

50; Û me ('Îsayê) kur ê Meryemê, bi tevê dîya wî ya (Meryem va) xistiye berateke (derhoze). Me ewan herdukan li bal topekî êwirgehê bi kanî ra anî.

51; Me (ji wan ra aha got): "Gelî saiyên hûn ji paqijê xurekan bixun û hûn karê aştî bikin. Loma bi rastî hûn çî dikin, ez pê dizanim."

52; Bi rastî ewan komên we (di bin da) komeke bi tenê ye (loma ximê hemişkan jî yakatîye) ez bi xweber jî Xudayê we me. Îdî hûn parizaya min bikin."

53; Îdî (paş da) ewan di nava xwe da bûyerên xwe ji hev raqetandin (xistne kom û olê curecure) bi pirtûkê (curecure nav da nin) her pirtûkî jî (bi raman û rêzbera li bal heyî hez dike) pê jî şa dibe.

54; Îdî (Muhemmed!) Tu dest ji (tekoşîna bi wan ra) berde, bira ewan heya gavekî di

wê berizandina xwe da bimînin.

55; Qey ewan goman dîkin, ku me ewan (di cîhanê da) bi mal û zar berxudar kirine.

56; Em ji bona wan ra leza qencîyan dîkin?. Na, wekî (gomana wan nîne) lê agaha wan ji van kirinan tune ye.

57; Bi rastî ewanê ji tîrsa Xudayê xwe vediciniqîn hene!

58; Û ewanê ku bi beretên Xuda yê xwe bawer dîkin hene!

59; Û ewan bi Xudayê xwe ra hempara çênakin hene!

60; Û ewanê, ji bo ku we li bal Xudayê xwe da bizivirin, ji wî {malê} ji wan ra hatîye dayînê, ewan jî (ji hewcan ra) didin, dilê wan bi xweber jî, ji tîrsa davêje (Gelo ewan kirinê min hatine litêkirinê, ya jî ne hatîye litêkirinê) hene!

61; (Ewanê salixê wan borîne) ew in, ku ji bona kirina qencîyan didine ber hev (ka kîjan, ji wan pirtir qencîyan dike). Evan in, ku bi kirina qencîyan pêş da ketine.

62; Em ji bona her kesekî ra hey wekî hêz û burha wî (fermana kirin a qencîyan û parisandina ji xirabîyan) dîkin. Loma li bal me pirtûkeke wusa heye, ewa pirtûka hey bi mafê dipeyîve (hemî kirin di wê da nivîsîne). Qe bi tu awayî cewr bi wan nayê kirinê.

63; Lê di dilê wan yê (qencîkar da) ji pêştirê van (kirinê borî) hinek kirinê (bi qencî) hene. (Ewan qencîkaran) ewan (kirinê dilê wan da heyî) bi xweber dîkin.

64; Gava em ewanê pêşrewanê berxudar ê wan, bi şapatan digirin; di wê gavê da zarîn dikirin.

65; (Em ji wan ra aha dibêjin): "Hûn (gelî pêşrewanan!) Di îro da zarîn nekin, loma bi rastî hûn ji me arîkarî hilnadin."

66; "Bi sond! Beratên min ji bona we ra hatine xwendinê, îdî hûn para da direvîyan."

67; "We di hemberê (Qur'anê da) quretî dikirin, di şev da (li dora mizgevtê) didvîyan (di mafê Qur'anê da) bi tirane mijûl dibûn."

68; Ma qey, ewan qe di mafê Qur'anê da naponijin, ya jî tiştê qe ji bav û kalê wan ne hatibû ji wan ra hatîye (ewan jî pê sodret dimînin)?

69; Ya jî ewan (filan) saîyên xwe nîyas nînin, îdî ji ber wî, bi wî (saîyê) bawer nakin?

70; Ya jî ewan (filan ji bona wî saî ra aha) dibêjin: "Eva sîya tepa dikebe." Na, (qe yek jî rast nîne) lê ewî (saîyê) ji wan ra rastî anîye, îja pirê ji wan (filan) ji bona rastîyê rikê xwe tînin.

71; Heke rastî bibûya peyrewê xwastina (dilê wan) wê bi rastî ezman û zemîn û kesê di wan herdukan da heyî, hemîşkê dêriz bibûnan. Lê me ji bona wan ra bi vê (Qur'anê) av û aborya wan) anîye, îdî ewan jî (ji av û abora xwe) rû fetilandine.

72; Ya jî qey tu ji bona (saîtîya xwe) ji wan kirê dixwazî (ewan filan ji ber vî bi te bawer nakin)? Bi rastî kirya Xudayê te (dide, ji kirya ku ewan bidine te) qenctir e. Loma (Xudayê te) qenctirê rozîdanan e.

73; Loma bi rastî tu ewan gazî bal rêya rast dike.

74; Ewanê ku (bi jîna) para da bawer nakin hene! Ewan ji rîya rast derketine.

75; Heke me li wan (filan) dilovanî kiribûya û me ewa tengasîya bi wan da hatîye, rakiribûya, ewanê dîsa di deliqandina xwe da bi korî bimanan.

76; Bi sond! Me ewan (filan) bi şapatan girtin. Îdî dîsa ewan . Ji bona Xudayê xwe ra serî berjêr ne kirine û lavaya (baxişandina xwe ne kirine).

77; Heya gava me bi ser wan da deryekî ji şapata zor vekirîye, îdî ewan di wê gavê da (ji her tiştî) bê hêvî mane.

78; Ewê, ku ji bona we ra goh û çav û dil çê kirîye heye! Ewa (Yezdanê) we ye. Hûn çîqa hindik sipasîya (wî dîkin!).

79; Ewê, ku hûn di zemîn da (ji bona piranîyê) afirandine heye! Ewa (Yezdanê) we ye. Hûnê bi rastî li bal wî da bicivin.

80; Ewê dijît û dimîrîne heye! Ewa (Yezdanê) we ye; Guhartina şev û royan ewa dike. Îdî qey hûn (li ser van kirinan naponijin) ku ji wan hiş hildin?

81; Na, ewan (qe li ser van tiştan naponijin) ewan jî wekî gotinê wan yê berya xwe gotine.

82; Ewan (aha) gotibûne: "Qey gava em bimirin bibine xwelî û hestû ji dîsa emê rabin herne civînê?"

83; Bi sond! Hêj di berê da em û bav û kalê xwe va (bi van peymanên, rabûn û çûne civînê) hatine peymandanê. Evan (peymanan) ji pêştirê çîvanokan qe tu tişt nînin.

84; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Heke hûn dizanin; ka ji min ra bêjin; zemîn û kesê di zemîn da heyî, ji bona kê ra nin?"

85; Ewanê (bersîva te bidin, wê aha) bêjin: "(Ewan hemûşk jî) ji bona Yezdan ra nin." Tu (ji wan ra aha) bêje: "Qe hûn naponîjin (ewê di cara yekem da bikaribe bîafîrîne, dikare ji piştî mirinê jî dîsa bîafîrine)."

86; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Ka Xudayê heft balokan (ezman-Heft gerokerên ji sitêrkan) û xweyê arşa mezin (mana mezin) kê ye?"

87; Ewanê (bersîva te aha bidin) wê bêjin: "(xayîbûna wan) ji bona Yezdan ra ne." Tu (ji wan ra aha) bêje: "Ka ji bo çi hûn xudaparizî nakin?"

88; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Heke hûn bi rastî dizanin ka ji min ra bêjin; seroktî û mal xûya heyar, di destê kê dane û ewa hemî tiştan diparisîne, qe tu tişt ewî naparisîne ewa dide xebatê qe tiştê ewî nade xebatê (ewa kî ye)?"

89; Ewanê (bersîva te aha bidin) wê bêjin: "(Malxwê û parisandina wan) ji bona Yezdan ra ne." Tu (ji wan ra aha) bêje: "Îdî ka ji bona çi hûn têne (xapandin) û ançkirinê?"

90; Na, (gotina wan nîne) me ji bona wan ra rastî anî. Ewan bi rastî viran dîkin.

91; Yezdan ji bona xwe ra qe zar ne girtine û bi wî ra jî tu (ilah babetê perestîyê) tune ne. (Heke ewan ça dibêjin; hinek ilahê mayî hebûnan) wê her ilahîkî, çi afirandîye bi xwe ra bibiranan (ewan ilahan wê bi tenê bîmanan, îja ewan ilahan wê) bi hev ra tekoşîn bîkirinan (ji bona servahatîna xwe, wê li hev cewr) bîkirinan gerdûnê bi vê tekoşîna wan kavîl bîbûya. Bi rastî Yezdan ji wan salixê ku ewan dîkin paqij e.

92; Ewa (Yezdanê) zana yê bi dizî û xûyanan e, îdî ewa ji wan tiştên ku ewan (filan) jê ra dixîne hevîrî pîr bilind û dûr e.

93; (Muhemmed! Tu aha) bêje: "Xudayê min! Heke tu î bi rastî ewan peymanê te daye (ji şapata, ji bona filan ra) bidî nişanê min."

94; "Xudayê min! Îdî tu min nexa nava komalê cewrkar."

95; Bi rastî em diçên ku ewe (şapata me ji wan ra) peyman daye, bidîne nişanê te.

96; (Muhemmed!) Tu ewan sikatîyên, ku ewan (filan) di hemberê te da dîkin, bi qencîyan bide paradanê. Em bi wan salixên, ku ewan (filan ji te ra dîkin) çêtir dizanin.

97; (Muhemmed! Tu aha) bêje: "Xudayê min! Min ji sêwrandin û rexneyên pelîd, xwe avêtîye te (ku tu min ji pelîd biparisînî)."

98; "Xudayê min! Ez xwe davêjime te, ku tu gava (ewan li bal min da) amade dikî (min ji wan biparisînî)."

99; Heya gava mirîna yekê ji wan tê (aha) dibêje: "Xudayê min! Çi dibe, min para da li bal cîhanê da bizivirîne (ezê ji te ra perestî bikim)."

100; "Loma bi rastî ezê di wê cîhana, ku min dest jê berdabû karê aştî bikim. Na, (eva gotina wî çênabe). Loma ewa peyvek e, hey ewa bi xweber dibêje (para hatina wa yên cîhanî qe çênabe) loma di berya wan da perdeke ne xûyaî heye, heya roya ku wê bêne rakirinê, ji bo herne civînê (ewanê piştî wê perdê da bîmînin)."

101; Îdî gava di stûrî da tê pufkirinê, di nava wan da (pîsmamî û ûrt) namîne û bi ûrtî jî, ji hev nayêne pîrskirinê.

102; Îdî kêşa kîjana giran be, îdî ewan felat bûne.

103; û kêşa kîjana sivik be, îdî ewanê ku zîyana xwe kirine hene! Ewan bi xweber in. Ewanê di dojê da her bîmînin.

104; (Di dojê da) agir li ser çavê wan dimalîne û ewan bi xweber jî di dojê da diranê xwe diçirikînin dimînin.

105; (Gava ewan zarîn dîkin, Yezdan ji wan ra aha dibêje): "Qey hûn ne bûn, gava beretên me ji we ra dihatine xwendinê, îdî we ewan beratan didane derewdêrandinê?"

106; Ewan (dojewîyan aha bersîva Yezdan dane û) gotine: "Xudayê me! Bi rastî deleqandina me, zor dabû ser me, loma em komalekî (wusa bûn) ji rêya rast derketibûn."

107; Xudayê me! Tu me ji (dojê) derxe, îdî heke em (ji piştî derketinê) çûne bal rêyên xirab, bi rastî îdî em cewrkar in.

108; (Yezdan bersîva wan daye, aha) gotîye: "Hûn di wura da dengê xwe bibirin û bi min ra jî mijûl nebin."

109; "Bi rastî destekî ji bendeyên min hebûn (aha) digotin: "Xuda me! Bi rastî me bawer kirîye, îdî tu jî me bibaxîşîne û tu li me dilovanî bike, loma tu qenctirê

dilovanan î."

110; "(Ji ber ku ewan aha lava dikirin) îdî we jî bi wan tirane dikirin, heya (ewan tiraneyên we, bi wan wusa pêş va çû) ewan tiranan ez bi we dame bîrvakirinê, loma hûn tim carî bi wan dikenîyan."

111; "Ji ber vî, min li ser hewa wan, di îro da ewan xelat kirin, loma bî rastî ewan (di îro da) serfiraz in."

112; (Yezdan ji bona dojevan aha) dibêje: "Gelo hûn çend salan di zemîn da mane?"

113; Ewan (dojevan aha bisyara Yezdan dane) û gotine: "Em royekî, ya jî danekî ji royê mane. Îdî tu ji wanê, ku hijmarê dikin, pîrsa (mayîna me) bike (loma em ketine derdê can ê xwe)."

114; (Yezdan ji wan ra aha) dibêje: "Xwezîka we bizanîya, bi rastî hûn hindik mane."

115; Ma qey we goman dikir, ku me bi rastî hûn beredayî afirandine û hûn bi rastî li bal me da nayêne zivirandinê?"

116; Bi rastî seroke; maf hey Yezdan e, ji pêştirê wî, tu (ilahek babetê perestîyê) tune ne. Xweyê arşa pîroz hey (ewa bi tenê ye).

117; Kîjan bi Yezdan ra, ji hinek ilahên mayî ra jî perestî bike, ku qe ji bona xudatîya wan, ji bona wî perestvanî ra tu nîşan jî tune ye, îdî hijmara kirinê wî, li bal xudayî wî ye. Loma bi rastî file felat nabin.

118; (Muhemmed! Tu aha lavaya baxişandina xwe bike) û bêje: "Xudayê min! Tu ewê (koma min) bibaxişîne û dilovanî (li wan bike) loma tu qenctirê dilovanan î."

#### Chapter 24 (Sura 24)

1; Eva, ku me hinartîye û (me fermanê wê li ser we) bi vê nevê; kirîye, ewa ferkerek e. Dibe ku hûn ji wê (ferkerê biryarên me) bîra xwe bînin. Me di wê (ferkera da) beratên hizwartî hinartine.

2; Ewan jin û mêrên karê xirab dikin hene! (Gava ewan karê xirab kirin) îdî ji bona her yekê ji wan ra, hûn sed darî lexin. Heke hûn bi rastî bi Yezdan û bi roya dawîyê bawer dikin, hûn di ola Yezdan da mêhrivanî nekin; (ola wî ça ferman dike; hûn wusa pêk bînin). Û bira desdekî ji bawergeran jî li celata wan herdukan nihrewanî bikin.

3; Mêrikê zinakar, hey bi jina zinakar, ya bi jinika hevriçêker ra, dikare kevîn bibe. Jinika zinakar jî hey dikare bi mêrê zinakar ra, ya jî bi mêrê hevriçêker ra kevîn bibe. Eva kevîniya hanê li ser bawergeran hatiye ne duristkirinê.

4; Ewan mêrên ku pizan davêjine wan jinê dawparêz, paşê jî çar nihrivan ji bona (piza xwe yê gotî ra) nayne hene! Îdî hûn heştê darî li wan bixin û hûn bi tu carî ji wan nihrewanî litê nekin. Bi rastî evanan ji rîya rast derketine.

5; Ji pêştirê wanê, ku ji piştî piza xwe poşman bibin û aştî kiribin. Loma bi rastî îdî Yezdan baxişgerê dilovîn e.

6; Ewan merivên ku ji bona zoya (xwe ra, eva zinakar; dibêje) hene! Heke ji bona wan ra ji wan pêştir qe tu nihrewan tune be, berewaniya wan aha ne; her yek ji wan nihrewaniya xwe wê aha bide: Çar caran her yek ji wan wê aha beje, "Bi Yezdan ez sond dixum, ku ez (di vê gotina xwe da) ji rastbêja me."

7; Cara pêncê da (aha bêje): "Deherandina Yezdan li ser min be heke ez derewan dikim."

8; Heke jinik jî çar caran aha nihrewanî bike û bêje: "Bi Yezdan ez sond dixum, ku zoya min ji vireka ne."

9; Cara penca da jî wê aha bêje: "Xeşma Yezdan li ser min be heke zoya min ji rastbêjan e." Celat li ser wê jinikê radibe.

10; Heke rûmet û dilovaniya Yezdan li ser we tune bûya û heke Yezdan baxişkarê bijejke ne bûya (wê gavê we yê ça bikira)?

11; Bi rastî ewanê, ku bi pizan hatine (eva peyva hanê avêtine nava kesan) hene! Ewan komeke ji we ne. Hûn goman nekin, ku ewa (peyva wan anîye) ji bona we ra (li bal Xudayê we) tiştêkî sik e. Lê ewa (kirina wan li bal Xudayê we) ji bona we ra qencîyek e. Ji bona her yekê (ji wan kesên ku eva peyva pizan anîye) çi ked kirine ji gonehan (hemberîya wan gonehên wan, ji aşîtan heye). Ewê mezin yê ji wan, ku aborya vê peyvê kirîye heye! Ji bona wî ra şapatek e mezin heye.

12; Xwezîka gava we ewa (peyva) bihist, mêr û jinên bawer kirine, gomana qencîyan (ji xûşka xwe) bikirinan (aha) gotîbûyan: "Eva gotina, hey pizeke xûya ye."

13; Ma qey ne diva, ku ewan li ser vê piza xwe, çar nihrewan bianînan? Îdî heke ewan çar nihrewanan (ji bona vê peyvê xwe) neynin, bi rastî ewan li bal Yezdan bi xweber derewkar in.

14; Heke di cîhan û para da rûmet û dilovanîya Yezdan li ser we tune bûya, we bi van nav û nûçikên, ku hûn têda noq bûne, şapateke mezin bi we bigirta.

15; Loma haja we qe pê tune bû, we ewa (peyva) bi zimanê xwe ji hev ra digotin, hûn goman dikin, ku eva (gotina hanê) hêsanî ye, lê ewa (gotina) li bal Yezdan gonehekî pîr mezin e.

16; Xwezîka gava we ew (peyva) bihîstibû, we (aha) gotîbûya: "Babet nîne, ku em bi vê (peyvê) biaxivin. Na (wusa nîne); em te ji van (gotinan) paqij dikin, eva hey pizeke mezin e."

17; Heke hûn bi Yezdan bawer dikin, ewa li we şîretan dike, ku hûn carekî dinê tişteki aha nekin.

18; Yezdan ji bona we ra biryarên (xwe bi vî awayî) hizwartî dike. Bi rastî Yezdan pîrzanê bijejke ye.

19; Bi rastî ewan (du rû ne) ku hez dikin, di nava wanê; bawerger da hîz û fuhûşê belav bikin hene! Ji bona wan ra di cîhan û di para da şapatek e dilsoz heye. Yezdan (bi van tiştan) dizane, lê hûn bi wan nizanin.

20; Heke rûmet û dilovanîya Yezdan li ser we tune bûya (wê şapateke mezin bi we da bihata) û bi rastî Yezdan mêhrivanê dilovîn e.

21; Gelî ewanê ku we bawer kirîye! hûn nebin peyrewê şopên pelîd. Bi rastî kîjan bibe peyrewê şopên pelîd, îdî bi rastî pelîd, hey fermana bi fehşa û sikatîyan dike. Heke rûmet û dilovanîya Yezdan li ser we tune bûya, tu kesekî ji we (ji qirêj û sikatîya gonehan) paqij ne dibû. Lê Yezdan evîne xwe (ji gonehan) paqij dike. Bi rastî Yezdan bihîstvanê pîrzan e.

22; Ewanê ji weyên, bi rûmet û maldar hene! Bira sond nexun, ku ji malê xwe qe tu tiştî ji bîna pîsmam û belengaz û ewanê di rêya Yezdan da ji welatê xwe koç kirine derketine, nedin. Û bira (ewan) baxişandin û borandina ji kêmayan bikin. Ma qey hûn hez nakin, ku Yezdan we bibaxişîne? Loma bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

23; Bi rastî ewanê, ku pîzan davêjine wan jinên dawpariz yên bê gomanê (ji fehşayê) û bawer kirine, hene! Di cîhan û di para da jî, ji dilovanîya Yezdan hatine deherandinê, ji bona wan ra şapatek e mezin heye.

24; Di wê royê da ziman û dest û pê wan bi kirinê wan li ser wan nihrewanî (şahidî) didin (gelo temtêla wana ça be?)

25; Di wê royê da ne, ku Yezdan bi mafîtî xelat û celata wan bi hemîtî dide wan. Ewan jî dizanin ku Yezdan mafekî xûya ye.

26; Loma bi rastî peyvên sik ji bona merivên sik ra ne û merivên sik jî ji bona peyvên sik ra nin (ewan peyvên sik dibêjin). Peyvên paqij ji bona merivên paqij ra nin, merivên paqij ji bona peyvên paqij ra nin (ewan peyvên paqij dibêjin). Ewanan ji wan (pîzên) ku ewan (durûyan) gotine, paqij in (haja wan pê tune ye). Ji bona wanan ra baxişandin û rozîyên rind hene.

27; Gelî ewanê, ku we bawer kirîye! heya hûn destûrê nestînin, ji pêştirê xanî yên xwe, nekebine tu xanîyên mayî (dema we ji bona ketinê destûr stand, hûn çûne wan xanîyan) hûn selaman li wan rûniştîyê wan bikin. Bi rastî heke hûn bîponîjin, bi vî awayî (çûna xanîyên mayî yan) çêtir e û qenctir e.

28; Îdî heke hûn di wan (xanîyan da) rastî tu kesî ne hatin, dîsa heya ji bona we ra destûr neyê dayînê, hûn nekebine wan (xanîyan). Heke ji bona we ra (aha hate) gotinê: "Para da bizvirin." îdî hûn para da bizivirin, ji bona we ra para zivirandin qenctir e. Loma tişta hûn dikin, Yezdan pîr pê dizane.

29; Ewan xanîyên, ku tu kes têda rûnanên, lê di wan da jî kelmelê we hebe, li ser we tu zîyan çênabe. Çi tişta hûn diyar bikin, ya jî veşêrin hey Yezdan pê dizane.

30; (Muhemmed! tu ji bona wan mîrên bawer kirine aha) bêje: "Hûn gelî bawergerên mîr! Çavê xwe (li mêzekirina ne duristîyan) bigirin û hûn dawa xwe (ji fehşayê) biparisînin. Eva kirina we (bi vî awayî) ji bona we ra paqij û qenctir e. Loma ewan çî bikin, Yezdan bi kirinê wan agahdar e."

31; Û (Muhemmed! Tu ji bona wan jinên bawer kirine jî aha) bêje, "Gelî bawergerên jin! Hûn çavê xwe (li mêzekirên ne duristîyan) bigirin û hûn dawa xwe (ji hîz û fehşayê) biparisînin, hûn ji pêştirê wan xemilên, ku xûyana wan bi vê nevê ye, xemla xwe nedine diyarkirinê (ji bona mîrên biyanî ra, ya jî hûn şûna xemla xwe

rindaya xwe ji bona bîyanayî ra venekin; wekî; dest û pê û sing û qirik û goh û stû û mil û pêşîr û serî û wekî van, ji pêştirê wan şûnên dîyariya wan bi vê nevê ye). Hûn (gelî jinan!) Laçika xwe li ser pastûne xwe ra berdîn. Hûn xemla xwe (ji bona meran ra) venekin, lê ji bona mêrên xwe ra ya jî bavên xwe ra, ya jî bavê mêrên xwe ra, ya jî kurên xwe ra, ya jî kurên mêrên xwe ra, ya jî birayên xwe ra, ya jî kurên biranê xwe ra, ya jî kurên xûşkên xwe ra, ya jî ji bona jinên (vanê borî ra) ya jî ewan bendeyên binê destê wan jinan da (ji mêr û jinan) hene, ya jî ewan mêrên ku îdî hewcebûna wan li bal jinan da ne maye, lê peyrewîya wan jinan dîkin; (wekî xulam û kal û parsek û hewceyên arîkaryan) ji pêştirê wanê ku rawa wî hebe, ya jî ewa zaroka, ku hêj haja wî bi veşartîyên jinan çê nebûye, (hûn) dikarin xemla xwe (ji bona van ra) vekin. (Gelî jinan!) ji bona ku hûn bi mêran bidine zanînê, ku xîşrê we heye, hûn pê xwe li zemîn nexin. (Gelî, bawergeran! Hûn hemîşk ji gonehan li bal Yezdan da bizivirin, loma dibe ku hûn (bi vî awayî) serfiraz bibin.

32; Ê hûn (gelî bawergeran!) xamayên xwe û bendeyên xwe û qerewaşê xwe yê aşîkar in, kevîn bikin. Heke ewan xezan bin, Yezdanê ewan ji rûmeta xwe zengîn bike. Loma Yezdan (xweyê qencî yên fire ye) pirzan e.

33; Ewan (xezanê) ku nikarin kevîn bibin hene! Heya Yezdan ewan ji rûmeta xwe zengîn bike, bira xwe ji tûlîtîyê biparisînin. Ewan koleyên (jin û mêrên) binê destê we da hene! Heke ewan ji we azadiya xwe, di hemberê (dayîna hinek baban da) bixwezin, îdî heke hûn bizanin (di azadiya wan da) qencî ji bona (wan kolan) heye, hûn ji wan (kolan ra danê dayîna bahan) binivîsin. Ewa malê (ku ewan kolan ji bona we ra tînin, bi rûmeta) Yezdan didine we, hûn jî hinekî ji wî malî ji bona wan (kolan ra bibaxişandin, para da) bidine wan. (Gelî kesan!) hûn ji bona (kara) cîhanê (li koleyên) xwe yên jin, kotekî ji bona hîzê nekin; ku ewan (kolan) dawparizaya xwe biven. Kîjan ji bona (fehşayê) li wan (kolan) kotekî bike, Yezdan ji piştî kotekîya wan (li ser hîzîtiya kolan, ji bona wan koleyên jin) baxîşkarê dilovîn e.

34; Bi sond! Me li bal we da beratên hizwartîkar hinartîne (evan beratan) ji wanê berya we da (ji bona we ra) hecwekîyeke û ji bona xudaparizan jî şîreteke e.

35; Ruohnaya ezman û zemîn; Yezdan e. Hecwekîya ruhnaya wî wekî piltekî di hundurê fanoseke devgirtî da be (wusa diçilwule). Ew a fanosa jî di hundurê şûşan da hilbe, tu dibê qey ewa (şûşa ku têda fanos hildebe) stêrkeke dûr e (li her aliyê xwe da) ronahiyê bela dike (di şûna xwe da diçilwule). Ewa (fanosa) ji (rûnê) zeytûnê dara pîroz e; ne li rojhilat û ne jî li rojava da ne, pê dikeve; Heke agir bi wî (rûnî) nekebe jî, ewa (rûna wusa tase-saf) bi xweber tav dide. Eva rohnaya (bi van salixan wusa pire) dibe rohnaîya li ser rohnaîyê. Yezdan ji kîjanî ra bivê, ewî li bal rohnaya xwe ra tîne. Yezdan ji bona merivan ra (bi vî awayî) hecwekîyan çê dike, Şixwa Yezdan bi hemî tiştî pirzan e.

36; Ji bona Yezdan ra di sibeh û êvaran da, paqijî û perestîya wî di wan xaniyên ku Yezdan destûr daye, ku di wan da navê: Yezdan û biryarên wî bêne xwendine, tê kirine.

37; (Ewanê ku di wan xaniyan da perestîya Yezdan dîkin hene!) ewan hinek mêrên (wusa nin) ku bazirganî û kirîn û firotin; ewan ji nimêjkirin û ji dayîna baca malan, nadine para da, ewan (mêran) hey ji hatina wê roya, ku dil û çav têda wêldigerin, ditirsin.

38; (Ewan perestî dîkin û ditirsin) ji bo ku Yezdan ji kirinê wan çêtir, wan xelat bike û hêj ji rûmeta xwe jî (ji wan ra xelatan) pir bike. Loma Yezdan ji evînê xwe ra bê hijmar rozînan dide.

39; Ewanê bûne file hene! Keda wan wekî leylana rastan e: Ewê tî (gava leylanê dibîne) dibê qey av e. Gava li bal da diçe, rastî tu tiştî nayê (ku vexwe) îdî (bê hêvî dimîne) li wura rastê şapata Yezdan tê. Ewa keda wî bê kêmasî dide wî. Loma Yezdan hijmaran zû pêk tîne.

40; Ya jî (keda wan filan) wekî tarîtiya di derya (kûr da ne). Lêpan ewa (derya) nixima dibe, li ser (deryayê) lêp hebin, li ser lêpan jî ewrê reş ê tarî hebin, li ser hev bûne tarîti (îdî kes nikare di van tarîtiyan da bimeşe). Gava ewa (di van tarîtiyan da) destê xwe derxe (derva) destê xwe jî nabîne. (Evan filan jî wusa rêya xwe di tarîtiya fîletiyê da wunda kirine, îdî nikarin bibînin). Loma heke Yezdan ji bona kesekî ra ruhnaî çêneke, îdî ji bona wî ra qe tu ruhnaî tune ye.

41; Ma qey tu nabînî ku jî bona Yezdan ra hemî kesên di ezman û zemîn da heyî û

hemî çûkên baskê xwe li hev dixin û ref digirin, perestî dikin û paqijî dikin? Bi sond! Hemîşka jî bi nimêj û perestîya xwe zanîne. Loma Yezdan bi kirina wan pir dizane.

42; Maldarî û seroktîya ezman û zemîn, hey ji bona Yezdan ra ne. Fetilandin hey li bal Yezdan da ne.

43; Ma qey tu nabînî? Ku bi rastî Yezdan ewran pev dixe, paşê ewan (wusa) dicivîne (nava wan ewran da valatî nahêle) paşê (ewan ewran) li ser hev deste deste digevêşe, îdî tu dibînî ku barişt ji wan (ewran) dibare. Ji wan ewrên jor da wekî çîya hene, ji wan da xilolîlk (û barişt) dibare. îdî ewa (zîyana kê bivê) ewê zîpikê li çandina wî dixe (Yezdan wê zîpikê ji çandina wanê ku zîyana wan nevaye) dide fetilandinê; (Ewan berqetavê ku ji wan ewran derdikebin) nêzik dibe ku tîrêja wan (ruhnaya) çavan behere.

44; Ewê ku şev û royan (li pey hev tîne û dirêj û kurt dike heye!) ewa Yezdan e. Ji bona wanê xweyê dîtînê, di vê kirina hanê da beratên sodret hene.

45; Yezdan hemî (candar û rawer) ji avê afirandîye. Îdî hinek (ji wan rawaran) li ser singê xwe digere û hinek ji wan jî li ser du pîyan digere û hinek ji wan jî hene, li ser çar pîyan dimeşe. Yezdan çi bivê, ewî diafirîne. Loma bi rastî Yezdan li ser hemî tiştan dişî.

46; Bi sond! Me beratên hizwartîkar hinartine. û Yezdan evînê xwe tîne rêya rast.

47; Ewanê (du rû hene! Aha) dibêjin: "Me bi Yezdan û bi saî (Muhemmed) bawer kirîye û em bûne peyrewê wan." Paşê destekî ji wan ji piştî vê gotinê, ji gotinê rû difetilandine. Ewanan bi rastî bawer ne kirine.

48; û di gava, ku ewan (ji bona doza nava wan da heyî) li bal berewaniya Yezdan û saiyê wî bêne gazî kirinê, ku di nav a wan da berewani bête kirinê, hema diwê gavê da destekî ji wan rû fetlandine.

49; Heke ji bona wan ra maf bête daînê, heman bi lez li bal (Peyxember) da tîn.

50; Gelo qey di dilê wan da nexweşiyek heye, ya jî (ewan) du dilin û ditirsin, ku Yezdan û saiyê wî ta bigirin (mafê wan ji wan bistînin)? Na, (wekî kirina wan nîne). Lê ewan bi xweber li xwe cewr kirine.

51; Ewanê (bi rastî) bawer kirine hene! Gava ewan li bal berewaniya Yezdan û saiyê wî da tîne gazîkirinê, ku (Yezdan û saiyê wî) di nava wan da berewani bikin, gotina wan hey ev e: "Me gazî kirin bihîst û em bi gotina wan dikin."Ewan bi xweber in ku serfiraz bûne.

52; Şixwa kê bi gotina Yezdan û saiyê wî bike û ji Yezdan bitirse û parizîya wî bike, îdî ewan bi xweber in hey berxwedar bûne.

53; Bi sonda mezin ewan sond xwarîne; heke te ji bona (çûna wan, li bal qirînê da) ferman kiribûya, ewanê derketina (biçûna qirînê. Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje, "Hûn sond nexun (tiştê ji we tê xwestinê, sonda bi vir nîne, lê) hey ji we (tê xwestinê, ku hûn) bi xweşî gotina Yezdan bikin. Loma bi rastî tiştê hûn dikin Yezdan bi wî agahdar e."

54; (Muhemmed! tu ji wan ra aha) bêje, "Hûn bi gotina Yezdan û saiyê wî bikin." Heke ewan ji vê gotina te) rû fetilandin, îdî tiştê li ser (saî) hatiye barkirinê hey (ragîhandinî) heye û tiştê li ser we jî (gelî kesan!) ku hûn bi wî hatine barkirinê (litê kirina biryarên Yezdan) heye. Heke hûn bi gotina (saî) bikin, hûnê werne (rêya rast). Li ser saiyên ji pêştirê ragîhandina hizwartî qe tu tişt tune ye.

55; Yezdan ji bona wanê, ji we ne ku bawer kirine û karê aştî kirine eva peymana daye, wê (Yezdanê) ça ewanê berya (wan bawergeran) xistîye şûnmayî ji bona (fîleyên berya wan da borî) wusa jî we (bawergeran) bixe şûnmayî (van cihû xweyê ol ê mayî) di zemîn da binecî bike û ewa ola ku ji wan ra hilbijartîye û ji bona (bawergeran) litê kirîye (di dilê bawergeran da) wê binecî bike. û ji piştî wê tirsê ku (ewan bawergeran têda bûne) wê ewê tirsê bi ewletîye biguhure. "Ewan (bawergeran) hey ji bona min ra perestî dikin û qe hevriyan ji bona min ra çê nakin. Lê kê ji piştî vê kirine, bibe file, îdî bi rastî ewa ji rêya rast derketîye.

56; (Gelî bawergeran!) Hûn nimêja xwe bikin û baca malê xwe bidin û hûn bi gotina saiyê (Yezdan) bikin, loma bi rastî dibe ku hûn bêne dilovankirinê.

57; Ewanê bûne file hene! Tu goman neke, ku ewanê (Yezdan) bêzar bikin (ku nikarbe) di zemîn da (ji bona wan ra şapatê bide) bi rastî ewra wan agir e. Çiqa (agir) sikê ewran e!



58; Gelî bawergeran! Bira di sê danan da, ewan koleyên we yên binê destê we da nin û ewan (zarên we ne) hêj ne gîhîjtine sedra xwe, destûr ji we bixwazin (ji bo ku bikebine xaniyê, hûn têda nin). Ewan her sê danan; di berya nimeêja sibehê da û di gava ku hûn danê nivro da kincê xwe derdixin û ji piştî nimêja êvarê da. Evan her sê danan, danê wusa nin hûn di wan da kincê xwe derdixin. Ji piştî (van her sê) danan tu zîyan li ser we tune ye, ku hûn bê destûr herne xaniyê wan, ya jî ewan bê destûr werne xaniyê we. Her yek ji we bê destûr dikare here, sertêdana yê mayî. Bi vî awayî Yezdan ji bona we ra beratan dihezwirtine. Loma Yezdan pirzanê bijejke ye.

59; Gava zarên we gihîjtine sedrê xwe, îdî bira ewan jî wekî wanê berya xwe da (ji bona hatina xaniyê we) destûr ji we bixwazin. Bi vî awayî Yezdan beratên xwe ji bona we ra dihezwirîne. Loma Yezdan pirzanê bijejke ye.

60; Ewan jinên, ku îdî rûniştine (wusa pîr bûne ji kirasan hatine birînê) îdî kevînbûna wan nayê gomankirinê hene! Heke ji bona xwe diyarkirinê xemil nişandin nebe, dikarin, ku xemla xweyê kincan derxin. Lê dîsa heke xwe biparisînin, ji bona wan ra parisandin çêtir e. Loma bi rastî Yezdan pîr bihîstek û pirzan e.

61; Li ser koran û li ser topalan û li ser nexweşa û li ser we bi xweber jî, heke hûn ji malê xwe û ji malê bav xwe û ji malê diya xwe û ji malê birayên xwe û ji malê xûşkên xwe û ji malê apên xwe û ji malê metên xwe û ji malê xalên xwe û ji malê xaletên xwe û ji wî malê, ku ji bona (parisandina wî malî) danîne bal we û ji malê dostên xwe î rast; hûn ji malê wan, di xaniyê wan da bi hev ra bixun, ya jî yeke yek bixun, tu zîyan tune ye. Îdî gava hûn çûne xaniyan, hûn ji alyê Yezdan da jîneke pîroz ya paqij ji bona xwe ra bixwazin û (li ser rûniştîyên xanî ji aliyê xwe da) "Selam" bejin. Yezdan ji bona we ra bi vî awayî beratên xwe, dihezwirîne, loma dibe ku hûn ji van (beratan) hiş hildin.

62; Ewanê bi Yezdan û bi saiyê wî bawer kirine û di gava (ku ewan bi peyxember ra) li ser bûyerekî civya bibin, heya destûr ji wî nexwazin, jî bal wî naçin hene! Bi rastî bawergerên rast ev in. (Muhemmed!) bi rastî ewanê ku ji te destûra çûnê dixwazin hene! Ewan bi rastî bi Yezdan û bi saiyê wî bawer kirine. Îdî gava ewan ji bona hinek karên xwe, ji te destûrxwastin, tu jî, ji wan kîjanî ra bive, destûra wî bide (bira here karê xwe pêk bîne) û tu ji bona wan ra ji Yezdan baxişandina wan bixwaze. Loma bi rastî Yezdan baxişkarê dilovîn e.

63; (Gelî bawergeran!) hûn gazîkirina saî, wekî hûn ça gazî hev dîkin, negirin; (Peyxember gava gazî we kir, hema bersiva wî bidin, û bal peyxember da bi lez herin). Bi sond! Ewanê ji we ne, ku xwe davêjine pişt hev (ji bo ku nexûyên) hene! Yezdan bi wan dizane. Îdî ewanê ku bê gotina (Peyxember) dîkin hene! Bira ewan xwe (ji vê kirina xwe) biparisînin, loma dibe ku (bi sedema van kirinê wan) ku aşîtek bi wan da were, ya jî şapateke dilsoz bi wan bigire.

64; Hûn (gelî bawergeran!) bizanên, ku bi rastî çi tişt di ezman û zemin da hene! Hemî ji bona Yezdan ra ne. Bi sond! Hûn li ser çibin (amacê we çi be û ramana we ça be, hey) Yezdan pê dizane. Di roya ku ewanê li bal wî da bizivirin, ewa tiştê wan kirîye, îdî wê (Yezdanê) kirina wan ji wan ra bêje. Loma bi rastî Yezdan bi hemî tiştî pîr dizane.

## Chapter 25 (Sura 25)

1; Ew (Yezdanê) ku li ser bendê xwe î (Muhemmed ra) pirtûka (bi nav) furqan hinartîye; ji bo ku ewa (pirtûka) bibe hişyarî ji bona gerdûnê ra pîroz e.

2; Ewê ku maldarî û seroktîya ezman û zemin ji bona wî ra ne heye! Ewa (Yezdan e). Ewî qe ji bona xwe ra tu zar ne girtine û ji bona wî ra tu hevri jî, di maldarî û seroktîya wî da tune ye. û ewî hemî tişt afirandîye, îdî (ewî hemî afirandinê xwe) bi pîvanî (danîne rêzikê wusa, ewan bi xweber pîvandina xwe pêk tînin) dixebitin.

3; Ewan (kesan) ji pêştirê (Yezdan ji bona xwe ra) ilahên wusa girtine, ku ewan (ilahên wan) qe tu tiştî na-aferînin, ewan bi xweber jî hatine afirandinê. û ewan ji bona xwe ra jî qe tu kar û zîyanê nikarin bikin û ewan nikarin mirin û jîn û (ji piştî mirinê) rabûnê jî bikin.

4; Ewanê bûne file hene! (aha) gotîbûne: "Eva Qur'ana hey virike; (Muhemmed ewa) ji ber xwe bi vir bi rêk xistîye û hinek komalê mayî jî (wekî cihû û mexîni û mecûsan) arîkarîya wî kirîne (eva Qur'ana hûnandine)." Bi sond! Ewan (kesan) îdî cewr û derewê bê binî anîne (gotine).

5; Ewan (kesan aha jî) gotîbûne: "Eva Qur'ana hanê çîvanokê berêne (Muhemmed) ewan

dide nivîsandînê, îdî di sibeh û evaran da ji bona (Muhemmed) ra tê xwendînê.  
6; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Ewê ku bi veşartîyên di ezman û zemîn da heyî, dizane, ewî eva (Qur'ana) hinartîye. Loma bi rastî ewa pir baxişkarê dilovîn e."

7; Ewan (kesan aha jî) gotîbûne: "Eva çi saîyek e (ça dibe pêxember, ka mêze bikin?) xurekan dixwe û di kuça da jî digere. Heke li bal wî da firiştekan bihata hinartinê, îdî ewî firişteyî jî bi wî ra hişyarî bikira (dibû ku me bi wî bawer bikira)."

8; "Ya jî li bal wî da xezînek hatibûya avêtinê (ku îdî ewî derdê bê pûlî nedîta) ya jî ji bona wî ra bostanek hebûya, îdî ewî (pêxemberî) jî wî bostanî bixwara (derdê birçîbûnê nedîta, diba ku me bi wî bawer bikira)." Ewanê cewrkar jî (aha) gotine: "(Gelî kesan!) bi rastî hûn bûne peyrewê mêrekî wusa, li wî hatiye ançkirin."

9; (Muhemmed!) Tu mêze bike (ewan kesan) ji bona te ra çi heçwekî çê kirine! Îdî ewan ji rêya rast) derketine, wunda bûne; ewan ji bona xwe ra qe tu rêyekî nikarin bibînin.

10; (Ew Xudayê) ku heke bivê we ji van (gotinê) wan qenctir ji bona te ra qencîyan pêk bîne, çiqa pîroz e! (Ewan qencîyên Xuda, ku ji te ra dide hene!) ewa bihiştê di binê (darê wê da) çem dikişê û wê (di wê bihiştê da) ji bona te ra koşkan jî bigire.

11; Ewan (kesan bi tenê di mafê te da evan gotin, tenê ne gotine; lê ewan) danê rabûna hemî jî dane derewdêrandînê. Me jî ji bona wanê ku danê rabûna hemîti didine derewdêrandînê, doja agir ê hilopît amade kiriye.

12; Gava ku ewan (kesan) ewî agirî ji cîyekî dûr da dibînin, ewan ji wî agirî hêrs û qîr û mirinîyê dibêhên.

13; Di gava, ku bi hev va têne girêdanê, li cîyekî dozeyî teng da têne avêtinê, ewan di wura da gazî mirinê dîkin; (ka mirin! Tu li kuderêyî, were canê me bistîne, ku em ji vê şapatê felat bibin).

14; (Ji wan ra tê gotinê): "Hûn di îro da gazî mirinekî bi tenê nekin, hûn gazî pir mirinan bikin (loma çiqa hûn bişewitin werme temtêla mirinê, hûnê dîsa bêne jîtinê)."

15; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo (ji bona we ra eva agir a) qencî bû, ya jî ewa bihiştê her heya ku ji bona xudaparizan hatiye peymandanê, qencî bû? Ewa ji bona (xudaparizan) xelat û ewîrgah e.

16; Tiştê ku ewan (xudapariz bivên) di wê da ji bona wan ra heye. Ewanê di wê da her gavê bimînin. Eva (xelat a xudaparizan) peymanê wusa ne li ser Xudayê te bi vê nevê ye.

17; Di roya (ku Xudayê te) ewan (filan) bi tevê wan (ilahên) ku ewan ji pêştirê Yezdan, ji wan (ilah ra) perestî dîkin, dicivîne; îdî (Xudayê te) ji wan perestdaran (dipirse aha) dibêje: "Ma qey we evan bendeyên min ê hanênan ji rêya rast dane wundakirinê, ya jî ewanan bi xweber rêya rast wunda kiribûn?"

18; Ewan (perestdaran aha bersiva Yezdan dane û) gotine: "Em te ji kemasîyan diparisînin, babet nîne ji bona me ra, ku em ji pêştirê te, ji xwe ra serkaran bigirin, lê te berxwudari da wan û bavê wan, heya ewan jî tu bîrva kirine. Şixwa ewan bi xweber jî komalekî teşqele bûne.

19; Îdî ka (gelî filan! bêjin;) vanê evan perestdarê we jî, we didine derewdêrandînê (ji bo çi hûn ji rêya rast derketin?) îdî di wê (gavê da) hûn ne dikarin şapatê ji xwe bidine para da û ne dikarin arîkarîya hev jî bikin. Kîjan ji we cewrê bike, bi rastî emê bi wî şapateke mezin bidine çeşnekirinê.

20; Me çiqa di berya te da saî şandine, hey ewan jî xwurek xwurine û di kunça da jî geryane. (Gelî kes û pêxemberan!) me hinek ji we, ji bona hinekên we ra xistiye sedema ceribandînê. Ka (gelo hûn) di hemberê hev da hewdanî dîkin? Bi rastî Xudayê te (hemî tiştî) dibîne.

21; Ewanê guman nakin, ku wê (di dawiyê da) li bal me da werin, hene! (aha) gotine: "(Ji bona bawerîya me ra) ne diva (ku Yezdan) bi ser me da firiştekan bihinarta, ya jî ne diva, ku me Xudayê xwe bidîta (me paşê bawer bikira)?" Bi sond! Ewan di hundurê xwe da, xwe mezin kirine, ewan bi deliqandineke mezin ji tixûbê xwe borîne.

22; Di roya ewan (gonehkaran) firiştan dibînin, di wê royê da ji bona gonehkaran tu mizgînî tune ye (firiştan ji wan ra aha) dibêjin: "Ji bona (we ra mizgîn hatiye)

qedexekirinê."

23; Me li bal wan da kirinê wan pêşkêş kirîye (loma ewan di cîhanê da guman dikiribûn, ku ewan qencî dikin) îdî me ewan kirinê wan xistîye ber bayeke ji hev çuyî, maye.

24; Hevriyên bihiştî di wê royê da, di qencê êwrandanin û di rindtirê şûnê geşt a da nin.

25; Di roya ku ezman bi sedema ewrên sipî ji hev diçirin û firiştan bi hinartinekî (li pey hev) dihinirin.

26; Seroktî bi rastî di wê royê da ji bona (Yezdanê) dilovan ra ne. Bi rastî ewa roya li ser filan royeke zor teng e.

27; Di wê royê da merivê cewrkar her du destê xwe dixê devê xwe (digeze, aha) dibêje: "Xwezîka min bi saîyê (Yezdan) ra rêya serfîrazê girtibûya."

28; "Xwelî li min be! Xwezîka min evê (ku ez ji rêya rast derxistime, ji bona xwe ra) bi hevaltê ne girtibûya!"

29; "Bi sond! Ji piştî hatina rastîyê li bal min da, ewî ez ji rêya (rast derxistime). Şixwa pelîd ji bona merivan rûreşîyek e (ji piştî merivan ji rê derdixê, merivan bi tenê dihêle û diçe)."

30; Û saî jî (aha) gotîye: "Xudayê min! bi rastî komalê min, eva Qur'ana ji bona xwe ra dest berdanok girtibûne (ji vê Qur'anê bi hemîtî dest berda bûne, qe haja wan ne maye)."

31; Her wusa me ji bona hemî pêxemberî ra ji gonehkaran destê neyar girtîye. Bi beledî û arîkarî, Xudayê te besê te ye.

32; Ewanê bûne file jî (aha) gotine: "Ne diva, ku eva Qur'ana li ser (Muhemmed) ra bi yek carî hatibûya hinartinê (îdî ewî ji bona hinartinê, hêvîdarî nekira, me jî çî ji wî bipirsîya, ewê hema bersîva me bida)?" Ji bo ku em dilê te bi hinartina Qur'anê binecî bikin (ez berya wê Qur'anê ji bona te ra hêsan bikin, dabaşa her bûyarekî nû bimîne) me ewa (Qur'ana, pare pare) li ser dilê te da hinartîye.

33; (Muhemmed!) ewan (filan) ji bona (şikênandina) te, çîqa hecwekîyek ji bona te ra anîbin, me hey (bersîva wê hecwekîyê) ji te ra bi mafî çêtir anîye. Ewa (bisbara) rindê hezwartina ye.

34; Ewanê deverû li bal dojê da têne civandinê hene! Ewanan di şûneke çîqa sik da nin û ewan ji her kesî pirtir rê wunda kirine.

35; Bi sond! Me ji bona Mûsa ra pirtûk (Tewrat) daye û me birayê wî ye (bi nav) Harûn ji wî ra xistîye arîkar û şalyarê wî.

36; Paşê me ji wan (herdukan ra aha) gotîye: "Hûn herduk bi hev ra herne bal wî komalê ku beratên me didine derewdêrandinê." (Ewan herduk çûne bal wî komalî, ewî komalî bi gotina wan herdukan ne kirin). Îdî me jî ewa (komala) hilşandin kavi kirin.

37; Gava komalê Nûh jî, saîyî xwe dane derewdêrandinê, me ewan (di avê da) fetisandin, me ewan ji bona merivan ra xistine beratên sodret (hiştin). Û me ji bona cewrkaran, şapateke dilsoz amade kirîye.

38; (Me komalê) Ad û Semûd û hevriyên (welatê bi nav) Res û di nîveka wan da pir kesên borî jî (teşqe kirîye).

39; Me ji bona wan hemîşkan ra jî hecwekîye (ji berya wan, bi şîretî anîye, lê ewan şîret hil ne dane) me jî ewan hemîşk teşqe kirine.

40; Bi sond! Ewa (welatê) ku sikê bariştan, li ser wan hatîye barandinê heye! (Komalê te) hatine wura (gava diçûna Şamê li wura da diborîn). Îdî qey ewan nikarin mêze bikin ka çî hatîye serê wan? Na, ewan guman nakin, ji piştî mirinê wê rabin.

41; Ewan gava te dibînin, hey te hil didine tinazan (aha) ji te ra dibêjin: "Eva ye, ku Yezdan (ji bona me ra) saî şandîye?"

42; "Heke me li ser bawerya ilah yên xwe, hew ne kiribûya, nezîk dibû ku ewa me ji rêya ilah ên me derxe, wunda bike." Gava ewan şapatê bibînin, wê bizanin ka kîjanî rind rê wunda kirîye.

43; Qe te dîtîye, ku kesekî dilê wî çî xwastibe ji xwe ra xistibe xuda? Îdî qey tu yê ji bona wî ra bibî cînîşt e (ji bona wî ra parisvanî bikî)?

44; Ma qey tu guman dikî, ku pirên ji wan (şîretan) dibêhên û (ji rastîyê) dizanin? Bi rastî ewan (dizanîn û bihistinê da) wekî tarişan in, dibe hêj (ji tarişan jî) pirtir, rê wunda ne.

45; Ma qey tu li bal (hêza) Xuda ê xwe da mêze nakî; Xudayê te sî ça dirêj kirîye?

Heke Xudayê te biva, wê sî (di şûna wê da) rawestan da. Paşê me ji bona hebûna (sîyê) roj xistîye berate; (dîtina sîyê giredayî bi hebûna tavê ye).

46; Paşê (roj çîqa bilin dibû) me jî ewa (sîya) hêdî hêdî li bal xwe da kişand (hil da).

47; Ewê ku şev ji bona we ra xistîye midas, xew jî ji boa we ra xistîye rawestandin (û bêhindan) û ro jî xistîye jîn û rabûn (ji bona xebat û belavbûnê) heye: ewa (Yezdan e).

48; Ewê ku ba ji bona mizgîna bariştê, di berya bariştê da dişîne heye! Ewa (Yezdan e). Loma bi rastî em di jor da aveke paqij dihênirînin.

49; Ji bo, ku em bi wê (avê) welatekî ku mirîye (heşnîyên wî hemî hişk bûne, dîsa) bidine jîrandînê, wusa jî ewan tariş û merivên ku me ji wê (avê) afirandine, pirê wan bi wê (avê) av bidin.

50; Bi sond! Me ewa (barîsta) di nava wan (welat û afirandokan da) car bi car barandîye; ji bo ku ewan (kesan) ji van (kirinan) şîretan hildin. Lê pirê kesan ji şîret hil dane para da çûne, nonkorî dikin.

51; Heke me biva, me ê ji bona her welatekî (pêxemberek) ji bona hişyarîya wan bişanda.

52; Îdî (Muhemmed!) tu bi gotina filan neke û tu (bi Qur'anê) bi wan ra tekoşîna mezin bike.

53; Ewê, ku her du derya di nava hev da daye herikandinê heye! Ewa (Yezdan e. Ava) yek ê ji wan her du deryan, şîrîne: bi hesanî tê vexwerinê; ya mayî jî (ava) wê şor e û tal e. Ji bo ku her du (av) tevê hev nebin ewî di nava (av a) her du deryan da perdeke qedexokê parisvan vekirîye.

54; Ewê, ku meriv ji avê afirandîye heye! Ewa (Yezdan e), îdî (ewî meriv kirine du par): yek ji wan (paran) nijadî (para mayî jî) xilamîtî. Loma Xudayê te dişî (evan bike).

55; (Bi vî ra jî) ewan (filan) perestîya tiştên pêştirê Yezdan dikin; (ji bona Yezdan ra perestî nakin). Ewan (tiştên, ku ewan filan perestîya wan dikin) qe tu kar û zîyana wan nakin. ji bo ku ewan (filan) neyartîya Xuda ê xwe bikin, ji bona hev ra piştevanî dikin.

56; (Muhemmed!) Me hey tu mizgînavan û hişyarvan (li bal kesan da) şandîye.

57; (Muhemmed! Tu ji bona kesan ra aha) bêje: "Ez ji bona vekirîna xwe ya hanê (ji we) ji pêştirê rêgirtina wî kesê, ku li bal Xudayê xwe da (diçe) tu tiştî naxwazim."

58; Ê (Muhemmed!) ewa (Xudayê) zindîyê nemir heye! Tu xwe hispêre wî û tu bi pesnê wî, ewî ji kemasîyan paqij bike. Ewa bi agahdarya gonehên bende yên xwe, şixwa besî xwe ye.

59; Ewê ku ezman û zemîn û tiştên di nava wan da heyî, di şeş royan da afirandîye paşê arş (mana) hil daye binê hêz a xwe, heye! Ewa (Yezdanê) dilovan e. (Heke tu bi van nizanî) îdî tu ji yekê zana pîrs bike (ku ewan hemû pêşeyên Yezdan in; we ji te ra bêjin).

60; Gava ji bona wan (merivan ra aha) tê gotin: "Hûn ji bona (Yezdanê) dilovan ra herin secdê." Ewan (merivan aha bersiv dane û) gotibûne: "(Yezdanê) dilovan çîye? Qe em ji bona wî tiştê, ku tu fermana me (ji bona secdebirîna wî dikî) diçin secdê? (Eva fermana te, bi secdebirîna wan) hey ji bona wan ra, rikê wan pîr kirye."

61; Ewê di ezman da beden (burç) çê kirine û di wan bedenên da roj û hîva ruhnîdar bi cîh kirîyê heye! Ewa çî (Xudayekî) pîroz e!.

62; Îja ewa (Xuda ye) ku ji bona wan ê şîret hil didin û ya jî divên ku sipazîya (Xuda) bikin, şev û ro (ji bona hev ra) xistîye peyrewê hev.

63; Ewê ku (bi rastî) bendeyên (Yezdan ê) dilovî in hene! (Ewanan bi van salixên jêrda ku tene gotinê, hatine salixkirinê. Gava ewan li ser zemîn digerin, bi dilê şkestî digerin û gava nezan li wan bi mijûlîyan (cewrê bikin, hemberya wan nezanan bivê peyvê) didin, "Selam" (li we be).

64; Ewanan di şevê da radibin, ji bo Xudayê xwe ra diçin secdê.

65; Ewanan (gava xwastînan ji Xuda bixwazî, aha) dibêjin, "Xudayê me! Tu şapata dojê ji me bide fetlandînê, loma bi rastî şapata (dojê gava bi merivan girt, îdî) ji merivan venabe."

66; "Loma bi rastî ewa (doja) sik ê êwr û şûnan e."

67; Ewanan (gava ji bona hewcan ra) tişteki bisixurînin, ne dest valatî ne jî

çikûsî nakin, ewanan di nava van her du salixan da nave nav in (ne dest belane ne jî çikûs in).

68; Ewan gava ji Yezdan daxwazî dikin, bi Yezdan ra, qe gazî tu ilahên mayî nakin. Ew canê ku Yezdan kuştina wî qedexe kirîye; ewan bê mafî ewî canî naku jin, ewanan hîzîtî nakin. Şixwa kê ewanan bike, ewa li bal celata wî gonehî da tê avêtinê.

69; Ji bona wî ra di roya rabûna hemî da şapat duçar dibe, ewa jî di wê şapatê da bi rûreşî dimîne.

70; Ji pêştirê wî kesê, ku ji kirine xwe poşman bibe û (bi Yezdan) bawer kiribe û karên aştîkarî kiribe, îdî Yezdan gonehên wan bi qencîyan diguhure. Loma bi rastî Yezdan baxîşkarê dilovîn e.

71; Kê ji (kirine xwe) poşman bibe û karê aştî bike, îdî ewa merivekî wusa ne; li bal Yezdan da zivirîye, hatiya litê kirine.

72; Ewanê gava (ji bona nehrevanîye tene gazîkirinê) bi vir nehrevanî nakin (şahidî nadin, ewan) gava rastî (wanê) beredayî mijûl dibin, tên; ji wan (mijûlyan rû difetilînin) dev bi kenî diborin diçin.

73; Ewanê gava bi beratên Yezdan tene şîretkirinê, li ser wan şîretan bi ker û kor xwuya naçin.

74; Ewanê ku gava (ji Xudaê xwe, daxwazîya berxudarya dikin, aha) dibêjin: "Xudayê me! Tu ji bona me ra jin û ûrtê wusa bide, ku çav bi wan şa bin û (dil bi wan hêsanî bibin) û (Xudayê me!) tu me ji bona xudaparizan bixe pêşrewan.

75; Ewanê (bi van salixên borî) hene! Bi sedema hew a wan, ewanan (di bihiştê da) bi koşknê bilind tene xelatkirinê, li ber wan da di wan (koşkan da) peyva "Bijîn" tê avêtinê ("Hûn bijîn" ji wan ra tê gotinê).

76; Ewanan di wura da her dimînin. Ewa dera çîqa êwreke rind e û çîqa şûneke qenc e!

77; (Muhammed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Heke lavakirin û perestîya we nebûya, ka Xudayê min ê çî ji we bikira? Bi sond! Îdî (gava min ji bona we ra ji beratên axiftin fikir, we ez) didame derewdêrandinê (ji ber vê kirina we, şapat ji bona we ra) bi vê nevê bûye.

## Chapter 26 (Sura 26)

1; T.S.M. (Arşa van tipên ji hev çûî hey Yezdan dizane).

2; Bi rastî ewan beratên pirtûka hezwartî ne.

3; Ji ber ku ewan bawer nakin, nêzîk e ku tu xwe bibeicînî.

4; Heke me biva, me ê ji ezmanan da li ser wan da beratên (derhoze) bihinarta, îdî sitûyê wan ê ji bona (baweryî) xwer bibûya (ewanê bawer bikinan).

5; Çîqa ji bona wan ra (ji Yezdanê) dilovan (beratekê) nû hatibe, ewanan hey ji wê (berata nû) rû fetilandine.

6; Bi sond! (ça ji wan beratên rû fetilandine, wusa jî) dane derewdêrandinê, we di nêzîk da axiftina (wê şapata ku Qur'an ji wê mijûl dibe) ewan jî bi wê (axiftinê) tinaz dikiribûne, ji bona wan ra were.

7; Ma qey ewan li bal zemîn da mêze nakin, ka me çîqa zone rind di zemîn da hêşîn kirîye?

8; Bi rastî (di van hêşîn kirinan da) beratên (hêz a me) hene, bi vî ra jî pirê wan bawerker nînin.

9; Loma bi rastî Xudayê te servahatê dilovîn e.

10; Di gavekî da Xudayê te gazî Mûsa kiribû, ji bo ku ewa here bal komalê cewrkar.

11; (Ewa komala) komalê Fir'ewn bû. (Ewan) hêj jî xudaparizî nakin?

12; (Mûsa aha bersiva Xudayê te da û) got: "Xudayê min! Bi rastî ez ditirsim, ku ewan (Fir'ewn, komalê wî) min bidine derewdêrandinê."

13; "Singê min teng dibe û zimanê min venebe, îdî tu Harûnê bira ê min jî bi saî (li bal wan da) bişîne."

14; "Ji bona wan ra li ser min gonehek (tolek) heye, îdî ez ditirsim ku ewan (tola xwe ji min hil din) min bikujin."

15; Xuda (bersiva Mûsa aha daye û) gotîye: "Na, (ewan nikarin tu tiştî bi te bikin). Îdî (tu û Harûn) bi beratên me va (herne bal wan), loma em bi we ra gohdarya wan dikin."

16; "Hûn herduk herne bal Fir'ewn, îdî (hûn herduk ji Fir'ewn ra aha) bêjin: "Bi

rastî em (herduk jî) saîyên Xuda yê gerdûnê ne."  
 17; "(Em hatine, ku tu) zarên cihûyan bi me ra bişînî."  
 18; (Dema ewan hatine bal Fir'ewn, gotinê, xwe jê ra gotine, Fir'ewn bersiva wan aha daye û) gotîye: "Mûsa! Ma qey me tu di nava xwe da bi zarokî mezin ne kirî? Tu di nava me da bi salan maî (îja tu van gotina ji kur tînî?)"  
 19; "(Di hemberê van qencîyên me da, Mûsa!) te jî kirinê xwe kirîye. Û bi rastî (Mûsa) tu ji nonkoran î."  
 20; (Mûsa ji bona wan ra aha) gotîye: "Gava min ewan (tiştên, ku hûn dibêjin) kiribû, hêj ez ji (nezan û) rê wundakera bûm."  
 21; Gava ez ji we tirsîyam, ez ji nava we revîyam, îdî Xudayê min ji bona min ra zanîna retkokî daye û ez xistime ji saîyan,"  
 22; "Ewan qencîyên, ku (Fir'ewn!) te bi min kirîye (îro jî tu dixî) serhev da ser min, hene! (te ji bona min ne kirîye, lê ji bona ku tu) zarên cihûyan bixî bende (loma te bi min kirîye)."  
 23; Fir'ewn (ji Mûsa pirsî, aha) got: "(ka Mûsa!) Xudayê gerdûnê çî ye (te eva ji kur derxistîye)?"  
 24; (Mûsa ji bona wan ra aha bersiv daye, û) gotîye: "Xudayê ezman û zemîn û tiştên di nava wan da heyî, heye! Ewa bi xweber e. Heke hûn bi rastî bîponijîn (hûnê bi rastî bizanîn, ku gotina min rast e)."  
 25; (Fir'ewn ji bona wanê) dora xwe ra (aha) gotîye: "Hûn dibihên (ka eva çî dibêje)?"  
 26; (Mûsa ji wan ra aha) gotîye: "(Erê); ewa Xudayê we ye û Xudayê bav û kalê we ye jî."  
 27; (Fir'ewn ji wan ra aha) gotîye: "Bi rastî saîyî li bal we da hatîye şandinê, heye! Ewa tepa dikebe."  
 28; (Mûsa bersiv dide û aha) dibêje, "Heke hûn bi rastî hişyarî dikin; Xudayê rojhilat û rojava û tiştê di nava wan da heye (ewa) bi xweber e."  
 29; (Fir'ewn ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "(Mûsa!) heke tu ji pêştirê min ji bona xwe ra ilahekî mayî bigirî, bi sond! Ez ê te bixme ji wan ê ku li bal zîndanên da hatine avêtinê."  
 30; (Mûsa ji bona Fir'ewn ra aha) gotîye: "Heke ez (ji bona rastîya xwe) ji te ra nişanên huzwartî jî bînim (dîsa tu ê wekî xwe bikî?)."  
 31; (Fir'ewn ji Mûsa ra) gotîye: "Heke nî jî rastbêjanî, ka ewê (nişanê) bîne (em lê mêze bikin)."  
 32; Îdî ewî gopalê xwe avêtîye, nişkeva (gopal) bûye zîhakî xûyaî maye.  
 33; (Mûsa) destê xwe (ji piçenga xwe) kişandîye (derxistîye) îdî nişkêva destê wî wusa sipî maye; ewanê, lê mêze dikirin (çavê wan ji sipîtiya dihate girtinê).  
 34; (Fir'ewn) ji bona wanê dor a xwe ra aha) gotîye: "Bi rastî evê hanê ançkerêkî pir zana ye."  
 35; "Eva divê, ku bi van ançê xwe we ji welatê we derxe. Ka îdî hm çî dibêjin?"  
 36; Ewan (komalê dor a Fir'ewn bersiva wî aha dane û) gotine: "Tu ewî û birayê wî bi xweşî mijûl bike, tu (peyameran di welat da) bişîne (ji bo ku ewan) bicivînin."  
 37; "Bira ewan hemî ançkerê pir zana ji te ra bînin."  
 38; Îdî di wî danê (ku Fir'ewn ji bona civandina wan danîbû) ançkar hemî di wê royê da civîyane.  
 39; (Di wê royê da) ji bona merivan ra (aha) tê gotinê: "Hûn jî îdî nacivin?"  
 40; "Loma em guman dikin, hekeançkar bi ser va werin, emê jî bibîne peyrewê wan,"  
 41; Îdî gava ançkar hatîne, ji bona Fir'ewn ra (aha) gotine: "Gava serfirazî ya me be; ji bona me ra kirêk heye, wusa nîne?"  
 42; (Fir'ewn bersiva wan aha daye û) gotîye: "Erê?! (Kirya we heye, hêj) hûn îdî dibîne ji wanê nêzîk ê min."  
 43; (Gava hemî amade bûn) Mûsa ji bona wan (ançkaran ra aha) gotîye: "Hûn (gelî ançkaran!) çî davêjin bavêjin."  
 44; Îdî ewan kap û gopalê xwe avêtine (kêşê) û (aha) gotine: "Bi mezinaya Fir'ewn serfiraz em bi xweber in."  
 45; (Paşê) Mûsa gopalê xwe avêtîye, îdî (gopal) tiştê ewan (bi pizan) çê kiribûne daqurçandîye.  
 46; Îdî (gava ançkaran eva dîtin) nişkeva çûne secde.  
 47; (Aha) gotine: "Me bi Xudayê cîhanê bawer kirîye."

48; "(Ewa) Xudayê Mûsa û Harûn ne."

49; (Fir'ewn ji wan ançkaran ra aha) gotîye: "Hêj min ji bona we ra destûr ne dabû we bi wî bawer kirîye. Ew mezinê we yî, ku ji bona we ra anç hîn kirîye heye! Ewa (Mûsa) bi xweber e. Îdî hûnê di nêzîk da bizarîyîn (ka ezê çî bînine serê we); ezê destê û pê we bi çîlo çepî jê bikim û ezê we hemîşkan darda bikim."

50; Ewan (bersiva Fir'ewn aha dane û) götine: "Qe zirar nake, loma bi rastî emê li bal Xudayê xwe da bizvirin."

51; "Bi rastî ji ber ku me di cara yekem da bawer kirîye, em divên ku Xudayê me ji bona me ra nûsitemne me bibaxîşîne."

52; Me li bal Mûsa da (aha) niqandîye: "(Mûsa!) Tu bendeyên me di şevê da derxe rê, loma bi rastî wê li pey we kebin."

53; Îdî gava (Fir'ewn, bi reva cihûyan hesya, qe ne hewîya peyamêr) şandin, di welat da (leşker) civandin.

54; (Fir'ewn ji bona wan ra aha gotîye): "Evan (zarên cihûyan) komake hindik in."

55; "Ewanan bi rastî hêrsa me tînin."

56; "(Bi rastî em komeke wusan in, ku her kes xwe ji me diparisînin."

57; "Îdî me jî ewan ji (nava) rez û kanîyan derxistin."

58; "Îdî me jî ewan ji (nava) xezînan û şûnwarên bi rûmet (derxistin)."

59; Me bi vî awayî (bi serê Fir'ewn û komalê) wî kir. Me zarên cihûyan ji bona wan ra xistîye ûrt.

60; Îdî gava roj derket (Fir'ewn û koma xwe va) dane pey (Mûsa û koma wî).

61; Gava her du koman hev du dîtîn, hevalê Mûsa (aha) gotine: "Bi rastî va gehîjtne me."

62; (Mûsa ji wan ra aha) gotîye, "(Hûn netirsîn; ewan nagihêjne me) loma bi rastî Xudayê min bi min ra ye, wê rêyekî bide nişanê min."

63; Îdî me jî li bal Mûsa da (aha) niqandîye: "(Mûsa!) Tu gopalê xwe li deryayê xe." (Gava Mûsa gopalê xwe li deryayê xist) derya ji hev tiş bûye, her tişekî bûye wekî çiyayekî maye (danzdeh re vebûne).

64; Me (Fir'ewn û hevalê wî jî) nêzîkê wura kirine.

65; Me Mûsa û kesê bi wî ra, heyî, hemîşk fereste kirine.

66; Paşê me ewanê mayî (di avê da) fetisandine.

67; Di van (bûyeran da) beratên (derhoze) hene. Lê pirê wan bawer nakin.

68; Bi rastî Xudayê te servahatê dilovîn e.

69; (Muhemmed! Tu ji bona) wan ra serdaborya Îbrahîm bixûne.

70; Di gavekî da (Îbrahîm) ji bona bav û komalê xwe ra (aha) gotîye: "Hûn ji bona çî tiştî ra perestî dikin?"

71; Ewan (bersiva Îbrahîm aha dane û) gotine, "Em perestîya hinek putan dikin, îdî em ji bona perestîya wan jî peyweste ne."

72; (Îbrahîm ji wan ra) dibêje: "Erê! (hûn ji wan ra perestî bikin, lê gava) hûn gazî wan dikin, qe ewan dengê we dibehên?"

73; "Ya jî ewan qe kar û zîyana we dikin?"

74; Ewanan (aha bersiva Îbrahîm dane û) gotine: "Na, qe tu tiştî jî nakin) lê em rastî bav û kalê xwe hatin wulo dikirin (em jî wekî wan dikin),"

75; (Îbrahîm ji wan ra aha) gotîye: "Îdî qe hûn dibînin, ka hûn çî tiştan ra perestî dikin?"

76; "Hûn û bavên we yên berê jî?"

77; "Îdî bi rastî" ewan (putan) neyarê min in, lê Xudayê cîhanê (dostê min e)."

78; "Ewê ez afirandime (ewa Xudayê cîhanê ye) îdî ewê (rêya rast) bide nişanê min."

79; Ewê, ku xwarin û vexwarin dide min, ewa (Xudayê cîhanê ye)."

80; "Gava ez nexweş bikebin, ewa (Xudayê cîhanê) min mefa dike."

81; "Ewê min dimirîne û paşê jî min zinde dike; ewa (Xudayê cîhanê ye)."

82; "Ewê, ku ez guman dikim: di roya xelat û celatan da nûsitemne min ji bona min ra bibaxîşîne ewa (Xudayê cîhanê ye)."

83; "Xudayê min! Tu ji bona min ra zanîna retkokî bide û tu min bigihîne aşîkaran."

84; "Îdî (ji bona wanê ku) para da dinînin (min li ser zimanê xwe bi rindî hildin) tu zimanê wan (di mafê min da) rast û (hezger) bixî para min."

85; "Îdî tu min bixe nav bihiştê xwarinan."

86; "Îdî tu bavê min bibaxîşîne, loma bi rastî ewa ji rêya rast derketîye"

87; "Û tu min di roya şandin a civînê da riswa neke."  
 88; "Ewa royeke wusa ne, ku mal û zar têda qe tu havilî nakin."  
 89; "Ji pêştirê wî kesê, ku bi dilekî xwûrî hatibe bal Yezdan."  
 90; Û (di we roye da) bihişt ji bona xudaparisan nêzîk dibe.  
 91; Û doj jî ji bona wanê, ku ji ava rû derketî xûya dibe.  
 92; Û ji bona wan ra (aha) tê gotinê: "Kanêna ewan tiştên ku we ji bona wan ra perestî dikirin?"  
 93; "Ji pêştirê Yezdan. Gelo ewan ji bona we ra arîkarî dikin, ya jî arîkariya xwe jî qe dikin?"  
 94; Îdî ewan û bi tevê, wanê ku ava rû derketine (di wê royê da) li pey hev li bal agir da tene avêtinê.  
 95; Hemû leşkerê pelîd jî.  
 96; Ewan di dojê da bi hev ra tekoşîn dikirin (ji hev ra aha) digotibûne."  
 97; "Bi Yezdan, em bi rastî di rê wundabûneke xûya da nin"  
 98; "Loma bi rastî me hûn (gelî putan!) dixistine hempayê Xuda yê cîhanê."  
 99; "Ji pêştirê gyonehkaran, tu kesekî em ji rêya rast dernexistine."  
 100; "Îdî ji bona me ra qe tu mehder jî tune ye."  
 101; Û tu destê parisvan jî tune ye."  
 102; "Xwezîka ji bona me ra carekî dinê jî (li bal cihanê da zivirandinek hebûya). Îdî meyê bawer bikira."  
 103; Bi rastî di van (bûyeran da) beratên (derhoze) hene, lê pirê ji wan bawer nakin.  
 104; Bi rastî Xudayê te servahatê dilovîn e.  
 105; Komalê Nûh jî saiyê xwe dane derewdêrandinê.  
 106; Di gavekî da birayê wan ê Nûh ji bona wan ra (aha) gotibû: "Hûn qe xudaparizî nakin?"  
 107; "Bi rastî ez ji bona we ra saiyekî ewle me."  
 108; "Îdî hûn xudaparizî, bikin û bi gotina min bikin."  
 109; "Ez ji bona (van şîretan) qe tu kiryekî ji we naxwazim: kirya min hey li ser Xudayê cîhanê ye."  
 110; "Îdî hûn yezdanparizî bikin û hûn bi gotina min bikin."  
 111; Ewan (bersiva Nûh aha dane û) gotine: "Peyrewên te hemû riswa ne (ka îdî) emê ça bi te bawer bikin?"  
 112; (Nûh ji bona wan ra aha bersiv daye gotîye: "Tu zanîna min (bi hundurê) kirina wan tune ye (lê bi tenê ez bi kirinê wan ê xûyayî dizanim)."  
 113; "Heke giza zanîna we (bi van) hebe (hûn dizanin) ku hijmara (kirinê) wan hey Xudayê min pêk tîne."  
 114; "Ez bi xweber jî nikarim bawergeran derkim."  
 115; "Ez ji bona kesan ra) hey hişyarkarekî xûya me."  
 116; Ewî (komalê Nûh, bersiva wî dane û) gotibûne, "Nûh! Heke tu ji van (kirin û gotinê xwe) xwe neparisînî, bi rastî tu ê bibî ji wan."  
 117; (Gava Nûh ji wan bê guman bûye, ji Xuda aha lava kirîye û) gotîye: "Xudayê min! Bi rastî komalê min, ez dame derevdêrandinê."  
 118; "Îdî (Xudayê min!) tu di nava min û wanan da (bi berewayîni) raqetinê bike, tu min û ewanê bawerger yên bi min ra hene! Ji (vî komalê cewykar) fereste bike."  
 119; Pasê me jî (Nûh) û ewanê bi wî ra di keleka tijî da fereste kirin.  
 120; Me paş da ewanê mayî di avê da feşirandin (Xeniqandin).  
 121; Bi rastî di van (bûyeran da) beratên (derhoze) hene, lê pirê wan bawer nakin.  
 122; Bi rastî Xudayê te servahatê dilovîn e.  
 123; (Komalê) 'Ad jî saiyên xwe dane derewdêrandinê.  
 124; Di gava, ku birayê wan ê Hûd (aha) ji bona wan ra gotibû: "Hûn ji bo çi (xuda)-parizî nakin?"  
 125; "Bi rastî ez ji bona we ra saiyekî ewle me."  
 126; Îdî Hûn yezdanparizî bikin û bi gotina min bikin."  
 127; "Ez biy van (şîretan) ji we qe tu kirêkî naxwazim. Kirya min hey li ser Xudayê cîhanê ye."  
 128; "Hûn li ser hemî rêyan (ji bona şaskirina rêwîyan) topikan çê dikin; bi tiştê beredayî ra mijûl dibin?"



129; "Û hûn guman dîkin, ku hûnê (di cîhanê da) her bimînîn, hûn ji bona xwe ra (bingehê) pêşeyên binecî ava dîkin."

130; "Û hûn gava yekê (ji bona şapatkirinê bigirin) hûn ewan wekî hincerokan digirin."

131; "Îdî hûn yezdanparizî bikin û bi gotina min bikin."

132; "Ewê ku mal û berxudarya hûn pê dizanîn, daye we heye! Hûn parizaya wî bikin."

133; "Ewî (Xudaê) bi tariş û kuran hûn bi hêz kidrine."

134; "Û bi rez û kaniya jî (hûn bi hêz kirine)."

135; "Bi rastî ez ditirsim, ku şapata ro ya mezin bi we da were."

136; Ewan (bersiva Hûd dane, aha) gotine: "(Hûd) tu şîretan bikî, ya jî qe nebî ji wanê şîretkar, li bal me yek e."

137; "Evan (kirin û gotinê te) hey xûye wan ê borîne."

138; "Û em nayêne şapatkirinê."

139; Îdî ewan (Hûd) dane derewdêrandinê û me jî ewan teşqeke kirin. Bi rastî di vê (bûyere da) beratên (derhoze) hene, lê pirê wan bawer nakin.

140; Bi rastî hey servahatê dilovîn Xudayê te ye.

141; Komalê Semûd jî Saî dane derewdêrandinê.

142; Di gava, ku biraê wan ê Salih (aha) ji bona wan ra gotibû: "Hûn ji bo çi (xuda)-parizî nakin?"

143; "Bi rastî ez ji bona we ra saîkî ewle me (û bal we da hatime şandinê)."

144; "Îdî hûn yezdanparizî bikin û bi gotina min bikin."

145; "Ez ji bona van (şîretan) qe ji we tu kirêkî naxwazim, loma kirya min hey li ser Xudayê cîhanê ye."

146; "Qey hûn (guman dîkin) ku hûnê di cîhanê da bi ewletî bêne hiştinê?"

147; "Di nava rez û kaniyan da."

148; "Di nava çandin û nexlistanê, ku çiqilê dar a xurmê wan ji devîyên berêwan nermin."

149; "Û hûn (di kevirên) çîyan da bi berxudari xaniyan dikolin."

150; "Îdî hûn bi gotina min bikin, yezdanparizî bikin."

151; "Û hûn bi gotina feşartekan (musrif) nekin."

152; "Ewanê di zemîn da tevdanî dîkin û aştî nakin hene! Ewan feşartok in."

153; Ewanan (bersiva Salih aha dane û) gotine: "Bi rastî (Salih!) ewanê rind hatine ançkirinê hene! Tu ji wan î."

154; "Tu jî hey merivekî wekî me yî, îdî heke tu di doza xwe da rast î, ka ji me ra berateke (derhoze) bîne."

155; (Salih ji bona wan ra aha bisyar daye û) gotîye: "Eva deva (şutir) hanê ji bona we ra (berateke derhoze ye). Di royeke diyarî da av vexwarin ji bona wê ra ne, royekî jî ji bona we ra ne."

156; "Hûn bi sikatî nêzikê wê devê nebin. (Heke hûn sikatîya wê devê bikin) wê şapata ro ya mezin bi we bigire."

157; Axirî ewan serê devê jêkirin, îdî ewan (ji serjêkirina devê) poşman bûn.

158; Paşê şapatê ewan girtin. Bi rastî di van (bûyeran da) beratên (derhoze) hene, lê pirê wan bawer nakin.

159; Bi rastî Xudayê te bi xweber jî servahatê dilovîn e.

160; Komalê Lût jî saî dane derewdêrandinê.

161; Di gava, ku birayê wan ê Lût ji bona wan ra (aha) gotibû: "Ji bo çi hûn (xuda)-parizî nakin?"

162; "Bi rastî ez ji bona we ra saîyekî ewle me (li bal we da hatime şandinê)."

163; "Îdî hûn bi gotina min bikin, yezdanparizî bikin."

164; "Û ez ji bona van (şîretan) qe tu kirêkî ji we naxwazim, loma kirya min hey li ser Xudayê cîhanê ye."

165; "Di cîhanê da, hûn ça tûşê mêran dibin?"

166; "Ewan jinên we ne, ku Xudayê we ji bona we ra, ji wan jinan (xweşî) afirandîye, hûn ça dest ji wan berdidin? (Wekî we nîne!). Bi rastî hûn komalekî wusa nin; hûn ji tixûbê xwe borîne."

167; Ewan (bersiva Lût aha dane û) gotine: "Lût! Heke tu ji van (kirin û göotinê xwe) xwe nedî para da, tu ê bibî ji wan."

168; (Lût bisyara wan aha daye û) gotîye: "Bi rastî rikê min ji van kirinê we tê."

169; "Xudayê min! Tu min û malîyên min ji kirinê wan fereste bike."

170; Îdî me jî (Lût) û malîyên wî hemî fereste kirin.  
 171; Hey di nava wan ê (di şapatê da mane) pîrek bi tenê (me fereste nekir).  
 172; Îdî paşê me ewanê mayî teşqe le kirin.  
 173; Û me li ser wan da baranek barandîye. Ewanê hatine hişyarkirinê (bi vî ra jî ne hatine rêya rast) hene! Îdî (ji bona wan ra) siki ê barana ne.  
 174; Bi rastî di van (bûyeran da) beratên (derhoze) hene, lê pirê wan bawer nakin.  
 175; Bi rastî Xudayê te bi xweber jî servahatê dilovîn e.  
 176; Hevrî û (komalê li welatê bi nav) Eyketê jî saî dane derewdêrandinê.  
 177; Di gava, ku birayê wan ê Şu'eyb (aha) gotibû: "Ji bo çi hûn (xuda)-parizî nakin?"  
 178; "Bi rastî ez ji bona we ra saîkî ewle me (li bal we da hatime şandinê)."  
 179; "Îdî hûn bi gotina min bikin. Yezdanparizî bikin."  
 180; "Û ez ji bona van (şîretan) qe tu kirya ji we naxwazim, loma kirya min hey li ser Xudayê cîhanê ye."  
 181; "Hûn (gelê min!) pîvana xwe pêk bînin, hûn nebîne ji wanê (ku pîvana xwe kêr dikin, û malê xwe ne dirust dikin) dibîne ji wanê mal kêrger."  
 182; "Û hûn (gelê min!) kêşa xwe (bê dexelî) bi kêşa rast pêk bînin."  
 183; "Û hûn (gelê min!) zîyana merivan (di mal û mafê) wan da nekin, hûn di zemîn da ji bona tevdanê negerin."  
 184; "Û hûn (gelê min!) ewê, ku hûn û nişa berê afirandîye heye! Parizaya wî bikin."  
 185; Ewan (aha bersiva Şu'eyb dane û) gotine: "Bi rastî (Şu'eyb!) ewanê ku rind hatine ançkirinê hene! Tu bûyî ji wana."  
 186; "Tu jî hey merivekî wekî me yî, bi rastî em guman dikin, ku tu jî ji wanê vîrekî."  
 187; "Heke bi rastî tu ji wanê rastgoyî (di doza xwe da rast î) ka îdî tu ji ezmanan li ser me da cêtiyan (parça) bixe xarê."  
 188; (Şu'eyb aha) got: "Xudayê min, bi kirinê we çêtir dizane."  
 189; Îdî (ji piştî van şîretan jî, dîsa) ewan (Şu'eyb) dane derewdêrandinê (paşê) şapata ro ya (ku ewan di wê royê da ji german xwe avêtibûne ber) sîhê, bi wan girt, loma bi rastî ewa şapata royeke mezin bûye.  
 190; Bi rastî di van (bûyeran da) beratên (derhoze) hene, bi vî ra jî pirê wan bawer nakin.  
 191; Bi rastî Xudayê te bi xweber jî servahatê dilovîn e.  
 192; Bi rastî ewa (Qur'ana) hinartina Xuda ê cîhanê ye.  
 193; Canê ewle (Cibraîl) ewa hinartîye.  
 194; Ji bo ku tu bibî ji wanê hişyarvan (Cibraîl ewa Qur'ayîne) li ser dile te da hinartîye.  
 195; Bi zimanekî 'erebîyî hizwartî.  
 196; Bi rastî (hinartina Qur'anê bi vî awayî) di wan pirtûkê berê da jî (salixê wê hebûye).  
 197; Ma qey zanîna, zanayên zarên cihûyan, ku (Qur'an bu vî awayî ji Xudayê cîhanê hatiye hinartinê) ji bona wan ra beratên derhoze nîne?  
 198; Heke me ewa (Qur'ana) li ser hinekê bîyanê 'ereban da hinartîbûya.  
 199; Îdî ewê (bîayînyî) ewa (Qur'ana) ji bona ('ereban) bixûnda, 'ereban (bi Qur'anê) bawer ne dikir.  
 200; Bi vî awayî me (ne bawerya bi Qur'anê) di dilê gonahkaran da bi cîh kirîye.  
 201; Ewan (filan) heya şapata dilsoz nebînin, bi wê (Qur'anê) bawer nakin.  
 202; Îdî (şapat jî) wusa nişkêva bi wan da tê, qe haja wan (ji şapatê) namîne.  
 203; (Gava ewan nişkêva şapatê, dibînin, aha) dibêjin: "(Ji bona bawerya me ra gelo qe) firset nayê dayîne?"  
 204; Ma qey hêj ewan (filan) bi hatina şapata me lez dikin? (Dibêjin: "Heke tu ji rastgoyan î, bira şapat jî bona me ra lez were)."  
 205; Tu dibînî, heke me ewan bi salan berxudar bikira.  
 206; Paşê ewa (şapata) ku ji bona wan ra hatiye peymandanê; bi wan da hatîbûya.  
 207; Ewa berxudarya (ku ewan filan têda mabûne) ji bona wan ra, qe tu (parisîya ji şapatan) ne dida.  
 208; Me çîqa welatek teşqe le kiribe, hey ji bona wî (welatî ra) hişyardarek hebûye.  
 209; Ewî (hişyardarî, rûniştyên wî welatî) hişyar dikiribûne, loma bi rastî em ji

cewrkaran nînin.

210; Pelîdan (ewa Qur'ana) ne hinartine.

211; Şixwa ji bona (pelîdan jî) babet nîne ku ewê (Qur'anê) bihênirînin û ewan (pelîdan şixwa) nikarin jî (bihênirînin).

212; Loma ewan (pelîdan) bi rastî ji bîhistinê hatine dîrxistinê.

213; (Muhemmed!) Tu bi Yezdan ra perestîya tu ilahên mayî neke. Loma heke tu (perestîya ilahên mayî bikî) ewanê hatine aşîtkirinê hene! Tu dibî ji wan.

214; Û tu (di cara yekem da) tîryên (pismam) xwe î nêzik bide hişyarkirinê.

215; Û tu çengê xwe ji bona peyrewên xwe yê bawerger ra nişîv bike (di hemberê wyan da rûmetkar û dilovîn be).

216; Îdî heke ewan bê gotina te bikin, paşê tu (ji bona wan ra aha) bêje: "Bi rastî ez ji wan tiştên, ku hûn dikin, bê guman im."

217; Û tu xwe hispêre li ser Yezdanê servahatê dilovîn.

218; Ewê gava tu radibî, te dibîne heye! (Yezdanê servahatî) ewa ye.

219; Ewa gera te ye di nava secdebîran da heye! (Yezdan ewî jî dibîne).

220; Loma bi rastî ewa bi xweber pîr bîhêstê pîr zana ye.

221; Ez ji bona we ra bêjim; ka pelîd li ser kîjanan dihinire?

222; (Pelîd) li ser hemî vîrekên gonehkar dihinirin.

223; Ewan (vîrekan) gohdarya (pelîdan) dikin, pîrê wan jî (tiştên) vir (li bal serkarên yê ra davêjin).

224; (Temtêla (xozayînan jî ahane), "peyrewîya wan hey merivên, garyaî dikin."

225; Ma qey tu nabînî, ku (ewan xozanan) di hemî newalan da li hev dizivîrînin û dibêjin?

226; Loma bi rastî ewan (Xozanan) tişta nakin dibêjin.

227; Ji pêştirê wan (xozanên) ku bawer kirine û karê aşî kirine û Yezdan pîr bîra xwe anîne û ji piştî ku li wan hatibe cewrkirinê; (ji bona servahatîna xwe xebat kiribin) û serfiraz bibin. Di nezîk da ewanê cewr kirine hene! Wê bizanin ka wê li bal kîjan êwirê da bizivirin.

## Chapter 27 (Sura 27)

1; T.S. (hey bi arşa van tîpên ji hevçûyî Yezdan dizane). Eva beratên Qur'anê û Pirtûka hizwartîne

2; Ewan beratan ji bona bawergeran, beled û mizgîniyek e.

3; Ewanê ku nimêja xwe dikin û (baca malê xwe) didin û di nêzik da jî (bi danê para da) bawer dikin hene! (bawerger) ewan in.

4; Bi rastî ewanê, ku (bi danê) para da bawer nakin hene! Me kirina wan ji bona wan ra xemilandîye. Îdî ewan bi xweber jî, di kirinê xwe da kor mane.

5; Ewanê, ku ji bona wan ra sikê şapata heye, hene! Evan bi xweber in, evanan di para da jî pîr zîyan kirine.

6; Bi sond (Muhemmed!) eva Qur'ana ji bal (Yezdanê) bijejke yê pîr zana, li bal te da hatiye niqandinê.

7; Di gavekî da Mûsa ji bona malîyên xwe ra (aha) gotibû: "(Malîyên min! Hûn li vîra bihewin) bi rastî min agirek dît (ez ê herime bal wî agirî) ya ez ê ji wura, ji bona we ra peyvekî bînim (ku em rêya xwe bîbînin têda herin) ya jî ez ê ji bona we ra kozekî agirê gur bînim, ku hûn li dora wî agirî bitelizin.

8; Îdî gava (Mûsa) hatiye bal wî (agirî) ji bona (Mûsa ra aha) hatiye gazîkirinê: "Ewanê di agir da ewanê li dora agir da jî (hemî jî) pîroz in. Bi rastî Yezdanê Xuda ê cîhanê ji hemî kêmayan paqij e."

9; "Mûsa! Rastî ev e: Yezdanê servahatî bijejke heye! Bi rastî ewa ez bi xweber im."

10; "Û tu gopalê xwe baveje. Ga-va (Mûsa kopale xwe avît) dîna xwe dae, ku (ewa kopale wîyî mezin) wusa dimiînûle wekî tîremarekî xwe daveje. (Mûsa ji tîrsa) para da revya qe li pey xwe meze nekîr. (Me li bal Mûsa da aha gazî kir), "Mûsa! tu netirse, loma bi rastî li bal me saî natirsîn."

11; "Ji pêştirê wî kesê, ku cewr kiribe, paşê ji piştî sikatîya kirîye, ewa (sikatî) bi qencîyan guhurîbe (di hemberê van da jî) bi rastî ez baxîşkarê dilovîn im."

12; "Û (Mûsa!) tu destê xwe bixe bêrika xwe, wê destê te ê bê qilêr, spî û çîl derkebe. Tu bi van neh beratan va here bal Fir'ewn û komalê wî. Loma bi rastî ewan

komalekî wusa nin, ji rêya rast derketine."

13; Îdî (ji piştî ku Mûsa) bi beratên me yên xûya va hatine bal (Fir'ewn û komalê wî da). Ewan (ji bona Mûsa ra aha) gotine: "Bi rastî evan (beratan) ançên xûya nin."

14; Ewan bi dilê xwe (bi rastîya wan beratan dizaniyan) lê bi xweber li xwe cewr kirine û quretî kirine û bi wan (beratan) bawer ne kirine. Îdî tu mêze bike, ka encama tevdanokan çane!

15; Bi sond! Me ji bona Dawûd û Suleyman ra zanînek dabû. Ewan herdukan (aha) gotibûn: "Em ji bona wî Yezdanê, ku em li ser pir kesên ji bendeyên xwe yên bawerger, rûmetdar kirîye; sipasî dikin."

16; Suleyman bûye ûrta Dawûd û ewî ji bona kesan ra (aha) gotîye: "(Gelî) kesan! Bi rastî zimanê çûkan ji bona me ra hatiye hînkirinê û ji bona me ra ji hemî tiştan (par) hatiye dayînê. Bi rastî evan (hînkirin û dayîn) bi xweber jî rûmeteke xûya ye."

17; Ji bona Suleyman ra ji cunûk û ji komelê kesên mayî û melan (teyr) hemî leşkerê wî hatine civandinê: di cihekî da ji bona (Suleyman ra) pêş û paşê wan hemî li ser hev da dihatin.

18; Ewan çûn heya hatine wî cîhê (bi nav) Wadineml yekê ji morîstangan (aha) gotîye: "Gelî morîstangan! Bikevine êwirên xwe; ji bo ku Suleyman û leşkerê xwe va, we bi nezani nepelixînin."

19; Îdî (Suleyman) bi gotina wê (morîstangê) beşaşbû; kenîya û (aha lava kir û) got, "Xudayê min! Ji bo ku ez di hemberê wan qenciyan te ne, te li ser min û bavê min kirîye û ji bo ku ez karê aştî bikim, tu jî pê qayîl bibî tu min bixe fermana xwe (ku ez bi gotina te bikim) sipazîya te bikim û tu bi dilovaniya xwe min bixe nava bendeyên xwe yên aştîkar."

20; (Dema Suleyman li çûkan mêze kir), melê (bi nav Suleymanê dunikil ne dît) wunda bibû. Îdî (Suleyman ji bona koma xwe ra aha) gotibû: "Ka ji bo çi ez Suleymanê dunikil nabînim, ya jî wunda bûye?"

21; "Ya ez ê şapateke zor mezin bidime wî, ya jî ez ê serê wî jêkim, ya jî ewê (ji bona ne hatina xwe ra berateke) bi hêzê hizwartî bîne."

22; Îdî hindik man (Suleymanê dunikil hat, ji bona Suleyman ra aha) got: "Tiştê qe te pê nizanbû, min ewa zanî. Ji (welatê bi nav) Seba min ji te ra peyveke rast aniye."

23; "Bi rastî (di wura da) ez rastî jineke wusa hatim, Serokatîya wan dikir û ji hemî tiştan ji bona wê ra hatibû dayînê û ji bona wê ra textegahekî mezin jî hebû."

24; "Ez rastî wan hatim (min dîna xwedayî) ku ewa (jinika) û komalê wê ji pêştirê Yezdan, secdê ji bona rojê ra dibirin: Pelîd ji bona wan ra (eva kirina) wa yên hanê xemilandibû. Îdî (Pelîd bi vê kirina xwe) ewan ji rêya rast dabûne fetilandinê, loma îdî ewan bi xweber jî naêne (rêya rast)."

25; "Ma qey nediba, ku ewan ji bona wî Yezdanê, ku di ezmanan da evê û mijê di zemîn da jî heşînayî û xunav û rewaran derdixe, secdê beherin? Û hûn çi veşerin û hûn çi jî êşkere bikin, hey ewa (Yezdana) pê dizane."

26; "Ewê ji pêştirê wî tu Yezdanê (babetê perestîyê) tune ye, heye! Ewa ye Yezdanê (maf). Ewa (bi xweber jî) xweyê arşa (mana) mezin e."

27; (Suleyman ji bona koma xwe ra aha) gotîye: "Em ê mêze bikin, ka gotinê te rast in, ya jî tu ji wan ê derewçîn î."

28; "Tu evê nama min behere li bal wan da bavêje; paşê piştê xwe bide wan, mêze bike, ka îdî ewanê çi (bisyarê) bizivirînin."

29; (Gava Suleymanê dunikil, name avête bal wan; jinikê ji koma xwe ra aha) gotîye: "Gelî rîspîyên min! Bi rastî li bal min da nameke rind hatiye avêtinê (ka hûn di mafê wê namê da çi dibêjin)?"

30; "Ewa nama ji (merivekî bi nav) Suleyman hatiye û di serê wê namê da eva peyva heye, "bi navê Yezdanê Dilovan ê Dilovîn."

31; "Hûn di hemberê min da serî bilind nekin û hûn bi xwe hisparî werin bal min."

32; (Jinikê ji koma xwe ra aha) gotîye: "Gelî rîspîyên min! Hûn dizanin, ku heya hûn nêhrewaniya tiştêkî nekin, ez bê we qe tu tiştî nakim. Ka hûn di vê bûyera min da rêyekî ji min ra bibînin."

33; (Rîspîyan bersiva wê aha dane û) gotine: "Tu dizanî em xweyê hêz û xweyê tirsê zor in (kes di qirînan da di hembere me da nahewin). Ferman ya te ye; îdî tu mêze

bike, ka tu ê çî fermanê bidî me (em ê ewê fermanê pêk bînin)."

34; (Jinikê ji bona wan ra aha) gotîye: "Bi rastî gava serok bikebine welatekî, ewî welatî kavil dikin: serfirazê wan, sernegûn dikin. Erê! Me ça gotîye wusa dikin."

35; "Ez ê ji bona wan ra hinek pêşkêşan bişînim, îdî em ê mêze bikin, ka ewanê: saiyên me bi çî awayî bizivirînin."

36; Îdî gava (saî bi tevê pêşkêşa va) hatine bal Suleyman (Suleyman ji bona wan ra aha) gotîye: "Hûn bi mal, arîkarîya min dikin? Malê Yezdan ji min ra daye, ji wî mal ku we ji min ra aniye; bi rastî çêtir e. Na (wekî kirina we nîne) lê hûn bi pêşkêşê xwe şa dibin."

37; "(Saî!) Tu li bal wan da bizivire (ji bona wan ra aha) bêje: "Em ê bi leşkerekî wusa werin ser wan, ku hêj di berya wî leşkerî, leşkerekî wusa ne hatibe civandinê; em ê ewan ji welatê wan bi sernegûnî û piçûkî derxin."

38; (Piştî ku saî ji bal wan da para zivirî, Suleyman ji bona koma xwe ra aha) gotîye: "Gelî koma min ê rîspî! Kîjan ji we dikare, ji bona min ra textegahê wê (jinikê) bîne vira, di berya ku hêj ewa bi xwe hisparî ne hatibe bal min?"

39; Yekê ji egîtê cunûkan (aha) gotîye: "Bi rastî ez ê ewî (textegahê) ji te ra bînim, hêj tu ji şûna xwe ranebibî, bi rastî ez li ser (anîna wî textegahê) bi hêz û (bi xwe) ewle me."

40; Ew (Egîtê) ku li bal wî zanîna ji pirûkê hebûye (aha) gotîye: "Ez ê ewî (textegahê) ji bona te ra bînim, ku hêj çavê te (ji dîdevanîya re) li bal te da ne hatibe zivirandinê." Îdî (Suleyman) dêna xwe da ê ku (textegahê wê) li bal wî bi cîh bûye (aha) gotîye: "Eva rûmeta Xudayê min e (ji bona min ra eva hêza daye) ji bo ku min biceribîne, ka ez ji bona wî ra sipazî dikim, ya jî nankorî dikim. Ew ê sipazî bike, şixwa ewa ji bona xwa ra sipazî dike û kîjan nonkorî bike (bira ewa bizane!) ku bi rastî Xudayê min hewcê (sipazîya wî nîne) û xweyê qencîyan e."

41; (Suleyman ji bona koma xwe ra aha) gotîye: "Hûn textegahê wê biguhurînin (reng û rûçikê wî welgerînin, ji bo ku ewa nas neke) paşê mêze bikin, ka gelo textegahê xwe nas dike ya jî nas nake,"

42; Îdî gava (Belqîs) hatiye (jê ra aha hatiye) gotinê: "Textegahê te aha ne bû?" (Belqîsê ji bona wan ra aha) gotîye: "Bawer ke heman wusa ne. Şixwa hêj di berê da ji (hêza Yezdan û ji pêxemberîya te) zanîn ji me ra hatibû û em misilman bibûn."

43; Tişta ewê hêj di berê da ku ji pêştirê Yezdan, ji bona wan ra perestî dikirîbûye; ewanan ji rêya rast dane para da. Bi rastî ewa ji komalekî fîle bûye.

44; (Ji bona Belqîsê ra aha hatiye) gotine: "(Fermû) bikebe koşkê." (Gava ewê derê koşkê vekir) dêna xwe dayê ku wekî aveke kûr e. Delingê xwe bilind kir, guman dikir, ku ewa lêlav e." (Ji bona Belqîsê ra aha hate) gotinê: "(Tu delingê xwe nede jor) loma ewa koşkeke wusa ne, ji şûşê hilû hatiye çê kirinê." (Paşê Belqîsê ji aha) gotîye: "Xudayê min! Bi rastî min bi xweber li xwe cewr kirîye û ez bi Suleyman ra ji bona Yezdanê Xuda ê cîhanê ra misilman bûm."

45; Bi sond! Me li bal Semûdiyan, birayê wan ê Salih bi saî şandiye; ji bo ku (Salih ji bona wan ra aha bêje): "Hûn (gelê min!) ji bona Yezdan ra perestî bikin." Îdî (paşê) ewan bûne du deste bi hev ra tekoşîn dikirin.

46; (Salih ji bona wan ra aha) gotîye: "Gelê min! Hûn ji bo çî di berya qencîyan da leza kirina xirabîyan dikin? Divê ku hûn baxişandina xwe, ji van kirinê xwe, ji Yezdan lava bikin, loma dibe ku hûn bêne dilovînkirinê."

47; Ewan (bisyara Salih aha dane û) gotine: "Bi rastî em bi te û bi wa yên bi te ra, bê nutûf bûne (dest ji me berde)." (Salih ji bona wan ra aha) gotîye: "(Sedema) bê nutûfîya we li bal Yezdan e (Yezdan ji bona wanê karê sikî dikin bê nutûfî dide). Bi rastî hûn bi xweber jî komalekî wusa nin bi curecure têne ceribandînê."

48; Di bajar da neh (serokê lêzimî) hebûn, ewan aştî ne dikirin, lê di zemîn da ewan tavidanî dikirin.

49; Ewan (serokan aha) ji hev ra sond dixwurin û digotin: "Em ê şebxunekî bidine (Salih û malîyên wî, em ê ewan di şevê da bikujin) paşê em ê ji bona serkar û (lêzimên wî ra aha) bêjin: "Qe me nehrewamya teşqela wan nekirîye û em evan pey-ve xwe rast dibejin."

50; Ewan (ji bona Salih ra) xax kirine, me jî (ji bona wan ra) defik danîye, lê qe haja wan bi xweber jî tune bûye.

51; Îdî tu mêze bike, ka encama xaxê wan ça bûye. Loma bi rastî me evan û komalê wan bi hemûtî teşqeke kirin.

52; Îdî bi sedema cewra ewan kirî, evan kaviî hanênan xênîyên wan in, vala mane. Bi rastî di van (bûyeran da) ji bona komalekî zana ra beratên (derhoze) hene.

53; Ewanê bawer kirine û xudaparizî dikin hene! Me ewan fereste kirine.

54; Me Lût jî (bi saîtî ji bona komalê wî ra şandibû).Gavekî (Lût) ji bona komalê xwe ra (aha) gotibû: "Hûn ber çavî hîzîî dikin û hûn (bizanîn) mêze dikin!"

55; "Qey hûn jinan dihêlin, rastî bi xweşî li bal meran da bi qûndaî diçin? Lê rastî hûn komalekî wusa nîn, hûn xwe davêjine nezanîne."

56; Îdî bersiva komalê (Lût) ji bona wî ra hey eva bûye (aha) gotine: "Hûn (Lût) û malîyên wî ji gundê xwe derxin.Loma bi rastî ewan hinek kesên wusa yên (xwe ji van kirîne me) paqij dikin."

57; Îdî me jî, ji pêştirê jina (Lût ê) ku me ewa di nava wanê hatine teşqelekirinê da hiştîye, me (Lût) û malîyên wî va fereste kirin.

58; Me li ser wan da barişteke wusa barand, îdî ewa barišta sikê wê barišta hişyarbûnê ye.

59; (Muhemmed! Tu aha) bêje: "Sipazî ji bona Yezdan ra be, ewan bendeyên ku ewî di nava bendeyên xwe da hêlbijartîye; selam li ser wan be. Gelo Yezdan qenc e, ya jî ewan hevriyên hûn çê dikin?"

60; Gelo ewê êzman û zemîn afirandîye kî ye? Gelo ji bona we ra ji ezmanan, av kî hinartîye? Qe we nikarbû darê (bostana jî) hêşîn bikin, ewî ji bona we ra bostanê, ku dilan şa dike hêşîn kirîye. Qey hinek (hevalên) Yezdan hene? Na (qe tu hevalê wî tune ne) lê ewan komalekî ji (mafê, rû) fetilandine.

61; Gelo ewê, ku zemîn xistîye êwirgeh û di nava zemîn da çemê avê bi cî kirîye û ji bona (hewa zemîn ra) çîyayê binecî di zemîn da (rakutaye) û di nava her du deryan da perde hûnandîye, kî ye? Qey hinek (hevalên) Yezdan hene? Na, (qe tu hevale wî tune ne) lê pirê wan nizanin

62; Gelo ji (pêştirê wî) kê (dikare) bisyara hewcevanan bide; gava hewcevan gazî wî bikin û sikatîyê (li ser wan) rake û ewa bikaribe, we bixe şûnmaî wanê borî, di zemîn da we bihêle? Qey hinek (hevalên) Yezdan hene? Na, (Qe tu heval ji bona wî ra tune ne) le hûn çîqa hindik Xuda bîra xwe tînin!

63; Gelo ji pêştirê wî kê (dikare) ku di taritîya reşai û deryaê da, rê bide nişana we? Gelo ewê bayê di berya baranê da bi mizgînî dişîne, ji (pêştirê wî) kê ye? Qey hinek (hevalên) Yezdan hene? Na (qe hevalê wî tune ne). Yezdan bi rastî ji wan hevriyên, ku ewan jê ra çê dikin, bilind e.

64; Gelo (ji pêştirê wî) kî di cara yekem da heyî afirandine, paşê kê ewan (ji piştî mirinê) dîsa dizivirîne? û ji ezman û zemîn kê rozînan ji bona we ra dide? Qey hinek (hevalên) Yezdan hene? Na (qe tu havalê wî tune ne. Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Heke hûn di doza xwe da rast in, ka beratên xwe bînin."

65; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Ji pêştirê Yezdan, qe tu kes bi ne xwuya ne di ezman û zemîn da heyî nizane û haja wan tune ye, ka wê rabin herin civîne?"

66; Lê zanîna (bi jîna) para da li pey hev ji bona wan ra hatîye, ewan bi xweber jî bi rastî hêj di mafê (jîna) para da, du dil in. Na, lê ewan ji (zanîna bi jîna) para da kor in (hevqas berate li ber çavê wan hatine raxistinê hêj nabînin).

67; Ewanê bûne file hene! (Aha) gotine: "Qey gava (em bimirin) em û bavê xwe ne berê da bibîne xwelî, ma qey em ê dîsa (rabin ji nava xwelîyê) derkebin?"

68; "Bi sond! Hêj di berê da jî em û bav û kalê xwe va bi van peymanan hatine hişyarkirinê, evan (peymanan) hey çîvanokên berê ne."

69; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Hûn (gelî kesian!) di zemîn da bigerin, îdî hûn mêze bikin, ka encama gonehkaran ça bûye!"

70; (Muhemmed! Tu ji bona ne bawerya wan) li ser wan mirûzê xwe neke û tu ji bona dexelî u endezên wan bêhna xwe teng neke.

71; Ewan (ji te ra aha) dibêjin: "Heke hûn (di doza xwe da rast in) ka danê wan peymanan kengê ye?"

72; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Dibe, ku ewa şapata hûn leza hatina wê dikin, hinekî (ji wê şapatê) li pey we da be (haja we pê tune be)."

73; Bi rastî rûmet û qencîyên Xuda ê te li ser kesian heye, lê pirê wan (kesan) sipazîya (Xuda ê te) nakin.

74; Bi rastî Xudayê te bi wan tiştên, ku ewan di singe xwe da vedişêrin ya jî eşkere dikin, rind dizane.

75; Û çiqâ tiştên ne xwuyayên di ezman û zemîn da hene (ewan hemîşk jî) di nivîsareke hizwartî da nîn.

76; Bi rastî eva Qur'ana pirê wan tiştên, ku zarên cihûyan di wan (tiştan da) ne wekhev bûne (rastîya wan tiştan) ji wan ra dibêje.

77; Û bi rastî ewa (Qur'ana) ji bona bawergeran ra beled û dilovînek e.

78; Bi rastî Xudayê te wê di nava (zarên cihûyan da) bi biryarên xwe, berewani bike. Loma servahatê pirzan hey (Xudayê te ye).

79; Îdî tu xwe hispêre li ser Yezdan. Loma bi rastî tu li ser mafekî xwuyaî yî.

80; Bi rastî tu (dengê xwe) bi miryan nadî bihistinê û di gava (merivên ker) para da birevin, tu qe tu gazîkirinê bi wan nadî bihistinê.

81; Û tu nikarî ewan komê, ku di rê wundabûna xwe da wunda bûne, bînî rîya rast. Ewanê bi beratên me bawer kirine hene! Tu dikarî (dengê xwe) bi wan bidî bihistinê, şixwa îdî ewan bi xweber jî misilman bûne.

82; Gava (peymana bi hatina danê dawîyê) bi ser wan da hat; em ji bona wan (kesan ra) di zemîn da rawerekî derdixin. Ewa (rawera) bi wan ra mijûl dibe, ku merivan bi rastî bi beratên me bawer ne kirine.

83; Di wê roya, ku em ji her komekî ji wanê ku beratên me dane derewdêrandinê dicivînin, îdî ewanê (mayî) bi xweber deste deste dicivin.

84; Heya têne amada Xuda dibin; (ji bona wan ra Yezdan aha) dibêje: "We ça beratên min bê zanîn didane derewdêrandinê? Ya jî we çi tişt dikiribûne?"

85; Û li ser wan da, bi sedema cewra ewan dikiribûne (ewa peymana, ku ewan pê mijûl dibûne) hatiye, îdî ewan bi xweber jî (nikarbûne di hemberê) wê hatina (şapatê da) mijûl bibin.

86; Ma qey ewan (kesan) nabînin, ku me şev ji bona hewa wan ra çê kirîye, me ro jî ji bona, ku ewan (tê da) bi dîtin (bixebitin) çê kirîye? Bi rastî di van bûyeran da, ji bona komalê bawerger ra, beratên (derhoze) hene.

87; Di roya, ku di qaldanê can da tê pufkirinê, îdî ji pêştirê wanê ku Yezdan vîniye, hemî kesên di ezman û zemîn da heyî (ji tirsê) vediciniqin. Hemîşk jî li bal (Yezdan da) bi stûxwarî tîn.

88; Di (wê royî da) tu dibînî, dibê qey çîya di şûna xwe da qerimîne mane, lê ewan çîyan wekî ewran digeriyan. Ew Yezdanê ku hemî tişt afirandîye heye! Evan pêşeyên wî ne. Loma bi rastî tiştê, ku hûn dikin ewa pê dizane.

89; Îdî Kîjan bi qencîyan hatibe, ji bona wî ra (li bal Yezdan) hêj ji wî anîna wî çêtir heye. Ewanê bi van (salixan) ji tirsê wê royî ewle ne.

90; Û kîjan bi sikatîyan hatibe, îdî ewan deverû dikibîne dojê, bi tiştêkî mayî qey ewan têne celatîkirinê? (Na, ewan hey celatî kirinê xwe dikişînin).

91; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha bêje): "Ez hatime fermankirinê, ku ez hey perestîya Xudayê vî bajarê, ku (kirîna sikatîyan di wî da hatiya qedexekirinê,) bikim; hemî tişt hey ji bona wî ra nîn. Û ez hatime fermankirinê, ku ez bibime ji misilmanan."

92; Û (ez hatime fermankirinê) ku ez "Qur'anê" bixûnim, îdî kîjan were rêya rast, şixwa ewa ji bona xwe ra hatiye rêya rast. Îdî kîjan ji rêya rast derkebe, tu (ji bona wî ra aha) bêje: "Ez hey ji hişyardarokan im."

93; Û (Muhemmed! Dîsa aha) bêje: "Sîpazî hemî ji bona Yezdan ra ne. Ew (Yezdanê) wê beratên xwe bide nîşanê we, hûnê jî di nêzik da (evan beratan) nîyas bikin. Û Xudayê te bi xweber jî, ji kirinê wan bê guman nîne.

## Chapter 28 (Sura 28)

1; T.S.M. (Arşa van tîpên ji hevçûî hey Yezdan dizane).

2; Evan, bi rastî beratên pirtûka hizwartîne.

3; Bi rastî emê ji bona komalekî, ku bawer dikin: hinekî ji serdaborya Mûsa û Fir'ewn ji te ra bixwûnin.

4; Bi rastî Fir'ewn di wî zemîn da bi quretî (dest avêtîye cewrê) xwe bilind (zanîye) û ewî rûniştîne (wî zemînî) deste û deste ji hev raqetandîye: komakî ji wan (ku zarên cihûyan bûn) bê hêz dikiribûye: Sere; zarên wan ê kurîn jê dikir, jinê wan para da bi zendetî dihişt. Loma bi rastî (Fir'ewn) ji wanê tevdanok e.

5; Û ewanê di zemîn da hatine bê hêzîkirinê hene! Me jî diva, ku em li wanê bê hêz qencîyan bikin û em ewan bixne pêşrewan û em ewan (ji bona Fir'ewn ra) bixne mîratxwûr û ûrta wan.

6; Û emê ewan (zarên cihûyan) di zemîn da binecî bikin û em tiştê ku ewan, Fir'ewn

û Haman û leşkere wan herdûyan, ku xwe je di parizandin, bidine nîşanê wan.

7; Me li bal dîya Mûsa da (aha) niqandîye; "Tu ewê (zarokê) bimejîne. Gava (tu ji kuştina wî) tirsîyaî, îdî tu ewî bê tirs û bê mirûz bavêje nava ro. Loma bi rastî emê ewî li bal te da bizivirînin û emê ewê (zara te) bixne saî (li bal kesan da bişînin).

8; Îdî ji bona ku (Mûsa) ji wan (malîyên) Fir'ewn ra bibe neyar û kovan; malîyên Fir'ewn rastê (Mûsa) hatin, ji xwe ra birin. Loma bi rastî ji ber ku Fir'ewn û Haman û leşkere wan herdukan jî (Mûsa hildane mala xwe) bûne ji wanê şehitî.

9; (Gava jina Fir'ewn, çav bi Mûsa ketîye, ji wan ra aha) gotîye: "Eva (zaroka hanê zarake wusa şîrîn e) wê (ji bona min û te ra) bibe bîna çavan. (Fir'ewn!) hûn ewî (zarokî) nekujin, dibe ku ewa (zaroka) kêre me be, ya jî em ewî ji xwe ra bixne zar (li bal me bimîne). "Qe haja wan (bi serdaborya Mûsa) tunebûye.

10; Dilê dîya Mûsa ji pêştirê (kovana li ser Mûsa) ji hemî tiştî di wê şevê da vala ma bûye. Heke ji bona bawerîya wê ye, ku ewê bawer kiribû (Fir'ewn, Mûsa nakuje, loma me li bal wê da niqandibû, ku Fir'ewn nikare ewî bikuje) me li ser dilê wê da (bi vê bawerîyê) hewandin ne anîbûya (ji şabûnê) nêzik bû, ku ji wan ra bêje: "(Eva zara min e)."

11; (Dîya Mûsa ji bona xwûşka wî ra aha) gotîye: "Li pey wan da here. Îdî (xwûşka Mûsa) dûr da (li pey wan da çû) li wan mêze fikir, haja (hevalên Fir'ewn) bi xweber jî qe (bi xûşka Mûsa) tunebûye.

12; Me hêj di berê da (mêjandina şîrê jinan) li ser (Mûsa) ne durist kiribû, îdî ji ber (ku Mûsa şîrê jinan nedimêt; Fir'ewn û malîyên wî geryan ku jinekî wusa bibînin, Mûsa şîrê wê bimije. Gava xwûşka Mûsa bihist, ku ewan li jinan digerin, çûye bal wan aha ji wan ra) gotîye: "Hûn hez dikin, ku ez bîna maleke wusa bidime nîşanê we, ewa (bîna mala) ewî (zarokê) bê kêmaî mezin bikin û ji bona wî (zarokî ra jî) ewan bi xweber şîretan bikin?"

13; Îdî (ji piştî ku xwûşka Mûsa ji wan ra got: Ewan jî anîna wê jinikê litê kirin) ji bo ku çavê dîya (Mûsa) ji rê mêzekirinê hew bike û mirûz nebe, me (Mûsa) li bal dîya wî da zivirand, ji bona ku bizane bi rastî peymanî Yezdan daî, maf e, lê pirê wan bi xweber jî (bi vê bûyerê) nizanin.

14; Gava (Mûsa) gehîjte sedra xwe, burha (Mûsa) îdî rast bûye, me ji bona wî ra berewanî û zanînek daye. Ewanê qencî kirine hene! em ewan bi vî awaî xelat dikin.

15; (Di royekî da) haja kesî (bi Mûsa) tunebûye (Mûsa) çûye bajar. Îdî (di bajar da) ewa rastê du mêran hat; ku ewan li hev dixistin: Yek ji wan herdu mêran, ji komalê (Mûsa) bûye, ewê maî jî, ji neyarê wî bûye. Îdî ewê ji komalê Mûsa (ji bona arîkarîya xwe) di hemberê neyarê xwe da, hewar (li Mûsa) kirîye. Îdî Mûsa jî sîlek li wî ê (neyar) xistîye, ewê neyar mirîye. (Gava Mûsa kuştina neyar dibîne aha) dibêje: "Bi rastî eva kirina hanê ji kirine pelîd in. Loma bi rastî pelîd neyarekî rê wundanokê xwûya ye."

16; (Mûsa paşê aha lava kirîye) û gotîye: "Xudayê min! Bi rastî min li xwe cewr kirîye, îdî tu min bibaxîşîne", (Yezdan jî) ewî baxîşandîye. Loma bi rastî ew baxîşkarê dilovîn e.

17; (Mûsa aha jî) gotîye: "Xudayê min! Ez bi wan qencîyên ku te bi min kirîye; bi sedema wan qencîyan, îdî ez ji bona wan nûsîtemkaran ra nabime piştevan."

18; Îdî (Mûsa) di bajar da bi tirs dîdevanî fikir, gavekî (dêna xwe daê) ku ewê duh li wî hewar kirîye; dîsa hewar (li Mûsa) fikir. Mûsa ji bona wî ra (aha) gotîye: "Bi rastî tu li ber çavan merivekî ji ava rû derketîyî."

19; Îdî gava (Mûsa) vaye, ku neyarê xwe herdukan bigire, ewê (neyar ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "Mûsa! Qey te duh ça merivek kuşt, tu divê ku min jî wekî wî bikuji? (Mûsa! Bi rastî) tu (bi van kirinê xwe) nabî ji aşîkaran, le tu divê, ku tu di zemîn da bibî (mêrekî) zorbe."

20; Mêrek ji kûraîya bajar bi lez hat bal (Mûsa) ewî (ji Mûsa ra aha) got: "Mûsa! Bi rastî ewa koma pêşrewan, ji bona kuştina te civîyane (heke tu guhdarya min bikî) were (ji bajar) derkeve (here). Loma bi rastî ez ji bona te ra şîretan dikim."

21; Îdî (Mûsa) bi tirs (ji bajar) derket, li dora xwe mêze fikir (aha lava fikir) digot: "Xudayê min! Tu min ji komalê cewrkar fereste bike."

22; Gava (Mûsa) ber bi alîyê (bajar ê) Medyenê da (çûye aha) gotîye: "Bi rastî ez guman dikim, ku Xudayê min bi rastî min bîne rîya rast."

23; Gava (Mûsa) çû gîha ava (bajarê) Medyenê, li ser avê rastî komake ji merivan



hat, ewê (komê tarişê) xwe av didan. Ji wan wêda rastê du jinan jî hat (dêna xwe da wan jinan, ku ewan) berya (tarişê xwe ji av vexwurinê) digirtin. (Mûsa ji wan herdu jinan aha pirsîye û) gotîye: "Hûn herduk li vira çi dikin û (tarişê xwe ji bo çi para da didin)?" Ewan (herdu jinikan ji bona Mûsa ra aha) gotine: "Bavê me kalekî mezin e (ji wî pêştir jî kesekê me tune ye) heya şivan tarişê xwe av nedin para da neçin, em tarişê xwe av nadin."

24; Îdî (Mûsa) ji bona wan herdu (jinan ra tarişê) wan av daye paşê ewî piştî xwe daye wan, çûye binê sihê, paşê ji (Xuda aha lava kirîye û) gotîye: "Xudayê min! Bi rastî tu li bal min da çi bihênirî (ez bi wî qayîl im) loma ez hewce û bîrsîme."

25; Îdî paşê yek ji wan herdu jinikan bi şermokê hate bal (Mûsa) ewê (ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "Bavê min gazî te dike, ji bo ku kirya wê avdana te ji me ra kirîye bide te. Îdî gava ewa hatiye û serdaborya xwe ji (bavê wê ra) gotîye. (Bavê wê ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "(Mûsa!) îdî tu netirse, loma tu ji komalê cewrkar fereste bûî."

26; Yekê ji wan herdu keçikan (ji bavê xwe ra aha) gotîye: "Bavo! Tu ewî (ji bona me ra bi şivanî) bigire, loma bi rastî ewa (ji wan şivanên) ku te heya naha ji bona me ra girtine (ji hemîşkan jî) bi hêztir û ewletir e."

27; (Bavê wan herdu keçikan, ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "(Mûsa!) ez divê, ku yekê ji wan herdu keçikê xwe li te kevîn bikim; heke tu heşt salan ji bona min ra bixebitî. Îdî heke tu evî danê hanê bixî deh salan (ji bona min ra bixebitî) şixwa tu li bal xwe (qencîyan dikî). Ez navê, ku ji te ra zehmetê bidim. Bi hezkirina Yezdan tuê bibînî, ku ez ji aştîkaran im."

28; (Mûsa bersiva wî aha daye û) gotîye: "Eva axiftina te, di nîveka min û te da (peymana dane diyariyê) îdî ez ji wan herdu dana, kîjanî biqedînim, pey wî da neyartî (û xeyîdandin) li ser min tune ye. Yezdan bi xweber jî li ser tiştî ku em dibêjin cînîştîyê me ye."

29; Îdî gava Mûsa danê xwe qedandîye, bi malîyên xwe va derketine li rêya xwe çûne (di şevê da) li kêleka (rastê çîya ê) Tûr agirek dîtîye (ji bona malîyên xwe ra aha) gotîye: "Hûn li vira bihewin; bi rastî min agirek dît (ezê herme wura). Loma dibe ku ez ji wura ji bona we ra axiftinekî bînim, ya jî ez hinek kozê agir bînim, ku hûn li dora wî da bitelizin."

30; Îdî gava (Mûsa) hatiye bal wî (agirî) ji alîyî newalê rastê di wî zemînê pîroz da ji darê hate gazîkirinê (aha) got: "Mûsa hişyarbe! Bi rastî ez Yezdanê Xuda ê cîhanê me."

31; "Tu gopalê xwe bavêje." Îdî gava (Mûsa gopalê xwe avêtîye) li bal gopal da mêze kirîye, dêna xwe daye gopal wekî tîremarekî dimilimle .(Ji tîrsa) para da revîya, qe li pey xwe mêze ne kirîye (Yezdan ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "Mûsa! bizivire bere xwe bide wî (gopalî) ji wî netirse, bi rastî (Mûsa) tu ji wanê ewledar î."

32; "(Mûsa!) Tu destê xwe bixe berîka xwe, ewa (destê te) wê bê qilêr sipî derkeve. O tu herdu bazûyên te ne, ku ji tîrsa ji hev çûne li bal xwe da berev bike (îdî ji xwe ewle bibe). Evan herduk (gopal û dest sipî bûn) du berateyên ji Xudayê te li bal te da hatine, ku tu ewan herdukan bidî (nîşanê) Fir'ewn û koma wî yê pêşrewan (ji bo ku , ewan bawer bikin). Loma bi rastî ewan komalekî ji rê derketonek in."

33; (Mûsa ji bona Yezdan ra aha) gotîye: "Xudayê min! Bi rastî min ji wan merivek kuştîye, îdî ez ditirsim ku ewan jî min bikujin."

34; "Zimanê birayê min Harûn ji (zimanê) min rindtir vekirîye, tu ewî bi min ra ji bo ku arîkarîya min bike û gotîyên min bide rastdêrandînê, bişîne. Loma bi rastî ez ditirsim, ku ewan min bidne derewdêrandînê."

35; (Yezdan ji bona Mûsa ra aha) gotîye: "Emê bazûkê te bi birayê te bidine hezkirinê; emê ji bona we herdukan ra hêzeke wusa bidin, îdî ewan (Fir'ewnîyan) nikaribin nêzîkî we bibin. (Îdî) hûn herduk bi beratên me va herin bal wan. Loma bi rastî hûn herduk bi peyrewê xwe va, servahatî ne."

36; Îdî gava Mûsa bi beratên me yê hizwartî va hatiye bal (Fir'ewn û koma wî da, ewan ji hev ra aha) gotine: "Evan kirinê (Mûsa) hey ançên (wusanin, Mûsa bi wan ançan) viran dike. Me tiştên aha, qe ji bavê xwe ê berê da jî ne bihistîye."

37; û Mûsa jî (bersiva wan aha daye û) gotîye: "Bi rastî Xudayê min çêtir dizane; ka kîjan ji bal wî, bi rehberya rast hatiye û ka encama bûyeran ji bona kê ra dimîne. Loma bi rastî cewkar fereste nabin."

38; Fir'ewn jî (ji bona koma xwe ra aha) gotîye: "Gelî koma min ê pêşrewan! Ez ji

bona we ra ji pêştirê xwe qe bi tu ilahek nizanim. Haman! Îdî tu ji bona min ra ji herîyê kerpîçan sor bike û koşkekî ava bike. Loma dibe ku ez derkevim bal Xudayê Mûsa. Ez bi xweber guman dikim, ku bi rastî (Mûsa) ji virekan e."

39; Û (Fir'ewn) û bi leşkere xwe va bê mafî di zemîn da quretî dikirin. Loma ewan guman dikirin, ku bi rastî li bal me da nazivirin.

40; Îdî me jî ewa bi leşkerê wî va (bi şapatan) girtin, paşê me ewan avêtine ava mîlmîlok. (Muhemmed!) tu mêze bike, îdî ka encama wan ê cewrkar ça bûye!

41; Me ewan xistine pêşrewanê wusa, ku ewan li bal agir da têne gazî kirinê. Di roya rabêna hemî da jî qe arîkarîya wan nayê kirinê.

42; Di vê cêhane da me deherandin xistîye peyrewê wan. Di roya rabêna hemî da jî şixwa ewan ji wanê sik in.

43; Bi sond! Ji piştî teşqe le kirina wan kesên çaxê borî, me ji bona Mûsa ra pirtûkek daye; ji bo ku ewa (pirtûka) ji bona kesan ra bibe beled û dilovîneke ber çavî, loma bi rastî hêvî heye ku ewan (evan bûyeran) bîra xwe bînin (bawer bikin).

44; (Muhemmed!) Gava me li bal Mûsa da bûyera (Pêxemberîyê) qedand, tu (di newalê da di alîyê) rojava da ne bûyî û tu bi xweber jî (di gava pêkanîna bûyerê da) nehriwan ne bûyî.

45; Lê me (di pey Mûsa da) pir dem borandine, îdî (ji Mûsa heya naha) gavên dirêj borîne. Û tu bi xweber di nava komalê Medyenê da jî ne bûyî, ku te beratên me ji wan ra bixwun da (hîne beratên) me bibûyaî. Loma (Pêxemberê wan hebû) lê me tu jî (bi Qur'anê va) li bal vî komalî da saî şandîyî.

46; Gava me gazî (Mûsa kiribû) tu li bal (çîyayê) Tûr ne bûyî. Lê (li Çîyayê Tûr çî bûyer boriye, me) bi dilovîneke ji Xudayê te (li bal te da hinartîye) ji bo ku tu ewî komalê di berya te da li bal wan da qe tu hişyardanok ne hatibûn; bidî hişyar kirinê, loma dibe ku ewan (bi hişyarkina te) şîretan hildin.

47; Heke bi sedema tiştên ku ewan di berê da kiribûn, şapatek bi wan da hatibûya, îdî ewanê (aha) bigotinan: "Xudayê me! Qey çî dibû te li bal me da saîyek şandibûya, îdî me jî peyrewîya beretane te bikira û me jî bawer bikira?" Ne bûya (me tu li bal wan da ne dişandî, lê ji bona ku em keysa van gotinan nedine wan, me tu li bal wan da şandî).

48; Îdî gava ji bal me ji bona wan ra mafî hatîye, ewan (aha) gotibûne: "Qey tiştê ji bona Mûsa ra hatibû, gotî wekî wî ji vî (Muhemmedî ra jî) ne hatibûya?" (Ere, gotina wan e) ma qey ewan hêj di berê da bi wan beratên ji Mûsa ra hatibûn ne bibûne file? (Ewan ji bona Qur'an û Tewratê ra aha) gotibûn, "Evan herduk (Qur'an û Tewrat) du anç in piştê hev dikin. Em bi herdukan jî dibîne file."

49; (Muhemmed!) tu (ji wan ra aha) bêje: "Bîra heke hûn ji rastgoyan in, îdî hûn ji bal Yezdan pirtûkeke wusa bînin ku ewa ji van herduk pirtûkan (Qur'an û Tewratê) beledtir be; ez bi xweber jî bibime peyrewê we."

50; Îdî heke ewan bersiva te ne dan (ewan xwastinê te bid cîh ne anîn) tu bizane, ku bi rastî ewan hey peyrewî dilxwaşîya xwe dikin. Gelo ji wanê, ku qe tu beledî ji Yezdan ji bona wan ra tunebe û bibîne peyrewê xwaşîya xwe herin, rê wundaker tu kes heye? Bi rastî Yezdan komalê cewrkar nayne rêya rast.

51; Bi sond! Me ji bona wan ra mijûlîya (xwe) peyweste gîhandîye wan, loma dibe ku ewan şîretan bîra xwe bînin (bawer bikin).

52; Ewanê, ku hêj berya (Qur'anê da) me ji wan ra pirtûk dabû hene! Ewan (bi Qur'anê) bawer kirine.

53; Gava (Qur'an) ji wan ra te xwundinê, ewan (aha) dibêjin: "Bi rastî ewa (Qur'ana) mafekî ji Xudayê me ye (ji bona me ra hatîye). Şixwa bi rastî em hêj di berya (Qur'anê da jî) Misilman bibûn."

54; Ewanê bi van salixan hene! Bi sedama hewa wan e li ser cewra cefakaran kirine, kirya wan bi du carî tê dayîne û ewan sikatîyan bi qencîyan diborînin. Ji rozînê me dane wan, ewan jî, ji hewcan ra didin.

55; Gava ewan peyvên beredayî jî dibêhên, rûyê xwe ji wan difetilînin (aha) dibêjin: "Kirinê me ji bona me ra ne kirinê we jî ji bona we ra ne. Hûn ji me ewle bîn, ku em (çêrê we nakin). Şixwa em bi xweber jî hevaltîya nezanan navên."

56; (Muhemmed!) Bi rastî tu nikarî hezkerê xwe bînî rêya rast, lê Yezdan ji kê ra bivê ewî tîne rêya rast. Loma ewa bi wanê ku hatine rêya rast çêtir dizane.

57; Ewan (filan) aha gotine: "(Muhemmed!) heke em bibîne peyrewê beledîya bi te ra heyî, bi rastî emê ji zemînê xwe bîne avêtinê. "Ma qey me ji bona wan ra li bal xwe

da, (bajarê Mekke) nexistiye şûnwarê ewletiyê ku li bal wî (bajarî da) ji her aliyî bertên? Lê pirê wan bawer nakin.

58; Me çiqa welat bi sedema berxwudarya wan ku ji tixûbê xwe borîne) teşqele kirîye! (Mêze bikin) evan kavilan, ewra wan in. Ji piştî wan hindik (meriv) li warê wan rûniştine. Em bi xweber jî ûrta wan in.

59; Heya Xudayê te di bajarê mezinê (welatan da) saikî neşîne, ewa saîya beratên me ji wan ra nexwûne, em rûniştine wî (welatê) teşqele nakin. Me çiqa welatek teşqele kiribe, rûniştine wî welatî hey cewrkar bûne.

60; Ji bona we ra çi hatibe dayînê, îdî ewa hey daborî û xemla cîhanê ye. Ewa tiştê li bal Yezdan ji van (tiştê cîhanê) çêtir û mayîtir e. Îdî gelo hûn qe hiş hilnadin?

61; Îdî qey ewê, ku me ji bona wî ra peymana bi qencîyan dabe, ewa bi xweber jî (di roya rabûna hemîti da) rastî (wê qencîya, ku me peymana dana wê dabû) hatibe; wekî wî kesê, ku me ewa di cîhanê da berxwudar kiribe, paşê jî di roya rabûna hemî da (tê girtinê) li bal (avêtina dojê da) amade dibe, dibe?

62; Di we royî da li bal wanê (amadeker da) tê gazîkirin (Yezdan ji wan ra aha) dibeje: "Ka ewan hevriyên, ku we ji bona min ra bi vir digirtin li ku ne?"

63; Ewanê ku şapat li ser wan hatiye maf kirinê hene! Ewan (aha) gotine: "Xudayê me! Ewanê ku me ewan deliqandin ji rêya rast derxitibûn!) ewan evan in. Em ça ji rêya rast derketibûn, me ewan jî, ji rêya rast derxistibûn (loma ewan bibûne peyrewê me). Îdî me dest ji wan şûst em li bal te da zivirîne. Şixwa ewan ji me ra perestî ne dikiribûne (lê ji bona dil xwaşîya xwe ra perestî dikiribûne)."

64; Îdî (Yezdan ji wan ra aha) dibêje: "Ka gazî wan hevriyên xwe bikin." Ewan jî gazî wan hevriyan kirin, îdî ewan (hevriyan) ji bona wan ra bersiv ne dane. (Ewan) di hemberê ku xwe da şapat dîtine (tu dibê qey li bal şapatê bi xweber da hatine gazîkirinê). Gelo çi dibû ku bihatina rêya rast!

65; Di wê royî da (Xudayê wan gazî wan dike (ji wan ra aha) dibeje: "Gelo we bi çi bersiva saîyan dane?"

66; Îdî di wê royî da mijûlî li ber çavê wan wunda dibin (nabînin wê çi bêjin) ewan ji hev jî napirsîn.

67; Îdî kîjan ji kirinê xwe poşman bibe û bawer bike û karê aştî bike, dibe ku ewa (kesa) bibe ji wanê ferestok.

68; (Muhemmed!) Xudayê te çi bivê, ewî diaferîne û ewî hildibijirîne, ji bona wan bi xweber jî qe tu hilbijartin tune ye. Yezdan ji wan (gotinê wan) paqij e û ji hevriyan jî bilind e.

69; Û çi tiştê ku singê wan di xwe da veşêre û ya jî eşkere bike, Xudaê te hey bi wan dizane.

70; Ewa Yezdanê babetê (perestîyî) Yezdan e kî wusa ne, ku ji pêştirê wî tu ilahek (babetê perestîyî) tune ye, di pêş û para da hey sipazî ji bona wî ra ne û berewanî jî hey ji bona wî ra heye. Para zivirandin hey li bal wî da ne.

71; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje "Hûn mêze bikin: heke Yezdan heya roya rabûna hemî şevê li ser we da bihêle, gelo ji pêştirê Yezdan, kîjan Xuda dikarin ji bona we ra ruh naîyî binin? (Ka ji min ra bêjin) hûn qey nabîhîzin?

72; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Gelo hûn mêze nakin, heke Yezdan heya roya rabûna hemî royê li ser we da bihêle, ji pêştirê Yezdan kîjan Xuda dikarin ji bona we ra şevê binin, ku hûn di wê şevê da bihewin? Îdî qey hûn nabînin?

73; Ji bo ku hûn di şevê da bihewin û di royî da jî, ji rûmeta wî rojiyên xwe biqedînin ewî ji dilovanîya xwe şev û ro çê kirîye. Loma bi rastî dibe ku hûn sipazîya (qencîyên) wî bikin.

74; (Di roya rabûna hemî da) ewa gazî wan (filan) dike, îdî (ji wan ra aha) dibêje: "Ka ewan hevriyên ku we bi vir ji min ra çê dikirin, li kêderê ne?"

75; Di we (royî da) em ji hemî koman nehrawanan derdixin, îdî em ji (wan ra aha) dibejin: "Ka (ji bona van perestvanên xwe ra) beratan binin (ku hûn bizanin ewan maf in) ji piştî vî da ewan zanîn, ku maf ji bona Yezdan ra ne û ewan (perestvanên) ku ewan (filan) ji bona Yezdan ra bi vir digirtin, hemî jî li berçavan wunda bûne.

76; Bi rastî Qarûn (bi xweber jî) ji komalê Mûsa bû (kurê apê wî bû). Îdî ewî li ser (Mûsa û peyrewê wî) quretî û pozbilindî kirîye. Me wusa ji bona (Qarûn ra) maldan çê kirîye: zimanê devê xezîneyên wî komeke bi hêz dikarîya hilde. Di gavekî da komalê wî ji bona wî ra (aha) gotîye: "(Qarûn!) tu xwe qure neke, loma bi rastî

Yezdan ji wanê qure ê şa, hez nake

77; Tu bi wî tiştê ku Yezdan daye te, ewra para da bixwaze u tu para xweyê cîhanê jî bîrva neke; ça Yezdan bi te ra qencî kirîye tu jî wusa qencîyan ji bona hewcan ra) bike û tu di zemîn da tevdanî neke, loma bi rastî Yezdan ji tevdanokan hez nake 78; (Qarûn ji wan ra aha) gotîye, "Evan (zengînên hanênan) bi zanîna min ji min ra hatine." Ma qey ewa nizane, ku me di berya wî da di wan çaxên borî da çiqa merivên ji wî maldar û bi hêztir teşqeke kirine? (Di gava teşqekekirinê da) gunehkar ji kirina gonehan nayêne pirsînê.

79; Îdî Qarûn bi xemla xwe va derketîye nava komalê xwe; ewanê jîna cîhanê divan hene! Ewan (aha) gotine: "Xwazîka wekî tiştê ji Qarûn ra hatîye; ji bona me ra jî ewa hebûya. Loma bi rastî Qarûn xwaye para mezin e (ewa bextîyar e)."

80; Ewanê ji bona wan ra zanîn hatîye dayînê hene! Ewan jî (aha) gotine: "Xwelî li we be: Ji bona wanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Qencîya Yezdan ji wan ra çêtir e. Ji pêştirê wanê (ku li ser cefadana di rêya Yezdan da) hew kirine (qe tu kes) nagihêje (wan qencîyan)."

81; Îdî paşê me (Qarûn) û bi mal û xênîyên wî va di zemîn da xiste xarê, ji pêştirê Yezdan, ji bona Qarûn ra qe tu komeke xurte, ku ewî ê malê wî ji teşqeke bide para da tunebû. Şixwa ewî bi xweber jî nikarbûye arîkarîya xwe bike.

82; Ewanê, ku duhe dixwastin bikebine şûna Qarûn hene! Ewan jî (gava dîtine, ku aha hatîye serê (Qarûn) gotine: "Ax! Erê wusa ne, Yezdan ji kêjan bendeyên xwe ra bîvê, mal dide wan û ji kîjanan ra jî nevê mal nade wan. Heke Yezdan bi me qencî ne kiribûya wê em jî bixistina zemîn. Ax wusa ne! Bi rastî file serfiraz nabin."

83; Ewa ewra para da heye! Em ewê hey ji bona wanê, ku navên di zemîn da tevdanî û quretî bikin, dixne ewirgeh. Şixwa encama para ji bona Xuda parizane.

84; Kîjan bi qencîyan va (li bal me da) hatibe, îdî ji bona wî ra ji wan (qencîyên, ku ewî anîne) qencîyên çêtir hene. Kîjan bi sikatîyan (li bal me da) hatibe, îdî ewanê sikatî kirine hene! Ewan hey bi tiştê kirine tene celatkirinê.

85; (Muhemmed!) Bi rastî ewê ku Qur'an li ser te da (hinartîye û xwundina wê) li ser te bi vê nevê kirîye heye! Ewa (Xudaê te ye) wê te li bal wî cîyî (ji te ra hatîye peymandanê) behere. (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Bi rastî Xudayê min, ka kîjan bi beledî hatîye hatîye û ka kîjan di rê wundabûneke xwuyan da ne, çêtir dizane."

86; Îdî (Muhemmed!) tu ji bona filan ra nebe piştevan, loma te bi xweber guman ne fikir, ku wê pirtûkê (di jor da) li bal te da bê berdanê. (Hinartina vê pirtûkê) hey dilovîneke ji Xudayê te ye.

87; Ji piştî, ku beratên Yezdan li bal te da hatine hinartinê, bira ewan (filan) te ji xwundina wê nedine para da, tu ewan (filan) li bal Xudayê xwe da gazî bike. (Muhemmed!) Tu qe nebe ji wanê hevriçêker.

88; Û tu bi perestîya Yezdan ra, perestîya tu Xuda ne maî neke, loma ji pêştirê wî qe tu Xuda tune ne. Hemî tiştê ji pêştirê Yezdan wê teşqeke bibin, hey berewanî ji bona wî ra ne; hûnê (dawayê da) hey li bal wî da bizivirin.

## Chapter 29 (Sura 29)

1; E.L.M. (Arşa van tîpên ji hevçûî hey Yezdan dizane).

2; Qey meriv guman dikin, ku bêjin: "Me bawer kir" qe neyêne ceribandîne, dest ji wan bê berdanê?

3; Bi sond! Ewanê berya wan da borîne hene! Îdî bi rastî ji bo ku em bi rastgo û vîrekê wan bizanin, me ewan jî ceribandine.

4; Qey ewanê ku sikatîyan dikin, guman dikin wê ji me biborin, îdî (em nikaribin ji wan ra şapatan bidin)? Berawanîya ku ewan dikin çiqa sik e!

5; Kîjan gumana hatina bal Yezdan da bike, îdî bi rastî danê gîhîjtina Yezdan tê. Şixwa ewa bi xweber jî bihistekê pir zana ye.

6; Kîjan (di rêya Yezdan da ji bona xwaşîya canê xwe) tekoşînê bike, şixwe ewa ji bona xwe ra tekoşînê dike. Loma bi rastî Yezdan ji hemî cîhanê bê perwa ye.

7; Ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Emê sikatîyên wan rakîn ji wî tiştê, ku ewan dikiribûne, hêj rindtir xelata wan bidin.

8; Me meriv şîret kirine, ku bi da û bavê xwe ra qencîyan bikin. Heke dê û bav tekoşînê bikin bi te ra: Ji bo ku tu ji min ra tiştê qe zanîna te bi wî tune ye. Bixî hevri, îdî tu bi gotina wan neke. Loma para hatina we hemû li bal min da ne,

îdî ji piştî gava hatine bal min, tiştê we kiribû, ezê ji bona we ra bêjim.

9; Ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Emê ewan bixne nava aştîkaran.

10; Hinek ji kesan hene, dibêjin: "Me bi Yezdan bawer kirîye" îdî ji piştî ku di rêya Yezdan da tê cefadanê wusa dibe, cefadana merivan wekî şapata Yezdan digire. Heke arîkareyek ji Xudayê te (ji bona we ra) hatibe, ewan (aha) dibêjin, "Bi sond! Em jî bi we ra bûn," tu dibê qey Yezdan bi wan tiştê di singê hemî kesan da heye, jî wan çêtir nizane?

11; Bi rastî Yezdan bi wanê bawer kirine û bi wanê durê jî çêtir dizane.

12; Ewan ê file hene! Ji bona wanê bawer kirine ra (aha) gotine: "Hûn werin bibine peyrewê me, emê xeletiyên we yên (heya niha) hildine ser xwe. Ewan (filan) qe tu tiştî ji xeletiyên wan hilnadin. Loma bi rastî ewan viran dikin.

13; Ewan (filan) wê barê xwe hildin û bi barê xwe va jî wê barê wanê, ku ewan ewanan (ji rêya rast derxistine) hildin û wê ewan di roya rabûna hemî da jî, ji pizne kirinê bêne pirsînê.

14; Bi sond! Me Nûh li bal komalê wî da bi saîtî şandîye. Îdî (Nûh) di nava wan da heya nehse û pêncê salî maye, (li wan şîret kirîye; ewan jî bi gotina Nûh ne kirine). Îdî paşê lêmiştê ewan di nava xwe da girtin, loma ewan cewrkar bûn.

15; Paşê me Nûh û hevalên wî yên kêlekê fereste kirin û me eva (ferestîya) ji bona cêhanê ra xistîye berateke (derhoze).

16; Me Îbrahîm jî (li bal komalê wî da şandîye). Ewî ji bona komalê xwe ra (aha) gotîye, "Hûn gelî komalê min! Ji bona Yezdan ra perestî bikin û hûn yezdanparizî bikin. Heke hûn bizanin, ewa ji bona we ra qenctir e."

17; "Ewan tiştên ku hûn ji pêştirê Yezdan ji wan ra perestî dikin hene! Ewan hinek tokel in, hûn bi vir (ewan Xuda û Mehder) digirin. Bi rastî ewan tiştên ku hûn ji pêştirê Yezdan ji wan ra perestî dikin hene! Ewanan ji bona we ra qe tu rojînî nadin. Îdî hûn li bal Yezdan li rojîniyê bigerin û hûn hey perestîya wî bi tenê bikin û ji bona wî ra sipasî bikin. Hûnê hey li bal wî da bizivirin."

18; (Îbrahîm) heke (tu ji aliyê komalê xwe da) bê derewdêrandinê, bi sond! hinek komê berya we da jî (pêxemberê xwe) dan derewdêrandinê. Li ser saîyan hey têgihandina xwûyaî heye.

19; Ma qey ewanan nabînin, Yezdan di cara yekem da ça heyî afirandine, paşê jî ça ewan difetilîne? Bi rastî eva kirina li ser Yezdan hêsan e.

20; (Îbrahîm! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Hûn (Gelî merivan) di zemîn da bigerin, îdî hûn mêze bikin, ka di cara yekem da afirandin ça hatiye kirinê, paşê (Yezdan) cara dawiyê jî diaferîne. Bi rastî Yezdan li ser hemî tiştan dişî.

21; Yezdan ji kê ra bivê, ewî şapat dike, ji kê ra jî bivê, li wî dilovanî dike û hûnê hemî jî li bal wî da bizivirin.

22; (Gelî merivan!) hûn di zemîn û ezman da nikarin ewî ji şapatdanê bêzar bikin. Ji bona we bi xweber jî, ji pêştirê wî qe tu serkar û arîkar tune ye.

23; Ewanê bi beratên Yezdan û bi rasthatina wîye (di dane para da) bûne file hene! ewanan ji dilovanîya min bê hevî mane. Ji bona wan ra şapateke dilsoz heye.

24; Îdî bersiva komalê (Îbrahîm ji bona wî ra) hey eva bûye: (ji hev ra aha) gotine: "Hûn (gelî me!) Îbrahîm bikujin, yann jî ewî bişewitînin." Îdî (ji piştî ku ewan Îbrahîm avête agir) Yezdan ewî ji agir fereste kirîye. Bi rastî ji bona komalê ku bawer dikin (di van bûyeran da) beratên (derhoze) hene.

25; Û (Îbrahîm ji bona komalê xwe ra aha) gotîye: "Hûn ji bona hezkirina xweye, jîna cîhanî di nava xwe da hunek tokelan ji pêştirê Yezdan, ji xwe ra perestvan digirin. Paşê di roya rabûna hemû da jî hinekên we bi hinekên ji we dibine file û hinekên we li hinekên we deherandinê dikin. Şixwa şûna fetla we bi xweber jî agir e, ji bona we ra qe tu arîkar tune ne.

26; Paşê Lût (bi Îbrahîm) bawer kirîye. (Îbrahîm ji bona komalê xwe ra aha) gotîye: "(Gelî min!) ew zemînê Xuda ê min (fermana min li bal çûna wura kirîye) ezê herim wura. Bi rastî ew (Xuda) servahatê bijejke ye."

27; Û me ji bona (Îbrahîm) ra Îshaq û Ye'qûb raber kirîye, me pêxemberî û (hinartina) pirtûkê di ûrta wî da bi cîh kirîye û me kirya (Îbrahîm) di cîhane da daye wî, bi rastî ewa di para da jî, ji aştîkaran e.

28; Me Lût jî (li bal komalê wî da şandîye). Ewî di gavekî da (ji bona komalê xwe ra aha) gotîye: "Gelî min! hûn tiûtê sikê wusa dikin, ku di cîhanê da kesekî berya we da qe ewa tiştê ne kirîye."

29; "Hûn ça (ji jinan dihêlin) hûn rêya dibirin tûşê mêran dibin. Hûn di civatê xwe da tiûtên pir sik dibêjin!" Komalê (Lût) ji bona wî ra hey (aha) bersiv dane û gotine: "Heke bi rastî tu rast î, ka ji me ra şapata Yezdan bîne."

30; (Lût aha lava kirîye) gotîye: "Xudayê min! tu arikariya min li ser komalê tevdanok bike."

31; Gava saîyên me li bal îbrahîm da hatine (ji bona wî ra aha) gotine: "Bi rastî emê rûniştîyên vî weletê teşqeले bikin. Loma bi rastî rûniştîyên wî cewrkar bûne."

32; (îbrahîm bisyara wan aha daye û) gotîye: "Bi rastî di nava gundiyan da Lût (bi xweber jî heye, hûnê ça ewan teşqeले bikin?" Saîyan bersiva îbrahîm dane û) gotine: "Kê di wura da heye, em bi wan çêtir dizanin. Emê (Lût) û malîyên wî, hemîşkan ji teşqeले fereste bikin; ji pêştirê jina wî. Loma bi rastî jina wî bi xweber jî di nava wanê bûne toz da maye."

33; Gava saîyên me li bal Lût da hatine, bi sedema hatina wan, Lût sik bû û destê xwe li berhev da kirîye mat maye (Loma ewan saîyan di diliqê xortên bedewê wusa da hatibûne mēzekerê xwe, ji xwe ra dixistine bengî." Lût ji komalê xweî sik tirsîya, ku ewan tişteki bi serê wan saîyan bikin. Ewan saîyan ji bona Lût ra aha) gotine: "Lût! Tu netirse û miruzê xwe jî neke, loma bi rastî emê te û malîyên te ji vê teşqeले fereste bikin, ji pêştirê jina te. Loma bi rastî ewa (jina te) di nava wanê bûne toz, da maye."

34; "Emê li ser rûniştîyên vî gundi da, bi sedema, ku ewan ji re derketibûn; ji ezmanan da şapateki bihênirin."

35; Bi sond! Me ji bona komalê, ku hişê xwe dixebitînin beratên xwûyaî, ji wan hiştine.

36; Me li bal (komalê bajarê) Medyenê jî birayê wan ê Şu'eyb bi saîtî şandiye. Îdî (Şu'eyb ji wan ra) aha gotîye: "Gelî min! Hûn hey ji Yezdan ra perestî bikin û hûn hey hêviya roya para da bikin û hûn di zemîn da bi tevdanî digerin."

37; Îdî ewan (Şu'eyb) dane derewdêrandinê, paş da lerzeke wusa bi wan girt, îdî ewan di xaniyan da li ser çokan ketine, di şûna xwe da mane.

38; û me Ad û Semûd jî (teşqeले) kirine û bi sond! Şûnwarê wan ji bona we ra xwûya ne. (Sedema teşqeला wan eva ye), "pelîd ji bona wan ra kirinê wan xemilandîye, îdî (pelîd) rêya rast ji ber wan girtiye, lê ewan bi xweber jî rispî bûne (di karyan ji wan beratên berya xwe hiş hildanan).

39; Me Qarûn û Fir'awn û Haman jî (teşqeले) kirine. Bi sond! Mûsa bi beratên hizwartî va hatibûye bal wan, îdî ewan (bi beratên me bawer ne kirine ewan di zemîn da quretî dikirin. Ewan ji me naborin (ku em nikaribin ji wan ra şapatê bidin).

40; Me her yekê ji wan bi gonehê wan dane girtinê. Îdî me hinekên ji wan babelîzk bi ser wan da şandiye, ewan (bi wê teşqeले kirîye) û hinekên ji wan dengê teyrokê ewan girtin (ewan bi wî dengî me teşqeले kirîye) û hinekên wan jî me ewan di zemîn da xistine xarê (me ewan jî wusa teşqeले kirin) me hinekên wan jî di avê da fetisandin (ewan jî wusa hatine teşqeलेkirinê). Yezdan li wan cewr ne kirîye, le ewan bi xweber li xwe cewr kirine (loma hatine teşqeलेkirinê).

41; Ewanê ku ji pêştirê Yezdan ji bona xwe ra serkaran digirin hene! Hecwekiya wan wekî we pîrhevoka, ku ji bona xwe ra xaniyekî ava dike (wusa bê wece). Bi rastî xaniyê pîrhevokê bê wecê xaniyan e, xwazîka ewan bi zaniyan (ka kirina wan ça ne)!

42; Bi rastî ka ewan ji pêştirê Yezdan ji çira perestî dikin, Yezdan pê dizane, loma Yezdan bi xweber servahatê bijejke ye.

43; Em evan hecwekiyan ji bona kesan ra vedikin. Lê ji pêştirê zanan tu kes ji van hiş hilnade (loma naponijin).

44; Yezdan ezman û zemîn bi mafî afirandiye. Ji bona bawerkeran ra di vê afirandinê da beratên derhoze hene.

45; (Muhemmed!) Ji pirtûkê çî li bal te da hatiye hinartinê, tu ewî bixwûne û tu (ça hatî fermankirinê wusa) nimêj bike. Loma bi rastî nimêj (kesan) ji sikatî û ji gonehan diparisîne. Şixwa bîranîna Yezdan ji hemî perestîyan meztir e. û hûn çî pêşe bikin şixwa Yezdan bi wî dizane.

46; û hûn (gelî bawerkeran!) bi xwaî pirtûka ra bi qencê tekoşinan va, tekoşinê bikin. Ji pêştirê wan (xwaî pirtûkên) cewrkar, hûn (ji wanê xwaî pirtûk ra aha) bêjin: "Çi tiştê li bal me û li bal we da hatiye hinartinê, em bi wî bawer dikin. û Xudayê me û Xudayê we yek e, me ji bona wî ra xwe hispartîye (hey em ji wî ra perestî dikin).

47; Me li bal te da pirtûkeke wusa hinartîye (ewa bi xweber jî rastîya wan pirtûkê berya wê da hatine hinartinê di der e) ewanê, ku me ji wan ra pirtûk daye hene! Bi vê pirtûka (ku me li bal te da hinartîye) bawer dikin. Ji van (ereban jî) ewê bi vê (pirtûkê) bawer dikin hene. Ji pêştirê filan tu kes beratên me (bi fileti) venaşêrin.

48; (Muhemmed!) Te di berya (Qur'anê da) qe tu pirtûk (nikarbû) bixwunda û te bi destê xwe yê rastê jî qe tu pirtûkek (nikaribû) binivîsanda, heke te (ewan xwundin û nivîsandin bikarbûya bikira) wê gavê ewanê, ku (ji bona) pûçaya (Qur'anê) xebatê dikin hene! Wê di rastîya (Qur'anê da) dudil bibûnan.

49; (Gotina wan filan nîne) lê ewa (Qur'ana) hinek beratên hizwartîne; di singê wanê, ku zanîn ji bona wan ra hatîye dayînê (di çûwule) maye. Ji pêştirê cewrkaran qe tu kes beratên me (bi fileti) venaşêrin.

50; Ewan (filan ji hev ra aha) gotine: "Heke Ji Xudayê (Muhemmed) li ser wî da hinek beratên (derhoze, ça ji Mûsa ra hatine hinartinê hatibûya hinartinê (dibû ku me jî bi wî bawer bikira". Muhammed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: "Bi rastî beratên (derhoze) hey li bal Yezdan in. Ez bi xweber jî li ber çavan hey hişyarvanek im."

51; Ma qey ewa pirtûka, ku me li ser te da hinartîye, tu jî ji wan ra (bi beratî) dixwunî, têra wana nake (ewan beratên maî ji te dixwazin)? Bi rastî ji bona komalê bawer kirine, di vê (Qur'anê da) dilovîn û bîrxistineke (bê paşî heye).

52; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Di nava min û we da Yezdan bi nihrevanî bes e. Loma Yezdan bi hemî tiştê di ezman û zemîn da heyî dizane. Ewanê bi pûçan bawer dikin û bi Yezdan jî fileti dikin hene! Ewanê zîyan kirine evan bi xweber in.

53; Ewan ji te leza hatina şapatan dikin; heke danê hatina şapatê (ne hatibûya) diyarkirinê, wê heman naha ji wan ra bihata. Û bi sond! Qe haja wan tunebe wê şapatê nişkê va bi wan da were.

54; Dojê ewan filan bi xweber hildane nava xwe da, hêj ewan ji te leza hatina şapatê dikin.

55; Di roya ku şapat ji jora wan da û ji binê pê wan da, ewan diniximîne (Yezdan ji wan ra aha) dibêje. "Tiştê we dikiribû, hûn çeşna wê bikin (ka ça ne?).

56; Gelî ewan bendeyên me yên ku we bawer kirîye! ( Heke hûn nikaribin di bingaha xwe da ji bona min ra perestî bikin) îdî bi rastî zemînê min fire ye (ji bo ku hûn) ji bona min bi tenê ra perestî bikin (hûn koçê cîhê maî bikin).

57; Hemî candarê, we çeşna mirinê bikin. Paşê wê li bal me da bêne zivirandinê.

58; Ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Emê ewan di avaiyên bilind ê bihiştê da, ku dibinê wan da çem dikişin bi cîh bikin. Ewanan di wan avaiyan da her dimînin. Kirya xebatkaran çîqa qenc e!

59; Ewan (xebatkar hene!) li ser (cafadana di rêya Yezdan da) hew dikin û xwe hispartine ser Xudayê xwe.

60; Çîqa candar hene, ku nikarin bi xweber rozînîya xwe pêk bînin! Yezdan rojîna wan û rojîna we jî dide. Loma bi rastî ewa bi xweber pir bihistokê pir zana ye.

61; Heke tu ji wan bipirsî: "Gelo kê ezman û zemîn afirandîye û kê roj û hîv (ji bona kara heyana) sernerm kirîye (di fermana wan da dixebitin)?" Ewanê bi rastî (bersiva te aha bidin û) bibêjin: "Hemî jî Yezdan kirîye." Lê îja ka ewan ça (ji perestîya wî rû difetilînin?

62; Yezdan ji bendeyên xwe, ji kê ra bivê rojîna wî pir dike, ji kê ra jî bivê rojîna wî kêmkirî dike. Loma bi rastî Yezdan bi hemî tiştî dizane.

63; Heke tu ji wan bipirsî: "Gelo ke avan ji ezmanan da dihênirîne, îdî ji piştî mirina zemîn, ewê zemîn bi wê avê zende dike kê ye? Ewanê (bersiva te aha bidin û) wê bêjin, "Ewê (van tiştan dike) ewa Yezdan e." Tu ji wan ra (aha) bêje: "Sipazî hemî ji bona Yezdan ra ne." Ê pirê wan (ji van beratan) hiş hilnadin.

64; Jîna vê cîhanê hey leyîztik û dilxwastinek e. Loma bi rastî jîna rast hey jîna avaiyî para da ye. Xwazîka ewan bi zanînan.

65; Îdî gava ewan (filan) sîyarê kelekan dibin, ji tirsan gazî Yezdan dikin (bawer dikin) ku ol, xwurî hey ji bona wî ra ne. Gava bi serfîrazî têne reşaiyê, dîsa ji bona wî ra hevriyan çê dikin.

66; (Ewan aha dikin); ji bo ku nonkorîya qencîyên me bikin û ji wan qencîyan berxwudarî bibin (me ji bîrva bikin). Îdî ewanê di nêzik da bi kirinê xwe bizanin.

67; Ma qey (ewan komalê bajar yê Mekke) nabînin; ku me ji bona wan ra (Mekke) xistîye şûna qedexan (tu kes) tê da nayên kuştinê lê di wan (bajarê) dora wan da

bêwec dihatine herçiqandinê? Ma qey ewan (Mekkîyan) bi tiştê pûç bawer dikin û nonkorya qencîyên Yezdan dikin?

68; Gelo ji wanê ku viran li ser navê Yezdan dikin û gava maf ji wan ra hatibe, ewan maf dabine derewdêrandinê, cewrkartir kê heye? Ma qey di dojê da ji bona filan ra cîhek tune ye?

69; Ewanê ji bona me ra tekoşîn (bi nonkoran ra) kirine hene! Bi rastî emê ewan bîne rêya xwe ya rast. Û loma bi rastî Yezdan bi qencîkaran ra ne.

#### Chapter 30 (Sura 30)

1; E.L.M. (Arşa van tîpên ji hevçûî her Yezdan dizane).

2; (Komalê) Rûmê (di hemberê îranîyan da) sernugûn bûn.

3; Di zemînê nêzikê (ereban da) ewan (rûmîyan) wê ji piştê sernugûniya xwe, di nêzik da serva werin.

4; Ewa (servahatina wan, di van) çend salê (para da tîn wê bibe). Ferman; di pêş û paş da jî hey ji bona Yezdan ra ne. Di wê roya (servahatina rûmîyan) we bawerkerê şa bibin.

5; (Bawerker) bi arîkirina Yezdan (şa dibin). Yezdan (ji bo) kîjanî ra bivê, arîkariya wî dike. Şixwa Yezdan bi xweber jî servahatê dilovîn e.

6; (Eva servahatina rûmîyan) peymana Yezdan e. Yezdan ji peymana xwe para nakebe, û lê pirê kesan bi vî nizanin.

7; (Meriv) ji cîhanê hey jîna xwûyaî dizanin. Ewan bi xweber jî ji (jîna) para da bê guman in.

8; Ma qey ewan di nava xwe da raman nakin, ku Yezdan ezman û zemîn û çî tiştê di nava wan herdukan da heyî, hey bi mafî afirandîye û (ji bona hebûna wan jî) danekî navdaî gerandîye? Lê pirê ji kesan (di danê para da) bi rast hatina Xudayê xwe bawer nakin.

9; Ma qey ewan di zemîn da nagerin, ku mêze bikin ka encama wanê berya wan da borî çî bûye? (Ewanê berya wan da hebûne) hêj ji wanê naha bi hêztir bûne. Loma ewan di zemîn da (cuhê avan û karxaneyên madenan bi vekirî ava kirine û zevî çandine û dar çikandine) û xênîyî ji van çêtir ava kiribûne. Saîyên wan jî bi beratên hizwartî va hatibûne bal wan (ewan jî wekî wê bi gotina wan saîyan ne dikiribûne. Yezdan ji bona wan ra şapat daye). Îdî Yezdan li wan cewr ne kirîye, lê ewan bi xweber li xwe cewr kirine.

10; Paşê ewanê sîkatî kirine hene! Bi sedema ku ewan beratên Yezdan didane derewdêrandinê û bi wan beratan tinaz dikiribûne, şûna wan sikê şûnan e.

11; Di cara yekem da Yezdan afirandin çê kirîye, paşê (ji piştî mirinê Yezdan) ewan radike, paşê hûnê li bal wî da bîne fetilandinê.

12; Di roya, ku hemî radibin; gonehkar bê deng şûna xwe da dimînin.

13; Ji bona wan (gonehkar) ji wan hevriyên, ku ewan (ji bona Yezdan ra çê dikin) qe tu mehderî çênabe. Ewan (di wê gavê da) bi wan hevriyan dibine file.

14; Di roya ku hemî radibin, di wê royî da (bawerker û file) ji hev radiqetin.

15; Îdî ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Ewanan di bihiştî (gul û sosinan da) berxwudar dibin.

16; Lê ewanê bûne file û beratê û rasthatina para da dane derewdêrandinê hene! Evan jî di şapatê da tîne amadekirinê.

17; Îdî di gava evar û sibehe da (hûn) Yezdan (ji kemaîyan) paqij bikin.

18; Di ezman û zemîn da hemî sipazî ji bona wî ra ne. Di êvar û di gava hûn dikebine nîvro da jî.

19; (Yezdan) zindîyan ji mirîyan derdixe û mirîyan jî ji zindîyan derdixe û ji piştî mirin û (hişkaya) zemîn, dîsa zemîn jî zende dike. Hûn jî (gelî merivan!) wusa (bi mirin û zendetî ji hev) derdikebin.

20; Ji berate (şîn û hez û hebûna Yezdan e, ku ewî hûn) ji xwelîyê afirandine, paşê di gavekî da hûn bûne meriv (li ser zemîn) belav bûne.

21; Û ji beratên (şîn û hez û hebûna Yezdan e, ku ewî) ji bona we ra, ji we bi xweber zone we afirandîye. Ewî di nava we (zoyan da) hezkirin çê kirîye, ji bo ku hûn li bal hev hew bikin. Bi rastî di van (afirandinan da) ji bona komalên raman dikin berateên (derhoze) hene.

22; Û afirandina ezman û zemîn û ne wekhevbûna ziman û rengên we bi (xweber jî) beratên (şîn û hêz û hebûna Yezdan in). Ji bona zanan (û cîhanê) di van (kirinan



da) beratên (derhoze) hene.

23; Û nivîstina we ye di şevan da û (xwastina we ye, ku hûn) ji rûmeta wî rojî û jînê di royê da dixwazin, beratên (şîn û hêz û hebûna Yezdan in). Bi rastî ji bona komalên dibêhên, di van da beratên (derhoze) hene.

24; Û avêtina berqetavê, ku (Yezdan) berqatavê bi tirsî (ji teyrokê) û dilxwazîya (şilî barandinê) bi we dide dîtî, beratên (şîn û hêz û hebûna Yezdan e). Ewa ji ezmanan aveke wusa dihênirî, îdî ji piştî mirin û (hişkaya zemîn) Yezdan ewî ( zemînî bi wê avê zende dike. Bi rastî ji bona wan komalên, ku hişê xwe dixebitînin di van da beratên (derhoze) hene.

25; Ji beratên (şîn û hêz û hebûna Yezdan e) ku ezman û zemîn bi fermana wî bi hewyaî mane. Paşê gava carekî bi tenê ewa gazî we dike, hûn ji zemîn nişke va (bi zendetî) derdikebin.

26; Çi kesên di ezman û zemîn da hene! Hemî ji bona Yezdan ra ne. Hemî jî ji bona wî ra sitûxar in.

27; Ewê di cara yekem da heyî afirandine heye! Ewa (Yezdan) bi xweber e paşê ewa ewê (afirandina xwe) difetilîne hêj nû da diafirîne. Ewa (nû afirandin) ji (afirandina cara yekem da) li ser wî hêsantir e. Di ezman û zemîn da salixê bilind hey ji bona wî ra ne. Şixwa servahatê bijejkê ewa bi xweber e.

28; Ji bona we ra, ji we bi xweber jî hecwekîyek heye (di wî da jî beratên jîn û şîna hebûna Yezdan he ne). Ka (mêze bikin) gava ji bona we ra bendekî binê destê we da hebe; ewa benda bi xweber jî di rojîna we da hempar be (ça jî hûn hemî di rojînan da) wekî hev hempar in, hûn ji tirsî (yek bi mafê yekê maî ra) nêzîk nabe (heryek ji hev ra rûmetdar in). Şixwa ji têkilîya mafê hev, hûn wekî (pûçbûna) mafê xwe ditirsîyan (hûn ewan ji xwa ra naxîne hempar, ça hûn bendeyên min ji bona min ra dixne hevriî û hempar?) bi vî awayî em ji bona komalên ku hişê xwe dixebitînin, beratên ji hev derdixin.

29; Na (wekî kirina wan) nîne, lê ewanê cewr kirine hene! Bê zanîn bûne peyrewê hewasa xwe. Gelo ewê ku Yezdan ji rêya rast derxistibe, kesek dikare beledîya wî bike? Ji bona vanê bi van salixan hatine salixkirinê, qe tu arîkar jî tune ne.

30; (Muhemmed!) Tu îdî berê xwe li bal wê ola rast da bide. Ewa (ola) afirandina Yezdan e, ku meriv li ser wê olê afirandine. Ji bona afirandina Yezdan qe tu guhurandin tune ye, ola rast eva ye. Lê pirên kesan pê nizanin.

31; Hûn (gelî kesan!) li bal wî da bizivirin û hey parîsîya wî bibikin (ji wî bitirsîn). Hûn (ji bona wî ra) nimêj bikin û nebîne ji wanê hevriçêker.

32; Ewanê (hevriçêker hene!) ewanan ola xwe ji hev raqetandine, ewan (paşê) bûne hînek (partî û) kom mane. Her partîk bi para li bal wan heyî şa dibin (ku para wan rast e).

33; Gava nexwaşîk bi merivan bigire (ji bona feletbûna xwe) bi dilekî vala li bal (Yezdan da) dizivirin gazî wî Xudayê xwe dikin. Paşê (gava Xudayê wan) dilovîneke ji xwe bi wan dide çeşnekirinê (dîsa) nişkê va destekî ji wan, hevriyan ji Xudayê xwe ra çê dikin.

34; (Ewa desta wusa dike) ji bo ku ewan nonkorîya wan qencîyên me ji wan ra daye bikin. Îdî hûn berxwudar bin, hûnê di nêzîk da bizanin (ka encama we ewê ça bibe).

35; Ya jî qey me bi ser wan da hînek nişanên bi hêz hinartine (ku ewan ji bona Yezdan ra hevriyan çê bikin). Îdî ewan jî bi sedema wan nişanan (bi rastîya wan hevriyan) diaxivin?

36; Û di gava ku em bi merivan dilovînekî bidine çeşnekirinê, îdî meriv bi wê dilovîniyê şa dibin. Heke sikatîyek bi sedema keda destê wan kirî bi wan da hatibe, di wê gavê da bê hevî dibin.

37; Ma qey ewan nabînin, ku bi rastî Yezdan; rojînan ji bona kîjan ra bivê pir dike û ji kîjana ra jî bivê kêr dike? Bi rastî ji bona komalekî bawer kiribe di van (bûyeran da) beratên (derhoze) hene.

38; Îdî tu ji bona pismam û belengaz û rewîyê rêyan mafê wan ê (rojîni) bide wan. Eva (maf dayîna hanê) ji bona wanê, ku hey qayîlbûna Yezdan va ne, qencîr e. Ewan bi xweber jî felat bûne.

39; Ji bo ku malê merivan pir be, hûn çiqî serpaîyan (riba) bidin, ewa li bal Yezdan hey pir nabe. Û hûn ji baca malê xwe, ji bona qayîlbûna Yezdan (ji hewcan ra) çî bidin, îdî ewa (mal û qencî li bal wî) car bi car pir dibe.

40; Ew ê hûn afirandine û paşê ji bona we ra rojî daye û paşê we dîmirîne û paşê;

we dijîne heye! Ewa Yezdan e. Gelo di nava hevriyên we da yekê ku tiştêkî ji vanê borî bike heye? Yezdan ji van hevriyên we paqij û bilind e.

41; Bi sedema ku merivan bi destê xwe (goneh) ked kirine, tevdanî di reşai û deryayê da xwûya bûye, dibe ku ewan (ji kirinê xwe) para da bizivirin (Yezdan) hinek ji kirinê wan bi wan daye çeşnekirinê.

42; (Muhemmed! Tu ji wan ra aha) bêje: "Hûn (gelî Mekkiyan!) di zemîn da bigerin; îdî hûn mêze bikin ka encama wanê berya we da borîne ça bûye!" Pirê wan bi xweber jî hevriçêker bûne.

43; Îdî hêj di berya ku roya ji (şapata) Yezdan tu kes nikare merivan bide para da, tu rûyî xwe ji bona ola Yezdan e rast ra bizivirîne. Di wê royê da (meriv) ji hev radiqetin.

44; Kîjan bûbe file, îdî filetiya wî ji bona wî ra ne, kîjan karê aştî bike, îdî ewa ji bona xwe ra hêlanan çê dîkin.

45; (Ji ber vî meriv bûne du destê): Ewanê bawer kirine û karê aştî kirine ewa ji rûmeta xwe ji bona wan ra (xelatan) dide. Ewanê bûne file jî bi rastî ewa ji wan hez nake.

46; Û ji beratên (şîn û hêz û hebûna Yezdan in) ji bo ku ewa bi we dilovanîya xwe bide çeşnekirinê û ji bo ku kelek bi fermana wî (bi wî baî di deryayê da) bikişê û ji bo ku hûn (hewceyên xwe) bi rûmeta wî (pêk bînin) ewa ewî baî bi mizgînanî dişîne. Û dibe ku hûn sipazîya wî bikin.

47; Bi sond (Muhemmed!) me di berya te da saî li bal komalê wan da şandine, îdî ewan saîyan (bi beratên) hizwartî va li bal wan da hatine; ewanê gohdarya wan saîyan ne kirine, goneh kirine hene! Me ji wan tol hildaye. Loma bi rastî arîkarya bawerkeran li ser me maf bûye.

48; Ewê ku bayê dişîne, îdî ewa baya jî ewran radike, paşê ewa bi vîna xwe ewan (ewran) jor da belâ dike û par par dike, îdî tu dibînî ku baran di nava wan ewran da derdikebe, heye! Ewa Yezdan e. Îdî gava Yezdan ewê baranê bi ser bendeyên xwe yê, ku vaye ji wan ra bibarîne, barandîye; ewan nişke va (bihatîna baranê) şa bûne.

49; Ewan (bendan) hêj berya ku (baran bi ser wan da ne barîbû) ji hinartîna baranê bê hêvî bûn.

50; Îdî (Muhemmed!) tu li bal rêça dilovanîya Yezdan mêze bike, ka zemîn ji piştî mirîna (xwe ya hişkaî) ça (bi hêşînaî) zende kirîye? Loma bi rastî Yezdan mirîya jî wusa zende dike. Şixwa Yezdan li ser hemî tiştî bi hêz e.

51; Bi sond! Heke em bayekî bişînin (ewa baya rengê çandinîyên wan zer bike) ewan jî (çandinîyên xwe) zer bibînin, ewanê ji piştî vê (zeraya çandinîyên xwe) wê nonkorîya qencîyên me bikin û (wekî mirîyan) bîmînin.

52; Îdî tu jî bi rastî nikarî bi mirîyan bidî guhdarîkirinê, gava ker pişta xwe bidinê herin, tu nikarî bi wan bidî bihistinê.

53; Û tu nikarî koran jî ji re wundabûna wan bînî rêya rast. Tu hey dikarî ewanê bi beratên me bawer kirine (şîretan) bidî bihistinê. Îdî şixwa ewan bi xweber jî Misilman bûne.

54; Ew ê ku hûn ji (nişayeke) bê wec afirandîye heye! Ewa Yezdan e, ewî ji piştî bê wecyî (ji bona we ra) hêz daye: Paşê ji piştî hêzê ewî hûn bê wec kirine û hûn kal kirine. Ewa çi bivê diafirîne. Loma ewa pirzanê pir bi şî ye.

55; Roya ku danê rabûna hemîti tê, gonehkar sond dixwun, ku (di cîhanê da) hey danekî bi tenê mane. Şixwa ewan (di cîhanê da jî) wusa vir dikiribûne.

56; Ewanê ku ji wan ra zanîn û bawerî hatiye dayînê hene! Ewan (aha) gotine: "Bi sond! Di pirtûka Yezdan da, heya roya rabûna hemî da hûn mane. Îdî eva roya (bi xweber jî) roya rabûna hemî ye (hûn tê da hatine şandinê) lê hûn bi wê nizanin."

57; Îdî di wê royê da Tatê cewrkaran qe kêrê wan nayê, guhdarya mijûlya wan jî nayê kirinê.

58; Bi sond! Me di vê Qur'anê da ji bona merivan ji hemî hecwekiyan vekirîye. Heke tu beratekî ji bona wan ra bînî, ewanê bûne file hene! (aha) dibejin: "Evan (beratan) hey hinek (rêzikên) pûçkar in (tu ewan tîni ji bo ku tu rê û rêzikê bav û kalê me bi wan pûç bikî)."

59; Bi vî awayî Yezdan li ser dilê wanê nezan duruf dike.

60; Îdî (Muhemmed! Tu li ser cefadana wan) hew bike, loma bi rastî peymana Yezdan maf e. Ewanê ku bi jîna para bawer nakin hene! Bira (kirinê wan) te (ji doza te) bi sivikaî (para nedin).

## Chapter 31 (Sura 31)

1; E.L.M. (Arşa van tîpên ji hevçûî hey Yezdan dizane).

2; Evanan beratên Pirtûk a bijejke ne.

3; (Evan beratên) ji bona qencîkaran beledî û dilovanîyeke (me hinartîye).

4; Ewanê nimeja xwe dikin û baca malê xwe didin hene! (qencîkar ew in). Ewanan bi danê para da jî di nêzîk da bawer dikin.

5; Ewanê ku li ser beledîya jî Xudayê xwe ne, evanan in. Evan bi xweber jî serfiraz bûne.

6; Hinek ji merivan hene, ji bo ku rêya Yezdan bi nezanî li ber kesan wunda bikin mijûlîyên beredayî dikirin, ewan (mijûlîyan) ji xwe ra dixne tinaz. Ji bona van ra şapateke bihatî heye.

7; Gava beratên me ji wî ra te xwundinê, ewa para da bi quretî pişta xwe (dide wan beratên) tu dibê qe ne bihistîye (diçe). Dibe qey di herdu guhe wî da gûhesin heye. Îdî tu mizgînîya wî bi şapateke dilsoz bide.

8; Ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Ji bona wan ra bihişta xwuringan heye.

9; (Ewanê di wê bihiştê da) her bimînin. Eva (maîna wan) peymaneke raste ji Yezdan e. Loma bi rastî Yezdan bi xweber jî servahatê bijejke ye.

10; Yezdan hûn ça dibînin ezman bê stûn afirandîye. Ji bo ku zemîn we nehejîne ewî di zemîn da çiyayên direj û bilind danîne. Ji hemîşk candaran ewî di zemîn da reşandîye. Îdî me ji ezmanan da aveke (wusa) hinartîye, em bi wê avê ji hemî zone rindên (hêşînayê) di zemîn da hêşîn dikin.

11; Afirandinê Yezdan evan e. Îdî ka hûn (gelî filan) bidine nîşanê min ewanê pêştirê Yezdan ka çi afirandine? (Ewan qe tu tişt ne afirandine). Lê ewanê cewr kirine hene! Ewan di wundabûneke xwûyadanin.

12; Bi sond! Me ji bona Loqman ra zanîna retkokî anîye; ji bo ku sipazîya Yezdan bike. Kîjan sipazî bike, îdî ewa hey ji bona xwe ra sipazî dike, kîjan jî nonkorî bike, bi rastî Yezdan ji wî (bê perwayê) pesinvan e.

13; Di gavekî da Loqman ji bona kurê xwe ra bi şîret (aha) gotîye: "Kure min! Tu ji bona Yezdan ra hevriyan çê neke, loma bi rastî hevriçêkirin cewreke pîr mezin e."

14; Me li meriva şîreta da û bavê wan kirîye, "ku ewa meriva sipazî ji bona min û da û bavê xwe ra bike, loma dîya wî ewa bi cefaê li ser cefan hildaye û bardar bûye. Ewa meriva heya du salan paşê ji şîr vebûye. Êwra (para da) hey li bal min da ne."

15; "Heke ewan da û bavê te bi te ra tekoşîn kirin; ku tu ewan tiştên tu zanîna te bi wan tune ye, tu ewan ji bona min ra bixî hevri, îdî tu (di vê tekoşînê da) bi gotina wan neke, tu di cêhanê da bi wan ra bi qencî hevaltîyan bike û tu peyrewîya wan ê ji sikatîyan, li bal min da zivirîne bike. Paşê şixwa hûnê hemîşkê jî li bal min da bizivirin. Îdî (wê gavê) ezê ji bona we ra tişta we kiribû, bêjim."

16; "Kurê min! Heke (keda) te wekî tovê henzelê be jî, di nava kevirê hilû da be, ya jî di ezman û zemîn da be, hey Yezdanê ewê (keda) te bîne. Loma bi rastî Yezdan bi hemî tiştên hûrê nexûya ê veşartî agahdar e."

17; "Kurê min! Tu nimeja xwe bike û tu fermana bi qencîyan û parisandina ji sikatîyan bike, tu li ser wan rîpên bi te da tî hew bike. Loma bi rastî (evan kirinên wusan in Yezdan fermana kirina wan) bi vê nevê kirîye."

18; "(Kure min!) Tu rûye xwe ji bona (kirinê) merivan (ji wan) nequrçîmîne û tu bi quretî di zemîn da negere. Loma bi rastî Yezdan ji hemî qureyên sewirkar hez nake."

19; "(Kurê min!) Tu di gera xwe da giranî bike û tu dengê xwe nişîv bike. Loma bi rastî siktirê dangan, dengê keran e."

20; Ma qey hûn nabînin, ku bi rastî Yezdan ji bona we ra hemî tiştên di ezman û zemîn da heyî, xistîne bine destê we, ewî qencîyên xwe yên xwûyaî û ne xwûyaî li ser we da pîr pêk anîye? (Bi vî ra jî) hinek ji merivan hene; bê zanîn bê beled û bê pirtûkên ruhnaîker, tekoşînê (di mafê hebûna) Yezdan da dikin.

21; Gava ji bona wan ra (aha) bê gotinê: "(Gelî kesan!) tişta ku Yezdan hinartîye hûn bibîne peyrewê wî." (Ewan bersiv dane û) gotine: "(Na, em bi gotina we nakin)

lê tişta ku em rast hatin; bav û bapîrên me li pey wan bûn, emê jî peyrewîya wan bikin." Gelo heke pelîd ewan gazî bal agirê hilopît kiribe jî, ewanê dîsa (di şopa bav û kalê xwe da) herin?

22; Bi sond! Kîjanê bi qencîyan rûyê xwe ji bona (perestîya) Yezdan ra xurî kiribe, îdî ewî bi qulpa zexm girtîye. Şixwa encama bûyera (hemî jî) li bal Yezdan da ne.

23; Û kîjan jî fîletîya (Yezdan) bike, îdî bira fîletîya wî te mirûz neke. Loma dawîyê da jî zivirandina wan li bal me da ne; îdî tiştê ewan kiriye emê ji bona wan ra bêjin. Bi rastî Yezdan bi tiştên di singan da heye pir dizane.

24; Em ewan (filan) hindik berxwudar dîkin, paşê emê ewan li bal şapateke giran da stûxar bikin.

25; Heke tu ji wan bipirsî, "Gelo kê ezman û zemîn afirandîye?" (Ewanê bersiva te aha bidin û) bêjin: "Yezdan (afirandîye)". Tu (aha) bêje, "Çiqa sipazî hene ji bona Yezdan ra ne." Lê pirê wan nizanin.

26; Çi tiştên di ezman û zemîn da hene! Hemî ji bona Yezdan ra ne. Loma bi rastî Yezdan bi xweber jî zenginê pesinvan e.

27; Bi rastî çiqa darên di zemîn da heye bibine gilîgo (qelem) û avşîn jî bibine hubur, ji peyvîda jî hevt avşîn bibine piştevan, tevê wan hubran be (ewan hemî jî binivîsin) dîsa dawîya peyvên Yezdan nayên. Bi rastî Yezdan servehatê bijejke ye.

28; Afirandina we (ji piştî) mirinê rakirina we û şandina we (li bal civînê da) wekî (afirandin û rakirina merivekî) bi tenê ye (qe tu raqetandin) tune ye. Bi rastî Yezdan dibêhê û dibîne.

29; Ma qey tu nabînî, ku bi rastî Yezdan şevê dixê ro e û royê jî dixê şevê (herdukan bi vî awaî kurt û dirêj dike) û roj û hîv jî di fermana xwe da sernerm kiriye; heryek ji wan heya danê navdaî dikişin? Bi rastî Yezdan tiştê hûn dîkin bi agah e.

30; Wusa ne! Loma bi rastî Yezdan mafî (bi xweber heye). Lê ewan tiştên ku ewan (filan) ji pêştirê wî perestîya wan dîkin, ewan pûç in. Bi rastî Yezdan bi xwer jî bilindê mezin e.

31; Ma qey tu nabînî, ji bo ku Yezdan hinekî ji beratên xwe bide nişanê we, kelek bi qencîyên wî di deryayê da dikişê? Bi rastî di van (bûyeran da) jî bona hemî hewkerê sipazvan ra beratên (derhoze) hene.

32; Gava pêlê deryayê wekî siye ewan diniximîne, ewan xwurî gazî Yezdan dîkin: Loma "ol" xurî ji bona Yezdan ra ne. Îdî gava me ewan li bal reşaiyê da fereste kirin; hinek ji wan rêyeke nîvwarî ji xwe ra digirin. Ji pêştirê sêwirkarên pir file, qe tu keş beratên me venaşêrin.

33; Gelî kesan! Hûn parizaya Xudayê xwe bikin û hûn ji wê roya, ku bav, ji bona zara xwe ra û zar jî ji bona bavê xwe ra, bi tu tiştî nayê xelat û celatkirinê bitirsîn. Loma bi rastî peymana Yezdan (daye) maf e. Îdî bira jîna cîhanî we nede xapandinê. Û bira (sêwrandinê pelîd ku dibêje: "Xuda mezin e wê we bibaxîşîne") nede xapandinê.

34; Loma bi rastî zanîna danê (rabûna hemîti hey) li bal Yezdan e, ewa bariştê dibarîne, ewa bi tiştê di malberxika da heyî dizane, qe tu candar nizane, ka wê di sibehê da, ji bona xwe ra çi ked bike û tu candar nizane jî ka wê li kû zemînî bimire. Bi rastî ewê (bi hemî tiştan dizane) û agahdarê (bi hemî tiştan e) ewa hey Yezdan e.

## Chapter 32 (Sura 32)

1; Elîf, Lam, Ra.

2; Daxistina kitêbê tu dudilî tê nîne ku ji perwerdekarê cîhanê ye.

3; Ma qey ew dibêjin ku: "Wî bi derew ji ber xwe ve çekiriye." Ne, ew rastiyek e ji perwerdekarê te ji bo tu komelekî ku berî te tu hiþyarker ji wan re nehatine hiþyar bikî. Hêvî heye rast bibînin.

4; Xuda ye ê ku asîmana û zemîn û tiptê navbera wan de di pêp rojan de aferand, papê ser text vegirt. Ji we re bêyî wî ne tu yar û yawer û ne jî tu mehdervan hene. Ma hûn hêjî nafikirin-þîret nagirin?

5; Ji asîman heya bi zemîn tevdira kae ew dike, papê ew (kar) di rojekî ku biqasî hezar salê hûn dijmêrin ne, bal ve bilind dibe.

6; Zanayê bi penhan û peyda, serkeftiyê dilovan her evê haye.

7; Ewê ku her tiptê aferandîye rind çekiriye û aferandina mirov jî ji heriyê dest pê kiriye.

8; Papê nifþa wî ji dilopek telape ji avekî bereday-bêkêr çekir.

9; Papê wî li hev rast kir û ji canê xwe tê pif kir, û ji we re goh û çav û dilan

çêkir. Hûn çiqas hindik sipas dikin!

10; Û gotin: "Ma gava em (hûr bibin) di axê de hinda bibin, ma bera emê bi aferandineke nû bèn aferandin?" Ne, ew bi pergîhatina perwerdekarê xwe kafir in.

11; Tu bêje: "Feriptê ku can sitendina we pê hatiye sipartin wê canê we bistîne, papê hûnê bal perwerdekarê xwe ve bêne vegerandin."

12; Eger te sûcdarên gunehkar bidîtana gava sitûyê xwe li cem perwerdekarê xwe xor kiribûn (û digotin:) "Perwerdekarê me! me dît û me bihîst, êdî tu me vegeirîne ku em karê qenc bikin; bêguman em ji dil bawer in" (te yê pirr sosreta bidîtana).

13; Eger me bixwesta, me yê her kesî rêberiya wî bidanayê, lê belê gotin ji min pêwîst bû ku ezê hey dogehê ji cinn û mirovan tev tije bikim.

14; Vêca (dergevanê dogehê ji wan re dibêjin ku:) "Hûn bi sedem ku we pergîhatina vê roja xwe ya han ji bîr kiribû, tam bikin. Bêguman me jî we ji bîr kiriye, û hûn bi sedem tiptê we fikir ezabê hertimî tam bikin."

15; Bêguman bi ayetên me, tenê ewên ku gava di bîra wan tê xistin ew ser dev û rû dikevin secde dibin û bi pesn û sipasê perwerdekarê xwe wî (ji her kêmasiyî) pak bêrî didêrin û ew quretiya nakin bawerî tinin.

16; Ew teniptên wan ji livîna bilind dibe (radibin limêja pevê) bi tirs û hêvî gazî perwerdekarê xwe dikin-wî dihebînin û ji tiptê me rozî daye wan didin.

17; Vêca tu kes nizane ku bergîdana tiptê kirine çi çavronahî ji wan re hatine vepartin!

18; Vêca ma ê bawermend be wekî ê jirêderketî ye? Ew ne wek hev in.

19; Heçî ên bawerî anîne û karên qenc kirine, êdî ji wan re bihiptê hewyegehê hene, ew ji ber tiptê kirine ve di qonaxan de têne mazûrvanî kirin.

20; Û heçî ên ji rê derketine jî, êdî hewyegeha wan agir e. Her cara ew bixwazin ku jê derên ew tê de papve têne zivirandin û ji wan re tê gotin ku: "Hûn ezabê agirê ku we wî diderewand tam bikin."

21; Sond be, emê berî ezabê herî mezin ji ezabê kêmtir (êp û nexwepiyê dinê) bi wan bidin tam kirin, hêvî heye ku ew vegeirîn.

22; Ji kesê ku ayetê perwerdekarê wî di bîrê bêne xistin, papê ew rû ji wan bizivrine sitemkartir kî heye? Bêguman em, ji sûcdarên gunehkar hey heyfstan in.

23; Sond be, me kitêbê da Mûsa, êdî tu di pergîhatina wî de dudilî nebe, û me wî ji zariyê Îsraîl re kire rêber.

24; Û me, ji wana çi gava bihna fireh nîban dan hin pêpwayan çêkir ku bi fermana me rêberî dikin û ew bi ayetên me ji dil bawer bûn.

25; Bêguman perwerdekarê te, wê roja qiyametê wan di tiptê ku ew tê de bi hev ketine ji hev biqetîne.

26; Ma ji wan re rêberî nekiriye ku me berî wan çiqas nifîa qelandiye tevî ku ew di pûnwarên wan de diçin û tèn jî?

27; Bêguman di vî de gellek ayet hene. Ma ew hêjî nabihîzin?

28; Ew dibêjin: "Eger hûn bera rastgo ne ka ev pîroziya han kîngê ye?"

29; Tu bêje ku: "Roja pîroziyê, baweriya ên kafir bûne hew bikêra wan tê û ew li bendê jî nayên mayîn."

30; Vêca tu rû ji wan bizivrine û li bendê be. Bêguman ew jî li bendê ne.

### Chapter 33 (Sura 33)

1; Ey pêxember" tu xwe ji Xuda biparêze-bitirse û nebe peyrewê kafir û durûyan. Bêguman Xuda hey zana ye hîkmetdar e.

2; Û bide pey tiptê ji perwerdekarê te bal te ve tê wehî kirinê. Bêguman Xuda bi tiptê hûn dikin hey kûrzana ye.

3; Tu xwe bispêre Xuda. Bi sipartinê Xuda besî te ye.

4; Xuda, ji tu mêrî re du dila di nava wî de çê nekiriye, û jinên we yên ku hûn hevpiptî ji wan çêdikin (hûn dibêjin wan: Pîpta te li ser min wek a diya min e) bera ji we re nekiriye dê û zirkurên we ji we re bera nekiriye kur. Evê han tenê gotina bi devkî ye. A rast Xuda dibêje û ew digihîne rêya rast.

5; Hûn wan bi bavê wan gazî bikin. Ev li cem Xuda rasttir e. Vêca eger hûn bavê wan nizanbin, êdî ew di dîn de bireyên we-pismamên we (yan jî yar û yawerên we) ne. Di tiptê we xwe pê pap kiriye de tu guneh li ser we nîne. Lê belê tiptê hûn ji dil qesdî bêjin (de guneh heye). Xuda hey bexpendekar e dilo van e.

6; Pêxember bi bawermend ji wan bi xwe pêptir e û pîrekên wî dayikên wan in. Û

merivên hev, hin ji wan bi hina di kitêba Xuda de, ji bawermendan û koçkiran ji hev re pêptir in, lê hûn bi yar û yawerên xwe qencî bikin ne tê de. Evê han hey di kitêbê de bi rêz nivsandî ye.

7; Û (di bîr bîne) dema me ji pêxemberan peymanan wan girt; û ji te û ji Nûh û Îbrahîm û Mûsa û Îsayê kurê Meryemê jî. Me ji wan peymanekî zexm girt.

8; Ji bo ji rastgoyan rastiya wan bipirse; ji kafiran re jî ezabekî bi jan amade kiriye.

9; Gelî ên bawerî anîne! hûn qenciya Xuda li ser xwe di bîr binin dema lepkerek giran hate we, vêca me bayekî û lepkerekî ku we wan nedidît bi ser wan de band. Xuda tiptê we fikir hey ba didît.

10; Dema ew ji serya we û ji binya we ve bi ser we de hatin û dema çav li hev weribîn û dil gihîptin qirika û we bi Xuda gumanên bed guman fikir.

11; Ha wê gav bawermend hatin sihêtî kirin û bi hejekî dijwar hatin hejandin.

12; Û dema durûyan û ên di dilên wan de nexweşî heye gotin: "Xuda û pêxemberê wî hey xapandinê ji me re wade dan."

13; Û dema hina ji wan got: "Gelî ehlê Yesrîbê (Medînê)! tu cîh ji we re nema; êdî hûn vegerin." Û hin ji wan jî destûr ji pêxember dixwazin, dibêjin ku: "Bêguman malên me vala ne"; lê ew ne vala ne. Ew hey dixwazim birevin.

14; Û eger ku (pûtperest) ji hawîdorê wê (Medînê) ve biketana ser wan de papê fitnê (tehlîhevî û pûtperestiyê) ji wan bixwestana wê (fitnê bikirna yan) bidana û ji hindikî pêve jî pê nediman.

15; Tevî ku berê wad û ahd dabûn Xuda ku: Bi sond wê pipt nedinê nerevin neçin. Wad û ehda Xuda hey tê pirsyarî kirin.

16; Tu bêje: "Eger hûn ji mirin yan kuştinê birevin jî rev qet bikêra we nayê û ew gav hûn ji hindikî pêve jî bi xweşî najîn."

17; Tu bêje ku: "Eger Xuda xerabî ji we re bivê yan dilovanî ji we re bivê wê kî we jê biparêze?" Ew ji Xuda pêve ji xwe re ne tu yar û yawer û ne jî tu alîkar peyda dîkin.

18; Bi rastî Xuda, ên ji we xwe egle dîkin û ên ji birayên xwe re dibêjin: "Werin ba me" ba dizane. Ew ji hindikî pêve nayên per.

19; Ji ber ku ew li ser we kîndar in. Vêca gava tirs bê, tu wan dibînî ku ew li te dinêrin, çavê wan wekî ê ku ji mirinê ji xwe çûbe digere. Vêca gava tirs çû ew ji ber çikûsiya li ser mal bi zimanên tûj êrîşî we dîkin-we rexne dîkin. Evê han bera bawerî neanîne; vêca Xuda jî kirinên wan bereday bir. Evê han li ser Xuda pîrr hêsan e.

20; Ew (ji tirs) guman dîkin ku (lepkere) partiyên (bi ser we de girtine) hê neçûne; û eger ew (lepkere) partiyan (dîsa) bî ew ji dil hiz dîkin ku xwezî ew di nava Erebbê çolê de bûna ku pîrsa xerebê we bikirna. Eger ew di nava we de bûna jî dîsa wan ji hindikî pêve per nedikir.

21; Sond be ji we re di pêxemberê Xuda de nimûnên rind hene, ji ewên ku Xuda û roja dawîn hevî dîkin û pîrr Xuda di bîr tînin re.

22; Û çî gava bawermendan (lepkere) partiyan dît, gotin: "Evê han tiptê Xuda û pêxemberê wî wade dabûn me ye û Xuda û pêxemberê xwe rast gotine." Eva hey bawerî û musulmaniya wan pîrrtir dike.

23; Ji bawermendan hin zîlam hene ku wad û ehda dabûn Xuda rast derxistin; êdî hina ji wan ehd û nezra xwe bi cîh anî-behîd bûn û hin ji wan jî li bendê ne û bi tu awayî (wadê xwe) naguherînin.

24; Ji bo ku Xuda rastgoyan bi rastiya wan xelat bike û eger bixwaze durûyan bide ezabê yan toba wan bipejirîne. Bêguman Xuda hey bexpendekar e dilovan e.

25; Xuda (lepkere) ewên kafir bûne bîyî ku bigihîjin mal (û pîrozîkî) bi kîn û hêrsa wan zivîrand. Xuda di per de besî bawermenda ye. Xuda hey hêzdar e serkeftî ye.

26; Û (Xuda) ji ehlê kitêbê (cihûyê Benî qureyze) ên ku piptvaniya wan (lepkere partiyan) kirin wan ji beden (keleh)ên wan daxist û tirsê avête dilên wan; hûn destekî (ji wan) dikujin û destekî jî hûn dîl digrin.

27; Û we kir mîratxwarê axa wan û warên wan û malên wan û axekî ku we hê pê navêtiyê. Xuda, hey bi her tiptî dikare.

28; Ey pêxember! tu ji pîrekên xwe re bêje ku: "Eger hûn jîna dinê û xeml û xweşîya wê divên, êdî werin ez wê xweşiyê bi we dim û bi berdaneke rind ez we berdim."

29; "Û eger hûn Xuda û pêxemberê wî û warê axretê divên, êdî bêguman Xuda ji jinên qencîkarên ji we re perûkî mezin amade kiriye."

30; Gelî pîrekê pêxember! kî ji we nepakîkî apîkar bike, ezab jê re bi du qatî tê qat kirinê. Evê han hey li ser Xuda hêsan e.

31; Û kî ji we ji dil bi a Xuda û pêxemberê wî bike û karê qenc bike, emê du cara perûya wê bidinê û me jê re rozîkî rind jî amade kiriye.

32; Gelî pîrekê pêxember! eger hûn xwe bi parêzin tu jinekî wekî we nabe; vêca hûn gotinê nerm nebêjin da ku ê di dilê wî de nexweşin heye dilê wî nebiye we, û hûn gotina xweş û pak bêjin.

33; Û hûn di malên xwe de bimînin û (gava ji bo hewcetîkî hûn ji malên xwe derketin jî) wek (dewra) nezaniya pêşîn hûn xwe bapewelayî nekin-xeml û xîbrê xwe nîşan nedin û hûn limêj bikin û zekatê bidin û peyrewiya Xuda û pêxemberê wî bikin. Gelî malîyê (pêxember) bêguman Xuda hey dixwaze nepakîyê ji we bibe-dûr bike û we pak û paqij bike.

34; Û hûn ayetê Xuda û hîkmetê di malên we de têne xwendin di bîr bînin-jî ber kin. Bêguman Xuda hey hûrzana ye kûrzana ye.

35; Bêguman mêrên musulman û jinên musulman, û mêrên bawermend û jinên bawermend û mêrên ji dil perestvan û jinên ji dil perestvan û mêrên rastgo û jinên rastgo û mêrên bîhnfireh û jinên bîhnfireh û mêrên dilbitirs û jinên dilbitirs û mêrên qencîkar û jinên qencîkar û mêrên rojîgirt û jinên rojîgirt û mêrên dawparêz û jinên dawparêz û mêrên Xuda pirr di bîr tînin û jinên di bîr tînin, Xuda ji wan re bexşînekî û perûkî mezin amade kiriye.

36; Gava Xuda û pêxemberê wî, bi karekî hukim kirin, ne ji mêrê bawermend û ne ji jina bawermend re nabe ku ji karê wan hilbijartin ji wan re hebe. Kî bi gotina Xuda û pêxemberê wî neke, êdî bi rastî wî bi paşîyek diyar rêya xwe paş kiriye.

37; Û (di bîr bîne) dema te ji ewê ku Xuda (bi Îslamê) pê qencî kiribû û te jî (bi azad kirinê) pê qencî kiribû re got ku: "Tu jina xwe li ba xwe bihêle-bernede û xwe ji Xuda biparêze-bitirse" û tiptê ku wê Xuda wî epkere bike te di dilê xwe de vedijart û tevî ku Xuda sezatir e tu jê bitirsî, tu ji mirovan ditirsîyay î. Vêca çi gava Zeyd karê xwe pê qedand - wê berda, me wê li te mehr kir ji bo ku tu zor û guneh li ser bawermendan di (mehrkirina) jinên zirkurên wan de gava ku karê xwe bi wan (jinan) qedandin-wan berdan, nebe. Hey fermana Xuda tê cîh.

38; Tu zor û guneh li ser pêxember di tiptê Xuda jê re ferz-rewa dêreya de nîne. Wek rê û rêça Xuda di ew (pêxember)ên ku berê derbas bûne çûne de. Fermana Xuda hey sernivîseke bûye çûye.

39; Ew (pêxember)ên ku peyxa mî Xuda radigihînin û jê ditirsin û ji Xuda pêve ji tu yekî natirsin. Xuda bi danasî û qîmkirin bes e.

40; Muhammed ne bavê tu yekî zîlamên we ye, lê belê ew pêxemberê Xuda û dawîya pêxemberan e. Xuda hey zanayê bi her tiptî ye.

41; Gelî ên bawerî anîne! hûn bi bîranîyek pirr Xuda di bîr bînin.

42; Û hûn wî sibe û êvarê pak bîrî bidêrin.

43; Ew e ê ku ew û ferîşteyên xwe li we dîlovanî û bexşîne dîkin-pesnê we didin ji bo ku we ji tarîtiyan derîne bal ronahiyê ve. Ew bi bawermendan hey dîlovan e.

44; Roja ew rastî wî tîn, gotina wana xweş-bixêr hatina wan ji hev re, 'silav' e; û ji wan re perûkî rind amade kiriye.

45; Ey pêxember! bêguman me te bi danasî û mîzgînanî û hişyarkerî pândiye.

46; Û bi bangkirina bal Xuda ve bi destûra wî û bi çirakî rohnîker (me te pândiye).

47; Û tu mîzgînê bide bawermendan ku bêguman ji wan re ji Xuda qencîkî mezin heye.

48; Û tu nebe peyrewê kafir û durûyan û tu dev ji renca wan berde û tu xwe bîspêre Xuda. Xuda bi parêzvanî bes e.

49; Gelî ên bawerî anîne! gava we jinên bawermend mehr kir, papê berî ku hûn têkilî wan bibin we wan berda, êdî ji we re li ser wan tu iddê (mudê mayînê) ku hûn wî bijmêrin nîne. Vêca hûn, hin xweşî (nivê mehra wan) bidin wan û hûn bi berdane kî rind wan berdin.

50; Ey pêxember! bêguman me jinên te yên ku te destmuzên wan (mehrê wan) daye wan ji te re helal dêraye, û wan cariyên berdestiyên te yên ku Xuda (bi dîlîti) bi ser te ve vegehandiye û keçê apê te û keçê metê te û keçê xalê te û keçê xatîyê te yên ku bi te re koç kirine û jineke bawermend ku xwe ji pêxember re bîbexşîne, eger pêxember jî bixwaze wê mehr bike, me xurû ji te re bîyî bawermendan (helal dêraye).

Bi rastî me, tiptê ku me derbareê jinên wan û (cariyên) berdestiyên wan de ferz dêraye baþ zaniye; ji bo ku tu zor û tengî li ser te çê nebe. Xuda hey bexpendekar e dilovan e.

51; Tu ji wan (jinan) kîjan bixwazî dikarî bihêlî-dev jê berdî û tu kîjan bixwazî jî dikarî li bal xwe bihewînî; û ji ewê te dev jê berdaye, dilê te divê (wan bîne bal xwe) êdî tu zorî û tengî li ser te nîne. Evê han nêztir e ku çavê wan rohnî bibe û xemgîn nebin û ew bi tiptê te daye wan teva qayil bibin. Xuda bi tiptê di dilê we de ya baþ dizane. Xuda hey zana ye mulayîm e.

52; Ji niha pêde ne jinên (din) ji te re helal in û ne jî tu wan bi hin jina bigiherînî, her çend rindaya wan ji te re sosret bê jî; ji pêptirê (cariyên) berdestiyên te (ew ne tê de; tu dikarî jî wan pêve bi hinek din re jî bizewicî). Xuda hey li ser her tiptî dîdevan e.

53; Gelî ên bawerî anîne! hûn nekevin malê pêxember ji pêptirê ku destûr ji we re bê dayîn-hûn bal xwarinekî ve bêne vexwendin bêyî ku hûn li benda pijandina wê bimînin; lê belê gava hûn hatin vexwendin êdî hûn têkevin (malê wî), lê gava we xwarina xwe xwar êdî belav bibin, li hêviya peyvê nemînin. Bêguman evê han hey pêxember acis dike, lê ew ji we þerm dike. Xuda ji gotina rastiyê þerm nake. U gava we ji wan (jinan) pelûpotekî xwest jî êdî hûn ji piþt perdê ve ji wan bixwazin. Evê han hem ji dilên we re û hem ji dilên wan re paktir e. Tu mafê we nîne ku hûn pêxemberê Xuda acis bikin û ne jî piþtî wî tu car pîrekên wî mehr bikin. Bêguman evê han li cem Xuda gellek mezin e.

54; Eger hûn tiptekî diyar bikin yan wî veþêrin, êdî bêguman Xuda zanayê bi her tiptî ye.

55; Tu guneh li ser wan (jinan) nîne (ku pêca xwe vekin) li cem bavên xwe û kurên xwe û birayên xwe û kurê birayên xwe û kurê xweþkên xwe û jinên (hevalên) xwe û (qewraþên) berdestiyên xwe. Hûn xwe ji Xuda biparêzin-bitirsin. Bêguman ew danasê li ser her tiptî ye.

56; Bêguman Xuda û feripteyên xwe li pêxember dilovanî dîkin-pesnê wî didin; gelî ên bawerî anîne! hûn jî dilovanî li serê bixweynin û baþ lê silava bikin.

57; Bêguman ewên ku Xuda û pêxemberê wî acis dîkin, Xuda di dunya û axretê de li wan lanetê kiriye û ji wan re ezabekî nizim-ker amade kiriye.

58; Ê ewên ku mêrên bawermend û jinên bawermend bêyî ked û karekî ku kiribin acis dîkin, êdî derewekî mezin û gunehêkî aþîkar hilgirtine.

59; Ey pêxember! tu ji pîrekên xwe û keçên xwe û pîrekên bawermendan re bêje ku çarþevê xwe bi ser xwe de berdin-li xwe kin. Evê han nêztir e-çêtir e ku (bi pakiyê) bêne nasîn, êdî hew bêne acis kirin. Xuda hey bexpendekar e dilovan e.

60; Sond be eger kesên durû û ewên di dilên wan de nexweþîn heyê û ewên di bajarê (Medînê) de peyvê derew belav dîkin, (ji kirinê xwe) bes nekin, emê te êrîþî ser wan bikin, paþê ewê tê de ji hindikî pêve cîrantiya te nekin.

61; Ew lanetbûyî ne, li kuder bêne dîtin têne girtin û bi kuþtinek sosret têne kuþtin.

62; Rê û rêça Xuda ye di nav ên berê derbas bûne de, tu ji rê û rêça Xuda re qet tu guherandin jî nabînî.

63; Mirov ji te danê qiyametê dipirsin. Tu bêje ku: "Bêguman zanîna wê her li cem Xuda ye." Tu çî zanî dibe ku danê qiyametê þirr nêz be.

64; Bêguman Xuda li kafiran lanet kiriye û ji wan re agirê hîlbûyî amade kiriye.

65; Wê hertimî hertim tê de bin; ne yar û yawerekî û ne jî alîkarekî dibînin.

66; Roja ku rûyên wan di agir de tê welgerandinê; dibêjin: "Hey xwezî me bi gotina Xuda bikirna û em bibûna peyrewê pêxember!"

67; Ê gotin: "Perwerdekarê me! bêguman me da pey serwerên xwe û mezinên xwe, vêca wan me ji rêya rast þaþ kir."

68; "Perwerdekarê me! tu du qat ji ezab bide wan û bi lanetek mezin li wan lanet bike."

69; Gelî ên bawerî anîne! hûn nebin wekî ewên ku Mûsa acis kirin, vêca Xuda wî ji tiptê digotin bêrî kir, û ew li cem Xuda rûmetdar bû.

70; Gelî ên bawerî anîne! hûn xwe ji Xuda biparêzin-bitirsin û gotina rast û durust bêjin.

71; Wê (Xuda) karê we ji we re li hev bîne û gunehên we ji we re bibexþîne; û kî bide pey Xuda û pêxemberê wî, êdî bi rastî ew bi rizgariyek mezin rizgar bûye.



72; Bêguman me, emanet, li ser asîmana û zemîn û çiyayan derpêp kir, lê wan ji hilgirtina wî xwe para da û jê bizdiyan û mirov wî hilgirt. Bêguman ew bû sitemkarekî pirr nezan.

73; Ji bo ku Xuda, mêrên durû û jinên durû û mêrên pûtperest û jinên pûtperest bide ezabê û poşmaniye ji mêrên bawermend û jinên bawermend bipijirîne. Xuda hey bexpendekar e dilo van e.

#### Chapter 34 (Sura 34)

1; Pesn û sipas ji Xudayê ku tiptê di asîmana û tiptê di zemîn de ê wî ne, û pesn û sipas di axretê de jî ê wî ne. Hikmetdarê kûrzana her ew e.

2; Ew e tiptê di zemîn de diçe û tiptê jê dertê û tiptê ji asîman dadikeve û tiptê tê berjor dibe tev dizane. Dilo vanê bexpendekar her ew e.

3; Ewên kafir bûne gotin; "Danê qiyametê nayê me." Tu bêje ku: "Ne, ez sond dixwim bi perwerdekarê xwe yê zanayê bi penhan, ewê (ew dan) bê we. Bi qasî serê derziyê jî ne di asîmana û ne di zemîn de ne ji vî biçûktir û ne meztir jê veparî namîne; tev her di kitêbekî apîkar de ne."

4; Ji bo ku ên bawerî anîne û karên qenc kirine xelat bike. Evên han ji wan re bexpînekî û roziyekî rind heye.

5; Ewên di ayetên me de dixebitin ku bêzar bikin, ewên han ji wan re ezabekî bi jan ji pîsîtiyê heye.

6; Û ewên zanîn ji wan re hatiye dayîn baþ dibînin ku tiptê ji perwerdekarê te bal te ve hatiye daxistin rastî her ew e û ew bal rêya (Xudayê) serkeftiyê hêjayî pesn ve rêberî dike.

7; Û ewên kafir bûne (bi tinaz ji hev re) gotin: "Ma em zilamekî nîþanî we bidin ku (ji we re bêje:) "Gava hûn giþt ji hev hûr hûr bûn, bêguman hûnê bi aferandînek nû rabin."

8; "Qey wî ji ber xwe ve derewa nebûyî avêtiye ser Xuda yan dînîti pêre heye?" Ne, ewên bi axretê bawerî naynin di ezab û þayîtiyek dûr de ne.

9; Ma qey ew ji asîman û zemîn li tiptê ber xwe û li tiptê paþ xwe nanêrin-nabînin? Eger em bixwazin emê wan bi zemîn ve serûbin bikin yan emê ji asîman perça bi ser wan de bixînin. Bêguman di vî de ji her bendeyê ji dil vegekar re ayetek (nîþanek) heye.

10; Sond be me qencîkî ji cem xwe da Dawid, (û me got:) "Gelî çiyaya û tirûda! hûn jî pê re tesbîha bidin (denga lê vegeînin)." Û me jê re hesin nerm kir.

11; (Û me gotê:) "Ku tu (zirx) ên fireh çêke û tu li gorî hewcetiyê bi pîvan çêke (ne kême û ne zêde, ne teng û ne pirr fireh) û hûn karê qenc bikin. Bêguman ez tiptê hûn dikin baþ dibînim."

12; Û me ji Silêman re jî ba (situxor kir) ku sêre sibê çûna wî mehekî ye û êwarê dagerîna wî mehekî ye; û me jê re kaniya paxir herikand, û hin ji cinna jî bi destûra perwerdekarê wî li ber destê wî dixebitin. Kî ji wan ji fermana me rû bizivîne, emê wî ji ezabê agirê hilbûyî bidin tam kirinê.

13; Wan, jê re tiptê bixwesta ji kopk û mizgevtâ, û heykel û kopikên wekî hewzê mezin û dizikên ku ji cîh nedhatin bilindkirin çêdikir. (Me gotê:) "Hûn gelî malbata Dawid sipaskarî bikin" Ji bendeyên min sipaskar hindik in.

14; Vêca çi gava me mirinê li serê hukim kir, her kurmikê axê ku ji gopalê wî dixwar wana bi ser mirina wî vekir-nîþa wan da. Vêca çi gava ew (ji ser gopalê xwe de) ket, (êdî ji mirovan ve) xuya bû ku eger cinna tiptê penhan zanibûna wê (ew qas) di ezabê nizimker de nemana.

15; Sond be, ji (xelqê) Sebe'e re di pûnwarê wan de ayetek (nî þanek) hebû: ku ji rast û çep ve du baxçe hebûn. (Ji wan re hat gotin ku:) "Hûn ji roziya perwerdekarê xwe bixwînin û jê re sipas bikin? Bajarekî rind û pak û perwerdekarekî bexpendekar."

16; Vêca wan (ji rastiyê) rû li ba xist; êdî me jî lehiya zor diþwar bi ser wan de þand û me wan herdu baxçê wan (ê xwep) bi du baxçeyê fêkiyê tal û tirþoqî û dargezê bi dirrî û tiþtekî hindik jî ji sidrê guherand.

17; Me wan bi sedem kufra wan wuha ceza kir. Ma em ji kafiran-nankoran pêve ceza dikin?

18; Û me di nabeyna wan û bajarên ku me tê de firehî çêkiribû de bajarên bi hev ve-ji hev dixuyan çêkir û me çûn û hatîne di nava wan de derbas kir; (û me gote wan ku:) "Hûn bi peva û rojan biewletî di wan de derbas bibin."

19; Vêca gotin: "Perwerdekarê me! tu navbera rêwîtiyên me dûr bike.", û wan li xwe sitemkarî kir; êdî me jî wan kir hin buyer (ji ên pey wan re) û me wan tev ji hev hûr hûr kir. Bêguman di vî de ji her bîhnfirehê pirr sipaskar re gellek ayet (nîpan û îbret) hene.

20; Sond be, pelîd gumana xwe derbareê wan de rast dêrand; vêca ji destekî hindik ji bawermend pêva wan da pey wî.

21; Tu zor û hêza wî li ser wan nebû tenê ev ku da em kesê bi axretê bawerî tîne ji ê ku ew tê de dudil e bizanbin-veqetînin. Perwerdekarê te li ser her tiptî parêzvan e.

22; Tu bêje ku: "Hûn gazî ewên ku hûn bêyî Xuda bi derew doz dikin, bikin; ne di asîmana û ne di zemîn de bi qasî sere derziyê jî di destê wan de nîne û ji wan re di wan de tu pîrîkatî jî nîne, û jê re jiwan tu piptvan jî nîne.

23; Tu mehdervanî li balê bikêr nayê ji pêptirê ê ku jê re destûr dabe. Heya gava tirs ji dilên wan sivik dibe, dibêjin ku: "Ma perwerdekarê we çi got?" Gotin: "Rastiyê (gotiyê). Bilindê herî mezin her ew e."

24; Tu bêje: "Ma ji asîmana û zemîn kî rozî dide we?" Tu bêje: "Xuda; û bêguman em yan hûn li ser rêya rast in yan jî di papîtîkî apîkar de ne."

25; Tu bêje ku: "Hûn ji sûcê me kiriye nayên pirsîn û em jî ji tiptê hûn dikin neyên pirsîn."

26; Tu bêje ku "Wê perwerdekarê me, me bicivîne, papê wê bi rastiyê me ji hev safî bike. Safîkerê herî zana her ew e.

27; Tu bêje ku: "Ka hûn ew pîrîkên we pê gihan dibû nîpa min bidin?" Naxêr! serkeftiyê hîkmetdar her Xuda ye.

28; Me te ji bo hemû mirovan re her mizgînvan û hiþyarker pandiye, lê belê pirrî mirovan nizanin.

29; Û dibêjin: "Eger hûn rastgo ne ka ev wada han kîngê ye?"

30; Tu bêje ku: "Wada rojekî ku hûn danakî jî hê ne papde dikevin û ne jî pêpde dikevin ji we re ye".

31; Û ewên kafir bûne gotin ku: "Em, ne bi vê Qur'ana han û ne jî bi ê berî wê, qet bawerî naynin." Hey xwezî te bidîtana gava sitemkar li cem perwerdekarê xwe rawestiyane ku çewa hin ji wan gotinê li hina li ba dixin! Ewên bindestxistî ji ên serdestiyên qure re dibêjin ku: "Eger ne ji we bûna, emê bibûna bawermend."

32; Ewên serdestiyên qure jî ji ên bindestxistî re dibêjin ku: "Ma piptî gava rêberî ji we re hat ma qey me pêþiya we girt? Ne, hûn bi xwe bûn sûcdarên gunehkar."

33; Û ewên bindestxistî ji ewên serdestiyên qure re gotin ku: "Ne, we bi þev û bi roj xax û dafa çêdikir; lewra we bi me ferman dikir ku em bi Xuda kafir bibin û em jê re hemtayan çêkin." Wan çi gava ezab dît, poþmaniyê di dilê xwe de vepartin; û me ji xelekê agirîn kire sitûyê ewên kafir bûne. (Dergevanê dogehê gotine wan:) "Ma hûn ji tiptê we kiriye pêve tene ceza kirin?"

34; Her bajarê me hiþyarkera pandiyê hey têrxwariyên wan ên bitir gotine ku: "Em bi tiptê hûn pê hatine pandin kafir in-bawer nakin."

35; Û gotin ku: "Em bi mal û bi zarû pirrtir in û em nayên ezab dayîn."

36; Tu bêje ku: "Bêguman perwerdekarê min, jî ê bixwaze re rozî fireh radixe û teng jî dike, lê belê pirrî mirovan nizanin."

37; Ne malên we û ne jî zarûyên we ne ku we hey bal me ve nêz dikin; tenê ê ku bawerî anîbe û karê qenc kiribe. Êdî evên han ji wan re xelatekî qatkirî di bergîdana kirinê wan de heye û ew di kopkên bilind de jî biewle ne.

38; Ewên ku derbareê ayetên me de dixebitin ku (me) bêzar bikin, ewên han di ezab de tene amade kirin.

39; Tu bêje ku: "Perwerdekarê min jî ê bixwaze re rozî fireh radixe û teng jî dike. Her tipta hûn bidin êdî ew dike pûna wê. Ew çêtirînê rozîdana ye."

40; Û roja ku wê wan teva bicivîne papê ewê ji feripteyan re bêje: "Ma evên han, we dihebandin?"

41; Gotin: "Em te (ji her kêmasiyî) pak bêrî didêrin, ne ew, tu yar û yawerê me yî. Ne, wan cinna diheband; pirrî wan bi wan (cinna) bawermend in."

42; Êdî îro, tu kar û ziyana yekî ji we bi destê yekî nîne; û emê ji ên sitemkarî kirine re bêjin ku: "Hûn ezabê agirê we wî diderewand tam kin."

43; Gava ayetên me li ser wan tene xwendin, ew dibêjin ku: "Evê han hey zilamek e,

dixwaze ku pêpiya we ji tiptê bapîrên we dihebandin bigre"; û gotin ku: "Evê han derewek e ku ji ber xwe ve hatiye çêkirin"; û ewên kafir bûne çî gava rastî ji wan re hat gotin ku: "Eva han efsûneke apîkar e."

44; Tevî ku me, ne kitêbên ew ders bixweynin dabû wan û ne jî me berî te hiþyarker bal wan ve þandibû.

45; Û ên berî wan jî derewandibûn; tevî ku ew negihîptine deh yeka tiptê me dabû wan. Vêca wan pêxemberên min derewand; êdî wê înkara min (li kirinên wan) çewan be (tu mêze ke!)

46; Tu bêje ku: "Bêguman ez yek þîreteka bitenê li we dikim (ew jî eve:) ku hûn yek yek û dido dido ji bo Xuda rabin û bifikirin." Bi hevalê we (pêxember) re tu dînîti nîne. Ew tenê ji we re beriya ezabekî zor dijwar hiþyarkerek e.

47; Tu bêje ku: "Her destmuza min ji we xwestibe êdî bira ew ji we re be. Destmuza min tenê li ser Xuda ye. Ew danasê li ser her tiptî ye."

48; Tu bêje ku: "Bêguman perwerdekarê min rastiye davêje (dilê e bixwaze. Ew) pirr zanayê bi tiptê penhan e."

49; Tu bêje ku: "Rastî hat û nerastî, ne dest pê dike û ne jî vedigere."

50; Tu bêje ku: "Eger min rê þaþ kir, êdî bêguman ez tenê ji xwe re þaþ dikim; û eger ez rêya rast bibînim jî, êdî ew bi wehya perwerdekarê min bal min ve ye. Bêguman ew þaþ sehkir e pirr nêz e."

51; Xwezî gava ew tirsîyan te bidîta!; êdî tu xelasî nîne; û ew ji ciyekî nêz hatin girtin.

52; Û gotin: "Me pê bawerî anî." Lê ji ciyekî dûr (ji axretê) çewa dikarin dest dirêjî (baweriya li dinê) bikin?

53; Tevî ku ew berê (li dinê) pê kafir bûn, û ew ji ciyekî dûr bi gumanê davêjin (guman dikin ku wê vegehin dinê).

54; Û cudatî kete navbera wan û tiptê dilê wan dibijê, çewa ku berê bi hemtayên-hemkîþên wan hate kirin. Bêguman ew, hey di gumanek dudilî de bûn.

## Chapter 35 (Sura 35)

1; Pesn û sipas ji Xudayê ku aferendekarê asîmana û zemîn e û e ku ferihþeyan kiriye qasidên xwedî baskên didu didu, û sisê sisê, û çar çar. Tiptê bixwaze di aferandinê de zêde dike. Bêguman Xuda bi her tiptî dikare.

2; Xuda, her dilovaniya ji mirovan re veke êdî tu kes nikare wê bigre; û tipta bigre jî êdî tu kes nikare wê piptî wî biþîne. Serkeftiyê hîkmetdar her ew e.

3; Gelî mirovan! hûn qenciyê Xuda li ser xwe di bîr bînin. Ma ji Xuda pêve aferendekarekî heye ku ji asîman û zemînrozi bide we? Ji wî pêve tu Xudanînin. Vêca ma hûn .ima (ji rastiye) tene zivirandin?

4; Eger ew te diderewînin, vêca bi rastî pêxemberên berî te jî hatinderewadin. Kar tev her bal Xuda ve tene vegeandin.

5; Gelî mirovan! bêguman wada Xuda rast e, vêca ne bira jîna dinê we bixapîne û ne jî bira (pelîdê) pirr xapînok we bixapîne.

6; Bêguman pelîd ji we re neyar e, vêca hûn jî wî neyar bigrin. Bêguman ew tenê gazî partiya xwe dike ji bo ku ew bibin ehlê agirê hîlbûyî.

7; Ewên kafir bûne ji wan re ezabekî zor dijwar heye û ên bawerî anîne û karên qenc kirine ji wan re bexþîn û xelatekî mezin heye.

8; Vêca ma e ku karê wî ye xerab jê re hatiye xemilandin, vêca ew wî rind dibîne. (wekî ewê ku Xuda wî daye ser rêya rast e?) Vêca bêguman Xuda kesê bixwaze jî dide ser rêya rast. Vêca bira canê te bi kul û derdê li ser wan (ku çima ew bawerî naynin) derneyê neçe. Bêguman Xuda bi tiptê ew dikin þaþ zana ye.

9; Xuda ye e ku baya þand û vêca ew ewra radikin; êdî me wî ajot bal welatekî mirî ve, vêca me zemin piptî mirina wê pê vejand. Rabûna (ji goran û zindî bûn jî) her wuha ye.

10; Kî rûmet û serkeftinê dixwaze, vêca rûmet tev a Xuda ye. Peyva rind û pak her bal ve berjor dibe û karê qenc jî ew wî bilind dike. Ewên ku xaxê xerab dikim ji wanre ezabekî zordijwar heye; û xaxê wanê han jî hey pûç û bereday diçe.

11; Xuda we ji axê aferand, þapê ji dilopek avik þapê we kire cot (nêr û mê). A mê çî hildigre û çî datîne her bi zanîna wî ye. Her kesê temendirêj dijî û ji temenê wî çî kêmbibe her di kitêbê de ye. Bêguman evê han li ser Xuda pirr hêsan e.

12; Herdû derya mîna hev nînin. Eva han (av) pêrînî xweþe vexwarina wê di ber meriv

de namîne û eva han jî porî tal e; û hûn ji herdûyan jî goptê terr û teze dertînin dixwin û hûn xiprê ku hûn li xwe dikin jî dertînin, û tu dibînî ku keptî avê diqelêpe dimepe ji bo ku hûn ji qenciya wî bi dest xî û hêvî heye ku hûn sipas bikin.

13; Ew pevê di rojê radike û rojê jî di pevê radike û roj û hîvê sitûxor kiriye ku gipt heya demekî navdayî diherikin. Ev Xudayê han perwerdekarê we ku mulk tev ê wî ye. Ewên ku hûn bêyî wî gazî dikin-dihebînin ew biqasî qaçilê navika dendikê jî di destê wan de tune ye.

14; Eger hûn gazî wan bikin ew gazî kirina we nabihîzin û eger bibihîstina jî bersiva we nedidan. Roja qiyametê wê bi pîrkperestiya we kafir bibin-înkâr bikin. Tu kes mîna (Xudayê) kûrzana te haydar nake.

15; Gelî mirovan! hûn hewcekarê bal Xuda ve ne û bêhewceyê hêjayî pesn her Xuda ye.

16; Eger bixwaze wê we bive û xelqekî nû bîne.

17; Evê han li ser Xuda zor nîne.

18; Tu gunehkarek barê gunehê yekî din hilnagire. Eger yekî bargiran gazî bal hilgirtina wî (barê xwe ve) bike, tu tiptek jê nayê hilgirtin (kes tiptekî alî wî nake hilnagire) her çend merivê wî yê nêz be jî. Bêguman tu tenê ewên ku bi penhanî ji perwerdekarê xwe ditirsîn û limêj dikin hiþyar dikî-ditirsînî. Kî xwe pak bike, êdî bi rastî ew ji xwe re xwe pak dike. Vegera papîn her bal Xuda ve ye.

19; Ê kor û ê dibîne nabin yek.

20; Tarîti û ronahî,

21; Sî û germahî jî.

22; Zindî û mirî jî nabin yek. Bêguman Xuda bi kesê bixwaze dide bihîstin. Tu bi ên di goran de ne, nikarî bidî sehkirin.

23; Tu tenê hiþyarkerî.

24; Bêguman me te bi rastiyê mizgînan û hiþyarker þandiye. Her kom û civat hey hiþyarkerekî tê re bihuriye.

25; Eger ew te biderewînin, vêca bi rastî ên berî wan jî derewandibûn, ku pêxemberên wan bi nîþanên diyar û rûpelên-pirtûkên vekirî û bi kitêba rohnîker hatibûn wan.

26; Papê min, ewên kafir bûn girt; vêca (te nedît) ka înkara min çewa bû.

27; Ma te nedît ku bêguman Xuda avê ji asîman daxist; vêca me pê fêkiyên wan rengên wan cihê cihê deranî. Ji çiyayan jî rêyên-xêzên sipî û sor û rêyên çîl reþ (me çêkir).

28; Ji mirovan û rawiran û dewaran jî her wuha rengê wan cihê cihê ne. Bêguman ji bendeyê Xuda tenê ên zana bi rastî jê ditirsîn. Bêguman Xuda Serkeftiyê bexpendekar e.

29; Bêguman ewên ku kitêba Xuda dixweynin û limêj dikin û ji roziya me daye wan bi dizî û epkere didin, ew hêviya danûsitaneke bîziyan-bêqedandin dikin.

30; Ji bo ku destmuz-perûyên wan bîkemasî bide wan û ji qenciya xwe ji wan re pirr bike. Bêguman ew bexpendekar e sipaskar e.

31; Ewê me ji kitêbê bal te ve wehî kir a rastî her ew e ku ê berî xwe rast didêre. Bêguman Xuda bi bendeyan kûr zanaye baþ dibîne.

32; Papê me, ewan bendeyên xwe yên me hilbijartibû kire vêrisê kitêbe. Vêca hin ji wan hene li xwe tadê dikin û hin ji wan navendî ne, û hin ji wan jî bi destûra Xuda bi baþiyan bi pêþ dikevin. Qenciya herî mezin eva haye.

33; Bihiptê xweþiyê ku wê bikevinê de wê tê de ji bazinê zêr moriyan bixemilin û kincê wan jî tê de hevriþim e.

34; Ê gotin: "Pesn û sipas ji Xuda re be ku xemê ji me bir. Bêguman perwerdekarê me her bexpendekar e sipaskar e."

35; "Evê ku me ji qenciya xwe xiste warê hertimî mayînê ku tê de, ne betilandin digihîje me û ne jî tê de kerixîn têkilî me dibe."

36; Ewên ku kafir bûne ji wan re agirê dogehê heye. Ew, ne têne kuþtin ku bimrin herin û ne jî ezabê wê ji wan tê sivik kirin. Em her kafirî-nankorî wuha ceza dikin.

37; Ew tê de hewar û gazî dikin ku: "Perwerdekarê me! tu me derîne emê karê qenc bikin, ne ewê ku me berê dikir." (Bersiv tî dayîn ku:) "Ma qey me temenek dirêj bi qasî ê tê de difikire-þîret digre, bifikire-þîret bigre neda we? Ê hiþyarker jî ji we re hatibû. Vêca hûn (ezab) tam kin, êdî tu alîkar ji sitemkaran re nîne."

38; Bêguman Xuda zanayê bi penhanê asîmana û zemîn e. Bêguman ew zanayê bi veþariyê di singan de ye.

39; Ew e ê ku we di rûyê zemîn de kiriye canîþîn. Êdî kî kafir bibe, ew kufra wî li serê ye. Kufra kafiran li cem perwerdekarê wan ji hêrs û xepmê pêve ji wan re zêde nake û kufra kafiran ji ziyane pêve ji wan re zêde nake.

40; Tu bêje ku: "De ka we dît bêjin ku þîrikên (pûtên)we yên ku hûn wan bêyî Xuda dihebînin, ka nîþanî min bidin wan ji zemîn çî aferandiye?" Yan ji wan re þîrikatî di asîmana de heye? Yan me kitêbek daye wan ku ew jê li ser delîlek xuya ne?" Ne, sitemkar hin ji wan bi hina hey wadê xapandinê didin.

41; Bêguman Xuda asîmana û zemîn digre ku ji binî neçin. Sond be, eger ew ji binî herin, piþtî wî tu kes nikare wan bigre. Bêguman ew hey mulayîm e bexþendekar e.

42; Heye ji wan hat bi Xuda sond xwarin ku: "Eger hiþyarkerek ji wan re bê, ewê bibin yekî ji kom û civatê herî rê rast." Vêca çî gava hiþyarker ji wan re hat, hey rev û dûriya wan pirr kir.

43; Ji ber quretiya di rûyê zemîn de û xaxê pîs (wuha kirin). Xaxê pîs jî hey bi xwediyê xwe digre-diartile. Vêca ma ew hey li benda rêça pêþiyan e? Êdî tu, ji rê û rêça Xuda re ne tu guhezîn dibînî û ne tu ji rê û rêça Xuda re tu guherîn dibînî.

44; Ma ew li rûyê zemîn nagerin, vêca ku binêrin ka paþiya ên berî wan ku ew ji wan bihêztir bûn jî çewa bû? Tu tiþt di asîmana û zemîn de nikare Xuda bêzar bike. Bêguman ew hey zana ye pêkar e.

45; Eger Xuda mirova bi sedem tiþtê bi dest xistine-kirine bigirtana, wê li ser piþta wê (li ser rûyê zemîn) tu rawirî-candarî nehiptana; lê belê wan heya demekî nandayî paþde dihêle. Vêca gava dema (acelê) wan bê, êdî bêguman Xuda bendeyên xwe baþ dibîne.

#### Chapter 36 (Sura 36)

1; Yasîn (Zilamo!)

2; Bi Qur'ana hîkmetdar kim,

3; Bêguman tu, her ji pêxemberan î.

4; Li ser rêyan rastîn î.

5; (Eva) daxistina (Xudayê) serkeftiyê diloan e.

6; Ji bo tu komelekî ku bav û kalên wan nehatine hiþyar kirin hiþyar bikî-bitirsînî; vêca wan hay jê nîne.

7; Sond be, gotin, li ser pirrî wan pêwist bûye; êdî ew hew baweri tînin.

8; Bêguman me xelesa avêtiye (dest û) sitûyên wan û vêca heya çena wan girtiye; êdî ew ser rakirî mane.

9; Û me ji pêþiya wan ve bendekî çekiriye û ji paþiya wan ve jî bendekî; vêca me wan rapêçandiye; êdî ew nabînin.

10; Û ji wan re jî wekî hev e; çî tu wan hiþyar bikî-bitirsînî û çî tu wan hiþyar nekî-netirsînî, ew hew bawerî tînin.

11; Bêguman tu, tenê ê daye pey zîkrê (Qur'anê) û bi penhanî ji (Xudayê) Mihrîban tirsîyaye hiþyar dikî-ditirsînî; vêca tu mizgîna bexþandin û destmuzekî rind bidê.

12; Bêguman her em miriyan vediþînin û em tiþtê bi pêþ xistene tevî rêç û þopê wan dinivîsin. Me, her tiþtî jî di kitêbek (pêþwayek) diyar de jimartiye-parastiye.

13; Tu ji wan re ehlê wî bajarî wek mînak bide ku gava qasid hatinê.

14; (Di bîr bîne) dema me du (qasida) þand bal wan, vêca wan, herdû (qasida) derewand; êdî me (wan) bi ê sisiyan piþtvani kir; vêca gotin: "Bêguman em bal we ve hatine þandin."

15; (Ehlê bajêr) gotin: "Hûn jî hin mirovên wekî me ne, û (Xudayê) Mihrîban tu tiþtî danexistiye, hûn hey derewa dîkin."

16; (Qasida) got: "Perwerdekarê me baþ dizane ku bêguman em bal we ve hatine þandin."

17; "Û ji ragihandinek aþîkar pêve jî li ser me nîne."

18; "(Ehlê bajêr) gotin: "Bêguman peþka we li me ketiye. Sond be, eger hûn bes nekin, emê we kevirbaran bikin-biricimînin û wê îþkencekî bi jan ji me bigihê we."

19; (Qasida) got: "Peþka we bi we re ye. Ma qey ji ber hûn hatine þîret kirin (peþk li we ketiye?). Ne, ji xwe hûn komelekî bergîberdan in."

20; Zilamekî ji devera herî dûrê bajêr bilez hate got: "Gelê min! hûn bidin pey qasidan."

21; "Hûn bidin pey kesê ku tu destmuzî ji we naxwaze û ew her li ser rêya rast in."  
 22; "Û ma çi bûye ji min ku ez (Xuday) ê min aferandiye û hûnê her bal ve bêne vegerandinê nehebînim?"  
 23; "Ma qey ezê ji wî pêve hin Xudayên din bigrim ku eger (Xudayê) Mihriban ziyana min bixwaze, mehdervaniya wan bi tu tiptî bi kêra min nayê û ew min xelas jî nakin?"  
 24; "Bêguman ez ew gav dikevîm papîtîkî xuya."  
 25; "Bêguman min bi perwerdekarê we bawerî aniye; vêca hûn min seh bikin."  
 26; (Gava wî zîlamî ew gotin got, gelê wî ewî pelixand, êdî jê re) hat gotin ku: "Tu têkeve bihiptê." Wî got ku: "Hey xwezîka gelê min bizanbûna;"  
 27; "Bi tiptê ku perwerdekarê min ji min re bexîpandiye û min kiriye ji mazûrvanên herî rind."  
 28; Me piptî wî tu lepkerî ji asiman bi ser gelê wî de danexist; nedibû em daxînin jî.  
 29; Ew (têkçûna wan) tenê yek qêrînek bû; vêca ew pêre pêre vemirîn (bêhis û deng man).  
 30; Hey çi heyf e li bendeyan! Her pêxemberê ji wan re tê, ew hey pê tinaza dîkin.  
 31; Ma qey wan nedît ku me berî wan çiqas nîfîa tîk biriye?, ku ew qet bal wan ve jî venagerin.  
 32; Wê tev hemû jî hey li cem me bêne civandin-amade kirin.  
 33; Ji wan re nîpanek jî axa miriye ku me wê vejandiye û me tene jê deraniye; vêca ew jê dixwin.  
 34; Û me tê de bax û bostanê ji xurma û tirî çekiriye û me tê de ji kaniyan jî herikandiye.  
 35; Ji bo ew ji fêkiyê wî û ji tiptê destên wan çekiriye bixwin. Vêca ma ew hêjî sipas nakin?  
 36; Pak bêrî ye (Xuday)ê ku cotan tev ji tiptê ax hêpîn dike û ji wan bi xwe û ji tiptê ew nizanin aferandiye.  
 37; Ji wan re nîpanek jî pev e ku em royê jê digurên; vêca ew pêre pêre di tariyê de dimînin.  
 38; Roj jî di pûngeha xwe de diherike. Evê han pîvana (Xudayê) serkeftiyê zana ye.  
 39; Me hîvê jî di hin qonaxan de pîvaye; heya ku wek çuqliyê dara xurmê yê kevnare (ku wek kevan xor dibe) vedigere.  
 40; Ne roj dikare bigihîje hîvê û ne jî pev ji royê derbas dibe. Tev jî di çerxekî de diherikin.  
 41; Nîpanek jî ji wan re (ev e ku) bêguman me azbata wan di keptiyek dagirtî de hilgirt.  
 42; Û me ji wan re jî wekî wê (keptiyê) tiptê ku lê siwar dibin aferandiye.  
 43; Eger em bixwazin jî emê wan bifetisînin; êdî ne tu kes li hewara wan tê û ne jî ew tene xelas kirin.  
 44; Tenê ku dîlovaniyek ji me û xwepiyek heya demekê (li hewara wan bêt).  
 45; Û gava ji wan re tê gotin ku: "Hûn ji tiptê pêpiya xwe û ji tiptê paþiya xwe bitirsîn-xwe biparêzin, dibe hûn bêne dîlovani kirin (ew qet goh nadinê).  
 46; Her nîpanek ji nîpanê perwerdekarê wan ku ji wan re tê ew hey rû jê dizivînin.  
 47; Û gava ji wan re tê gotin ku: "Hûn jî ji tiptê Xuda rozî daye we bidin"; ewên kafir bûne ji ên bawerî anîne re dibêjin ku: "Ma emê xwarin bidin ewê ku eger Xuda bixwaze wê xwarin bideyê?; hûn hey di papîkî apîkar de ne."  
 48; Û dibêjin ku: "Eger hûn bera rastgo ne ka ev wada han kîngê ye?"  
 49; Ew hey li hêviya yek qêrînekî ne ku wan bigre û ew bi hev re xirecirê bikin.  
 50; Êdî ew nedikarin pîret û tenbîhîkî li hev bikin û ne jî bal ehlê xwe ve vegerin.  
 51; Û di sûrê de hat pîf dayîn; êdî ew pêre pêre ji goran (radibin) bal perwerdekarê xwe ve dilezînin.  
 52; (Ew gav) dibêjin: "Hey xulî li me be? Kî me ji gorên me rakir? Evê han wada (Xudayê) Mihriban e û pêxemberan ji rast gotibû."  
 53; Ew tenê yek qêrînek e; êdî ew tev li cem me dicivin-amade dibin.  
 54; Vêca îro tu kes tade lê nabe û hûn tenê bi tiptê we kiriye tene ceza kirin.  
 55; Bêguman ehlê bihiptê îro bi xebatên xweþ dilþa ne.  
 56; Ew û jinên xwe di bin siya de li ser sedra paldayî ne.

57; Ji wan re tê de xweþî û tiptê daxwazî bikin hene.  
 58; (Tiptê ew dixwazin) gotina xweþiyê ji perwerdekarekî diloan e.  
 59; Hûn gelî sûcdarên gunehkar îro cihê bibin.  
 60; Gelî zariyê Adem! ma qey min ji we re ferman û þîret nekir ku hûn nedin pey pelîd - wî nehebînin. Lewra bi rastî ew ji we re neyarekî aþîkar e.  
 61; Û hûn min bihebînin. Rêya rastîn eva haye.  
 62; Sond be wî ji we gellek nifþa ji rê deraniye. Vêca qey nedibû we hiþ tê bibrana - we xwe ragirtana?  
 63; Eva han e dojeha ku hûn hatine wade dayîn.  
 64; Hûn îro têkevinê ji ber kufra xwe tê biþewitin.  
 65; Îro emê ser devên wan mohr bikin û wê destên wan biþeyivin û wê piyên wan bi tiptê bi dest xistine danasî bidin.  
 66; Eger me bixwesta, me yê ser çavên wan hilo kor bikirna, vêca ka di rêya rast de bilezînin; êdî ma wê çewa bibînin?  
 67; Û eger me bixwesta me yê wan di þûna wan de bihiþta (têk bibirna yan rûçêkên wan biguharta) êdî nedikarbûn ronahî bibînin û ne jî vegerin.  
 68; Em kî temendirêj bikin em wî di aferandinê de hêdî hêdî bêhêz dikin. Ma êdî hêjî ew hiþ tê nabin - xwe ranagirin?  
 69; Me þî'ra pê nedaye hîn kirin û ew nikare bêje jî. Ew tenê þîret-bîrxistin e û Qur'aneke aþîkar e.  
 70; Ji bo ku ew ê zindî hiþyar bike-bitirsîne û gotin li ser kafiran pêwist bibe.  
 71; Ma qey ew nabînin ku me ji tiptê destên me çêkiriye ji wan re hin dewaran aferandiye? vêca ew xwediye wan in.  
 72; Û me wan (dewara) ji wan re sitûxor kiriye; êdî hin ji wan lê siwar bibin û hin ji wan jî dixwin.  
 73; Û ji wan re di wan (dewaran) de gellek kar û vexwarin jî heye. Vêca ma hêjî ew sipas nakin?  
 74; Wan bêyî Xuda hin Xudayên din ji xwe re girtin bi hêviya ku wê bêne yarî kirin.  
 75; Lê ew nikarin yariya wan bikin. Ew ji wan (Xudayên derewîn) re lepkerên amade ne.  
 76; Vêca gotina wan bira te xemgîn neke. Bêguman em, tiptê ew vedipêrin û tiptê diyar dikin tev dizanin.  
 77; Ma mirov nabîne ku bi rastî me wî ji dilopek avik aferandiye?; vêca ew pêre pêre bûye dijberê xuya.  
 78; Wî ji me re minak da û aferandina xwe ji bîr ve kiriye. Wî got ku: "Hestiyê rizîyayî wê kî vejîne?"  
 79; Tu bêje ku: "Ê cara pêþîn wan çêkir wê ew wan vejîne. Ew bi her aferandinî baþ zana ye."  
 80; "Ewê ku ji we re ji dara hêþîn agir çêkir; vêca hûn jî pêre pêre jê vêdixin."  
 81; Ma qey ê ku asîmana û zemîn aferandiye nikare ku hinekî wekî wan biaferîne? Belê, ew pirr aferendekarekî zana ye.  
 82; Bêguman gava ew tiptekî bixwaze tenê fermana wî ev e ku jê re dibêje: "Çêbibe"; vêca ew jî pêre çêdibe.  
 83; Vêca pak bêrî ye ê ku xwedîtiya hemû tiptî bi destê wî ye û hûnê her bal wî ve bêne vegerandin.

#### Chapter 37 (Sura 37)

1; Bi (feriþteyên) qor bi qor in,  
 2; Û ên hey berî (ewran) didindajon,  
 3; Û ên hey Qur'anê dixweynin.  
 4; Bêguman Xudayê we her yek e,  
 5; Perwerdekarê asîmana û zemîn û tiptê di navbera wan de ye û perwerdekarê rojhelatan e.  
 6; Bêguman me asîmanê dinê (ê herî nêz) bi ronahî û xweþikiya sitêrkan xemilandiye.  
 7; Û ji bo parastina ji her pelîdê serkêþ;  
 8; Ku ew li civata herî jirîn gohdarî nekin û ew, ji her alî ve têne avêtin.  
 9; Qewrandinekî (bi gilokê agirîn); û ji wan re îþkencekî bi janê hertimî heye.  
 10; Tenê ê ku bi lez tiptekî bigre û bazde, vêca sitêekê ronak (wek gilokê agir) didin pey.

11; Vêca tu ji wan bipirse; gelo di pîpekarî de ew zortir in-tekûztir in yan ên aferandiye? Bêguman me wan ji herîkî zelqokî aferandiye.  
12; Ne, (dev ji wan berde) tu sosreta dibînî û ew jî tinaza dîkin.  
13; Û gava ew têne pîret kirin-bîr xistin ew pîret nagirin-bi bîr naynin.  
14; Û gava ayetek (nîpanek) bibînin ew dest bi tinaza dîkin.  
15; Û gotin ku: "Eva han hey efsûnek xuya ye."  
16; "Ma gava em bîmrin û bibin ax û hestî ma qey bera emê bêne vejandin-rakirin?"  
17; "Ma qey bav û kalên me yên pêpîn jî (wê rabin?)."  
18; Tu bêje: "Belê, û hûnê sitûxor bin."  
19; Vêca bêguman ew (rabûn) tenê yek qêrînek e; vêca ewê pêre pêre rabin û binêrin.  
20; Û wê bêjin ku: "Hey xulî li me be! roja xelat û celatê eva haye."  
21; Roja veqetandinê ku we wê diderewand eva haye.  
22; Hûn ewên sitemkar tevî jinên wan û tiptê dihebandin bicivînin.  
23; Wan bêyî Xuda (pûta û pelîd diheband); vêca hûn rêye dojahê nîpa wan bidin.  
24; Û hûn wan bisekinînin. Bêguman ewê bêne pirsyarî kirin:  
25; "Ma çima' hûn alîkariya hevûdin nakin?"  
26; Ne, ew îro sitûxor in.  
27; Hin ji wan li hina defitilîn ji hev dipirsîn.  
28; Gotin: "Bêguman hûn hey ji rast ve dihatine me."  
29; (Pêpwayan) got ku: "Ne, ji xwe hûn nebûn bawermend."  
30; "Tu zora me li ser we nebû; ji xwe hûn bûn komelek serkêp."  
31; "Vêca gotina perwerdekarê me li ser me pêwiat e. Bêguman emê her tam bikin."  
32; "Vêca me we ji rê derxist; bêguman em bi xwe jî jirêderketî bûn."  
33; Vêca bêguman ew wê rojê di ezab de hempar in.  
34; Bêguman em bi sûcdarên gunehkar her wuha dîkin.  
35; Bêguman ew, gava ji wan re dihate gotin ku: "Ji Xuda pêve tu Xuda nînin" wan quretiya dikir.  
36; Û digotin ku: "Ma qey bera emê ji bo pairekî dîn dev ji Xudayên xwe berdîn?"  
37; Ne, ew bi راستiyê hat û pêxemberan jî rast gotiye.  
38; Bêguman hûnê ji ezabê bi jan tam kin.  
39; Û hûn, ji tiptê we kiriye pêve nayên celat kirin.  
40; Bendeyên Xuda yên dilpak ne tê de.  
41; Ewên han ji wan re rozîkî xuya heye.  
42; G\_ellek fêkî jî û ew bi xweþî têne mazûrvanî kirin.  
43; Di bihiptê xweþiyan de ne.  
44; Li hember hev li ser texta rûniptî ne.  
45; Bi tasê ji meya pak tije li ser wan tê gerandin.  
46; Ji ên vedixwin re çîlsipî meyxop e.  
47; Ne tê de serxweþî û zikêþî heye û ne jî ew jê ji xwe diçin.  
48; Li cem wan hin jinên çav rindê çav mezin hene ku hey li wan dinêrin.  
49; Ew herwekî hêkê sipî parastî ne.  
50; Vêca hin ji wan hina difetilin ji hev dipirsîn.  
51; Yekî ji wan got ku: "Bêguman hevalekî min hebû."  
52; "Digot ku: "Ma qey tu ji ewên rasdidêrin-bawerî tînin î?"  
53; "Ma qey gava em bîmrin û bibin ax û hestî ma bera emê bêne celat kirinê?"  
54; Got: "Ma gelo haya we (ji wî hevalê min) heye?"  
55; Vêca bi ser (hevalê xwe) vebû; êdî wî da nava dojahê de dît.  
56; Gotê: "Ez bi Xuda kim hin mabû ku te min têk bibrana."  
57; "Eger ne ji qenciya perwerdekarê min bûna, ezê jî bi te re li wur bûma."  
58; "Vêca ma emê nemirana newsa?"  
59; "Ji mirina xwe ya pêpîn pêve û em nayên ezab dayîn jî!?"  
60; Bêguman rizgariya herî mezin her eva haye.  
61; Vêca xebatkar jî (xweþiyê) wekî vî re bira bixebitin.  
62; Ma ev ciyê xweþ çêtir e yan dara zîqûmê?  
63; Bêguman me wê (darê) ji sitemkaran re kiriye sihetî û tepqe.   
64; Bêguman ew darek e ku ji kurahiya dojahê dertê.  
65; Fêkiyê wê herwekî serê pelîdan e.  
66; Vêca bêguman wê ew jê bixwin û wê zika jê tije bikin.  
67; Papê bi rastî ji wan re di ser de jî vexwarînek tevlihev ji ava kel heye.



68; Papê bêguman vegergeha wan bal dojeha har ve ye.  
 69; Bêguman wan, bav û kalên xwe yên jirêderketî jî dît.  
 70; Vêca ew li ser rê û rêça wan dibezin.  
 71; Sond be, berî wan pirrî pêpiyan jî rê pap kiribûn.  
 72; Sond be me gellek (pêxemberên) hiþyarker di nava wan de pandibû.  
 73; Vêca tu binêre ka paþiya ên hatin hiþyar kirin çewa bû?  
 74; Bendeyên Xuda yên dilpak ne tê de.  
 75; Sond be, Nûh gazî me kir; vêca ên bersiv dan çî rind bûn!  
 76; Me wî û malbata wî ji wê kovana zor mezin xelas kir.  
 77; Û me ên mayîn her azbata wî hiþt.  
 78; Û me navê wî di nav ên ji pare de tên hiþt.  
 79; Di nav hemû aleman de silav li ser Nûh be.  
 80; Bêguman em, qencikaran wuha xelat dîkin.  
 81; Bêguman ew, ji bendeyên me yên bawermend e.  
 82; Papê mê ên din tev fetisand.  
 83; Û bêguman Îbrahîm jî ji hemkîþê wî ye.  
 84; Dema bi dilekî pak hate perwerdekarê xwe.  
 85; Dema ji bavê xwe û gelê xwe re got ku: "Ma hûn çî dihebînin?"  
 86; "Ma hûn bêyî Xuda bi derew hin Xudayên din dixwazin?"  
 87; "Vêca ma gumana we bi perwerdekarê hemû aleman çîye?" (hûn guman dîkin wê çî bi we bike).  
 88; Vêca bi nêrînek li sitêrka mêzand.  
 89; Vêca got ku: "Bêguman ez nexweþ im."  
 90; Vêca wan piþt danê çûn.  
 91; Êdî ewî berê xwe bal Xudayên (pûtên) wan ve kir vêca got: "Ma hûn çîma naxwin?"  
 92; "Ma çî bûye ji we hûn nepeyivin?"  
 93; Vêca berê xwe da wan bi destê raste li wan da.  
 94; Vêca wan berê xwe danê bilez berpê hatin.  
 95; Got: "Ma hûn tiptê we (bi destê xwe) hekandiye dihebînin?"  
 96; "Xuda we û tiptê hûn çêdikin tev aferandiye."  
 97; Gotin: "Hûn jê re avahiyek lêkin, vêca hûn wî bavêjin dojeha agir."  
 98; Vêca wan xwest ku pê xerabî bikin, êdî me wan kir ên herî jêrîn.  
 99; (Îbrahîm) got ku: "Bêguman ez diçim bal perwerdekarê xwe, wê ew rêya rast nîþa min bide."  
 100; "Perwerdekarê min! tu (zarûkî) ji qencan bi min baxþîne."  
 101; Vêca me mizgîna zarûkî sernerm dayê.  
 102; Vêca çî gava (ew zarûk) pê re gihîþte çaxa ger û xebatê, gotê: "Kurê min! bi rastî min di xewê de dît ku min te serjê dîkir; vêca binêre ka tu çî dibînî?" Got: "Bavo can! tiptê tu têyî ferman kirin bike. Xuda hiz ke tu yê min ji bîhnfirehan bibînî."  
 103; Vêca çî gava herdûyan jî serî (ji Xuda re) danîn û wî li ser kêleka rastê serê wî danî erdê.  
 104; Me gazî kirê: Îbrahîm!  
 105; Bêguman te xewnê rast dêrand. Bêguman em qencikaran wuha perû dîkin.  
 106; Bêguman sihêtiya aþîkar her eva han e.  
 107; Û me di bergîdanê de goriyeke mezin dayê.  
 108; Û me navekî xweþ jê re di nav ên papîn de hiþt.  
 109; Silav li Îbrahîm be.  
 110; Em qencikaran wuha xelat dîkin.  
 111; Bêguman ew ji bendeyên me yên qenc e.  
 112; Û me mizgîna Îshaq ku pêxemberek ji qencan e dayê.  
 113; Û me rozîkî fireh da wî û Îshaq; ji azbata wî qencîkar û ê aþkera li xwe sitemkar jî hene.  
 114; Sond be me li Mûsa û Harûn jî qencî kir.  
 115; Û me wan û gelê wan ji renceke mezin xelas kir.  
 116; Û me yariya wan kir; vêca ên serkeftî her bûn ew.  
 117; Û me kitêbek pirr xuyaker da wan.  
 118; Û me rêya rastîn nîþanî wan da.  
 119; Û me navekî xweþ ji wan re di nav ên papîn de hiþt.

120; Silav li Mûsa û Harûn be.  
 121; Bêguman em qencîkaran wuha xelat dîkin.  
 122; Bêguman ew herdû jî ji bendeyên me yên bawermend in.  
 123; Û bêguman Îlyas jî ji pêxemberan e.  
 124; (Di bîr bine) dema ji gelê xwe re got ku: "Ma hûn xwe naparêzin-natirsin?"  
 125; "Ma hûn gazî pûta dîkin-dihebînin û hûn dev ji rindtirîne aferendekaran berdidin?"  
 126; "Xuda perwerdekarê we û perwerdekarê bav û kalên we yên pêpîn e."  
 127; Vêca wan wî derewand; êdî bêguman ewê bêne amade kirinê.  
 128; Bendeyên Xuda yên dilpak ne tê de.  
 129; Me navekî xweþ jê re di nav papîniyan de hiþt.  
 130; Silav li Îlyas be.  
 131; Bêguman em qencîkaran wuha xelat dîkin.  
 132; Bêguman ew ji bendeyên me yên bawermend e.  
 133; Û bêguman Lût jî ji pêxemberan e.  
 134; (Di bîr bine) dema me wî û malbata wî tev xelas kir.  
 135; Ji pêþîrê pîrenjinekî ku di nav ên mayî de ma.  
 136; Papî me ên din serûbin kir.  
 137; Û bêguman hûn sibeha hey di ser wan re diçûn û tîn.  
 138; Û bi þev jî, ma hûn hêjî hiþ tê nabin-xwe ranagirin?  
 139; Û bêguman Yûnis jî ji pêxemberan e.  
 140; (Di bîr bine) dema (ji gelê xwe) dût bû-reviya çû bal keptîkî tije ve.  
 141; Vêca peþk kirin; êdî ew bû ji ên sitûxor (peþk li wî ket ku ew ji keptiyê bê avêtin).  
 142; Vêca masîkî mezin wî daqurtand û ewî loma li xwe dikirgunehkar bû.  
 143; Vêca eger bi rastî ew nebûya ji limêjkaran;  
 144; Ewê di zîkê wî (masiyî) de heya roja rabûnê bimana.  
 145; Vêca me wî avête zemînek rût, tevî ew nexweþ bû jî.  
 146; Û me darekî ji kundira li serê hêþîn kir.  
 147; Û me wî þandibû bal sed hezar (mirov) yan hê þirrîr.  
 148; Vêca wan bawerî anî, êdî me wan heya demekî bi xweþî jiyand.  
 149; Vêca tu ji wan bipirse ma ji perwerdekarê te re keç û ji wan re jî kur hene?  
 150; Ma qey me ferîþteyan mê aferandiye û ew jî hazir û danas bûn?  
 151; Hay jê bin! bêguman ew ji derewa xwe dibêjin:  
 152; "Xuda zarû çekirîye:" Bêguman ew þirr derewkar in.  
 153; Ma wî keça di ser kura re girtiye?  
 154; Ma çi bûye ji we?, hûn çewa hukim dîkin?  
 155; Ma hêjî hûn nafikirin?  
 156; Yan ji we re delîlek zexmî xuya heye?  
 157; Vêca eger hûn bera rastgo ne ka kitêba xwe bînin!  
 158; Û di navbera wî û cinna de jî nasebek çekirîne. Sond be cinn baþ dizanin ku wê ew bêne amade kirin.  
 159; Xuda ji tiþtê ew salix didin pak bêrî ye.  
 160; Ji pêþtirê bendeyên Xuda yên dilpak.  
 161; Vêca bêguman hûn û tiþtê hûn dihebînin,  
 162; Hûn qet (kesî) nikarin li serê ji rê derînin.  
 163; Ji pêþtirê kesê ku wê têkeve dogehê.  
 164; (Ferîþteyan got ku:) "Ji her yekî ji me re payekî diyar heye."  
 165; "Û bêguman em hey qor bi qor in."  
 166; "Û bêguman em hey li mêjkar in."  
 167; Her çend wan hey digot ku:  
 168; "Eger bi rastî kitêbek ji pêþiyan li cem me hebûna,"  
 169; "Emê bibûna ji bendeyên Xuda yên dilpak."  
 170; Vêca ew pê kafir bûn, êdî wê papê bizanbin.  
 171; Sond be peyva me ji bendeyên me yên pêxember re derbas bûye ku:  
 172; Bêguman ên wê bêne yarî kirin her ew in.  
 173; Û bêguman ên serkeftî her leþkjarên me ne.  
 174; Vêca tu heya demekê rû ji wan bizivrinê.  
 175; Û tu li wan binêre; vêca ewê papê bibînin.

176; Vêca ma ew bi ezabê me dilezînin?  
177; Vêca gava ew (ezab) li hêla wan daket, vêca sibeha ên hatine hiþyarkirin tirsandin wê çiqas nexweþ be!  
178; Tu heya demekê rû ji wan bizivrine.  
179; Û tu bibîne vêca ewê jî paþê bibînin.  
180; Perwerdekarê te ku perwerdekarê serkeftinêy e ji tiptê ew salix didin pak bêrî ye.  
181; Û silav li ser pêxemberan be.  
182; Û pesn û sipas ji Xudayê perwerdekarê hemû cîhanan re ye.

#### Chapter 38 (Sura 38)

1; Sad. Bi Qur'ana xwedan zikir (pend û pîret) kim (ku gotina kafiran nerast e).  
2; Ne, ên kafir bûne di quretî û neyartiyê de ne.  
3; Me berî wan çiqas nifþa têkbiriye, vêca wan hewar û gazî kir, lê dema revê qet nemaye.  
4; Ew sosret man ku hiþyarkerek ji wan hate bal wan û kafiran got ku: "Evê han efsûngerek pirr derewkar e."  
5; "Ma ew Xudayan dike yek Xudakî? Bêguman evê han tiptekî pirr sosret e."  
6; Û koma sereka ji wan rabûn derketin (û gotin:) "Herin û li ser Xudayên xwe hewî bînin. Bêguman evê han tiptek e ku tê xwestin."  
7; "Me evê han di naf komela paþîn de jî nebihîstiye. Evê han hey derewek bi hev xistin ye."  
8; "Ma ji navbera me zikir (Qur'an) bi ser wî de hatiye daxistin?" Ne, ew ji zikrê min (Qur'anê) di dudiliyê de ne. Ne, wan hê ezabê min tam nekiriye.  
9; Ma qey xiznê dîlovaniya perwerdekarê te yê serkeftiyê pirr bexpende li cem wan in?  
10; Yan qey mulkê asîmana û zemîn û tiptê di navbera wan de ê wan e? (Eger ê wan e) nexwe bira di rêyê (asîman) de hilkþin!  
11; (Ew) li wê der (li Bedrê) ji partiyan leþkerekî þikestxwarî ne.  
12; Berî wan komela Nûh û Ad û Fîr'ewn ê xwedî sing jî derewandin.  
13; Û Semûd û komela Lût û ehlê Eyketê (satara-daristanê gurr) jî (derewandin). Partî evên han in.  
14; Teva jî hey pêxemberan derewand, vêca ezabê min pêwist bû.  
15; Evên han hey li benda yek qêrînekî ne qu jê re tu xweþî (û veger û bixwevehatin) nîne.  
16; Wan (bi tinaz) got ku: "Perwerdekarê me! tu berî roja hisabê zûtir defterê me (yê qu xweþî û xelatê para me tê de ne) bide me!"  
17; Tu li ser tiptê ew dibêjin bihnfirehî nîþan de û bendeyê me Dawid ê xwedan hêz di bîr bîne. Bêguman ew pirr bendewar e.  
18; Bêguman me, pê re çiyayan sitûxor kir ku êwar û sibeha (Xuda ji kêmasiya) pak bêrî didêrin.  
19; Û teyr jî (li balê) juvandî ne; giþt jê re bendewar in.  
20; Û me mulkê wî bihês kir û me hîkmet û zanîna bi xweþî ji hev veqetandinê dayê.  
21; Ma xebera wan dozدارan ji te re hat? (Tu goh bidê) dema wan hawîdorê mîhrabê (lîmêjgehê) girt.  
22; Dema ew ketin bal Dawid, vêca ew ji wan bizdiya. Gotinê: "Netirse, em du dozdar in ku hina ji me li hina tadê kiriye, vêca tu bi rastiyê di navbera me de hukim bike û ji rastiyê dûr nebe-ne-heqî neke û tu rêya rast nîþa me bide."  
23; "Bi rastî evê han birayê min e, not û neh bizinê wî ne û ê min jî yek bizinekî ye, vêca wî got ku: "Tu wê jî bispêre min û di gotinê de bi ser min ket."  
24; (Dawid) got ku: "Bêguman wî bi xwestina bizina te ku tu tevlihev dikin hin ji wan li hina tadê dikin, tenê ên bawerî anîne û karên qenc kirine ne tê de. Ew jî çiqas hindik in!" Dawid zanî ku me bera wî sihêtî kiriye, vêca bexþînê ji perwerdekarê xwe xwest û li piya xwe xor kir û (ji kirinê xwe) popman bû-vegeriya.  
25; Me jî wî jê re bexþand û bêguman jê re li cem me nêzikahî û vegera rind heye.  
26; Dawid! bêguman me te di rûyê zemîn de kiriye canîþîn, vêca tu di nabeyna mirovan de bi rastiyê hukim bike û nede pey hewesa, vêca wê te jý rþya Xuda paþ dibin ji wan re bi sedem ku roja hisabê (qiyametê) ji bîr kirine ezabek diþwar

heye.

27; Me asîman û zemîn û tiptê di navbera wan de pûç û bereday ne aferandiye. Eva gumana ên kafir bûne ye. Vêca ji agir xulî li ên kafir bûne be!

28; Ma qey emê ên bawerî anîne û karên qenc kirine wekî xerabkarên di rûyê zemîn de bigrin? Yan emê xweparêzan wekî gunehkaran bigrin?

29; (Eva) kitêbek pîroz e ku me wê bal te ve daxistiye ji bo ku ew di ayetên wê de hûr bifikirin û xwedan hiş bîret bigrindi bîr binin.

30; Û me Silêman bi Dawîd bexband. î bendekî rind e! Bêguman ew pirr bendewar e.

31; (Di bîr bine) dema berî êvarê hespê rewanî beza jê re hatin pêpkêş kirin.

32; Vêca got ku: "Bêguman min hizkirina mal (hespa) di ser bîranîna perwerdekarê xwe re girt heya ku (roj) bi perda (tariyê) hinda bû.

33; (Got ku:) "Hûn wan li min vegeirînin"; vêca (bi pûr) çûr û sitûyan dest pê kir (jê kir).

34; Sond be, me cendekêki avêt ser textê wî, papê ew vegeirîya.

35; (Silêman) got: "Perwerdekarê min! tu (gunehê min) ji min re bibexşîne û mulkekî bide min ku piştî min ji tu yekî re nebe. Bêguman tu, her bexpendekar tu yî."

36; Vêca me bayê jê re sitûxor kir ku ew bi fermana wî kuder bivê bi xweşî û sernermî diherike.

37; Û pelîdan jî, her avaker û noqvana (me jê re ram kir).

38; Û (pelîd) ên din jî ku di qeyd û xelean de girêdayî ne.

39; Evê han dayîna me ye; êdî (ê dixwazî) qencî bike (berde) yan bihêle (bernede), bêhesab (tu serbestî).

40; Û bêguman jê re li cem me nêzîkahî û vegerek rind heye.

41; Û tu bendeyê me Eyûb jî di bîr bine dema gazî perwerdekarê xwe kir ku: "Bêguman ez, pelîd bi êş û ezab têkilî min bûye."

42; (Vêca me gotê ku:) "Tu piyê xwe li erdê de. Eva avekî sar e û a vexwarinê ye."

43; Û me ji ber dilovaniyek ji xwe û bîrxistina-þîreta xwedan hiþa maliyê wî û bi qasî wan pê re jê re bexband.

44; Û (me gotê ku:) "Tu bi destê xwe qevdekî qirþik bigre, vêce tu pê lêde û sonda neþkîne." Bêguman me wî pirr bihnfireh dît. Çi bendekî rinde! Bêguman ew pirr bendewar e

45; Û tu bendeyên me Îbrahîm û Îshaq û Yaqûb ên xwedan hêz û zanîn jî di bîr bine.

46; Bêguman me wan bi xurû dibîranîna warê (axretê-bihîptê) pak dêreya.

47; Û bêguman ew li cem me ji hilbijartiyên qenc in.

48; Û tu Îsmâîl û Yese' û Zulkîf jî di bîr bine. Giþt jî ji qencan e.

49; Evê han bîranîneke rind e; Û bêguman ji xweparêzan re vegerek rind heye.

50; Bihiptê xweþiyê ku derî ji wan re li ser piþtê vekirîne.

51; Ew tê de paldayî ne; ew tê de gellek fêkî û vexwarinê dixwazin.

52; Û li cem wan keþê hevsal ku hey li wan dinêrin hene.

53; Tiptê hûn ji bo roja hisabê (axretê) tene wade dayîn evê haye.

54; Bêguman evê han hey roziya me ye ku tu qedandin jê renîne.

55; Evê han (ji xweparêzan re ye), Û bêguman ji serkêþan re jî vegerek nerid heye.

56; Dojeh e ku dikevinê-tê dipewitin; vêca ew çî civînek nerid e!

57; Evê han avekî kelandî û avekî pirr sar e vêca bira ew jê tam kin.

58; Û a din ji teþnîtê wî cot bi cot in.

59; (Zebaniya gote serekên wan:) "Eva han komekî ye ku xwe bi we re davêjin (agir. Wan got:) "Ew qet nebixêr hatin. Bêguman ewê têkevin agir."

60; Gotin: "Ne, hûn qet nebixêr hatin. We wî (agirî) ji me re pêþ xist. Vêca pûna manê çî nerid e!"

61; Gotin: "Perwerdekarê me! kî evê han ji me re pêþ xistiye, êdî tu di agir de ezab jê re li ser hev pirrtir bike."

62; Û gotin ku: "Çî bûye ji me ku em hin zîlamê ku me wan ji xeraba dijmart nabînin?"

63; "Me wan bi tinaza digirt yan .av ji wan fetilîne?"

64; Bêguman evê han bera xirecira ehlê agir e.

65; tu bêje: "Bêguman ez tenê hiþyarker im; Û ji Xudayê yekta yê her serkeftî pêve tu Xuda nînin."

66; "Perwerdekarê asîmana û zemîn û tiptê di navbera wan de ye, ê serkeftiyê pirr bexpendekar e."

67; Tu bêje: "Ew (Qur'an yan rabûna piptî mirine) bûyerek pirr mezin e."  
 68; "Hûn jê rû dizivrînin."  
 69; "Tu zanîna min bi civata jorîn nîne dema ew bi hev re xirecirê dîkin."  
 70; "Her bal min ve wehî dibe ku bêguman ez tenê hiþyarkerek xuya me."  
 71; (Di bîr bîne) dema perwerdekarê te ji feripteyan re got ku: "Bêguman ezê mirovekî ji heriyê çêkim."  
 72; "Vêca gava min wî li hev rast kir û min ji canê xwe te pif kir; êdî hûn jê re serî deynin."  
 73; Vêca hemû feripteyan tev jê re serî danî."  
 74; Ji pêptirê pelîd. Wî quretî kir û bû ji kafiran.  
 75; (Xuda) got: "Pelîdo! çi nehipt ku tu ji tiptê min bi destê xwe aferandiye re serî deynî? tu qure bûyî yan bûyî ji poz bilindan."  
 76; (Pelîd) got: "Ez jê çêtir im. Te min ji agir aferandiye û te wî jî ji heriyê aferandiye."  
 77; (Xuda) gotê: "Nexwe ji wê derkeve; lewra bêguman tu qewrandî yî."  
 78; "Û bêguman laneta min heya roja xelat û celatê li ser te ye."  
 79; Wî got ku: "Perwerdekarê min! tu heye roja ku wê bêne rakirin li benda min bimîne."  
 80; (Xuda) gotê: "Êdî bêguman tu ji wanê li benda wan tê mayîn î."  
 81; "Heya roja ku wextê wê diyar e."  
 82; (Pelîd) got ku: "Vêca ez bi rûmet û serkeftina te kim, ezê wan teva bixapînim."  
 83; "Tenê bendeyên te yên dilpak ji wan ne tê de."  
 84; (Xuda) got ku: "Vêca (Ez) rast im û her rastiye dibêjim."  
 85; "Ezê dogehê ji te û ji ên ji wan didin pey te teva tiye kim."  
 86; Tu bêje ku: "Ez ne tu destmuzî li serê ji we dixwazim û ne jî ez bi zorê ji ber xwe ve derdixim."  
 87; 2Ew (Qur'an) ji hemû cîhanan re hey pîret û bîrxistin e."  
 88; "Û hûnê xebera wê piptî demekê baþ bizanbin."

#### Chapter 39 (Sura 39)

1; Daxistina kitêbê hin bi hin ji Xudayê serkeftiyê hîkmetdar e.  
 2; Bêguman me kitêbê bi rastiye bal te ve daxistiye vêca tu Xuda bihebîne, dîn jê re pak bidêrîne.  
 3; Hay jê bin! dînê pak her ê Xuda ye. Ewên ku ji Xuda pêve hin yar û yaweran girtine (û dibêjin ku:) "Em wan dihebînin ji bo ku ew me hey bal Xuda ve nêztir bikin"; bêguman wê Xuda di navbera wan de di tiptê ku tê de bi hev ketine de hukim bike. Bêguman Xuda ewê ku derewkarê pirr kafir e nade ser rêya rast.  
 4; Eger Xuda bixwesta ku zarû bigire wê ji tiptêdiaferîne a hiz dike hilbijartana. Ew pak bêrî ye. Ew Xuda yektayê herî serkeftî ye.  
 5; Wî asîmana û zemîn bi rastiye aferandiye; pevê li ser royê dipêçe û royê li ser pevê dipêçe; ûroj û hîvê sitûxor kiriye. Tev jî ji demek navdayî re diherikin. Hay jê bin! serkeftiyê pirr bexpendekar her ew e.  
 6; We ji yek canekî aferandiye, papê jê hevala wî jî çêkir û ji we re ji dewara hept cota daxistiye (aferandiye). We di zikê dayîkên we de di sê tarîtiyan de bi aferandinek piptî aferandinek diaferîne. Ev Xudayê han perwerdekarê we ye. Mulk her ê wî ye. Ji wî pêve tu Xuda nînin. Nexwe hûn çewa tene zivirandin?  
 7; Eger hûn kafir bibin, êdî bêguman Xuda ji we bêhewce ye, û ew ji bendeyên xwe bi kufrê qayil nabe. Eger hûn sipas bikin ew pê ji we qayil dibe. Tu bardarê guneha barê gunehê yekî din hîlnagire. Papê vegera we her bal perwerdekarê we ve ye; vêca wê we bi tipte we kiriye haydar bike. Bêguman ew baþ zanayê bi tiptê di singan de ye.  
 8; Gava nebaþîkî têkilî mirov dibe ew gazî perwerdekarê xwe dike, bal ve vedigere, papê gava qencîkî ji xwe pê dike, ew tiptê berê bal ve gazî dikir ji bîr dike, û ji Xuda re hemtayan çêdike ji bo ku (mirova) ji rêya wî þaþ bike. Tu bêje ku: "Tu bi kufra xwe hindikî kêfxweþ be. Bêguman tu ji hevalê agirî."  
 9; Ma (evê han baþ e) yan ê ku nîvê pevê radibe serê xwe datîne û li piya limêj dike, ji (ezabê) axretê ditirse û dîlovaniya perwerdekarê xwe hêvî dike? Tu bêje ku: "Ma ên dizanin û ên nizanin wekî hev in." Bêguman tenê xwedan hiþ difikirin-pîret digrin.

10; Tu bêje ku: "Gelî bendeyên min ên bawerî anîne! hûn xwe ji perwerdekarê xwe biparêzin-bitirsîn. Ji ewên di vê dunya han de qencî dikin qencî heye; û axa Xuda fireh e. Bêguman tenê ên bihnfireh bêjmartin destmuza wan bi tevayî tê dayîn."

11; Tu bêje ku: "Bêguman ez hatime ferman kirin ku Xuda bihebînim, dîn hey jê re pak bidêrim."

12; "Û ez hatime ferman kirin ku ez bibim pêpînê musulmanan."

13; Tu bêje ku: "Bêguman ez, eger bêemriya perwerdekarê xwe bikim, ji ezabê roja mezin ditirsim."

14; Tu bêje ku: "Ez hey Xuda dihebînim, dînê xwe jê re pak didêrim."

15; "Vêca hûn ji wî pêve kî dixwazin bihebînin." Tu bêje ku: "Bêguman ziyankar ew in ku xwe û ehlê xwe roja qiyametê zîyan kirine. Hay jê bin! ziyana herî xuya eva haye.

16; Ji wan re di ser wan re tebeqên ji agir û di bin wan re tebeqên (ji agir) hene. Evê han Xuda bendeyên xwe pê ditirsîne. Bendeyên min! êdî hûn xwe ji min biparêzin-bitirsîn.

17; Ewên ku xwe ji pelîd dûr girtine ku wî bihebînin û bal Xuda ve vegeeriyane, mizgîn ji wan re ye.

18; Vêca ku gotinê dibihîzin êdî didin pey a herî rindê wê. Evê han in ên ku Xuda wan daye ser rêya rast û ên xwedan hişk ji her evên han in.

19; Vêca ma ê peyva ezabê li serê pêwîst bûye, ma ê di agir de tê xelas bikî?

20; Lê belê, ên xwe ji perwerdekarê xwe parastine ji wan re kopkê bilind ku di ser wan re qonaxên avakirî hene ku di binê wan re jî çem diherikin. Wada Xuda ye ( ku bi wan re wad daye). Xuda ji wada xwe danagere.

21; Ma tu nabînî ku bêguman Xuda avê ji asîman daxistiye, vêca wê di zemîn de kiriye kanî, papê pê çandiniyê cihê reng derdixe, papê ew hişk dibe. Vêca tu wî zerbûyî dibînî papê wî hûr hûr dike. Bêguman di vî de ji xwedan hişan re pîret û bîrxistinî heye.

22; Vêca ma ê ku Xuda singa wî ji îslamê re vekiribe û ew li ser ronahiyek ji perwerdekarê xwe be (wekî ê bêronahî ye?) Vêca xulî li ên ku dilên wan ji bîranîna Xuda hişk in! ewên han di papîkî diyar de ne.

23; Xuda rindtirê peyva ku kitêbek (ayetên wê) dirûvêhev pêdixin, tene dubare kirin, daxistiye ku çermê ên ji perwerdekarê xwe ditirsîn jê diguruze, papê çermê wan û dilên wan bal bîranîna Xuda ve nerm dibe. Evê han rêberiya Xuda ye ku ê bixwaze rêberî rêya rast dike. Kesê Xuda wî ji rê pap bike, êdî tu rêber jê re nînin.

24; Vêca ma ê ku roja qiyametê xwe bi rûyê xwe ji diywariya ezab diparêze (wekî ê ku dikeve bihiptê ye?) Ji sitemkaran re tê gotin ku: "Hûn tiptê we bi dest xistiye tam bikin."

25; Ên berî wan jî derewandin, vêca ezab ji alîkî ku haya wan jê nebû hate wan.

26; Vêca Xuda rûrepiya di jiyana dinê de bi wan da tam kirin û ezabê axretê jî her mezintir e, eger bizanbûna (lê ew nizanin).

27; Sond be me di vê Qur'ana han de ji mirovan re her mînakî daye; hevî heye ku ew bifikirin-pîret bigrin.

28; Qur'anek (bi zimanê) erebî ye, bê tu çewtî ye; hevî heye ku ew xwe biparêzin-bitirsîn.

29; Xuda, zilamek mînak da ku çend kes tê de pîrîk in li serê xirecir dikin û zilamek jî ê yekî bitenê ye. Ma ev herdu ji alî mînak ve wekî hev in? Pesn û sipas ji Xuda re. Ne, pirrî wan nizanin.

30; Bêguman tê bimrî û bêguman ewê jî bimrin.

31; Papê bêguman hûnê roja qiyametê li cem perwerdekarê xwe bi hev re xirecirê bikin.

32; Vêca ma ji ê derewa davê ser Xuda û rastiyê dema jê re tê diderewîne sitemkartir kî heye? Ma ji kafiran re pûnwarek di dogehê de nîne?

33; Ewê ku rastiyê aniye û wê rast dêraye, ên xweparêz her evê han in.

34; Ji wan re li cem perwerdekarê wan tiptê bixwazin heye. Xelata qencîkaran eva haye.

35; Ji bo ku Xuda nerindtirê tiptê kirine ji wan bibe-vepêre û destmuza wan bi rindtirê tiptê kirine perû bike.

36; Ma qey Xuda têra bendeyê xwe nake? Ew te bi ên pêptirê wî didin tirsandin.

Xuda, kî ji rê paþ bike êdî tu rêber jê re nînin.

37; Û Xuda, kî bide ser rêya rast, êdî tu kes nikare wî ji rê paþ bike. Ma qey Xuda serkeftiyê heyfsitan nîne?

38; Sond be eger tu ji wan bipirsî ku kî asîmana û zemîn aferandiye? Wê bêjin:

"Xuda". Tu bêje ku: "De ka binêrin, tiptê hûn bêyî Xuda dihebînin, eger Xuda bixwaze ziyaneke bigihîne min, ma ew (pût) dikarin ziyana wî rakin yan eger bixwaze dilovaniyek bigihîne min, ma ew dikarin dilovaniya wî nehêlin?" Tu bêje ku: "Xuda besî min e. Ên xwesipar her xwe dispêrin wî."

39; Tu bêje: "Gelê min! hûn di pûna xwe de bixebitin, béguman ez jî xebatkar im; vêca hûnê papê bizanbin."

40; "Kî ezab pêde were, ew wî rûreþ dike û ezabê hertimî jî bi ser de tê."

41; Béguman me ji mirovan re kitêbê bi rastiyê li ser te daxistiye, vêca kî rêya rast bibîne êdî ew ji xwe re dibîne û kî jî rê paþ bike êdî ew ji xwe re paþ dike. Tu li ser wan parêzvan nîni.

42; Xuda cana dema mirîna wan distîne û a ku di xewa xwe de nemiriye jî (distîne). Vêca a ku mirîna li serê hukim kiriye digre û a din jî heya demekî navdayî berdide. Béguman di vî de ji komelekî difikirin re gellek ayet (nîþan) hene.

43; Ma bêyî Xuda hin mehdervana girtine? Tu bêje ku: "Ma gelo ew tu tiptê di dest wan de nebe û ew hiþ tê nebin jî (hêjî ewê wan ji xwe re mehdervan bigrin?)."

44; Tu bêje ku: "Mehdervanî tev her a Xuda ye. Mulkê asîmana û zemîn her ê wî ye. Papê hþnê her bal wî ve bêne vegerandin."

45; Û gava Xuda bitenê bê bîranîn, dilê ewên bi axretê bawerî naynin bi quretî û nexweþî tê girtin; û gava ên bêyî wî tene behs kirin ew pêre pêre dilþa dibin.

46; Tu bêje: "Xudayê me! ê ku asîmana û zemîn aferandiye, zanayê bi penhan û peyda ye! tu di navbera bendeyên xwe de di tiptê ew tê de bi hev ketine de hukim dikî."

47; Béguman eger hemû tiptê di rûyê zemîn de û bi qasî wî jî pê re ê wanê sitemkarî kirine bûna, wê wan roja qiyametê ji ber zoriya ezab ve bergîdan bidana. Ji wan re ji Xuda tiptê qet guman nedikirin xuya bû.

48; Xerabiyê tiptê bi dest xistin ji wan re xuya bû û tiptê pê tinaza dikirin bi wan de hat.

49; Vêca gava nexweþîkî digihîje mirov, ew gazî me dike. Papê gava em xweþîkî ji xwe didinê ew dibêje: "Béguman ew li ser zanînek ji min re hatiye dayîn." Ne, ew (jê re) sihetî ye, lê belê pirrî wan nizanin.

50; Bi rastî ên berî wan jî vê gotibûn; vêca tiptê bi dest xistibûn qet bikêra wan nehat.

51; Vêca xerabiyê tiptê bi dest xistin hate serê wan. Ji ewên han jî ên ku sitemkarî kirine wê xerabiyê tiptê bi dest xistine were serê wan û ew nikarin nehêlin jî.

52; Ma qey ew nizanin ku béguman Xuda rozî ji kesê bixwaze re fireh dike û teng dike. Béguman di vî de ji komelekî ku bawerî tînin re gellek ayet (nîþan) hene.

53; Tu bêje: "Gelî bendeyên min ên ku li xwe tadê kirine- ji hed derketine! hûn ji dilovaniya Xuda bêhêvî nebin. Lewra béguman Xuda hemû guneha dibexþîne. Lewra béguman bexþendekarê dilovan her ew e.

54; "Û hûn bal perwerdekarê xwe ve vegerin û berî ku ezab bê we hûn jê re serî deynin, papê hûnê neyên yarî kirin."

55; "Û berî ku ezab ji niþkav de bê we û haya we jê nebe hûn bidin pey rindtirê tiptê ji perwerdekarê we bal we ve hatiye daxistin."

56; Û (hûn bilezînin berî) ku her kes (ji we) bêje: "Hey wax li min! li ser kêmasiyê ku min derbareê Xuda de kiriye û ez jî her ji wanê ku tinaza dikirin bûm."

57; Yan bêje: "Eger Xuda min bida ser rêya rast ezê jî bibûma ji xweparêzan."

58; Yan jî dema ezab bibîne bêje: "Eger bi rastî firsendeke din ji min re hebûna, êdî ezê jî bibûma ji qencîkaran."

59; (Xuda wuha bersiva wî dide:) "Belê çewan, bi rastî ayetên min ji te re hatin, vêca te wan derewand û te quretî kir û tu bûyî ji kafiran."

60; Û roja qiyametê tu ewên ku derewa davên ser Xuda dibîni ku rûyên wan reþ bûye. Ma qey ji qureyan re pûnek di dogehê de nîne?

61; Û Xuda ewên xweparêzî kirine jî bi qenciyên wan, wan xelas dike; ne xerabî digihê wan û ne jî ew xemgîn dibin.

62; Xuda aferandekarê her tiptî ye û ew li ser her tiptî parêzvan e.

63; Miftê gencineyê asîmana û zemîn ê wî ne. Ewên ku bi ayetê Xuda kafir bûne ên ziyankar her ewên han in.

64; Tu bêje: "Gelî nezana! ma hûn fermana min dikin ku ez ji pêptirî Xuda bihebînim?"

65; Sond be bal te û bal ên berî te ve hatiye wehî kirin ku eger tu pîrîka çekî wê karê te hey bişewite û tê yî bibî ji ziyankaran.

66; Ne, êdî tu her Xuda bihebîne û bibe ji sipaskaran.

67; Wan rûmeta Xuda çewa hêjayê wî ye negirt. Roja qiyametê zemîn tev di destê wî de ye û asîman jî bi destê wî yê rastê pêçayî ne. Ew, ji tiptê dikin pîrîk pak bîrî ye û pîrr bilind e.

68; Û di sûrê de hat pîf dayîn, êdî ên di asîmana de û ên di zemîn de ne ji pêptirê ê ku Xuda bixwaze pêve tev ji qêrînê bêhiş ketin mirin, papê dîsa tê de hat pîf dayîn, êdî ew pîre pîre rabûn li bendê man.

69; Zemîn bi ronahiya perwerdekarê xwe rohnî bû û kitêb hat danîn û pêxember û danas hatin anîn û di navbera wan de bi rastiyê hate hukim kirin û ew nayên tade kirin jî.

70; Herkes tiptê kiriye bêkêmasî hatiye dayîn û ew bi tiptê dikin zanatir e.

71; Û ewên kafir bûne kom bi kom bal dogehê ve tene ajotin, heya gava hatinê pîre derên wê vebûn û dergevanên wê ji wan re gotin ku: "Ma qey hin pêxemberên ji we ku ayetê perwerdekarê we li ser we dixwendin û we bi pergîhatina vê roja we ya han hişyar dikirin-ditirsandin ji we re nehatin?" Gotin: "Belê çewa (nehatin)." Lê belê peyva ezab li ser kafiran pêwîst bûye."

72; Hat gotin ku: "Hûn têkevin deriyê dogehê hertimî tê de bin. Vêca pûna qureyan çî nerind e!"

73; Û ewên ku xwe ji perwerdekarê xwe parastibûn-tirsiya bûn kom bi kom bal bihiptê ve hatin ajotin, heya gava hatinê û deriyên wê hatibûn vekirin û dergevanên wê gotin wan: "Silav li we be. Hûn dilpa ne. Êdî hertimî têkevinê."

74; Wan jî got ku: "Pesn û sipas ji Xudayê ku wada xwe ji me re rast deranî û me kir mîratxwîrê zemîn ku em ji bihiptê kuder bixwazin wê der qonax digrin. Vêca xelata xebatkaran çî rind e!"

75; Û tu ferîşteyan dibînin ku hawîdorê text girtine bi pesn û sipasê perwerdekarê xwe wî pak didêrin. Di navbera wan de bi rastiyê hate hukim kirin û hat gotin ku: "Pesn û sipas ji Xuda perwerdekarê hemû aleman re ye."

#### Chapter 40 (Sura 40)

1; Ha, Mîm.

2; Daxistina kitêbê ji Xudayê serkeftiyê zana ye.

3; Ew bexpendekarê gunehan û litekarê poşmaniyan, ezab dijwarê xwedan qencî ye; ji wî pêve tu Xuda nînin; veger her bal wî ve ye.

4; Ji ewên kafir bûne pêve kes di ayetê Xuda de xirecîrê nake vêca bira çûn û hatina wan di welatan de te nexapîne.

5; Berî wan komela Nûh û partiyên piştî wan jî derewandin. Her civatî dixwest ku pêxemberê xwe bigre (bikuje), lê min wan girt; vêca ka ezabê min çewa bû?

6; Her wuha peyva perwerdekarê te li ser ewên kafir bûne pêwîst bû ku bêguman ew hevalê agir in.

7; (Ferîşte) yên ku text hildigrin û ên hawîdorê wî bi pesn û sipasê perwerdekarê xwe limêj dikin-wî pak didêrin û pê bawerî tînin û ji ên bawerî anîne re bexpîne dixwazin (û dibêjin:) "Perwerdekarê me! te bi dilovanî û zanîn her tiptî dagirtiye, vêca tu ji ewên poşman bûne-vegeriyane û dane pey rêya te re bibexpîne û tu wan ji ezabê dogehê biparêze."

8; "Perwerdekarê me! tu wan û ji bav û kalên wan û pîrekên wan û azbata wan yên qenc bûne têxe bihiptê xwebiyê de. Bêguman tu, serkeftiyê hîkmetdar her tu yî."

9; "Û tu wan ji nebaşîyan biparêze. Tu, wê rojê, kî ji nebaşîyan biparêzî, êdî bêguman te lê dilovanî kiriye. Rizgariya herî mezin jî her eva haye."

10; Bêguman ewên kafir bûne tîrî kirin ku: "Hêrsa Xuda ji hêrsa we bi xwe mezintir e. Lewra hûn bal baweriyê ve dihatin gazî kirin, vêca hûn kafir dibûn."

11; Wan got ku: "Perwerdekarê me! te du cara me mirand û te du cara jî me jiyand, êdî me gunehên xwe li xwe daniye; vêca gelo bal derketinê ve rêyek heye?"

12; Ev (ezabê) han ji ber vî ye ku bêguman gava Xuda bitenê dihate gazî kirin-



hebandin hûn kafir dibûn, û eger jê re þîrîk bihatana çêkirin we bawerî dianî. Êdî hukim her ê Xudayê herî bilindê herî mezin e.

13; Ew e ê ku ayetên (nîþanên) xwe nîþanî we dide û ji we re ji asîman rozî dadixe. Ji ê vedigere pêve kes nafikire-þîret nagire.

14; Her çend kafir nexwazin jî êdî hûn her gazî Xuda bikin-wî bihebînin, dîn jê re pak bidêrin.

15; Ew bilindkirê payeyan e (û) xweyê text e; ji bendeyên xwe kî bivê giyanê (can, wehî, Qur'an, dilovaniyê) ji fermana xwe davê serê ji bo ku (wî) bi roja pergîhatinê hiþyar bike-bitirsîne.

16; Roja ku ew tev li rastê xuya ne; tu tipt ji wan li ser Xuda veparî namîne. Mulk îro ê kî ye? Ê Xudayê yektayê herî serkeftî ye.

17; Îro her kes bi tiptê bi dest xistiye tê celat kirinê. Îro tu neheqî-sitemkarî nîne. Bêguman Xuda, hesaba zû dibîne.

18; û tu wan bi roja nêzhatî hiþyar bike-bitirsîne dema dil li nik qirika bi tirs û xem dagirtîne; ji sitemkaran re ne dostekî germ heye û ne jî mehdervanekî ku li pey tê çûyîn heye.

19; Ew, bi çavên zexel û bi tiptê sing vedipêrin dizane.

20; Xuda bi rastiye hukim dike, û ewên ji pêptirê wî gazî dikin bi tu tiptî hukim nakin. Bêguman sehkirê baþ dibîne her Xuda ye.

21; Ma qey ew li rûyê zemîn negeriyane ku binêrin ka paþiya ewên beriya wan çewa bû? Ew ji wan bihêztir û di rûyê zemîn de bi rêç þop bêtir bûn; lê Xuda wan bi sedem gunehên wan girt û ji wan re tu parêzvan jî nebû ku wan ji Xuda biparêze.

22; Evê han ji ber ku bêguman ew, pêxemberên wan hey ji wan re nîþanên xuya dianîn lê ew kafir dibûn, êdî Xuda jî wan girt. Lewra bêguman ew hêzdar e ezabdiþwar e.

23; Sond be me Mûsa bi ayetên xwe û bi delîlek xuya þand,

24; Bal Fîr'ewn û Haman û Qarûn; lê wan got ku: "Efsûngerek pirr derewkar e."

25; Vêca çi gava ew ji cem me bi rastiye hate wan, gotin ku: "Hûn zarûyê ên pê re bawerî anîne bikujin û pîrekên wan zindî bihêlin." Lê xax û dafê kafiran hey di þaþîtî û tewþîtîyê de ye.

26; Fîr'ewn got ku: "Hûn min berdim ez Mûsa bikujim û bira ew gazî perwerdekarê xwe bike. Bêguman ez ditirsim ku ew dînê we biguherîne yan ew di rûyê zemîn de xerabkarî derxe."

27; Mûsa got ku: "Ez xwe ji (xerabiya) her qureyê ku bi roja hîsabê (qiyametê) bawerî nayne davêjim perwerdekarê xwe û perwerdekarê we."

28; Zilamek bawermend ji malbata Fîr'ewn ku baweriya xwe vedipart got ku: "Ma hûnê zilamekî ku dibêje perwerdekarê min Xuda ye û tevî ku delîlên xuya ji perwerdekarê we ji we re aniye bikujin? Eger ew derewkar be ji xwe derewa wî jê re ye û eger rastgo be, wê hinek tiptê ji we re wade dide bê serê we. Bêguman Xuda kesê jihedderketiyê pirr derewkar nade ser reya rast."

29; "Gelê min! îro mulk ê we ye, hûn di rûyê zemîn de serdest in, lê eger ezabê Xuda ji me re were êdî wê kî yariya me bike?" Fîr'ewn got ku: "Ez her tiptê rast dibînim nîþa we didim û ez hey berê we didim rêya rast."

30; Ewê bawerî anibû got ku: "Gelê min! bêguman ez li ser we ji (rojekî) wekî roja partiyan ditirsim."

31; "Wekî þopa Nûh û Ad û Semûd û ên pey wan. Xuda ji bendeyan re sitemkarî naxwaze."

32; "Gelê min! bêguman ez li ser we ji (ezabê) roja tevgaziyê ditirsim."

33; "Roja hûnê piþt bidinê û birevin; tu perêzvan nikare we ji Xuda biparêze. Xuda kî ji rê þaþ bike êdî tu rêber jê re nînin."

34; "Sond be, berê Yûsif jî bi delîlên xuya hate we, vêca hûn ji tiptê ew pê hatibû hey di dudiliyê de bûn, heya gava ew mir, we got ku: "Xuda, piþtî wî qet tu pêxemberî naþîne." Xuda, kesê jihedderketiyê dudilî, wuha ji rê þaþ dike."

35; "Ewên ku bêyî delîlekî xurt ku ji wan re hatiye di ayetê Xuda de xirecirê dikin li cem Xuda û li cem ên bawerî anîne, ew (xirecira wan) hêrsek mezin radika. Xuda, li ser her dilê qureyê zordar, wuha mohr dike."

36; Fîr'ewn jî got ku: "Hamano! tu ji min re kopkekî lêke, dibe ez bigihîjim deriyan."

37; "Deriyê asîmana, vêca ez bi ser Xudayê Mûsa vebim, lê bi rastî ez wî derewkar guman dikim." Ji Fîr'ewn re karê wî yê xerab wuha hat xemilandin û ew ji rê hat

liba xistin. Xax û dafê Fîr'ewn hey pûç û beredayî ne.

38; Ewê bawerî anîbû got ku: "Gelê min! hûn bidin pey min, ezê we bigihînim rêya rastiyê."

39; "Gelê min! bêguman ev jiyana dinê tenê hinek xweşî ye, û bi rastî axret her warê mayînê ye."

40; "Kî karekî xerab bike ew hey biqasî wî tê celat kirinê û ji mêr û jina kî karê qenc bike û ew bawermend be êdî ewên han dikevin bihiptê, ew tê de bêjimar tene rozî kirin."

41; "Gelê min! ma çi bûye ji min ku ez we gazî bal rizgarîyê ve dikim û hûn min gazî bal agir ve dikin?"

42; "Hûn gazî min dikin ku ez bi Xuda kafir bibim û jê re tiptê ku zanîna min pê nîne têxîm pirîk; tevî ku ez we gazî bal (Xudayê) serkeftiyê pirr bexpendekar ve dikim!"

43; "Ziyan nake, bêguman tiptê hûn min bal ve gazî dikin jê re ne di dinê de û ne jî di axretê de dozekî heye, û bêguman vegera me her bal Xuda ve ye û bi rastî ên jihedderketî her ew hevalê agir in."

44; "Vêca hûnê di nêz de tiptê ez ji we re dibêjim di bîr bînin, û ez karê xwe her dispêrim Xuda. Lewra bêguman Xuda bendeyan baş dibîne."

45; Vêca Xuda wî ji xerabiyê tiptê lê xax û daf çekiribûn parast û xerabê ezaba malbata Fîr'ewn girte nav xwe.

46; Ew sibe û êvara li ser agir tene pêpkêş kirin û roja danê qiyametê radibe hûn malbata Fîr'ewn têxin zortirê ezaba.

47; Û (di bîr bîne) dema ew di agir de bi hev re xirecirê dikin, vêca ên bindest ji ewên serdestên qure re dibêjin ku: Bêguman em peyrewê we bûn, vêca hûn dikarin parîkî agir ji me dûr bikin-me jê bêhewce kin?"

48; Ewên serdestên qure gotin ku: "Bêguman em tev tê de ne. Bêguman Xuda di navbera bendeyan de hukim kiriye."

49; Ewên di agir de ji dergavanê dogehê re gotin ku: "Hûn ji perwerdekarê xwe bixwazin bira rojek ezab ji me sivik bike."

50; (Dergavanan) got ku: Ma qey pêxemberên we ji we re delîlên xuya neanîn." Gotin: "Belê (anîn)." (Dergavanan) got ku: "Hûn gazî kin, lê gaziya kafiran hey pûç û beredaye."

51; Bêguman em, hem di jiyana dinê de û hem jî di roja ku danas radibin de yariya pêxemberên xwe û ên bawerî anîne dikin.

52; Roja ku poşmaniya sitemkaran bi kêrî wan nayê û ji wan re lanet heye û ji wan re warê nexweş heye.

53; Sond be me rêberiyê da Mûsa û me zariyê Îsraîl kire wêrisê kitêbê.

54; Ku ew ji xwedan hişan re rêber û bîranîn e-şîret e.

55; Vêca tu bîhna xwe fireh ke, lewra bêguman wada Xuda rast e û tu ji gunehê xwe re bexşînê bixwaze û êvar û sibeha bi pesn û sipasê perwerdekarê xwe wî pak bêrî bidêre.

56; Bêguman ewên ku bêtî delîlek xurt ku ji wan re hatine di ayetê Xuda de xirecirê dikin, ew hey di singê wan de quretî heye ku ew nagihîjinê (nagihîjin mebesta quretiya xwe). Vêca tu xwe bavê Xuda. Lewra bêguman ew her sehkîr e baş dibîne.

57; Sond be aferandina asîmana û zemîn ji aferandina mirovan meztir e, lê belê pirrî mirovan nizanin.

58; Ê kor û ê dibîne nabin yek; ên bawerî anîne û karên qenc kirine û ê xerab jî (nabin yek). Hûn çiqas hindik difikirin-şîret digrin.

59; Bêguman danê qiyametê hey tê ku tu dudilî tê de nîne, lê belê pirrî mirovan bawer nakin.

60; Perwerdekarê we got ku: "Hûn gazî min bikin ezê bersiva we bidim. Bêguman ên ku ji hebandina min quretî dikin wê bi sitûxorî têkevin dogehê."

61; Xuda ye ê ku pêvê ji we re çekiriye ji bo ku hûn tê de bihêminin û royê jî rohnî kiriye. Bêguman Xuda li ser mirovan xwey qencî ye lê belê pirrî mirovan sipas nakin.

62; Ev Xudayê han perwerdekarê we ye, aferandekarê her tiptî ye, ji wî pêve tu Xuda nînin. Êdî hûn bi ku ve tene zivirandin?

63; Ewên ku ayetên Xuda înkâr dikirin wuha tene zivirandin.

64; Xuda ye ê ku zemîn ji we re kiriye ciyê manê û asîman jî kiriye avahî û we

kiriye xwedî sikûm, vêca sikûmên we pirr xweþik çekiriye û ji tiptê xweþ û pak rozî daye we. Ev Xudayê han perwerdekarê we ye. Vêca perwerdekarê aleman çî pîroz e.

65; Ew zindiyê ku ji wî pêve tu Xuda nînin. Nexwe hûn ji dil gazî wî bikin-wî bihebînin dîn her jê re pak bidêrin. Pesn û sipas ji Xudayê perwerdekarê hemû aleman re ye.

66; Tu bêje ku: "Bêguman ez çî gava delîlen xuya ji perwerdekarê min ji min re hatin û ez hatim ferman kirin ku ez serî ji perwerdekarê hemû aleman re deynim, ez hatim ferman kirin ku ez ewên hûn bêyî Xuda gazî wan dîkin-wan dihebînin nehebînim."

67; Ew e ê ku we ji axê papê ji dilopek avik papê ji xweyna terî hiþk aferandiye papê we bi zarûkî (ji zikê dayîkên we) dertîne ji bo ku hûn bigihîjin hêza xwe papê ji bo ku hûn pîr bibin; hin ji we jî berê dimrin û ji bo ku hûn bigihîjin demek (ecelek) navdayî û hevî heye hûn hiþ tê bibin-xwe ragirin.

68; Ew e ê ku vedijîne û dimirîne; vêca gava bivê karek biqedîne êdî tenê jê re dibêje: "Bibe", ew jî pêre pêre çêdibe.

69; Ma tu ewên ku di ayetê Xuda de xirecirê dîkin nabînin ku ew çewa têne zivirandin?

70; Ewên ku kitêbe û tiptê me pêxemberên xwe pê þandibû derewandine, vêca ewê papê bizanbin.

71; Dema qeyd û xelek di sitûyên wan de ne, ew têne kiþandin.

72; Di ava kel de, papê di agir de ew têne þewitandin.

73; Papê ji wan re tê gotin ku: "Ka li ku ne tiptê we dikir þirîk.

74; Bêyî Xuda?" Gotin ku: "Ew ji ber me hinda bûne. Ne, ji xwe me berê tu tiptî nediheband." Xuda, kafiran wuha li hev þaþ dike.

75; Evê han ji ber ku hûn bi neheqî di rûyê zemîn de dilþa dibûn û ji ber ku we quretiya dikir e.

76; Hûn têkevin deriyê dogehê hertimî tê de bin; vêca ciyê qureyan çî nexweþ e!

77; Vêca tu bîhna xwe fireh bike. Lewra bêguman wada Xuda rast e; êdî ya emê hin tiptê em ji wan re wad dîkin nîþanî te bidin yan jî emê te bimirînin, êdî ewê her bal me ve bêne vegerandin.

78; Sond be me berî te gellek pêxember þandiye ku me hinek wan ji te re gotiye û me hinek wan jî ji te re negotiye. Bêyî destûra Xuda ji tu pêxemberî re nabe ku ayetek (ji kîsê xwe) bîne. Vêca gava fermana Xuda bê, bi راستiyê tê qedandin-hukim kirin û li wê der ehlê doza pûç ziyar dîkin.

79; Xuda ye ê ku dewara ji we re çekiriye ji bo ku hûn li hinek wan siwar bibin û ji hinek wan bixwin.

80; Û ji we re di wan de gellek kar hene û ji bo ku hûn li ser wan bigihên hewcetiyê di dile we de ne, û hûn li ser wan û li ser keþtiyê têne hilgirtin.

81; Ew ayetên xwe nîþanî we dide, vêca hûn kîjan ayetên Xuda înkâr dîkin?

82; Vêca ma qey ew li rûyê zemîn negeriyane ku binêrin ka þaþiya ewên berî wan çewa bû, ku ew ji wan þirrîr û bihêztir û di rûyê zemîn de bi rêç û þop zêdetir bûn, lê tiptê bi dest xistibûn tu bikêra wan nehat.

83; Vêca çî gava pêxemberên wan bi delîlên xuya hatin wan, ew bi zanîna li cem xwe dilxweþ bûn û tiptê pê tinaza kiribûn hawîdorê wan girt.

84; Vêca çî gava zora ezabê me dîtin gotin: "Me bi Xuda tenê bawerî aniye û em bi tiptê me dikir þirîk kafir bûne."

85; Lê çî gava zora ezabê me dîtin êdî baweriya wan tu bikêra wan nehat. Rê û rêça Xuda ye ku di nav bendeyên wî derbas bûye. Ha li wê der kafiran ziyar kir.

#### Chapter 41 (Sura 41)

1; Ha, Mîm.

2; Daxistînek hin bi hin ji (Xudayê) mihriban î dilovan e.

3; Kitêbek e ku ayetên wê ji hev hatine veqetandinê, ji komelekî zana re Qur'anekî erebî ye.

4; Mizgînavan û hiþyarker e; vêca þirrî wan rû zivirand, êdî ew nabihîzin.

5; Û gotin ku: "Dilên me ji tiptê tu me bal ve gazî dikî di perda de ye û di gohên me de giranî heye û di navbera me û te de perde heye, êdî tu bixebite, bêguman em jî xebatkar in."

6; Tu bêje ku: "Bêguman ez jî her mirovekî wekî we me ku bal min ve tê wehî kirin

ku bêguman Xudayê we her Xudakî yekta ye, êdî hûn xwe bal ve rast bikin û jê bexpînê bixwazin. Xulî li serê pûtperestan be!"

7; "Ewên ku xwe bi yektaperestiyê ji pûtperestiyê pak nakin û ew bi axretê jî kafir in."

8; Bêguman ewên ku bawerî anîne û karên qenc kirine ji wan re xelatek bêkêmasî û bêdawî heye.

9; Tu bêje ku: "Ma hûn bera bi ewê ku zemîn di du rojan de aferandiye kafir dibin û jê re hemtayan çêdikin? Evê han perwerdekarê hemû alema ye.

10; Û li ser rûyê zemîn tê de çiyayên paydar çekiriye û tê de firehî çekiriye û tê de di çar rojan de zadê wan li wan parve kiriye; ji hemû hewcedaran re wekî hev bi pîvan daye.

11; Papê bal asîman ve ku ew hê dû bû qesd kir vêca jê re û ji zemîn re got ku: "Hûn herdû bi dil yan bédil werin." Herdûyan jî got ku: "Em bi dilê xwe tèn."

12; Vêca wî wan di du rojan de kir heft asîman û di her asîmanî de karê wî wehî kir. Me asîmanê dinê (jêrîn) jî bi (sitêrkên wekî) çirayan xemiland û me wan parast. Lihevanî û pîvana (Xudayê) serkeftiyê zana eva haye.

13; Êdî eger wan rûliba xist, vêca tu bêje ku: "Min we bi qêrîna (ezabek) wek qêrîna (ezabê) Ad û Semûd hişyar kir-tirsand."

14; (Di bîr bîne) dema pêxember, beriya wan û piptî wan ji wan re hatin ku: Hûn ji Xuda pêve nehebînin, wan got ku: "Eger perwerdekarê me bixwestana wê feripteyan daxistana. Vêca bêguman em bi tiptê hûn pê hatine pandin kafir in."

15; Vêca heçî Ad, wan bi neheqî di rûyê zemîn de quretî kir û gotin ku: "Ji me bihêztir kî heye?" Ma qey wan nedît ku bêguman Xudayê ku wan aferandiye ew ji wan bihêztir e? Wan ayetên me hey înkâr dikir.

16; Vêca me, di rojên bi peşk de bayekî pirr sar bi ser wan de pand; ji bo ku em di jîna dinê de ezabê rûrepiyê bi wan bidin tam kirin, lê ezabê axretê hê bi rûrepiyê e, û ew nayên yarî kirin jî.

17; Û heçî Semûd jî êdî me wan da ser rêya rast lê wan korîtiyê di ser rêya rast re girt-hiz kir, êdî bi sedem tiptê bi dest xistibûn ezabê riswatiyê wan girt.

18; Me ewên bawerî anî bûn û ew xweparêz bûn jî rizgar kir.

19; Roja dijminên Xuda bal agir ve têne civandin êdî ew (pêpî û paþiyên wan) bi hev têne gihandin.

20; Heya gava ew tèn gohên wan û çavên wan û çermên wan bi tiptê kirine li ser wan danasî didin.

21; Û ji çermên xwe re gotin ku: "We çima li ser me danasî da?" Wan got ku: "Xudayê ku her tiptî daye axaftin me jî da axaftin tevî ku cara pêpî wî we aferand û hûnê her bal ve bêne vegerandin."

22; We nikarbû hûn xwe veþêrin ku ne gohên we û ne çavên we û ne jî çermên we li ser we danasî bidin, lê belê we guman dikir ku bi rastî Xuda pirrî tiptê hûn dikin nizane.

23; Eva gumana we ya han ku we bi perwerdekarê xwe guman dikir, we têk bir; êdî hûn bûn ji ziyankaran.

24; Vêca eger ew hewya xwe bînin, êdî agir pûna wan e, û eger bixwazin ku bal dilxwaziyê xwe ve bîn vegerandin da ku qayil bibin, êdî ew nayên vegerandin ku qayil bibin.

25; Me ji wan re hin hevalan bikar kir, vêca wan ji wan re tiptê pêþiya wan û tiptê paþiya wan xemiland û gotina (ezabê) ku di nav komelên ji cinn û mirovan ku berî wan derbas bûbûn li ser wan pêwist bû. Bêguman ew ziyankar bûn.

26; Û ewên kafir bûne, gotin ku: "Hûn li vê Qur'ana han gohdarî nekin û hûn gotinê pûç û beredayî derbareê wê de bêjin hevî heye ku hûn bi ser kevin."

27; Vêca bi sond, emê ezabek zor dijwar bi ewên kafir bûne bidin tam kirin û emê wan bi pîstirê tiptê dikirin bidin celat kirinê.

28; Evê han celata neyarê Xuda agir e; ji wan re tê de warê hertimî mayînê heye, celatekî ye ji ber ku wan ayetên me înkâr dikir.

29; Ewên kafir bûne gotin ku: "Perwerdekarê me! tu ji cinn û mirovan wan herdûyê ku me ji rê pap kirin nîþanî me bide, emê wan têxin binê piyên xwe ji bo ku ew bibin ji wanê herî nizimketî."

30; Bêguman wanê ku gotin: "Perwerdekarê me Xuda ye." Papê xwe sere rast kirin, ew feripte bi ser wan ve dadikevin ku: "Hûn netirsîn û xemgîn jî nebin û hûn bi

bihipta ku hûn hatibûn wade dayîn mizgîn-dilpa bibin."

31; "Em, di jîna dinê û di axretê de yar û yawerên we ne. Ji we re tê de tiptê dilê we dibijê heye û ji we re tê de tiptê hûn dixwazin heye."

32; Mazûrvaniyek e ji (Xudayê) bexpendekarê diloan.

33; Ji kesê gazî bal Xuda ve dike û karê qenc pêk tîne û dibêje: "Bêguman ez ji musulmanan im" kî gotin rindtir e?

34; Ne qencî û ne xerabî nabin yek. Tu, (xerabiya) bi a herî qenc biqewirîne; vêca ha tu dibînî ê ku di navbera te û wî de neyartî heye ew bûye herwekî dostekî germî nêz.

35; Ji pêptirê ewên bîhna fireh nîpan didin rastî vê nayên û ji pêptirê ewê xwedan parek mezin e pergê vê nayên.

36; Eger ji pelîd nepakîkî têkilî te bû, êdî tu xwe bavêje Xuda. Lewra bêguman ew her sehkirê zana ye.

37; Pev û roj û ro û hîv tev ji ayetên (nîpanên) wî ne. Hûn ne ji royê re û ne jî ji hîvê re serî deynin. Eger hûn bera wî di hebînin hûn ji Xudayê ku wan aferandiye re serî deynin.

38; Vêca eger wan quretî kir, êdî ên li cem perwerdekarê te ne, bi pev û bi roj wî (ji kêmasiyan) pak bêrî didêrin-limej dikin û ew nabetilîn-nakerixin jî.

39; Û ji ayetên wî ne ku tu zemîn hişkbûyî dibînî, vêca gava me avê bi ser ve daxist, ew dilive û dinepîxe (bi giya û çêrê bilind dibe). Bêguman ewê ku wê vejandiye ew miriyan jî vedişîve. Lewra bêguman ew bi her tiptî dikare.

40; Bêguman ewên ku ayetên me înkâr dikin ew li ser me neveparîne. Vêca ma roja qiyametê ê ku di agir de tê avêtin çêtir e yan ê biewle tê? Hûn tipta divên bikin. Bêguman ew tiptê hûn dikin dibîne.

41; Bêguman ewên ku bi zîkrê (Qur'anê) çî gava ji wan re hat kafir bûn, tevî ku ew bi rastî kitêbek birûmet e-parastî ye, (ewê bi kufra xwe bîne celat kirin).

42; Ku ne ji pêpiya wê û ne ji paþiya wê tu pûçî û beredayîtî tevî nabe; daxistinek hin bi hin ji (Xudayê) hîkmetdarê hêjayî pesn e.

43; Ji pêptirê tiptê ku ji pêxemberên berî te re hatiye gotin ji te re nayê gotin. Bêguman perwerdekarê te xwedan bexpandin û xwedan ezabek bi jan e.

44; Eger me wê bikirna Qur'anekî biyanî (ne bi zîmanê erebî bûna) wê bigotina: "Ma çima ayetên wê ji hev nehatine veqetandin (bi zîmanê erebî nehatiye daxuyandin?) Ma (ew kitêb) biyanî û (pêxember jî) erebî ye?" Tu bêje ku: "Ew ji ên bawerî naynin di gohên wan de giranî-kerrîtî heye û ew li ser wan korîtî ye. Ewên han ji ciyekî dûr tene gazî kirin."

45; Sond be me kitêbê da Mûsa, vêca tê de dubendî hate çêkirin. Eger ne ji peyvekî ku ji perwerdekarê te derbas bûye bûna, wê di navbera wan de bihata hukim kirin. Bêguman ew hey tê de di bedgumaniyek dudilî de ne.

46; Kî karekî qenc bike, êdî ew ji xwe re dike û kî xerabî jî bike êdî ew ji xwe re dike. Perwerdekarê te ji bendeyan re qet ne sitemkar e.

47; Zanîna danê qiyametê her bal ve tê veqetandin. Her fêkiyên ji kumikên xwe dertên; her mênên tiptê hildigrin (badar dibin û barê xwe) datînin tenê bi zanîna wî ye. Roja gazî wan bike ku: "Kanê þîrîkên min?" , ew dibêjin ku: "Me bi te daxuyandiye ku tu danasek ji me nîne."

48; Tiptê berê dihebandin ji ber wan hinda bûn û baþ zanîn ku ji wan re tu ciyê revê nîne.

49; Mirovê (kafir) qet ji xwestina xweþî (û malê þirr) nabetile-nakerixe. Eger nexweþîkî têkilê wî bibe, vêca ew bêhêviyê bêumîd dibe.

50; Sond be eger em, piptî ku nexweþî gihîptiyê dilovaniyek ji xwe pê bidin tam kirin, ewê bêje ku: "Evê han ji min e, û ez guman nakim ku qiyamet rabe; û eger ez bal perwerdekarê xwe ve bême veqetandin, bêguman ji min re li balê a herî rind heye." Vêca bi rastî emê ewên kafir bûne bi tiptê kirin haydar bikin û emê hey ji ezabê sitûr bi wan bidin tam kirin.

51; Û gava em li mirovê (kafir) qencî bikin, ew rû dizivrine û xwe li alîkî liba dike-tu paxavê pê nake û gava nexweþîkî digihîjê vêca ew dibe xwey lavahiyê dûm û dirêj.

52; Tu bêje ku: "Ka binêrin! eger ew (Qur'an) ji cem Xuda be, paþê hûn pê kafir bibin, ka ji ê ku di neyartîkî dûm û dirêj de be rê þaptir kî heye?" (Eger hûn pê kafir bibin ji we rê þaptir û ji rastiyê dûrtir kî heye?).

53; Emê ji nêz ve ayetên (nîpanên) xwe di asoyan de û di wan bi xwe de jî nîpanî wan bidin heya ji wan ve baþ xuya dibe ku ew (Qur'an) bera rast e. Ma qey ji perwerdekarê te re (ev) bes nîne ku bi rastî ew danasê li ser her tiptî ye?  
54; Hay jê bin! bêguman ew ji rasthatina perwerdekarê xwe di dudiliyê de ne. Hay jê bin! bêguman wî hawîdor li hemû tiptî girtiye.

#### Chapter 42 (Sura 42)

1; Ha, Mîm.

2; Eyn, Sîn, Qaf.

3; Bal te ve û bal ên berî te ve wuha wehî dike. Serkeftiyê hîkmetdar her Xuda ye.

4; Tiptê di asîmana û tiptê di zemîn de ê wî ne. Bilindê herî mezin her ew e.

5; Hin dimîne asîman (ji meznaya Xuda) ji ser wan ve biqeliþin û feripte jî bi pesn û sipasê perwerdekarê xwe limêj dikin-wî (ji kêmasiya) pak berî didêrin û ji ên di rûyê zemîn de ne re bexþînê dixwazin. Hay jê bin! bêguman bexþendekarê dilovan her Xuda ye.

6; Ewên ku bêyî Xuda ji xwe re yar û yawer girtine, Xuda li ser wan parêzvan e (kirinê wan dihêle ji bo ku wan pê celat bike). Tu li ser wan ne dîdevan î.

7; Her wuha me Qur'anek erebî bal te ve wehî kir ji bo ku tu dayîka bajaran (Mekkê) û ên dora wê hiþyar bikî-bitirsînî û tu (wan) bi roja civînê (qiyametê) ku tu dudilî tê de nîne hiþyar bikî-bitirsînî. Birrek di bihiptê de ne û birrek jî di dogehê de ne.

8; Eger Xuda bixwesta, wê wan bikirna yek komek, lê belê ê bixwaze dike dilovaniya xwe; ên sitemkar jî, ne ji wan re yar û yawer hene û ne jî alîkar.

9; Ma qey wan bêyî wî hin yar û yaweran girtiye? Vêca her Xuda yar û yawer e; ew miriyan vediþîne û ew bi her tiptî dikare.

10; Her tiptê hûn tê de bi hev ketin, êdî hukmê wî bal Xuda ve ye. Ev Xudayê han perwerdekarê min e; min her xwe sipartiye wî û ez her balê ve vedigerim.

11; Aferandekarê asîmana û zemîn e; ji we bi xwe cotan (nêr û mê) û ji dewaran jî cotan (nêr û mê) çekiriye we tê de diaferîne (dide jiyandin û pirr dike). Tu tipt wekî manendê wî nîne. Sehkirê baþ dibîne her ew e.

12; Miftê gencîneyê asîman û zemîn her ê wî ne; ji kesêbixwaze re rozî fireh dike û teng dike. Bêguman ew zanayê bi her tiptî ye.

13; Ji we re ji dîn tiptê Nûh pê pîret kiriye û tiptê me bal te ve wehî kiriye û tiptê Îbrahîm û Mûsa û Îsa pê pîret kirine, daxuyandiye ku: "Hûn dîn rast bikin-li piya bihêlin û tê de bi hev nekevin-dubendiye çênekin. Tiptê tu, pûtperestan bal ve gazî dikî pirr mezin e-li zora wan diçe. Xuda, kî bixwaze balê ve hildibjêre û kesê vegere, balê ve rêberî dike.

14; Ew ji piptî ku zanîn ji wan re hat ji ber dexesiya di nav wan de bi hev ketin-ji hev perçe perçe bûn. Eger ne ji ber peyvekî ku ji perwerdekarê te heya demek navdayî derbas bû, bûna, wê di navbera wan de bihata hukim kirin. Bêguman ên ku piptî wan bûn mîratxwirê kitêbê, ew jê di bedgumanîyek dudilî de ne.

15; Vêca tu (wan) gazî bal evê han bike û tu çewa têyî ferman kirinê xwe rast bike û tu nede pey hewesên wan; û tu bêje ku: "Min bi tiptê Xuda ji kitêbê daxistiye bawerî aniye û ez hatime ferman kirinê ku ez di navbera we de bi dadmendî (bi edalet) tevbigêrim. Xuda perwerdekarê me û perwerdekarê we ye. Kirinên me ji me re ne û kirinên we jî ji we re ne. Tu xirecir û neyartî di navbera me û we de nîne. Xuda, wê nava me bicivîne. Veger her bal wî ve ye."

16; Êwên ku derbareê Xuda de ji piptî ku jê re bersiv hatiye dayîn lecbazî-neyartî dikin, ew neyartiya wan li cem perwerdekarê wan pûç û bereday e, û xepmek li ser wan e û ji wan re ezabek zor diþwar heye.

17; Xuda ye ê ku kitêb û mêzînê bi راستiyê daxistiye. Çi gihaye te? dibe ku danê qiyametê neþîk be.

18; Ewên ku pê bawerî naynin pê dilezînin. Ewên ku bawerî anîne ew jê dilbitirs in û dizanin ku bêguman ew rast e. Hay jê bin! bêguman ewên ku derbareê danê qiyametê de dudilî dikin ew di þaþîtîkî dûr de ne.

19; Xuda bi bendeyên xwe qencîkar e, kî bixwaze rozî dideyê. Hêzdarê herî serkeftî her ew e.

20; Kî kar û xebata ji axretê re bixwaze emê jê re di kar û xebata wî de pirr bikin. Kî jî kar û xebata dinê bivê emê jê bidinê û di axretê de jê re tu par nîne.

21; Qey ji wan re hin þirik hene ku ji wan re dînakî ku Xuda pê destûr nedaye derxistin? Eger ne ji ber peyva jihevveqetandinê bûna, wê di nabera wan de bihatana hukim kirin. Bêguman sitemkar ji wan re ezabekî bi jan heye.

22; Tu sitemkaran dibînî ku ew ji tiptê bi dest xistine dilbitirs in, ewê jî bi wan de bê. Ewên ku bawerî anîne û karên qenc kirine, di baxçê bihiptan de ne; ji wan re li cem perwerdekarê wan tiptê dixwazin heye. Qenciya herî mezin her eva haye.

23; Evê han e ê ku Xuda bendeyên xwe yên ku bawerî anîne û karên qenc kirine pê mizgîn dike. Tu bêje ku: "Ez, ji ber merivê we me ji hizkirina xwe pêve tu destmuzî li ser (doza xwe) ji we naxwazim. Kî qencîkî bi dest bixe emê jê re tê de qencî pirr bikin. Bêguman Xuda bexpendekar e sipaskar e.

24; Yan qey ew dibêjin ku: "Wî derewa nebûyî avêtiye ser Xuda? Vêca eger Xuda bixwaze wê ser Xuda (pûtperestiya) pûç û beredayî radike û rastiyê bi peyvên xwe bi cîh dike. Bêguman ew zanayê bi vepariyê di singan de ye.

25; Ew e ê ku poşmaniyê ji bendeyên xwe dipejirîne û li nebaþiyan dibore; tiptê hûn dikin dizane.

26; Û bersiva ên bawerî anîne û karên qenc kirine dide û qenciya xwe ji wan re pirr dike. Kafir jî ji wan re ezabekî zor diþwar heye.

27; Eger Xuda, roziyê ji bendeyên xwe re berfireh raxistina wê wan di rûyê zemîn de tadê bikirna, lê belê ew biqasî dixwaze hin bi hin dadixe. Lewra bêguman ew bi bendeyên xwe kûr zana ye baþ dibîne.

28; Ew e ku piptî ew bêhêvî bûn, baranê dadixe û diloþaniya xwe belav dike. Dostê hêjayî pesn her ew e.

29; Aferandîna asîmana û zemîn û rawirê di nava wan de belav kiriye ji ayetên (nîþanên) wî ne. Ew gava bixwaze dikare wan li hev bicivîne.

30; Her belayê bi serê we de tê ew bi sedem keda destên we ye, û ew li pirrî (nebaþiyan) jî dibore.

31; Hûn di rûyê zemîn de, ne bêzarker in û ne jî ji Xuda pêve ji we re yar û alîkar hene.

32; Keptiyên wek çiyayan ku di derya de diherikin jî ji ayetên (nîþanên) wî ne.

33; Eger ew bixwaze wê ba bisekinîne, vêca wê ew (keptî) li ser piþta wê sekinandî bimînin. Bêguman di vî de ji her bihnfirehê sipaskar re gellek ayet (nîþan) hene.

34; Yan wê wan tiptê bi dest xistine têk bibe-bifetisîne û ew li pirrî (teþþiyan) jî dibore.

35; Ewên ku di ayetên me de xirecirê dikin baþ dizanin ku ji wan re tu ciyê revê nîne.

36; Vêca tiptê ji we re hatiye dayîn, ew xweþiya jîna dinê ye û tiptê li bal Xuda ji ên bawerî anîne û her xwe sipartine perwerdekarê xwe re çêtir e û mayînîtir e.

37; Û ewên ku xwe ji gunehên mezin û nepakiyan dûr digrin û gava hêrs bibin jî ew dibexþînin .

38; Û ewên ku bersiva perwerdekarê xwe dane û limêjê rast kirine û karê wan di nav wan de bi pêwrê ye û ew ji tiptê me rozî daye wan didin.

39; Û ewên ku gava tadekî li wan dibe ew yariya hevûdin dikin.

40; Cezayê nebaþiyê wekî wê nebaþî ye. Vêca kî têbibore û qencî bike, êdî xelata wî li ser Xuda ye. Lewra bêguman ew ji sitemkaran hiz nake.

41; Kî piptî tade lê hat kirin, bê yarî kirinê, êdî ewên han tu rê li ser wan nîne.

42; Lewra bêguman rê tenê li ser ên ku li mirovan tadê dikin û bi neheqî di rûyê zemîn de serkêþî dikin heye. Ewên han ji wan re ezabekî bi jan heye.

43; Lê kî bihna fireh nîþan de û bibexþîne, bêguman evê han ji karên girang e.

44; Xuda, kî ji rê þaþ bike êdî piptî wî jê re tu yar û yawer nîne. Tu, sitemkaran jî dibînî çî gava ew ezab dibînin dibêjin ku: "Ma gelo tu rêya vegeerê nîne?"

45; Û tu, wan dibînî ku ew li ser (agir) têne pêþkêþ kirin, ew ji riswatiyê dilbitirs in-sitûxor in di binê çavan re-bi çavekî zebûn dinêrin. Ewên bawerî anîne gotin ku: "Bêguman ziyankar her ew in ku roja qiyametê xwe û malbata xwe hinda kirine." Hay jê bin! bêguman sitemkar di ezabekî hertimî de ne.

46; Ji Xuda pêve ji wan re tu yar û yawer jî nînin ku yariya wan bikin. Xuda, kî ji rê þaþ bike êdî jê re tu rê jî nînin.

47; Hûn berî rojekî bê ku jê re ji Xuda tu veger nîne, bersiva perwerdekarê xwe bidin; wê rojê ji we re, ne ciyê hûn xwe pê bigrin heye û ne jî ji we re hêz û alîkarek ku we vepêre heye.

48; Vêca eger ew rû bizivrinin, êdî me te li ser wan parêzvan nebandiye. Li ser te tenê ragihandin heye. Bêguman em, gava dilovaniyek ji xwe bi mirov didin tam kirin ew pê kêfxweş dibe. Lê eger nebaşîkî bi sedem keda destên wan bê serê wan, êdî bi rastî mirov zor nankor e.

49; Mulkê asîmana û zemîn ê Xuda ye. Tîptê bixwaze diaferîne; ji kî re bivê keçan bibexşîne û ji kî re bive kuran dibexşîne.

50; Yan kur û keç cot dide wan; kî jî bivê wareş çêdike. Bêguman ew zana ye pêkar e.

51; Ji tu mirovî re nabe ku Xuda (rû bi rû) pê re bipeyive, tenê bi wehyê yan ji pişt perdê ve yan jî qasidek bişîne, êdî ew bi destûra wî tiptê bivê wehî bike. Bêguman ew pirr bilind e hîkmetdar e.

52; Her wuha me rewanek (can Qur'anek) ji fermana xwe bal te ve wehî kir. Te berê ne dizanibû kitêb çiyê û ne jî bawerî; lê belê me wê kir ronahiyek ku em ji bendeyên xwe ê bixwazin pê didin ser rêya rast. Bêguman tu jî bal rêya rastîn ve gazî dikî.

53; Rêya Xuda yê ku tiptê di asîmana û tiptê di zemîn de tev ê wî ne. Hay jê bin! hemû kar her bal Xuda ve vedigerin.

#### Chapter 43 (Sura 43)

1; Ha, Mîm.

2; Bi kitêba aşîkar.

3; Bêguman me wê kiriye Qur'anek erebî hevî heye ku hûn hiş tê bibin-xwe ragirin.

4; Û bêguman ew li cem me di dayîka kitêban de pirr bilind e hîkmetdar e.

5; Vêca ma qey li ber ku hûn komelekî ji hedderketî ne (pûtperest in) emê bi tevayî dev ji we berdin (we li ser kufra we bihêlin ezab) bi bîra we nexin?

6; Me di nav pêşyan de çiqas pirr pêxember bandiye!

7; Her pêxemberê ji wan re dihat wan hey pê tinaza fikir.

8; Vêca me ên ji wan bihêztir têkbir û minaka pêşyan derbas bû.

9; Sond be eger tu ji wan bipirsî ku: "Kî asîmana û zemîn aferandiye?" wê bêjin ku: "(Xudayê) serkeftiyê zana wan aferandiye."

10; Ewê ku zemîn ji we re kiriye dergûş û ji we re tê de rêya çekiriye hevî ku hûn rêya xwe bibînin.

11; Ewê ku ji asîman avê bi pîvan daxistiye, vêca me pê welatekî mirî vejand; hûnê jî wuha bêne derxistinê.

12; Ewê ku cota teva aferandiye û ji we re ji keştiyan û dewaran tiptê hûn lê siwar dibin çekiriye.

13; Ji bo ku li pişt wan rast (siwar) bibin, papê gava hûn li ser wan rast (siwar) bûn, hûn qencyê perwerdekarê xwe di bîr bînin û bêjin: "Pak bêrî ye ê ku eva ji me re sitûxor kiriye û me bi xwe qet pê nikarbû."

14; "Û bêguman emê her bal perwerdekarê xwe ve vegerin."

15; Wan jê re ji bendeyên wî parek (ji zarûyan) çekir. Bêguman mirov nankorekî aşîkar e.

16; Ma wî ji tiptê diaferîne keçan ji xwe re girtiye û kuran jî ji we re hîlbijartiye?

17; Gava yek ji wan bi tiptê ji (Xudayê) Mihrîban re minak dide (bi keçan) tê mizgin dayîn, rûyê wî reşûtankî dibe û ew hêrsa wî di gewriya wî de dimîne.

18; Ma ew (keç)ên ku di nav xîr û xemle de tene mezin kirin û ew di xirecira de jî (delîla xwe bi hêsanî nikare) diyar bike (ji Xuda re dîkin hevpar?)

19; Û wan, ferîteyên ku bendeyê (Xudayê) Mihrîban in kiriye pîrek. Ma ew danasê aferandina wan bûn? Ewê danasiya wan bê nivisandin û wê bêne pirsyarî kirin.

20; Û gotin ku: "Eger (Xudayê) Mihrîban nexwestana me wan nediheband." Tu zanîna wan bi vî nîne. Ew hey derewa dîkin.

21; Ma qey me berê wî ketêbek daye wan, vêca ew xwe pê digrin?

22; Ne, (me tu kitêb nedaye wan) gotin ku: "Bêguman me bav û kalên xwe li ser dînekî dît û bi rastî em jî li ser şopa wan rêya xwe dibînin."

23; Her wuha me berî te her hişyarkerê di welatekî de band her serdestên wan gotin ku: "Bêguman me bav û kalên xwe li ser dînekî dîtiye û bi rastî em peyrewê şopa wan in."

24; (Her pêxemberî) got ku: "Ma eger min (rêyekî) rasttir ji tiptê we bav û kalên



xwe li serê dîtiye anîbe (hûnê dîsa li pey wan herin?)" Wan got ku: "Bêguman em bi tiptê tu pê hatî pandin kafir in."

25; Vêca me heyf ji wan sitend, êdî tu binêre ka paþiya ên di derewandin çewa bû?

26; (Di bîr bine) dema îbrahîm ji bavê xwe û gelê xwe re got ku: "Bêguman ez ji tiptê hûn dihebînin bêrî me."

27; "Ji pêptirê ê ku min aferandiye; êdî bêguman ewê min rêberî bike."

28; Wî, wê (gotinê) di pey xwe re kir peyvekî hermayî, hêvî heye ku ew vegezin.

29; Bi rastî min ji vanê han û bav û kalên wan bi xweþî jiyand heya ku (Qur'an) a rast û pêxemberê diyarker ji wan re hat.

30; Çi gava rastî ji wan re hat gotin ku: "Evê han efsûn e û bêguman em pê kafir in."

31; Û gotin ku: "Ma çima ev Qur'an a han li ser zilamekî mezin ji herdû bajaran (Mekke û Taif) nehatiye daxistin?"

32; Ma qey dilovaniya perwerdekarê te ew parî dîkin? Me roziya jiyana wan di jîna dinê de di nav wan de parî kiriye û me hina ji wan di ser hina re bi payeyan bilîn kiriye, ji bo ku hin ji wan hina ji xwe re bindest bigrin-bixebitînin. Dilovaniya perwerdekarê te ji tiptê ew dicivînin çêtir e.

33; Eger ne ji ber ku wê mirov (tev li ser kufrê) bibûna yek komek, me yê ji ê ku bi (Xudayê) Mîhrîban kafir dibe re, hin xaniya çekirna ku banê wan û pêplûkên wan ji zîv bûna, ew li ser wan bilind bibûna.

34; Û ji xaniyên wan re hin deriyên (ji zîv) û textên (ji zîv meyê çekirna ku) li ser wan pal bidana.

35; Û (me yê) xîr û zêr jî (bidana wan). Evê han hemû xweþiya jîna dinê ye. Axret jî li cem perwerdekarê te ji xweparêzan re ye.

36; Kî ji pîretê (Xudayê) Mîhrîban rû bizivrine-çavkorîtiya bike, emê jê re pelîdekî girêdin-lê bikin moz û êdî ew jê re heval e-hew jê diqete.

37; Bêguman ew (pelîd) wan ji rê liba dixin û ew guman dîkin ku ew bera li ser rêya rast in.

38; Heya gava tê ba me, dibêje: "Hey xwezî di navbera min û te de dûrahiya rojhelat û rojava hebûna! vêca tu çi hevalekî pîs î!"

39; Ji ber we sitemkarî kiriye, hevparbûna we di ezab de îro qet bikêra we nayê.

40; Vêca ma qey tê bi ê kerr bidî seh kirin yan tê ê kor û ê ku di þaþîtîkî xuya de ye rêberî bikî?

41; Êdî eger em te bivin herin, vêca bêguman em ji wan heyfsitan in.

42; Yan emê tiptê me bi wan wade daye nîþa te bidin. vêca bêguman em li ser wan bihêz in-pêkar in.

43; Vêca tu bi tiptê bal te ve hatiye wehî kirinê xwe bigre. Bêguman tu li ser rêya rastîn î.

44; Û bêguman ew (Qur'an) ji te re û ji komela te re pîret e-bîrxistin e. Hûne papê bene pîrsyarî kirin.

45; Tu ji pêxemberên me berî te pandiye bipirse ku: Ka me ji (Xudayê) Mîhrîban pêve hin Xudayên ku tene hebandin çekiriye?

46; Sond be, me Mûsa bi ayetên (nîþanên) xwe pand bal Fîr'ewn û koma gire girên wî; vêca got ku: "Bêguman ez qasidê perwerdekarê hemû alema me."

47; Vêca çi gava ew bi ayetên (nîþanên) me hate wan, ew pêre pêre bi wan kenîyan.

48; Her ayeta me nîþa wan dida ew her ji a hevala xwe meztir bû; me wan bi ezab girt; hêvî heye ku ew vegezin.

49; Wan (dema ezab dît) gotin ku: "Efsûngerê zana! tu ji me re ji perwerdekarê xwe bi tiptê li cem te peyman daye, lava bike. Lewra bêguman em li ser rêya rast in."

50; Vêca çi gava me ezab ji wan rakir, wan pêre pêre (ehda xwe) diþikand-nedianîn cîh.

51; Fîr'ewn di nav komela xwe de gazî kir ku: "Gelê min! ma mulkê Misrê, ne ê min e û ev çemên han ji binê (kopkên) min nahekin? Vêca ma qey hûn nabînin?"

52; "Ma qey ez ji vî yê han ku ew rebenekê û nikare (mebesta xwe) diyar bike çêtir nînim?"

53; "Vêca çima bazinên zêrîn li serê nehatine avêtin yan pêre feripte bi hevaltî nehatin?"

54; Vêca wî komela xwe sivik girt, êdî wan jî dane pey wî. Bêguman ew komelekî jirêderketî bûn.

55; Vêca çi gava wan me hêrs kir, me heyf ji wan sitend, êdî me wana tev fetisand.  
 56; Vêca me wan ji paþîniyan re kir pêþîn û mînak.  
 57; Çi gava kurê Meryemê mînak tê dayîn, komela te pêre pêre jê acis dibin-rû liba dixin.  
 58; Û gotin ku: "Ma Xudayên me çêtir in yan ew?" Wan hey ji bo xirecirê wî ji te re mînak dan; ji xwe ew komelekî dijber in.  
 59; Ew tenê bendekî ye ku me pê qencî kiriye û me wî ji zariyê Îsraîl re kiriye mînak.  
 60; Eger me bixwesta, me yê di rûye zemîn de ji we ferîpteyan çêkirna ku bibûna canîþîn.  
 61; Bêguman ew (Îsa kurê Meryemê) ji danê axretê re zanîn e-nîþan e. Êdî hûn tê de xirecirê nekin û bidin pey min. Rêya rastîn eva haye.  
 62; Bira pelîd we qet (ji vê rêya rast) para nehêle. Lewra bêguman ew ji we re neyarek aþîkar e.  
 63; Çi gava Îsa bi delîlên xuya hat got ku: "Bi rastî ez ji we re bi hîkmetê hatime û ji bo ku ez hin tiptê hûn tê de bi hev dikevin ji we re diyar bikin. Vêca hûn xwe ji Xuda biparêzin û bidin pey min."  
 64; "Bêguman Xuda, ew perwerdekarê min û perwerdekarê we ye; êdî hûn wî bihebînin. Rêya rastîn eva haye."  
 65; Vêca partî ji nav xwe bi hev ketin. Êdî ji ezabê rojekî bi jan xulî li ewên sitemkarî kirine be.  
 66; Ma ew li bendê ne ku danê axretê ji nîþkav de bêyî haya wan jî hebe ji wan re were?  
 67; Wê rojê dost, ji xweparêzan pêve hin ji wan ji hina re neyar in.  
 68; Gelî bendeyên min! îro ne tirs li ser we heye û ne jî hûn xemgîn dibin.  
 69; Ewên ku bi ayetên me bawerî anîne û ew musulman bûne.  
 70; Hûn têkevin bihiptê; hûn û jinên xwe bi xweþî tene mazûrvanî kirin.  
 71; Bi kasik û þerbikên zêrîn li ser wan tê gerandin. Tê de tiptê dil dibijîne û çav xweþ dibînin heye, û hûn hertimî tê de dimînin.  
 72; Ev bihipta han e ku hûn bi xebata xwe bûne miratxwirê wê.  
 73; Ji we re tê de gellek fêkî hene ku hûn jê dixwin.  
 74; Bêguman sûcdarên gunehkar di ezabê dogehê de hertimî dimînin.  
 75; Ew (ezab) ji wan nayê sist kirin û ew tê de behêvî ne.  
 76; Me li wan tadê nekiriye, lê belê ew bi xwe sitemkar bûn.  
 77; (Ehlê dogehê) gazî kirin ku: "Maliko! bira perwerdekarê te li ser me hukim bike-me bimirîne." (Dergevan) got ku: "Bêguman hûnê tê bimînin."  
 78; Sond be me rastiyê ji we re anî, lê belê pirrî we bi rastiyê dilnexweþ in.  
 79; Ma qey wan biryara karekî zexm daye? Vêca bêguman me jî biryar daye.  
 80; Yan ew guman dikin ku bera em razê wan û hevpeyvîna wana bi dizî nebihîzin? Çewa (em dibihîzin) û qasidên me jî li cem wan in dinivsinin.  
 81; Tu bêje ku: "Eger ji (Xudayê) Mihrîban re zarû hebûna, vêca ezê pêþiyê perestvanan bûna ma."  
 82; Perwerdekarê asîmana û zemîn, perwerdekarê textê (mezin) ji tiptê ew salix didin pak bêrî ye.  
 83; Vêca tu dev ji wan berde bira ew (di nebaþiyên xwe de) noq bibin û bileyzin heya ku ew rastî roja xwe ya ku tene wade dayîn tèn.  
 84; Ew e ê ku di asîman de Xuda ye û di zemîn de Xuda ye. Hîkmetdarê zana her ew e.  
 85; Û pak pêroz e ê ku mulkê asîmana û zemîn û tiptê di nav wan de ê wî ye; û zanîna danê qiyametê li cem wî ye û hûnê her bal wî ve bêne vegerandin.  
 86; Ewên ku ew bêyî wî gazî dikin tu mehdervanî di destê wan de nîne; ji pêþtirê ê ku bi rastiyê danasî bide û ew bizanbin.  
 87; Sond be, eger tu ji wan bipirsî ku: Kî wan aferandiye? Wê bêjin: "Xuda." Vêca ew çewa tene zivirandin?  
 88; Û (zanîna) gotina wî ku (got:) "Perwerdekarê min! bêguman evên han komelekî ne ku bawerî naynin" (jî li cem Xuda ye).  
 89; Êdî tu rû ji wan bizivrine û bêje: "Silav (xweþî ji we re be)"; veka wê papê bizanbin.

1; Ha, Hîm.  
 2; Bi kitêba aþîkar.  
 3; Bêguman me wê di þevêkî pîroz de daxistiye; bêguman em hey hiþyarker in.  
 4; Her karê hîkmetdar di wê (þevê) de ji hev tê veqetandin.  
 5; Karekî ji cem me. Bêguman em hey (pêxemberan) diþînin.  
 6; Dilovaniyek ji perwerdekarê te ye. Bêguman ew, sehkîrê zana her ew e.  
 7; Eger hûn ji dil bawer in (ew) perwerdekarê asîmana û zemîn û tiptê di nava wan de ye.  
 8; Ji wî pêve tu Xuda nînin; vedijîne û dîmirîne. Perwerdekarê we û perwerdekarê bav û kalên we pêþîn e.  
 9; Ne, ew di dudiliyê de dileyizin-pê tinaza dîkin.  
 10; Êdî tu li benda wê rojê be ku asîman dûyekî xuya tîne.  
 11; Ew mirovan radipêçe. Evê han ezabekî bi jan e.  
 12; (Gotin:) "Perwerdekarê me! tu ezab ji me rake, bêguman em bawermend in."  
 13; Çewa ew þîret digrin, tevî ku pêxemberek xuya ji wan re hatiye?  
 14; Paþê wan jê rû zivirand û gotin ku: "Hînbûyekî dîn e."  
 15; Bêguman emê hinekî ezab rakîn, bi rastî hûnê (dîsa) veqerin.  
 16; (Di bîr bîne) roja ku emê bi girtina herî mezin (wan) bigrin; bêguman em heyfsitan in.  
 17; Sond be me berî wan komela Fir'ewn jî sihêti kir û pêxemberek birûmet ji wan re hat.  
 18; (Û gote wan:) "Ku divê hûn bendeyên Xuda (zariye Îsraîl) bispêrin min. Bêguman ez ji we re pêxemberek pêbawer im."  
 19; "Û ji bo ku hûn nebûya navên ser Xuda-li hember wî ranebin. Bêguman min ji we re delîlek xuya aniye."  
 20; "Û bi rastî min xwe avêtiye perwerdekarê xwe û perwerdekarê we ku hûn min kevirbaran nekin."  
 21; "Eger hûn ji min bawer nekin jî, êdî hûn dev ji min berdin."  
 22; Vêca gazî perwerdekarê xwe kir ku: "Bêguman evên han komelekî sûcdarên gunehkar in."  
 23; Vêca (Xuda gotê ku:) "Tu bi þev bi bendeyên min re bi rê keve; bêguman hûnê bêne peyketin."  
 24; "Û tu deryayê hêdî bihêle û here. Lewra bêguman ew leþkerekî fetisandî ne."  
 25; Wan çiqas bax û baxçe û kanî (li pey xwe) hiþt.  
 26; Û gellek zevî û ciyên rind.  
 27; Û xweþiyên ku ew tê de kêfxweþ bûn.  
 28; Me komelekî din wuha kir mîratxwîrên wan.  
 29; Vêca ne asîman li ser wan giriya û ne jî zemîn, û li benda wan jî nehate mayîn.  
 30; Sond be, me zariyê Îsraîl ji ezabê riswaker rizgar kir.  
 31; Ji Fir'ewn Lewra bêguman ew zordarekî ji hedderketiyan bû.  
 32; Sond be, me wan bi zanîn di ser gelê cîhanê re girt-hilbijart.  
 33; Û me hin nîþanan da wan ku tê de xweþîkî xuya hebû.  
 34; Bêguman evên han dibêjin:  
 35; "Ku ji mirina me ya pêþîn pêve tu tipt nêne û em (piptî mirinê jî) nayên rakirin."  
 36; "Vêca eger hûn bera rastgo ne de ka bav û kalên me bînin."  
 37; Ma ew çêtir in (bihêztir in) yan komela Tubbe', û ên berî wan ku me wan têk bir. Lewra bêguman ew sûcdarên gunehkar bûn.  
 38; Me asîmana û zemîn û tiptê di nava wan de bi leystik neaferandiye.  
 39; Me wan her bi راستیê aferandiye, lê belê pirrî wan nizanin.  
 40; Bêguman roja ji hev veqetandinê wextê wada wan teva ye.  
 41; Roja ku tu merivê nêz bi kêra merivê xwe nayê û ew neyên yarî kirin jî.  
 42; Ji pêþtirê ê ku Xuda lê dilovanî kiribe. Lewra bêguman ew, serkeftiyê dilovan her ew e.  
 43; Bêguman dara zîqûmê-keratiyê,  
 44; Xwarina gunehkaran e.  
 45; Wekî qîra kelandî ye ku di zikan de dikele.  
 46; Wekî ava kelandî.  
 47; (Gelî zebaniyan!) hûn wî bigrin, êdî hûn wî bi zorê biþînin nava dogehê.

48; Papê hûn jiezabe germ bi ser serî wî de birêjin.  
 49; Tu tam ke. Lewra bêguman tu (di dilê xwe de) serdestekî birûmet bû yî.  
 50; Bêguman evê haye tiptê we pê xirecirê fikir.  
 51; Bêguman xweparêz jî di ciyekî biewle de ne.  
 52; Di nav bax û baxçe û kanyan de ne.  
 53; Ew jihevriþimê tenik û qalind li xwe dikin; li hember hev rûniptî ne.  
 54; Her wuha ye, û me wan bi (jinên) çav belek re daye zewicandin.  
 55; Ew tê de biewletî ne ji her fêkiyî dixwazin.  
 56; Ew tê de ji mirina pêþîn pêve tu mirinê tam nakin; û (Xuda) wan ji ezabê dogehî parastîye.  
 57; Qencîkî ji perwerdekarê te ye. Rizgariya mezin her eva haye.  
 58; Vêca bêguman me wê (Qur'anê) bi zimanê te hêsan kir, hêvî heye ku ew bifikirin-þîret bigrin.  
 59; Vêca tu li bendê be; bêguman ew jî li bendê ne.

#### Chapter 45 (Sura 45)

1; Ha, Mîm.  
 2; Daxistina kitêbê hin bi hin ji Xudayê serkeftiyê hîkmetdar e.  
 3; Bêguman di asîmana û zemîn de ji bawermendan re gellek ayet (nîþan) hene.  
 4; Ji komelekî jidilbawer re di aferandina we û rawirên ku belav kiriye de jî gellek ayet (nîþan) hene.  
 5; Û ji komelekî hiþ tê dibin re di guherîna þev û rojê û roziya (ava) ku Xuda ji asîman daxistiye vêca pê zemîn piptî mirina wê vejandiye, û guherîna bayan de jî gellek ayet (nîþan) hene.  
 6; Evên han ayetê Xuda ne ku em wan bi rastiyê li ser te dixweynin. Vêca ma ew piptî Xuda û ayetên wî bi kîjan peyvê bawerî tînin?  
 7; Xulî li serî her derewkerê gunehkar be.  
 8; Ew ayetên Xuda ku li serê tene xwendin dibihîze, papê bi quretî rik dike herwekî ku qe nebihîstibe; vêca tu wî bi ezabek bi jan mizgîn bike.  
 9; Ew gava tiptekî ji ayetên me hîn dibe, wan bi tinaz digre. Ewên han ji wan re ezabekî riswaker heye.  
 10; Ji pap wan ve dogeh heye. Ne tiptê bi dest xistine tiptekî bikêra wan tê û ne jî yar û yawerên ku bêyî Xuda girtin. Ji wan re ezabekî mezin heye.  
 11; Ev (Qur'an)a han rêber e. Ewên ku bi ayetê perwerdekarê xwe kafir bûne ji wan re ezabekî bi jan ji ezabê þîs heye.  
 12; Xuda ye ê ku deryayê ji we re ram kiriye ji bo ku keptî bi fermana wî tê de biherike-bimeþe û ji bo ku hûn ji qenciya wî bixwazin û hêvî heye ku hûn sipas bikin.  
 13; Û ji (qenciya) xwe tiptê di asîmana û tiptê di zemîn de tev ji we re ram kiriye. Bêguman ji komelekî ku difikirin re di vî de gellek ayet (nîþan) hene.  
 14; Tu ji ewên bawerî anîne re bêje ku: "Bira ew li ewên ku hêviya rojê Xuda nakin biborin, ji bo ku ew, komelekî bi sedem tiptê bi dest xistine celat bike.  
 15; Kî karekî qenc bike, vêca ew ji xwe re dike û kî xerabî jî bike, êdî ew ji xwe re dike; papê hûnê her bal perwerdekarê xwe ve bêne vegerandin.  
 16; Sond be, me kitêbê û fêrbûnê û pêxemberiyê da zariyê Îsraîl û me ji tiptê pak rozî da wan û me wan di ser cîhaniyan re girt.  
 17; Û me ji hemû karan daxuyaniyan da wan. Vêca ew, tenê ji piptî ku zanîn ji wan re hat ji ber dexesiya nav wan bi hev ketin. Bêguman perwerdekarê te wê roja qiyametê di nava wan de di tiptê ku ew tê de bi hev ketine de hukim bike.  
 18; Papê me te ji kara li ser rêyek (dînek) çêkir; êdî tu bide pey wê û nede pey hewesê ên nizanin.  
 19; Bêguman ew, te bi tu tiptî ji Xuda bêhewce nakin. Bêguman sitemkar jî hin ji wan dostê hina nin û Xuda jî yar û yawerê xweparêzan e.  
 20; Ev (Qur'an)a han ji mirovan re çavvekirin û ji komelekî ji dil bawer dikin re rêber û dîlovanî ye.  
 21; Ma qey ewên ku xerabiyan bi dest xistine guman dikin ku emê wan bikin wekî ên bawerî anîne û karên qenc kirine?; emê jiyana wan û mirina wan wekî hev bikin? Tiptê hukim dikin çî nerind e!  
 22; Xuda, asîmana û zemîn bi rastiyê aferandiye û ji bo ku her kes bi tiptê bi dest

xistiye bête celat kirin û ew tadê jî nabînin.

23; Vêca ma te dît ê ku hewesa xwe ji xwe re bi Xudayî girt û Xuda wî li ser zanînê ji rê pap kir û li ser gohê wî û dilê wî mohr kir û li ser çavê wî jî perde çekir. Vêca ma piptî Xuda wê kî wî bide ser rêya rast? Ma hûn hêjî nafikirin-pîret nagirin?

24; Gotin ku: "Ji vê jiyana me ya dinê pêve tu tipt nîne, em dimirin û dijîn. Ji dema mezin (guherîna pev û rojan) pêve me têk nabe." Tu zanîna wan bi vî nîne. Ew hey guman dîkin.

25; Û gava ayetên me bi xuyanî li ser wan tî xwendin, delîla wan tenê (ev e) ku dibêjin: "Eger hûn rastgo ne de ka bav û kalên me bînin."

26; Tu bêje ku: "Xuda, we dide jiyandin papê we dimirîne papê wê we bal roja qiyametê ve ku tu dudilî tê nîne bicivîne, lê belê pirrî mirovan nizanin."

27; Mulkê asîmana û zemîn ê Xuda ye. Roja danê qiyametê rabe, wê rojê xwediyê karê pûç û beredayî ziyan dîkin.

28; Tu (ehlê) her dînî çokpikandî dibînî. Her kom bal kitêba xwe ve têne gazî kirin. Îro hûn bi tiptê we kiriye têne celat kirin.

29; Evê han kitêba me ye ku bi rastiyê li ser we dipeyive. Lewra béguman me, her tiptê we dikir dinivisand.

30; Vêca heçî ên bawerî anîne û karên qenc kirine êdî perwerdekarê wan, ewan dixê dîlovaniya xwe de. Rizgariya xuya her eva haye.

31; Û heçî ên kafir bûne, (ji wan re tê gotin ku:) "Vêca ma qey ayetên min li ser we nedihat xwendin, vêca we quretî kir û hûn bûn komelekî gunehkar."

32; Û gava hate gotin ku: "Béguman wada Xuda rast e û danê qiyametê tu dudilî tê nîne" we got ku: "Em nizanin danê qiyametê çî ye. Em hey guman dîkin û em ji dil bawer nakin."

33; Û xerabiya tiptê kiribûn ji wan ve xuya bû û tiptê pê tinaza dikirin hawîdorê wan girt.

34; Û hat gotin ku: "Emê jî îro we ji bîr bikin çewa ku we pergîhatina vê roja we ya han ji bîr kir û hewyegeha we agir e û ji we re tu alîkar jî nînin."

35; Evê han ji ber ku bi rastî we ayetê Xuda bi tinaz girt û jîna dînê we xapand. Êdî îro ew ne jê tî derxistin û ne jî vegeer ji wan tê xwestin.

36; Vêca pesn û sipas her ê Xudayê perwerdekarê asîmana û perwerdekarê zemîn, perwerdekarê hemû cîhana ye.

37; Meznahiya di asîmana û zemîn de her a wî ye. Serkeftiyê hîkmetdar her ew e.

## Chapter 46 (Sura 46)

1; Ha, Mîm

2; Daxistina kitêbê hin bi hin ji Xudayê serkeftiyê hîkmetdar e.

3; Me asîmana û zemîn û tiptê di nava wan de her bi rastiyê û demek navdayî aferandiye. Ewên kafir bûne ew ji tiptê (pê) hatine hişyar kirinê rû liba dixin.

4; Tu bêje ku: "De binêrin tiptê hûn bêyî Xuda dihebînin, ka nîpanî min bidin wan ji zemîn çî aferandiye? Yan ji wan re pîrîkatî di asîmanan de heye? Eger hûn rastgo ne ka kitêbek berî vê (Qur'an) a han yan bopekî ji zanînê bînin!"

5; Ji kesê bêyî Xuda gazî ê ku heya roja qiyametê bersiva wî nade û ew ji gaziya wan jî bêhay in dike, rêbaptir kî heye?

6; Û gava mirov bêne civandin ew (pûtên wan) ji wan re dibin neyar û ew bi hebandina wan jî dibin kafir.

7; Û gava ayetên me apkera li ser wan tî xwendin, ên kafir bûne ji rastiyê re çî gava ji wan re tê dibêjin: "Evê han efsûneke apîkar e."

8; Yan qey ew dibêjin ku: "Wî ji ber xwe ve derxistiye?" Tu bêje ku: "Eger min wê ji ber xwe ve derxistibe êdî (ezabê) ji Xuda ji min re bê tu tipt di destê we de nîne (hûn nikarin min jê biparêzin). Ew bi tiptê hûn tê noq dibin zanatir e. Ew bi danasiya di navbera min û we de bes e. Bexpendekarê dîlovan her ew e."

9; Tu bêje ku: "Ez ji pêxemberan ê pêpîn nînim (ku hûn ew qas sosret dibînim) û ez nîzanim wê bi min û we çî bête kirin. Ez tenê didim pey tiptê bal min ve tê wehî kirin û ez tenê hişyarkerek apîkar im."

10; Tu bêje ku: "Ka binêrin! eger ew (Qur'an) ji cem Xuda be û hûn pê kafir bibin û danasê ji zariyê Îsrail li serê danasî bide, vêca ew bawerî bîne û hûn quretî bikin (kafir bibin êdî ji we rê bapîr kî heye?)" Béguman Xuda, komela sitemkaran nade

ser rêya rast.

11; Ewên kafir bêne ji ên bawerî anîne re gotin ku: "Eger ew (dîn) baştir bûna ew pêpiya me nediketin." Wan çî gava pê rêya rast nedît vêca wê bêjin: "Eva han derewek kevnare ye."

12; Berê wê kitêba Mûsa peþwa û dilovanî bû. Eva han jî kitêbek rastdêr e bi zimanê erebî ye ji bo ku ên sitemkarî kirine hiþyar bike-bitirsîne û ji qencîkaran re jî mizgîn e.

13; Bêguman ên ku gotin: "Perwerdekarê me Xuda ye" papê xwe rast kirin, êdî ne tirs li ser wan heye û ne jî ew xemgîn dibin.

14; Ewên han ehlê bihiptê ne, bergîdana tiptê dikirin wê ew tê de hertimî bin.

15; Me li mirova pîret kiriye ku bi dê û bavê xwe qencî bike. Diya wî bi zor wî hilgirtiye û bi zor wî daniye. Hilgirtina wî û (ji pîr) veqetina wî sî meh e. Heya gava ghiptê hêza xwe û ghiptê çihl saliyê, got ku: "Perwerdekarê min! tu hêz bide min ez sipasî qencyê ku te bi min û dê û bavê min qencî kiriye bikim û ez karê baþ bikim ku tu pê qayil bibî û tu di nifþa min de ji min re baþî bike. Bêguman ez bal te ve poþmam bûmevegeriya me û bêguman ez ji musulmana me."

16; Evên han in ên ku em rinditirê tiptê kirine ji wan dipejirînin û em di nav ehlê bihiptê de ji xerabiyên wan diborin. Wada rast e ku ew hatine wade dayîn.

17; Ewê ku ji dê û bavê xwe re got: "Of ji we re, ma hûn min ditirsînin ku ezê (piptî mirinê ji gorê) bême derxistin, tevî ku berî min gellek nifþ derbas bûne?"

Ew (dê û bavê wî jî) hewarê li Xuda dadixin ku: "Xulî li serê te be! bawerî bîne.

Lewra bêguman wada Xuda rast e." Vêca ew jî dibêje: "Evê han çîrokê peþiyan e."

18; Evên han in ên ku gotina (ezabê) di nav komên ji cinn û mirovan ku berî wan derbas bûne de li ser wan pêwîrt bûye. Bêguman ew bûne ziyankar.

19; Ji hemûyan re ji tiptê kirin hin paye (ji xelat û celatê) hene û ji bo ku (Xuda bergîdana) karên wan bêtêmasî bide wan û ew nayên tade kirin jî.

20; Û roja ku ewên kafir bûne li ser agir têne derpêþ kirin (ji wan re tê gotin:)

"We, xwepiyên xwe di jiyana dinê de derbas kir û we pê kêfa xwe kir. Îdî îro, hûnê bi sedem ku we di rûyê zemîn de bi neheqî quretî dikir û bi sedem ku hûn ji rastiyê derdiketin, bi ezabê riswatiyê bêne celat kirin."

21; Û (Hûd) birayê (komela) Ad di bîr bîne, dema ku wî komela xwe li Ehqafê (Girên ji qûmê) tevî ku berî wî û piptî wî gellek hiþyarker derbas bûn jî hiþyar kir ku:

"Hûn ji Xuda pêve kesî nehebînin. Bêguman ez li ser we ji ezabê roja mezin ditirsim."

22; Gotinê: "Ma tu hatî me bi derewa ji Xudayên me bizivrinî? Vêca eger tu bera ji rastgoyanî ka tu tiptê me pê ditirsînî ji me re bîne."

23; (Hûd) got ku: "Bêguman zanîn tenê li cem Xuda ye, û ez tiptê pê hatime þandin bi we radigihînim, lê belê ez we komelekî nezan dibînim."

24; Vêca çî gava wî (ezabî) dîtî ku ewrek e, ber bi newalên wan tê, gotin: "Evê han ewrek e wê baranê bide me." Ne, ew tiptê we pê dilezande. Bayekî ku tê de ezabekî bi jan heye.

25; Ewê bi fermana perwerdekarê xwe her tiptî wêran bike. Vêca ew bûn ku ji ciyên wan pêve nedihat dîtî. Em komela sûcdakarên gunehkar wuha celat dikin.

26; Sond be, me wan di hin ciyan de bi cîh kir ku me we tê de bi cîh nekiribû, û me ji wan re goh û çav û dilan çekir. Lê ne gohên wan û ne çavên wan û ne jî dilên wan bi tu tiptî bikêra wan hat; ji ber ku wan ayetê Xuda înkâr dikir û tiptê pê tinaz dikirin hawîdor li wan girt.

27; Sond be, me gellek bajarên derûdora we têk bir û me ayetan daxuyand hêvî heye ku ew vegerin.

28; Vêca ma çima ewên ku bêyî Xuda ji bo nêzikahiyê bi Xudayî digirtin yariya wan nekir. Ne, ew ji wan hinda bûn. Evê han derewa wan e û tiptê ji ber xwe ve diavetin e.

29; (Di bîr bîne) dema me komekî ji cinna bal te ve liba xist ku Qur'anê gohdarî dikirin. Vêca çî gava hatin balê gotin: "Deng nekin." Vêca çî gava (xwendin) qediya ew bi hiþyarkerî çûne bal komela xwe ve.

30; Gotin: "Gelê me! bêguman me kitêbekî bihîst ku piptî Mûsa hatiye daxistin, ew, ê berî xwe rast didêre, bal rastiyê ve û bal rêya rastîn ve rêberî dike."

31; "Gelê me! hûn bersiva dozvanê Xuda bidin û pê bawerî binin ku gunehê we ji we re bibexþîne û we ji ezabê bi jan rizgar bike."

32; Kî bersiva dozvanê Xuda nede êdî ew di rûyê zemîn de bêzarker nîne, û ji wî pêve jê re tu yar û yawer jî nînin. Ewên han di paþiyek xuya de ne.

33; Ma qey ew nabînin ku bêguman Xudayê ku asîmana û zemîn aferandiye û ew bi aferandina wan newestiyaye, dikare ku miriyan jî vejîne? Çewa! bêguman ew bi her tiptî dikare.

34; Û roja ku wê ewên kafir bûne li ser agir bêne derpêþ kirin (wê ji wan re bê gotin ku:) "Ma evê han nerast e?" Wê bêjin: "Belê çewa! em bi perwerdekarê xwe kin (ev rast e)." (Xuda) got ku: "Nexwe hûn bi sedem ku kafir bûne ezab tam kin."

35; Vêca tu bihna fireh nîþan de çewa ku pêxemberên xwediyê hewiyê bihna fireh nîþan dan, û tu ji wan re nelezîne. Ew, roja ku tiptê têne wade dayîn dibînin, ew herwekî ku ji danekî rojê pêve (li dinê) nemabin. (Ev Qur'ana han) ragihandin e-qîm dike. Vêca ma qey ji komela ji rastiye derketî pêve têk tê birin?

#### Chapter 47 (Sura 47)

1; Ewên ku kafir bûne û (mirovan) ji rêya Xuda girtine (nahêlin bawerî binin, Xuda) kirinên wan pûç kiriye.

2; Ewên bawerî anîne û karên qenc kirine û bi tiptê li ser Muhammed hatiye daxistin bawerî anîne-tevî ku ew ji perwerdekarê wan rastî ye, (Xuda) nepakiyên wan ji wan biriye-bexiþandiyê û rewþa wan baþ kiriye.

3; Evê han ji ber ku bêguman ewên kafir bûne dane pey pûçîtî û beredayîtiyê û bêguman ên ku bawerî anîne jî dane pey rastiya ji perwerdekarê xwe. Xuda ji mirovan re wuha mînakan dide.

4; Vêca gava hûn (di cengê de) rastî ên kafir bûne hatin êdî hûn li sitûyê wan din (wan bikujin); heya gava we zora wan bir (wana bi pirranî kuþt û dîl girt) êdî hûn girêkan biþidin (ku ji destê we nefilitin) heya gava cengê çekên xwe danî (hûn bi ser ketin û ew zebûn bûn) êdî piþtre ya bi qencîtî yan jî bi girtina bergîdanekî (hûn dîlan berdin. Kar) evê han e. Eger Xuda bixwesta wê bi xwe heyf ji wan hilanîna. Lê belê (wuha nake) ji bo ku hina ji we bi hina sihêtî bike. Ewên ku di rêya Xuda de hatine kuþtin, êdî (Xuda) kirinên wan hinda nake.

5; Wê (Xuda) wan rêberî bike û rewþa wan xweþ bike.

6; Û wê wan têxe bihiþta ku ji wan re salix daye-xweþ kiriye.

7; Gelî ên bawerî anîne! eger hûn yariya Xuda bikin wê ew jî yariya we bike û piyên we paydar bike.

8; Ewên kafir bûne jî êdî pemitandin-sernûgînî ji wan re be û (Xuda) kirinên wan jî pûç û beredayî derxistiye.

9; Evê han bi sedem ku bêguman ew bi tiptê Xuda daxistiye dilnexweþ bûn, vêca wî kirinên wan þewitandiyê.

10; Vêca ma qey ew li rûyê zemîn negerîyan ku bibînin ka paþiya ên berî wan çewa bû? Xuda, (warên wan) bi ser wan de wêran kir û ji kafiran re jî wekî wî heye.

11; Evê han ji ber ku bêguman Xuda yar û yawerê ên bawerî anîne ye û bêguman kafir, ji wan re tu yar û yawer nînin.

12; Bêguman Xuda, ên bawerî anîne û karên qenc kirine dixê bihiþtên ku çem ji binê wan diherikin. Ewên kafir bûne kêfa xwe dikin û çewa dewar dixwin ew dixwin û agir ji wan re qonax e.

13; Çiqas bajar ku ew ji bajarê te yê te deranîn bihêztir bûn jî me wan têk bir, êdî tu alîkar ji wan re nînin.

14; Vêca ma ê ku li ser daxuyaniyek ji perwerdekarê xwe be wekî wî ye ku karê wî yê xerab jêre hatiye xemilandin? Wan daye pey dilxwaziyên xwe.

15; Mînaka bihiþta ku ji xweparêzan re hatiye wade dayîn; têde çemên ji ava ne genî û çemên ji þîrê ku tama wî neguheriye û çemên ji meyxwiran re xweþ e û çemên ji hingivê dakirî heye; û ji wan re tê de ji her fêkiyî û bexþînek ji perwerdekarê wan heye. (Ma ê ku di nav van xweþiyan de ye) wekî ê ku hertimî di agir de ye? Ew ji avekî kelandî hatin avdan, vêca rodîyên wan perçe kir.

16; Hin ji wan li te gohdarî dikin, heya gava ku ji cem te dertên, ji ewên zanîn ji wan re hatiye dayîn re dibêjin: "Ma wî hêja çi got?" Ewên han in ên ku Xuda ser dilên wan mohr kiriye û wan daye pey dilxwaziyên xwe.

17; Ewên ku rêya rast dîtine (Xuda) rastiya wan pirrtir kiriye û xweparêziya wan daye wan.

18; Vêca ma ew hey li hêviya danê qiyametê ne ku ji niþkavde bê wan? Vêca bi rastî

nîpanên wê hatine. Gava bête wan, êdî pîret girtina wan çi bikêra wan tê?

19; Êdî tu bizanbe ku: Bêguman ew, ji wî pêve tu Xuda nînin û tu ji gunehê xwe û ji mêrên bawermend û jinên bawermend re bexpînê bixwaze. Xuda ciyê çûn û hatina we (bi roj) û ciyê qonaxa we (bi pev) dizane.

20; Ewên bawerî anîne dibêjin ku: "Ma çima sûretek nehatiye daxistin." Vêca gava sûretek biryardayî bê daxistin û tê de behsa cengê bibe, tu ewên di dilên wan de nexweşin heye dibînî ku ew wek nêrîna ê ji tirsê mirinê bêhiş ketiye li te dinêrin. Vêca ew ji wan re çêtir e!

21; Peyrewtî û gotina xweş (hê çêtir e). Vêca gava kar (ê cengê) beratî-jî dil bibe, (ew xwe ji pare didin). Vêca eger ew bi Xuda re rast bûna ewê ji wan re bapîr bûna.

22; Vêca ma nabe ku eger hûn (ji rastiyê) rû bizivrin, hûnê di rûyê zemîn de xerabkarî bikin û hûnê merivatiya xwe bibirrin?

23; Evên han in ên ku Xuda li wan lanet kiriye vêca wan kerr kiriye û çavên wan kor kiriye.

24; Vêca ma qey ew li Qur'anê hûr nafikirin? Yan li ser dilan qeflên wan hene?

25; Bêguman ên ku piştî rêya rast ji wan re xuya bû, li ser paşiyên xwe zivirîn (kafir bûn) ew pelîd ji wan re xemilandiye û arzûyên dirêj ber wan xistiye.

26; Evê han ji ber ku wan ji ên ku bi tiptê Xuda daxistiye dilnexweş bûn re gotin ku: "Emê di hin karan de peyrewtiya we bikin." Xuda, vepariyên wan dizane.

27; Vêca gava feripte canê wan bistînin çewa ne ku ew li rûyên xwe û paşiyên xwe dixin?

28; Evê han ji ber ku bi rastî wan da pey tiptê Xuda hêrs dike û ji qayilbûna wî hiz nekin, vêca wî kirinên wan pêwîst.

29; Ma ewên di dilên wan de nexweşin heye guman dikin ku wê Xuda kîn û neyartiya wan qet dernexe?

30; Eger me bixwesta, me yê wan nîpanî te bidana vêca te yê wan bi sikûmê wan nas bikirna. Sond be tê wan di nav gotinê wan de binasî. Xuda kirinên wan dizane.

31; Sond be emê we sihêtî bikin heya ku em cihadvan û bîhnfirehên ji we bizanbin û em bûyerên we jî sihêtî bikin.

32; Bêguman ên kafir bûne û pêpî li rêya Xuda girtine û piştî ku rêya rast ji wan re xuya bû neyartiya pêxember kirine, ew nikarin bi tu tiptî zîyanê bidin Xuda. Wê kirinên wan bişewitîne.

33; Gelî ên bawerî anîne! hûn bidin pey Xuda û bidin pey pêxember û kirinên xwe pûç û beredayî dernexin.

34; Bêguman ên kafir bûne û pêpî li rêya Xuda girtine papê ew tevî ku kafir bûn mirine, êdî Xuda qet ji wan re nabexpîne.

35; Vêca hûn xwe sist û zebûn nekin û bal aptiyê ve gazî nekin, tevî ku hûn serdesttir in. Xuda bi we re ye û qet kirinên we ji we re kêr nake.

36; Bêguman jîna dinê her leystik û hewes in. Eger hûn bawerî binin û xwe biparêzin, wê destmuzên we bide û malên we jî ji we nexwaze.

37; Eger ew wî ji we bixwaze vêca li we zor bê hûnê timatî nîpan din, ewê jî kîn û neyartiyên we derîne.

38; Ha hûn evên han, hûn tîr gazî kirin ji bo hûn di reya Xuda de bidin, vêca hin ji we timatî nîpan didin. Kî timatî bike êdî bêguman ew her ji xwe re dike. Xuda, dewlemend e-bêhewce ye û hûn xizan in-hewcedar in. Eger hûn rû bizivrin, wê we bi komelekî din biguherîne, papê ew nabin mîna we.

#### Chapter 48 (Sura 48)

1; Bêguman me pîrozîkî xuya ji te re vekiriye.

2; Ji bo ku Xuda gunehê te yê borî û ê para de bibexpîne û qenciya xwe li ser te pêk bîne û te bigihîne rêya rastîn.

3; Û Xuda bi yariyek serkeftinî yariya te bike.

4; Ew e ê ku di dilê bawermendan de hêminî daxistiye ji bo ku bi baweriya xwe re bawerî pirr kin. Lepkerê asîmana û zemîn ê Xuda ne. Xuda hey zanayê hîkmetdar e.

5; Ji bo ku (Xuda) mêrên bawermend têxe bihiştên ku ji binê wan çem diherikin, ewê hertimî tê de bimînin û nepakiyên wan ji wan bibe. Evê han li cem Xuda hey rizgariyek mezin e.

6; Û mêrên durû û jinên durû û mêrên pûtperest û jinên pûtperest ên ku bi gumanek



pîs bi Xuda bedguman in jî bide ezabê Çerxa xerab li ser wan e. Xuda li wan hêrs bûye û li wan lanet kiriye û ji wan re dogehê amade kiriye. Çi pûnvegerek nerind e! 7; Lepkerê asîmana û zemîn ê Xuda ne. Xuda hey serkeftiyê hîkmetdar e.

8; Bêguman me te danas û mizgînavan û hiþyarker þandiye.

9; Ji bo ku hûn bi Xuda û pêxemberê wî bawerî binin û wî yarî bikin-biparêzin û birûmet mezin bigrin û sibe û êvara wî pak bêrî bidêrin.

10; Bêguman ên ku bi te re bey'et (hevpeymanî) kirine wan her bi Xuda re bey'et kiriye. Destê Xuda li ser destê wan e. Vêca kî (peymana xwe) biþkîne, êdî ew li xwe diþkîne. Kî jî tiptê li serê bi Xuda re hevpeymanî çekiriye pêk bîne edî wê xelatekî mezin bide wan.

11; Ji erebê çolê ên ku (ji cengê) para de hatine hiþtin wê ji te re bêjin ku: "Malên me û ehlê me, me mijûl kir, vêca tu ji me re bexþîne bixwaze." Ew tiptê di dilên wan de nîne bi zimanên xwe dibêjin. Tu bêje ku: "Eger Xuda ziyana we bixwaze yan kara we bixwaze, vêca li hember wî di destê kî de tiptek heye ku nehêle?" Ne, (tu kes nikare tiptekî bike). Xuda bi tiptê hûn dîkin kûrzana ye.

12; Ne, we guman dîkir ku tu car wê pêxember û bawermend bal ehlê xwe ve qet venegerin. Evê han di dilên we de xweþ hat û we bi gumanek pîs bedgumanî kir û hûn bûn komelekî têkçûyî.

13; Kî bi Xuda û pêxemberê wî bawerî neyne, vêca bêguman me ji kafiran re agirek har amade kiriye.

14; Mulkê asîmana û zemîn ê Xuda ye, ew kî bixwaze dibexþîne û kî jî bixwaze dide ezabê. Xuda hey bexþendekar e diloan e.

15; Gava hûn derên bal xenîmetê ve herin ji bo ku hûn wan bigrin ên (ji cengê) para de hatine hiþtin dibêjin ku: "Hûn me bihêlin em jî bidin pey we." Ew dixwazin ku peyva Xuda biguherînin. Tu bêje ku: "Hûn qet nadin pey me. Evê han Xuda ji berê ve gotiye." Vêca wê bêjin ku: "Ne, hûn ji me çavnebariya dîkin." Ne, ew ji hindikî pêve tê nagihên .

16; Tu ji erebê çolê ên ku para de hatine hiþtin re bêje ku: "Hûnê bal komelekî zor cengvan ve bîne gazî kirin ku hûn bi wan re þer bikin yan jî ew serî deynin-musilman bibin, vêca eger hûn peyrewtî bikin wê Xuda xelatek rind bide we. Eger çewa ku we berê piþt dayê hûn piþt bidinê wê we bi ezabekî bi jan bide ezab dayîn."

17; Ne li ser ê kor zorîtî heye û ne li ser ê qot (seqet) zorîtî heye û ne jî li ser ê nexweþ zorîtî heye. Kî peyrewtiya Xuda û pêxemberê wî bike, wê (Xuda) wî têxe bihiþtên ku çem ji binê wan diherikin. Kî jî piþt bidê, wê wî bi ezabekî bi jan bide ezab dayîn.

18; Sond be Xuda ji bawermendan dema li binê darê bi te re bey'et kirin qayil bû; vêca tiptê di dilên wan de zanî, êdî hêminiyê bi ser wan de daxist û pîrozîkî nêz mizgîn da wan.

19; Û gellek xenîmetê ku wê bigrin. Xuda hey serkeftiyê hîkmetdar e.

20; Xuda, gellek xenîmet bi we wade daye ku hûnê wan bigrin. Vêca eva han ji we re zû kiriye û destê mirovan ji we girtiye; ji bo ku ji bawermendan re bibe nîþan (a pîroziyê) û we bide ser rêya rastîn.

21; Û (gellek xenîmet)ên din jî ku hê we nikariya bi ser wan kevin. Bi rastî Xuda hawîdor li wan girtiye-wan ji we re parastiye. Xuda hey bi her tiptî dikare.

22; Eger ên kafir bûne bi we re þer bikinna wê wan piþt bidayê, papê ne yar û yawer û ne jî alîkar diditin.

23; Rê û rêça Xuda ye ku ji berê de derbas bûye. Tu ji rê û rêça Xuda re tu guherîn qet nabînî.

24; Ew e ê ku di nava Mekkê de piþtî we li ser wan pîroz kir destên wan ji we girt û destên we jî ji wan girt. Xuda tiptê hûn dîkin hey dibîne.

25; Ew in ên kafir bûne û we ji Mizgevtî Heremê û goriya ku diviya bigihîþta ciyê xwe, para xiptin. Eger ne ji ber hin zîlamên bawermend û pîrekên bawermend ku hê hûn wan nizanin-nas nakin, hûnê pêl wan bikin vêca wê bi nezanî gunehêk (yan ziyaneke) ji wan bigihê we, bûna (minê we îsal bixista Mekkê. Lê me wuha kir) ji bo ku Xuda ê dixwaze têxe dîlovaniya xwe de. Eger ew ji hev cihê bibûna, me yê ên ji wan kafir bûne, bi ezabekî bi jan bida ezab dayîn.

26; Dema ên kafir bûne xîret-kêþî xîreykêþiya dewra nezaniyê kirin dilên xwe de, vêca Xuda, hêminiya xwe bi ser pêxemberê xwe û bi ser bawermendan de daxist û peyva xweparêziyê li ser wan pêwist kir ku ew pê hêjatir û ehlê wê bûn. Xuda hey bi her

tiptî zana ye.

27; Sond be, Xuda xewna pêxemberê xwe bi duristî rast derxist ku hûnê - eger Xuda bixwaze-biewletî ser kurkirî û porqusandî têkevin Mizgevtê Heremê, hûn natirsîn jî. Vêca wî tiptê we nezani zanî, êdî berî vî pîroziyek nêz çêkir.

28; Ew e ê ku pêxemberê xwe bi rêberî û dîne rastiyê pand ji bo ku wî bi ser her dînî bixe. Xuda bi danasî bes e.

29; Muhammed pêxemberê Xuda ye, ên digel wî li ser kafiran zor diwar in û di nava xwe de jî dilovan in. Tu wan dibînî ku xor dibin û serî datînin jî Xuda qencî û qayilbûnê dixwazin. Nîşana wan di rûyên wan de jî dewsa serîdanînê ye. Minaka wan di Incîlê de jî: wekî çandiniya ku zîla xwe derxistiye vêca wê rastzextm kiriye, vêca ew qalind bûye, êdî ew li ser koka xwe rast bilind bûye ku cotkaran dixê sosretê, ji bo ku kafiran bi wan hêrs bike. Xuda bi ên jî wan ku bawerî anîne û karên qenc kirine bexşîn û xelatek mezin wade daye.

#### Chapter 49 (Sura 49)

1; Gelî ên bawerî anîne! hûn pêşiya Xuda û pexemberê wî nekevin û hûn xwe ji Xuda biparêzin-bitirsîn. Bêguman Xuda sehkirê zana ye.

2; Gelî ên bawerî anîne! hûn dengê xwe bi ser dengê pêxember de bilind nekin û hûn çewa bi hev re bi deng mijûl dibin pê re bi deng mijûl nebin ku bêyî haya we jê hebe kirinên we bişewite.

3; Bêguman ên ku dengê xwe li cem pêxemberê Xuda kêr dînin, ewên han in ên ku Xuda dilên wan ji xweparêziyê re sihetî kiriye; ji wan re bexşîn û xelatek mezin heye.

4; Bêguman ewên ku ji pişt xaniyan ve gazî te dînin pirrî wan hiş tê nabin-xwe ranagirin.

5; Bêguman eger wan hewî bikirna heya ku tu derdiketî ba wan wê ji wan re çêtir bûna. Xuda bexpendekarê dilovan e.

6; Gelî ên bawerî anîne! eger yekî fasiq (ji rêya rast derketî) ji we re xeberekî anî, vêca hûn baş lê bikolin ji bo ku hûn bi nezani belakî bi serê komelekî de neynin, vêca hûnê poşman bibin.

7; Hûn baş bizanbin ku pêxemberê Xuda di nava we de ye. Eger wî di pirrî karan de peyrewtiya we bikirna hûnê biketina tengasiyan de. Lê bele Xuda baweriyê bi we xweş kiriye û wê di dilên we de xemilandiye û kufrê û fisqê (derketina ji rêya rast) û bêfermaniyê bi we nexweş kiriye. Ên rêya rast dîtine her evên han in.

8; Rûmet û qenciyek ji Xuda ye. Xuda zanatê hîkmetdar e.

9; Eger ji bawermendan du desta li hev xist-ber kirin, êdî hûn di naca wan de aptî bikin. Vêca eger yekî ji wan li a din tadê kir êdî hûn bi (dest) a ku tadê dike re ber bikin heya ku ew bal fermana Xuda ve vedigere. Vêca eger vejeriya êdî hûn bi dadî (edaletê) di nava wan de aptî bikin û bi rastiyê tevbigerin. Bêguman Xuda ji ehlê dad û rastiyê hiz dike.

10; Bêguman bewermend her biran e, vêca hûn di nava birayên xwe de aptî bikin û xwe ji Xuda biparêzin hêvi heye ku hûn bêne dilovanî kirin.

11; Gelî ên bawerî anîne! bira zîlam bi zilama tinaza nekin dibe ku ew ji wan çêtir bin; û bira pîrek jî bi pîreka (tinaza nekin) dibe ku ew ji wan çêtir bin. Hûn hev û din permezar nekin û bi navê nexweş gazî hev nekin. piştî baweriyê navê nexweş bi hev ve danîn çî pîs e. Kî poşman nebevenegere, edî sitemkar her ewên han in.

12; Gelî ên bawerî anîne! hûn xwe ji pirr bedgumanîyê dûr bikin. Lewra bêguman hinek bedgumanî guneh in. Hûn li pey hev û din gotina negerin casûsî û sixûriya nekin û paşpêşî hev û din nepeyivin. Ma yek ji we hiz dike ku goştê birayê xwe bi mirîti bixwe?; tevî ku hûn jê bîzê xwe tînin. Hûn xwe ji Xuda biparêzin-bitirsîn. Bêguman Xuda poşmaniya dipejirîne dilovan e.

13; Gelî morivan! bêguman me we ji zîlam û pîrekî aferandiye û me ji bo ku hûn hevûdin nas bikin we kiriye gel û el. Bêguman li cem Xuda bapirê we xweparêztirê we ye. Bêguman Xuda zana ye haydar e.

14; Erebe çolê gotin ku: "Me bawerî aniye." Tu bêje ku: "We bawerî neaniye lê belê bêjin: "Em musulman bûne." Hê bawerî neketiye dilên we. Eger hûn peyrewtiya Xuda û pêxemberê wî bikin, tu tipt jî kirinên we kêr nake. Bêguman Xuda bexpendekarê dilovan e.

15; Bêguman bawermend tenê ew in ku bi Xuda û pêxemberê wî bawerî anîne papê neketine dudiliyê û bi malên xwe û canên xwe di rêya Xuda de cîhadê kirine. Rastgo

her evên han in.

16; Tu bêje ku: "Ma hûn Xuda bi dînên xwe haydar dikin? Tevî ku Xuda bi tiptê di asîmana û tiptê di zemîn de dizane. Xuda zanayê bi her toptî ye."

17; Ew musulmaniya xwe li ser te dikin qencî. Tu beje ku: "Hûn musulmantiya xwe qet li ser min nekin qencî. Ne, eger hûn bera rastgo ne, Xuda li ser we qencî kiriye ku we bal baweriyê ve rêberî kiriye."

18; Bêguman Xuda vepariyê asîmana û zemîn dizane. Xuda, tiptê hûn dikin baþ dibîne.

#### Chapter 50 (Sura 50)

1; Qaf. Bi Qur'ana bilind hêja (ewê ji gora bêne rakirin).

2; Ne, ew ku ji wan re hiþyarkerek ji wan hatiye, sosret man, loma kafiran got ku: "Evê han tiptekî pirr sosret e."

3; "Ma gava em bimrin û bibin xulî (emê dîsa rabin?) Evê han vegerek pirr dûr e."

4; Bi rastî, tiptê zemîn ji wan kêr dike me zaniye. Li cem me kitêbek parêzwan heye.

5; Ne, çî gava rastî ji wan re hat wan derewand. Êdî ew di karekî tevlihev de ne.

6; Vêca ma qey ew li asîmanê seriya xwe nanêrin ku me wî çewa ava kiriye û me wî xemilandiye û jê re tu qelþ jî nînin.

7; Û me zemîn jî (çewa) dirêj raxistiye?; û me çiyayên bêhej tê de daniye û me tê de ji her cotê rind (giya) hêþîn kiriye.

8; Ji her bendeyê ji dil vedigere re çavvekirinî û bîrxistin e.

9; Me ji asîman avekî pirr bixweþî daxit, vêca me pê gellek bax û baxçe û tenê çinandinê hêþîn kir.

10; Û darê xurma yên dirêj ku bûtikên wan li ser hev hûnandî ne jî (me pê hêþîn kir).

11; Ji bo rozîniya bendeyan; û me pê welatekî mirî vejand. Derketina (ji goran) jî her wuha ye.

12; Berî wan komela Nûh û ehlê Ressê û Semûd jî derewandin.

13; Û (komela) Ad û Fîr2ewn û birayên Lût jî.

14; Û ehlê Eyketê (satara-daristanê gurr) komela Tubbe'ê jî. Teva jî pêxamberan derewandin; vêca ezabê min pêwist bû.

15; Vêca ma qey em ji aferandina pêþîn bêzar bûn (ku rakirina wan ji goran ji me re zor bê?) . Ne, (em bêzar nebûne lê) ew ji aferandinek nû di dudiliyê de ne.

16; Sond be, me mirov aferandiye û em dizanin ka di dilê xwe de çî çêdike. Em ji þahreha sitûyê wî pê nêziktir in.

17; Dema herdû (feriþte) jî rast û çep ve li hember rûniþtî ne-çavnêrî dikin digrin û dinivsinin.

18; Gotina (mirov ji devê xwe) bipekîne her parêzvanek amade li balê ye.

19; Sikrata (bêhiþiya) mirinê bi rastî hat. A ku tu jê direviyayî eva haye.

20; Di sûrê de hat pîf kirin. Roja ezab eva haye.

21; Û her kes ku pê re ajotvanek û danasek heye hat.

22; Sond be, haya te ji vî yê han nebû. Vêca me perda te ji (ser çavê) te rakir, êdî îro (dîtina) çavê te pirr tûj e.

23; (Feriþte yê) hevalê wî got ku: "Tiptê li ba min amade ye evê han e."

24; (Xuda gote wan ku:) "Hûn her kafirê serkêþ bavêjin dogehê."

25; "Ewên ku qet nahêlin qencî bibe, ji hed derketî ne, dudil in."

26; "Ewê ku bi Xuda re Xudakî dîn jî çêkiriye. Vêca hûn wî bavêjin ezabê zor diþwar."

27; (Pelidê) hevalê wî got ku: "Perwerdekarê me! min bi xwe wî serkêþ nekiriye-ji rê dernexistiye, lê belê ew bi xwe ketþaþiyek dûr de."

28; (Xuda got ku:) "Hûn li cem min bi hev re xirecirê nekin. A rast min we berê bi ezab haydar kiribû."

29; "Ne gotin li cem min tê guhartin û ne jî ez li bendeyan sitemkar im."

30; Roja ku emê ji dogehê re bejin: "Ma tu tiþe bûyî?" Wê bêje ku: "Ma hê bêtir nînin?"

31; Bihiþt ji xweparêzan re hat nêzik kirin, ne dûr e.

32; Tipta hûn têne wade dayîn eva haye; ji her bendewarê parêzvan re ye.

33; Kesê bi dizî ji (Xudayê) Mihrîban tirsîyaye û bi dilek vegerkar hatiye.

34; Hûn bi xweþî têkevinê. Roja hertimî mayînê eva haye.

35; Ji wan re tiptê dilê wan bixwaze tê de heye û li cem me hê bêtir heye.  
 36; Me berî wan çiqas nifpa têkbiriye ku ew ji wana bi girtin zortir bûn, vêca ew li welata qul bi qul geriyan, lê ka ciyê revê (ji mirinê) heye.  
 37; Bêguman di vî de ji kesê dil jê re hebe yan guh bidê û ew amade be re pîret û bîrxistin heye.  
 38; Sond be, me asîmana û zemîn û tiptê di nava wan de di pêp rojan de aferandiye; û tu renc û westîn negihaye me.  
 39; Vêca tu li ser tiptê ew dibêjin hewî bike û berî derketina rojê û berî çûna ava bi pesn û sipasê perwerdekarê xwe wî pak bêrî bidêre.  
 40; Û hin ji pevê û piptî secdan jî ewî pak bêrî bidêre.  
 41; Tu guh bide roja ku wê bangvanekî ji ciyekî nêz gazî bike.  
 42; Roja ku wê qêrînê bi rastî bibihîzin. Roja derketin, eva haye.  
 43; Bêguman her em vedijînin û dimirînin; veger jî her bal me ve ye.  
 44; Roja ku wê zemîn ji wan biqeliþe, wê bilez û bez derên. Eva han civandinek hêsan e li ser me.  
 45; Em bi tiptê ew dibêjin zanatir in û tu li ser wan ne zordarî. Vêca tu kesê ji ezabê min ditirse bi Qur'anê pîret bike-bi bîr xîne.

#### Chapter 51 (Sura 51)

1; Bi (ba) yên ku bi gurrane ji hev belav dîkin.  
 2; Vêca bi (ewr)ên barê giran hildigrin.  
 3; Vêca bi (kepti)yên ku bi hêsanî diherikin.  
 4; Êdî bi (feripte) yên kara parve dîkin.  
 5; Bêguman tiptê hûn têne wade dayîn her rast e.  
 6; Û bêguman xelat û celat wê her çê bibe.  
 7; Bi asîmanê xwedî re (û sitêrk û avahiyê) rind kim.  
 8; Bêguman hûn her di gotinê tevlihev de ne.  
 9; Ê jê (ji baweriyê) hatiye liba xistin tê liba xistin.  
 10; Ewên pir derewkar bêne kuptin!  
 11; Ewên ku di korî û nezaniyê de bêhay in.  
 12; Dipirsin ku: Roja xelat û celatê kîngê ye?  
 13; Roja ku ew li ser agir têne pewitandin.  
 14; (Ji wan re tê gotin ku:) "Hûn pewata xwe tam kin" Evê hane tiptê ku we pê dilezand.  
 15; Bêguman xweparêz di bax û baxçe û kaniyan de ne.  
 16; Tiptê perwerdekarê wan daye wan digrin. Lewra bêguman ew berî vî qencîkar bûn.  
 17; Ew ji pevê hindik radizan.  
 18; Û serê sibeha ew bexþînê dixwazin.  
 19; Û di malê wan de ji gerok û bêparan re mafek heye.  
 20; Ji ên bidilbawer re di zemîn de gellek ayet (nîþan) hene.  
 21; Di we bi xwe de jî hene. Ma hêjî hûn nabînin?  
 22; Roziya we û tiptê hûn têne wade dayîn di asîmana de ye.  
 23; Vêca bi perwerdekarê asîmana û zemîn kim, ew her rast e çewa ku hûn dipeyivin.  
 24; Ma bera qiseta mêvanên Îbrahîm ên hêja ji te re hat?  
 25; Gava hatin balê, vêca gotin: "Silav (li te be)." (Îbrahîm jî) got: "Silav (li we be. Hûn) komekî nenas in."  
 26; Vêca bi dizî vegeriya bal malîyê xwe û golikî xurt (ê qelandî) anî.  
 27; Vêca wî nêzî wan kir, got: "Ma hûn naxwîn?"  
 28; Vêca di dilê xwe de ji wan tirsîya, gotinê: "Tu netirse" û mizgîna zarûkî zana danê.  
 29; Vêca pîreka wî qêrîn kir û li rûyê xwe da û got: "Pîrejinek sitewr (wê zarû bîne?)"  
 30; Gotin: "Perwerdekarê te wuha gotiye. Bêguman ew, hîkmetdarê zana her ew e."  
 31; (Îbrahîm) got ku: "Vêca xwestina we çiye gelî qasidan?"  
 32; Gotin: "Bêguman em bal komelekî gunehkar ve hatine pandin."  
 33; "Ji bo ku em kevirê ji heriyê bi ser wan de biþînin."  
 34; "Ew (kevir) li cem perwerdekarê te ji hedderketiyan re nîþankirî ne."  
 35; Vêca me bawermendên tê de deranî.  
 36; Vêca me tê de ji malekî musulmanan pêve peyda nekir.

37; Me tê de ji ên ku ji ezabê bi jan ditirsin re ayetek (nîpanek) hipt.  
 38; Di Mûsa de jî dema me wî bi delîlekî xuya pand bal Fîr'ewn (nîpanek heye).  
 39; Vêca wî bi hevalên xwe re rû liba xist û got ku: "Yan efsûnger e yan jî din e."  
 40; Vêca me wî û lepkerê wî girt, êdî me wan avêt deryayê û ewî bi gunehkarî li xwe loma dikir.  
 41; Û di (komela) Ad de jî, dema me bayekî kokbirr bi ser wan de pand (nîpanek heye).  
 42; Her tiptê bi ser de hat, wî nehipt, wî kir wek giyayê hişkê hûrbûyî.  
 43; Di (komela) Semûd de jî, dema ji wan re hat gotin ku: "Hûn heya demekî bi xweþî bijîn."  
 44; Vêca wan ji fermana perwerdekarê xwe serkêþî kir, êdî qêrînek bêhiþker wan girt û wan jî dinihart.  
 45; Êdî wan nedikaribû rabin û n jî hatin yarî kirin.  
 46; Û berê jî komela Nûh (me fetisand). Bêguman ew komelekî ji rêya rast derketî bûn.  
 47; Me asîman bi desta (bihêz) ava kiriye û bêguman em wî hey fireh dikin.  
 48; Me zemîn jî raxistiye. Vêca ên raxistine çî rind in!  
 49; Me ji her tiptî du cota aferandiye. Hêvî heye ku hûn bifikirin-þîret bigrin.  
 50; Vêca hûn her bal Xuda ve birevin. Bêguman ez, ji we re jê hiþyarkerekî xuya me.  
 51; Hûn bi Xuda re Xudakî din çê nekin. Bêguman ez, ji we re jê hiþyarkerekî xuya me.  
 52; Her pêxemberê ji ên berî wan re jî ku dihat her wuha digotin ku: "Yan, efsûnger e yan jî dîn e."  
 53; Ma qey wan pê li hev û din þîret kiriye? Ne, ew komelekî serkêþ in.  
 54; Vêca tu ji wan rû bizivrine. Êdî tu nayê lome kirin.  
 55; Û tu bi bîr xîne. Vêca bêguman bîrxistin bi kêra bawermendan tê.  
 56; Min cinn û mirova hey ji bo min bihebînin aferandiye.  
 57; Ez, ne tu rozî ji wan dixwazim û ne jî dixwazim ku ew xwarin bidin min.  
 58; Lewra bêguman Xuda, rozîdanê xwediyê hêza zexm her ew e.  
 59; Vêca bêguman ji ên sitemkarî kirine re hin guneh wekî gunehê hevalên wan hene; êdî bira ew nelezînin.  
 60; Vêca xulî li serê ên kafir bûne be, ji roja wan ê ku têne wade dayîn.

## Chapter 52 (Sura 52)

1; Bi çiyayê Tûrê  
 2; Û kitêba rêz bi rêz nivsandî.  
 3; Di pelê raxistî de.  
 4; Û mala avakirî.  
 5; Û banê bilindkirî.  
 6; Û deryaya bi agir tijîkirî.  
 7; Bêguman ezabê perwerdekarê te wê hey were.  
 8; Tu kes nikare nehêle.  
 9; Roja ku asîman bi hejek zor dizivire.  
 10; Û çiya bi meþek dijwar diçe.  
 11; Edî wêrojê xulî li serê ên diderewînin be.  
 12; Ewên ku di (qeqmeriyan) de noq bûne dileyizin.  
 13; Roja ku bal agirê dogehê ve bi zorê têne qewirandin.  
 14; (Ji wan re tê gotin ku:) "Agirê ku we wî diderewand evê haye."  
 15; Vêca ma evê han efsûn e yan hûn nabînin?"  
 16; "Hûn têkevinê-bîþewitin. Êdî we divê hewî binin yan hewî neynin, ji we re yek e. Lewra bêguman hûn tenê bi tiptê we dikir têne celat kirin."  
 17; Bêguman xweþarêz di bihipt û xweþiyan de ne.  
 18; Ew bi tiptê perwerdekarê wan daye wan dilþa ne. Perwerdekarê wan, wan ji ezabê dogehê parastiye.  
 19; (Ji wan re tê gotin ku:) "Hûn ji ber tiptê we kiriye di noþîcanî bixwin û vexwin."  
 20; Ew li ser textê rêz bi rêz kirî paldayî ne. Me wan bi horiyê çavbelek re kiriye cot-zewicandiye.  
 21; Ewên bawerî anîne û nivþa wan bi bawerî dane pey wan, me nivþa wan bi wan

gihandiye. Me tu tipt ji kirinê wan ji wan re kên nekiriye. Her kes bi keda xwe gerew e.

22; Û me, ji tiptê dilê wan diçê pirr fêkî û gopt da wan.

23; Ew tê de kasikê meyê dirêjî hevûdin dikin ku tê de ne serxweþî heye û ne jî guneh.

24; Ji wan re hin zarû (xulam) hene ku li ber (destê) wan digerin, ew her wekî moriyê parastî ne.

25; Hin ji wan li hina zivirîn ji hevdû pirsîn.

26; Gotin ku: "Bêguman em berê di nav malîyên xwe de dilbitirs-dilovîn bûn."

27; "Vêca Xuda bi me qencî kir û me ji ezabê dogehê parast."

28; "Bêguman me berê jî wî diheband. Bêguman ew, qencê dilovan her ew e."

29; Vêca tu bi bîr xîne-þîreta bike; êdî tu bi qenciya perwerdekarê xwe ne penhango yî û ne jî dîn î.

30; Yan qey ew dibêjin ku: "Ew pair e (helbestvan e). Em li bendê ne êpa mirinê pê de were."

31; Tu bêje ku: "Hûn li bendê bin. Vêca bêguman ez jî bi we re ji bendewaran im."

32; Yan qey hiþê wan ên çewt bi vî fermana wan dike yan ew komelekî serkêþ in?

33; Yan ew dibêjin ku; "Wî (Qur'anê) ji ber xwe ve gotiye?" Ne, ew bawerî nayinin.

34; Eger ew bera rastgo ne vêca ka bira ew peyvekî wekî wê bînin.

35; Yan ew, ne ji tiptekî hatine aferandinê yan ew bi xwe aferandekar in?

36; Yan qey wan asîmana û zemîn aferandiye? Ne, ew ji dil pê bawerî nayinin.

37; Yan qey xezîne perwerdekarê te li cem wan in? Yan ew xwedanê serdest in?

38; Yan qey ji wan re pêplûk hene ku pê (bilind dibin) gohdarî dikin? Vêca bira gohdarê wan delîlek xuya bîne.

39; Yan qey jê re keç û ji we re kur hene?

40; Yan qey tu destmizekî ji wan dixwazî, vêca ku ew ji deyndariyê bargiran bûne?

41; Yan qey (zanîna) penhanî li cem wan e vêca ew dinivsînin?

42; Yan ew dixwazin xax û dafekî bikin? Vêca ên kafir bûne her ew bi xax û daf in.

43; Yan qey ji wan re bêyî Xuda Xudakî (dim) heye? Xuda ji tiptê ew dikin þîrîk pak bêrî ye.

44; Eger ew bibînin ku ji asîman perçekî dikeve wê bêjin ku: "Ew ewrekî li ser hev dewisandî ye."

45; Vêca tu dev ji wan berde heya ew rastî roja xwe ya ku ew tê de behîþ bikevin-bimirin, tên.

46; Roja ku ne xax û dafê wan bi tiptî bikêra wan tê û ne jî ew têne yarî kirin.

47; Û bêguman ji ên sitemkarî kirine re berî vê (rojê) ezabek heye lê belê pirrî wan nizanin.

48; Tu ji hukmê perwerdekarê xwe re hewî bike. Êdî bêguman tu li ber çavê me yî, û tu dema rabû yî bi pesn û sipasê perwerdekarê xwe wî (ji her kêmasiyî) pak bêrî bidêre.

49; Û hinek ji pevê û piptî çûna sitêrkan wî pak bêrî bidêre-limej ke.

## Chapter 53 (Sura 53)

1; Bi sitêrka (Perwînê) dema hinda dibe.

2; Hevalê we (pêxember) ne ji rêya rast þap bûye û ne jî þiqitiye.

3; Ew ji hewesa jî napeyive.

4; Ew (Qur'an) her wehyek e ku tê wehî kirin.

5; (Cebraîl) ê zor bi hêz pê daye hîn kirin.

6; Ku xwediyê hêzek rind e. Vêca rast bû.

7; Ew jî li asoyê jorîn bû.

8; Papê nêz bû, vêca xwe berda jêr.

9; Vêca bû biqasî du kevana yan hê nêztir.

10; Vêca tiptê bal bendeyê wî ve wehî kir, wehî kir.

11; Dil, tiptê dît derew nekir.

12; Vêca ma hûn hêjî li ser tiptê ditiye pê re xirecirê dikin?

13; Sond be wî carekî din jî dît.

14; Li nik dara papîn (Sîdretul munteha).

15; Bihipta hewyegehê li balê ye.

16; Dema darê tiptê rapeçand, rapeçand.

17; Çav ne çewt çû û ne jî biqîtî.  
 18; Sond be wî ji ayetê (nîbanê) perwerdekarê xwe yên herî mezin dît.  
 19; Vêca ma te (pûtên bi nav) Lat û Uzza dît?  
 20; Û ê din yê sisiyan Menat jî (te dît?).  
 21; Ma e nêr ji we re û ê mê jî ji me re ne?  
 22; Ew gav, eva parvekirineke kêr e-ne di cîh de ye.  
 23; Evên han tenê hin nav in ku we û bav û kalên we li wan kiriye. Xuda, tu delîlî pê danexistiye. Ew hey didin pey gumanê û tiptê dilên wan dixwaze. Sond be, ji wan re ji perwerdekarê wan rêya rast hat.  
 24; Ma qey ji mirov re her tiptê bixwaze heye?  
 25; Vêca a papîn (axret) û a pêpîn (dunya) her ê Xuda ne.  
 26; Di asîmana de çiqas feripte hene ku mehdervaniya wan bikêra tu tiptê nayê ji pêptirî piptî e ku Xuda bixwaze û pê qayil bibe re destûr bide.  
 27; Bêguman ên ku bi axretê bawerî naynin ew feripteyan bi navê mêyan nav dîkin.  
 28; Tu zanîna wan pê nîne. Ew hey didin pey gumanê. Guman jî bi tu awayî ciyê rastiyê nagire.  
 29; Êdî tu ji ê ku pipt daye zikrê (bîretê) me û ji jîna dinê pêve nexwestiya rû bizivrine.  
 30; Ciyê gihîptina wan ji zanînê evê haye. Bêguman perwerdekarê te, ê ku ji rêya wî pap bûye pap dizane û ê ku rêya rast dîtîye jî pap dizane.  
 31; Tiptê di asîmana û tiptê di zemîn de ê Xuda ne; ji bo ku ew ên karê xerab dîkin celat bike û ên qencî kirine jî bi a herî qenc xelat bike.  
 32; Ewên ku ji gunehên biçûk pêve xwe ji gunehên mezin û nepakiyan dûr dîkin. Bêguman perwerdekarê te fireh bexpîne. Ew, dema we ji zemîn çêtir û dema hûn di zikê dayîkên xwe de zarûk bûn, bi we zanatir e. Vêca hûn xwe bi xwe dernexin paqijiyê. Ew, bi ê xwe parastîye zanatir e.  
 33; Vêca ma te ê rû liba xist dît?  
 34; Û hindikî da û birrî.  
 35; Ma qey zanîna penhanî li balê ye vêca ew dibîne?  
 36; Ma qey ew bi tiptê di rûpelê (kitêba) Mûsa de, nehatiye haydar kirin.  
 37; Û Îbrahîmê ku (karê xwe) bêkêmasî pêk anî.  
 38; Tu gunehkar barê gunehê yekî din hilnagire.  
 39; Û ji mirov re ji tiptê xebitiye pêve nîne.  
 40; Û bêguman wê xebata xwe piptre bibîne.  
 41; Papê wê (Xuda) bergîdanek bêkêmasî bidêyê.  
 42; Û bêguman dawî her bal perwerdekarê te ve diqede.  
 43; Û bêguman her ew dikenîne û digirîne.  
 44; Û bêguman her ew dimirîne û vedijîne.  
 45; Û bêguman her wî du cotê nêr û mê aferandiye.  
 46; Ji dilopek avik, dema tê avêtin.  
 47; Û bêguman aferandîna papîn jî her li ser wî ye.  
 48; Û bêguman her ew dewlemend dike û bi tiptê daye qayil dike.  
 49; Û bêguman perwerdekarê (sitêrka bi nav) Pi'ra jî her ew e.  
 50; Û bêguman her wî (komela) Adê pêpîn têk bir.  
 51; Û (komela) Semûd jî; êdî ew neman.  
 52; Û berê jî komela Nûh. Lewra bêguman ew sitemkartir û serkêptir bûn.  
 53; Û (bajarê komela Lût ên bi navê) Mutefîke jî serûbin kir.  
 54; Vêca tiptê wan rapêçand li wan kir.  
 55; Êdî tu bi kîjan qenciyê perwerdekarê xwe dudilî dibî?  
 56; Evê han hiþyarkerekî ji hiþyarkerên pêpîn e.  
 57; (Qiyamet)a nêzik nêz bûye.  
 58; Ji Xuda pêve tu kes nikare wê diyar bike.  
 59; Vêca ma hûn ji vê peyva han sosret dibîn?  
 60; Û hûn dikenin û hûn nagirîn?  
 61; Û hûn hêjî bi qeþmerti rû liba dixin?  
 62; Êdî hûn ji Xuda re serî deynin û hûn (wî) bihebînin.

#### Chapter 54 (Sura 54)

1; Danê qiyametê nêz bûye û hîv du bûye.

2; Eger ew ayetek (nîpanek) bibînin, rû liba dixin û dibêjin ku: "Efsûneke diçe-namîne."

3; Wan derewand û dane pey dilxwaziyên xwe. Her kar ciyê xwe digre.

4; Sond be, tê de ji bû yerên (pêpiyan) tiptê ji wan re bibe pîret (û dawî li nebaþiyan bîne) hatiye.

5; Hikmetek ragihîptî ye. Lê hiþyarker bikêr nehatin.

6; Êdî tu rû ji wan bizivrine. Roja bangvan gazî bal tiptekî pirr tirsnaq ve bike.

7; Çav tirsîyayî ji goran dertên, ew herwekî kuliyên belawelabûyî ne.

8; Bal bangvan ve stûdirêjkirî dibezin; kafir dibêjin ku: "Eva rojekî pirr zor e."

9; Berî wan komela nûh derewand. wan bendeyê me derewand û gotin ku: "Dînek e" û ew hate qewirandin.

10; Vêca gazî perwerdekarê xwe kir ku: "Bêguman ez binketî me, êdî yarî bike."

11; Êdî me deriyê asîman bi avek gujane vekir.

12; Û me zemîn bi kaniyan dapîþiqandderkir; vêca av li ser karekî ku bera hatibû qedandin gihîpt hev.

13; Û me wî li ser (keþtiyek) xwey texte û bismar hilgirt.

14; Ew (keþtî) li ber çavê me diherike. Xelatek e ji bo ê ku hatiye înkâr kirin.

15; Sond be, me wê, ayetek (îbrettek) hiþt. Vêca gelo kesê pîret- îbret bigre heye?

16; Vêca ka ezabê min û hiþyarkerên min çewa bû?

17; Sond be, me Qur'anê ji bo xwendin û pîret girtinê hêsan kir, vêca ma gelo ê pîret bigre heye?

18; (Komela) Ad jî derewand. Vêca ezabê min û hiþyarkerên min çewa bûn?"

19; Bêguman me di roja hertimî bi peþk de bahozek zor dijwar bi ser wan de þand.

20; Ew mirovan ji cîh radike; ew bûn wekî qurme darê xurmê yên ji kokê rabûyî.

21; Vêca ezabê min û hiþyarkerên min çewa bûn?

22; Sond be, me Qur'anê ji bo xwendin û pîret gitinê hêsan kir, vêca ma gelo ê pîret bigre heye?

23; (Komela) Semûd jî hiþyarkeran derewand.

24; Vêca gotin: "Ma emê bidin pey mirovekî ji xwe? Bêguman em, ew gav di þapîtî û dînîtiyê de ne."

25; "Ma ji nava me zikir (wehî û pîret) ji wî re hatiye dayîn? Ne, ew derewkarekî qure ye."

26; Wê sibê bizanbin ka kî derewkarê qure ye.

27; Bêguman em, devê ji bo sihêtiya wan diþînin; vêca tu li benda wan be û bîhna fireh nîþan de.

28; Û tu wan haydar bike ku bêguman av di nav wan de parvekirî ye. Her kes li ber dora xwe ya avê amade dibe.

29; Vêca gazî hevalê xwe kirin; wî jî kêrê hilanî û wê serjêkir.

30; Vêca ezabê min û hiþyarkerên min çewa bûn?

31; Bêguman me yek qêrînek bi ser wan de þand; êdî ew bûn wek giyyayê hiþkê hûrbûyî.

32; Sond be, me Qur'anê ji bo xwendin û pîretgirtinê hêsan kir, vêca ma gelo ê pîret bigre heye?

33; Komela Lût jî hiþyarkeran derewand.

34; Bêguman me bayekî bi xulî û xîçik bi ser wan de þand ji pêþtirê malbata Lût. Me wan serê sibê rizgar kir.

35; Qenciyeke e ji cem me. Em, ê sipas dîkin wuha xelat dîkin.

36; Sond be, (Lût) wan bi zor girtina me hiþyar kir, lê wan bi hiþyarkeran re xirecirê kir.

37; Sond be, wan dest avêt mêvanên wî, êdî me çavên wan hilo kor kir (û me gote wan ku:) "Hûn ezabê min û hiþyariyên min tam kin."

38; Sond be, serê sibê zû ezabek biryardayî bi wan de hat.

39; Vêca hûn ezabê min û hiþyariyên min tam kin.

40; Sond be, me Qur'anê ji bo xwendin û pîretgirtinê hêsan kir, vêca ma gelo ê pîret bigre heye?

41; Sond be, ji malbata Fîr'awn re jî hiþyarker hatin.

42; Wan hemû ayet (nîþan)ên me derewand. Vêca me wan bi girtina serkeftiyê hêzdar girt.

43; Ma kafirên we ji wanê han çêtir in? Yan ji wan re bêribûnek di kitêbên pêþîn de heye?



44; Yan ew dibêjin ku: "Em tev yek in heyfsitan in."  
 45; wê kom belav bibe û wê pipt bidinê birevin herin.  
 46; Ne, danê qiyametê wadegeha wan e û ew dan tirsnahtir û taltir e.  
 47; Bêguman sûcdarên gunehkar di paþitî û dînîtikî har de ne.  
 48; Roja ku wê li ser dev û rû di agir de bêne kîþandin (û wê bê gotin ku:) "Hûn girtina dogehê tam kin."  
 49; Bêguman me her tiptî bi pîvan aferandiye.  
 50; Ferma me, her yek e wekî çavniqandineki e.  
 51; Sond be, me gelek hemtayên we tøk biriye, vêca gelo þîretgîrek heye?  
 52; Her tiptê wan kiriye di kitêban de ye.  
 53; Her (kirinê) biçûk û mezin rêz bi rêz nivsandî ye.  
 54; Bêguman xweparêz di bihipt û çeman de ne.  
 55; Li nik (Xudayê) serdestê hêzdar di civata rastiyê de ne.

#### Chapter 55 (Sura 55)

1; Mîhrîban.  
 2; Da hînkirinê Qur'an.  
 3; Aferandiye mirovan.  
 4; Pê eliman peyv-daxuyan.  
 5; Roj û hîv in bi pîvan.  
 6; Serî datînin giyah û daran.  
 7; Rakir wî asîman û danî mîzan (mêzîn-terazî).  
 8; Da ku hûn serkêþî nekin di mêzînan.  
 9; Û hûn kêþanê bi dadî rakin û kêr nekin mêzînan.  
 10; Zemîn jî wî daniye ji mirovan (hemû candar û mexlûqan re).  
 11; Tê de hene fêkî û darê xurma yên goþidar.  
 12; Û teneyên bi ka û pel û gulê bi bîhn (rihan).  
 13; Nexwe hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 14; Wî mirov ji herîkî (hiþk) wekî qafik aferandiye.  
 15; Û cinna jî ji agirek bêdû aferandiye.  
 16; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 17; Perwerdekarê herdû rojhelat û perwerdekarê herdû rojavaya ye.  
 18; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 19; Herdû deryayan berda ku digihên hev.  
 20; Di navbera wan de perdeki heye ku tevlihev nabin.  
 21; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 22; Ji wan morî û mircan dertên.  
 23; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 24; Keþtiyên bilindê wekî çiyayan ku di deryayan de diherikin jî ên wî ne.  
 25; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 26; Her kesê li ser rûyê zemîn e, namîne.  
 27; Tenê rûyê perwerdekarê te yê xwey meznahî û rûmet dimîne.  
 28; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 29; Ên di asîmana û zemîn de her ji wî dixwazin. Her roj ew di karekî de ye.  
 30; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 31; Emê ji we re - gelî giraniyê (zemîn cinn û mirov!) - vala bibin.  
 32; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 33; Gelî koma cinn û mirova! eger hûn dikarin ku ji çarmedorê asîmana û zemîn derên, êdî hûn derkevin. Lê hûn tenê bi hêzek xurt dikarin derkevin.  
 34; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 35; Wê alav û dûyê ji agir bi ser we de bê þandin; êdî hûn nikarin yariya havûdin jî bikin.  
 36; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 37; Vêca gava asîman qeliþî, êdî wek donê rengin (kesk û sor û ser) rengsorî bû (wekî hespê kumeyt ku reng bi reng dibe).  
 38; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 39; Êdî wê rojê ne mirov û ne jî cinn ji gunehê xwe nayê pirsîn.  
 40; Êdî hûn kîjan qenciyê perwerdekarê xwe diderewînin?  
 41; Sûcdarên gunehkar bi sikûmên xwe tèn nasîn vêca bi pocax û piyan tê girtin.

42; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 43; Dojeha ku sûcdarên gunehkar wê diderewînîn eva haye.  
 44; Ew di navbera wê û ava pirr kelandî de diçin û tîn.  
 45; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 46; Ji kesê ku ji pûna (meqamê) perwerdekarê xwe bitirse re du bihipt hene.  
 47; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 48; Ew herdû (bihipt) xwedan cuqliyê rengîn in.  
 49; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 50; Di wan de du kanî diherikin.  
 51; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 52; Di wan de ji her fêkiyî du cot hene.  
 53; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 54; Ew li ser dopekên ku betanê wan ji hevriþimê qalind paldayî ne, û çinîna (fêkiyê) bihipta li ber desta ye.  
 55; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 56; Di wan de (jinên) tenê li mêrên xwe dinêrin hene ku berî wan ne tu mirov û ne tu cinn têkilî wan nebûne.  
 57; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 58; Ew (jin) her wekî yaqût û mircanan e.  
 59; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 60; Ma bergîdana qencyê ji qencyê pêve heye?  
 61; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 62; Ji wan (du bihipta) wêdetir du bihiptê din jî hene.  
 63; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 64; Herdû jî çîlhêþîn in.  
 65; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 66; Di wan de du kanî tim dizên hene.  
 67; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 68; Di wan de fêkî û darê xurma û hinar hene.  
 69; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 70; Di wan de jinên xuy xweþ û rû xweþik hene.  
 71; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 72; Jinên çavbelek ên ku di konan de parastî ne.  
 73; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 74; Berî wan ne tu mirov û ne jî tu cinn têkilî wan nebûne.  
 75; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 76; Li ser xaliyên kesk û tejikên rind paldayî ne.  
 77; Êdî hûn kîjan qencyê perwerdekarê xwe diderewînîn?  
 78; Pirr pîroz e navê perwerdekarê te yê xwey meznahî û rûmet!

#### Chapter 56 (Sura 56)

1; Gava (qiyamet)a rastîn çêbibe.  
 2; Ji çêbûna wê re tu derew nîne.  
 3; (Ji hina re) nizimker (û ji hina re jî) bilindker e.  
 4; Gava zemîn bi hejek zor bê hejandin.  
 5; Û çiya hûr hûr bibin.  
 6; Êdî bibin xulîkî berbayî.  
 7; Û hûn bibin sê deste.  
 8; Hevalê destê restê, çi heval in ên destê çepê!  
 9; Û hevalê destê çepê çi heval in ên destê çepê!  
 10; Ên pêþketî pêþketî ne.  
 11; Ên nêzbûyî evên han in.  
 12; Di bihiptê xweþiyan de ne.  
 13; Komekî pirr ji pêþiyan.  
 14; Û hinekî jî ji paþiyan.  
 15; Li ser sedrê neqbandî ne.  
 16; Li ser wan li hember hev rûniptî ne.  
 17; Li dora wan hin nûciwanên bêmirin digerin;  
 18; Bi tas û misîn û perþikên ji serkaniyan (tîjebûyî)

19; Ji wê (meyê) ne sergêj dibin û ne serxweş dibin.  
20; Û fêkiyên ku ji xwe re hildibjêrin.  
21; Û goptê çûka ku dilê wan diçê.  
22; Û jinên çavbelek (ji wan re ne).  
23; Ku ew wekî moriyê parastî ne.  
24; Bergîdana tiptê (li dinê) kirine.  
25; Tê de, ne tiptê beredayî dibihîzin û jî gunehkariya.  
26; Ji pêptirê gotina: "Silav Silav."  
27; Hevalê destê rastê çi heval in ên destê rastê!  
28; Di nav (darê) gelyaza yên cuqlîtewandiyê bêdirrî de ne.  
29; Û (darê) mûzê yên li ser hev hûnandî de ne.  
30; Û li binê siyê dirêjbûyî ne.  
31; Û di avê herikandî de ne.  
32; Û di nav gellek fêkiyan de ne.  
33; Ne tîr birrîn û ne jî qedexa kirin.  
34; Û di nav jinên bilindhêja de ne.  
35; Bêguman me wan (jinan) hê jî nû ve çekiriye.  
36; Vêca me wan kiriye keçên xama.  
37; Evîndarên hemsal in.  
38; Ji bo hevalê destê rastê ne.  
39; Komekî pirr ji pêpiyan.  
40; Û komekî jî ji paþiyan.  
41; Hevalê destê çepê çi heval in ên destê çepê!  
42; Di nav germa agir û ava kelandî de ne.  
43; Û siyî ji dûyê reþ de ne.  
44; Ne hênik e û ne rind e.  
45; Bêguman ew berî vî qeþmer bûn.  
46; Û wan hey li ser gunehê mezin (kufr û pûtperestiyê) didomand.  
47; Û wan digot ku: "Ma gava em bimirin û bibin xulî û hestî ma emê bera bêne rakirin?"  
48; "Û bav û kalên me yên pêþîn jî?"  
49; Tu bêje ku: "Bêguman pêþînî û paþînî tev."  
50; "Danê roja xuya wê her bêne civandin."  
51; Paþê hûn gelî rêþapên derewkar!  
52; Hûnê jî dara kerratiyê jî hey bixwin.  
53; Vêca hûnê zika jê tiþe kin.  
54; Êdî hûnê di ser re jî ava kelandî vexwin.  
55; Vêca hûnê wek vexwarina devên nexweþ ên hergav tî (yan axa ku ji avê têr nabe) wexwin.  
56; Roja xelat û celatê rozî û xwarina wan evê han e.  
57; Me we aferandiye, vêca çima hûn rast nadêrin?  
58; Vêca ma hûn tiptê (avika) davêjin dibînin?  
59; Ma hûn we diaferînin yan em aferandekar in?  
60; Me mirîne di navbera we de (bi pîvan) parve kiriye û bi pêþiya me nayê ketin;  
61; Ku em we bi hinekî wekî we biguherînin û em we di tiptê hûn nizanin de çekin.  
62; Sond be we aferandina pêþîn zaniye, vêca çima hûn nafikirin-þîret nagirin?  
63; Vêca ma hûn tiptê dajon (çandiniyê xwe) dibînin?  
64; Ma hûn wî dajon-çot dikin yan em cotkar in?  
65; Eger me bixwesta, me yê wî bikirna ka-bêtene vêca hûnê sosret bimana.  
66; (We yê bigotana:) "Bêguman em, çandiniyê me çû-deyndar man."  
67; "Ne, ji xwe em bêpar in."  
68; Vêca ma hûn ava ku vedixwin dibînin?  
69; Ma we wê jî ewra barandiye yan em dibarînin?  
70; Eger me bixwesta me yê wê (avê) tal bikirna, êdî ma çima hûn sipas nakin?  
71; Vêca ma hûn agirê ku dertînin-pêdixin dibînin?  
72; Ma we dara wî (agirî) çekir yan em çedikin?..  
73; Me wî (agirî) kiriye bîrxistinî û xweþikî ji bo rêwiyan (û hewcedaran) re.  
74; Êdî tu navê perwerdekarê xwe yê mezin pak bêrî bidêre.  
75; Vêca ne, ez sond dixwim bi þûnê sitêrkan (ku di wan deran de diweþin-dikevin).

76; Û bêguman ew (sond) sondekî mezin e-eger hûn bizanbin-.  
 77; Bêguman ew Qur'anekî birûmet e.  
 78; Di kitêbekî parastî de ye.  
 79; Ji ên paqijkirî pêve têkilî wê nabin.  
 80; Daxistinekî hin bi hin ji perwerdekarê hemû cîhana ye.  
 81; Vêca ma hûn vê peyva han biçûk dibînin-diderewînin?  
 82; Û hûn sipasê roziya xwe dikin ku hûn bera diderewînin?  
 83; Vêca ma çima gava (can) digihîje qirikê (hûn nikarin tiptekî pê bikin?).  
 84; Û hûn wê gav hey dinêrin.  
 85; Û em ji we pê nêziktir in, lê belê hûn nabînin.  
 86; Vêca eger hûn ji dil bawer nakin (ku hûnê werin celat kirinê);  
 87; Eger hûn bera rastgon e çima hûn wî (canî) venagerînin?  
 88; Vêca heçî eger ew ji ên nêzbûyî be;  
 89; Êdî dîlxwepî û gulê xwepbîhn (rihan) û bihipta xwepiyan (jê re ye).  
 90; Û heçî eger ew ji hevalê destê rastê be;  
 91; Êdî ji hevalê destê rastê xwepî ji te re be.  
 92; Û heçî eger ew ji derewkarên rêbap be;  
 93; Êdî rozî û xwarinên ji ava kelandî (jê re ne).  
 94; Û emê wî têxin dogehê-wî bipewitînin.  
 95; Bêguman rastiya herî rast eva haye.  
 96; Êdî tu navê perwerdekarê xwe yê mezin pak bêrî bidêre.

#### Chapter 57 (Sura 57)

1; Hemû tiptê di asîmanan û zemîn de, Xuda (ji kêmasiyan) pak bêrî dêrandine.  
 Serkeftiyê hîkmetdar her ew e.  
 2; Mulkê asîmanan û zemîn her ê wî ye. Veditîne û dimirîne. Ew bi her tiptî dikare.  
 3; Ê pêpîn û ê papîn û ê xuya û ê veparî her ew e. Ew zanayê bi her tiptî ye.  
 4; Ew e ê ku asîmanan û zemîn di pê rojan de aferandiye papê ser text vegirtiye.  
 Ew, tiptêdi zemîn de diçe û tiptê jê dertê û tiptê ji asîman dadikeve û tiptê tê bilind dibe dizane. Hûn li kuder bin ew bi we re ye. Xûda, tiptê hûn dikin bap dibîne.  
 5; Mulkê asîmanan û zemîn her ê wî ye. Hemû kar her bal Xuda ve vedigerin.  
 6; Ew, pevê di rojê radike û rojê ji di pevê radike. Ew, zanayê bi vepariyê di singan de ye.  
 7; Hûn bi Xuda û pêxemberê wîbawerî bînin û ji tiptê ku (Xuda) we kiriye canîpînên wî bidin. Vêca ên ji we bawerî anîne û (mal) dane, ji wan re xelatek mezin heye.  
 8; Ma çî bûye ji we ku hûn bi Xuda bawerî naynin, tevî ku pêxember gazî we dike ji bo hûn bi perwerdekarê xwe bawerî bînin û bi rastî eger hûn bera bawermend in ji we peymanekî zexm jî girtiye?  
 9; Ew e ê ku ayetn diyar li ser bendeyê xwe dadixe ji bo ku we ji tarîtiyan derxîne bal ronahiyê ve. Bêguman Xuda, bi we dilovîne dilovan e.  
 10; Ma çî bûye ji we ku hûn di rêya Xuda de (mal) nadin, tevî ku mîrata asîmanan û zemîn tev a Xuda ye? Ên ji we ku berî vegirtin (a Mekke mal) dane û per kirine (bi ên din re) nabin yek. Ewên han, ji ên ku papê dane û per kirine paye mezintir in. Xuda, a herî qenc ji tevan re jî wade daye. Xuda, bi tiptê hûn dikin kûrzana ye.  
 11; Kî ye ku deynekî rind bi deyndarî dide Xuda? Vêca wê hey jê re pirrî pirr bike, û jê re xelatekî birûmet jî heye.  
 12; Roja tu, mîrên bawermend û jinên bawermend dibîni ku ronahiya wan li pêpiya wan û li rastê wan dimeşe. Îro mizgîn ji we re hin bihipt in ku çem ji binê wan diherikin, ew hertimî tê de ne. Rizgariya mezin her eva haye.  
 13; Roja ku mîrên durû û jinên durû, ji ên bawerî anîne re dibêjin: "Hûn li me binêrin ku em ji ronahiya we bigrin." Ji wan re tê gotin ku: "Hûn li paþiya xwe vegerin vêca li ronahiyê bigerin." Êdî di navbera wan de bendekî hat danîn ku jê re derîkî heye. Hundiye wî tê de dilovanî û dervayê wî ji ber ve ezab heye.  
 14; Gazî wan dikin ku: "Ma em jî ne bi we re bûn?" Gotin: "Belê çewa (hûn bi me re bûn) lê belê xwe gunehkar kir û hûn li benda (neþapiyan) bûn û we dudilî kir û dîlxwaziyan we xapand; heya ku fermana xuda xapand."  
 15; Êdî îro, ne ji we û ne ji ên ku bûne kafir tu gerew nayê sitendin. Hewyegeha we agir e. Ew ji we re çêtir e. Çi pûnve gerek ne rind e!

16; Ma qey ji ên bawerî anîne re dem nehatiye ku dilên wan ji ber bîranîna Xuda û rastiya ku daxistiye, bitirsin; û bira ew nebin wekî ên ku berê kitêb ji wan re hatiye dayîn; vêca demek dirêj di ser wan re borî êdî dilên wan hişk bû. Pirrî ji wan jî ji rêya rsat derketî ne.

17; Hûn baþ bizanbin ku Xuda, zemîn pirþî mirina wê vedijîne. Bi rastî me ayeten ji we re daxuyandiye hêvî heye ku hûn tê hiþ bibin-xwe rabigrin.

18; Bêguman mêrên sedeqe didin û jinên sedeqe dinin û bi dennekîrind deyndarî didin Xuda, ji wan re pirrî pirr tê kirin û ji wan re xelatekî birûmet heye.

19; Ên bi Xuda û pêxemberê wî bawerî anîne, li cem perwerdekarê wan, ên pirr rastgo û þehîd her ewênhan in. xelata wan û ronahiya wan ji wan re ye. Ên kafir bûne û ayetên me derewandine, ehlê dogehê her ewênhan in.

20; Hûn baþ bizanbin ku jîna dinê leystik û hewes û xemil-xwe-þîkî û pesn û quretiya we ya di nava we de û pirr xebata di mal û zarûkan de ye; wekî barana ku giyayê wê kafiran dike sosretê, papê hiþk dibe vêca tu wî dibînî ku zer bûye, papê dibe qirþîkê hûrik. Di axretê de jî ezabekî dilwar û bexþin û qayilbûna ji Xuda heye. Jîna dinê, tenê pertalê xapandinê ye.

21; Hûn, bal bexþinek ji perwerdekarê xwe û bihiþtekî ku firehiya wê wek firehiya asîmana û zemîn e ku ji ên bi Xuda û pêxemberên wî bawerî anîne re hatiye amade kirin, ve bazdin. Evê han qenciya Xuda ye dide kesê ku ew bixwaze. Xuda, xwey gencyek mezin e.

22; Her musîbeta di zemîn de û di we bi xwe de .êbibe ew, berî em wê biaferînin her di kitêbekî de (nivsandî) ye. Bêguman evê han li ser Xuda pirr hêsan e.

23; Ji bo ku hûn li ser tiptê ji destê we diçe xemgîn nebin û hûn bi tiptê daye we pirr dilþa nebin. Xuda ji her qureyê navdixwe dide hiz nake.

24; Ewên ku timatî dikin û bi mirovan jî timatiyê ferman dikin. kî rû bizivrine, êdî bêguman bêhewceyê hêjayê pesn her Xuda ye.

25; Sond be, me pexemberên xwe bi nîþanên xuya þand û me bi wan re jî kitêb û mêzîne daxist ji bo ku mirav bi dada rastîn tevbigerin. Me hesin jî gellek kar heye daxist; ji bo ku Xuda bizanbe ka kî bi penhanî yariya wî û pêxemberê wî dike. Bêguman Xuda hêzdar e serkeftî ye.

26; Sond be, me Nûh û Îbrahîm þand û me pêxemberî û kitêbê di nav nifþa wan de çêkir; êdî hina ji wan rêya rast dît û pirrî wan jî ji rêya rast derketine.

27; Papê me pêxemberên xwe li ser þopa wan þand û me Îsa kurê Meryemê jî li ser þopa wan þand û me Încîlê jî dayê û me di dilên wanê dane pey wî de dilovînî û dilovaniyê çêkir. Wan ji ber xwe rahiptiyê (dest kîþandina ji xweþiyê dinê) çêkir ku me wê li ser wan ferz nenivisîbû. Tenê ji bo qayilbûna Xuda (wê derxistin); lê wan wê bitewayî pêk neanî. Êdî me, ewên ji wan bawerî anîn xelata wan da wan. Pirrî ji wan jî ji rêderketî ne.

28; Gelî ên bawerî anîne! hûn xwe ji Xuda biparezin-bitirsin û bi pêxemberê wî bawerî binin ku ew du para ji dilovaniya xwe bide we û ji we re ronahiyek çêke ku hûn pê bimeþin û ew (gunehên we) ji we re bibexþîne. Xuda bexþendekar e dilovan e.

29; Ji bo ku ehlê kitêbê baþ bizanbin ku ew bi tu tipt ji qenciya Xuda nikarin û bêguman qencî her bi destê Xuda ye, kî bixwaze dide wî. Xuda xwey gencyek mezin e.

## Chapter 58 (Sura 58)

1; Bi astî Xuda, gotina wê (pîreka) ku derbareê mêrê xwe de bi te re xirecirê dikir û giliyê xwe bal Xuda ve dikir bihîst. Xuda, hevpeyvîna we seh dike. Lewra bêguman Xuda baþ seh dike baþ dibîne.

2; Ji we ên ku pîrekên xwe wek diyên xwe dibînin (ji wan re dibêjin ku: "Piþta te wek ya diya min e") ew (pîrekên wan) ne diyên wan in. Diyên wan her ew in ku wan welidandine. Bêguman ew gotinê nelirê û derewa dibêjin. Bêguman Xuda, têbihûr e bexþendekar e.

3; Ewên ku jinên xwe wek diyê xwe dibînin, papê ew li gotina xwe dadigerin, êdî berî ew bigihên hev, azadkirina dilekî (divê). Hûn bi vî han tên þîret kirin. Xuda bi tiptê hûn dikin kûrzana ye.

4; Vêca ê ku peyda neke, êdî berî ew bigihên hev, du meha li pey hev rojî girtin (divê). Vêca ê ku nikarbe êdî xwarin dayîna þêst belengazî (divê). Evê han ji bo ku hûn bi Xuda û pêxemberê wî bawerî binin e. Evên han tixûbê Xuda ne. Ji kafiran re ezabekî bi jan heye.

5; Bêguman ên ku li hember Xuda û pêxemberê wî dertên ew hatin sernigûn kirin çewa ku ên berî wan hatin sernigûn kirin, tevî ku me ayetên xuya daxistiye. Ji kafiran re ezabekî nizimker heye.

6; Roja ku wê Xuda wan teva rake, vêca wê wan bi tiptê kirine haydar bike, ku Xuda wî jimartiye û wan wî ji bîr kiriye. Xuda danasê li ser her tiptî ye.

7; Ma tu nabînî ku bêguman Xuda, tiptê di asîmana û tiptê di zemîn de dizane. Sê kesê bi dizî bi hev re biaxivin ê çarê wan her ew e û pêncên (ku bi dizî bi hev re biaxivin) ê pêpê wan her ew e. Ji vî kêmtir an pirrtir; ew li kuder bin ew her bi wan re ye. Papê roja qiyametê wê wan bi tiptê kirine haydar bike. Bêguman Xuda zanayê bi her tiptî ye.

8; Ma tu li ewên ku ji dizî axivtinê hatibûn qedexe kirinê nanêrî ku ew papê li tiptê jê hatibûn qedexe kirin difetilin û ew bi gunehkarî û neyarî û bêfermaniya pêxember bi hev re bi dizî dipeyivin. Gava ew tèn bal te, ew te bi tiptê Xuda, te pê silav nekiriye silav dikin, ew di dilê xwe de dibêjin ku: "Ma çima Xuda me bi tiptê em dibêjin nade ezabê? Dojeh besî wan e. Ewê têkevinê-tê bişewiyin. Vêca ew der çî pûnvegerek nerind e!

9; Gelî ên bawerî anîne! gava we bi hev re bi dizî axivt, êdî hûn bi gunehkarî û neyarî û bêfermaniya pexember nepeyivin. Hûn bi bapî û xweparêziyê bipeyivin, û hûn ji Xudayê ku hûnê bal ve bêne civandin xwe biparêzin-bitirsin.

10; Bêguman bi dizî axivtin her ji pelîd e, ji bo ku ên bawerî anîne xemgîn bibin; bêdestûra Xuda tu ziyar nagihê wan. Vêca bawermend bira her xwe bispêrin Xuda.

11; Gelî ên bawerî anîne! gava ji we re hat gotin ku: "Hûn di civata de cîh fireh bikin" vêca hûn cîh fireh bikin ku Xuda jî ji we re fireh bike. Gava ji we re hat gotin ku: "Rabin" vêca hûn jî rabin ku Xuda, ji we ên bawerî anîne û ên zanîn ji wan re hatiye dayîn bi payeyan bilind bike. Xuda bi tiptê hûn dikin kûrzana ye.

12; Gelî ên bawerî anîne! gava hûn bi dizî bi pêxember re bipeyivin, vêca hûn berî bi dizî peyivîna xwe sedeqekî bidin. Evê han ji we re çêtir û paqijtir e. Vêca eger we peyda nekir êdî bêguman Xuda bexpendekar e dilovan e.

13; Ma qey hûn (ji xizaniyê) tirsîyan ku hûn berî bi dizî peyivîna xwe sedeqa bidin? Vêca dema we nekir û Xuda jî li we borî êdî hûn limêjê rast bikin û zekatê bidin û peyrewtiya Xuda û pêxemberê wî bikin. Xuda û pêxemberê wî bikin. Xuda bi tiptê hûn dikin kûrzana ye.

14; Ma tu li ewên ku komelekî ku Xuda li wan hêrs bûye dost girtine nanêrî? Ew ne ji we ne û ne ji wan in. Ew, tevî dizanin jî li ser derewa sond dixwin.

15; Xuda, ji wan re ezabekî zor dijwar amade kiriye. Lewra bêguman ew, tiptê dikirin pirr pîs e.

16; Wan sondên xwe ji xwe re kir mertal, vêca pêpî li rêya Xuda girtin. Êdî ji wan re ezabekî nizimker heye.

17; Li hember Xuda, ne malên wan û ne zarûyên wan bi tu tiptî bikêra wan nayên. Ewên han hevalê agir in. Ewê tê de hertimî bimînin.

18; Roja ku wê Xuda wan teva (ji gora) rake vêca çewa ji we re sond dixwin jê re jî sond dixwin û ew guman dikin ku li ser tiptekî ne. Hay jê bin! bêguman ew, derewkar her ew in.

19; Pelîd ketiye qebelê wan-bi ser wan ketiye vêca bîranîna Xuda bi wan daye ji bîr kirin. Ewên han partiya pelîd in. Hay jê bin! bêguman ên ziyankar her partiya pelîd in.

20; Bêguman ên ku li hember Xuda û pêxemberê wî dertên, ewên han di nav binketiye riswabûyî de ne.

21; Xuda ferz nivisiye ku: Ez û pêxemberên xwe emê hey bi ser kevin. Lewra bêguman Xuda hêzdar e serkeftî ye.

22; Tu, komelekî ku bi Xuda û roja dawîn bawerî tînin peyda nakî ku ew ji ên li hember Xuda û pêxemberê wî derketine hiz bikin; herçend ew bavên wan yan kûrên wan yan birayên wan yan jî ji êl û epira wan bin. Evên han Xuda, di dilên wan da bawerî nivisiye û wan bi canek (yariyek) ji xwe zeximandiye. Wê wan têxe hin bihiptên ku çem ji binê wan diherikin. Wê hertimî tê de bimînin. Xuda ji wan qayil bûye û ew ji je qayil bûne. Evên han partiya Xuda ne. Hay jê bin! bêguman ên rizgarbûyî her partiya Xuda ne.

1; Ê di asîmana û ê di zemîn de her Xuda pak bêrî dêrandine. Serkeftiyê hîkmetdar her ew e.

2; Ew e ê ku ji ehlê kitêbê ên kafir bûne ji bo civîna pêpîn wan ji warên wan deranî. We guman nedikir ku ew derên, wan jî guman dikir ku wê kelehên wan bera wan ji Xuda biparêze. Vêca Xuda ji derevekî ve hate wan ku wan qet guman nedikir û tirsê avêt dilên wan ku ew xaniyên xwe bi destê xwe û bi destê bawermendan xera dikin. Êdî hûn-gelî xwedan hişan-ders û îbret bigrin.

3; Eger Xuda bi derketinê li ser wan hukim nekirbûna wê wan di dinê de bida ezabê. Ji wan re di axretê de ezabê agir heye.

4; Evê han ji ber ku bi rastî wan neyartiya Xuda û pêxemberê wî kir. Kî neyartiya Xuda bike, êdî bêguman Xuda ezab diwar e.

5; Her darê xurma ku we birrand yan we wan li ser kurmê wan hişt êdî ew bi destûra Xuda ye; û ji bo ku ew jirêderketiyan celat bike.

6; Her tiptê Xuda (bê ceng) ji wan sitendiye daye pêxemberê xwe, êdî we li serê ne tu hesp û ne tu deve daye-hinda kiriye. Lê belê Xuda, pêxemberên xwe bi ser ê bixwaze dixê. Xuda bi her tiptî dikare.

7; Her tiptê Xuda ji ehlê welatan distîne dide pêxember xwe, êdî ew ji Xuda û ji pêxember û ji merivên nêz (malbata pêxember) û sêwî û belengaz û rêwiyên li rê mane re ye; ji bo ku ew (mal) tenê di nava dewlemendên wede, nebe (sermiyanekî dest bi dest dibe). Tiptê pêxember da we êdî hûn wî bigrin û tiptê we jê dûr kir jî êdî hûn jê dûr bimînin. Hûn xwe ji Xuda biparêzin. Lewra bêguman Xuda ezab diwar e.

8; Ji xizanên koçber yên ku ji warên xwe û malên xwe hatine derxistin ku ew li qencî û qayilbûna Xuda digerin û yariya Xuda û pêxemberê wî dikin re ye jî. Ên rasgo her ewên han in.

9; Ê ewên ku berî wan, war û baweriyê amade kirin, ew ji ên ku bal wan ve koçber bûne hiz dikin û ew di dilên xwe de tu hewcetî bi tiptê ji wan re hatiye dayîn nabînin û her çend hewcetiya wan hebe jî ew (birayên xwe) di ser xwe re digrin. Kî ji çikûsî û dexesiya xwe bê parastin êdî ên rizgarbûyî her ewên han in.

10; Ewên ku di pey wan de hatin dibêjin: "Perwerdekarê me! tu ji me re û ji birayên me yên ku bi bawerî berî me derbas bûne re bibexşîne û tu di dilên me de tu kînekî ji ên bawerî anîne re çeneke. Perwerdekarê me! bêguman tu dilovîn î dilovan î."

11; Ma tu li ewên durûtiyê dikin nanêrî ku ew ji birayên xwe yên ji ehlê kitêbê ku kafir bûne re dibêjin: "Sond be, eger hûn (ji Medîne) bêne derxistin emê jî hey bi we re derên û em derbareê we de tu car peyrewtiya kesî nakin, û eger bi we re per bête kirin, emê her yariya we bikin." Xuda danas e ku bêguman ew derewkar in.

12; Sond be eger ew bêne derxistin, ew bi wan re dernakevîn û sond be eger bi wan re bête per kirin, ew yariya wan nakin û sond be eger yariya wan bikin jî ewê pişt bidinê birevin papê ew nayên yarî kirin.

13; Tirsê we di dilên wan de ji a Xuda zortir e. Evê han ji ber ku ew bi rastî komelekîne kûr tê nagihên.

14; Ew bi tevayî bi we re per nakin, tenê di bajarên bi kelehên zexm dorgirtî de yan ji pişt diwaran ve (ew bi we re per dikin). Perê wan di nav wan de diwar e. Tu wan teva yek guman dikî lê dilên wan cûrbe cûre. Evê han ji ber ku ew bi rastî komelekî ne xwe ranagirin.

15; Wek mînaka ên ji nêz ve berî wan ku celata karê xwe tam kirin. Ji wan re ezabekî bi jan heye.

16; Wek mînaka pelîd ku gava ji mirov re dibêje: "Kafir bibe." Vêca çi gava kafir dibe, ew dibêje ku: "Bêguman ez ji te bêrî me. Lewra bêguman ez ji Xudayê perwerdekarê cîhanan ditirsim."

17; Vêca paþiya herduyan bû ku ewê di agir de hertimî bimînin. Celata sitemkaran eva haye.

18; Gelî ên bawerî anîne! hûn xwe ji Xuda biparêzin-bitirsîn û bira herkes binêre ka ji sibê re çi bi pêp xistiye? Hûn xwe ji Xuda biparêzin-bitirsîn. Lewra bêguman Xuda bi tiptê hûn dikin kûrzana ye.

19; Hûn nebin wek ên ku Xuda ji bîr kirine, vêca (Xuda) jî wan bi wan daye ji bîr kirin. Ên jirêderketî her ewên han in.

20; Ehlê agir û ehlê bihiptê nabin yek. Ên rizgarbûyî her ehlê bihiptê ne.

21; Eger me vê Qur'ana han li ser çiyakî daxistina, te yê wî bidîtana ku ew ji tirsê Xuda serpêlê jihevbelabûyî ye. Em van mînakên han ji mirovan re didin hevî

heye ku bifikirin.

22; Ew Xuda ye ê ku ji wî pêve tu Xuda nînin. Zanayê bi penhan û peyda ye. Ew mihriban î dilo van e.

23; Ew Xuda ye ê ku ji wî pêve tu Xuda nînin. Behînpah e, pakbêrî ye, (xwedan) xweþî ye, pêbawer e, danasê biewle ye, serkeftî ye, serdestê bilind e, mezin e. Xuda ji tiptê ew dikin þîrîk pak bêrî ye.

24; Ew Xuda ye, aferandekar e, çêker e, sikûm û rûçikan dide. Navên herî xweþîk ê wî ne. Tiptê di asîmana û zemîn de wî pak bêrî didêrin. Serkeftiyê hîkmetdar her ew e.

#### Chapter 60 (Sura 60)

1; Gelî ên bawerî anîne! hûn neyarê min û neyarê xwe bi dostî negirin. Tevî ku ew bi rastiya ji we re hatiye kafir bûne hûn ji wan hiz dikin. Ji ber we bi Xudayê perwerdekarê xwe bawerî aniye, ew, we û pêxember (ji warên we) dertînin. Eger hûn ji bo cîhada di rêya min de û xwestina qayilbûna min derketine (êdî hûn wan dost negirin). Hûn bi dizî ji wan hiz dikin tevî ku ez tiptê hûn vedipêrin û tiptê hûn êpkere dikin tev dizanim. Kî ji we vî bike êdî bi rastî wî rêya rast þaþ kiriye.

2; Eger ew bi ser we kevin ewê ji we re bibin neyar û wê destên xwe û zimanên xwe bi xerabî dirêjî we bikin û ew hiz dikin ku xwezî hûn jî kafir bibûna.

3; Ne mervatiyên we û ne jî zarûyên we qet bikêra we nayên. Roja qiyametê wê navbera we ji hev biqetîne. Xuda, tiptê hûn dikin þaþ dibîne.

4; Bi rastî ji we re di Îbrahîm û ên pê re de nimûnekî rind heye. (Di bîr bînin) dema ji komela xwe re gotin ku: "Bêguman em ji tiptê hûn bêyî Xuda dihebinin bêrî ne. Em ji we bawer nakin û di navbera me û we de neyartî û xepma hertimî xuya yekta bawerî binin." Tenê gotina Îbrahîm ji bavê xwe re (ne tê de; ku gotê:) "2Sond be ezê ji te re bexþînê bixwazim û li hember Xuda ji te re tu tipt di destê min de nîne." Perwerdekarê me! me her xwe sipartiyê te û em her bal te ve vegeyane û vegeyane her bal te ve ye."

5; "Perwerdekarê me tu me ji ên kafir bûne re neke sihêtî û tu ji me re bibexþîne perwerdekarê me! Bêguman tu, serkeftiyê hîkmetdar her tu yî."

6; Sond be, ji we re di wan de nimûnekî rind heye ji ê ku hêviya Xuda û roja dawîn dike re. Kî rû bizivrine êdî bêguman Xuda, dewlemendê hêjayê pesn her ew e.

7; Dibe ku Xuda di nava we û ên we neyartiya wan fikir de hizkirinekî çêke. Xuda þaþ dikare. Xuda bexþendekar e dilo van e.

8; Xuda we ji ên ku di dîn de bi we re þer nekirine û we ji warên we dernexistine para nade ku hûn bi wan qencî bikin û bi wan re bi dad û rastî tevbigerin. Lewra bêguman Xuda ji ehlê dad û rastiye hiz dike.

9; Bêguman Xuda we tenê ji ên ku di dîn de bi we re þer kirine û we ji warên we deranîne û li ser derxistina we piþtvaniya hev kirine, para dide ku hûn wan dost bigrin. Kî wan dost bigre, êdî sitemkar her ewên han in.

10; Gelî ên bawerî anîne! gava jinên bawermend bi kopberî hatin bal we, vêca hûn wan sihêtî bikin. Xuda baweriya wan çêtir dizane. Vêca eger we wan (jînan) bawermend zanî, êdî hûn wan bal kafiran ve nezivrin. Ne ew (jînan) ji wan re durust in û ne jî ew (kafir) ji wan (jînan) re durust in. Hûn tiptê wan (kafir) daye bidin wan. Tu guneh li ser we nîne ku hûn mehr bikin gava hûn destmuza (mehra) wan bidin wan. Hûn bi dawa jinên (xwe yên) kafir negirin û tiptê we daye bixwazin û bira ew jî tiptê dane bixwazin. Hukmê Xuda evê han e. Xuda di navbera we de hukim dike. Xuda zana ye hîkmetdar e.

11; Eger tiptekî ji jinên we ji dest we çû bal kafiran vêca hûn bi ser ketin, êdî hûn biqasî tiptê dane bidin ên ku pîrekên wan ji dest wan çûne. Hûn xwe ji Xudayê ku hûn pê bawermend in biparêzin-bitirsin.

12; Pêxember! gava jinên bawermend hatin bal te ku bi te re bey'et kin ku: Bi Xuda re tu tiptî nekin û zarûyên xwe nekujin û di nav pêþî û lingên xwe de derewa bi hev nexim neynin û di karê qenc de bêfermaniya te nekin, êdî tu jî bi wan re bey'et bike, û ji Xuda, ji wan re bexþînê bixwaze. Lewra bêguman Xuda bexþendekar e dilo van e.

13; Gelî ên bawerî anîne! hûn komelekî ku Xuda li wan hêrs bûye dost negirin. Bi rastî ew ji axretê bêhêvî bûne çewa ku kafir ji ehlê goran bêhêvî bûne.



## Chapter 61 (Sura 61)

1; Tiptê di asîmanan û tiptê di zemîn de Xuda (ji her kêmasiyî) pak dêrandine. Serkeftiyê hîkmetdar her ew e.

2; Gelî ên bawerî anîne! hûn çima tiptê nakin dibêjin?

3; Tiptê hûn nekin bêjin li cem Xuda hêrsekî pirr mezin radike.

4; Bêguman Xuda ji ên ku di rêya wî de qor bi qor per dikin ku ew her wekî avahiyekî biheve zeliqandî ne hiz dike.

5; (Di bîr bîne) dema Mûsa ji gelê xwe re got: "Gelê min! hûn çima min diêpînin tevî ku hûn baþ dizanin ku ez pêxemberê Xuda me bal we ve (hatime þandin?)." Vêca çi gava ew (ji rastiyê) fetilîn Xuda jî dilên wan fetiland. Xuda, komelekî ji rêderketî nade ser rêya rast.

6; Û (di bîr bîne) dema Îsa kurê Meryemê got: "Gelî zariyê Îsraîl! bêguman ez pêxemberê Xuda me bal we ve (hatime þandin) ku rastdêrê Tewrata berî xwe me û mizgînvanim bi pêxemberekî ku navê wî Ehmed e, wê piptî min were." Vêca çi gava ew bi nîþanên xuya hat, gotin ku: "Evê han efsûneke diyar e."

7; Ji kesê derewa nebûyî davê ser Xuda tevî ku ew bal Îslamê ve tê vexwendinê sitemkartir kî heye? Xuda, komela sitemkaran nade ser rêya rast.

8; Ew dixwazin ku ronahiya Xuda bi devên xwe bitefînin. Lê her çend bi kafiran nexweþ be jî wê Xuda ronahiya xwe bitevayî bibe serî.

9; Ew e ê ku pêxemberê xwe bi rêberî û dînê rastîn þandiye ji bo ku wî her çend bi pûtperestan nexweþ be jî bi ser hemû dînan bixe.

10; Gelî ên bawerî anîne! ma ez danûsitaneke ku we ji ezabekî bi jan xelas bike nîþanî we bidim.

11; Hûnê bi Xuda û pêxemberê wî bawerî binin û hûnê bi malên xwe û bi canên xwe di rêya Xuda de cîhadê bikin. Eger hûn bizanbin evê han ji we re çêtir e.

12; Wê gunehên we ji we re bibexþîne û wê we têxe hin bihiptên ku çem ji binê wan diherikin û hin ciyên xweþ di bihiptê Ednê (ciyê xweþ û þên) de. Rizgariya herî mezin eva haye.

13; Yeka dîn jî ku hûn jê hiz dikin: yariyek ji Xuda û pîroziyek nêz. Tu mizgîn bide bawermendan.

14; Gelî ên bawerî anîne! hûn bibin alîkarê Xuda. Çewa ku Îsa kurê Meryemê ji þagirtan re got ku: "Bi alî Xuda ve kî alîkarê min e?" þagirtan got: "Em alîkarê Xuda ne." Vêca ji zariyê Îsraîl destekî bawerî anî û destekî jî kafir bûn. Vêca me ên bawerî anîn li ser neyarên wan zeximand êdî ew bi ser ketin.

## Chapter 62 (Sura 62)

1; Tipte di asîmana û tiptê di zemîn de Xudayê þehînpahê pak pîrozê serkeftiyê hîkmetdar pak bêrî didêrin.

2; Ew e ê ku di nav nezanan de pêxemberek ji wan rakir-þand ku ayetên wî li ser wan dixweyne û wan pak dike û wan hînê kitêbê û hîkmetê dike; her çend ew berê di þaþiyek xuya de bûn.

3; Ji wan ên dînê re jî ku hê negihîptine wan. Serkeftiyê hîkmetdar her ew e.

4; Evê han qenciya Xuda ye, ê bixwaze dide wî. Xuda xwey qenciyeke mezin e.

5; Mînaka ên ku Tewrat li wan hatiye bar kirin papê wan nikarbû wê hilgirin wek mînaka kerê ku barê kitêba hildigre ye. Mînaka ên ku ayetê Xuda derewandine çi nerind e! Xuda komela sitemkaran nade ser rêya rast.

6; Tu bêje: "Gelî ên bûne cihû! eger hûn guman dikin ku hûn bêyî mirovan bera dostê Xuda ne, nexwe hûn eger rastgo ne de ka mirinê bixwazin."

7; Ew, bi sedem tiptê ku destên wan pêþ xistiye tu car wê naxwazin. Xuda, bi sitemkaran baþ zana ye.

8; Tu bêje ku: "Bêguman mirina ku hûn jê direvin, vêca bêguman ewê rastî we were, papê hûnê bal (Xudayê) zanayê bi penhan û peyda ve bêne vegerandin vêca wê we bi tiptê we kiriye haydar bike."

9; Gelî ên bawerî anîne! gava roja inê ji bo limêjê hat gazî kirin, êdî hûn herin bal zikrê (þîretê) Xuda û hûn dev ji danûsitaneke berdîn. Eger hûn bizanbin evê han ji we re çêtir e.

10; Vêca gava limêj hat pêk anîn, êdî hûn li rûyê zemîn belav bibin û ji qenciya Xuda bixwazin-bigerin û pirr Xuda di bîr binin hêvî heye ku hûn xelas bibin.

11; Gava ew danûsitaneke yan leystikeke bibînin ew belav dibin-diçin balê û te li

piya dihêlin . Tu bêje ku: "Tiptê li cem Xuda ye ji leystik û danûsitanê çêtir e. Xuda çêtirê rozîdana ye."

#### Chapter 63 (Sura 63)

- 1; Gava ên durû tên bal te dibêjin: "Em danasî didin ku bi rastî tu pêxemberê Xuda yî." Xuda baþ dizane ku tu pêxemberê wî yî. Xuda danasî dide ku bêguman ên gurû her derewkar in.
- 2; Wan baweriya xwe ji xwe re kir mertal vêca wan pêþî li rêya Xuda girt. Bêguman ew, çî pîs e tiptê dikirin.
- 3; Evê han ji ber ku bi rastî wan bawerî anî papê kafir bûn, vêca li ser dilên wan hate mohr kirin; êdî ew tènagihên.
- 4; Gava tu wan dibînî, bejn û bala wan te dixê sosretê, û eger ewbipeyivin tu li gotina wan gohdarî dikî. Ew her wekî hipke darê sipartî ne. Ew her qerînî bi ser xwe ve guman dikan. Neyar her ew in, êdî tu xwe ji wan bigre-biparêze. Xuda wan bikuje!, ew bi ku ve têne zivirandin?
- 5; Û gava ji wan re tê gotin ku: "Werin ku pêxemberê Xuda ji we re bexþînê bixwaze" , ew serê xwe hey dihejinin û tu wan dibînî ku ew bu quretî li ba dikevinxwe ji para didin.
- 6; Çi tu ji wan re bexþînê nexwazî li ba wan yek e. Xuda ji wan re qet nabexþîne. Lewra bêguman Xuda komela jirêderketiyan nade ser rêya rast.
- 7; Ew in ên ku dibêjin: "Hûn tiptekî nedin ên li cem pêxemberê Xuda ne heya ew ji hev belav dibin." Xiznê asîmana û zemîn her ê Xuda ne, lê belê ên durû tènagihên.
- 8; Ew dibêjin ku: "Sond be, eger em bal Medîne ve vegerin wê ê bêrûmet, jê derîne." Rûmet (û serkeftin) her a Xuda û pêxemberê wî û bawermendan e, lê belê ên durû nizanin.
- 9; Gelî ên bawerî anîne! ne malên we û ne zarûyên we bira we ji bîranîna Xuda para nehêle. Kî vî bike êdî ên ziyankar her ewên han in.
- 10; Û hûn ji tiptê me rozî daye we bidin berî ku mirin ji we yekî re were vêca bêje: "Perwerdekare min! çima te min heya demek nêz nehipt êdî ku ez sedeqa bidim û bibim ji qencan?"
- 11; Gava danê wî were, Xuda qet tu kesî para nade. Xuda bi tiptê hûn dikan kûrzana ye.

#### Chapter 64 (Sura 64)

- 1; Tiptê di asîmana û tiptê di zemîn de her Xuda pak bêrî didêrin. Mulk ê wî ye. Pesn û sipas her jê re ne. Ew bi her tiptî dikare.
- 2; Ew e ê ku we aferandiye; vêca hin ji we kafir in û hin ji we jî bawermend in. Xuda, tiptê hûn dikan baþ dibîne.
- 3; Asîmana û zemîn bi rastitê aferandiye, û sikûm û rûçik bi we daye vêca sikûm û rûçikên we xweþik çekiriye. Veger her bal wî ve ye.
- 4; Tiptê di asîmana û zemîn de dizane û tiptê hûn vedipêrin û tiptê hûn diyar dikan jî dizane. Xuda zanayê bi vepariyê di singan de ye.
- 5; Ma xebera ên berê kafir bûne ji we re nehat ku wan sezayê karê xwe tam kirin. Ji wan re ezabekî bi jan jî heye.
- 6; Evê han ji ber ku bi rastî pêxemberên wan bi nîþanên xuya ji wan re hatin vêca wan got ku: "Ma wê mirovekî me bide ser rêya rast?" Vêca ew kafir bûn û rû zivirandin. Xuda (ji wan) bêhewce bû-tu paxevê bi wan nekir. Xuda devlemendê bêhewce hêjayê pesn e.
- 7; Ewên kafir bûne, guman kirin ku wê tu car (ji goran) neyên rakirin. Tu bêje ku: "Belê çewa (hûnê neyên rakirin); Bi perwerdekarê xwe kim hûnê her bêne rakirin papê hûnê bi kirinê xwe bêne haydar kirin. Evê han li ser Xuda pirr hêsan e."
- 8; Nexwe hûn bi Xuda û pêxemberê wî û ronahiya ku daxistiye bawerî binin. Xuda bi tiptê hûn dikan kûrzana ye.
- 9; Roja ku wê we ji bo roja civîne (roja qiyametê) bicivîne; ew (roja) han roja kar û ziyane ye. Kî bi Xuda bawerî bûne û karê qenc bike, ewê nepakiyên wî jê bibe û wê wî têxe bihiptên ku çem ji binê wan diherikin, wê hertimî hertim tê de bimînin. Rizgariya mezin eva haye.
- 10; Ewên kafir bûne û ayetên me derewandine ehlê agir her ewên han in, wê hertimî tê de bimînin. Çi pûnvegerek ne rind e!

11; Her musîbeta çêbibe hey bi destûra Xuda ye. Kî bi Xuda bawerî bîne wê ew dilê wî bal rastiyê ve rêberî bike. Xuda zanayê bi her tiptî ye.

12; Hûn peyrewtiya Xuda û peyrewtiya pêxember bikin. Vêca eger hûn rû bizivrinin êdî béguman li ser pêxemberê me tenê daxuyandinek apîkar heye.

13; Xuda, ji wî pêve tu Xuda nînin. Êdî bira bawermend her xwe bispêrin Xuda.

14; Gelî ên bawerî anîne! béguman hin ji jinên we û zarûkên we ji we re neyar in; vêca hûn xwe ji wan biparêzin. Eger hûn lêbiborin û xwe bibînin û bibexbînin, êdî béguman Xuda bexpendekar e dilovan e.

15; Béguman malên we û zarûyên we ji we re her sihêtî ne. Xuda li balê xelatekî mezin heye.

16; Vêca hûn biqasî dikarin xwe ji Xuda biparêzin-bitirsîn û guhdarî bikin û peyrewtî bikin û ji xwe re qencî bikin. Kî ji çikûsî û timatiya xwe bê parastin êdî ên rizgarbûyî her ewên han in.

17; Eger hûn deynekî rind bi deyndarî bidin Xuda ewê wî ji we re pirrtir bike û ji we re bibexbîne. Xuda sipaskar e mulayim e.

18; Zanayê bi penhan û peyda ye serkeftiyê hîkmetdar e.

#### Chapter 65 (Sura 65)

1; Pêxember! gava we jina berda, vêca hûn wan di danê (paqijiya) wan de berdîn û hûn wî danî bijmêrin. Hûn xwe ji Xudayê perwerdekarê xwe biparêzin-bitirsîn. Hûn wan ji xaniyên wan dernexin û bira ew jî dernekevin ji pêptirê ku nepakîkî apîkar bikin. Evê han tixûbê Xuda ne. Kî ji tixûbê Xuda bibore êdî bi rastî wî li xwe tadê kiriye. Tu nizanî dibe ku Xuda piptî vî kareki nû çê bike (rewpekî nû bi ber we xe).

2; Vêca gava ew (jin) gihîptin danê (berdana) xwe, êdî hûn ji wan ya bi qencî bigrin yan jî hûn wan bi qencî biqetînin û hûn ji xwe du danasê dadmend (adil) amade kin. Hûn ji bo Xuda danasiyê rast kin. Evê han ê ku bi Xuda û roja dawîn bawerî tîne pê tê pîret kirin. Kî xwe ji Xuda biparêze-jê bitirse wê jê re rêya derketinê çêke.

3; Û wê ji deverekî ku ew guman nake rozî bidê. Kî xwe bispêre Xuda, êdî ew besî wî ye. Béguman Xuda fermana xwe radigihîne (tiptê bixwaze pêk tîne). Bi rastî Xuda, ji her tiptî re pîvanek (qasekîdanê dawî lêhatine) çêkiriye.

4; Ew (pîre jin) ên ku ji kirasa bêhêvî bûne (êdî nakevin heyza) -eger hûn dudilî bibin- êdî danê (mayîna) wan sê meh e; û ên ku (biçûk in) neketine kirasa de jî (danê mayîna wan sê meh e; jin) ên bardar (bi hemle) jî danê wan (ev e) ku barê xwe deynin. Kî, xwe ji Xuda biparêze-bitirse, wê ji karê wî jê re hêsanî çêke.

5; Evê han fermana Xuda ye ku bal we ve daxistiye. Kî xwe ji Xuda biparêze-bitirse wê nepakiyên wî jê bibe û wê xelata wî jê re mezin bidêre.

6; Hûn li kuder bimînin hûn wan (jinên berdayî) jî li wê der bi qasî maldariya xwe bihêlin, û hûn ji bo ku li ser wan tengasî çêkin, ziyane nedin wan. Eger ew (jin) bardar bin, êdî hûn heya ew barê xwe deynin (rozî) bidin. Vêca eger ew (zarûyên we) ji we re bimêjînin, êdî hûn destmuza wan bidin wan, û hûn bi qencî dinav xwe de lihev bikin. Eger ji we re zor hat, êdî wê yeka din wî bimêjîne.

7; Bira ê xwedan firehî (maldar) ji firehiya xwe bide. Kî jî roziya wî jê re teng hatiye kirin, êdî bira ew ji tiptê Xuda dayê bide. Xuda, her kesî bi qasî tiptê dayê berpirsyar digre. Wê Xuda, piptî dengasiyê firehî çêbike.

8; Çiqas ji bajaran ku ji fermana perwerdekarê xwe û pêxemberên wî serkêpî kirin vêca me wan bi pirsek zor dijwar berpirsyar girt û me wan bi ezabekî nedîtî da ezabê.

9; Vêca wan celata karê xwe tam kir û paþiya karê wan bû ziyar.

10; Xuda, ji wan re ezabekî zor dijwar amade kiriye. Nexwe hûn xwe ji Xuda biparêzin-bitirsîn - gelî xwedan hiþên ku we bawerî aniye! - Bi rastî Xuda bal we ve Qur'anekî (ku tev pend û pîret e) daxistiye.

11; Pêxemberekî ku ayetên Xuda êpkere li ser we dixweyne ji bo ku ew, ên bawerî anîne û karên qenc kirine ji tarîtiyan bal ronahiyê ve derîne. Kî bi Xuda bawerî bîne û karê qenc bike, wê wî têxe hin bihiptên ku çem ji binê wan diherikin, wê hertimî hertim tê de bin. Bi rastî Xuda, jê re roziyê rind çêkiriye.

12; Xuda ye ê ku heft asîmana û biqasî wan zemîn aferandiye. Kar û ferman di nava wan de hin bi hin dadikeve ji bo hûn bizanbin ku béguman Xuda bi her tiptî dikare û

bêguman Xuda bi zanînê hawîdor li her tiptî girtiye.

#### Chapter 66 (Sura 66)

1; Pêxember! tu çima tiptê Xuda ji te re rewya dêraye tu ji bûna qayilbûna jinên xwe nerewa didêrî? Xuda bexpendekar e diloan e.

2; Bi rastî Xuda, ji we re vekirina sondên we (bi dana bergîdana) daxuyandiye. Xuda yar û yawerê we ye. Zanayê hikmetdar her ew e.

3; Dema pêxamber ji hin jinên xwe re gotinek bi dizî got; vêca çi gava wê wî (razî ji jinên din re) got, û Xuda jî haya wî pê xist, wî hinekî wî (razî) nasî û ji hinekî wî jî rû zivirand. Vêca çi gava wî wê pê (bi belavkirina razê wî) haydar kir (jina wî) gotê: "Kî te bi vî haydar kir?" Got: "(Xudayê) zanayê haydar min pê haydar kir."

4; (Hûn herdû jinên pêxember ku we gotinê wî yê bi dizî belav kiriye) eger hûn bal Xuda ve poşman bibin-vegerin êdî bi rastî dilê we (ji rastiye) xor bûye-ziviriye û eger hûn li serê piştvaniya hevdû bikin, êdî bêguman yar û yawerê wî her Xuda û Cebraîl û qencê bawermendan e. Piştî vî feripte jî piştvan in.

5; Eger ew we berde, dibe perwerdekarê wî di bûna we de hin jinên ji we çêtir bidê ku musulmanê bawermendê ji dil pê girtiye tobedarê perestvanê rojîdarê (yan koçberê) jinebî û keç bin.

6; Gelî ên bawerî anîne! hûn xwe û malîyên xwe ji agirê ku şewata wî mirov û kevir in biparêzin. Li serê hin feriptê sirt û dijwar hene ku tiptê Xuda ji wan re ferman bike ew bêemriya wî nakin û tiptê tene ferman kirin dikin.

7; Gelî en kafir bûne! hûn îro doza lêborînê nekin. Lewra bêguman hûn, her bi tiptê we kiriye tene celat kirin.

8; Gelî ên bawerî anîne! hûn bi poşmaniyek vebirî bal Xuda ve poşman bibin-vegerin. Dibe ku perwerdekarê we nepakiyên we ji we bibe û we tene hin bihiştên ku cem ji binê wan diherikin; di roja ku wê Xuda, pêxember û en pê re bawerî anîne riswa neke. Ronahiya wan li pêşiya wan û li rastê wan rohnî dike; ew dibêjin ku: "Perwerdekarê me! tu ronahiya me ji me re bi tevayî pêk bîne û tu ji me re bibexşîne. Bêguman tu bi her tiptî dikarî."p

9; Pêxember! tu bi kafir û durûyan re cîhadê bike û li ser wan sirtî nîşan de. Hewyegera wan dojah e. Çi pûnvegerek ne rind e!

10; Xuda, ji en kafir bûne re pîreka Nûh û pîreka Lût minak da ku ew herdû di binê du bende yên qenc ji bendeyên me de bûn, vêca wan (du jina) bi her du (bendeyên me re) dexesî kir, êdî li hember Xuda tu tipt bikêra wan nehat, û hat gotin ku: "Hûn jî tevî ketiyan têkevin agir."

11; û Xuda, ji en bawerî anîne re pîreka Fîr'awn minak da; dema ku got: "Perwerdekarê min! tu ji min re li cem xwe xanîkî di bihiştê de ava ke û min ji Fîr'awn û karê wî xelas ke û min ji komela sitemkaran rizgar bike."

12; û Meryam keça Îmran (minak da) a ku dawa xwe parast, vêca me ji canê xwe tê pîf kir û wê peyvê perwerdekarê xwe û kitêbên wî rast dêrand û bû ji en bi dil perestvan in.

#### Chapter 67 (Sura 67)

1; Ew (Yezdan ê ) ku (serektiya hemî berewan û bûyeran ) di destê wî dane, pîroz e. û ewa bi xweber jî li ser hemî tiştan bi hêz e.

2; Ji bo ku ewa we bi ceribûn e; ka kîjan ji we karekî rindtir dike ewî mirin û jîn afirandî ye. Şixwa ewa bi xweber jî servahatê baxîşkar e.

3; Ewî ezman bi heft ramaxê (wekîhev) afirandî ye (heryekê ji wan di şopa xwe da digere). Tu di afirandîna ( Yezdan ê ) diloan da qe to aloziyê nabînî. Îdî tu çav bizvirîn e, ka qe tu (di afirandîna wan da) tu aloziyekî di bînî?

4; Paşê tu bi car û car çav bizvirîne qe tu (tu alozî nabînî). Ewan çavanê bi bêzarî (ji dîtina kêmaî û aloziyan) bê umîd wê li bal te da bizvirin.

5; Bi sond ! me ezmanê cihanê bi sitêrkne wekî çiran çilwulok xemilandî ye. Me ewan sitêrkan ji bona Pelîdan xistin e kevir afîtok (sitêrkê rijok e). Me ji bona (Pelîdan ra) şapata doja hilopît amade kirîye.

6; Me ji bona wanê ku filetî ya Xuda yê xwe dikin şapata dojê (amade kirîye). Ewa çîqa sikê ewran e !

7; Gava ewan di nava dojê da tene afîtinê, ewan ji dojê dengê zîqîniyê di behên (tu

dibê qey ji hizkirina afîtinê) di hîre û ewa li sed hev da pêt davêj e.

8; Nêzik dibe ku (ewa doja) ji hêrsa ji hev bi çire. Çiqa destek ji wan di nava (dojê da) tene afîtinê, zebaniyê (dojê) ji wan pirs kirîye, « Qe ji bona ew ra hişyarvanekî, ku (hûn ji vê dojê bi dana tirsandinê ) ne hatibû bal we ? »

9; Ewan (aha pisyar dane û) gotine, « erê ! bi sond, li bal me da hişyarvan hatibûn, lê me ewan dane derew dêrandinê, me ji wan ra (aha) gotibû, « Yezdan qe tu tişt ne hinartîye, hûn hey di wundabûneke mezin danin. »

10; (aha jî) gotibûne, « Şixwa heke me ji wan (hişyrvanan) bi bihîsta û me (ji gotinê wan) hiş hilda, em ne diketine nava hevrîne (agirê) hilopît. »

11; Îdî ewan (bi vênê gotine), « erê ! me (evan gunehê hanênan) kirine. Îdî (tu dest ji wan berde) bi ra hevalê wî (agirê) hilopît bêne hêrandinê, dûr e (dilovanî ya Yezdan bi kebin).

12; Bi rastî ewanê, ku bi dizîka da ji Xuda yê xwe ditirsin hene ! ji bona wan ra baxîşkirin û kiryeke mezin heye.

13; Hûn (gelî merivan !) axiftinan, çî veşêrin û çî eşkerke bikin (yek e). Loma tiştê di singa da heye (Yezdan) pur pê dizane.

14; Ewa bi xweber bi hemî tiştê hûr (dizane û ) agahdar e, ça bi tiştê (afirandîye)nizane ?

15; Ewê, ku zemîn ji bona we ra melûl kirîye heye ! ewa Yezdan e, îdî hûn di nav milê (zemîn da) bigerin û hûn ji rojîne wî bixun. Hey zivirandin li bal (Yezdan) dane.

16; Qey hûn ji wanê di ezmana da ewle dibin, ku ewan we di zemîn da nexne xarê? Gava (evan bi vên, ku we di zemîn da bixne xarê) zemîn heman diheje (hûn bixweber di zemîn da diçîne xarê).

17; Yajî qey hûn ji wanê di zemîn da hene ewle dibin, ku ewan li ser we da bexûrê neşînin? Di nava wê baxûrê da kevirne, ku hûn bi wan bêne kuştinê hebin. Îdî hûnê di nêzik da bizanin ka hişyar ya mine bi tirsdanê, çane ?

18; Bi sond! Ewanê di berya wan da hebûne, hene ! ewan jî (Pêxemberne xwe) dabûne derewdêrandinê, îdî (tu mize bike) ka temtêla wanê, ku (digotin, Xuda) tune ye çane?

19; Maqey ewan li bal wan çûkne, ku li ser wan da ref girtine û baskê xwe diweşînin û req dîkin, mêze nakin? Ewan (çûkan) di hewa da hey (Yezdan ê) dilovan digire. Loma bi rastî ewa hemî tiştîdibîne.

20; Qey ji pêştirê (Yezdan ê) dilovan, evan leşkerne wene hanênan wê we (ji şapata Yezdan) biparîsînin? Bi rastî file di xapandinêdanin.

21; Qey heke (Yezdan) rojîna xwe ji we bide girtinê, evanê hanê wê ji we ra rojînan bidin? (Tu kes nikare bide!) lê ewan di inça xwe da tekoşîne dîkin û (ji rastîyê) vedicinîkin.

22; Maqey ewê, ku deverû diçe, ewa li ser rîyaraste yan jî ewê li ser rîyarast diçe hatiye rîyarast?

23; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: “Ewê hûn afirindine heye! Ewa Yezdan e. Ewî ji bona we ra goh û çav û dil çekirîye. Hûn çiqa hindik sipasî ya (wî) dîkin!”

24; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha jî) bêje: “ewê hûn di zemîn da çandine heye! Ewa (Yezdan e) hûnê li bal wî da bêne civandinê.”

25; Ewan ji te (aha dipirsin) û dibêjin: “heke hûn rastbêjin, ka danê wê (şapatê) kîngeye?”

26; Tu (pisyara wan aha bide) û bêje: “ zanîna wî danî hey li bal Yezdan e. Ez bi xweber jî hey hişyardarekî xwuyame.”

27; Îdî gava ewan (nabaweran) ewa (aşîta) di nêzik da dîtine, rûyê wanê bûne file sîkbûya (ji wan ra aha) hatiye gotinê: “ewa şapata we dixwest evaye.”

28; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha) bêje: “hûn mêze bikin, heke Yezdan min û ewanê bi min ra teşqeale bike, yan jî dilovanî ya xwe li me bike (em bi xweber qayîlin loma ewa Xuda yê me ye, lê gelo) îdî kê dikare filan ji şapata dilsoz biparêşîne?”

29; (Muhemmed! Tu ji bona wan ra aha jî) bêje: “parîsvan hey (Yezdan ê) dilovan e, me bi wî bawer kirîye û me xwe hispartîye wî, îdî hûnê di nêzik da bizanin ka kîjan di rê wundabûna xuyadane.”

30; Tu (ji wan ra aha jî) bêje: “hûn mêze bikin; heke ava we di (zemîn da) here xarê û bimirçiqe, îdî gelo ji we ra kîjan dikare aveke nexwuyaî bide zayîne bîne?”

Chapter 68 (Sura 68)

- 1; Nûn. (Arşa van tîpên di serê ferkeran da hatine hey Yezdan dizane) Bi nûn û nivîsदारok û bi nivîsandina, ku (bi nivîsदारokê) tê rêz kirinê.
- 2; (Muhemmed!) tu bi qencîneke Xuda yê xwe tepa nakebî.
- 3; Bi rastî ji bona te ra kiryeke bê paşî heye.
- 4; Bi rastî tu li ser xûyekî mezinî.
- 5; Îdî tuyê jî (di nêzik da) bibînî ewanê jî, bibînin.
- 6; Ka kîjan ji we (herdu destan ji rêya rast) darketîye (tepa ketîye).
- 7; Bi rastî Xuda yê te bi xweber ça bi wanê hatine (rîyarast) çêtir dizan e, bi wanê, ku ji rêya wî der- ketine jî çêtir dizan e.
- 8; Îdî (Muhemmed!) tu bigotina virekan nek e.
- 9; Ewan hiz kirine, ku tu bi wan ra bi nermayî derbas bikî, îdî ewan jî bi wa ra bi nermayî derbas bikin (carna tu bi gotina wan, carna jî ewan bi gotina te bikin)
- 10; (Muhemmed!) hemî (kesên) sond xwarin e riswa
- 11; Gotegotê bi navok (di nava kesan da) axiftinan digerin e.
- 12; Nahêle (kes) qencîyan bike, ji tuxûbê xwe borî û gonehkar.
- 13; Ku bi hêrs in ji piştî hêrsê jî bê nişan e.
- 14; Ji ber ku bi mal û kur in, tu bi gotina (wan) neke. Loma, ewan ji tuxûbê xwe borîne rast nînin).
- 15; Gava berateyên me ji wî ra tê xwundinê (aha) dibêje, "Evanan çîvanokê berêne."
- 16; Di nêzik da emê li ser pozê wî durufê daynin.
- 17; Bi rastî me ça hevrîne rêz û baxan ceribandibûn. Kanê wan sond xaribûn, ku ewanê di serê sibehê da (darê bostanê xwe biweşînin).
- 18; Qey ewan tu tişt ji hev venediqetandin (ne digotin: Heke Xuda hez bike).
- 19; Îdî ewan bi xweber jî hêj razaibûne li ser wan da aşîtek ji Xuda yê te çerixî.
- 20; Îdî rêz û baxê wan wekî pirêzên zevîyan man e.
- 21; Ewan di sibehê da qîrdane hev.
- 22; Ku hûnê herin (daran) dawêşînin; zû herin hûn dereng man e, gotine.
- 23; Îdî ewan rabûne çûne, di nava hev da bi dizî axiftin e.
- 24; Di îro da bila tu xezan (di rêz û baxçe da) neyê bal me.
- 25; Ewan zû çûn. Guman dikirin, ku dişin qe tu xezanî nexne baxçê xwe.
- 26; Îdî gava ewan çûne (bostanê xwe) dîtine (aha) gotine: "Bi rastî me rêya rast wuda kirîye".
- 27; Bi rastî em di berê da ji wî (bostanî) hatine bê par kirinê
- 28; Ewê nivwarê ji wan (ji bona wan ra aha) gotîye: "Qey min ji bona we ra negot; gotî hûn Xuda yê xwe ji kêmasîyan paqij bikin
- 29; Ewan jî (aha) gotine; "Xuda yê me! bi rastî em te ji kemasîyan paqij dikin, loma bi rastî em ji cewrkaran bûne.
- 30; Îdî hinekê ji wan berê xwe dane hinekên wan li hev tilf kirine.
- 31; (Ji hev ra aha) aha gotina, "Xwalî li me be! bi rastî em ji avarû derketibûn".
- 32; Dibe ku Xuda yê me di şûna wan da ji wan çêtir bide me. Loma bi rastî em ji Xuda yê xwe hêj ji wan çêtir dixwazin.
- 33; Şapat ahane! heke ewan bizanin şapata para da hêj meztir e.
- 34; Bi rastî ji bona Xuda parizan, li bal Xuda yê wan, behîşt xarinan heye.
- 35; Îdî qe em misilmanan û guneh karan wekî hev digirin?
- 36; (Gelî filan!) hûn ça berewanî dikin (ewan wekî hev digirin)?
- 37; Qey ji bona we ra pirtûkek heye! hûn (di wê pirtûkê da) evan biryaran dixûnin?
- 38; Bi rastî hûn çi bibêjin, ji bona we ra di wê pirtûkê da heye?
- 39; Maqey heya roya qarsê ji bona we ra me sond xwarîye, ku hûn bi çi berewanî bikin, ewa berewanî ya ji bona we ra heye?
- 40; (Muhemmed! tu ji wan aha) pirs bike, ka ji wan kîjan dibe gerewa vê gotinê?
- 41; Qey Ji bona wan ra (divê axiftinê da) hempayê wan hene? Îdî heke ewan (di doza xwe da) rast in, bila hempayê xwe jî bînin.
- 42; Di roya, ku deling ji bazûyan tê hildanê (temtêla wan zor dibe) ewan li bal kunde birinê da tene gazî kirinê, îdî ewan nikarin kunde beherin (loma danê wî borîye).
- 43; Çavê wan ji tirsê ketîye, rûşîk bi wan digirtîye. Bi sond! Ewan hêj zende bûne, li bal kunde birinê da hatine gazî kirinê (lê kude ne birine).
- 44; Îdî (Muhemmed!) tu ewanê, ku vê (Qur'an ê) didine derewdêrandinê ji min ra

bihêle (dest ji wan berde) emê ewn bi pêpelîk di wî cîyî qe ewan pê nizanbin nêzikê (aşîtê) bikin.

45; Ez ji bona wan ra dem didim. Bi rastî defika min (ji bona wan ra ) bi hêz e, (kê bikeve îdî dernakeve).

46; Qey (Muhemmed!) tu ji wan kirya (pêxembrî ya xwe) dixwazî, îdî ewan jî, ji deyn dayînê giran bûne (nikarin kirya te bidin?).

47; Qey li bal wan (xezîna bi ne xûyan) heye, îdî ewan jî, (ji wan ne xûyan) dinivîsin?

48; Îdî tu ji bona berewani ya Xuda yê xwe hew bike û tu jî wek hevriyê masîyê (Yunis) neke. Gava (Yunis) ji kulan tijî bûye (ji Xuda) lava kirîye.

49; Heke ji Xuda yê wî qencîyek negîhişt a wî, wê di çoleke rût da bi rexni bihata avêtinê.

50; Îdî (wusa nebû) loma Xuda yê wî (lava ya wî) litê kir. Îdî (Xuda yê wî) ewa xiste ji aşîkaran.

51; Ewanê bûne file hane! Gava ewan (xwendina Qur'an ê) dibihîstin, nêzik dibû, ku ewan te bi çavê xwe welgerînin. Ewan (aha) digotin: "bi rastî (Muhemmed) tepa dikebe".

52; Lê (Qur'an) bi xweber jî, ji bona hemû heyran şîretk e (hatîye şandinê)

#### Chapter 69 (Sura 69)

1; Maf (bi rastî di roja qarsê da) ne.

2; (Roja) qarsê çîye?

3; Ka çî tişt e bi te daye zanînê(roja) qarsê çîye?

4; Semûdiyan û Adiyan (danê) qarsê (dan e) derewdêrandinê.

5; Îdî Semûdî bi sedema ku ji avarû derketibûn, hatine teşqe kirinê.

6; Lê Adiyan bi babelîzkeke bi denge zor hişk hatine teşqe kirinê.

7; (Yezdan ewa baya) bi ser wan da hevt şev û hevt rojan bi peywestî anîye, îdî te digo qey ewa komala di nava wî baî da bi xwe va çûne, wekî çiqilê darê xurm kefikî, diketin

8; Îdî qe tu ji wan para maîyan dibnî?

9; Fir'ewn û ewanê berya (Fir'ewn jî) û (komalê) bajarê kavi bûne, bi xeletîne xwe va hatine.

10; Îdî ewan bê gotina qasidê Xuda yê xwe kirine, îdî (Xuda yê wan jî, ewnan) bi şapateke mezin (dane şapat) kirinê.

11; Bi rastî gava av rabû ye, me hûn hildane kêleka kişyaî da.

12; Ji bo ku guhekî vala ewî bi xweber bi parisîne, me ji we ra xistiye şîreteke (sodret).

13; Îdî gava di sturî da bi carekî tenê tê puf kirinê.

14; Û zemin û çîyan tene rakirinê, bi yek carekî û hev dikevin.

15; Îdî bûyera qarsê di wê royê dan e.

16; Îdî ezman di wê rojê da çiriye; hatîye dawêşandinê.

17; Û ferîştên jî li ser lêvê ezman in. Şixwa di wê rojê da arşê Xuda yê te heşt (ferîşte) hil didin.

18; Di wê rojê da hûn (ji bona Yezdan ra) tene raber kirinê, ji we tu veşartî ji (Xuda) penha namînin.

19; Îdî ji bona kîjanî ra pirtûka wî bi destê rastê hatibe dayînê (aha) dibêje: "Ka pirtûka min bi xwûnin (hemî qencîne)."

20; Loma bi rastî min guman kiribû, ku ezê rastê vê hijmarê wer im.

21; Îdî ewa di jîneke pê qayîl dan e.

22; Di behîşteke bilind dan e.

23; Guşîne (darê) wê nêzik in.

24; Bi sedema (wan karên qencîne) ku we di wan rojê borî da (pêş da kirîye) îdî hûn bixun û vexun; li we bigivîr e.

25; Lê ewê, ku pirtûka wî bi destê çepê ji wî ra hatîye dayînê; îdî (aha) dibêje: "Xwezîka ji bona min ra pirtûk ne hatibû ya dayînê."

26; Min bi hijmara (kirinê) xwe nizanbû ya.

27; Xwezîka (mirina min) pêk hatibû ya (min ewan ne dîtibûnan).

28; Qe malê min bi kêrê min nehat (evan şapatan dîrê min ne xistin).

29; Hêz û seroktî ya min çû(qe tu kar nekir).

30; (Yezdan ji bona nobedarê dojê ra aha) dibêje: "hûn ewî li bal dojê da bavêj in."  
 31;  
 32; Paşê hûnê wî di zincîrê; ku pîletê wî hevtê zend in, beherin.  
 33; Loma ewî bi Yezdan ê mezin bawer ne dîkir.  
 34; Ji bona daxwûrinan belengazan qe helan ne dida tu kesî.  
 35; Îdî di îro da ji bona wî ra di vîra da qe tu pismam tune. *tuneye.*  
 36; Ji pêştîrê kêmê, qe tu xwûrin jî tune. *tuneye.*  
 37; Ji pêştîrê gunehkaran, qe tu kes (ewê xwûrinê ) naxun.  
 38; Ho! Ez bi wan tiştên, ku hûn ewan dibînin.  
 39; Bi wan tiştên, ku hûn ewan nabînin.  
 40; Sond dixum! Ku ewa (Qur'an a) bi rastî peyva (Xuda ye) qasidê (Yezdan ê) dilşa anîye.  
 41; Ewa (Qur'an a) gotina bengîyekî nîne. Hûn çîqa hindik bawer dîkin!  
 42; Ewa (Qur'an a) gotina fal zanan jî, nîne. Hûn çîqa hindik diponîjin.  
 43; Lê ewa hey hînantîneke ji Xuda yê cîhanê ye.  
 44; Heke ewî (qasidî) li ser navê me hinek gotin, aloze kirîbû ya.  
 45; Bi rastî meyê ji wî hêza wî hildabû ya.  
 46; Paşê meyê temarê canê wî jêkira.  
 47; Îdî tu kesî ji we nikaribû, ji wî (qasidî) eva şapata bida para da.  
 48; Bi rastî ewa (Qur'an a) ji bona Xudaparîzan şîretek e.  
 49; Bi rastî me dizanî ya, ku hinekne ji we ewê didine derewdêrandînê.  
 50; Bi rastî eva li ser filan kovanek e.  
 51; Loma bi rastî ewa mafekî bê dudil e.  
 52; Îdî (Muhemmed!) tu navê Xuda yê xweî mezin bi perestî paqîjîyan bike.

#### Chapter 70 (Sura 70)

1; Yekê pîrsa wê şapata (bi serê wan da) tê, kirîye.  
 2; (Gava eva şapata were) ji bona filan ra qe tu parisvan tune. *tuneye.*  
 3; Ewa (şapata) ji Yezdan ê xwedîyê pay e.  
 4; Ferîştên û can di royeke wekî pêncî hezar sal dirêj (li bal Yezdan da) bilind dibin.  
 5; Îdî (Muhemmed! Tu di hemberê wan da) rind hev bike.  
 6; Loma bi rastî ewan (ewê aşîtê) dûr dibînin.  
 7; Lê em jî, ewê nêzîk dibînin.  
 8; Di wê rojê da ezman wekî sifrê bahatî dibe.  
 9; Çîyan jî, wekî hirî ya jenî dibe.  
 10; Tu pismamek (ji temtêla) pismaman napîrs e.  
 11; Ewan (gunehkaran) hevdu didine nîşanê hev (lê her kes ketîye derdê xwe, hevdu ne nîyasîn) di wê rojê da nusîtemkar hez dike, heke ji wê şapatê ferîşte bibe, zarê xwe ji bona xwe ra bixe gerew.  
 12; Hevalê xweyê (jînê) û birayê xwe jî.  
 13; Ewan malîne, ku di nava wan da jî ye û di nava wan da mezin bûye hemû.  
 14; Û hemû heyîne di zemîn da (di gerewa xwe da) bide, hey bi tenê fereste be.  
 15; Na! (ewa fereste nabe) lê bi rastî ewa agirê hilopît e.  
 16; Bi sedema bahatînê çermê (wan) diçirîn e.  
 17; (Ewa agira) gazî wanê jê rev û paş da çûyan (hemûyan) dike.  
 18; Ewî mal berav kirîye, îdî qe ji bona xezana ra nedaye.  
 19; Bi rastî meriv, tîrsonek û bê zar hatîye afirandinê.  
 20; Gava sikatîk pê da were, zarîn dike.  
 21; Gava qencîyek pê da were, (ji hewcan ra nade) hişk digire.  
 22; Ji pêştîrê wanê nimêjker.  
 23; Ewan (nimêjkeran) li ser nimêj kirina xwe peywestene.  
 24; Di malê wan da (ji bona wan ra) pareke xwuyaî heyê.  
 25; Ji bona xwastî û ne xwastîyan ra.  
 26; (Ewan nimêjkeran) roja xelat û celatan rast didêrînin.  
 27; Ewanan ji şapata Xuda yê xwe disilikînin.  
 28; Loma bi rastî şapata Xuda yê wan, ewletî çê nabe.  
 29; Ewan ji bona doxîna xwe ra parisvan in.



30; Ji pêştirê zo û yan jî (hevala) bi ked û malê xwe hildaye binê destê xwe, îdî (doxîn vekirin) ji bona van herduyan ra jî bi tilf e.  
 31; Îdî kîjan ji van pêştir bivê, ewanan îdî ji tuxûb diborin.  
 32; Ewanê (nimêjker) emanet (hildane paradan-ragirtin bo danewe) û peymana xwe pêk tînin.  
 33; Ewana nihrewanî ya xwe pêk tînin (qe venaşerin).  
 34; Ewanan bi xweber jî, parisvanê nimêja xwe ne.  
 35; Ewanan di behîştan da bi mexzûvanî rûmetkar in.  
 36; Îdî gelo ji bona wanê file ra çibûye, sitûyê xwe dirêj kirine li bal te da direnin.  
 37; Ji rast û çep da destê destê tînin.  
 38; Qey her yek ji divên, ku bikevine behîştê xarinan?  
 39; Na! (tiştêkî wusa tune) bi rastî me ewan ji wê (ava) ku pê dizanin afirandîye.  
 40; Ho! Îdî bi Xuda yê rojhilat û rojava sond dixum, ku em bi şîn e.  
 41; Em dikarin di şûna wan da (mirovên) ji çêtir bînin, qe ewan nikarin pêşîya me bigirin (ku em di şûna wan da ji wan çêtir neynin).  
 42; Îdî (Muhemmed!) tu dest ji wan berde, bila ewan heya wê rojê, ku ji wan ra hatiye peymandanê noqî tinaz û leyîstika bin.  
 43; Di wê rojê da ewan ji gora xwe li lez derdikevin, tu dibê qey li bal kêlê xwene çikandî da direvin.  
 44; Çavê wan ji (riswabûnê) berjêr ketine, alotîyê ewan som kirîye. Ewa roja, ku ji bona wan ra hatiye peymandinê, eva ye.

#### Chapter 71 (Sura 71)

1; Bi rastî me Nûh li bal koma wî da şandîye (me ji Nûh ra aha gotîye: "Nûh!) hêj di berîya, ku ji komalê te ra şapateke dilsoz ne hatiye; tu komalê xwe bide hişyar kirinê".  
 2; (Nûh ji bona wan ra aha) gotîye: "gelî min! bi rastî ez ji bona we ra hişyarvanekî xûyame".  
 3; Hûn perestî ya Yezdan bikin û bi gotina min bikin.  
 4; (Heke hûn aha bikin. Yezdan ê) hinekî ji gunehên we ji bona we ra bibexşîne û wê ewayê heya danê nevdaî we para da bihile. Bi rastî heke hûn bizanin; gava danê dawîyê hatibe, nayê paradanê.  
 5; (Nûh ji Xuda aha lava kirîye û) gotîye: " Xuda yê min! bi rastî min komalê xwe di şev û rojê da (li bal te da) gazî kirîye".  
 6; Îdî gazîkirina min ji wan ra hey revandina wan para da pir kirîye.  
 7; Bi rastî ji bo ku tu ewan bibexşînî, min çîqa gazî wan kirîye ewan kincên xwe li xwe dipêçandin û tiliyê xwe dixistine guhê xwe (ji bo ku deng neçe wan înç dikirin, ji quratiyê xwe mezin dikirin..  
 8; Paşê bi rastî min ewan bi eşkere gazî kirin (ku ji kirinê xwe poşman bibin).  
 9; Paşê bi rastî min, ji bona wan ra (doza xwe) eşkere kir, ça min ji bona wan ra (doza xwe) bi veşartî penha kiribû.  
 10; Îdî minji wan ra (aha) got: "hûn ji bona xwe ra ji Xuda yê xwe baxişandina xwe lava bikin. Loma bi rastî (Xuda yê we) baxîşkar e.  
 11; (Hûn ji wî baxişandinê bixwazin) ji bo ku di jor da li ser we da baranê bişîne!  
 12; Ji bo ku ewa (berxudar ya we) bi mala û zaran pir bike, ji bona we ra bostan ş çeman çê bike.  
 13; (Gelî min!) ji bona we ra çî bûye; ku hûn bi kubarî gazî Yezdan nakin?  
 14; Ewî bi xweber jî hûn ji temtêlne curecure da afirandine (qey hûn naponijin).  
 15; Maqey hûn nabînin, Yezdan ça hevt ezman wekî hev afirandîye?  
 16; (Yezdan) hîv di wan (ezmanan da) xistîye rohnayî û roj jî xistîye çira.  
 17; Yezdan hîn ji zemîn (wekî çêre) hêşîn kirine.  
 18; Paşê wê dîsa we bixe zemîn, dîsa we ji zemîn derxe, carbicar aha bike.  
 19; Yezdan zemîn ji bona we ra xistîye binrax.  
 20; Ji bo ku hûn di rêne firene (di zemîn da) hatine vekirinê, bigerin.  
 21; Nûh (gava dîna xwe dayê ku şîretên wî ji bona komalê wî ra qe kêrê wan ne hatiye, ji Xuda yê xwe aha lava kirîye û) gotîye: "Xuda yê min! bi rastî ewan bê gotina min kirine û bûne peyrewê kesekê wusa, komal û zarê wî ji bona wî ra hey

zîyana wî pir kirine".

22; Ewanan endezene mezin kirine.

23; (Ji hev ra) gotine: "hûn (gelî me! bi gotina Nûh) dest ji Xudan yên xwe bernedin û hûn dest (ji Xuda yê bi nav) Wed û Sewa û Yexûs û Ye'ûq û Nesîr bernedin".

24; Bi sond! ewan bi vî awayî pir kes ji rê ya rast derxistin e. Tu bi xweber jî ji bona cewrkaran hey teşqelan pir dikî.

25; Ji ber dixelîne wan ewan (di avê da) feşirîn, îdî ketine agir. Ji bona wan ra ji peştirê Yezdan, îdî qe rastî tu arîkarî ne hatiye.

26; Nûh (aha lava kirîye û) gotîye: "Xuda yê min! tu ji bona filan ra li ser zemîn qe tu welatê nehêle".

27; (Xuda yê min!) bi rastî heke tu ewan (filan li ser zemîn) bihêlî, ewanê bendene te ji rê ya te derxin, ewanê hey filene bê xûne (cewrkar) bizêyînin.

28; Xuda yê min! tu min û da û bavê min û ewanê bi bawerî dikevîne xênîyê min û mer û jinê bawer kirine bibexşînî. (Xuda!) tu ji bona cewrkaran ra hey teşqelê pir bike

## Chapter 72 (Sura 72)

1; (Muhammed! tu ji bona wan ra aha) bêje: "bi rastî li bal min da hatiye niqandinê, ku çend nijdewanê ji cunûkan eva (Qu'ran a) guhdarî kirine û paşê ji hev ra (aha) gotine: "Bi rastî me guhdarî ya Qu'ran-eke sodret kirîye.

2; Ewa (Qu'ran a) beledî ya rê ya rast dike, îdî me jî bi wê (Qu'ran ê) bawer kir. Îdî em tu kesî naxne hempaê Xuda yê xwe.

3; Bi rastî temtêla Xuda yê me ji her kemasîyan paqij e (Xuda yê me) qe ji bona xwe ra tu hevalê jînê zar ne girtine.

4; Bi rastî nezan û evsenene me di hemberê Yezdan da mijûlîne necê dibêjin.

5; Bi rastî me guman dikir, ku meriv û cunûk li ser (navê) Yezdan derewan nakin.

6; Bi rastî mêrne ji merivan hane! xwe diavîtnê berbextê mêrne ji cunûkan, îdî meçetiran jî xwe pir qure dikirin.

7; Bi rastî (cunûkan jî) wekî we guman dikirin, ku Yezdan tu kesî (ji piştî mirinê) ranake naşîn civîne.

8; Bi rastî me destê xwe da ezmana; me (dêna) xwe dayê, ku nobedarê zor û alava (agirva) tijî bû.

9; Bi rastî ji bona guhdariyê, em di şûnê xurî da di (ezman) da rûdiniştin, îdî kîjan di naha da guhdarî bike alava nobedarekî dîdeban rastê wî tê.

10; Bi rastî me nizanîye gelo (Xuda) ji bona wanê di zemîn da sikatî va ye, ya jî Xuda yê wan ji bona wan ra qencî va ye?

11; Bi rastî ji me (cunûkan) aşîkar hene, ça ji me ne aşîkar jî hene, ji bo ku em di rê û olê cure û cure dabûn evan nemekhevyan çê dibûn.

12; Bi rastî me guman dikir ku em nikarin di zemîn da Yezdan bêzar bikin û rava me jî (Yezdan) bêzar nake (ku me celat neke).

13; Gava me bi rastî beledî bihist, îdî me bi wê (Qu'ran) ê bawer kir. Kîjan bi Xuda yê xwe bawer bike, îdî ewa bila ji kêmaya xelat û celat kirinê netirse.

14; Û bi rastî ji me Misilman jî hene û ji me jî rê ya (rast) derketî jî hene, îdî kîjan Misilman bibe, ewan li rê ya rast geryane.

15; Ewanê ji rê ya rast derketine hene! Îdî ewan ji bona doje ra bûne ardûk.

16; (Yezdan li ser gotina meçetiran aha dibêje): "heke ewan (cunûkan) di rê ya rast da bi çûnan, meyê ewan bi aveke pir av bidan (ku rojînê wan pir bibû ya).

17; Ji bo ku em ewan di qencîyan da biceribînin (ka sipasî ya qencîne me dikin, ya qe nakin. Û kîjan ji sipasî ya Xuda yê xwe rû bîfitilîne (Xuda yê wî) ewî dixê şapateke serberjêrkar.

18; Bi rastî mizgevt hemû ji bona Yezdan r anin, îdî hûn (di wan mizgevtan da) ji tu kesî ra perestî nekin.

19; Bi rastî gava bendeyê Yezdan rabûye gazî bal perestî ya wî kirîye (ewan cunûkan) nêzîk dibûn, ku wekî kulavan ( li dora Pêxember bicivin) ewî binixîmînin.

20; (Muhenuned! tu ji bona wan ra aha) bêje: "ez hey bi rastî perestî ya Xuda yê xwe dikim. Û ez ji bona Xuda yê xwe ra jî, tu kesî naxme hempa".

21; Tu (ji bona wan ra aha) bêje: "bi rastî ez ji bona we ra qe tu zîyan û rehberî nakim".

22; Tu (ji bona wan ra) bêje, "bi rastî (heke Yezdan nexwaşyekî bide min) tu kes ji

pêştirê wî min naparisîne, ez ji pêştirê Yezdan jî rastê tu kesekî, ku xwe bavêjime berbextê wî nayê.

23; Ez hey (wan bi yarne) Yezdan û pêxemberî ya wî ku li bal min da hînantîye, li bal we da radigihînim. Kîjan bê gotina Yezdan û qasidê wî bike, îdî ji bona wî ra agirê dojê heye. Ewanê di dojê da her bimînin.

24; Heya ewan, ewê şapata, ku ji bona wan ra hatîye peyman danê dibînin, îdî ewanê bizanin ka bi arîkar kê bêwec û hindikin.

25; (Muhemmed! tu ji bona wan ra aha) bêje: "Bi rastî ez nizamim; gelo ewa (şapata) ji bona wan ra hatîye peymandanê nezîke ya jî Xuda yê minê ji bona wî ra danekî dirêj çêke.

26; Zana yê bi veşartîyan, hey (Yezdan ê), îdî tu kes li ser veşartîyê (Yezdan da) nayê.

27; Ji pêştirê ewan qasidên, ku bi xweber ji bona zanîna wan ra qayîl be. Loma îdî (Yezdan) di ber û paşî ya wan (qasidan) dadîdevanan digerin e.

28; (Yezdan aha) dike; ji bona ku ewa bizane bi rastî ewan pêxemberan fermanê Xuda yê ragihandine. Û çiz anîn li bal wan heye ewî ewn hemû hildane binê zanîna xwe û hemû tişt jî jimartin e.

### Chapter 73 (Sura 73)

1; Kesê (te) xwe di kincê xwe da peçai!

2; Di şevê da rabe (perestî bike) ji pêştirê hindikê (ji şevê).

3; Di nîvê şevê da (rabe) ya jî hindik ji wî nîvî jî bibore.

4; Ya jî hinekî ji wî nîvî pir bike û tu Qu'ran ê hêdî û tîpên wî ji hev derxe, bixûne.

5; Bi rastî emê di nezîk da, gotineke giran li ser te da bavêjin.

6; Bi rastî temtêla (merivên) di şevê da rabû î (ji bona xebat û perestîyî) û xwûndinê, şidya û bi hêztir e.

7; Loma bi rastî di royî da ji bona te ra danê xebatên dirêj hene.

8; (Muhemmed!) tu bi navê Xuda yê xwe (bi xwûne) tu ji hemî (xebat û sêwrandinan) dile xwe vala bike, xurî hey li bal (Xuda yê xwe da) bizvire.

9; (Ewa Xuda yê te) Xuda yê rojhilat û rojava ye. Ji pêştirê wî, tu Yezdan ê babetê (Perestîyê) tunene, îdî tu ewî bi tenê ji xwe ra cînîşte bigire.

10; Û tu li ser gotinê wan hew bike, tu bi qencîyan dest ji wan berde.

11; Tu min û ewanê maldarên vîrek bi tenê bihêle û tu hindik dan ji wan ra bide.

12; Loma bi rastî li bal me (ji bona wan ra) serberjêr kirin û agirê doja pêketî heye.

13; Xwarinê (bi sturî) û xenoqe û şapata dilsoz heye.

14; Di wê rojê da zemîn çîyan dihejin û çîya di binê wekî tîxê qumê da dimînin.

15; (Geli merivan!) Me ça li bal Fir'ewn da qasidek, şandibû bi rastî wusa jî me li bal we da qasidek şandîye ji bo ku li ser we bibe nihrewan.

16; Îdî Fir'ewn bê gotina wî qasidê kiriye, mejî Fir'ewn bi girtinekî (zor şapat va) îdî girtîye.

17; Erê heke hûn filetî ya wî bikin, ka hûnê ça (ji şapata) wê roya, ku zar tê da kal dibin, xwe biparisînin?

18; Ezman (ji tîrsa) di wê royî da çiryaye. Bi rastî peymana (Yezdan bi şapatdana wan) pêk hatîye.

19; Bi rastî evan(beratan) şîret in, îdî kîjan hez bike, ewa (ji bo çûna) li bal Xuda yê xwe da rêyekî digire.

20; Bi rastî Xuda yê te dizane, ku tu ji sê parê şevê nêzîkê duparan, yan jî nîvê şevê, yan jî sê parê şevê, di parekî da radibî (nimêj dikî). Destekî ji wanê bi ter a jî (wekî te radibin, Xuda yê xwe te bi wan jî dizane). Pîvandîna şev û royan Yezdan dike. Ji ber ku ewî dizanibû, hûn nikarin (danê xweyê şevê) bipîvin (di wan danan da ranabin) îdî ewî hûn (ji hijmara wan danan) baxişandîne. Îdî ji Qur'an ê (ji bona we ra) çi hêsaîye, ewî bixwûnin (zor nedine xwe)! Ji ber (Yezdan) zanibû, ku wê ji we nexwaşê hebin û destekî ji we di zemîn da ji rûmeta wî rojînê xwe bigerin û destek jî di rê ya Yezdan da qirînê (bi wanê file ra) bikin (eva hêsaya hanê, ji bona we ra pêk anî). Îdî (geli bawerkeran!) ji (Qu'ran ê ji bona we ra) çi hêsaîye, hûn ewî bixwûnin (zor nedine xwe). Hûn nimêj bikin û baca malê xwe bidin, hûn ji bona qayîlbûna Yezdan, bi qencî ji hev ra deynan bidin. Hûn ji bona xwe ra

ji qenrîyan çi pêş da pêk bînin, hûnê li bal Yezdan rastê wî werin, ku ewa (ji bona we ra) qencîyeke û meztirê kiryanê. Hûn baxişandina xwe ji Yezdan bixwazin, loma bi rastî Yezdan baxişkarê dilovîn e.

#### Chapter 74 (Sura 74)

- 1; Yê xwe di kinca da pêçayî!
- 2; Tu rabe, îdî tu (merivan) hişyar bike.
- 3; Û tu Xuda yê xwe (ji hevritî ya pûtan) bi mezinahî paqij bike.
- 4; Û tu îdî cilê xwe paqij bike.
- 5; Û tu îdî dest ji pîsî ya berde.
- 6; Û tu tilfa bi kirina xwe neke, ji bo ku tu (hember ya wan) pir hildî.
- 7; Îdî tu ji bona (qayîlbûna) Xuda yê xwe ra hew bike.
- 8; Îdî gava (ji bona hewarê) di stûrî da hatibe qîkirinê.
- 9; Îdî ewa roya royeke pir tenge.
- 10; Li ser filan qe hêsaî nîne.
- 11; Tu min û ewî (fileyê) ku min ewa rût afirandîye bi tenê bihêle.
- 12; Min ji bona wî ra malê peyweste daye.
- 13; Û zarên xûyaî jî daye.
- 14; Û min ji bona wî ra qencî raxistibû.
- 15; Paşê ewî jî dixwast, ku ez ji wî ra hêj pir bikim.
- 16; Na! (ez ji bona wî ra pir nakim) loma bi rastî ewa ji bona beratene me ra înçkar bûye.
- 17; Di nêzîk da bi rastî ezê ji bona bilindî ya wî ra (şapatan) raxim.
- 18; Bi rastî ewî raman kirîye û pîva ye.
- 19; Îdî ewa bîmire (hatîye kuştinê) ka ewî ça pîva ye?
- 20; Paşê dîsa ewa bîmire, ka ewî biçi awayî pîva ye?
- 21; Paşê li wan (pîvanê xwe) mêze kirîye.
- 22; Paşê murûzê xwe kirîye û rûye xwe tîrş kirîye.
- 23; Paşê pişta xwe daye xwe qure kirîye.
- 24; Îdî (aha) gotiye: "Bi rastî eva (Qur'an a) ançeke; ji şopa wan ançne borîne."
- 25; Bi rastî eva (Qur'an a) hey gotinêmerivan in.
- 26; Di nêzîk da ezê jî ewî bavêjime (doja) sar.
- 27; Tu ji kû dizanî gelo ka (doja) sar çîye?
- 28; (Ewa doja) di para da tu tiştî nahêle û tu kesî bernade.
- 29; Ewa (doja) çerman hişk dike.
- 30; Li ser (wê dojê) nuzdeh (ferîşteyên fermande) hene.
- 31; Ji bona ku ewanê pirtûk ji wan ra hatîye bizanin bi rastî ewa pirtûka ji wan ra hatîye maf e û bawer ya wanê, ku bawer kirine jî pir bibe û ji bo ku ewanê ji wan ra pirtûk hatîye û ewanê bawer kirine dudil nebin û ji bona ku ewanê di dilê wan da nexwaşî heye û ewanê bûne file (aha) bêjin, ka Yezdan bi van hecwekîyan çi va ye? Me hevrîne dojê hey ji ferîştan çê kirîye, me hêjmara wan (ferîştan) ji bona wanê, ku bûne fîne raxistîye ceribandin. Bi vî awayî Yezdan ji kîjanî ra bivê, rê ya xwe li ber wî wunda dike û ji kîjanî ra jî bivê, ewî tîne rê ya rast. Ji pêştirê Xuda yê te tu kes bi hêjmara leşkerê wî nizan e. Ewa (doja sar) ji bona kesan ra hey şîretek e.
- 32; Nal (bi gotina wan filan nîne) bi hîvê.
- 33; Û bi danê şevê gava dizvire diçe.
- 34; Û bi danê sibehê jî gava zer dibe.
- 35; Sond dixum, ku ewa (doja sar) yek ji wan (şapatên) mezin in.
- 36; (Ewa doja) ji bona merivan ra hişyar bûnek e.
- 37; (Her wusan jî) ji we kîjanê bivê, ku di qencîyan da pêş û paş da bikeve, ji bona (wî ra jî hişyar bûnek e).
- 38; Her kesek gerewa kirina xwe ye.
- 39; Ji pêştirê (wanê pirtûka wan) li rastê wan da hatîye dayînê.
- 40; Ewanan di behîştandan in.
- 41; Ji gunehkaran dipirsin.
- 42; Gelo çi tiştî hûn xistine vê (doja) sare qeremok?
- 43; Ewan (aha) pisyara wan dane û gotine: "Bi rastî em ji wanê nimêjker ne bûn."
- 44; Me ji bona belengazan ra jî xurek ne dida.

45; Û em bi leyîztik hazan ra noqê leyîztikê dibûn.  
 46; Û me bi roya xelat û celatan vir fikir (bi wê bawer ne fikir).  
 47; (Em di van kirinan da bûn) heya mirina me hat.  
 48; Îdî meherdêr ya tu mehdervanî kêrê wan ne hat.  
 49; Bi vî ra jî gelo ji bona wan ra çi bûye ku ewan (ji Qur'an ê) rû difetilînin?  
 50; Tu dibê qey ewan kerên kovîn e.  
 51; Ji şêran silikîn e.  
 52; Na! (ewan ji wan şîretan hiş hilnadin) lê divên, ku ji bona wan heryekê ra rûpelên vekirî li ser navê wan ji Xuda yê wan bihata, paşê bawer bikin.  
 53; Na! (ji bona wan ra ewan rûpelan nayên) lê ewan ji (şapata) para da natirsîn (loma bawer nakin).  
 54; Na! (bila ewan ji wan kirinê xwe para werin) loma bi rastî ewa (Qur'an a) hişyar bûneke (sedritî ye).  
 55; Îdî kîjan bivê, ji bona xwe ra ji wê (Qur'an ê) şîretan hildide.  
 56; Ji pêştirê wanêYezdan va ye, ku ji (Qur'an ê) şîretan hildin, qe tu kes şîretan hilnade. Bi rastî (Yezdan) babete ji bo parizî û baxişandinê ra.

#### Chapter 75 (Sura 75)

1; Ho! Ez bi roya qarsê sond dixum.  
 2; Û ho! ez bi canê, ku (li ser kirinê xweyê sik) li xwe tatan dike sond dixum.  
 3; Qey meriv guman dikin, ku ji (piştî mirinê) em hestûyê wan nacivînin?  
 4; Erê! (emê hestûyê wan bicivînin) em dişên, ku momikê tilîyê wan jî rast bikin.  
 5; Lê bi rastî meriv di vên, ku di berxwe da jî (aşîtan) derxin (loma bi peyweste gunehan dikin).  
 6; (Bê tebat) meriv dipirsîn; ka roya qarsê kîngê ye?  
 7; Îdî gava çav dibirûs e.  
 8; Û rûyê hîvê hatibe girtinê.  
 9; Û roj û hîv bi hev ra civyabin.  
 10; Di wê royê da meriv (aha) dibêjin: "Ka merivê kuda bireve?"  
 11; Na! (rev çenebe) loma tu penah tune ye.  
 12; Di wê royê da hewandin hey li bal Xuda yê te ye.  
 13; Di wê royê da ji bona merivan ra tiştê ewan pêş û paş xistîye tê gotinê.  
 14; Bi rastî (di wê royê da) meriv li ser xwe; bi kirin û ne kirinê xwe dîdevan e.  
 15; Çiqa hinek tatê xwe jî bêje.  
 16; (Muhemmed!) tu zimanê xwe (hêj di berya dawî ya niqandê nehatî ye) ji bona lez kirina (ezber ya Qur'an ê) ne hejîn e.  
 17; Loma bi rastî civandin û xwundina wê (Qur'an ê) li ser me ye.  
 18; Îdî gava me Qur'an xwund, tu jî îdî bibe peyrewê wê xwundinê.  
 19; Paşê bi rastî huzwartina wê (Qur'an ê) li ser me ye.  
 20; Na! (hûn ji lezbûnê para naçin) lê hûn ji lezbûnê hez dikin.  
 21; Û hûn dest ji para da jî berdidin.  
 22; Di wê royê da hinek rû hene, ji bedewî ya xwe diçilwulin.  
 23; Li bal Xuda yê xwe da mêze dikin.  
 24; Û di wê royê da hinek rû jî hene, temirîn e.  
 25; Loma guman dikirin, ku wê hestûyê piştê wan bê şikênandinê.  
 26; Na! (bira lez nekin). Lê gava can gihîjte pira hestûyê stû.  
 27; Û (aha) bê gotinê: "Gelo kê dikare (ewî derman bike) rake".  
 28; Û ewî guman kirîye, ku bi rastî îdî danê raqetandina wî ji cihanê ye.  
 29; Îdî (ji zerpa mirinê) çiq li hev aylan e.  
 30; Di wê royê da hey şandin li bal Xuda yê te da ne.  
 31; Îdî ewî (fileyê) rastdarî û nimêj ne kirîye.  
 32; Lê hey vir kirîye, piştê xwe da ye wan.  
 33; Paşê çû ye bal malîne xwe, xwe qure kirîye.  
 34; Îdî (mêriko!) xwelî ji bona te ra be, xwelî li serê te be.  
 35; Dîsa xwelî ji bona te ra be, xwelî li serê te be.  
 36; Maqey meriv guman dikin, ku merivê bahorde bê berdane?  
 37; Maqey ewa (meriva) ji aveke hilwejoke bînketî çi ne bûye?  
 38; Paşê bûye zûryekî, îdî (Yezdan) ewa afirandîye û pêk anîye.  
 39; Îdî (Yezdan) ji wê du zon e; nêr û mê çê kirîye.

40; Maqey ewê ku, evan (bi afirîne) naşê ku miryan zende bike!

#### Chapter 76 (Sura 76)

- 1; Bi sond! meriv qe hêj tu tişt ne bûye, ku navê wî bihata gotinê; dan û demê pir dirêj li ser da boriye (paşê ji xalya qîmîtiye bînketi hêdî hatiye afirandinê).
- 2; Bi rastî mc meriv di temtêlne pey hev da, ji aveke tevlihevê (ji nêr û mêyan) afirandiye, îdî ji bo ku emê ewî biceribînin, me ji bona wî ra bihîstin û dîtin çê kirîye.
- 3; Bi rastî me ji bona wî ra rê nîşan daye, îdî ewa (meriva) ya sipazî û ya ji nankorî dike.
- 4; Bi rastî me ji bona filan û nankoran ra, zincir û bend û doja hilopît amade kirîye.
- 5; Bi rastî ewanê qenc jî hene! ewanan, meya ku tevê kafûrê bûye, di şelbikan da vedixwun.
- 6; (Ewa meya) kanyeke wusane, bendanê Yezdan ji wê (kanîye) vedixwun. (Ewanbendan ewê) kanîyê ça bixwazin, wusa didine kişandinê.
- 7; Ewan (qencan) gorîne xwe pêk tînin. Ewanan ji wê roja ku aşîta wê belav dibe ditirsîn.
- 8; Bi hez kirina xwe, xurekan ji bona belengaz û sewî û zebûnan ra didin.
- 9; Ewan (ji bona hewcan ra aha dibêjin): "Em hey ji bona qayîlbûna Yezdan bi we didine xwurinê. Loma me ji we qe xelat û sipazî navên.
- 10; Loma bi rastî em di roja rû tirş û bi mirûz da ji (şapata) Xuda yê xwe, ditirsîn.
- 11; Îdî Yezdan jî ewanan ji şapata wê royê parisandin û Yezdan ji bona wan ra (rûyekî) bi ken û (dilekî) fire daye.
- 12; Bi sedema, ku ewan li ser (cefan) hew kirine, xelata wan (di wê royê da) behîşt û hevirmûş e.
- 13; Ewanan di (behîştê da) û ser kursîyan paldayîne ewanan di (behîştê da) germa (şewatok) û serma (qermandok) nabînin.
- 14; Û sîne (darê behîştê) bi ser wan da hatiye vegirtinê, çiqilên (daran ji bona weşandina beran) berjêr bûne, hatinê jêrê.
- 15; Bi firaqê ji zîv û bi misînên ji biloran li ber wan digerin.
- 16; Ewan îstekanê ji zîv in, bi pîvandî hatine pêk anînê.
- 17; Û ewanan (di behîştê da) bi aveke wusa têne avdanê, ku ewa (ava) bi zencefilê hatine tevdane (di wan şûşan da) vedixun.
- 18; Eva di (behîştê da) kanyeke jêra selselbîl tê gotinê.
- 19; Ewan (vexurînan) zarên, ku di (behîştê da) hermaîne li dora wan da digerin.
- Gava tu (ewan zaran) dibînî, tu dibê qey luluyê zêr kildayîne.
- 20; Tu çi gavê li wura mêze bikî (tu di wura da) qencî û maldar ya mezin dibînî.
- 21; Li ser (behîştîyan) kincê ji hevirmûşê kesk û birqonek hene. Ewan ji bazînê zîv xwe xemilandî e. Xuda yê wan, ewan bi aveke paqij dane avdanê.
- 22; Bi rastî ewa ji bona we ra xeleteke û xebata we hatiye sipaz kirinê (litê kirinê).
- 23; (Muhammed!) bi rastî me Qur'an bi vekirî li ser te da hîmartî ye.
- 24; Îdî ji bona berawanî ya Xuda yê xwe tu hew bike û tu ji wan (filan) qe bigotina tu gunehkar û nankoran neke.
- 25; Û tu bi navê Xuda yê xwe di sibeh û êvaran da perestî bike.
- 26; Û di hinekî şevê da, îdî tu ji (Xuda yê xwe ra) kunde behere û tu di şeva dirêj da jî perestî ya (Xuda yê xwe) bike.
- 27; Bi rastî ewanan (ji vê cihana) zû çûyî hez dîkin û dest ji wê roja girane pêş ya xwe da berdan e.
- 28; Me ewan afirandine û me (momikên wan) pevixistine û ewan bi hez kirine û gava em bivên jî, emê ewanan bi hinekî wekî wan ra biguhurînin.
- 29; Evan beratan şîret in; îdî kîjan bivê, wê li bal Xuda yê xwe da ji bona xwe ra rêyekî bigire.
- 30; Û hûn bi xweber jî ji pêştirê vîna Yezdan qe tu tiştî navên. Loma bi rastî Yezdan pirzanê bijejke ye.
- 31; Ewa ji kîjanî ra bivê ewî dixê nava dîlovanî ya xwe. Ewî ji bona cewr karan ra jî şapateke dilsoz amade kirîye.

Chapter 77 (Sura 77)

- 1; Bi wan (bayê) şandayê (peywestene) ji bona qencîyan.
- 2; Bi wan (bayê) bagerok.
- 3; Bi wan (bayê) vekerokê (tiştan e).
- 4; Bi wan (bayê) ji hev derxistok.
- 5; Bi wan (bayê) bûyerên (borî) tîne bîra merivan.
- 6; Tatan û ya jî hişyarîyê.
- 7; (Sond dixum!) tiştê ji bona we ra hatîye peymandanê, wê hatibe.
- 8; Îdî gava sitêrk biçilmisin.
- 9; Ê gava ezman ji hev çirya (ji hev çû).
- 10; Gava çîya hatine jenandinê.
- 11; Ê gava qasid (ji bona nihrewanîyê) danê ra dewanîyê dabe.
- 12; (Aha tê gotinê): "Ji bona kîjan royê "Dan" para hatîye danînê?
- 13; Ji bona roja berewanî (tê da tê kirinê).
- 14; Tu ji ku dizanî, ka roja berewanîyê çîye?
- 15; Di wê royê da, xwelî li derewdêran be!
- 16; Maqey me ewan (virekê) berê teşqe ne kirîye?
- 17; Paşê emê ewanê para da mayî jî bûne peyrewê wan.
- 18; Bi vî awayî em gunehkaran (celat) dîkin.
- 19; Di wê royê da xwelî li derewdêran be.
- 20; Maqey me hûn ji aveke sîke tîr ne afirandîne?
- 21; Îdî me eva (ava) di ewreke parisvane bi hêz da cîh kirîye.
- 22; Heya danekî dîyarî.
- 23; Îdî me ewa (ava) pîva (xistiye meriv). Îdî pîvdanok çîqa qenc e!
- 24; Di wê royê da xwelî li derewdêran be.
- 25; Maqey me zemîn ne xistiye şûna civînê?
- 26; Ji bona zindî û miryan.
- 27; Ê me di zemîn da çîyane bilindê dirêj binecî danîne û me hûn bi ava hêsaî û şîrin dane avdanê.
- 28; Di wê royê da xwelî li derewdêran be.
- 29; Hûn (gelî filan!) li bal wê (şapata) ku we bi hatina wê derew dîkinir, herin.
- 30; Hûn li bal wê sî ya (doja) sê şax da herin.
- 31; Ewan (sîyan) sîwanê nakin û ji pêtê agir jî (naparisînin).
- 32; Bi rastî ewa (doja) pêtê wusa devêje, ta dibê qey wekî koşkan in.
- 33; Ewan (pêtê hatine avêtinê) tu dibê qey pîletê keleka nin (ji agirê) sor (dirêj bûne).
- 34; Di wê royê da xwelî li derewdêran be.
- 35; Eva roja royeke wusane qe ewan tê da na-axivin.
- 36; Ji bona wan ra destûr nayê dayînê heya, ku ewan tatê xwe jî bixwazin.
- 37; Di wê royê da xwelî li derewdêran be.
- 38; Ewa roja (ku pûçî û rastî ji hev ra diqete) eva ye. Emê we û ewanê berya we da (di vê royî da) bicivînin.
- 39; Îdî heke ji bona we ra endeze hene (ku hûn xwe bi wan fereste bikin) ka ji bona xwe ra endezan bikin.
- 40; Di wê royê da xwelî li derewdêran be.
- 41; Bi rastî Xuda-pariz di nava sîwan fi kanî ya danin.
- 42; Di nava êmişên dilxwastî danin.
- 43; Hûn (gelî Xuda parizan!) bi sedema kirinê xwe bigivirandin bixwun û vexun, noşê canê we be.
- 44; Bi rastî em bi vî awayî qenckaran xelat dîkin.
- 45; Di wê royê da xwelî li derewdêran be.
- 46; (Gelî gunehkaran!) hûn hindik bi xwaşî bixun û bijîn. Qe (tu zîyan tune) bi rastî hûn gunehkar in.
- 47; Di wê royê da xwelî liderewdêran be.
- 48; Gava ji bona wan ra hatîye gotinê: "Hûn ji bona (Yezdan ra) xwe kûz bikin. Ewan (ji bona Yezdan ra biperestî) xwe kûz nakin.
- 49; Di wê royê da xwelî li derewdêran be.
- 50; Îdî gelo ji piştî (Qur'an ê) ewanê bi kîjan axiftinê bawer bikin?

## Chapter 78 (Sura 78)

- 1; Ewa (filan) çi tiştî ji hev dipirsin?
- 2; (Qey) ewan ji wê Peyva (Qarsîya) mezin ji hev (dipirsin?)
- 3; Ewa (Qarsî ya) ku ewan (di hebûna) wê da ne wek hevbûne.
- 4; Na! Bi rastî (wekî gotina wan nîne, lê ewanê) di nêzîk da bizanin.
- 5; Paşê (dîsa wekî gotina wan nîne, lê ewanê) di nêzîk da bizanin.
- 6; Maqey me zemîn (ji bona wan ra) nexistîye hêlan?
- 7; (Me) çîya jî (ji bona zemîn ra ne xistîye) sing?
- 8; Û me hûn bi zotî afirandine.
- 9; Me xewa we jî (ji bona ew ra) xistîye rawestandî.
- 10; Û me şev jî (bi tarîti ya wê va ji bona we ra) xistîye xewkirin.
- 11; Û me roj jî (ji bona we ra) xistîye (danê) jînê (ji bo ku hûn tê da bixebitin).
- 12; Û me di jora we da heft ramaxne bi hêz ava kirîye.
- 13; Û me (di wan ramaxana da) çirane çilwulok çêkirine.
- 14; Û me ji ewrne givaştok aveke şîroke hinartîye.
- 15; Ji bo ku em bi wê (avê) lub û hêşnayan derxin.
- 16; Û em (bi vê avê) bax û rezne li hevalyaî (derxin).
- 17; Bi rastî roja (pûçaî û maf) ji hev radiqete heye! Bûye danê radewa ê.
- 18; Hûnê di roja di stûrî da tê puf kirinê, îdî destê destê werin.
- 19; (Di wê rojê da) ezman vebûye; îdî derî derî çêbûye.
- 20; Û çîya (ji şûna xwe) hatine ajotinê, îdî bûne leylan.
- 21; Bi rastî doj jî bûye dîdevan.
- 22; Ji bona wanê rê derketî bûye êwir.
- 23; Ewanê di wura da pur danan bimînin.
- 24; Ewan (di dojê da) saritî û ave çeşne nakin.
- 25; Hey hîlmojek û kême (çeşne dîkin).
- 26; Eva celata (ji bona kirinê wan ra) gavîkan bûye.
- 27; Loma ewan guman ne dikir, ku wê kirinê wanê bêne hijmartinê.
- 28; Û ewan beratene me bivir di dane derewdêrandinê.
- 29; Û hemî tişt me bi nivîsarî hijmartîye.
- 30; Îdî hûn çeşna (kirinê) xwe bikin, îdî em ji bona we ra hey şapatê pur dîkin.
- 31; Bi rastî ji bona Xuda parizan ra serfirazî hene.
- 32; Bostan û rezê tîryan (hene).
- 33; Perîne hevsaî, ku memikne wan hêj gulîkdane (hene).
- 34; Û kasikne tijî mey (hene).
- 35; Ewan (Xuda parizan) di wura da vir û mijûlîne kêrnehatî nabihên.
- 36; (Eva) xelata ji Xuda yê te (ji bona wan ra hatîye dayînê) dayîneke wusane nayê hijmartinê.
- 37; Xuda yê ezman û zemîn û di nîveka wan herdukan da heyî (Yezdan ê) diloan e; ewan (heyana) qe ji wî mijûl nabin.
- 38; Di wê rojê da can û fereşte gargî dibin, li bal wî ji pêştirê wîyê ku Yezdan ê diloan ji bona wî ra destûra axiftinê daye û gotinê qencî bêje, qe tu kes nikare bi axive.
- 39; Roja mafê (ku hatîye peyman danê) evaye. Îdî kîjan bi vê ewa li bal Xuda yê xwe (ji bona xwe ra) êwrekî digire.
- 40; Bi rastî me hûn bi şapateke nêzîk dane hişyarkirinê. Di wê rojê da meriv li bal wan tiştne, ku hêj di berê da kirîya mêze dike û file (aha) dibêje: "xwazîka ez xwelî bûma (ne hatîma vê derê)."

## Chapter 79 (Sura 79)

- 1; Bi wan (fireştene) can sitandne fereşandok.
- 2; Bi wan (fireştene) ku canan bi hêsanî distînin (û dev) bi kenin.
- 3; Û bi wan sitêrke (di hewa da) melevanî dîkin.
- 4; Û bi wan (fireştene) daberhevne (ku ji hev) di borin.
- 5; Bi wî yê ku bûyerana pêk tîne (sond di xum)!
- 6; Ku roja (di stûrî da tê puf kirinê) hej (bi zemîn digire û ) di heje.
- 7; Li peyda jî hejeke dinê digire.
- 8; Di wê rojê da dil (ji mirûzûyê) di silikin.



9; Çavê (xweyê wan dilan ji tirsar) di telisin.  
 10; (Aha ) dibêjin: « ma qey bi rastî (ji piştî mirina me, ku em ketine goran) dîsa emê (wekî temtêla xweyê berê) rabin? »  
 11; « Qey gava em bibûna hestûyê rizî jî ? »  
 12; Ewan (aha) gotine: « bi rastî (eva) zivirandina zîyaneke.  
 13; Îdî (eva) bi rastî zaroke bitenê ye.  
 14; Nişkêva ewan hişyar bûn e.  
 15; Bi sond!ji tera dabaşa (serdaborya) Mûsa hatîye.  
 16; Gava Xuda yê (Mûsa) di newala pîrozê (bi nav) « Tuwa » da gazî wî kirîye.  
 17; (Ji ra aha gotîye): « tu here bal Fir'ewn, loma bi rastî ewa ji avaril derketî ye ».  
 18; Îdî tu (ji bo wî ra aha) bêje: « tu hez dikî, ku ez beledîya te li bal rîya rast da bikim, ku tu (ji sikatîyan) fereste bibî? »  
 19; Heke îdî tu (ji Xuda yê xwe , yan jî ji danê dawîyê) bi tirsî, ezê belidî ya te li bal Xuda yê te da bikim.  
 20; Îdî (Mûsa) beratenê mezin daye nişanê Fir'ewn.  
 21; Paşê (Fir'ewn)ewan (beratan) dane derewdêrandinê, serî hilda.  
 22; Paşê piştî (xwe daye Mûsa) bi lez çû ye.  
 23; (Merivê xwe) civandin îdî (aha) li wan çir kirîye.  
 24; Û (aha ji bona wan ra) got : “bi rastî ez xudayê weyê bilintirê mezin im.”  
 25; Îdî Yezdan ewa wusa şapat kir, ku ewa bi wê şapatê ji bona wanê borî û para da tèn bûye (bereketa sodret).  
 26; Bi rastî ji bona wanê , ku (ji Yezdan) ditirsîn di van (bûyeran da) beratenê sodret hene.  
 27; Gelo di afirandinê da (ji piştî mirinê) ku hûn tene afirandinê zor e, yan jî (afirandina) ezmanan ? (ewî ezman) ava kirîye.  
 28; Ewî (ezman )di jor da bilind kirîye, îdî wekî hev rast kirîye.  
 29; Û şeva wî (ezmanî) tarî kirîye, roja wî ronahî kirîye.  
 30; Paşê (Yezdan) zemîn jî gulok kirîye.  
 31; Ewî ji zemîn, av û kovîçêrê wî derxistîye.  
 32; Û çiyane (zemîn jî) di zemîn da birakutî şandî ye.  
 33; Ewî (evan) ji bona wê û ji bona tarişê we ra kirine (j ibo ku hûn daborîya xwe pêk bînin).  
 34; Îdî gava ewa aşîta mezin hat (hemû tişt hildan e binê xwe, tune kirîye).  
 35; Di wê rojê da merivan çî kiribin tînin e bîra xwe.  
 36; Û doj jî ji bona wanê dibînin ra xuya bû ye.  
 37; Îdî kîjan ji (rîya rast derketibe) avarû rijandibe.  
 38; Û jîna cihanê ji xwe ra helbijartin e.  
 39; (Ji bona wî ra) bi rastî ewra wî doj e.  
 40; Û kîjan jî ji (hewandina di hemberê) Xuda yê xwe tirsîyabe û xwe ji xwastina canê xwe parisandibe.  
 41; (Ji bona wî ra) bi rastî ewra wî hey bihêşt e.  
 42; Ewan ji te danê qarsê dipirsîn ; ka danê şandina (qarsê) kengê ye ?  
 43; (Heke Yezdan nebe) tu ji kêderê dikerî (zanîna bi danê qarsê) bêjî ?  
 44; Dawîya (zanîna )ji wî danî hey li bal Xuda yê te ye.  
 45; (Muhemmed!) tu hey dikarî ewanê ji (hejmara di roja qarsê da) ditirsîn, bidî hişyar kirinê.  
 46; Gava (ewan) wê rojê dibînin tu bidê qey ewan (di cihanê da) şevêkî, yan jî danê taştî ya wê (şevê) man e (wusa diqilqilin).

#### Chapter 80 (Sura 80)

1; Rûyê xwe tirsî kirîye û piştî xwe (daye).  
 2; Ji bo ku ewa kora hatîye.  
 3; Tu çî dizanî? Bi rastî dibe ku xwe paqij bike.  
 4; Yan jî şîretan bike, îdî şîret kêrî wî werin.  
 5; Lê ewê, xwe hewce nabîne.  
 6; Îdî tu ji bo wî ra raber dibî.  
 7; Û çî ji te ra ku ewa xwe ji (filetîyê) paqij nake.  
 8; Lê ewê bi lez hatîye bal te.

9; Ji (Xuda) tirsîyaye, loma hatîye.  
 10; Îdî tu jî ji wî rû difetîlînî!  
 11; Na! (wusa nabe) loma bi rastî (Qur'an) şîretek e.  
 12; Îdî kîjan ji vê, wê ewê şîretê hilde.  
 13; Ewa (Qur'an a) di rûpelne rûmetdar danin.  
 14; Bilind û paqij e.  
 15; Di destê balyozne (ji firêşte danin).  
 16; Ewan (firêştan) rûmetdar û qencîkar in.  
 17; Xwelî li meriva be, çiqaş nankor in.  
 18; (Gelo) ewa (meiva) qe mêze nake, ka (Yezdan) ewa ji çi afirandîye?  
 19; (Yezdan) ewa ji aveke tîre avotek afirandîye, îdî paşê ji wî ra rûçik daye.  
 20; Paşê (Yezdan) rêya wî hêsanî kirîye.  
 21; Paşê (Yezdan) ewa mirandî ye, îdî ewa xistîye gorê.  
 22; Paşê gava (Yezdan) bivê dîsa ewî zindî dike(di weşîne).  
 23; Na! (gotina merivan nîne) bi rastî tişta (Yezdan ferman) kiribû; ewî pêk ne anîbû.  
 24; Îdî bila meriv carekîli bal xurekê xwe ra mêze bike.  
 25; Me ça (ji bona pîranîya xwarina wî) aveke pîr rijandî ye.  
 26; Paşê me zemîn (ji bo hêşinaîyê) ça çirandî ye.  
 27; Îdî me (di zemîn da) lub hêşîn kirîye.  
 28; Û (me) tirî û nefel jî (hêşîn kirîye).  
 29; Û me zeytûn û xurme jî (hêşîn kirîye).  
 30; Û (me) bostanne (darê wan) ji hev derbvaz bûyî jî (hêşîn kirîye).  
 31; Û (me) êmiş û mêrg jî (hêşîn kirîye).  
 32; Ji bona (ku hûn daborya xwe pêk bîn in) me evan ji bona we ûtarişê we ra pêk anî ye.  
 33; Îdî gava dengê ku ji (bona) rabûna we ra te, guhan ker dike.  
 34; Di wê royê da meriv, ji birayê xwe direv e.  
 35; Û ji dîya xwe û ji bavê xwe jî.  
 36; Û ji hevalê jîna xwe û zarê xwe jî.  
 37; Di wê royê da ji bona heryekê ji wan ra temtêleke wî heye, ewa îdî hewcê tişteki nabe,  
 38; Di wê royê da hinek rû hene diteyîsin  
 39; Mizgînvani bi hev diken in.  
 40; Û di wê royê da hinek rû jî hene bi gemar in.  
 41; Reşatî û taritî ewan rûyan niximandin e.  
 42; Filene gunehkar evan bi xweber in.

#### Chapter 81 (Sûra 81)

1; Gava roj hate pêçandinê, herikî.  
 2; Û gava siterk (ji hev) verişîn ketne xarê.  
 3; Û gava çîya (ji zemîn bûne leylan) çûn.  
 4; Û gava dest ji malê civyayî hate berdanê (ya jî gava dest ji wê dema deh meh li ser da borî; gavê zayîna wê hatîye, hate berdanê).  
 5; Gava (tarişê) hov hatîne civandinê.  
 6; Û gava avşîn li ser hev da kelîya, tevê hev bû.  
 7; Û gava can bi hev ra zo dibin.  
 8; Û gava ji keça hêj bûyî hate pirsînê.  
 9; Ji bo çi ewa hatîye kuştinê (bi zindî hatîye çal kirinê)?  
 10; Û gava rûpelên defterên (kirinan) tene vekirinê.  
 11; Û gava rûyê ezman ji dûmanan hate vekirinê.  
 12; Û gava doj bi pêtê agir hate pêxistinê.  
 13; Û gava behîşt nêzikê (merivan) bû.  
 14; Hemî kes dizane, ka (ji bona xwe ra) çi amade kirîye.  
 15; Ho! ez bi wan (siterkên ku di rojê da) tene veşartinê.  
 16; Di şevê da (wekî asan-xezal di guherê xwe da) dicivin.  
 17; Bi wê şevê, gava pişta xwe (daye taritîyê).  
 18; Bi wê sibehê gava ruhnaya wê derdikeve û bêhna xwe dide.  
 19; (Sond dixum!) evanê (Muhemmed ji bona we ra dibêje) peyvê qasidekî (Yezdan ê)

ku bi rûmet û dilşad e.

20; Ewa qasida li bal (Yezdan ê) xweyê arşê bi hêz û xweyê cî ye.

21; Bi gotina wî (qasidê) tê kirinê û ewle ye.

22; Û hevalê we bi xweber jî tepa ketî nîne.

23; Û bi sond! (Muhemmed) ewa (qasida) li bêlanê bilindê xûyayî da dîtîye.

24; Û (Muhemmed) bi xweber jî ji bona (niqandina Qur'an ê bi ne xûyayî) nayê rexnekirinê.

25; Ewa (Qur'an a) gotina pelidê deherandî jî nîne.

26; Îdî bi vira jî ka hûn kuda diçin (û bi çi bawer dikin)?

27; Ewa (Qur'an a) hey ji bona hamû gerdûnê ra şîretek e.

28; Ji bona wî kesê ji we, ku divê xwe rast bike (şîret e).

29; Hûn bi xweber jî hey tiştê Yezdan ê Xuda ê cihanê va ye, dikarin ji bona xwe ra bivên.

## Chapter 82 (Sura 82)

1; Gava ezman çir ya.

2; Û gava siterk verişin (ketne) xarê.

3; Û gava avşin keliya tevê hev bûn.

4; Û gava goran (xwelî ya xwe avîtin mirî) ji xwe derxistin.

5; Hemî can dizanin ka ji bona xwe ra çi tişt kirin e, pêşta (şandin e) û çi tişt ne kirin e para da (hiştin e).

6; Merivo! gelo tiştê, ku tu ji Xuda yê teyê bi rûmetê dilşa çiya xapandîyî dûrxistîyî çîye?

7; Ewê tu afirandî, îdî tu rast kirî û tu xistî rûçikê merivan, ewa ye.

8; (Ewa) di kîjan rûçikî da bivê, te wusa berêk dike.

9; Na! (bi gotina we nîne, loma hûn bi na bawerî ya xwe bi tenê na hewin) lê hûn roya xelat û celatan jî didin e derewdêrandinê.

10; Bi rastî li ser we da (feriştênê) qencî nivîsarokan hene! (hûn çi dikin) ewan (feriştan, ewan kirinê we) diparisin in.

11; Ewan (feriştan) qencê (nivîskaran in (loma kêr û pir nanivîsin in).

12; Hûn çi bikin ewan (feriştan) pê dizan in.

13; Bi rastî (merivên) qencîkar (di behiştê xuraka dan in).

14; Û bi rastî (merivên) gunehkar jî di doja (şewatê dan in).

15; Di roya xelat û celatê da (li bal dojê ta) tî e avîtin e.

16; Ewan qe (ji dojê) wunda nabin (dernakev in).

17; (Muhemmed!) ka tu ji kûderê dizan î, roya xelat û celatan çîye?

18; Paşê dîsa (Muhemmed!) ka tu ji kûderê dizan î, roya xelat û celatan çîye?

19; Ewa royeke wusaye kesek ji bona kesekî ra kêrê tu tiştî nayê. Di wê royê da hemî ferman ji bona Yezdan ra nin.

## Chapter 83 (Sura 83)

1; Ewanê ku di kêş û pîvandina xwe da kemasî dikin, xwelî li wan be.

2; Ewanan gava tişteki ji merivan bistînin; pîvandina wî bê kêmasî pêktî in.

3; Gava ewan ji bona merivan ra bipîvin ya jî bikişin in; ewan di kêş û pîvandina xwe da kêmasî dikin.

4; Maqey ewan guman nakin ,ku wê ewanê (ji piştî mirinê) rabin herne civînê?

5; Ji bona royeke mezin (wê rabin).

6; ku di wê royê da meriv radibe (hijmara kirinê xwe) ji bona Xuda yê cihanê ra (dide).

7; Na! (gotî ewan kêş û pîvanê xwe bi kêmasî nekin) loma bi rastî nivîsara (kirinê) gunehkaran di sicîlan da hatiye pêk anînê.

8; (Muhemmed!) tu ji ko dizanî ka sicîl çîye?

9; Ewa (sicîla deftereke wusane) hemû kirinan tê da cî hilda ye.

10; Di wê royê da xwelî li derewdêran be.

11; Ewan (derevdêran) roya xelat û celatan didine derewdêrandinê.

12; Ewê royê hey ewanê ji tuxûbê xwe borî û gunehkar, didine derewdêrandinê.

13; Gava beratenê me ji bona wî ra, tî e xwundinê ewî (aha) gotîye: "Ewan çîvanokê berêne."

14; Na! (bi gotina wan nîne). Lê bi rastî bi sedema keda wane kirî gemarê li ser

dilê wan girtiye.

15; Na! (bi gotina wan nîne, keda wan jî bi tenê nîne) loma bi rastî ewanan di wê royê da ji Xuda yê xwe rûreş in.

16; Paşê ewanê li bal doji da bîne avêtinê.

17; Wê hej paş da ji bona wan ra aha bêgotinê: "Ewa tiştê ku wê pê bawer ne dikir, eva ye (îdî de ji şapata wê çeşne bikin)."

18; Na! (wekî gotina we nîne) loma bi rastî nivîsara kirinê wanê qencîkarê, di jora bilinddan in.

19; (Muhammed!) tu ji ku dizanî, ka jora bilind çîye?

20; Ewa (jora bilind deftereke wusane) hemû kirinan tê da cî hildan e.

21; Ewan (ferîştene) nêzîk, nêhrewanî ya wî dikin.

22; Loma bi rastî qencîkar di (behiştê) xurekadan in.

23; Li ser kursîyan temaşa dikin

24; Tu di rûyê wan da, şopa qencîyan nîyas dikî.

25; Ewan, bi meya devgirtî ye xurî tîn e avdanê.

26; Derxûnê wî miske (ya jî daw ya wê meyê misk e). Îdî bira dexes (di van xelatan da) dexesî bikin.

27; Pê vexwarina wê (meyî) meya bi nav Tensîm e.

28; Ewa (Tensîm a) kanyeke wusane, ji wê (kanîyê) hey ewanê nêzîkê (Yezdan) vedixun.

29; Bi rastî ewanê gunehkarî dikirin hene! Ewanan, bi wanê bawer kiribûn e dikenîyan.

30; Gava ewanê (gunehkar) li bal wanê (bawerker da) diborîn li hev mêze dikin çav dinîqîn in (bi bawerkeran tinazan dikin).

31; Û gava (ewan gunehkaran) li bal malîne xwe da zivirîn e, ewan bi xweşî (bawerkeran) di nava xwe da bi ken mijûl dibin.

32; Û gava (ewan gunehkaran, bawerker) dîtî e; ji hev ra (aha) gotin e: "Bi rastî ewan (bawerkeran) rêya xwe wunda kirin e."

33; Ewan (gunehkaran dizan in) ku bi dîdevanî li ser wan (bawerkeran) ne hatin e şandinê, ji bo ku ewan biparîsîn in.

34; Îdî di îro da jî ewanê bawer kirin e hene! ewan (bi wanê gunehkar) di ken in.

35; Ewan (bawerkeran) li ser textegahan (li wan filan) mêze dikin.

36; Çane! (ka mêze bikin) gelo filan gerewa kirinên xweyên dikiribûn e, dîtî e?

#### Chapter 84 (Sura 84)

1; Gava ezman derizî.

2; (Ezmen) ji Xuda yê xwe destûr xwest (ku bi sitûxarî wekî babetî ya wî) bi gotina wî (perestî ya) wî bike.

3; Û gava zemîn direj bûye (rast bûye).

4; Û di hundurê (zemîn da) çî heye, hemî avêtî ye derva, îdî vala maye.

5; Û (zemîn) ji Xuda yê xwe destûr xastiye (ku bi sitûxarî wekî babetîye wî) bi gotina wî (perestî ya wî) bike.

6; Merivo! Bi rastî tu dixebitî, ku tu herî bal Xuda yê xwe, îdî (tu wusa bixebit e) tu yê bigehêjî wî.

7; Di wê gavê da îdî pirtûka kîjanî (bi destê) rastê bê danê.

8; Ewê hijmarek e hindik û hêsanî bibîn e (derbasbibe).

9; Û ewa li bal malîne xwe da bi şahî dizvîr e.

10; Lê pirtûka kîjanî di alîyê piştê wî da hatîbe daînê.

11; Îdî ewê ji bona xwe ra gazî teşqela bike.

12; Ewê li bal doja pêtan da bê kişandin e.

13; Loma ewa (di cihanê da) di nava malîne xwe da dilşabû ye (qê tiştêk ji vê şapatê ne dianî bîra xwe).

14; Loma bi rastî (ewê gunehkar) guman kiribû, ku bi rastî îdî ranabe. -11

15; Na! (bi rastî wê bîne şandinê) loma bi rastî Xuda yê wî ewî dibîne.

16; Ho! Bi segura sibehê.

17; Û bi şevê û bi wan tiştên, ku şevê di xwe da pêçaye.

18; Û bi hîva (çarde) şevî.

19; (Sond dixum!) ku hûnê ( bi temtilekî li bal temtêla mayî da bîne rêkxistinê.

20; Îdî gelo ji bona wan (filan ra)çî bûye, ku ewan hêj bawer nakin?

21; Û gava ku Qur'an ji bona wan ra tê xwundinê ewan (ji bona Yezdan ra) kunde nabin?  
22; Lê ewanê bûne file hene! (gava Qur'an ji bona wan ra tê xwundinê) ewanan (Qur'an ê) didine derewdêrandinê  
23; Yezdan bi xweber jî (ewa tişta, ku ewan filan di hundurê xwe da veşartin e) bi wan çêtir dizane.  
24; Îdî (Muhemmed!) tu ewan (filan) bi şapateke dilsoz bide mizgîndanê.  
25; Bi tenê ewanê bawer kirine û karê aşti kirin e hene! kêryeke bêpaşî ji bona wan ra

#### Chapter 85 (Sura 85)

1; Bi wî ezmanê xwedîyê beden.  
2; Bi wî roya hatiye peymandanê.  
3; Û bi nehrivan û dîtinê wî va.  
4; (Sond dixum!) ku hevrîne çala (agir) hatine kuştinê.  
5; Ewa (çala) xayê agirê pêketî ye.  
6; Ewan (cewr karan) gava (meriv di avêtina agir) bi xweber jî li ser (agir) rûniştîbûn e.  
7; Ça jî ewan (cewr karan) tişta bi serê bawerkeran dihate kirinê, bi xweber didît in.  
8; Ji ber, ku ewan bi Yezdan ê servahatê pesinvan bawer kirin e ewan (cewr karan) ji wan (bawer karan) tûla (baweryî) hildan e.  
9; Ewê, ku seroktî ya ezman û zemên ji bona wî ra ne heye! Ewa (Yezdan ê servahatê pesinvan e). Bi rastî Yezdan nehrîvanê hemî tiştan e.  
10; Bi rastî ewanê, ku ji bona mêr û jinê bawerker ra cefayê di din û paşê ji kirinê xwe jî poşman nabin hene! Ji bona wan ra şapata dojê heye û ji bona wan ra şapata şewitandinê heye.  
11; (Lê) ewanê, ku bi rastî bawer kirin e û karê aşiti kirin e hene! Ji bona wan ra behîştên wusa hene, di binê (darê) wan da çem dikişin. Serfirazî ya mezin eva ye.  
12; Bi rastî (şapata) Xuda yê te (ku bi wan cewr karan digire) pir zor e.  
13; Loma bi rastî (Xuda yê te di cara yekem da ewan) afirandin e (ji piştî mirinê, dîsa ewan para da) dizvirîn e.  
14; Baxîşkarê, hizker (Xuda yê te bi xweber e.)  
15; Xweyê erşê pesinvan ewa bi xweber e.  
16; (Xuda yê te) çi bivê ewî pêk tîn e.  
17; Maqey bûyara leşkerê.  
18; Fir'awn û Semûd ji bona te ra ne hatî ye?  
19; Lê ewanê filetî kirin e hene! Ewanan .  
20; Û bi rastî ewanan hêj di pişta hevdan in, Yezdan (bi zanîna xwe) ewan som kirin e.  
21; Na! (wekî ewan ça dibêjin: "Qur'an hinek peyv in hatin e aloz e kirinê" gotina wan nîn lê) Qur'an (Pirtûkeke) pesinvan e.  
22; Di rûperên parîsvandan in.

#### Chapter 86 (Sura 86)

1; Bi ezman û bi sitêrka quloker.  
2; (Muhemmed!) ka tu ji ku dizanî ewa (sitêrka) quloker çîye?  
3; Ewa sitêrka bi runahî û rêjoke ye.  
4; (Sond dixum!) ku li ser hemû candaran, parîsvanekî wî heye.  
5; Ka bira meriv mêze bike ji çi hatiye afirandinê?  
6; Ewa (meriva) ji avekehilavok hatiye afirandinê.  
7; Ewa (ava) ji pişta (mêran) û ji nava (her du) memikê (jînan) derdikeve.  
8; Bi rastî (ew Yezdan ê, ku bi vî awayî merivan biafirîn e; ji piştî mirinê) di şî ku ewan para da bizvirîn e.  
9; Di roya, ku hemû (veşartî) wê derkevin xûya bibin.  
10; Îdî ji bo wî merivî ra qe tu hêz û arîkarî namîn e.  
11; Û bi wî ezmanê (ku avê hildid e û) para da dîsa dizvirîn e.  
12; Û bi wî zemînê (ku ji bona hêşîna ya) çiryanê derizî.  
13; (Sond dixum!) ku ewa (Qur'an a) bi rastî pûçî û rastîyê ji hev ra diqetîn e.

14; Û ewa (Qur'an a) tinaz nîn e.  
15; Bî rastî ewan (filan ji bona pûçatê ya Qur'an ê) endezan dikan.  
16; Ez bi xweber jî (ji bona girtina wan) defikan pev dixim.  
17; Îdî (Muhemmed!) tu ji bona wan filan ra firsetê bide, bira ewan hedî-hedî (di rê ya xwe da her in.

#### Chapter 87 (Sura 87)

1; (Muhemmed!) tu bi navê Xuda yê xweyê bilintir paqîjî ya vî ji kêmayan bike.  
2; Ew (Xweda yê te) afirandin kirîye, îdî bi pêkanî rast kirîye.  
3; Ewî ji hemû heyran ra (temtêla wan) pîvaye, îdî paşê anîye rêya rast.  
4; Ewî kovîçêr derxistîye.  
5; Îdî paşê ewa (çêra) xistêye gîhakî reşê hişk maye.  
6; (Muhemmed) di nêzik da (bi Cibraîl) emê (Qur'an ê) ji te ra bidin xûndinê, îdî tu bîrva nekî.  
7; Ji pêştirê tiştê Yezdan (bîrva kirina wê) va ye. Loma bi rastî Yezdan bi tiştê xûyayî Û bi tiştê veşartî dizane.  
8; Û emê ji bona te ra rêya hêşabûna (berkirinê) pêk bîn in.  
9; (Muhemmed) heke şîreta (bi Qur'an ê) ji bona wan ra kêr tê tu ji wan ra şîretan bike.  
10; Bi rastî ewê (ji Xudê) bitirs e, wê (ji Qur'an ê) şîretan hilde.  
11; Ewê gunehkarê ji rê derketî heye! Ewa jî xwe (ji şîretê Qur'an ê) diparisîn e.  
12; Ewa di agirê mezin da tê avêtinê.  
13; Paşê (di agirda jî) ne dijî Û ne jî dimire.  
14; Bi sond! Ewê ku xwe ji (gunehan) paqîj kirîye haye! Ewa feredte bûye.  
15; Îdî ewî bi navê Xuda yê xwe şîret hildaye Û nimêj kirîye.  
16; Lê hûnê jîna cihanê heldibijêrin.  
17; Jîna parada jî (ji jîna cihanê) çêtir Û mayîtir e.  
18; Bi rastî ewan (şîretan) di pirtûk Û rûpelên berêda jî hebûn e.  
19; Ewan rûpelan, rûpelê Ibrahîm Û Mûsa nîn.

#### Chapter 88 (Sura 88)

1; Bi sond! Ji bona te ra ji bûyera (Qarsê, ku hemû tiştî kavlî dike) peyv hatîye.  
2; Di wê rojê da hinek rû hene, melûl dibin.  
3; Xebitîne(westîyane) bi kerbî hatine teşqeladanê.  
4; Di agirê sor da tene avêtinê.  
5; Ji kanîyeke kel da vedixun.  
6; Ji pêştirê (berêdara) ererê qe tu xwarina wan tune.  
7; (Ewa) bi xwarinê qelew nabin, ça ji birçîbûnê jî fereste nabin.  
8; Di wê rojê da hinek rû jî hene, di nava xwarinan da (berxudarin).  
9; Ji bona xebata xwe ye (cihanê) qayîl in.  
10; Ewanan (di behîştê da) qe tu (axiftinê) kêr nehatî nabihên.  
11; Di (behîştê da) kanînê avê wan dikişin hene.  
12; Û textegahên hatine bilind kirinê hene.  
13; Û şel bikne (avê) bi tijî amade (hene)  
14; Û balgînê rêzkirî (hene).  
15; Binraxne baha (hene).  
16; Maqey ewan (merivan) îdî li bal devê da mêze nakin, ka ça hatîye afirandinê?  
17; (Ewan) li bal ezman da jî (mêze nakin) ka ça hatîye bilind kirinê?  
18; Û li bal çîyan da jî (mêze nakin) ka ça hatîye çikandinê?  
19; Û li bal zemin da jî mêze nakin) ka ça hatîye çê kirin Û raxistinê?  
20; Îdî (Muhemmed!) Tu (ji bona wan ra) şîretan bike. Loma bi rastî hey tu şîret karî.  
21; Tu (ferman dêrekî) li ser wan hetibî (Verêhte kirinê) ku bi zor ewan bînî ser gotina xwe, nînî.  
22; Lê kîjan (ji piştî şîretan) rû fetilandibe Û bibe file.  
23; Îdî Yezdan ê ewî bi şapateke meztir bide şapat kirinê.  
24; Loma bi rastî veğerandin Û ewra wan bal me dane.  
25; Paşê bi rastî hijmara (kirinê wan) li ser meye (emê bihijmir in).  
26;

## Chapter 89 (Sura 89)

- 1; Bi Segura (sibehê).
- 2; Bi wan deh şevê (bi nev û nişan).
- 3; (Bi hemî afirandê) zo û kit.
- 4; Û bi şevê gava di çe.
- 5; Ji bona xayî hişan ra bi rastî di vane borî da sond û ewletî heye.
- 6; Maqey tu nabîni, ku Xuda yê te komalê Ad ça şapat kirîye?
- 7; Ewan (komelekî wusa bi hêz bûn) wekî sitûnan bilind bûn.
- 8; Ewan (komalên wusa bûn e) ku wekî wan tu komal di welatan da ne hatine afirandinê.
- 9; Û ewan Semûdîne di newalan da, zinar qul dikirin (ji bo ku ji xwe ra xaniyan ava bikin, Xuda yê te ça şapat kirîye?
- 10; Û (Xuda yê te) Fir'awn ê xwedîyê hêz û singê jî ça şapat kirîye?
- 11; Ewan di welatan da (bi zorbetî) ji ava rû derketibûn.
- 12; Îdî ewan di welatan da pîr cewr kiribûn e.
- 13; Xuda yê te jî, îdî li ser wan da şapatek e zor rijandîye
- 14; Loma bi rastî Xuda yê te (di hemû deman da) dîdevanê (bendeyê xwe ye).
- 15; Îdî gava Xuda bivê, ku merivan biceribîn e; ewa merivê, ku Xuda yê wî ji bona wî ra berxudarî dabe (aha) bêje bi rastî Xuda yê min ji min ra qencî kirîye.
- 16; Lê gava Xuda yê wî ewî bi ceribîne, îdî rojîne wî kêmbike û bê pêar bike îdî ewa jî (aha) di bêje: "Bi rastî xuda yê min, ez riswa kirime."
- 17; Na! (bi gotina we nîne) lê hûn (gelî merivan!) rûmeta sêwyan na girin.
- 18; Û hûn ji bona xurek dana belengazan helana nadene hev.
- 19; Û hûn mîratê qe ji hev naraqetînin, hemî tevê hev dixun.
- 20; Û hûn ji civandina mal pîr hez dikin.
- 21; Na! (evan kirinê we rast nînin) gava zemîn hejîya bû toz.
- 22; Û (gava) Xuda yê te hat; ferîşte bi gargî rêz bûn.
- 23; Di wê rojê da doj jî hatiye anînê. Di wê rojê da meriv kirinê xwe tîne bîra xwe, îdî (di wê rojê da) bîranîna wî ji bona wî ra wê ça kêrê wî were?
- 24; (Di wê gavê da meriv aha) di bêje: "Xwezîka min ji bona vê jîna xwe ra hêj di berê da (qencî) şandibûnan."
- 25; Îdî di wê rojê da wekî şapata (Yezdan) qe tu kes şapatê nake.
- 26; Û tu kes jî wekî girêdana (Yezdan) girêdanê nake.
- 27; Gelî canê rawestîyayê hewda î!
- 28; Tu li bal Xuda yê xwe da bi qayîlî bizvire.
- 29; Îdî tu bikeve nava bendenê minê (xurî).
- 30; Û tu bikeve behîştê min.

## Chapter 90 (Sura 90)

- 1; Ho! Ez bi vî bajarî sond dixum.
- 2; Û tu bi xweber jî di nava wî da rûniştî yî.
- 3; Û bi nişa merivan û bi ûrta wan.
- 4; (Sond dixum) ku me nişa merivan (di nava) zoratîyê da afirandîye.
- 5; Maqey ewa meriva guman dike, ku hêza tu kesî pêda naçe?
- 6; (Ji bona pesindanê aha) di bêje: "Min di vê rê da bi kulûra mal sixurandîye."
- 7; Maqey ewa guman dike, ku kes ewê kirina wî nabîne?
- 8; Qey me ji bona (merivan ra) du çav ne daye.
- 9; Û zîmanek û du lêv (nedaye)?
- 10; Û me ji bona (merivan) du rê; (rêya qenc û xirabîyan) daye.
- 11; Îdî ewî (merivî, ji bona sipazîya di hemberê van qencîyan) qe xwe ne avite tu gaz û bêlanê zor.
- 12; Gaz û bêlanê zor, ka çîye tuyê ji ku bizanî?
- 13; Ewa (kara) vekirina (zincîra) kolan e (ku tu ewan azad bikî).
- 14; Yan jî di rojeke axilve da dayîna xurekan e.
- 15; Ji bona sêwîyên pismam ra.
- 16; Yan jî ji bona wan belengazê, ku ji birçîya xwe li ser xwelîyê dirêj kirene.
- 17; Hêj paşê ewa dibe ji wanê bawer kirin e û şîreta bi hewdana (di hemberê cewr û aşîtan da) li hev dikin û bi dilovanî ya li hev kirinê dikin.

18; Hevrîne bi nutûv û rast evan in.  
19; Ewanê bi beratenê me bûn e file hene! ewan jî hevrîne bènutûv û çep in.  
20; Agirê ku derê wî tê girtinê, ji bona (vanan ra)ne.

#### Chapter 91 (Sura 91)

1; Bi roj û bi ruhnaya wê.  
2; Û bi hîva gava li pey (rojê) derdivebe  
3; Û bi wî roya gava (roj) ewê (vedike.  
4; Û bi wê şeva gava taritî ewê som dike.  
5; Û bi ezman bi avakerê wî.  
6; Û bi zemîn û bi wê, ku (zemîn bi gulokî) raxistîye.  
7; Û bi can û (bi wîyê, ku can) bi rûçikî (afirandîye).  
8; Îdî ji bona wî (canî ra) gunehkarî û parisandina (ji gunehan) niqandîye.  
9; Sond dixum! Kîjan canê xwe ji sikatîyan bi parisîne ewa serfiraz bûye.  
10; Û sond dixum! Kîjan ketibe sikatîyan (ji rêya rast derketibe) bi rastî ewî zîyan kirîye.  
11; (Komalê) Semûd ji qurebûna xwe (Pêxemberê xwe) dabûne derewdêrandinê.  
12; Gava mêrxasên wan serî hildane.  
13; Îdî qasêdê Yezdan ji bona wan ra (aha) gotîye: "hûn dest ji deva Yezdan û ji ava vexarina wê berdîn.  
14; Îdî ewan (mêrxasan pêxember) dane derewdêrandinê; Ewan serê devê jêkirin, îdî Xuda yê wan jî bi sedema gunehê wan şapat li ser wan da pêyweste kir; ewan (bi welatê wan va bi dêrizayî rast kir.  
15; Û (Yezdan bi xweber jî) ji encama (şapatê) natirse.

#### Chapter 92 (Sura 92)

1; Bi şeva gava taritî ewê som dike.  
2; Bi roya gava derdikeve (rohnaî dike).  
3; Bi wîyê ku nêr û mê afirandîye.  
4; (Sond dixum!) ku xebata we bi rastî cure û cureye.  
5; Îdî kîjan (ji bona xezanan ra mal) bi sixurîne û Xuda parizî bike.  
6; Û (perestîne) qenc jî bike û rast bi dêrîne.  
7; Îdî emê ji bona wî ra (hatina li bal rêya rast da) hêsanî bikin.  
8; Kîjan jî çikûsî bike û xwe (ji Yezdan) ne hewce bibîne.  
9; Û qencê (gotinan jî) bide derewdêrandinê.  
10; Îdî emê ji bona wî ra (çûna li bal rêne zehmet da) hêsanî bikin.  
11; Û gava ewa bikeve dojê, malê wî qe ji bona wî ra tu karê nake.  
12; Loma bi rastî hatina wî li bal rêya rast da li ser meye.  
13; Û bi rastî cihan û parada jî ji bona me ra ne.  
14; Îdî min hûn (gelî gunehkaran!) Bi agirêkî pêtdayî dane hişyar kirinê.  
15; Ji pêştirê wanê rûreşê ji rêya rast derketî, tu kes nakeve wî agirî.  
16; Ewî (rûreşê) maf daye derewdêrandinê, pişta xwe daye (mafê).  
17; Bi rastî ji wî (agirî) merivê Xuda pariz tê dûr xistinê.  
18; (Ewê Xuda pariz) ew e, ku malê xwe (di rêya Yezdan da )sixurandîye (mali xwe) paqij kirîye.  
19; Û (li bal Yezdan) ji bona tu kesekî ra qe tu qencîyek tune, ku ewan bi wê qencîyê bêne xelat kirinê.  
20; Ji pêştirê (maldana) ji bona qayîl bûna (Xuda yê xwe) yê bililindtir (heke dabe).  
21; Di nêzîk da jî (ewa qencîya) ku Xuda yê wî (ji bona wî ra bide, ewê) bi wê qencîyê qayîl bibe.

#### Chapter 93 (Sura 93)

1; Bi (danê) taştê.  
2; Bi şeva gava taritîya wê hewya.  
3; (Sond dixum!) Ku Xuda yê te dest ji te bernedaye ji te jî ne xeyîdiye.  
4; Û bi rastî (danê para da) ji bona te ra (ji danê) cihanê çêtir e.  
5; Û Xuda yê teyê bi rastî ji bona te ra di nêzîk da dayîneke wusa bide, ku tu bi wê dayînê qayîl bibî.



6; Maqey (Xuda yê te) gava tu sêwî bûyî tu xweyî ne kirî?  
7; Gava tu wundayî bûyî ewî tu ne anî li ser rêya rast?  
8; Gava tu xêzan bûyî ewî tu zengin ne kirî?  
9; Îdî tu bi tucureyî li sêwîyan zorê neke.  
10; Û bi tu cureyî parsekan bê par neke.  
11; Û tu bi wan qencîne, ku Xuda yê te bi te kirîye bi axive.

#### Chapter 94 (Sura 94)

1; (Muhemmed!) maqey me ji bona te ra singê te venekirîye (ku tu îdî zanîna retkokî bi zanî)?  
2; Meqey li ser te barê te hil nedaye?  
3; Ku ewî (barî ji giranîyê) pişta te dişkênand.  
4; Maqey me ji bona te ra nav û dengê te bilind nekirîye?  
5; Îdî bi rastî bi her tengayîyê ra firetîyek heye.  
6; Bi rastî jî bi her tengayîyê ra firetîyek heye.  
7; Îdî gava (Muhemmed!) tu ji karê xwe valabûyî (rabe) bi karekî dinê ra xebatê bike (nehewe).  
8; Îdî li bal Xuda yê xwe da bizvire (perestî bike).

#### Chapter 95 (Sura 95)

1; Bi hêjîr û zeytûnan.  
2; Û bi çîyayê Sîna yê.  
3; Û bi vî bajarê ewle.  
4; (Sond dixum!) ku me meriv bi rastî di rindê rûçikan da afirandîye.  
5; Me paşe ewa (meriva) li bal (tema pîr da) zivirandîye (ku ji pistî zanînê hemî tiştan bîrva bike).  
6; Ji pêştirê wanê bawer kirine û karê aştî kirine, îdî ji bona wan ra jî kêreke bê paşî heye.  
7; Îdî (Ji piştî van beratan) ka (merivo!) ji bona te ra çi bûye, ku tu bi ola (Xuda û bi roya xelat û celatan) viran dikî?  
8; Maqey tu (bawer nakî) ku berawanê berewanan Yezdan e?

#### Chapter 96 (Sura 96)

1; (Muhemmed!) tu bi navê Xuda yê teyê, ku tu afirandîyî bi xûne.  
2; Ewî meriv ji zûryan afirandîye.  
3; Tu bi xûne! Û Xuda yê te pîr rûmetdare.  
4; Ewî (bi merivan nivîsandîna) bi gilîgo û nivîsdarokî daye hînkirinê.  
5; Tişta, ku merivan nizanbûye ewî bi wan daye hînkirinê.  
6; Na! (di hemberê van qencîyan da) bi rastî meriv ji avarû derketîye.  
7; Ji ber, ku ewa (meriva) xwe ne hewce dîtîye.  
8; Bi rastî para zivirandin hey li bal Xuda yê te dane (wê hijmara kirinê wan bibîne).  
9; Qey tu ewê, ku paradanê dike nabînî?  
10; Gava bendek nimej dike (ewî dide para da na hêle nimej bike).  
11; Tu dibînî; heke; ewa (bendê nimêj; dike) li ser rêya rast be?  
12; Yan jî ewa (benda) fermana bi Xuda parizî bike?  
13; Tu di binî; heke ewa (bendê paradanê dike) pişta xwe bide (van şîretan û) bide derewdêrandine? (wê gavê ewê bizane ka wê çi bê serê wî).  
14; Maqey ewa nizane, ku bi rastî Yezdan bi hemû kirinê wî (dizane û) dibîne?  
15; Na! heke ewa (ji wan kirinê xwe poşman nebe) parada nefitile, bi rastî emê bi tûncika wî bigirin (ewî li bal dojê da) bi kişînin.  
16; Bi tûncika wî vîrekê gunehkar (bigirin).  
17; Îdî bi ra ewa (here) gazî hemnişînê xwe bike.  
18; Emê jî gazî ferîştene xwene (parîsvznê dojê bi navê) zabanî bikin.  
19; Na! (Muhemmed!) qe tu bi gotîna wî (gunahkarî) neke û tu (ji bona Xuda yê xwe ra) kunde bihere û nezîkê wî (Xuda yê xwe be).

#### Chapter 97 (Sura 97)

1; Bi rastî me ewa (Qur'an a) di şevêkê wuse da hînantî ye (ku pîvana kirina hemû

tiştan di wê şevê da çê dibe.)

2; (Muhemmed!) ti ji ku dizad ka şeva pivanê çîye?

3; Şeva pîvanê şeveke wusane ji hezar mehên (ku di wan mehan da perestî bê kirinê) qencîre.

4; Ferîşte û can bi destûra Xuda yê xwe (şevê da boyerên, ku ji bona wê salê hatine pîvandî) bi hîmartin tînin.

5; Heya segura sibehê (ewan ferîştan hey) berxudarîyê (di hênirînin)

#### Chapter 98 (Sura 98)

1; Ewanê xweyê pirtûkên, ku bûn e file û ewanê hevî çêker hene! Heya ji bona wan ra (berateke) huzwartî neyê (ewan ji hevaltîyan) xwe venabin.

2; Ewa (berata) qasidekî wusane ji alîyê Yezdan da hatîye şandinê, ku ji bona wan ra rûpelên paqij bi xûne.

3; Di wan (rûpelan da) nivîsanê (biryarê) wusa hene, mafan bi rastî vedikin.

4; Ewane xweyê pirtûk hene! ji piştî, ku ji bona wan ra berata huzwartî hatîye, paşê dutîretî di nava xwe da çêkirine.

5; Ewan (xweyê pirtûkan) bi tenê (ji alîyê qasid da) hey aha hatibûnê ferman kirinê; ku xurî ji bona Yezdan ra perestî bikin, loma ola rast hey ji bona (Yezdan ra) heye û nimejê bikin û baca malê xwe bidin û ola mafe rast şixwa eva ye.

6; Bi rastî ewanê xwedîyê pirtûkne, ku bûne file û ewanê hevî çêker hene! Ewanê di agirê dojê da her bimînin. Sikne heyîne reşayîyê evan in.

7; Ewanê bawer kirine û karê aştî kirine hene! Qencîrne heyîna reşayîyê evan in.

8; Xelata wan li bal Xuda yê wan behîsta xarinane; (Behîstake wusane) ku di binê (darê wêda) çemê (avê) dikişin. Ewanê di wê (behîstê da) her bimînin. Yezdan bi wan qayîl e û ewan jî (ji dana Yezdan) qayîl in. Ewê, ku ji Xuda yê xwe ditirsîya ye (bê gotina wî ne kiriye) heye! Eva xelata ji bona wî ra ne.

#### Chapter 99 (Sura 99)

1; Gava zemîn bi heja (zor) hejya.

2; Û (gava) zemîn (ji hundurê xwe kanî û gewherê xweyên) giran derxistine (derva).

3; (gava) meriv (aha) di bêje, "Ji bona (zemîn ra) çî bûye (ku aha diheje)?"

4; Di vê rojê da (zemîn) ji hemî (bûyerên, ku li ser hatine kirinê) di peyîve.

5; Loma bi rastî Xuda yê te li bal (zemîn da) niqandibû, (ku hemû bûyeran bêje).

6; Di wê rojê da, meriv deste deste (ji qorê xwe) derdikevin, ji bo ku kirine xwe bi bînin.

7; Îdî kîjanî wekî çîrûskekî qencîyek kiribe, wê ewê hey (hemberya wê qencîya xwe) bibîne.

8; Û kîjanî jî wekî çîruskekî sikatîyek kiribe; wê ewê hey (hemberya wê sikatîya xwe) bibîne.

#### Chapter 100 (Sura 100)

1; Bi wan hespên behindayî.

2; Û bi wan hespên, ku (bi simên xwe çîrûskên) agir derdixin.

3; Û bi wan hespên, ku (di êrişa serê sibehê da) tozê derdixin.

4; Û bi wan hespên, ku (bi wê êrişa xwe, bi tozê) şop li pey xwe hîştine.

5; Bi vî awayî ewan (hespan bi sîyarê xwe va) di nava neyaran da cî vedane.

6; (Bi van sond dixum!) ku meriv bi rastî ji bona Xuda yê xwe ra pir nankor e.

7; Û bi xweber jî nihrevanê vê kirina xwe ye.

8; Û bi rastî (meriv) ji bona civandina mal ra zor hizkere. .

9; Ma qey meriv nizan e, gava tiştên di goran da heyî radibin (ji bona civînê) têne şandinê (we gavê temtêla wan ça dibe)?

10; Wê (gavê çî) di dilê wan da heye derketî ye hatîye xu yandinê.

11; (Erê!) di wê rojê da Xuda yê wan bi temtêla wan agahdare.

#### Chapter 101 (Sura 101)

1; Lêdana (bi zor) yera heye!).

2; Ewa (boyera zor, ku dilan çîrîne, ewa bûyera heye!).

3; Tu ji ku dizanî, ka (bûyera lêdana) zor çîye?

4; Di wê rojê da meriv wekî wan perperokên (ku di gava rabûnê da ça ji hev belav

dibin) ewan jî wusa ji hev belav dibin.  
5; Û çîya jî wekî hirya jenî dibin (ji hev di herikin).  
6; Îdî kîjan (merivê) ku kêşa wî giranbe.  
7; Ewa di jîneke qayîlbûdane.  
8; Lê kîjan (merivê) ku kêşa wî sivikbe.  
9; Îdî di pêşya wî da (doja bi nav) Hawîye heye (ewê here wura).  
10; Tu ji ku dizanî ka (Hawîye) çîye?  
11; Ewa agirekî sor e.

#### Chapter 102 (Sura 102)

1; Pesindana (bi mal û mêran) wusa hûn dane mujûl kirin.  
2; Heya hûn diçûne nava goran (we mirîne xwe didane nîşanê hev).  
3; Na! (wekî gomana we nîne) lê hûnê di nezîk da (bi xeletî ya xwe) bi zanin.  
4; Dîsa na! (wekî gotina we nîne) hûnê di nezîk da bi rastî (bi xeletî ya xwe) bi zanin.  
5; Na! (wekî gomana we nîne) lê heke bi rastî we (maf) bi zanî ya ( we wusa ne fikir).  
6; Bi sond! hûnê dojê bi bînin.  
7; Dîsa bi sond! hûnê ewê (dojê bi çavekî tûj) bi bînin.  
8; Di wê rojêda hûnêpaşê ji wan qencîne (bi we ra hatine kirinê) bêne pirs kirinê.

#### Chapter 103 (Sura 103)

1; Bi gav û danan.  
2; (Sond dixum!) ku meriv di zîyanêdanin.  
3; Ji pêştirêwan (merivne) ku bawerkirine ûkarê aştî kirine û şîreta (parisandina) mafê û şîreta bi hewdana (li ser cefadanê) li hev dîkin.

#### Chapter 104 (Sura 104)

1; Ewanê ku bi zimanê xwe bi (merivan) tirana dîkin û bi çav û birûyê xwe va niqandinêdîkin (merivan didine nîşanê hev) hene! Xwelî li wan hemûyan be.  
2; Ewî mal civandîye qe nahewe, tim ewî malî dihijmire.  
3; Ewa guman dike, ku malêewî (di cihanê da) tim carî bide jînanandinê.  
4; Na! (bira ewa wusa guman neke) bi rastî ewê li bal (doja bi nav) Hutem da bê avînê.  
5; (Muhemmed!) tu ji ku dizanî, ka Hutem çîye?  
6; (ewa) agirê Yezdan ê ( pêketîye).  
7; Ewa (agîra) li ser dilan bilind dibe (qê ji dilan dernakeve).  
8; Bi rastî (derê wê dojê) li ser wan hatîye girtinê.  
9; Ewan di (nava) sitûnê direj da (bi giredayî) wê bi mînin.

#### Chapter 105 (Sura 105)

1; Maqey te nedît, ku Xuda te hevalê fîlan (ça şapat kirîye)?  
2; Maqey (Xuda yê te) endeza wan(nexistîye şîmitandina) wundabûna wan?  
3; Û (Xuda yê te)li serwan da refref (çukê bi nav hecheck) şandîye.  
4; Ku ewan (hecheckan) li ser wan da (xuryêkevîran) di avêtin.  
5; Îdî (Xuda yête ewan wusa qul-qulî kirin, te digo qey) ewan belgê kurma xarîne(wusa bedena wan qulbû ye).

#### Chapter 106 (Sura 106)

1; Bira ji bona hogirîya Qureyşîyan  
2; Ji bo ku (Yezdan) ewan (Qureyşîyan) hînê barkirina di zivistanê da (li bal Yemenê) û barkirina havînê (ûbal Şamê da kirîye) bikin.  
3; Îdî bira ewan (Qureyşîyan) ji bona Xuda yê vî xanî (ku Kebe ye) perestîye bikin.  
4; Ewî (Xuda yê) ewan (Qureyşîyan) ji bîrsînê têrkirîne û ewan ji tîrsê ewle kirine.

#### Chapter 107 (Sura 107)

1; (Muhemmed!) qe te ewê, ku ol dida derewdêrandin e dîtîye?  
2; Îdî ewa sêwîyan dide ber nuqoçkan (li wan cewr dike).

3; Û ewa ji bona xurekdana belangazan jî helana nade (maldaran).  
4; Îdî ewanê! nimej dikin hene! xwelî li wan be.  
5; Ku ewan (merivênwusanin qe tu rûmetê) nadin e nimeja xwe.  
6; Ewan ji bona gotinê nimej dikin.  
7; Ewan qe bi destê tu xezanî jî nagirin.

#### Chapter 108 (Sura 108)

1; (Muhemmed!) Bi rastî me ji bona te ra (bostanne) ku ava wan hilwejokin daye.  
2; Îdî tu ji bona Xuda yê xwe ra nimej bike û (ji bona qayîlbûna wî) goryan jêbike.  
3; Birastî hey dexesê te bi xweberin počik birne bêdûmdan in.

#### Chapter 109 (Sura 109)

1; (Muhemmed! tu ji bona wan ra aha) bêje; " gelî filan!"  
2; Tiştê, ku hûn jê ra perestî dikin ez ji bona wî ra perestî nakim.  
3; Û hûn jî tiştê, ku ez jê ra perestî dikim perestok nînin.  
4; Û ez bi xweber jî perestokê wî tiştê, ku hûn jê ra perestî dikin nînim.  
5; Û hûn bi xweber jî qe perestokê wî tiştê, ku ez ji wî ra perestî dikim nînin.  
6; Ola we ji bona we ran e û ola min jî ji bona min ran e.

#### Chapter 110 (Sura 110)

1; (Muhemmed!) gava arîkariya Yezdan hatibe.  
2; O te jî dît, ku meriv deste û deste dikebine ola Yezdan.  
3; Îdî tu bi pesindana Xuda yê xwe (perestî bike, ewî) ji kêmayan paqij bike û baxişandina xwe ji wî bixwaze. Loma bi rastî ewa (Xuda yê te) poşmanîyan pur litê dike.

#### Chapter 111 (Sura 111)

1; Her du destê Ebî Lehib şîl bibe, şixwa şîl bûye jî.  
2; Mal û keda (Ebî Leheb) ewa (ji şapata Yezda) neda parisandinê.  
3; Di nêzîk da ewê li bal agirekî bi alev da bê avîtinê.  
4; Û Jina wîye, ku êzinga dikişîne jî (dikebe agir).  
5; Di sitûyê (wê jinêkê da) kapekî li hev alyai heye

#### Chapter 112 (Sura 112)

1; (Muhemmed! Tu aha) bêje, "Ewa Yezda-nekî bi tenêye."  
2; EwaYezdanekî wusane (qe tu xarîn ve xarîn û darxistin ji bona wî ra tune ye, hemû heyî hewcene wîne.)  
3; Na zêyîne û qe tu kesî jî ewan nazandîye.  
4; Û ji bona wî ra qe tu kesê babetî tune ye.

#### Chapter 113 (Sura 113)

1; (Muhemmed! tu aha) bêje, "Ez xwe davêjime (berbextê wî Xuda yê, ku şevê) diçirîne (sibehê) derdixe."  
2; Ji sîkatîne hemî tiştê aferandîye.  
3; Û ji sîkatîya şevê gava tarî dibe.  
4; Û ji sîkatîya ançkeran, ku pufe girya dikin; girê didin.  
5; Û ji sîkatîya Dexesan, gava dexesî dikin.

#### Chapter 114 (Sura 114)

1; (Muhemmed! Tu aha) bêje, "Ez xwe davêjime berbextê Xuda yê merivan."  
2; Ku serokê merivan e.  
3; Yezdan ê (babetê perestîya) merivan e.  
4; Ji sîkatîne sêwrandinê Pelîd.  
5; Ew Pelîd e, ku di singê merivan da sewrandinê çê dike.  
6; Ku ji meçetîr merivan in. (Ewê sewrandinê sik çê dikin; çi meriv û çi meçetîr; hemî jî fermanê sîkatîya dikin: Ewan Pelîd bi xweberin).